

ROJNIVÎSA HEVALA ŞEHÎD MARYA UMUD

MARYA

Weşanên Saziya Ziman

2020

Cure: Rojnivîs

Werger: Saziya Ziman

Cihê Çapê: Çapxana Azadî

Dîroka Çapê: 2020



Nasnav: Marya Umud

Nav û paşnav: Fatma Aydin

Cih û dîroka jidayîkbûnê: Dihê-Sêrt 1980

Cih û dîroka beşdarbûnê: 1999-Amed

Cih û dîroka şehadetê: 17'ê Gulanê 2010

NAVEROK

Pêşgotin	9
Jina dilê wê tijî hevî	21
Rêberê min	45
Dubare Vegera Welat	115
Ji Mizgîn Giyan re	248
Rojnivîsa Xerzanê	309
Ji Rêhevaltiyê re	421
Nameyên min	529

PÊŞEK

Ev pirtûka di destê we de beşek girîng a hevala Marya Umud bi pênuşa xwe li ser van rûpelan neqîşandiye. Di heman demê de em hîzîrîn helbestên di nav rojnivîsê de cih digirin weke xebatek cuda were destgirtin, Wê baştir bibe. Me beşek mezin ê van helbestan derxist û bi rengê weke pirtûk bi we re parve dikin.

Hûn ê girêdana jinê ya kûr a bi jiyanê, kedê, têkoşîn, welat, hevaltî û şer re ango her tişta ji bo nûbûnê pêwîst di vê pirtûkê de bibînin.

Dema we ev pirtûk xwend dê gotinên we hemû bitevizin, rih, girêdan û hêvî we dorpêç bike. Di heman demê de di vê pirtûka hûn dixwînin de hûn ê jineke di rastiya Rêbertiyê de bê sînor xwe ji bo avakirinê feda

kiriye bibînin. Em di wê baweriyê de ne hûn ê dilê xwe tevî dilê wê bikin, îsrara wê ya di rastiya hevaltiyê de sehra evînê hîs bikin. Hûn ê jina Kurd a serfiraz a ti carî serî netewandiye û asta xwe gihandiyê ferq bikin. Hûn ê di vê pirtûkê de îsrar, îdea, hewldana fedekariya vegera li cewherê xwe bibînin.

Her çîroka jiyana azad û erdem a nayê vegotin di aliyekî de bê ziman e. Her kêliya raboriya têkoşîna me ya tijî destan ji bo vegotina heqîqeta wê, vegotina hinek rastiyên hatine jiyîn bêguman wê têrê neke. Pêwîstî bi gelek tiştên din jî heye. Di vê mijarê de rojnivîsa hevrê Marya Umud ji bo pêşerojê mirasek girîng hiştiye.

“Şehîd, paşeroj, pêşeroj û dahatûya me ne.” Gelek nîrxên em di kesayeta hevalên xwe yên şehîd de hîs bikin û bi wate bikin hene. Bi vê boneyê hewldana ji bo em hevrêyên xwe yên şehîd hîs bikin, fêm bikin û bidin fêmkirin divê bibe parçeyek jiyana ma ya girîng. Divê em ji bîr nekin yê şehîdan hîs neke nayê hîskirin, yê nede jiyîn jiyan nake, yê fêm neke nayê fêmkirin. “Yê ku bi bîr neyîne nayê bîranîn.”

Xebatên weke HPG-BÎM me ji bo hevrêyên xwe yên şehîd daye destpêkirin, em ê her tim bi hemû hevalên xwe re parve bikin.

Di xebatek wiha de keda gelek hevalên me çêbû. Di xebatek wisa dem dirêj de hemû hevalên alîkarî û keda wan çêbûye bi taybet ji ber alîkariya hevalên di çapemeniya YJA STAR de em spasiyên xwe raber dikin.

Silav û Rêzên Şoreşgerî

Gulan 2014

HPG-BÎM

PÊŞGOTIN

Hevalên pirtûka hevrê Şehîd Marya amade kirin, ji min xwestin ez pêşgotina wê binivîsim. Ev çend rojin ez dihezirim ka pêşgotinek çawa tê nivîsandin. Bi taybet dema rojnivîsa Marya Umud dibe mijara gotinê ez kûr kûr hizirim û tiştên dixwazim bînim ziman bi kîjan peyv û hevo-kan binivîsim. Hem cara yekeme ez ji bo pirtûkekê pêşgotin dinivîsim hem jî ji bo pirtûka hevalek weke hevala Marya pêşgotin nivîsandin qet tiştek hêsan nîne. Hevala Marya bi rojnivîsên xwe yê nivîsandin re jiyana jina milîtan aniyê ziman. Ev jî ji bo me tê wateya gelek tiştan. Di rojnivîsê de mirov dikare bêje mîna destanekê dîroka me parçe parçe tîne ziman.

Ez bi heval Marya re di heman qada pratîkê de nemam. Derfetek min wisa jiyana wê ji nêz ve nas bikim û parve bikim çênebû. Ez di demên cuda cuda de rastî hevala Marya hatim, bes ew bîranên me yê kurt bûn. Bi xwezayî pêvajoya naskirina min a hevala Marya, piştî şhadeta wê, xwendina min a rojnivîsên wê bû. Di lînûsa xwe ya herî dawî de wesiyyet kiribû ez hemû rojnivîsên wê bixwînim. Xwesteka wê ya tiştên nivîsandine bixwînim ez gelek hestiyar kirim û bi rastî jî vegotina vê jî di aliyê min de gelek zehmet e. Ji ber vê min jî di sala 2011'an de rojnivîsên wê yê bi nivîsa destê xwe nivîsandî heta derengiya şevê xwendin, lêkolîn kir û pir li ser lêhûrbûn kir.

Rojnivîsên hevrê Marya ew qas herikbarin ku gelek caran heta seet sê-çarê şevê bê ku bêzar û biwastim min dixwendin. Rojnivîsên xwe tenê bi tarzê nixxandinên rojane negirtine dest, her cara rojên xwe vegotine, analîz, nixxandin û ezmûnên wê yê ji bo pêşerojê perspekti-

fek girîng hiştiye aniye ziman. Rojnivîs di navroka xwe de denehevek pir mezin dihawîne. Dema mirov dixwîne, mirov dikare zehmetiyên têkoşîna gerîla, êrîniyên wê, peywendiyên hevaltiyê, parkirinên wê, asta wê ya moral, êşên wê, her wisa ew tevgera wê ya bê rawest pir baş bibîne û hîs bike. Bi kurtasî jiyana gerîla bi awayek kûr û zirav jiyana kiriye û daye jiyan.

Hevrê Marya jiyana xwe ya bi nêrînek bîrdozî, rêxistinî, ahlaqî, polîtîk girtiye dest, bi hemû ziraviyên xwe bi hişyarî û hezkirinekê hîs kiriye û jiyana kiriye. Ya rast ew kêfxweşî baş vegotiye û nêz bûye. Wê zaniye di nav êşên xwe de hezar carî hêviya xwe zindî bigire, xweşibûnek bi zanîstî di jiyana xwe de daye avakirin. Ev hemû jî di rojnivîsên xwe de bi hestek pir mezin destnîşan kiriye. Gava min ev rojnivîs xwendin min pîrsek wiha ji xwe kir:

Ma mirovek ev qas pêşbîn, kûr û hemû ziraviyan difikire dibe?

Ya rast bersiva min pîrsî gav bi gav min di nav rojnivîsên wê de dît. Ez ji hevala Marya pir tiştan fêr bûm. Gava min ew xwend min jiyana wê ji kûr de hîs kir û ferq kir. Ez zêdetir bi jiyana ji bo wê şer dikin hatim girêdan. Min çend caran ev tişt ji xwe re gotin:

Jinek milîtan encex ev qas ji ax, war, welat, gelê xwe, jin û zarokên wê hez bike!

Jinek milîtan encex ev qas evîndarê her bihostek axa welatê xwe be!

Jinek milîtan encex ev qas ji dil nêzî hevaltiyê be!

Jinek milîtan encex ev qas cewherê jinê ji kûr de hîs bike û bijî. Di he-man demê de tiştên jiyane encex ev qas ji dil bi pênûsa xwe parve bike!

Tiştên hevrê Marya nivîsîne di wateyek rast de tiştên jinê bi hezar sale jiyane ku herîkîne heta roja me ya îro rêzikên di pratîka Têvgara Jina Azad de jiyane ronî dikin. Nakokî û pevçûnên di têkoşîna cîns de dest nîşan kirine di jiyana me ya rast de beşek girîng ava kiriye.

Hevrê Marya bê ku di ti mijaran de bêzar bibe, biweste, pîvanên jina azad a milîtan esas girtine û di her alî de têkoşîna xwe meşandiye. De-

ma min ew rojnivîsên wê xwendin gotinek Rêber Apo hat bîra min:
“Ger jinek azad a milîtan di nav artêşê de bi tena serê xwe bimîne jî ew milîtaneke. Ger jinek milîtan pêwîstiyên milîtantiyê bi cih neyîne, ew di nav hezar jinan de jî be dîsa ew nabe milîtan.”

Min di kesayeta hevrê Marya de dît ku jinek milîtan bi serê xwe di qadekê de, di eyalet û pêvojoyên herî zehmet de, di şevên dirêj ên zivistanê de çawa xwe perwerde dike, xwe pêş dixê, dike xwedî helwest û bertek, jiyane li ser bingeha pêlek kêfxweşiyê pêşwazî dike xwend. Min fêhm kir ku hevala Marya li hemberî bûyeran çiqas wêrek tevgeriya û bi awayekê eşkere nêz bûye. Min carek din fêhm kir divê jinên milîtanên azadiyê bi vî rengî nêz bibin. Her wiha min di rêbaza têkoşînkirina wê de dît ku hevala Marya di vî riyê de bê ku biweste, bê ku bikeve nav gumanên şexsî ka wê çî bibe, her tiştê xwe jî bo rêxistin, Rêbertî, azadiya jinê û pêşeroja gel feda kiriye. Bi rastî jî min ji van rojnivîsan zewqek pir mezin girt û pir kêfxweş bûm.

Ya din jî di van rojnivîsan de danehevek pir cidî jî derdikeve holê. Di warê nêrîn de asta bîrdozî ya bi hêz, kûrbûna di zanabûna rêxistinî de, her wiha tûjbûna di helwest û bertekan de, sekna bi biryar a li hemberî rexne û nêzîkbûnan derdikeve holê. Li gel vê jî ew qas jî dil nêzî hevaltiyê bûyî û ji bo hevalê xwe, xwe ava kirin.

Tevî qet dibistan nexwendiyê, bi hewldanên xwe fêhm xwendin û nivîsandinê bûye, di nivîsên wê de, di nirxandinên wê de astek bi hêz a wêjeyî derdikeve holê. Ev jî çavkaniya xwe ji dil girêdanbûna hevala Marya ya bi edeb û erdembûna PKK'ê digire. Bi taybet di derbarê helbestan de, tevî ti perwerdeyên teknîkî nedîtiye jî helbestên nivîsandine tam weke helbestvanekê hestên xwe bi rêzik û ristan aniye ziman. Hevala Marya bi van taybetmediyên xwe kesayet, şoreşgereke gelemperî û jineke milîtan a xwe fedayî xeta azadiyê kiriye daye nîşan. Vaye ev hevrêya milîtan a xweşik, xweşewîst, bi nirx û pêşeng, bêguman her tim çavên me li vî jina azad digere û wê bigere. Ev “berhma” vî hevala me ya bi nirx xwendin ji bo avaniya milîtan a Tevera ma ya Azadiya Jin, tiştên me jiyane careke din bi pênuşa hevala Marya cewherî kirin û di

wê baweriyê de me wê ezmûnên wê yên jiyanê tevlî ezmûnên xwe yên jiyanê bikin.

Li ser vê bingehe ez di kesayeta hevala Marya de hemû şehîdên şoreşê bi rêzdarî, hûrmet û minetek mezin bîr tînim. Li hemberî bîranînên wan bi rêzdarî bejna xwe ditewînim. Têkoşîna we daye meşandin misoger wê bigihe serkeftinê. Ez baweriya xwe ya bi rojên azad a bi azadiya Rêber Apo, zarokên Kurdan û hemû gelê bindest tacîdar bibe nû dikim.

Wê Marya heta dawî di nav vê doza pîroz de bijîn û her tim bi me re bijîn!

Sozdar Avesta

Mîna gula berfînê ti astengî nas nedikir

Li ser hevalên şehîd nivîs nivîsandin, di mirov de hestên mîna ka ez ê çiqas rastiyan wan bînim ziman, çiqas mafê wê bidim tî jiyîn. Em çiqas rastiya şehîdan binivîsin jî ji her alî ve vegotin zehmet e. Ger ev jî hevalên mirov nas dîkin bin zêdetir zehmet e. Dîsa mirov vê weke deyn bigire dest û li ser wê bingehe nêz bibe. Niha jî dixwazim li ser hevala Marya binivîsim û kêmkî jî be dixwazim behsa wê bikim.

Şehîd Marya weke zaroka duyemîn a malbata me ya ji sê keç û du kurran pêk dihat di sala 1980'an de li gundek girêdayî navçeya Sêrtê ya Dihê çavên xwe li jiyane vekirîye. Malbet ji ber sedemên cuda neçar dibin koçî Stenbolê bikin. Piştî koçber dibin jî di nav malbatê de aliyê ziman û çanda xwe parastinê li pêş bû. Bêguman ev nêzîkbûnên malbatê li ser zarokên wan jî bi bandor bû. Ji ber koçberiyê hevala Marya zêde li gund nema. Dema malbat ji gund koçber dibe Marya hîn di temenek pir biçûk de bû. Malbat welatparêz e. Di heman demê de derdora malbatê jî welatparêz e. Çanda xwe parastin, bi zimanê xwe axaftin, dîsa bi vî rengî zarokên xwe mezin kirin û pêşxistin esas digirtin heye. Hevala Marya di nêvenga malbatek wisa de mezin bû û şêwe girt.

Piştî salên 1990'î PKK zêdetir pêş ket û li metropolan dihat naskirin. Ango di salên 1990'an de serhildanên li bajarên Kurdistanê pêş diketin bandora xwe li metropolên Tirkî jî kir. Çalakiyên li metropolên Tirkîye pêş diketin malbat û derdora me jî tevî dibûn. Li gel çalakiyan hevalên

qadro yê di bajaran de xebat dimeşandin jî her carê dihatin mala me û diçûn. Rabûn û rûnişkandin, nêzîkbûn û parkirinên wan, hevala Marya bandor dikir. Dema me ji malbatê pirsra hevalên qadro dikir, malbatê ew weke xizmên me ne didan nasîn. Ji me vedişartin ku ew heval in.

Şehîd Marya di nêvengê wisa de mezin bû û bû xwedî kesayetê mezin. Di nav civakê de zaroka keş her tim di bin zextan de tê mezinkirin. Malbat çawa dixwaze, zarok di wî alî de teşe digire. Lê hevala Marya li hemberî wan hewldanên şewegirtina civakê derdiket. Di sekin û lêgerînên xwe de çî dixwest ew dikir. Ne dixwest li ser daxwazên derdor teşe bigire. Hîna di temê zarokatiya xwe de li hemberî ferzîkirinên civakê yê mirovan paşde dibe derdiket. Tevî xwedî hestên zarokatiyê bû jî lê di nav lêgerînekê de bû. Di kêliya hevala Marya jîyan nas kirî heta niha, xwedî lêgerînekê bû. Di navbera min û wê de du-sê sal ferq hebû, ew ji min biçûktir bû. Ji ber ku em zarok bûn di navbera me de şer jî çêdibûn. Dema nêzîkbûnên civakê yê mîna “zarokên keçin, bila zêde dernekevin derve, negerin” didît hema bertek nîşan dida.

Hevala Marya bi hestên xwe yê zarokatiyê serhildan, çalakî, pîrozbahî û girtinên li metropolan pêş diketin mereq dikir. Lêpîrsînên wê yê mîna “ev hemû çî pêşketinî, ev çavkaniya xwe ji ku derê digire” pêş diketin. Di wê pêvajoyê de hem li derdora malbata me hem jî li derdora hevalên me, komê me ya perwerdê hebû. Nîqaşên me li ser şoreş û rêxistinê çêdibûn. Her çendî pir bi zanabûnê nebe jî ew lêgerîn bi demê re gihîşt asta zanabûnê. Apek min hebû, kesekî pir welatparêz bû. Wê demê jî bandên bi Kurdî li her derê belav bibûn, apê min jî bi bandên danî re bi derdorê dida guhdarkirin. Bi vê re jî pirtûkên li ser rêxistin û şoreşê, pirtûkên Zindana Amedê vedigotin ji me re danî. Bi xwendina van pirtûkan re lêgerînên xwe zêdetir bi hêz dikir. Van lêgerînan jî em ber bi şoreş û rêxistinê ve dibirin.

Di wê pêvajoyê de bavê min û apê min hatin girtin. Di nav hewayek wisa de nebûna wan di nav nîqaşên koma me ya biçûk de jî diyar dibûn. Hevala Marya jî dibû şahidê van nîqaşên me yê li ser şoreşê û li gor wê jî şêwe dida xwe. Ji xwarin xwarina wê bigire, ji cil li xwekirina wê bigire û heta stranên ji Tv’yê guhadar dikir bigire bi her tiştê xwe ve xwe ji bo

şoreşê amade dikir. Em ji nêzîkbûnên şoreşgeran bigirin û heta cil û bergên wan her tiştê wan cuda bû, hevala Marya jî hewl dida xwe bi-şîbîne wan.

Di nav atmosferek wisa de em bi hev re mezin bûn. Pir caran me bi hevalên xwe re heta derengiya şevê li ser van mijaran nîqaş dikir. Me digot; “em xwe amade bikin û biçin tevî rêxistinê bibin.” Ji ber vê divê amadekarî hatiban kirin. Me hem di hêla fîzîkî de hem jî di hêla ruh de xwe amade dikir. Bi kurtasî hevala Marya bi lêgerînên xwe yên di nav nêvengek wisa nakokiyên civakê dihatin jiyîn de berê xwa da şoreş û rêxistinê.

Tevî hevala Marya di temen de ji min biçûktir ji bû parkirinên me ji du xwîşkan zêdetir mîna du hevalên hev bû. Tiştên me ji hev veşartiban û parvenekiran nebûn. Heta dema ez beşdarî gerîla bûm jî min ji hevala Marya xatir xwest.

Em weke komekê di sala 1993'ê de beşdar bûn û wê demê temenê hevala Marya pir biçûk bû. Lê wê ji bo tevî gerîla bibe amadekarî dikir. Ji hevalan re gotibû; ez dixwazim beşdar bibim, lê hevalan qebûl nekiribû. Tevî gerîla nebibû lê her tim bi awayek çalak tevî çalakiyan dibû. Ji ber vê jî pir caran dikeve binçavan, her carê ji ber sedema temenê wê biçûke tê berdane. Di sala 1996'an de dema dixwaze tevî gerîla bibe tê girtin. Vê carê jî ji ber sedema temenê wê biçûke wê dîsa berdidin. Deverên ku lê dimîne weke qadro di xebatan de cih digire. Heta sala 1996'an hem di xebatên ciwanan de hem di xebatên jinan de bi awayek çalak weke şoregerekê hem jî di asta rêveberiyê de xebatan dimeşîne. Di nav van xebatên heta sala 1999'an meşandine gelek caran tê binçavkirin. Tê girtin û di îşkenceyan re derbaz dibe. Her cara tê girtin ji ber ti agahiyên nade dijmin ji aliyê malbat, heval û derdorê xwe ve baweriyek pir mezin ava dike. Bi vî awayî di dilê civakê de cihek xwe yê taybet çêdike.

Tevî bi awayek çalak cihê xwe di nav xebatan de digirt û tevî çalakiyan dibû jî ti carî ev bes nedidît. Her roja derbaz dibû xwesteka wê ji bo çiya zêdetir dibû. Piştî Rêber Apo bi komploya navnetewî di sala 1999'an de tê girtin êdî dibîne di nav civakê de ti tiştê xwe pê bigire

nema û ji bo Rêbertî bigihe azadiya xwe başdarî nav refên gerîla dibe. Di dîroka 2 Tîrmeha sala 1999'an de xeyalên xwe yên hatina çiya pêkanî.

Destpêkê derbazî eyaleta Amedê dibe, piştî demek dirêj li wir dimîne bi bangawaziya Rêbertî bi komên derbasî qada başûr dibûn re derbazî Herêmên Parastina Medya dibe.

Min ji hevalekê beriya hevala Marya beşdar bibe bihîst ew beşdar bûye. Hevala Marya her qada tê re derbas dibe pirs min û hevalên ez bi wan re mabûm kiribû. Hevalên li Botan û Amedê em nas dikirin behsa me kiribû. Piştî heft sal bi ser re derbas bûn me cara yekem li Qendîlê hevdu dît. Bêguman piştî heft salan şûnde hevdu dîtî pir cuda bû. Yek jî di çiyayên azad de hevala Marya dîtî bîranînek vegotina wê gelek zehmet e. Piştî heft sal bi ser re derbas bûn û tiştên di van deman de jiyane ew gelek pijandibû. Roja me hev dît, em wê rojê qet nerazan heta sibê me bi hev re nîqaş kir. Di mijara girtina Rêbertî û biryara Rêbertî ya di derbarê vekişandinê de pir zehmetî jîyan dikir. Bi girtina Rêbertî re li gel wê hestên pir cuda ava bibûn. Me heta sibê hem li ser nakokiyên jiyane hem jî tiştên di pêvajoya vekişandinê de jiyane nîqaş kir. Dixwest nakokiyên jiyane fêr bike, ji ber wê jî mereq dikir û her tim pirs dipirsiyan.

Piştî hevdîtina me ya destpêkê me gelek rojên din jî hev didît. Ew derfeta em di heman cihî de bimînin çênebû. Di demên li çiya me hev didît de min pêşketinên di wê de pêş diketin didîtî. Hem zêdetir Rêbertî nas dikir hem jî bi coşê xwe ya li hemberî xwezaya Kurdistanê di gerîlabûnê de astek mezin a pêşketinê di xwe de ava dikir.

Şehîd Marya ji sala "99" an heta 2004'an hem li qadên Başûr hem jî li qadên Rohilat ên Qendîlê dimîne. Piştî wê jî derbazî qada Zagrosê dibe. Ez wê demê li Zapê li biryargeha qadê dimam. Bi koma ew pê re hatî jî hatin biryargeha Zapê. Hevalan ji wê re gotibûn qada Zagrosê qadek zehmet e û çiyayên wê pir bilind û asê ne. Wê bi xwe dixwest biçe Çarçêla. Dema hevalan pê re nîqaş kir û tevî heval jê re dibêjin; Çarçêla qadek zehmet e, qet nebe heta tu fêr dibî li cihek cuda bimîne, wê ji bo te baştir be. Lê hevala Marya dibêje; "ji bo min ne pirsgrêke. Ez

dixwazim li qadên zor û zehmetî pir dijwar be di nav xebatan de bimînîm, dixwazim tevî şer bibim. Di vê navberê de ez ê hêza xwe derbixim holê û xwe nas bikim. Her çiqas zehmet be jî ez ji xwe bawerim. Dikarim hemû zor û zehmetiyan derbaz bikim.” Hem ev gotinên wê hem jî ev sekna wê ya bi biryar ti carî ji bîra min naçe. Nîqaşa bi hevalan re kirî weke wê çêbû û derbazî Zagros û Çarçêla bû. Heta sala 2007’an derbazî Bakûr dibe li wir dimîne. Pêvajoya li Çarçêla dima gelek caran me hev dît, hem li ser pêvajoyê hem jî li ser pêşketinên giştî nîqaşên em çêdibûn. Nîqaşên me bi awayê “li hemberî pêvajoyê rîya derbaskirina kêmasiyên di kesayet de derdikevin çi ye û çi dibin astek?” Pêş diketin. Her cara me hev didît min di wê de pêşketinên pir bi hêz didît. Piştî xebatên civakî başdarî gerîla bû, di nav gerîla û derfetên çiya de di her alî de kesayeta xwe bi awayek bi hêz pêş xistibû. Pêşketinên di kesayeta wê de ava dibûn li ber çav bûn. Ji ber ku wê di nav xebatên civakî de hem civak hem jî dijmin pir baş nas kiribû, egera xwe ya têkoşînkirinê pir baş fêhm dikir. Dema gelek caran mirov dibû şahidê nîqaşên wê yên bi hevalên ji xwe mezintir re li ser civak, felsefe û bîrdoziya Rêbertî dikirin, mirov ev tişt ji xwe pirs dikir; “Ne pêkane mirovek di temenek wisa de bibe xwedî taybetmediyên wisa kesayetî û zanabûn”.

Her tiştê dizanî hewl dida bi hevalên ciwan ên li derdora xwe re parve bike. Hezkirina wê ya li hemberî mirovan, çi jin, çi zilam, çi biçûk û mezin be qet cudabûn nedixist navbera wan. Mirov hezkirina wê ya li hemberî mirovan di nîqaş û sohbetên wê de fêhm dikir. Gava mirov li çavên wê dinêriya hezkirina wê ya li hemberî mirov dihat dît. Ji ber peywedî û danûstandinên wê yên bi mirovan re, kesa carekê li gel wê axivîba careke din ew ji bîr nedikir.

Her wisa hezkirina wê ya li hemberî Rêbertî pir zêde bû. Piştî dîlgirtina Rêbertî tevî nav refên partiye dibe. Armanca wê ya herî mezin azadkirina Rêbertî bû. Di pêvajoya komploya sala 1998’an de destpêkirî, hevala Marya jî çalakiya fedayî difikîre. Wisa bawer dike encex bi vî awayî dikare ji bo pêvajoyê Rêbertî bibe bersiv û li ser vê binge hewl dida vê bixe pratîkê.

Di aliyek din de jî meraqa hevala Marya ya xwendin û nivîsandinê pir zêde bû. Ev taybetmediya xwe ya hîn di temenê zarokatiyê de dest pêkir di nav gerîla de berdewam kir. Tiştên weke gerîla jiyan dikirin dixwest fêhm bike û ji ber wê jî her tim dinivîsî. Kêfxweşî, zehmetî, serkeftin û hemû xweşikbûnên gerîla yên xwezayî ji bo ji pêvajoyê re bîmîne dinivîsand. Ji ber wê jî 7-8 rojnivîs nivîsandibû. Weke gerîla hestên xwe, dewlemendiya xwezayê, weke jinek gerîla li çiyayên Kurdistanê gerîlatî kirin, hemû pêvejoyên hesas di rojnivîsên xwe de dinivîsand. Dema mirov nivîsên hevala Marya dixwîne, mirov wê demê pir baş fêhm dike ku ev karê wê dikir bi azwariyek pir mezin kiriye. Li gel nivîsên wê helbestên pir xweş jî dinivîsand. Hemû taybetmendî û kesayetiya xwe di nivîs û helbestên wê de dida der.

Yek jî tiştê girîng a kesayeta wê ava dikir, bêguman gerîlabûna wê ya li Çarçêla û Zagrosê bû. Piştî derbasî Çarçêla dibe demek kurt şûnde, tevîbûna wê ya pratîk, şer û çalakiyan, di nav pratîkê de jî weke berpirsariya fermanîyê nêz bûyîn ew pir pêş xistibû. Di fermanîyê wê de jî her tim kesayeta wê li pêş bû. Li gel wê jî nêzîkatiyên wê yên mirov parastin û fedakarî kirin pir li pêş bûn. Hezîkirina wê ya li hemberî xwezaya Kurdistanê jî pir cuda bû. Dema min pê re nîqaş dikir ji min re digot; ez ji demsala biharê pir hez dikim. Ji ber ku bihar bi her tiştê xwe ve xwe nû dike, xwe ji nû ve dafirîne û derdikeve holê. Bêguman her çendî bêje ez ji demsala biharê hez dikim jî, digot; “ji bo min demsala payîzê jî tiştê jênevegere.” Rengê herî zêde jê hez dikir, şîrî asîmanî bû. Şîrî hem tê wateya azadiyê hem jî tê wateya bêdawîbûnê.

Mîna gula Berfînê ti astengî nas nedikir. Gula Berfînê tevî sir, seqem û berfa zêde di nav berfê de derdikeve û bi sekna xwe serî radike. Hevala Marya jî ji zarokatiya xwe heta roja dawî hem li hemberî paşverûtiyên civakê hem jî li hemberî hemû îşkenceyên dijmin ti carî tavîz neda û zanîbû li hemberî her tiştî serê xwe rake. Lewma bibû xwedî kesayetê ji xwe bawer û her tim serkeftinê esas digire. Di nav gerîla de jî ti carî ji zehmetiyan nereve û her tim li hemberî wan têkoşîn dikir. Lewma ji ber vê sekna wê, min ew her tim dişiband gula Berfînê.

Her tim di nav lêgerînan de bû. Pêvajoyên li Qendîl, Zagros û Çarçêla mayî hewldanên wê yên biçe çalakiya fedayî pêkbîne jî çêbû. Ji ber pêvajoyê ev hewldanên wê pêk nehatibûn. Piştî wê ji bo ji Rêbertî, pêvajo û hêviyên gel re bibe bersiv dixwest biçe qada Bakûr. Bi îsrar li ser vê jî sekîni û li ser vê bingehe derbasî qada Xerzanê dibe.

Di pêvajoya li Xerzanê dima ji min re her tim name dişand. Di namayên xwe de behsa xwezaya Xerzanê, çiya, dol û geliyên wê dikir. Herî zêde behsa hestên xwe yên weke jinek gerîla tevî çalakiyên li dijî dijim bûyîn û tohlilgirtin hestek çawa ye dikir. Weke jinek gerîla li ser mijarên divê jin li qada Bakûr xwe çawa rêxistin bike, li ser divê binesaziyek çawa li pişt xwe bihêle lêhûrbûn dikir. Bi van perpirsariyan nêzî xebatên xwe yên li Xerzanê dibû.

Piştî du salan şûnde di sala 2009'an de ew şansê min ê ku bi bêtêla mezin li gel wê baxivim çêbû. Ez ew gotinên wê yên mîna "em li şûna hevalên derfeta wan nîne jî gerîlatiyê dikin û têkoşîn dikin ji bîr nakim. Hêvî dikim wê binesaziya wê ava bibe û gav bavêjin serkeftinê." Hevala li gel min jê pirs kir û got; "tu nayê van deran?" Wê jî got; "ti niyeta min nîne ez werim wan deran. Ez li şûna we jî li van deran gerîlatiyê dikim. Li bendê me hûn rojekê bîn vê derê. Em ê hev li ser çiyayê Sîser, Kurîs û Kember bibînin." Ev axaftina min a bi wê re bû axaftina dawî. Piştî wê min êdî dengê wê nebîhist.

Hevalên bi wê re li Bakûr mabûn, behsa gerîlabûn, nêzîkbûnên wê yên wek jinek gerîla, çalakbûna wê û her gava wê ya bi coş û moral davêt dikir. Her dem di nav lêgerînan de bû. Kesayeta hevala Marya mîna robarekî her tim diherîkî, her dem di nav tevgerê de bû. Hema dixwest her tiştî fêr bibe, nas bike û li hemû deverên Kurdistanê bigere û bibîne. Dixwest li çiyayên Kurdistanê bigere û wê xweşîkbûnê bijî. Pir hez dikir di bin baranê de şil bibe û bimeşe. Çawa ku hezkirina wê ya li hemberî mirovan cuda bû, hezkirina wê ya li hemberî xwezayê jî pir cuda bû.

Weke jinek gerîla hewl dida ji bo her demê gavên serkeftî bavêje. Gava mirov raporên wê dixwîne, çawa hiziriye pir baş dibîne. Mirov matmayî dimîne û dibêje; çawa ev qas tişt hiziriye. Di mesafeyek ev qas dirêj de

dilê mirovan çawa dikare ev qas tiştan hîs bike. Weke jinek gerîla li qadek weke qada Xerzanê ku derfetên gerîlabûnê pir zehmetin li wir rêxistina jin di kîjan astê de ye, zehmetiyên wê çi ne, pêşketin çawa ne; her tim li ser van dihizirî.

Hevala Marya ji stran guhdarkirinê pir hez dikir, hem jî bi dengê bilind stran guhdar dikir. Ji zarokatiya xwe ve her tim stranên şoreşgerî guhdar dikir. Dema mezin jî bû eleqeya wê ya li hemberî mizûkê zêdetir bû. Bi rengê xwe, bi qasî fêhm dikir û dizanî strand digotin. Strana herî zêde jê hez dikir, strana Koma Azad a bi navê “Bihar hat gundê me” bû. Pir ji dengê Dîno hez dikir. Her tim digot; “Dîno hunera xwe ji dil dike. Çawa dikare stranên xwe ew qas ji dil bibêje mereq dikim.” Ji zarokatiya xwe heta dawî tişteke herî biçûk jî nedixwest bê wate bimîne. Qet ji bîr nakim, dema min cara yekem ew dît min pîrsa; “te çima navek biyanî li xwe kiriye” jê kir, dikene û dibêje; “ev nav ji biyanibûnê zêdetir navek dîrokî ye. Marya di dîrokê de kesayetek bi navûdeng e. Min lêkolîn kir û çavkaniya vî navî Mardin e. Mardin navê keça qîral bûye. Ji ber wê jî min navê Marya hêjayî xwe dît.” Navê wê Marya bû û paşnavê wê jî Umud bû. Çima Umud? Ji ber ku ji bo bibe hêviya gelê xwe, ji pêşeroj û zarokan re bibe hêvî, ji gîrnijînên li ser lêvên zarokan re bibe bersiv, paşnavê Umud rakirbû. Ji nav û paşnavê wê bigirin, heta di her qadên lê mayî de peywendiyên wê yên bi mirovan re bigirin dixwest her tiştî bi wate bike. Dema cara destpêkê diçe Zagrosan, ew gava destpêkê bû davêt qada Bakûr. Digot; “ger li Zagrosan serkeftî bibim, wê zemîna çûna min a Bakûr ava bibe.” Ew armanca xwe jî pêk anî û derbasî Xerzanê bû.

Cihê hevala Marya lê bû li wir coş û hêz hebû. Cihê ew lê ba mirov qet bê hêvî nedibû. Mirov her tim dixwest gel wê bimîne û bi wê re bijî.

Ez çiqas Şehîd Marya vêbêjim, ez ê nikarim bi awayek tam vêbêjim. Bi rastî bi çend peyv û hevokan taybetmedî, kesayet, sekin, xwestek û xeyalên wê vegotin pir zehmet e. Mîna pepûleyên li derdora agir ji bo heqîqetê bibînin xwe feda dikin bû. Ji bo fêhm bike, tevî hemû zehmetiyên ji bo heqîqet û pêşerojê di nav lêgerînekê de bû.

Mizgîn Egîd Marya

JI BO JINA DIL BI HÊVÎ

Rêwîtî...

Ber bi hêviya dilê xwe ve...

Ji bo keça ji rojê hez dike

Marya, Xwîşka min, hevrêya min a têkoşînê, weke tê zanîn li gor pêwîstiya diyalektîkê zindî di nav guhertin û veguhertinê de ne. Berê em du xwîşkên hev bûn, niha jî em di nav têkoşînê de du hevalên hev ên pêşketî û bi hêz bûne. Kêma jî be pêvajoyên ku me bi hev re di qadên cuda cuda de parvekirin çêbûn. Her çiqas ev pêvajo ji bo min zehmet bin jî lê ew qas jî bi wate û bi nirxin. Bêguman hevdîtina me ya dawî cewazîyeke xwe pir cuda heye. Piştî 8 salan şûnde, di mekanek wisa bi xwîna hezar hevalan bi nixrên azadiyê avakirî de hevdu dîtî pir cuda bû. Di çiyayên Kurdistanê de ku têkoşîna azadiyê lê tê meşandin hev dîtî, dereng jî be rûmeta xwe gihandina destana azadiya Kurd a esil PKK'ê jiyîn, a herî girîng jî weke jin bûna yek ji militana azad a ku Rêbertî dixweze ava bike, coş û kêfxweşîyek pir mezin dide mirov. Heval bi kurtasî, atmosfera bi vê hevdîtana me re li gel min ava bûye dikarim wisa pênasê bikim.

Belê heval, bi hêz û ezmûnên te ji qadên beriya vê girtî re, dîsa bi de-nehev û zanebûnekê derbazî qadek nû ya pratîkê bûyîn, yek jî derbazî qadek mîna qada Zagrosê ku girîngîyek xwe ya dîrokî digire bûyîn, bawerim hestek pir cuda ye. Bi taybet ev demsala biharê ya em di nav de dijîn û dîsa bi coşa biharê re berê xwe dana pratîkê mirovan dixê nav kelecaneke û bi coş dike. Hevala hêja, bi hêviya misogerkirina azadiya Rêber Apo, em li ku derê bibin bila bibin asta têkoşînê berzkerin û tenê rastiya ku me bigihîne hev, girêdana me bi hêz bike hevaltî ye. Bi hêviya tu yê bi awayek bi coş tevlî hemû xebatan bibî serkeftinên mezin ji bo te dixwazim.

Hevala te Mizgîn Egîd a pir ji te hez dike.

Ji hevala Marya re

Ev rêwîtiya azadiyê ya di nav sînorên mirin û jiyanê re derbaz dibe, bi hevalek weke te re li ser asêbûna van çiyayan hevdîtî, bawerim naskirinek bi wate ye. Qesta min a ji sînorên mirin û jiyanê, behsa her nixrên di nav wê de tê afirandin, parkirinên bîranînên azad, cudabûn û xweşikbûnên wê kir. Di vê pêvajoyê de me bi hev re hem pêvajoyek

zehmet hem jî bi wate jiyan kir. Êşên bûna weke Kurdek, bi taybet bûna weke jinek mîna li her derê jiyîn, li Çaçela jî dijîn. Rast jiyîn bi rastî jî pir zehmet e, lê her rastiya rastî me tê, ji me re dibêje ger dixwazin bibîn jinek, divê hûn şer bi cewherî fêm bikin, bizanibin bibin xwedî rûmet û vê ferz dike. Min ev rastî bi awayek pir zelal li vir jî fêm kir, ji bo mirov rast bijî divê şerek bi rêgez bide meşandin. Di demên em armanc û azadiya xwe dihêlin, em kêliyên herî kêrt û kole dijîn. Dema tu tê bîra min û te bi bîr tîmim, dixwazim her tim di nav vî şerî de te weke xwedî seknek bi wate bi bîr bînim û di vê watê de ji hewldanên te bawer dikim. Li ser navê xwe jî ez ê hevala xwe li ser hevpeymanek wisa bi bîr bînim.

Ararat Adar

2004

Ji por keja min re

Her ku min te nas kir, min bi hevaltiyek ji dil ji te hez kir. Kêliya vê bîranînê ji te re dinivîsim di dilê min de pir tişt derbaz dibin. Dema min lînûs û pênuş girtin destê xwe, di dilê min de tirsê veqetîna pêş ket. Di heman demê de ji niha ve di dilê min de pêleke bêrîkirîna rabûye, bes şaş fêm neke hevala min. Ji ber hevaltî di ser her tiştî re ye. Hevala min a bedew, me bi hev re rojên pir xweş û zehmet derbaz kirin. Dema wan rojan bi bîr tînim, dixwazim dîsa bigihim wan rojan û bi we re bijîm. Lê di wê baweriyê de me tu biçî ku derê tu yê her tim bi hevaltiya xwe bê nasîn û bîranîn. Tu yê mîna sosîna li ser lûtkeyên Çarçêla şîn dibin jiyanê hembêz bikî.

Di wê baweriyê de me em ê van rojên xweşik li ser lûtkeyên Gabar, Cudî û hezkiran me ya li hemberî Berfo pêk bê. Bi van hêviyan em dubare jiyanê hembêz bikin. Nizanim hevala min, ger lînûs û hibra pênuşa xwe xilas bikim jî, ji bo nivîs nivîsandina min têrê nake. Ji ber ku hezkirina hevaltiyê mîna zeryayan kûr û behrên bê dawî ne. Hezkirina te jî dişibe vê. Ez ê te qet ji bîr nekim û te mîna gulekê bidim jiyîn. Bi hemû hezkirina xwe di jiyanê te ya şoreşgerî de serkeftinê dixwazim. Hevala min a hêja, min xwest helbestek xwe ji te re binivîsim.

Hevala min

Mane hevaltî û qutbûn çiqas bêrehmin

Nayê zanîn

Dil ji ku tê

Û dê li ku bigihin hev

Dîsa jî her daîm

Di çavên min de hêvî

Di dilê min de evîndarî

Bihar bi şînkahî

Bi rengîna gulan ve şîn dibe û diçe

Zivistan jî mîna vê derbaz dibin û diçin

Lê hevaltî ne wisa ye

Ti carî dawî li dilên xwe nayînin

Her tim mîna gulekê vedibin,

Şîn û zindî dibin li kêleka zinaran

Dema di bêdawiya okyanûsan de

Li te digeriyam

Ez

Di kûraniya deryayan de

Di şînbûna asîmanan de

Ji nû ve çêbûm hevala min.

Tu ji tariyê re bû ronî,

Ji zehmetiyan re bû xweşîkbûn

Û bû hevala parkirinê.
Dema behsa te dikim
Ji lîstikên zarokekî re dibim dost
Ji dilê dayîkek bi êş re dibim heval
Û li ber zinarekî dostaniya me zindî dibe

Em ne dostên sexte bûn
Ji Îmraliyê re bibin dostê rast
Ji tenêbûna wî re bibin heval
Parkirinên wî par bikin
Encex em wisa dikarin bi Rojê re xwe bafirinin
Û encex dikirin wisa bi okyanûsan re bêdawî bibin
Hevaltiya me bêdawî bibe
Hevala min
Her tim hêviya dîtina carek din
Her tim dijîm bizane

Şehîd Aysel Wan

26 Çile 2006

Tovên hêviyê

Em mîna pepûleyan li ser vê gulê veniştin ser wê gula din
Ber bi agir û ronahiyê ve beziyan
Me xwe bi agirê Zerdûşt şûşt
Em wisa gihan merteba esîl û erdembûnê

Me ala xwe ya azadiyê bilind kir
Dîroka mirovahiyê ji nû ve hat nivîsin
Li ser dêmên zarokên zozanan
Tovên hêviyê şîn bûn
Li ser axa Mezopotamya
Stranên evînê bilind bûn
Li ser lûtkeyên çîyan
Gelan li ber agir dîlan girt
Asîman bi rengê şîn hat xemîlandin
Li welatê min bûka baranê hilat
Li ber ronahiya heyvê
Mîna pepûleyan
Li ser kulîlkên azadiyê veniştin
Em bi agir hatin şûştin
Em gihiştin dayîka axê
Em her roj ji nû ve ji dayîk dibin
Her sal biharan şîn dikin.

21 Kanûn 2005

Merheba birayê min ê hêja Ridwan

Piştî ji Stembolê qut bûm şûnd derbazî Amedê bûm. Me meşa xwe ya destpêkê bi şev kir. Di vê meşê de cara yekem min xweşikbûna xwezayê ew qas ji nêz de dît. Min nizanibû li asîman ev qas stêrk hene. Dema min ev qas stêrkên li asîmanan dibiriqin dîtî hema min dest bi temaşekirina wan kir. Yek jî min navên li pey xwe hiştin û hevalên di

girtîgehan de yek bi yek di dilê xwe de derbaz kir got; vaye li şûna we jî li stêrkan dinêrim. Cihên me navber didayê, yan me pala xwe dida darekê yan jî keviyekê me bi awayekê bêdeng li xwezayê guhdar dikir. Yek jî cara yekem min didît ronahiya tavaheyvê ew qas derdor ronî dike dijiyam. Dema li Stembolê bûm, di nav wan ronahiyên bajar de min nedizaniyê heya ew qas çavên mirovan dîtîsîne. Li hemberî van tiştên min didîtin ketim nav kelecaneke. Her kaniyên min dîtin min dixwest kulekê avê jê vexwim. Her ava min vedixwar min tacekê cuda jê digirt. Li hinek cihan divê em bi lez ji kêleka avê dûr biketan, wê demê jî çavê min her tim li pişt xwe dinêriya.

Dema min di rêwîtiya gerîla ya destpêkê de ew tişt hemû ferq dikir, lê ya herî bingeşîn dixwazim behs bikim min çawa hevala xwe Mizgîn dîtîye. Piştî vê meşê me şeva xwe derbaz kir û serê sibê jî aliyê komê havalan ve em hatin pêşwazîkirin. Me hevalên nû, dema me heval dîtin em ketin nav kelecaneke û dema hevalên kevin jî ew dîtin pir kêfxweş bûn. Piştî taştê me êdî westanadina xwe derbaz kir. Berpîrsê qadê hevalê Azad bi hevalên nû re nîqaş kir. Di nav nîqaşan de nasnameya me girt, piştî me nasnameya xwe da, ji min pîrs kir ka ji malê tevlibûnê heya yan na. Min jî jê re got; tevlibûnê hene, bes niha nizanim li ku derê ne. Dema min navê gundê xwe da, hevalê Azad yekser got; heval Mizgîn û Mazlûm wan jî ji wir tevlibûnê. Dema wisa got di dilê min de çirûskên hêviyê pêketin û hema min got; Mizgîn xwîşka min e. Ev gotin bi carekê ji nav herdu lêvên min derketibûn. Hevalê Azad êdî ji min re her tim behsa bîranînan xwe yê bi hevala Mizgîn re dikir. Êdî ez fêr bibûn hevala Mizgîn li ku derê dimîne.

Piştî çend rojan êdî ew ber bi Başûr ve bi rê ketin. Gelek heval tevlibûnê birayara ji bo vekişandina Başûr nedibûn, lê ji ber talimatê bû ti kesî nedikarî dengê xwe bike. Ji bo hevalên demê dirêj li van deran mabûn qutbûn pir zehmet bû. Bi roj çûyîna ava re ew ketin ser rîyan. Her cihê dihatinê min pîrsa Mizgîn dikir. Ji her derê min di derbarê li ku derê dimîne agahî digirtin. Mizgîn, Mazlûm û Egîd wan li Botanê nemabûn. Dema hatim Botanê min dîsa pîrs kir û wêneyê hevalê Mazlûm xwest, bes li gel hevalan nebû. Min êdî agahiyên zelal girtibûn. Min fêr kiribû hevala Mizgîn derbazî qada Başûr bûye û di dewreyên perwerde

de dimîne. Ev agahiyên zelal dilê min aram kiribû. Dema bi lûtkeya çiya ve hildikişiyam henase li min dikişiya û kêmek jî zehmetî dikişand. Lê bi hêviya ez ê Mizgîn wan bibînim bû sedem ez hemû astengiyan derbaz bikim. Koma me bi komek din a li pêş çûbû bi rê ketibû. Di nav wê komê de hevalên dizanin ez xwîşka Mizgîn im hebûn.

Ev nêzî mehek zêdetire em dimeşin. Em derbazî ser sînorên Başûr bûne, derfetên Başûr ji yên Bakûr pir cuda ne. Jiyanek tam bi cihbûn heye. Hewayek rihet heye. Mirov nikare li Bakûr bi roj dûkêl derbixe, lê mirov li vir pir rihet dikare dûkêl derbixe. Li gel hevalên ji Bakûr hatin hîn jî fêrbûn hene û dema agir pê dixin pir bi baldarî pê dixin. Rêzanê me yê li cihê rûniştû ban dike û dibêje; heval hûn dikarin dûkêl derbixin ev der Başûr e, xweşiya agir bijîn. Em ghiştin Dola Xirpapê, li vê derê du yekîneyên hevalên jin hene. Em çend rojan li vir man. Hevalek jin a li vir dimîne got; ez bi hevala Mizgîn re li nexweşxanê mabûm, guwatira wê hebû, wê emeliyat biba. Van gotinan moralê min xira kir, hevala Berfin a bêmoraliya min ferq kir got; nexweşiya wê ne cidî ye. Ger hevala Mizgîn li nexweşxanê be em hevdu qet nabînin, ji ber xeta riya me cuda ye. Piştî çend rojan em ghiştin Xinêre. Li vir hevalên jin û xort perwerde dibînin. Dibistanên îdolojîk hatine vekirin, hevala Mizgîn jî berê li vê dibistanê bû.

Şev bû, ronahiya tavaheyvê narîn narîn di ber çiyên de hildiket û ji vê koma gerîla ya dimeşiya re dikeniya. Em derbazî mangeyek dibistana îdolojî bûn, di hundir de fanos pêketibû. Hevalan jî em pêşwazî kirin, ev mange manga hevala Nawroz bû. Di hundir de sê kes razabûn. Jimara me gelek bû, di mangê de cih nebû. Hevala Newroz hevalên razabûn hişyar kir û me yek bi yek silav da wan. Hevalek li dawî mabû û xwe nêzî derî kiribû, tam di wê kêliyê de hevala Nalîn got; ev ne xwîşka te be. Min jî got; heval xwîşka min çûye nexweşxanê.

Min berî vê jî ji hevala Nalîn re behsa Mizgîn kiribû, lê nas nekiribû. Em li hundir rûniştin, hevalan hîn jî îsrar dikirin û digotin; dibe ev xwîşka te be, xwîşka te ye. Min jî digot; na. Ger xwîşka min ba min ê nas bikira. Min ê di dilê xwe de tiştêk hîs bikira. Ez pir ji xwe bawer daxivim, lê ya rast dema li ber derî min li wê hevala dawî mabû temaşe kir di wê

kêliyê de min pir şibandibû hevala Elîf. Lê ez hizirim hevala Mizgîn çûye nexweşxanê.

Hevalên wergehê yên bihîstibûn em hatine hatin gel me. Em jî pir westiyane, li ser me westandina bi mehan heye. Hevalên berî vê li Botanê mayîn wisa hizirin em hêzên Başûr in. Gotin; em mehekê meşîyan, lê em ev qas weke we newestiya bûn. Di wê kêliyê de hevala Newroz got; heval ev heval ji Amedê hatine û hevalên nû ne. Bi vê gotinê re em hemû kenîyan, hundir jî pir qelebalix bû. Min bi hevalên ji Botanê he-tibûn re dest bi nîqaşkirinê kir. Di vê navberê de bi dengê nizim min jê pirsî ka hûn hevala Mizgîn nas dikin an na. Gotin; kîjan Mizgîn? Min jî got; Mizgîn Sêrt. Wan jî got; heval berî vê hevala ku me ji vir şiyar kirî ew bû. Bi vê re min ji kêfxweşîyan da ber qêran. Min got; heval ka banî wê bikin, ew xwîşka min e. Hevalên bi me re ji Amedê hatibûn jî gotin; heval lez banî Hevala Mizgîn bikin an wê hevala Marya qirîza dil derbaz bike.

Di vê navberê de dema hevala Mizgîn ji mangê derdikeve û diçe manga din, kêliya dê raze pirs dike û dibêje; ev kom ji ku derê hatine. Dema heval jî dibêjin; ji Amedê hatine, ji cihê xwe radibe û dibêje; ez ê biçim gel wan. Heval jî dibêjin; neçe, tu dikarî sibe pirs bikî. Ew kom westiyane. Tu jî nû ji nexweşxanê hatî.

Koma me berî ji Amedê bi rê bikeve hevalek birîndar hema zû dibin nexweşxanê. Ev hevalê diçe nexweşxanê li wir hevala Mizgîn nas dike. Ji hevala Mizgîn re dibêje; xwîşka te beşdar bûye û navê wê jî Marya ye. Hevala Mizgîn bi saya vî hevalî fêr dibe ez beşdar bûme û li Amedê me.

Hevalek bi navê Sosin diçe banî hevala Mizgîn dike û dibêje; hevala Mizgîn, hevala Marya hatiye ma te nas nekir. Di wê navberê de hevala Sosin jî henase bi henase hatiye û dibêje; hevala Mizgîn Marya li vir e. Mizgîn jî dibêje; tu komlo li min dikî. Hevala Sosin dibêje; na, îsrar dike, destê Mizgîn digire û tèn.

Heval jî ji min re dibêjin; hevala Marya ranebe ka em binêrin dê te nas bike? Di mangê de gelek heval hebûn. Hevala Mizgîn ket hundir, di wê kêliyê de ez jî ji cihê xwe firiyam û me hev hembêz kir. Em herdu jî giri-

yan. Mizgîn ji min re dibêje; negrî û ez jî ji wê re dibêjim; negrî. Di vê navberê de hemû hevalên di mangê de amade bûn jî giriyan. Ev rondikên kêfxweşiyê bûn. Di van rondikan de bêrîkirin û hezkirina salan veşartîbû. Me wê şevê heta sibê nîqaş kir. Me hev nas nekiribû. Vê ez êşandibûm, lê ger roj ba min ê Mizgîn nas kiriba. Ger Mizgîn jî çav bi xew û nexweş neba dê wê jî ez nas kiribam. Mizgîn wê rojê îsrar dike û ji nexweşxanê derdikeve. Ya rast wê jî hinek tişt di dilê xwe de hîs kiribûn, bes nekarîbû nav li van tiştan bike. Piştî çend salan min Mizgîn dît. Em pir bi şansin.

Gelek hevalan nasên xwe nedîtibûn û heta nedizanan ka li ku derê dimînin jî. Nasên hinekan jî şehîd ketibûn. Piştî em rojekê bi hev re man, dîsa rêwîtiya me berdewam kir. Rawestgeha me ya dawî Qendîl wargeha Ş. Eyhan bû. Em du mehan meşiyabûn û di vê rêwîtiyê de min Mizgîn dîtibû. Dîrok sala 1999'an meha Cotmehê bû. Min dixwest wan herdu mehan bi berfireh binivîsim, lê min tenê xwest kêliya min Mizgîn dîtî bi te re parve bikim.

Rojên sala nû yên destpêkê ez ji Mizgîn qut bûm. Ez nizanim ev qutbûna vê carê wê dîsa kengê ji bo hevdîtînên nû ducanî be. Hevala Mizgîn diçe tedawiyê, wê biçe deverên dûr. Bawerim ez ê demek dirêj kulîlka xwe ya bêrîkirinê nebînim. Dema van rêzîkan dinivîsim jî henaseyek kûr ji dilê xwe dikişinim. Ji ber min ji niha de pir bêriya wê kiriye. Hema dixwazim kêlî berî kêliyêkê wê bibînim û li bendê me ji min re nîşe bişîne. Bûna rêwîyên heman riyan, bûna şervanên heman arman-can, bûna dost, heval û xwîşkên heman hêviyan hestên pir cuda ne.

8 Çile 2006

Xweşikbûn

Em pir caran têngîna xweşikbûnê bikartînin, ez bawerim têngîna herî zêde em di nav jiyandê de bikartînin têngîna xweşikbûnêye. Di xeyalên mirovan de her tim dixwaza xweşik be heye. Dema behsa xweşikbûnê dikim, behsa xweşikbûna fîzîkî ya xwerû nakim. Dixwazim bêjim; em bi rehendên wê yên ruhî, fikrî hundirê têngîna xweşikbûnê teji bikin. Çawa têngîna xweşikbûnê bi awayek fîzîkî ya xwerû nayê fêmkirin, xweşikbûn

yekpareye û di hundirê xwe de her tiştî dihevine. Ji ber di nav xweşikbûnê de hezkirin heye, di kûrahiya vê têgînê de kêfxweşî heye. Ji kirêtiyê nayê hezkirin, lê kirêti jî parçeyek xweza û gerdûnê ye. Bes dîsa jî kirêti nayê hezkirin, lê ya rast a xweşikbûnê xweşik dike jî kirêti ye. Pir caran xweşikbûn di asta xwestek de dibîne, ji ber ji bo xweşik bibe ked û hewldan nayê dayîn, an jî mijara li pêşiya hewldanan dibe asteng jî sedama xwe ji taybetmendiyan kes digire. Ya rast gelek mirov ne di zanabûna aliyên xwe yên kirêt de ye. Hinek nêrînên kirêt mirovan paş-de dikişîne. Nêrînek xweşik jî di danûstanên mirovan de diyar dibe, wê demê mirov mîna rojê germ, mîna zarokekî pak an jî bi qasî guleke beybûnê xwerû dibe.

Xweşikbûn mirovan dibe çavkaniya hezkirinê û heta dibe asta azadkirinê. Asta manewyetê bi hêz dike û di dilan de mîna robarên avê diherîke. Peyva xweşikbûnê ya bi sihêr xwe lêpîrsinkirin û bi xwe re şer dane destpêkirine. Yê bi xwe re şer nekin ti carî nayên hezkirin û hez jî nake. Yê bi xwe re şer nekin azad nabin. Heta xelesa koletiyê neyê şkandin ma em ê çawa bigihînin xelesa azadiyê û çawa di nav zelaliya şînahiyê de melevaniyê bikin? Astengiya li pêşiya xweşikbûnê bêçaretî ye. Divê em ji rû bi rûbûna bi xwe re netirsîn, tirs mirovan dîl digire. Şerê herî mezin ew e yê mirov li hemberî xwe dike. Em şeran ji bo xweşik bibin bidin, em xwe ji taybetmendî û fikrên xwe yên nebaş bişon, xwe bigihînin şoreşa wijdan û bibin xwedî mirovên xwe digihînin hişmediya xweşik.

Ger em ji xweşikbûnê hez dikin, divê wê demê em ji bo cîhanek xweşik bibin şervanên xweşikbûnê.

13 Çile 2006

Merheba dayîka min

Bi bêrîkirina salan te hembêz dikim û maç dikim. Pir dixwazim te bibînim, ji ber ew qas tişt hene ku dixwazim bi te re parve bikim. Dikarim bêjim min tu di vî warê azad de baştir fêhm kir û niha wate didim te. Dema mirov di jiyana sivil de ye, tiştên jinek diji û dayîkek çî êşan dikişîne zêde nizane. Ji ber pergala mirovan tîne wê astê, ji nixrê civakê dûr

dike û kesayetek beredeyî dafirine. Dema rewş wisa dibe nîrxên manewî namînin. Di vê wateyê de wisa bawer dikin çiqas serberadayî bin ew qas azad in. Mantîqek wisa; ti carî fêr nake civak pîrsgirêkên çawa dijî û jin çî êşan dijî. Bandora pergalê li ser min jî hebû. Ji ber vê jî ez nikarim bêjim min di wê demê de ji te fêr dikir. Di van warên azad de xwe lêpîrsîn dikim û bi encama min xwe gihandiyê, di kesayeta te de li hemberî hemû dayîkan rexnedayîna xwe didim.

Ev mantiqê serdest û hişmediya qirêj, jin kiriye kole, di nav qefesekê de daye girtin û weke mirovek jî nayê hesibandin. Jin weke mirov nayê destgirtin, kêr û lewaz tê dîtin. Lê ya herî zêde ked daye jin e, yê herî zêde fedakariyê dikin dayîkin. Ev ked ji aliyê hişmediya serdest ve her tim hatiye înkarkirin û vala derxistin. Dayê, bi te re dîrokek nehatiye nivîsin heye. Te êşên bi salan di rûyê xwe yê xweşik û mîna heyîvê xweşik de, di nav xetên rûyê xwe de neqîşkiriye. Di çavên te de her tim xemgîniyek tê xwendin, çavên te êşên di dilê te tîn jiyan vedibêje. Dilê hemû jinan şkestiye, bi taybetî yê dayîkan. Ger ev der jî cihek mîna Kurdistanê be, dayîkên me dikevin nav rewşên mîna welatê min bi tenêbûn û êşan re hatiye terikandin. Bi vî rengî ji bo em dawî li êşan binin, em bi kesayetiya xwe re şerek bê eman dikin. Şerê herî mezin ew şer e yê mirov li hemberî kesayet û hişmadiya xwe dike ye. Rêbertî dibêje; “jina azad dibe, civaka azad dibû ye.” Azadiya mirovan bi azadiya jinê ve girêdaye. Di civakekê de jin çiqas pêşketibe, ew civak jî ew qas pêşketiye. Ez ê nikarim di nav van rêzikên de pir tiştan pênasê bikim, encex dikarim vê bêjim: Divê em di rastiya jinê de xwe kûr bikin.

Belê dayîka min, weke jinekê li ser lûtkeyên van çîyan mayîn pîr xweşe û kêfxweşiyek pîr mezin dide mirov. Ger ji bo êşê û zilma gelê min û dayîkên me yê hêja dijîn ji holê rakin, bibin gîlokek agir ev tiştê herî pîroz e. Bi hêviya em hev bibînin, dîsa hezkirin, silavên xwe ji dil û destekulîlêkên çîya bi baskên çûkekê ve ji te re dişînim.

15 Çile 2006

Merheba xwîşka min

Dixwazim kêmekê Zagrosê ji te re pêname bikim. Ez ê pir berfireh negirim dest, lewma ger dest bi nivîsandinê bikim ev lûnûs têrê nake. Ji ber vê jî ez ê tenê di çarçoveyek diyar de pêname bikim, lewma ez ê hestên xwe jî bînim ziman. Min di mejiyê xwe de cihek sar û bi berfê hatiye dorpêçkirin bi cih kiriye. Min romanek bi navê Li Zagrosan Xezalek xwendibû û kêmkî jî be min wê demê heybet û asêbûna Zagrosê nas kiribû. Girîngiya Zagrosê ya di dîroka mirovahiyê de ji aliyê her kesê ve tê zanîn. Gelek kesan Zagros nivîsiye. Min jî bi nêrîna gerîlayekê, bi taybet ez ê bîranîn û hestên xwe yên dema destpêkê hatibûm Zagrosê binivîsim. Xwesteka min çûna Dêrsimê bû. Ji bo biçim Dêrsimê min pêşniyar kir. Dêrsim yek jî xeyalên min ên zarokatîyê bû, di nav xeyalên min ên zarokatîyê de veşartî bû. Di sala '96'an de ji bo em biçin Dêrsimê bi rê dikevin, lê li Xarpêtê tîm girtin. Du mehan di girtîgeha Xarpêt û Meletî de mam. Yek jî keça apê min, a bi navê Ozlem li Dêrsimê şehîd ket. Hevala Ozlem netenê keça apê min nebû, di heman demê de hevala min a zarokatîyê jî bû. Tenê ji bo bîranîna hevala Ozlem jî be dixwazim biçim Dêrsim û Bakûr. Bakûr her tim dilê min hênîk kiriye. Çawa rûyê mirovan her tim li qiblê ye, rûyê min jî her tim li Îmralî û Bakûr e. Ku der dibe bila bibe, bila hema tenê Bakûr be.

Pêşniyara min nehat pejirandin. Vesaziya min li Zagrosê hat çêkirin. Piştî çend salan êdî ji Qendîlê vediqetim. Zagros qadek li ser sînore. Hem aliyê wê yê Bakûr û hem jî aliyê wê yê Başûr heye. Ez Zagrosê di herîkandina jiyânê de weke rengê nû û gava destpêka çûna Bakûr digirim dest û bi van hestan ber bi Zagrosan ve bi rê ketim. Zagros cihê şaristaniyê ye. Cografya wê ew qas hişk û asê ye, artêşa Îskender jî nekariyê wê derbas bike û belav bûye. Lê niha çiyayên Zagrosê ji gerîla re bûne dost. Cihek wê nemaye ku gerîla lê negerîye û hilnekişaye ser lûtkeyên wê. Piştî rêwîtiya hefteyekê li Zagrosê cihê min destpêkê gav avêt û rawestgeha me ya destpêkê Çemçû bû. Çemçû aliyê wê yê Başûr e. Di navbera du çîyan de çemeke avê diherîke, ji vê derê re jî dibêjin Çemçû. Çiyayên wê pir bilind û bi heybet xuya dikin. Dema min ev çiyayên asê dîtî, her çendî min berê jî asêbûna van çîyan dizanî, lê dîsa jî hesta min destpêkê jîyan kir, gelo ez ê bikarim bi van çîyan ve hilkişim bû? Ez vê nêrînê weke pirsnîşanekê li gel xwe digirim. Em ji Çemçû di

geli de ber bi Mervanosê ve bi rê dikevin, bi giloka tirsê ya di dilê xwe de li derdor dinêrîm. Her ku mirov gav davêje Zagrosê, araziye wê ji mirovan re nepenî tê. Zagros bi vê nepenîya xwe mirovan ber bi dilê xwe ve dikişîne. Dema tu digihî Mervanosê şîverê dikevin pêşiya te, ev şîverê mirovan ber bi warên Zagrosê yên cuda ve dibe, Sûmbûl, Cîlo, Çarçêla, Govendê û gelek çiyayên min navên wan bi lêv nekirine.

Xweşikbûnek Zagros a xwezayî heye. Wênesazek jî nikare çiyayek ev qas xweşik xêz bike. Di xwezayê de rengê hevpar heye. Li aliyek çiya rengê şîn, li aliyek wê zer, li aliyek wê helesorî û gelek rengên nikarim navê nav bêjim hene. Ev reng ew qas di nav lihevkirinekê de ne, bi van peyvan nikarim vê xweşikbûnê pênase bikim. Encex mirov dikare li vir bijî û bibîne. Aliyê Zagrosê yê Bakûr Colemanêg e. Zagros bi silsileyên xwe ve dirêjî her navçeyek Colemanêgê dibe. Em dema ji cihê şehîd Ozgur bi rê dikevin, em digihî neqeba Şikêrê. Pêlên Avaşînê me ber bi xwe ve dikişîne. Hêjaye mirov her deverên Zagrosê bibîne. Dema hildikişim ser lûtkeyên çiyar her tim vê gotinê ji xwe re dibêjim; Zagros ger tu serhildêr bî, ez ji te serhildêrtir im.

Min her tim ev gotin ji xwe re esas girt, riya xwe berdewam kir û min karî li ser lingên xwe bisekinim û bijîm. Araziyê Zagrosê mirovên lewaz û bêhêz di hembêza xwe de qebûl nake. Dibe çiyayên din jî qebûl nekin, lê Zagros li gor xwe hinek aliyên xwe yên xweser û taybet hene. Em nikarin xwe li hemberî Avaşîn a mirovan ber bi xwe ve dikişîne bigirin. Di aliyê din de jî Çarçêla li pêşberî me ew qas muheşem xuya dike, nikarim pênase bikim. Di hundirê xwe de dibêjim; gelo li pişt Çarçêla hîn kîjan xweşikbûn veşartîne. Dikevim nev kelecaneke û hema dixwazim kêlî berî kêliyê bigihim lûtkeyên Çarçêla. Gavên me, me ber bi Avaşîn ve dibe. Piştî meşek bi çend seetan, fitloneyek dikeve pêşiya me. Piştî me fitlonek xilas kir em gihiştin neqebekê. Avaşîn jî li jêr silav dide me. Li hemberî van dûmenan ketim nav kelecane, bi qasî min texmîn kirî zêdetir xweşiktire. Min ji neqebê baz da û gihiştim Avaşîn. Avaşîn nazdar nazdar ji Çarçêla ber bi vir ve diherikî. Hema min kulemek av ji Avaşîn vexwar. Mirov biçe li ser Avaşîn û tam ji ava wê neke nabe. Kêliya ez bi nêrînen Avaşîn ên şîn û pêlên wê re kûr çûbûm, di wê kêliyê de hevalek ji min re dibêje; heval tu destpêkê masiyên Avaşîn

bixwî, tu yê wê demê baştir tama Avaşîn bigirî. Piştî van gotinan em çaydanê xwe yê bi navê reşo datînin ser agir. Piştî em çaya xwe vedixwin, êdî dema veqetînê tê. Ez naxwazim ji Avaşîn veqetim, bes dê rêwîtiya me hîn dirêj bike û divê em keçên çiya bibînin.

Di şîverê de gavên me bi awayek rêz hev dişopînin. Em bi Avaşîn re heta cihekî meşîyan û piştî wê riya me ji hev qut bû. Avaşîn hewl dide xwe bigihîne ava Basya. Ava Basya jî ji Şemzînan tê û digihe Avaşîn û bi hev re diherikin. Ev şîverê me digire û dibe, em li ber Astengê re derbaz dibin. Li pey hev çiya rêz dibin, piştî wê em bi cihek jê re dibêjin Sêgoşe re derbaz dibin û girê Kartal dikeve pêşiya me. Di girê Kartal de di demên biharan de kivarkên bi qasî kuman mezin û mîna berfê spî hene. Dema ji aliyê Çarçêla ve li gir dinêrî ji ber mîna Kartalekî baskên xwe vekirîne, jê re dibêjin Kartal.

Şîverê me dibe û diçe, li ser riya me gundê Kixê heye û piştî wê silav didin gundê Stûnê. Gundê Stûnê di navbera sînoren Bakûr û Başûr de ye. Gundê sînore. Axa wê pir bi berhem e. Tu çi bixwazî li vî gundî heye; guz, sêv, hêjîr, hirmî, bih, tû, guhij û her wiha gelek fêkiyên min nevên wan negotine hene. Li vê derê gelek rê dikevin pêşiya me, her riyek diçe cihek cuda. Ber bi riya Geper û Deriyê Hirçê ve diçe. Her ku li Zagrosê dimînim, li şûna tirsê hezkirin bi cih bû û bûna kesek serhildêr bi kêrî min hat. Em ji Gundê Stûnê jî vediqetin. Piştî meşek du-sê seetan digihin neqeba Stûnê. Piştîre bi tepê Firatê ve hildikişin. Êdî li hemberî Çarçêla sekîname û dengê lêdana dilê Çarçêla hîs dikim.

Êdî em li Oramarê ne. Rêwîtiya me ya Zagrosê berdewam dike. Yê destpêkê gav tavêje Zagrosê, dixwaze yan Cîlo yan jî Çarçêla bibîne. Ger tu li van deran nemînî û rojekê ji Zagrosê veqetî, tu nikarî bêjî ez li Zagrosê mame. Em xwe ji neqeba Firatê berdidin xwarê. Rawestgeha me ya destpêkê gundê Diyê ye. Ev der gundê Bakûr e. Berî vê çend salan gelê me yê hêja ji ber zextên dijîm dev ji mal, gund û axa xwe berdaye. Tiştê li pişt wan maye, xeyala wan û pêlavên zarokan ên di kolanan de tê dîtin. Em bi dil şkestî ji vir vediqetin. Digihin gundê Satê. Gundê Satê gundek xweşe. Rêwîtiya me êdî em gihandine quntarên Çarçêla, em di ber tepê jê re dibêjin Çete re derbaz dibin. Piştî rêwîtiyek see-

tekê, em digihin cihê jê re dibêjin Pezkovî. Ji ber ev der bi kevir, teht û evrazî ne, cihek encex pezkovî dikarin bi van deran ve hilkîşin. Lê gerîla jî li cihên wisa dimîne. Li vir berf heye, li ber ava diherike tirşok şînbûye û hîn pir taze ye. Em hinek xwê pê werdikin, dixin nav nan û dixwin. Bêguman mirov berfê bibîne û dondirmê çêneke nabe. Em lezo derdixin, li ser berfa me di destê xwe de weke gilokekê kom kirî direşînin. Di aliyekî de li derdor dinêrin di aliyê din de jî em dondirma xwe dixwin. Lêvên me hemû rengê lezo girtiye, destê me jî rengê xwe guhertiye û li hemberî van dîmeman heval bi hev dikenin.

Dema di gelî de rêwîtiya xwe berdewam dikin, papatya li me dikenin û heta em derbaz dibin bêhna wan digirin. Em digihin neqeba Deriyê Hirçê, çiya mîna nexşên berike hatine nexşirin û li hemberî me sekinîne. Piştî rêwîtiya me ya çend rojan êdî em ghiştin rawestegaha xwe ya dawî. Ev der Çarçêla ye û bawer nakim ez niha li ser lûtkeyên wê me! Ev warê min mereq fikir hema dest bi naskirina wê dikim. Cihek bi zozane, lê araziya wê pir xweş e. Gelek şkeftên nikarim bijmêrim hene û ev şkeft di mehên zivistanê de dibe sitargeha pezkoviyên.

Raza Çarçêla di nav hersê demsalên di nav hev de tê jiyîn de veşartîye. Li aliyek wê berf, li aliyê din sosin û beybûnên biharê tîne bîra mirovan û li aliyê din jî giyaşên zer bûne... Ez li ser çimenan mîna bi kelecana zarokekî baz didim. Hestek wisa xwe li dor dilê min radipêçe, qêr dikim û dibêjim; azadî! Qulingên difirin jî hevaltiya min dikin. Di aliyekî de roj bi germahiya xwe re mirovan dişewitîne, di aliyê din de jî bi şev di bin stêrkan de û li hemberî ronahiyên Gevê stranên evînê dibêjin. Dengê me di nav şînahiya asîmanên zelal de deng vedide. Li vir gelek cihên gerîla lê bi cih dibin hene. Gerîla xezalên vê derê ne.

Li vê derê jiyan bi kedê tê strandin û mirovan digihîne cewhera xwe. Vegotina Çarçêla pir zehmet e, ez Çarçêla her tim dişîpînim jinekê. Dilê jinan her tim şkestî û birîndar e. Ji ber Roja me di Îmralî de tê girtin, ji ber vê jî Çarçêla jî mîna jinê birîndar e. Robarên wê dişîbînim rondikên wê, golên wê jî dişîbînim dilopên avê yên di çavên wê de kom dibin. Sûlavên wê jî dişîbin porê jinekê yê pêldar, dirêj û diherike nav axê. Çarçêla, ma gulên zer ên di hembêza te de remza qûtbûnê ne? Bi sala-

ne tu di hembêza xwe de sosin û beybûnan didî jiyîn. Çarçêla bi hemû germahiya xwe ve gerîla hembêz kiriye û bi baskên xwe ew rapêçaye. Yê ji Çarçêla hez neke, ew jî jê hez nake. Bi ya min Çarçêla pir baş hîs dike ka kî ji wê hez dike yan hez nake. Yek jî ev di taybetmendiya Zagrosê de heye; yê ji Zagrosê hez neke, Zagros jî jê hez nake. Zagros dergûşa şaristaniyê ye û niha jî bûye dosta gerîla. Li Zagrosê bi hezaran lehengên hezkirinê bi xwîna xwe li ser van axan hêvî afirandin. Çarçêla min, min dixwest ji te re nivîsek xweş binivîsim, lê mixabin demê min nebû. Min hewl da hemû rojên min bi te re jiyîne binivîsim. Çarçêla min, tu yê her tim di dilê min de bî û hezkirina min î.

Dema tu hatî Zagrosê û te ev çiyayên asê dît wê tirsek bikeve dilê te. Wê demê tu yê bikevî nav gumanan û piştî wê tu yê rû bi rûyê van gumanên xwe werî. Dema veqetin hat li deriyê te da, vê carê jî tu naxwazî ji vir derkevî, hemû hincetan rêz dikî, lê encam nagire. Bi stûxahrî, çav tijî rondik dilê xwe li Zagrosê dihêlî û bi rê dikevî. Ji ber Zagros asê ye li ser taybetmendiyan mirovan jî bandor dike û baweriya mirov a li hemberî xwe pêş dixê. Zagros serpêhatiyek jiyanê ye, tu jî di nav vê de rêwîya hêviyê yî.

16 Çile 2006

Malbata min a hêja

Ez bawerim hûn pir mereq dikin ka min çima navê Marya li xwe kiriye. Yê wateya vî navî nizanibe şaş dinirxîne. Weke hûn jî dizanin, navê min ê we li min kiribû, min jê hez nedikir. Ya rast niha dihizirim dema destpêkê ji dayîk dibim navê min Marya ba, ez bawerim min ê pir jê hez kiriba. Ji ber min ji navê xwe hez nedikir, ketim nav lêgerîna navan. Piştî ji we veqetiyam min navê Marya li xwe kir û bi vî navî hatim welat, warê bihûştan. Kesek bi vî navî tinebû, nebûna ti kesê jî ez kêfxweş dikirim. Navê Marya her tim derya, rengê şîn û asîmanan tîne bîra min. Ya herî girîng jî navê Mêrdînê yê herî kev ne. Ev nav, navê keçek qiral e. Ev nav, navê dayîka Manî, xwîşka Musa û navê hevala Îsa bû. Ev nav niha li Rusya weke navê jinekê tê bikaranîn. Kêm jî be min xwest di dîrokê de ka kîjan kesayetan ev nav bikaraniye bînim ziman, lê ji bo min aliyê wê yê girîng ev e:

Marya rengê şîn tîne bîra min
Rengê şîn jî bêdawibûnê vedibêje
Bêdawîbûn jî azadiyê fêrî min dike
Azadî jî min xweşik dike
Xweşikbûn jî hevghîna min a
Bi dîrokê re pêk tîne
Dîrok jî
Mizgîniyên rojên azad dide min

17 Çile 2006

Merheba bavo

Ez dikarim bêjim min pir bêriya te kiriye û pir dixwazim te bibînim. Di nav vê dema me bi hev re derbaz kirî de tiştên min jiyane dixwest bi te re parve bikim. Bê ku vê jî bêjim nikarim derbaz bikim; min dixwest bi te re ne weke keç û bavek, weke du hevalên hev nîqaş û parve bikim. Dema ez hatim welat, min dixwest xatirê xwe ji te bixwazim wisa werim, lê mixabin dema hatim tu ne amade bû. Ji ber vê jî bê ku te bibînim hatim. Min dixwest hinek tiştan bi awayek hîn vekirî û xwezayî vebêjim. Lê îşev ez pir xemgînim û moralê min pir xerabe. Ger tu se-dema wê pirs bikî, ya rast tu dikarî fêhm bikî bavo. Tiştê ji bo gerîlayek û gelekî êş û îşkenceya herî mezin dikişîne negihîştina Rêbertî ye. Dizanîm ev êş û azarên dijîm, her kesê ji xwe re dibêje, mirovim dijî. Naxwazim moralê te xerab bikim.

Bavo, min keda te û dayîka xwe qet ji bîr nekiriye û min her tim hewl daye hêjayî wê kedê bim. Min her tim birûmet jiyan kiriye. Bawerî û nirxa we daye min û Mizgîn min qet ji bîr nekiriye. Ez di jiyana xwe ya şoreşgerî de jî bi vê têgîna baweriyê meşiyam û jiyan kir. Gotinek te hebû te her tim ji me re digot; ger hûn dixwazin tişteki bikin, an baş bikin an jî xerab nekin. Di derbarên tiştên hûn dixwazin bikin de baş

bihizirin wisa biryar bigirin û baş bikin. Min ev gotina te ya di nav gel de weke biwêjekê tê bikaranîn, kir guhar û xist guhên xwe.

Bavo, demekê nakokiyên min bi te re hebûn, ji ber wê demê te ji min fêhm nedikir pir ji te aciz dibûm. Her çendî min carana wate dida te jî, min her tim digot; sibe sibe ye, îro îro ye. Nêzîkbûnên we yên mîna pêşeroj û paşaroj heman tiştê, teqez wê wisa bibe li min ferz kirin, li gel min her tim rê li ber nakokî û pêvçûnan vedikir. Lê ji ber tu nêzî me nedibûyî, me jî tu fêhm nedikir û ev nefêmkirin jî di peywendiyên me de rê li ber tevliheviyan vedikir. Bavo, tu hinek bi dogma nêz dibûyî û nakokiyên me dijiyan te bi watedar nedikir. Ez naxwazim tu xelat fêhm bikî. Xwesteka min ew bû ez van nêrînên xwe bi awayek li hemberî hev nîqaş bikin parev bikim. Ji ber dema bi nivîsê dibe, dibe tu bêjî, keça min dîsa perspektîfan dide. Hewl bide taybetmediyên çax û pergalê fêhm bike. Ger hewl bidî ka mirovên pergalê li hemberî civakê dehî nav serhildanek çawa dikin fêhm bikî, wê demê tu yê baştir fêhm bikî ka çima ciwan dikevin nav lêgerînên cuda. Ev tiştên min anîne ziman, nirxandinên min li ser wê demê kirine. Lê niha nizamim rewşa te çawa ye, teqez niha tu guheriyî. Di vê mijarê de jî bawer dikim ti acîzbûna te li hemberî min nîne. Dixwazim tu vê jî bizanî, herî dawî dema me hev dît, min ji te moralek mezin girt. Bavo, ger acîzbûnên min çêbibin jî, hema ew kêlî bû û piştî derbaz bû. Ango weke tu jî dizanî ti acîzbûna min li hemberî te tineye. Min li vir xwe lêpirsin kir, min kêmasiyên xwe jî dît û li hemberî te rexnedayîna xwe didim. Wê rexnedayîna min jî her tim bibe pratîka min.

Bavo, pir mereq dikim, gelo tu hîn wisa bi dayîka min re henekan dikî? Ya rast divê min ev pirs nekira, ji ber dizanim tu hîn henekan lê dikî. Ji ber tu ji dayîka min pir hez dikî. Niha bi xatirê te, li xwe pir baş binêre û bi biharên welatê xwe re te hembêz dikim.

19 Çile 2006

Dibim berfîn

Dilê min li ber gumêniya bayê dikeve
 Çavên min şil dibin
 Mîna baranê diherikim nav axê
 Ez rêwiya hêviyê me di riya şoreşê de
 Zerya dilê min ji xwe re direvîne
 Hezkirina min mîna volkanan dikele
 Dibim serhildêr û di zinaran de dibim berfîn
 Ger di zinaran de qutbûn hebe jî
 Min wêneyê te li ser çiya û dilê xwe xêz kiriye
 Ger ji lûleyên çekan bêhna barûtê were jî
 Ez ê hezkirina te mîna nêrgizek nazdar mezin bikim
 Ger bimrim jî êdî ne xema min e
 Efsûna xwe li ber bayê berdidim

22 Çile 2006

Merheba xunçeya min

Îbrahîmê min, ez ji te re dibêjim xunçe, ji ber tu bihar, coş û kêfxweşiya min î. Ez dixwezim ji te re bêjim Îbo. Tu ji me hemûyan biçûktir û gula me ya dawî bû. Dema biçûk bû, tu pir qelew bû. Lamên te topikî bûn, me pir ji te hez dikir. Ez ti carî netebitîbûna te û bi taybet ew pirsas te ji dayîka min kirî ji bîr nakim. Te pirs dikir û digot; dayê ez çawa hatime dinê? Dayîka min jî digot; me tu li vê derê dîtîyî. Te jî bi awayek pir zana digot; na, ez ji zikê te derketime. Ger şaş nebim te nedikarî tîpa “r” bi kar bînin. Ji ber wê jî dema tu nû fêrî axaftinê dibû, em pir li te dikeniyên. Ji ber dema tu daxivî tu pir şîrîn dibûyî. Di 1995’an dema em çûbûn Newrozê polîsan êrîşî me kiribû û te derbeyeke xwaribû. Ji ber vê tu pir ji polîsan ditirsiya. Tu li ber çavên min hîn ew zarokê şîrînî. Lê niha tu mezin bûyî, bûyî ciwanek bedew û jêhatî. Dema tu zarok bûyî

porê te kej bû. Niha zarokatiya te dihizirim, bawerim tu niha di dibistanê de pir serkeftiyî. Qet navberê nede xwendina xwe. Ji ber pêwîstiya gelê Kurd bi ciwanên xwende heye. Tu û Elîf bixwînin, xwe pêş bixin, bibin mirovên zana û perwerdekirî. Mirovan di çî de winda kiribe, di bingeha wê de bêzanebûnî heye.

Xunçeya min, fêrî taybetmendiye xirab nebe. Hevalên xwe baş hilbijêre û bila ti kes te nekişîne ser riyên xirab. Ji ber pergale bi zanabûn ew qas tiştên xirab pêşxistine; hişber, çetegerî û hwd. tu ji min baştir van tiştan dizanî. Ez di wê baweriyê de me tu yê tevlî van tiştan nebî û di vê mijarê de bawerîya min bi te heye ku tu li hemberî van tiştan hişyar tevbigêrî. Min pir bêriya te, xwîşk û birayên xwe yên din û zarokên apê xwe kiriye. Ez dixwazim bêrîkirina xwe ya li hemberî we hemûyan binivîsim, lê bawer bikin derfeta min nîne. Di kesayeta Îbo de ji we hemûyan pir hez dikim û pir bêriya we kiriye.

Min yek ji we jî ji bîr nekiriye. Dibe ez neyê bîra we gelean, lê min her yek ji we di dilê xwe de çandiye. Hûn hevalên min nin, her yek ji we kulîlkan biharê yên reng bi rengin. Mirov ji kulîlkan aciz nabe, her tim dixwaze kulîlkan bibîne û bêhn bike. Hûn gulên min nin. Tiştên min ji Îbo re gotin, hûn jî dikarin baldar bin. Bi sekna çiya ya azad re, bi hezkirina Zagrosê ya mîna jinê û bi hevaltiya gerîla ya germ re ji vir heta wir silav û hezkirinên xwe rêdikim, we maç dikim.

25 Adarê 2006

Merheba zarokê azad, Azad

Xunçeya min a hêviyê, dibe tu mereq dikî di nav hezar navan de min çima navê Azad hilbiratiye. Ji ber min xwest tu azad bibî û azad bijî. Hêvî dikim tu yê navê xwe biecîbînî.

Gelo biraziyê destpêkê her tim wisa şîrînin? Dixwazim vê jî dest nîşan bikin; bila biraziyên min yên ji dayîk bibin nexeyîdin, wê ew jî şîrîn bin. Ji ber min tu dîtî pir kêfxweş bûm. Wisa bihizire piştî çend salan tu malbata xwe dibînî û tu di kêliyê ne li bendêyê derdikevî pêşiya wan, piştî wê lê dinê biraziyê te çêbûye. Min ev bûyerên wisa her tim di şo-

reşên cîhanê yên klasîk de dixwendin, lê di şoreşa me de zêdetir bûyer diqewimin. Dema tu mezin bûyî, dê ji te re ew şeva min tu dîtî vebêjin. Dema ji bo tu razî min te dihejand jî, tu ew qas bêguneh û şîrîn dirazayî, nikarim pê nase bikim. Ez di wê baweriyê de me tu yê bibî zarokek aqil û jîr. Tu dizanî îşev şevêk pir taybete, heyvê bi ronahiya xwe çiya ew qas xweşik ronî kirine pê nasekirina wê zehmete. Stêrk jî ji bo çavê mirovan hîn zêde bibirqîne û reng bide bi xwezayê re ketine nav pêşbaziye.

Wê sibe dîsa komêk hevalên din bikeve rê û piştî wê ez jî diçim. Hema dixwazim kêlî berî kêliyêkê biçim Bakûr. Ji ber ez ê biçim pir kêfxweşim.

Dixwazim bi bayê azad ê Bakûr re ji te û hemû zarokan re jiyanek xweşik bihêlim. Dixwazim ji we re parqek bi awayek azad tê de bilîzin, dibistanek bi zimanê dayîka xwe perwerde bibinin û jiyanek bi awayek azad pafirokên xwe tê de li ber bayê bifirînin diyarî bikim. Ji niha ve gîrnijîn û kêfxweşiyên we di dilê xwe de hîs dikim. Bi germahiya rojê, zelaliya Avaşîn re te hembêz û maç dikim.

Bi her stêrka dibirîqe re gîrnijînên min di dilê xwe de hîs bike.

26 Adarê 2006

JI RÊBERÊ MIN RE
Ji Warê Xwedavendan Zagrosê...
Ji raza dilê min...

Bi gihiştina raza dilê xwe re min dest bi vê rêwîtiya jiyanê nû kir. Dixwazim di vê rojnivîsa xwe de zêdetir cîhana xwe ya hundirîn û hestên xwe yên di derbarê Rêbertî de binivîsim û vebêjim. Hezkirina min a li hemberî Rêbertî di dilê min de veşartîye, dixwazim girêdan û hezkirina xwe jî bi sekna xwe ya di nav jiyanê de nîşan bidim. Dixwazim hezkirina xwe bi van rûpelên spî re parve bikim. Dixwazim van hestên xwe jî mîna nepenîya hezkirina dilê xwe veşartî bigirim. Dihizirim ger herkes vê hezkirina min a kûr bizane, wê demê ez ê negihim wê raza dilê xwe. Rêberê min, ji bo hûn bikarin rihet henase bigirin, lêhûrbûn dikim û dixwazim bibim afrîneriya jiyanek watedar. Rêberê min, we jiyanê nû afirand, ez jî weke keça vî gelê bi nîrx û şervana we ya azadiyê dixwazim vê jiyanê nû jiyanî bikim.

Rêberê min, dema we di navbera çar dîwaran de dihizirim, negengaze kêfxweş bibim. Weke taybetmendî jî ez pir zindî û rû bi kenim, lê ji ber hûn di nav çar dîwaran de dijîn her tim mîna qaqlibazekê birîndarim. Her tim ji dilê min xwîn diherike, kenek ne jidil li derdor belav dikim û weke rêgeza civakê bi mirovan re dikenim. Ez mirovek ji ken pir hez dikim, kêfa min ji mirovên rû tirş re nayê û mirovên zindî zêdetir nêzî xwe dibînim. Rêberê min, heta hûn azad nebin, ti wateya vî ken û zindibûnê nîne. Kêliya hûn azad bibin, dê ken ji nû ev watedar bibe. Rêberê min, dilê gerîla birîndare, ji ber di nav bêçaretîyekê de temaşiyî dîlgirtina we dike. Em her tim di nav lêpîrsînekê de ne û pîrs her tim dibin mijara me ya hizirandinê. Em ê çawa rola xwe bilîzin da ku we di nav wan derfetan de rizgar bikin û çawa bikevin nav kûrahiya hevaltiyê? Hûn dibêjin; bi min re bûna heval rêgezên xwe hene, gelo em ê kengê bibin pêkhînerê van rêgezan? Ez jî weke gerîla û şervaneke dildara azadiyê dixwazim hezkirin û girêdanbûna xwe ya li hemberî we tacîdar bikim. Dixwazim wan sihên li ser we hemûyan rakim û li hemberî hişmendiyan tarî bibim gilokek agir. Kêm jî be dixwazim sotîneriya agir nîşan bidim. Rêberê min, dizanim hûn van erkên pîroz erê nakin û li dijî van derdikevin, lê bawer bikin Rêberê min, naxwazim ti mirov êş bikişîne. Lê rastiya pergala KT'ê dihêle em van pêkbînin. Ji ber ne ti sedeman dixwazin gel û Rêberê gelekî tine bikin, dixwazin me bê we bikin. Li hemberî vê rastiye divê êdî em gavekê bavêjin û dixwazim vê

berpirsyariyê hildim ser milên xwe. Em weke zarokên vî gelê di bin serdetiyê de ye, ev mafê me yê parzastina cewherî yê herî xwezayî ye.

Rêberê min, min her tim xwestiye we bibînim, xeyala min a herî mezin jî dîtina wê kêliya rojekê hûn li ser Sûrên Amedê xitabî gel dîkin û gihîştina we ya gel e. Ji bo ev xeyal pêk were her tim di nav lêgerînan de me. Rêberê min hûn jî dizanin ku êşa herî mezin mirov bi gelekî bide jiyîn, Rêberê wî gelî jê qutkirin û nîşan nedane. Weke fîzîkî hûn ji gel hatin qutkirin, lê hûn di dilê gel de bûn agirê her tim pê dikeve û gelê min ji bo we dijî Rêberê min. KT pir ji girêdana gel a li hemberî we ditirse û yek jî hêzên tarî pir ji we dihesidin. Rêberê min, min xwest vê rojnivîsa xwe ji we re binivîsim û bi van nivîsan re xwe bidim nasîn.

Ez pê dihesim wexta min kêr maye û hema dixwazim ber bi agir ve baz bidim. Dixwazim hestên serkeftinê bi gel, dost û hevalên xwe bidim jiyîn.

Li benda min be agirê pîroz

Ber bi te ve tîm

Ez ê bi germahiya te

hestên serkeftinê bijîm

27 Çile 2006

Merheba Rêberê min

Bendewarî hîn berdewam dike. Ev rewş min pir tengav dike û her roj di bendewariya ez ê di nûçeyan de tiştek nû bibihîsim disekimim. Enca ma wê jî xemgînî ye. Hema şêwazê çalakîyan weke her rojên din e; girevên birçîbûnê, daxuyanî, xwepêşandan û çalakîyên korsanwarî. Ez van çalakîyan biçûk nabînin bes pir lewaz derbaz dibin. Di qadên legal de bi taybet di qada Ewrûpa de afrînerî nîne, hema mirov dikare bêje bi pergala Ewrûpa re di nav lihevkirinekê de çalakî tîm lidarxistin. Pêvajoyê ji zû ve ev rêbaz derbaz kiriye û ma wê kî dengê xwe ji van çalakîyên lewaz re bike? Ya rast ev çalakî marjinal bûne û tam li gorî pergalê ne. Ger çalakîyên ku qanûnên Ewrûpayê tengav bike pêk werin, dê

wê demê afrînerî û zindîbûn were dîtin. Bi vî tarzî, bi vî şêwazî dest û lingên mirov girêdayî temaşeyî vê pêvajoyê kirin hestek pir xirabe. Rêberê min, di aliyê wîdanî de nerihetim. Me îro weke tabûr pirtûka bi navê Di Tofanê de 33 Roj xwend, we di wê pêvajoyê de pir zehmetî jiyane û kesê hûn fêhm nekirine. Me hûn bi tenêbûnê re rû bir û hiştin. Rêberê min, ev pêvajo jî ji wê pêvajoyê ne cudatir e. Hûn dîsa êş dijîn, dîsa ji we fêhm nakin û ji we re nabin çareserî.

Mijara herî zêde di pirtûka Di Tofanê de 33 Roj bandor bûm, çalakiya hevalê Jêhat û Tayhan a ji bo çalakiyek birûmet bê ku diduliyê bijîn xwe dişewitînin. Ev vînek pir mezine. Kêlî bi kêlî şewitin...Ya jê re tê gotin milîtanbûn ev e ne wisa? Rêberê min, wan jî dengê dilê xwe guhdar kir û ji kûraniya hezkirina hevaltiyê soz dan hev. Bi rûyek ken agir û ronahî hembêz kirin. Tevîzînek pir balkêş xwe bi ser bedena min de berdide xwarê, wêrekî, biryarbûn, vîn û girêdanbûnek pir mezine. Bê ku hevalan pê bidim hesandin van çalakiyan bi awayek pir zirav ji xwe re mînak digirim. Ziraviyên wê yên herî biçûk jî hesapkirin û pêk anîn, ev ziravî ew ber bi serkeftinê ve birin. Divê ez jî weke van hevalan pir baldar nêz bibim. Ger bi vî rengî nêz nebim, ez ê negihim raza dilê xwe. Di wê demê de ez ê bimirim, mîna di zinarekî de bikevim mirin û valatiyê bijîm. Di vê wateyê de hewl didim pir bi baldar nêz bibim. Divê ev erkên wisa pîroz veşartî werin girtin. Hevalên ji rêveberiya biryargeha herêmê çûne biryargeha navendî civînê hîn nehatine, li benda wan im. Hevalên min dê ka zû werin, li benda we me û ev bendewarî min tengav dike.

28 Çile 2006

Merheba Mirovê Zana

Dilê min di qefesa xwe de nahewe, biryarbûna bi min re moral, kêfxweşî û kelecana avakirî... Hema dixwazim zû bigihim raza dilê xwe. Di van kêliyan de xwe pir aram û azad hîs dikim. Ez bawerim tiştê jê re tê gotin azadî ev e. Van hestan, nêrînên min ên li hemberî jiyane jî dan guhertin. Bi çavên tazî li jiyane dinêrim. Ji paşverûtiyan dûr, bi hestên azad xweseriyê di rih û jiyane de dijîm. Her hevalek ji min re ew qas xweşik tê! Her tim dixwazim li wan binêrim. Hema dixwazim zû ji

hêviyên di çavên hevalên xwe de û tiştên gelê me ji me hêvî dike re bibim bersiv. Ji ber vê jî dilê min bi lez lê dide. Ez ê bibim perperîkek û agir keşf bikim, dixwazim bibim perperîkek.

Mizgîn giyan

Mîna te jî anîbû ziman, hezkirin bi peyv û hevokan nayê pênasekirin, encex mirov di dil de hîs bike û bide jiyîn. Nikarim hezkirina xwe ya li hemberî te bi hevokan pênase bikim. Lê hezkirina min a li hemberî te, tu hîs dikî, çawa ez hezkirina xwe ya li hemberî te di dilê xwe de hîs dikim. Ez di wê baweriyê de me tu yê wate bidî vê veqetîna fîzîkî. Dibe di aliyê hem bûna xwîşk û hem jî bûna hevalên hev de di asta hest de ji vê veqetînê bandor bibî, lê tişta ji te dixwazim divê tu xemgîn nebî. Ger min ev nekiriba wê hevalek din ev pêkanîba. Ha ez ha hevalên min. Bêguman dema Rêbertî dibe mijara gotinê, hemû robarên avê ditevizin, lêdana dil radiweste. Di vê wateyê de wê lêdana dilê min jî raweste û hema dixwazim zû vê erka xwe serkeftî derbaz bikim.

Ez bi dîlgirtina Rêbertî re derbazî welat bûm. Bi nêrîna em ê Rêbertî di nav wan çar dîwaran de rizgar û azad bikin min bêhna van çîyan girt. Lê tevî ew qas sal derbaz bûn jî Rêbertî hîn di nav çar dîwaran de ye û şerê henasegirtinê dide. Êdî pêwîst nake bê ku em tişteki bikin rawestin. Êdî asta min a xweragirtinê nemaye, weke wijdan, ehlaq, dil û nêrînên min vê rewşa heyî ranake. Ger em niha dikarin henase bigirin ev di encama keda Rêbertî de çêbû û em nikarin pişt a xwe bidin vê kedê. Ma ne wisa ye Mizgîn giyan? Êrîşek pir diwar li ser Rêbertî heye û niha di nav tecrîtê de tecrît tê meşandin. Ez nikarim pişt a xwe bidim van êş û zehmetiyên Rêbertî dijî û jiyan bikim. Ger bikarim bijîm jî ez ê weke bedenek bê ruh bijîm. Ez jiyanek wisa jî naxwazim giyana min. Ji we veqetîn ji min re jî pir zehmet tê. Lê ez di zanabûna vê veqetîna ku dê ji bo te, malbata min û hevalên min ên hêja re zehmet be de me. Ez di wê baweriyê de me hûn hezkirinên min ên binirx wate bidin vê biryara min. Ger hûn dudilîyê dijîn jî vê dudilîyê ji holê rakin û hewl bidin min fêrî bikin. Heke li gel we nêzîkatiyek hestiyar pêş bikeve, wê demê tê wateya hûn ji min fêrî nakin. Ger hûn ji min hez dikin, divê hûn ji

nêzîkatiyek hestiyar birevin. Mizgîn giyan, ji te pir hez dikim û di heman demê de dildarê Rêbertî û azadiyê me jî.

Hevala min Mizgîn, dixwazim hezkirina te azad bikim. Di van rojên min xewn, xeyal û xwe azad kirî de, dilê min di qefesa xwe de nahewe. Ger derfet heba min pir dixwest te bibînim, lê weke tu jî dizanî derfet rê nadin vê. Min berî vê di vê astê de hevpeyman bi azadiyê re çênekiribû. Min di vê pêvajoyê de di vê astê de biryar girt. Ger berî vê pilansaziyek min wisa heba min ê bi te re parve bikira.

Dubare dixwazim vê ji te re bibêjim; li xwe pir baş binêre û li tenduristiya xwe baldar be. Mîna gotina gel; ger tu pir baş li xwe nenêrî ez ê rihet nerazim, ger tu bixwazî ez rihet razim tu yê kêfxweş bî, tu yê li xwe pir baş binêrî giyana min. Dubare bi hezkirina xwe ya herî kûr, bi germahiya dilê xwe û hestên ji dil te hembêz dikim. Ez wan lamên te yên mîna pembû maç dikim.

17 Çile 2006

Divê di bin her mercan de tevîbûn ji jiyanê re çêbibe

Jiyan bi hemû leza xwe berdewam dike. Tevlî jiyanê tabûrê dibim û hewl didim di hemû aliyên de xwe tevî bikim, lê di dilê xwe de bitenê me. Di van kêliyan de di perwerdê de me û heval bêrawest nîqaş dikin, ez jî tevî nîqaşan dibim. Di cîhana xwe ya hundir de tenê hevpeymana xwe ya bi azadiyê re difikirim û xeyalên ez ê ser bixim dikim. Kêlî bi kêlî xwe lêpirsîn dikim û hewl didim aliyê xwe yên lewaz derbaz bikim. Divê li pêşiya armanca min ti astengî nemînin. Dema tîm li hemberî rûyê hevalan çavên xwe direvinim. Ez ditirsim ez ê bi çavên xwe hinek tiştan bidim hîskirin û hema li aliyek din dinêrim. Piştî wê dubare dinêrim, dema li gel kesekê daxivim teqez divê li rûyê wê binerim an tiştek fêhm nakim. Gerîla pir jîrin, bi taybet hevalên jin hinek tiştan pir zû hîs dikin. Lewma hewl didim pir baldar tevbigerim. Divê ti kes negihe raza dilê min. Ger herkes bizane, wê demê ez ê negihimê. Ji ber vê divê ez bi ziraviyên jiyanî yên herî biçûk pir baldar nêz bibim. Niha di dibistanê de rûniştî û li rêza herî dawî me. Bi vî şêwazî fersend dibinim hemû havalan bişopînim. Ya herî girîng jî li hemberî min wêneyê Rêbertî, li

aliyê wî yê rast û çepê jî wêneyê hevala Nucan û Zilan ê biken heye. Gelo ez ê bikarim bibim hevala we? Ez ê bibim hevala we, li warê Xwedavenda bibim agir!

Niha li yekîneya xweser dimînim. Wê ji bo amadekariyên 8'ê Adarê komîsyon werin derxistin. Cara yekem dixwazim bi dilê xwe cihê xwe di amadekariyên vê moralê de bigrim. Asta lêhûbûnên me di derbarê 8'ê Adarê de kirin wê bi morlan were pêşwazîkirin. Di vê wateyê de dê ev moral ji bo min wateyek xwe ya girîng hebe. Ev moral, wê weke bîranînên min ên rojên dawiyê di jiyana her hevalekê de şopekê bihêle, ji ber vê dixwazim bi kûraniya dilê xwe tevî vê moralê bibim. Lê niha naxwazim biçim, hevalan jî ez ji bo komisyona moralê hîlbijartim, min dengê xwe nekir. Li gel min gumana ez ê heta 8'ê Adarê bi hevalan re nemînim heye û naxwazim xebatekî di nîvî de bihêlim. Ji niha ve em di derbarê em ê di moralê de çi bikin bi hevalan re nîqaş dikin û hemû heval jî ji kêfan difirin. Bi hezkirin tevîbûna hevalan a vê moralê min pir kêfxweş dike. Ji niha ve dibînim wê 8'ê Adarê pir xweş were pîrozkirin. Hevalên min ên hêja, dibe weke fîzîkî li gel we nebim, lê bawer bikin ez ê bi we re çepikan lêbidim, bi we re bikenim û bi we re serê govendê bigrim. Ez ê jî 8'ê Adarê bi şêwazek cuda pîroz bikim. Ez nizanîm wê ev pîrozbahî kengê pêk were, lê dibe îro yan sibe pîroz bikim. Hema niha zû, bê ku dereng bikeve dixwazim di bêdawiya asîman de bijîm. Niha hestên pir kûr û dijwar dijîm, li gel hevpeymana min a bi azadiyê re dest bi rojnivîsek din dikim. Navê rojnivîsa min jî, Gihiştina Raza Dilê Xwe ye. Ev rojnivîsa min dê hinek taybet be. Ev demek dirêj bû min ji birayê xwe Ridwan re lînûsek amade dikir, bes tiştên ez di vê pêvajoyê de dijîm ez ê nedim nîşan, lê ez dikarim bi awayek sergirtî parve bikim. Birayê min ê hêja, berî ez biryara xwe ya fedayîbûnê bidim min dest amadekariya vê lînûsê kir. Lê ev lînûs rastî biryara min hat û berê wê jî min xwest ji bo te lînûsekê amade bikim, lê derfetên min çenebûn.

Niha di nav lêpîrsînek pir dijwar de me, mîna niha li pêşbêrî min eynikek heye û ez jî li eynikê dinêrim, di nêrîn, liv, tevger û hemû aliyên hewl didim xwe rêxistin bikim. Di her şert û mercan de ez ê çawa bikarim xwînsar tevbigerim? Di çalakiyekê de ji ber xwînsar nêz nebûne çalakiya wan serkeftî derbaz nebûye. Divê ez nekevin nav van nêzîkati-

yan. Çavên min li rê ne. Ka em binêrin wê çi agahî ji min re bînin. Îro jî çarşem bû, roja hevdişîna bi Rêbertî re ye. Ka em binêrin wê hevdişîna pêk were yan na?

18 Çile 2006

Merheba bahoza dilê min

Dema vê sibê ji xew rabûm, min di dilê xwe de hestên pir cuda jiyar kir, jixwe min şevê din seyarê di xewna xwe de dişibû. Tê gotin, seyarê rêwitiye. Lawma kengê seyarê bibînim, ya vezasiya min an jî ya havalan çêdibe. Lê rastiyeke din jî heye, di rastiya xwe de vezasiya min her tim di van mehan de çêdibe, bi taybet di meha Sibatê de çêdibe. Di heman demê de roja ji dayîkbûna min jî di meha Sibatê de ye. Ez hîs dikim ez ê bi vê vezasiya xwe ya vê carê pir kêfxweş bibim. Ez ê bi meha Sibatê re azad bibim. Polîtîka tecrîtê ya li ser Rêbertî berdewam dike. Gelê me jî bê ku bêdeng bibe qîr dike û banga azadiyê dike. Lê kesek dengê van qêrînan nabihîse û nabîne. Ev rewşek pir xetere. Mirov mîna robotan bê hest hatine hiştin û dibe pênaseyek giran be, bi rastî jî mirov anîne asta lawiran. Helbûkî mirov hebûneke civakî ye. Ya rast mirov di rewşek lawirbûnê ya hemçax de ye. Êdî meymûn, çûk û hesp jî bi awayek luks dijîn. Her roj mirov ji bo çend quruş pere dimirin û raya giştî ya cîhanê di xewa mirinê de ye. Ez mirovan tewambar nakim, ji ber pergale mirov anîne vê astê, lê mijara ez ji mirovan hêrs dibim ev e; çima pergale lêpirsin nakin, çima xwe tevî vê pergale dikin? Ez ji vê şewaza fikrandina mirovan pir hêrs dibim û gelek bi zora min diçe. Li hemberî van tiştên tîn jiyîn û rastiya mirovan û di mijara divê em çi bikin de li çareseriyên digerin. Ev derfetên objektîf ên heyî şer ferzî me dike, cuda ti riyên din nabînim. Kêr gihiştîye ber qirîqê û em hîn bi riyên siyasî çareseriyê digerin. Pergal mîna cinawirekî lêhatiye û em jî gulan dirêjî vî cinawirî dikin, ma cinawir çi ji gulan fêhm dike! Tenê wê pêlî wan gulan bike û biçe. Divê em bi çeka pergale li pergale bixin.

Ez niha di perwerde de me. Heval li ser ekolojiye nîqaş dikin, waneyek pir girîng e. Ez jî hewl didim du tiştan bi hev re bihizirim û ev herdu tişt jî serê min dêşîne. Hevalê di komîsyonê de cih digire her carê bi hevalan re dikeve nav diyalogan û ji bo bide fêmkirin kedek pir mezin dide.

Li hemberî vê kedê mirov guhdar neke wê bêrêziya herî mezin be, ji bo nekevim nav vê bêrêziyê kedek pir dijwar didim. Di pir aliyan de lêhûrbûn kirin pir zehmet e, lê divê van zehmetiyan derbaz bikim. Di van rojên dawî de pir dereng dirazê, lê min pêşketin di xwe de avakirine; êdî di perwerdan de qet narazim.

19 Çile 2006

Merheba dilê ji pêtên sor

Bendewariya min didome, em perwerde dibînin. Ji bo ez perwerdê baş guhdar bikim bi awayek pir zêde xwe tengav dikim û tenê bi pirsan re tevlihbûna xwe çêdikim. Dixwazim bi tena serê xwe li cihekî rûnim û bihizirim, divê çareseriyekê bibînim. Di nav bendewariya bi awayek dest û lingên mirov girêdayî mayîn de îşkenceya herî mezine. Em nizanin ka wê kêlî bi me çî bidin jiyîn. Di van kêliyan de Rêbertî dijî, lê piştî van kêliyan wê çî bibe nediyare û ev hizirandin jî min qehir dike. Bi vê tecrîtê dixwazin Rêbertî tine bikin. Piştî tiştê bi Rêbertî hat ma çî wateya tiştên wê bîn kirin heye! Wê demê çî wateya jiyankirina min heye?

Yê gelê min û ez gihandim azadiyê Rêbertî ye. Ji bo min jî azadî Rêbertî ye. Bi qasî Rêbertî ghişt azadiya xwe ez jî dikarim ew qas azad bibim. Hemû hevalan jî di wateya hestiyarî de ji vê tecrîtê pir bandor bûne û di çavên hevalan de jî bêçaretîyê dixwînim. Ez vê pêvajoyê dişibînim pêvajoya berî Îsa ji dayîk dibe. Herkes li pey çarseriyê ye û di derûnaya hemûyan de divê yek derkeve û vê pêvajoyê biguherîne tê xwendin. Ez jî di nav vê bêçaretîyê de valevale disekinim. Divê êdî ji vê re bêjim raweste. Divê peyva bi sehir a bêçaretîyê kifş bikim. Ez ê sibe dest bi rapora xwe nivîsandinê bikim. Divê zû xilas bikim. Ez wisa hîs dikim ku dereng mame. Ez ê kengê rapora xwe binivîsim? Ya herî baş ez sibe bi awayekî xwe nexweş bidim nîşan, tevli perwerdê nebim û rapora xwe binivîsim. Li pêşiyê min ezmûnên divê wan derbaz bikim hene. Min bi awayek giştî xwe bi vê ve qifil kiriye û xwe amade hîs dikim. Êdî dema pêkanîna wê hatiye û derbaz dibe. Di vê navberê de min hewayê ez ê biçim Bakûr di nav hemû hevalan de balav kiriye û heval jî ji vê bawer dikan. Di vê navberê de jî ez di rojnivîsa xwe ya ez ê nû dest pê

bikim de bîranînan didim nivîsandin. Dixwazim bi hemû hevalan bidim nivîsandin, lê ez bawerim wê pê re negihe û êdî dixwazim dest bi wê lînûsê bikim. Ez rojaneyên xwe di lînûsa xwe ya nîşeyan de dinivîsim. Heval jî ji bo nîşeyên perwerdê ji xwe re binivîsin lînûsa min a nîşeyan dixwazin. Dema lînûsa xwe ya nîşeyan li gel wan dibînim destê min li ser dilê min e. Ez naxwazim kes raza min bizane. Raza min, dema ez ghiştîm raza xwe hûn dikarin wê demê bizanin. Di nav van lêhûrbûnên xwe de ez wext ji lînûsa min ji bo birayê xwe amade kirî vediqetînim. Bi çend peyvan jî be divê bêrîkirina xwe ya li hemberî Elîf giyan û Îbo bînim ziman, divê ji wan re bêjim ji we pir hez dikim.

Her dixwazim bi tenê bim

Bes bi tenê bim

Azadî!

Sozdara te me

Têkoşîna xwe gihandina te didim.

20 Çile 2006

Merheba zarokê ji bo bigihe azadiyê şer dike

Min xwest xwe nexweş bixim, lê bi rastî jî min nexwest ez nexweş bibim. Îro bi rastî jî nexweşim û ji nav cihan ranebûme. Min qurtek av jî nevexwariye. Rewşa Rêbertî her tim di bîra min de ye û pir bandor dibim. Bi zora hevalan ez ji nav cihan rabûm. Hîn jî bêhalî, dilxelandin û sergejbûn heye. Di aliyê din de jî dixwazim rapora xwe binivîsim, lê nikarim binivîsim û pir bêhalim.

21 Çile 2006

Merheba keça serhildêr

Ev serhildêriya min a vê carê wê zêdetir bi wate be û tam cihê xwe bigire. Belê, keça serhildêr, bê sebir nebe, van rojan baş binirxîne, baş lêhûrbûn bike û ziraviyên wê yên herî biçûk jî bixe hesabê.

Lîstoka satrançê ya îro min leyîstî min kêmasiyek kir û ev kêmasî bû sedema ez winda bikim. Ji bo ez vê erka pîroz bi ser bixim divê li ser ziraviyên wê baş hêlûrbûn bikim. Ez li ser meyzandina xwe jî lêhûrbûn dikim. Ji bo meyzandina min, min nede dest hewl didim wateya îfadeya di çavên xwe de jî rêxistin bikim. Tenê hevalan pê nedim hesandin bes e. Ji hevalan nivîsên bîranîn girtinê berdewam dikim. Bi qasî ji destê min tê bi hemû hevalan didin nivîsandin, bila hest û nêrînên hevalan jî bikevin dîrokê. Yek jî nêrîn û hestên hevalan ên herî bi wate ji nêz ve dîtin û hîs kirin. Bila weke îdalîstbûnê neyê fêmkirin, lê daxwaz û hêviyên hevalan ên serkeftinê digirim. Ez her hêviya hevalekê ya serkeftinê dixim kûrahiya dilê xwe, sipas dikim hevalên min.

Îro navber bû, hemû hevalan paqijiya xwe ya şexsî kirin. Ji ber ava nayê gel yekîneya me, min li gel yekîneya me ya din serê xwe şûşt û niha jî xwe bi qasî çûkekê sivik hîs dikim. Dema qirêj dibim xwe pir belav hîs dikim.

Pîştî mehan ez îro gihiştim hesreta xwe, min cilên hevala Viyan ên zer girtin. Cilên min pir xerab bibûn. Tevî li Zagrosê dimînim jî negirtina cilên zer hestek pir xirab e, ez bawerim ger li derveyî herêmê bûma, min ê zûtir cilek zer ji xwe re bidîta. Hevala Viyan ji bo te daxwaza min paşde nekişand sipasiyên xwe raber dikim. Rapora min xilas bû, tenê maye ez bixim paqijiyê.

Ji Çarçêla hinek heval hatine, pir dixwazim wan bibînim. Xwezî min cara dawî ew bidîtan. Min silavên xwe ji yekîneya Çarçêla re rêkiribûn. Înşalah bihizirin werin gel me. Lê dîsa em hewl didin bi hêvî bin. Di van rojan de hestên pir xweşik dijîm û min berî vê ti caran hestên wiha xweşik nejiyane. Bi çend peyvan zeryaya hestan pênasê kirin pir zehmete, nikarim bi peyvan pênasê bikim. Ez bawerim ya jê re tê gotin azadî tiştek wisa ye. Dibe hîn negihiştîme armanca xwe, lê ji niha ve dibînim ez ê bi ser bixim. Ez ê dijmin matmayî bihêlim, wê demê bila raya giştî ya cîhana bibine şervanên Rêber APO çawa şer dikin. Li benda

min be şerê min, ez ê werim û çeka xwe biteqînîm, wê ev evîn bi reng û dengê gerîla bibe. Evîna min wê bibe strana zarokan, wê bibe bafiroka zarokan û ez ê li warê welatê xwe yê mîna bihûştê li ber bayê bikevim û bibin awazek.

Her êvar bi hêviya guhertinek di rewşa Rêbertî de çêbûye diçim ber nûçeyan, lê heman pêkanîn berdewam dike. Ji aliyê rêxistinên me jî çalakiyên bi hêz nayên lidarxistin û bêdengî berdewam dike. Gerîla ji gel hêvî dike, gel jî ji gerîla hêvî dike, qadro heman nêzîkatîyan ji rêxistinê hêvî dike û rêxistin jî ji qadroyan hêvî dike. Ka em binêrin ev rihê di nav rewşa bendewariyê de dê kîjan çareseriyên bafirîne.

Merheba zarokê di asta evînê de dildar

Me îro dahûrandina Rêbertî ya bi navê “Çawa Bijî”xwend, ev dahûrandin ji bo lêhûrbûna min pir baş bû. Her tim di nav lêgerîna jiyanê neke çawa dixwazim de xwe lêpirsin dikim. Berê ez di nav lêgerîna divê jinek çawa be de bûm. Lêgerînên min her tim di derbarê azadiyê de çêbûn û min ji ber vê hewl da xwe perwerde bikim, di van mijaran de jî îsrara min pêş ketiye. Rêberê min, ji bo jiyanek xweşik her tim di nav lêgerînan de bûm, lewma di temek biçûk de tevî têkoşînê bûm û min dev ji lêgerîna xwe ya jiyanek xweşik berneda. Ev lêgerîna min a jiyanek xweşik tenê di wateya takekesî de nabêjim, ez vê di wateya ji bo jiyanê gelekî xweşik bibe de dibêjim. Ez ji bo gelê xwe têkoşîn dikim û henase digirim. Niha egera bingeîn a xweşibûna min jî azadikirina Rêbertî ye. Di wateya fikirandin de jî her tim xwe lêpirsin dikim.

Di fikir û nêzîkatî de ez ê çawa xwe xweşik bikim, min her tim xwe di nav lêpirsinê de derbaz kiriye. Bi rojane bê navber berf dibare û xweza bi rengê spî hatiye xemilandin. Vê berfê rengê şahane daye xwezayê. Daxwaza min hemû ew e ku biryara min were pejirandin. Ez bêsebir li benda wê kêliya ev biryara min bê pejirandin û ji min re bê gotin disekinim. Vê sibê hevala Agirî ez di xewna xwe de dîtibûm û min jî gotiye; we ji bo têgîna mirinê bersiv dît? Piştî dîsa berdewam dikim û dibêjim; min berî 3-4 rojan bersiva mirinê dîtiye. Hevala Sozdar ji xewnan fêhm dike, me ji wê pirsî. Wê jî ev xewn pênase nekir û ji wê re jî balkêş hat. Bê ku ji xwe vê pirsê bikim nikarim derbaz bibim. Gelo

hevala Agirî lêhûrbûnên min hîs kiriye? Yan jî min bi wê daye hîskirin? Divê hîn baldartir tevbigerim, xwezî cihek tenê min lê lêhûrbûn kiriba hebûya. Ji du alîyan ve lêhûrbûn û tevgerkirin dibe sedem ez hemû enerjî û lêhûrbûna xwe li cihekî kom nekim.

23 Çile 2006

Merheba zarokê şerê xwe naskirinê dide

Min duh nenivîsî, lê îro dixwazim binivîsim. Min şevê din cara yekem hinek xal bi hevala Berçem re parve kir û parkirinên me yên li beramberî hev pêşketin. Me li ser şehîdan nîqaş kir. Gelek hevalên me nas dikir şehîd ketine û min li hemberî van şahadetan hestên sûçdarbûnê jiyan kir. Em gelek lehengên xwe nas nakin û navê wan jî nayên zanin. Hevalên di vê pêvajoyê de şehîd dikevin pir bi şansin, di taritiyan de winda nabin, her tim di nav ronahî û robarên zelal de dijîn û cihê xwe di jiyana herkesê de digirin. Niha dema şahadetek çêdibe herkes pê dihesse, lê berê ev derfet nebû. Lehengên me yên hêja, dibe min hûn di asta nav de nas nekiribin, lê niha hûn egera min a têkoşînê ne. Ez ê ji we re bibim heval, hûn vê hevaltiya min paşde nadin ne wisa? Ez jî dixwazim weke we bibim xwedî jiyaneke bi rûmet. Di 1994'an de ez bi şahadeta hevala Bêrîvan û Ronahî pir bandor bûm. Berî bikevim mijarê dixwazim xalek din bibêjim. Di sala 1992'an de min bi xwîşk û birayên xwe ji xwe re li navên Kurdî digeriyan. Wê demê min kodê xwe kir Şîlan, navê xwîşka xwe jî kir Mizgîn. Navê Ridwan kir Berxwedan, ê Îbo kir Şervan û yê Elîfê jî kir Melîs. Min piştî wê fêhm kir, dema hevala Bêrîtan li Stembolê dimîne kodê wê Şîlan bûye, dema hevala Gulnaz derbazî welat dibe vê carê jî navê Bêrîtan li xwe dike. Ji ber ez derbazî welat nebûm, keça apê min navê Şîlan li xwe kiriye. Dema tê Amadê Şemdîn ji wan re dibêje; jimara hevalên jin pire û hevala Şîlan wan paşda vedigerine. Piştî hevala min a Şîlan di encama îsrarên xwe de dubare derbazî çiyayên azad dibe û vê carê jî ji ber bêrîkirana xwe ya li hemberî çiya navê xwe dike Ozlem, piştî wê li Dêrsimê şehîd dikeve.

Min piştî wê xwest navê Bêrîtan li xwe bikim, lê ji ber ev nav gelek kesan li xwe kiribû min ev nav li xwe nekir. Min xwest di sekna xwe ya jiyaneke de bibim bersiv. Navê min ê malê Fatma bû, min pir zêde ji vî

navî hez nedikir, ji ber pir zêde dihat bikaranîn. Dema min dixwest vî navî biguherînim jî digotin; berovajî pîvanên civakê ye. Piştî zelal bû ez ê derbazî welat bibim, ez ketim nav lêgerîna navan û piştî wê min navê Marya dît, min pir ji vî navî hez kir. Nêzî salekê jî ketim nav lêgerîna ji xwe re pašnevekî bibînim. Herî dawî min ji xwe pirsî û got; tiştê min li ser piyan dihele çî ye? Bi vê pirsê re min paşnavê xwe dît û paşnavê min jî bû Umud. Dema min rojnivîsa hevala Bêrîtan xwend, min di wir de fêhm kir paşnavê hevala Bêrîtan Hêvî ye. Ev rasthatina şibandina nav û paşnav li ser min bandorek kûr çêkir û hema min dest pê kir li ser van mijaran lêhûrbûn bikim. Dema min bi hevala Berçem re nîqaş dikir, gelek mijarên din hatin bîra min, lê min di dilê xwe de hişt, ji ber min dixwest hîn zêde hevala Berçem baxive. Min cara yekem dengê dilê hevala Berçem ev qas ji nêz de guhdar dikir. Ev demek dirêje ti rexne li ser min nehatine, ger hinek fêr bibim jî min di asta teknîkî de rexe girti-ne. Hevala Berçem şevê din di derbarê kesayetiya min de hinek rexne li min kirin. Ji min re got; “şerê te yê li hemberî kesayeta te pir lewaz e û divê tu hişk bi ser xwe de biçî. Tu bi xwe re di nav aşîtiyekê de yî, ev jî dihêle li ser peywendiya te ya bi hevalan re bandor bike. Ji ber vê tu ji aliyê pêkhatayê ve rexna nagirî. Yek jî divê tu kûrbûna rêxistinî bi dest bixî, di vê mijarê de pir kêmbûnên te hene.” Ev mijarên di asta rexne-yan de li min kirin hemû jî rastin. Bi taybet di van salên dawî de şerê min li hemberî xwe û nêvengê dayî meşandin, min encam jê dernexisti-ye û ev bê encambûn jî min tengav dike. Li hemberî van zehmetiyan, li gel min matîqê dev jê berde pêş ket û ev jî êdî weke tarzekî li gel min ava bûye. Dema di aliyê bîrdozî de gelek mijaran bigirim dest û bi-nirxînim, ez di kesayetiya xwe de heman mijaran dibînim. Ger nirxandi-nek bîrdozî bikim, ez ê nikarim rakim, lewma xwe dispêrim nêzîkatiyên xwe yên çîneyî. Di nav pîvanên asayî de di nav jiyanekê de me. Dema nakokiyên weke fikrî dijîm bi nêvengê re parve dikim, tiştê bawer dikim rast be, teqez divê bi şewazekî nêvengê pê bidim hesandin. Ez her tim bi vî rengî nêz bûm û rastiya nêvengê qet nadim ber çavan. Bêrêbazi-yek wisa ez her tim êşandime. Ev zehmetî di min re nêzîkatiya dev jê berde pêş dixê û ev jî lewaziyeke. Xwe sipartina paşverûtiyên xwe ye. Ev rexne wê min zêdetir bixe nav lêpîrsînê. Ez ê vê lêhûrbûnê bi azadiyê tacîdar bikim.

Di welat de li hemberî ti kesê têkîliya min di asta evînî de pêş neketi-
ye. Divê hezkirin ne min ne jî mirovê li hemberî min neke xwedî milk. Di
asta van pîvanan de rastî ti kesê nehatime û lewma evîndar jî nebûme.
Mirov ji xwe re hevalek ku her tim tiştên xwe parve bike digere. Ez jî
her tim li heval û rêhevaleyê geriyame, lê her tim jî hevelek ji zayendpe-
restiya civakê dûr, bûye daxwaz û lêgêrîna min.

25 Çile 2006

Dîwarê spî

Du cot çav li ser te asê dibin

Û tenê li te dinêrin ev çav

Dîwarê Spî

Wate û nîrxê van awiran bizane

Wê rengê te sor bibe

Dîwarê Spî

Wê bi te re êş giran bibin

Di dîroka mirovahiyê de

Dîwarê Spî

Ji te re mêvanek anîne

Her tim tenêbûn para wî hatiye dîtin

Dîsa weke warek tenêbûnê tu hatî hilbijartin

Ji vî mêvanî re bibe heval

Germ bike vî mirovê bi wate

Derdora wî hemû bi têlan hatiye dorpêçkirin
Behr jî pêlên xwe dijwar li peravê dide
Û dibêjin Îmralî
Recifînek sar hûcreya te dorpêç dike
Hûn nalînek kûr dikişînin
Mirovek hûn pê re baxivin jî li gel we nîne
Hêrsek xwe li dor bedena we radipêçe
Dîwarên Spî
Li hemberî we rûyek tirş heye
Dîsa jî bênavber li ber xwe didî
Ji bo çirûskek hêviyê bafirînî
Hemû awirên çavan li ser te ne Îmralî
Dilê me li Îmralî lê dide
Em henaseya xwe di riyên Îmralî de digirin

Ewrên reş asîman dorpêç kirine
Perdeyek mij gerdûn dorpêçkiriye
Hêvî dîsa di qirka zarokên zozanan de ma
Rengê spî cihê xwe ji tarîtiyê re hişt
Nêrîn mîna çiyayê cemedê tevîzîne
Dil vegûherîn volkanan
Ha îro ha sibê wê biqete
Zarokên zozanan

29 Çile 2006

Merheba Rêberê min

Dîsa demarên gelê dîlgirtiyê êşan bûye lînadin. Çima her tim êş ji me re rewa tê dîtin. Rêberê min, li her deverên cîhanê gelê me li ser piya ne û ji bo we di nav wan dîwarên beton de rizgar bike hewlek pir mezin dide. Dema van serhildanên gel ên bi îhtîşam dibînim, kelecaneke pir mezin min digire û weke hestiyarî jî pir bandor dibim. Di nûçeyên vê êvarê de gelê min dîsa didin ber cop û pehinan. Min xeyal kir ku ez xwe di nav polîsên li serê kolanan kom dibin de biteqînim, wê ev çiqas baş bûya û dê êdî ti kesê ew wêrekî di xwe de nedîtiba li vî gelî xistiba. Îro dîsa Çarşem e û me hîn ji Îmralityê ti agahî negirtine. Wê sibê parêzer ragihînin ka hevdfîtin pêkanîne an na. Ma wê çi biba sibe parêzeran ragihandiba û gotiba; tecrît hatiye rakirin. Ez bawerim ger niha li civakê bûma, dê ew polîs û hevkarên wan ji ber vê xeyala min kirî xistiban girtîgehê.

1 Sibatê 2006

Di baskên bazekî de diperpitim

Em her tim hatin mişextkirin, em bê we li çolan hatin hiştin. Em ên ku di vê gerstêrkê de tîna kaşkirin hewl didin xwe li ser lingan bigirin û li asoyan li ronahiyekê digerin. Ji bo ji xwe re hembêzek xwe bispêrimê bibînim li ser paskên bazakî diperpîtim. Ligên min ji erdê tîna qutkirin, şerê henase girtinê didim. Li ber kendelan carnar dibim kulîlkên çiya, carna jî dibim gulberfinek. Di kêleka zinaran de şerê jiyanê didim. Weke gel em gavên pir hesas di kêleka zinaran de tavêjin. Ev rê di cihek pir bi asteng û fitlonekên xwe hene de ye. Ev kendal ew qas bi ristin, mirov nikare wan pênas bike, encex bijî. Gumguma dilê me ye. Ger ketinek çêbibe, gelo dê di encama wê de çi çêbibe? Ew qas bi tirs û xeterin, ew hizirin jî xwîna di nav demaran de ditevizîne. Em gelekin di kendalan de dijîn, em mişextê van kendalan hatine kirin û niha jî ji bo em di van kendalan de xwe bi bask bikin û bifirin têkoşînek bê hempa didin. Ji bo

em bigihin Rêbertî û di nav wan çar dîwarên spî de wî rizgar bikin hewl didin têkoşînê bi hêz bikin. Rêberê min, em ji bo we di kendalan de henase digirin. Ji bo we dijîn. Ev pêvajoya em di nav re derbaz dibin, dişibînim jiyan û zemanê di van kedelan de mîna robaran diherike. Ma wê kî bizane, jiyîna di kendalan de tê çî wateyê, gel hîs neke û nebihîse em çî êş dikişînin. Em dîsa li mişextiyê baskên xwe vedikin ber bi kendalan ve, tenêbûn dibe çarenûsa me. Em li hemberî bahozên pir dijwar li ber xwe didin. Dilê me li ber bayek payîza xemgîn dikeve. Weke versiyona Xwedayê Marduk, xwedayên sedsala 21. jî bê navber xwîna mirovan dimijîn û dîsa bişkok li ber kendalan rondikên sor dibarînin. Di kendalan de dengê qêrînan bilind dibe, azadî li her derê deng vedide... Ji bo çûk xwe bigihînin vî dengê deng vedide, bi hev re ketine nav pêşbaziye. Me di awirên bazekî de azadî hembêz kir. Em bi serpêhatiya qulingekî re ber bi Îmralî bi rê dikevin, dilê me mişextî Îmralî ye. Dilê me li Îmraliyê lê dide.

2 Sibatê 2006

Kendal

Ya me birînek dile ku

Li ber kendal

Kendalan xwîn jê tê

Heta xwîn ji lêvên min tê

Êş û janan

Bêriyan dadiquirtînim

Me di kendalan de tama hêvî

Evîn û azadiyê girt

Me di kendalan de fir da

ber bi xeyalên şîn ve

Hezkirina me her tim lêgerîneke

Her tim xeyala me ye
Em we bibînin
Ji we re bêjim, Rêberê min
Gelê Kurd jî bêriya we kiriye
Mirovê Zana
Em bi ronahiya we re fêr bûn
Di kendalan de fir bidin
Mirovê Azad...
Bi her berbanga sibê re
Bi tirêjên roja Îmralî re
Beden û xeyalên me germ dibe
Me di kendalan de tama azadiyê girt
Di kendalan de ber bi hêvî û baweriyê ve rê ketin

2 Sibatê 2006

Merheba Rêberê min

Bi rojane bendewarî didome, ji aliyê rêxistina me ve min hîn bersivê zelal negirtiye. Min rapora xwe ji zû de nivîsiye û mereq dikim ka rapora min çawa nixandine, gelo min ew qane kirine? Ev rihê min ê di nav rewşek bendewariyê de min pir tengav dike...

Waneya tevlîbûnê hîn berdewam dike. Platform çêbûn. Ez dixwazim dahûrandin û analîzkirina kesayeta xwe bi we re parve bikim.

Em îro fêr bûn hevdîtîna pêk hatiye, ango duh bi we re hevdîtîna pêk hatiye. Ez rewşa we mereq dikim, bi qasî me ji ragihandinê bihîst rewşa we ya tendirustî zêde nebaşê û her roja derbaz dibe rewşa we girantir dibe. Rêberê min, rêxistina me çiqas bi sebre. Hîna bêdengiya xwe xi-

rab nekiriye. Ez pir mereq dikim, gelo rêxstina me çi pland dike û çi dihire. Em binêrin ka wê encama wê çi be? Baş e êdî tiştêk çêbibe.

2 Sibatê 2006

Merheba Rêberê min

Rêberê min, tiştên min duh jiyîn kurt jî be dixwazim bi we re parve bikim. Ji we re dibêjim, Rêberê min, ji ber ez wisa zêdetir xwe nêzî we hîs dikim.

Duh plarforma hemû hevalên tabûrê çêbû, hemû hevalên tabûrê soza xwe nû kir û ya min jî çêbû. Ji ber vê jî dixwazim bi awayek berfirehê ve bi we re parve bikim. Dema min soz da ez ketim nav kelecaneke, min giranbûna sozê di kûraniya dilê xwe de hîs kir. Rêberê min, dema min soz xwe da, ez li we fikirim û min bi îdaya ez ê wê erka pîroz serkeftî derbaz bikim soz da. Hema zû dixwazim vê sozê pêk bînim. Ev bendewarî min diqehirîne û bêdengî berdewam dike.

Ji ber min di komisyona şahiyê de cihê xwe digirt, me koma koroyê kom kir, piştî me kêmekê nîqaş kir şûnde me xebata xwe bi dawî kir. Piştî wê me televîzyon guhdar kir. Nûçeyên bi soranî li ser hevala Viyan nûçe didan. Kesê jê fêhm nedikir ka çi dibêje. Rêberê min, dema min hevala Viyan di nûçeyan de guhdar dikir, di wê kêliyê de ev nêrîn di dilê min re derbaz bû: Hevala Viyan dikare di qada Başûr de bibe pêşengê û ew asta wê jî heye. Berî vê di dema civîna diwanê de hatibû û hevalan jî gotibû; ev hevalek çiqas şîrîne. Min jî ji hevalan re got; di Konfêranda YJA –STAR de di tîma min de bû. Bê ku agahiya me ji bûyerên hatine jiyîn hebe, wisa me ew bi çend gotinan bîranî û piştî wê em di nûçeyên 07.00'an de fêhm bûn li Heftanînê xwe şewitandîye! Li hemberî vê nûçeyê em matmayî man û bi çavên girî ji dibistanê derketim. Ez bi îske îsk giriyam, ev giriyê min sedema derengmayîna min bû. Ger heta niha min ev çalakî pêkanîba, dê hevala Viyan ev çalaki pêk nanîba. Hevala Viyan jî çareserîya herî dawî di xirabkirina vê bêdengîya mirinê de dîtîye. Ji bo vê bêdengiyê xirab bike bedena xwe dide ber agir. Cara yekem li çiya jinek gerîla çalakiyek wisa pêktîne. Wêrekî, vîn, girêdanbûn û biryarbûnek mezin dide nîşan ji bo armanca xwe bi qasî

dilop dilop xwe bihelîne evîndara xeyalên xwe ye. Viyan evînek e, şêwaza evînê ya tê pênasekirin e. Viyan bi şêweyek din, bilêvkirina evîna ji bo Rêbertiyê.

Ev çalakî bû rojeva jiyane ya bingehîn û bêguman divê wisa jî biba. Şevê din di tabûrê de hevalek jin du caran hewl daye xwe bişewitine û hevalan jî ew girtine. Ev tiştê vê hevalê kirî nêzikatiyeke pir hestiyariye û biryarek di kêliyê de hatiye dayîne.

Çalakiya hevala Viyan pir zêde bû mijara nîqaşan. Çima çalakiyek wiha di çiya de pêk anî? Çima di Silêmanî û metropolan de pêkneanî? Pirsên hevalan dikirin ev bûn û li bersivan van digeriyan. Li gel min pirsên bi vî rengî pêş neketin û min wate da hest û nêrînên hevala Viyan. Hevala Viyan xwestiye vê çalakiya pîroz di metropolan de pêk bîne, lê rêxistinê qebûl nekiriye. Dema hem ji ber hevalek Soran bûye hem jî ji ber hinek tiştên cuda nayê qebûlkirin, di encama lêhûrbûna dijî de, hem li hemberî rewşa Rêbertî, dîsa bêdengiya di nav qadroyan de dimeşiya êdî tehemûla wê namîne. Di dawî de girêdanbûna hevala Viyan hiştiye çalakiyek wiha di çiyên de pêk bîne. Yan hevala Viyan jî dizaniya û di wê zanabûnê de bû ku xwe di çiya de şewîrandinê de di cîhanê de dengê venede. Lê hevala Viyan di vê zanabûnê de ye: Dê bi çalakiyê vê bêdengiya di nav rêxistinê de xirab bike û peyama ger ev bêdengî xirab nebe dê zêdetir çalakiyên cuda pêk werin dide.

Belê, êdî ji vê bendewariyê aciz dibim. Ez pir dereng mam. Ger min berî vê ev çalakî pêkanîba, dê niha hevala Viyan bijiya, lê ji ber giran tevgerîna min bû sedema şhadeta hevala Viyan û dibe zêdetir şhadet çêbin. Dixwazim hema zû xeyal û hêviyên xwe bi azadiyê tacîdar bikim. Dixwazim di vê meha Sibatê de ji Rêbertî re bibim heval. 25'ê Sibatê roja jidayîkbûna min e. Li gor nasnameya min ez di meha Adarê de ji dayîk bûme, lê dayîka min wan digotin; tu di meha Sibatê de jidayîkbûyî. Ez di meha Sibatê de hatime cîhanê.

Dixwazim di meha Sibatê de ji Rêber APO re bibin hevalek jin a rast. Di vê dîrokê de dixwazim bibim pişkek û di destpêka biharê de mizgîniya jiyana nû û rojên azad bidim gelên mazlûm. Ya herî girîng jî dixwazim ji bo Rêber APO bibim henase. Ji bo rihet henase bigire û bistîne li ser

sûrên Amedê bigihe gelê min. Êdî hinek tişt tenê bi xwestek pêk nayên, divê şer û bedelên wê bên dayîn. Ti tişt bê bedel nîne.

Belê hevala Viyan, te xeyal û hêviyên xwe pêkanîn û te li pêşiya min xwe gihand evîna xwe. Di vê mijarê de di aliyê wijdanî de nerihetim. Ji ber giran tevgerîna min, we erkek wisa pîroz hilgirt ser milên xwe. Li benda min bimîne, ez ê jî werim. Ez ê weke te bibim perperîk û azad bibim. Kulîlka Evînê, wê êdî rêxistin jî li hember vê firîna min nebe as-teng.

5 Sibatê 2006

Xwezî min karîba xwe bida vegotin

Ji derveyî rapora min duh nivîsandî, min xwest bi xwe jî nîqaş bikim, ez hizirim bi riya nîqaşê ez ê bikarim bidim qebûlkin. Lê di dawîya nîqaşa min kirî de min bersîvek zelal û teqez negirt. Bi vegotin û rastîyên giştî yê her roj re hewl dan bi min bidin qebûlkin, lê bi ser nexistin. Min biryar û îsrara xwe da ferzkirin. Min li ser tempoya me ya giran a li hemberî pêvajoyê, bîdengî, rewşa Rêbertî û konseptên giştî ya DYE-KT'ê bi berfirehî nîqaş kir. Min sedema îsrara xwe jî vegot û min got, her kêlî û roja em derbaz dikin dê windahiyên cuda çêbibin û divê em weke rêxistin jî di nav bendewariyek ku giranbûn û cidîbûna me ji holê rabe de nemînin. Wê berdewamiya çalakiyên mîna şewazê çalakiya hevala Viyan werin, ger ev bîdengî xirab nebe, her çendî çalakiyên bi vî rengî bên rexnekirin jî, lê dîsa dê çalakiyên bi vî rengî pêk werin. Êdî mirov bi gotinan qane nabin, encex bi tiştên çêdibin qane dibin. Ji bo çalakiyên bi vî rengî êdî pêk neyên, hema dixwazim zû li Teksîmê biteqim. Ka li vê rasthatinê binêrin, di rapora min de dîroka 21'ê Çileyê 2006'an de hatiye nivîsandin, hevala Viyan jî ya xwe di vê dîrokê de nivîsandiye. Rêberê min, çiqas bi wateye, me heman hest û nêrin bi hev re jiyane û dilê me bi hev re ji bo Îmralî lê daye. Gelek hevalan di van rojan de raporên xwe nivîsandine. ***Hat gotin, gelek hevalan ji bo çalakiya fedayî rapor nivîsandine. Min jî got; bêguman daxwaza her şoreşgerê ye ku çalakiyek wiha pêk bîne, ez jî dixwezim çalakiyek bi vî rengî pêk bînim û bila rêxistin derfetek wiha bide min. Piştî ev qas êrîş li ser Rêbertî, gel û gerîla hebin, wê demê çi wateya jiyankirina***

min nîne. Wan jî got; rêxistin rewşa malbatê jî di ber çavan re derbaz dike. Min jî got; wê malabata min wate bide çalakiya ez ê bikim û ez di wê baweriyê de me dê pê serbilind bin. Ji ber ez malbata xwe nas dikim. Malbateke pir girîngî didin rûmet û erdembûnê, dibe di aliyê hestiyarî de jê bandor bibin, ev jî asayî ye û hêvî dikim dê wê jî derbaz bikin.

Di encamê de min bersivê teqez negirt, bi awayek stûxwarî ji biryar-gehê vegeriyam tabûrê. Berf pir barîbû û ji ber hewa jî bi ewir bû berf pir nerm bû, hişk nebibû. Her gava me davêt, lingê me di nav berfê de diçû xwarê, lê min ev berf guhdar nedikir, tenê tiştê ez dihişîrî ez ê çawa rêxistinê qane bikim bû. Ez nizanim rêxistin li benda çi ye, di nav kîjan amadekariyan de ye, lê divê ji çalakiya heval **Sezaî** û Viyan encamên baş derbixin. Divê bersivê bidin asta biryarbûna pêkhatîyê.

Rêberê min, di nûçeyên îro de me bihîst we qirîza dil derbaz kiriye, wê sibe parêzer biçin Îmraliyê. Êdî nikarim xwe bigirim. Bê ku tiştêkî bikin di nav bendewariyê de mayîn... Qaşo gerîla azad bû. Ka em hêza parastina cewherî ya gel bûn? Ka, dema Rêbertî ket nav tengaviyan wê me mafê xwe yê parastinê bikaranîba? Ma gelo em ê kengê van derfetan bikarbinin? Gelo hevalên jin çima wisa bêdengin? Çima li hemberî rewşên di pêvajoyê de pêş dikevin tedbir nayên girtin? Bêdengiyek wisa heye, dişibe bêdengiya beriya tofanê.

Dîsa meha Sibatê û dîsa mehek xemgîn. Dîsa hevaltiya me ya nerast li ser maseyên dijmin tê pazarkirin, ji vê sextekariyê re qedehan li hev dixin. Em her roj êş dikişînin û ez bawerim em fêrî van êşan hatine kirin. Dibe qebûlkirina vê zehmet be, lê bi rastî jî sal derbas bûn Rêbertî hîn di nav çar dîwaran de ye, ji nav hûcereyekê xistine nav hûcreyek din, ev jî nebes be pêwîstiyên xwezayî jî sîno darê dikin. Ji vê bendewariyê nefret dikim.

7 Sibatê 2006

Agahiyek xofdar

Îro jî nehêlan bi Roja me re hevdiştin pêk were. Ji duh ve agahiyek belav bûye û ev agahiya reş nayê zelalkirin. Nûçeyek belav bûye û tê gotin Rêbertî qirîza dil derbaz kiriye, ji parêzeran tê pirsîn, dibêjin tiştê wisa nîne, ji ber nayê zelal kirin bersiv di hewa de dimîne. Dijmin dîsa dest bi êrîşên xwe yên dijwar kiriye û di kesayeta Rêbertî de diçin plansaziyên nû. Ev mijara qirîza dil jî nîşaneyê wê ye, wê şidet diwartir be. Bi vê nûçeyê re dixwazin nebza gel û rêxistinê bigirin, li gor encamên ku derbixin dê êrîş bikin. Em jî li bendê ne, ji bo êrîşê me bikin û piştî wê em jî bikevin êrîşê. Lê ma piştî çi? Piştî rêxistinê cidîbûna me vala derxist şûnde. Ya rast ev sekin min pir tengav dike. Gelo hinek rewşên ku em nizanin hene? Jixwe dizanim hevalê Cuma, Cemal û Abbas pir bi Rêbertî ve girêdayîne. Ger ti kes xwedî li têkoşîn û Rêbertî dernekeve jî wê ev heval xwedî lê derkevin, di vê mijarê de baweriya min bi konseya me heye. Ew jî niha pir êş dikişinin, ev heval, dost û rêhevalên Rêbertî yên herî nêzin.

Niha çavên xwe bi zorê vedikim, min sarma girtiye. Ez li hemberî vê nexweşiyê li ber xwe didim ku xwe nexim erdê. Ev nexweşî nikare min dîl bigire. Ez ê jî nebim dîlê vê nexweşiyê. Min her tim ji fêrbûnan hez nekiriye û li hemberî van fêrbûnan têkoşîn kiriye. Fêrbûn mirovan dike kole. Azadî jî mirovan dike mirov. Dema mirov destpêkê çêdibe, ji heta çêbûna şaneyê wê destpêkê ve têkoşîna wî ya xwe gihandina azadiyê dest pê dike. Her çendî rehma dayîkê cihek arame jî, lê piştî demek kurt dixwaze tiştên cuda bibîne û tiştên nû bijî zikê dayîka xwe dide ber pihînan.

Ya rast zarokatiya xwe mereq dikim. Gelo ez zarokek çawa bûm, min çiqas dayîka xwe tengav kiriye, gelo min pir êş bi dayîka daya kişandin? Kî dizane dibe min dayîka xwe ya delal pir tengav kiriye. Tê bîra min, dema ez zarok bûm min her tim xwestiye biçim Pamukkalê. Ew spîbûna Pamukkalê, kaniyên wê yê xwezayî germ ez her tim bandor kirime û xeyalên min xemilandine.

Min di dema ciwantiya xwe de, bi hevalên xwe yên keç ên li gor min, digot; em ê ji bo xwe malekê bigirin, ji bo xwe kar bikin û qet nezewicin. Xeyalên me ên bi keça apê min a şehîd ketî ev bûn. Piştî wê

min li gor daxwazên xwe tevger kir, ez her tim li gel hevalên xwe ên min dixwest bi wan re tevbigerim bûm, lê min wisa hîs dikir tiştê ez lê digirim ne ev e.

Min her tim ji wî alî bazdida wî aliyê din û dîsa min wisa hîs dikir tiştê lê digirim nabînim. Min nedikarî ji xwe re jî pênase bikim ka li çi digirim. Dema li ser rê dimeşiyam, çavên min her tim li zarokên li dûv pereyên nanê xwe dibeziyan diket. Dema min ev zarok didîtin dilê min tengav dibû û min hestên sûçdarbûnê dijiyan. Dema min ev zarok didîtin, min hîs dikir qey yek min dide ber zileyên. Birîna vê zileyê di dilê min de şopên kûr hişt. Vê şopê ez ber bi cîhana pirsan ve birim? Ev zarok çima di vê rewşê de ne? Ev zarok çima weke zarokên din zarokatiya xwe najîn? Çima ev zarok di bin piran de radizên? Çima şaradarî van zarokan mîna keriyên pez kom dike? Gelek pirsên mîna van û ev barana pirsan a min dijiya, di dawiya vê lêpîrsîna min kirî de, min ev encam derxist: Yên gunehbar ne ev zarokên madeyên hişber, tiryakê bikartînin, a gunehbar ev civaka ew xistine vê rewşê ye. Piştî min civak gunehbar dît, êdî min xwe jî gunehbar didît, ji ber ez jî ferdekê vê civakê me. Min li hemberî pergalê nakokî jiyan kir; xizan-dewlemend, serdest-bindest. Ev nakokiyên min dijiyan ez dehfi lêgerîna jiyana nû kirim. Êdî ez ketim nav lêgerîna tiştên nû. Jiyana min dijiya ji min re nedibû bersiv. Min her tim hîs dikir ez birçîme, gelo çima? Min ev tam dernexistibû holê. Min bi awayek xeyalperest li jiyane dinêriya. Min dest avêt çîrokek evînê ya direw, lê min ji vê jî tam negirt. Ji bo bibînim, min her tim lê geriya û ketim pêşbaziya maretonê. Êdî min bi zeman re şer dikir, min bi dilê xwe yê zarokatiyê ve li hemberî pergalê dadgehên KT'ê derdiketim. Ma wê kî li bê edaltiya ku li ser navê edaletê guhdar bike, ma wê kî nêrînen sextekar guhdar bike? Min êdî riya xwe dîtibû û tiştê lê digeriyam min dît. Tiştê lê digeriyam azadî bû. Tu nebêjî ez her tim li pey azadiyê beziyame.

Min azadî jî di nav bayê Amara de di dilê xwe de hîs kir û min êdî nexwest ji van hestan veqetim. Ji ber vê jî min her tim bi guman û tirs li hevpeymana koltiyê dinêriya û ji hembêza koletiyê ber bi zelaliya asîman ve firiyam. Jiyana min a rast li vir dest pê kir. Azadî, min tu di nav rengê Amara de nas kir, min tu di rastiya Amara de nas kirî. Min tu

ji zarokê pêroz ê xiyamet li xeyalên xwe yê zarokatiyê nekirî nas kir. Min fêm kir, xwe gihandina te nehêsane û gihandina te jî bi şerek hundirîn ê bê hempa meşandinê ve dibe, tu bûyî şerê min. Tu bûyî şerê min ê jiyanê. Min tu bi rastiya Rêbertî di dilê xwe de çandî. Azadî di qefesan de nayê girtin. Bê azadî nayê jiyîn, jiyanek bê te qet...Mirovê Pîroz ger tu hebî, ez jî heme, ger tu nebî ez jî nînim. Ji ber min azadî bi te re nas kir, ez bi te re zindî bûm. Mirovê Zana, mirov bi we re tama jiyînê digire.

8 Sibatê 2006

Merheba hêviya dilê min

Ev du rojin min nenivîsandiye, min xwest binivîsim lê ji vê bendewariya xwe re bersiv negirtin min tengav dike. Ez hêrsa min jî ne hestiyarî ye. Ev çend rojin em li ser parastina rawa perwerde didin. Stratejiya parastina rawa beşa min bû, bi saya vê waneyê min cihê xwe tê de girtî lêhûrbûnek kûr kir û gelek encam jê derxist. Min gelek aliyên xwe yê weke tevger di kîjan mijaran de lewazin û aliyên me yê bi hêz dîtin. Min di nîqaşên hevalan de ev mijar dît: Di pêkhatiya hevalan de xwe di kûrnekirinê de hîn lewazî hene, ya rast gotina min a hîn jî wê nerast be, ji ber gelek heval nû ne. Di nîrxandinên hevalan de nêzîbûnek pir dijwar di mijara çalakî pêkanînê de heye. Di heman demê de teknîka serdemê ya pêş dikeve û rastiya dijmin nagirin ber çavan. Dibêjin em çalakiyan pêk bînin. Dema nêzîkatî bi vî rengî bin lêhûrbûnek kûr nayê bidest xistin. Em bi van nêzîkatiyên xwe nikarin li hemberî vê rastiya heyî rêbazek alternatîf bibînin û bi armanca vê teknîka heyî di bêbandorkirinê de afrîneriyê pêş nexin. Ev nebesî pîrsgirêkek pir cidî ye û divê bi lez were derbazkirin.

Di encama vê lêhûrbûna min kirî de min ev rastî dît: Li gor hîmên parastina rawa rêbaza me ya têkoşînê lewaze. Di mijara hem lingê vê yê sehildanan, hem jî di mijara lingê vê yê gerîla pêşxistin pir girand tevdi gerin. Ev tempoya me ya giran dê bi me bide windakirin û ev bîdengiya me wê mirovan ber bi zinaran ve bibe. Duh li Edenê dîsa hevalek ciwan xwe şewitand. Îro 11'ê Sibatê ye û bi tîrsa wê van çend rojan çirû bide destê min li ser dilê min e. Dilê gel û hemû hevalên min jan

dike. Ev jan veguhere teqînekê. Lê destpêkê ez dixwazim vê teqînê pêk bînim. Bila tiştêk bi heval û gelê min neyê, bila êdî ew êş nekişînin. Her roj Rêbertî êş dikişîne, gelê min êş dikişîne, ne Rêbertî ne jî gelê min van êşan heq dike. Ev bêmafî ye! Êdî li hemberî van êşan hedara min nemaye. Em di cîhanek çiqas balkêş de dijîn, ji bo me bi tenê bihêlin bê navber êrîşî me dikin. Rêbertî weke fizîkî bi tenê hiştin, lê bi hezaran mirov li derdora Rêber APO bûn xelakek. Rêber APO di dilê hezaran mirov de ye. Niha hemû dil ji bo Îmralî lê didin. Em ji bo Îmralî dijîn. Rêberê min, em ê kilîta Îmraliyê bişkênin, em ê wan destên ew derî qifilkirine bişkênin. Ji ber vê çendê ez ê bibim bomba azadiyê.

Rêberê min, bi qasî min azad kir ez ê kêfxweş bim û bikarin jiyanê hez bikim. Evîn û azadiyek bê ked, bê bedel mahkûmê rizîn û binketînê ye. Di vê wateyê de dixwazim bibim bedela azadiyê. Ez ê por û bedena xwe di nav qêrînên Viyan, Bêrîtan û Mazlûman de bidim ber agir. Ez ê ji bişkokên biharê, ji nêrînên zarokên nû ji dayîk dibin re, bibim coş, kelcan û evîna jiyanê. Di nav hestên bi wijdan de qêrînên gelê xwe guhdar dikim. Divê êdî ev qêrîn deng vedin, ez ê bibin xitab û pileya vî dengî.

11 Sibatê 2006

Merheba zeryaya hestan

Rêberê min, xwezî ez niha bibam çûkek û li ser milê we venîştibam. Xwezî bibam qaqlîbazek û hatibam min ji we re stran gotiba. Xwezî bibam pelên zeryayê û destê we girtiba, germbûna destê we di kûraniya dilê xwe de hîs kiriba. Rêberê min, bi salane dilê min bi hêvî û bêrîkirina dîtina we jan dike û têkoşîna jiyanê didim. Rêberê min, hûn çavkaniya jiyana me, xeyal û hêviyên me ne. Rêberê min, her kes ne xwedî wê hêzê ye bigihe we û ji we re bibe rêheval. Ji ber vê ev hevaltiya nebes derdikeve holê, ya rast mirov nikare ji vê hevaltiya nebes re bibêje hevaltiya nebes jî, ya tê jiyîn di ser vê re ye. Dibe ev weke têgîn giran bê, lê divê em dîsa nav li van tiştên em di hundirê xwe de dijîn bikin. Pirsgirêka em dijîn, pirsgirêka xiyaretê ye. Xiyaret tenê ne ew e tu biçî bi yekî re hevpeyman çêkî, yan birevî. Ger wisa bibe, çend kesayetî, mirov dikare çarseriya wê jî bibîne, lê xiyaneta tê jiyîn ji ber pir berfirehe, rastiya Rêbertî mîna kurmekî dikemirîne. Ji ber vê sekna me ya

zemîn dide ev xiyametkarên dijmin ew qas êrîşî me dike. Sedema vê dîlgirtina Rêbertî ya bi salane berdewam dike çavkaniya xwe ji sekna me ya tam me xwe nedaye şoreşê ye. Weke fîzîkî dibe em di nav bexçeyê azadiyê de bin, lê weke rih em çiqas vê azadiyê dijîn? Em hîn di xwestekên xwe yê koletiyê de îsrar dikin. Em di kaseyeta jinek klasîk û zîlamên klasîk de îsrar dikin. Piştî wê em berê rûyê xwe didin taritiyê û dibêjin em şoreşgerin. Ji xwe re dibêjin em şervan û hevalên Rêber APO ne. Gelo ev hevaltî û şervantiyek çawa ye? Ev sextekariyek herî rezîle! Gelo em çima naçin ber eynikê û li aliyê rûyê xwe yê sorbûye nanêrin. Em ew qas ji xwe bêbawerin, em ditirsin li hemberî xwe rû bi rû jî werin. Bi giştî nebe jî em di cîhana xwe ya hundirîn de xiyametê vedîşêrin. Heta ku ev xiyamet neyê bêbandor kirin wê her tim li pêşiya azadiyê bibe astengiyek û li ser piştê rêxistina me jî her tim weke barekî bimîne. Bûyîna mirovê hestiyar pir bedewe lê divê em bizanibin bi van hestan re çawa bijîn. Divê em van hestên xwe derxin zanabûnê. Em li hemberî çi şadibin? Em li hemberî çi dikevin nav bêhêviyê? Divê em van hestên xwe ji nav hev derxin û nav li wan bikin. Heta ev hest dernekevin zelaliyê, dê her tim ev xiyamet bê jiyîn, wê ev hest me ber bi kendalan ve bibe û heta me dibe jî. Me Rêbertî xist hembêza komploiyê, me çavên xwe ji mayîna wî ya ev qas sal di nav çar dîwaran de girt û ger henaseyek rihet nede û nestîne jî ev pirsgirêka me ye. Ji xwe û ev rastiyên tînan jiyîn pir hêrs dibim, lê ev hêrsbûna me ne bi hestiyariyek ji rêzê, ne jî bêçareseriyê ve girêdaye. Ev hêrsa min dê min bike hevala Rêbertî.

Divê mirov tund be. Ji ber pêvajoya tundî û zelalbûnê ferzî me dike. Bi rewşa rihek dudil re mirov nikare hestên serkeftinê bijî. Divê em bigihin îtopiyayên xwe. Di mîtolojiyan de mîna şerê Ahûramazda û Ehrîmen, di kesayetîya mirov de jî başî, xirabî, xweşikbûn, kirêtî hene û her tim di hest û rihê me de bi hev re di nav şerekî de ne. Di dawîya vî şerî de jî kî ser dixê? Ger kûrbûn û hêza me ya bîrdozî nebe em bin dikevin. Em ê li hemberî kirêtî û xirabiyê bin bikevin. Hemû jî ji ber hest û nêzîkatiyên me yê ji rêzê ne. Em nikarin xiyametê li gel, dîrok û zarokên nû ji dayîk dibin bikin, ji ber keç û kurên ji bo azadiyê hatine diyarîkirin.

Rêberê min, îro rojek reşe, roj jî îro hilnehat. Ewrên şer li ser serê me digerin, her dever mije û dîsa hevdîtîna pêk nehat. Ez di nav tarîtiyê de ketime înzivayê, ji bo vê tarîtiyê veguherînim ronahiyê. Îro hezar caran naletan dibarînim û bi hêrs dibim. Îro em êş dikişînin û gelê me jî li ser piya ye, bi aliyên serhildanê re li ser riyan çalakiyên meşê pêkanîne. Min çiqas dixwest di nav vî dengê gur bilind dibi de bibim bûkek. Ez ê kengê pîmê dilê xwe bikişînim? Wê kengê ev dil biteqe? Ev bendewarî min hêrs dike. Dubare dubare 15'ê Sibatê jiyîn, bersiv nedayîna 15'ê Sibatê zêdetir celadan kêfxweş dike. 15'ê Sibatê di dilê min de birînek bi xwîne. Ev birîn min pir dêşîne, her ku xwîn jê tê rengê min zer dibe û lewaz dibim. Ez vê rojê ji kûraniya dilê xwe û bi hêsek mezin şermazar dikim. Bimre xiyaneta di dilê me de! Bimre hêzên komploger!

Bijî pêşeroja me ya azad!

Bijî azweriya me ya di asta evînê de!

15 Sibatê 2006

Ma ez ê çawa ji xwe birevim?

Ez dikarim ji xwe birevim, lê ka ez ê bikarim ji pêhesînên xwe birevim. Ez demek dirêj ji rastiya xwe reviyam, lê ez ji pêhesînên xwe nerevim, pêhesînên min rastiya min nîşa min da. Ev rastî ji min re pir zehmet tê, gelo ez ê vê rastiye qebûl bikim? Ez ê qet radestî vê rastiye nebim, ez ê nebim dîlê vê rastiye. Ez ê bibim mirovek hestiyar, lê di heman demê de bizanibim çawa bijîm. Yan ez ê bikevin xefika hestên xwe. Hest car caran li pêşîya mirov vediguherin xefikekê. Gelek caran, bi taybet berî ez bikevin nexweşiya jinê, hîsên min pir bi hêz dibin. Tiştên dê biqewimin hîs dikim, her çendî her roj nebe jî gelek caran hîs dikim. Gelo çima hîsên min ev qas bi hêzin? Li hemberî vê pîrsê tiştên heval ji min re dibêjin ev in: Ji ber tu jinekî, ji ber tu bi giştî di ber jiyane de hişyarî, ji ber hîsê te yê şeşemîn bi hêze...Lê bersiva bingehîn ku ez lê digeriyam min nedît.

Ez hîn li sedema ka çima hîsên min ev qas bi hêzin digirim û min ji xwe re bi vî rengî dahûrand: Di bingeha hîsên min de hezkirin heye,

hezkirin hemû enrjîyê li cihekî kom dike. Ev enerjîya kom dibe lêhûrbûn dike û ew weke hîs di dilê min de pêş dikeve. Ango ya hîsan bi hêz dike, di navbera mirov û tiştên dê biqewimin girêdanekê ava dike û hêza ferqkirinê derdixe holê hezkirine. Mirov di van kêliyên zehmet de fêhm dike ku zeman ji her tiştî re du canî ye, hinek tiştan ji nedîtî ve tê. Zeman hest û hîsên di dilê mirov de dipijîne, dubare tîne beramberî te û di wê kêliyê de êdî tu nikarî birevî. Weke biyaniyekî nêzî hestên xwe nabî, ji ber weke dîwarekê li pêşîya te disekîne. Ez aliyê xwe yê hestan dizanim, van hestan heta niha ne ez tengav kirime ne jî li pêşîya armancên min bûne asteng. Wê ji vir şûn de jî bi vî rengî bibe û ez ê van hestên xwe ji bo ku erka xwe ya pîroz serkeftî derbaz bikim bikar bînim.

16 Sibatê 2006

Merheba dilê birîndar

Mirov bi xweza û derdor re di nav parvekirinekê de ye. Çawa mirov nikare xwe ji rastiya civakê qut bigire, tu nikarî mirov ji nêvengan qut û razbar bigirî dest. Ji ber tu her tim di nav parvekirinekê de yî. Henase girtin, hatina mirov a li hemberî hev, bêdengiya xwezayê guhdarkirin, ev hemû diyalog, parvekirin û hev hîskirineke. Bi qasî te wate da xwe, hest û tiştên tu dijî, tu yê wê demê li derdor û nêvenga tu di nav de yî çî dijîn hîs bikî. Ger te bi çavek zuha û bê hest li mirov û jîyanê nêrî, tu yê hîs û fêhm nekî. Ji roja min bi azadiyê re hevpayman pêkanî heta niha, ez hinekê bi xwe re tenê dimînim, bahozen di dilê min de diqewim parve nakim. Na, na, ya rast parve dikim, lê bi ziman û rêbazek cuda. Ez bi van rêbazên xwe re tenê raza dilê xwe parkirinê namînim, li gor xwe ji vê rêbazê bawer dikim.

Ger eşkere tevbigirim, wê demê ez ê raza xwe bidim dest, ger wisa bibe ez ê negihim serkeftina raza xwe. Hevalên berê min nas dikir, bi taybet hevalên di pratîka Çarçêla de em bi hev re mane, wate nadin ji van nêzîkatîyên min ê di vê pêvajoyê de û ji ber weke berê bi wan re nîqaş nakim şaş dinirxînin. Wiha hîs dikin, mîna ez êdî ji wan hez nakim, êdî pêwîstiya min bi wan nîne, min ji xwe re hevalên nû peyda kirine û terka wan kiriye. Nîqaşên min ên bi hevala Berçem re şaş dinirxînin, anga di hizirin ji ber hevala Berçem rêvebereke, ez nêzî wê dibim. Ez di

nêzîkatiyên wan de vê dibînim. Dibêjin, hevala Marya berê wisa nebû, çima hevala Marya hat guhertin. Ango wisa gumanên ji rêzê derdikevin holê. Ew di nav hewldana ji bo min fêmkirin de ne û ez jî di nav şerê ji bo bigihim armanca xwe de me. Nehatina fêmkirin hestek pir zehemete, mirovan dêşîne. Lê ez wate didim van hevalên ji min fêmkirin. Ji ber ez bi vî rengî dixwazim, dê rojek were ew jî min mafdar bibînin. Ev nêzîkatiyên wan jî çavkaniya xwe ji hezkirina wan a li hemberî min digire, ger ji min hez nekiriban bendewariyên wan ji min çênedibûn. Dibe ew di vê zanabûnê de nebin, lê ez bi wan re her tim di nav parvekirinekê de bûm. Lewma ez ji bo tiştên di dilê wan de derbaz dibin, tiştên dixwazin pêk were û tiştên ew dixwazin bijîn pêk bên xwe amade dikim. Dixwazim vê pêvajoyê bêdengiyê bi taybetî vê bêdenegiya mirînê ya di asta gerîla de tê jiyîn xirab bikim. Lewma lêhûrbûn dikim, bi hemû hêz û dilê xwe bi armanca xwe ve qîfil kiriye. Li min biborînin hevalên min ên hêja û binirx, ji ber ez bi we re eleqedar nabim. Ev demek pir dirêj çêbû min ji Mizgîn giyana xwe re jî nivîs nenivîsandiye, ev rewş nayê wateya ez ji wê hez nakim û bîrnayînim. Ji Mizgîn pir hez dikim, lê di heman demê de jî ez şervanek Rêber APO me. Ji Rêber APO pir hez dikim, dixwazim vê bi giyana xwe bidim hîskirin.

Çi tişt ji bo azadiya Rêbertî pêwîst bike dixwazim wê pêk bînim. Dixwazim hezkirina xwe ya li hemberî havalan jî bi azadiya Rêbertî tacîdar bikim.

Tiştê di vê pêvajoyê de dijîm, jana lêhûrbûnê ye. Jana zayînê ya qêrîna wê nîne...Ger qêr bidim, wê demê dê her kes fêmkirin bike ku zayînek nû pêk tînim, lê jana min, jana jina tevî hemû êş û janên wê ji bo dengê wê dernekeve û neyê bihîstin lêvên xwe gez dike. Di kêliyê kesek ne li bendê ye zayîna xwe pêkanîn, jiyan watedarkirin û zarokek sûprîz anîna cîhanê! Ez mirovek ji sûprîzan hez dikim, wê ev hezkirina min xwe di rêbaza çalakiya min de bide der. Min xwe bi awayek gelemperî bi vê ve girêdaye, yek jî ger neyê qebûlkin! Na, na, tişteke bi vî rengî nabe, pirsê bi vî rengî pirsikin jî sehmeke. Bûna tişteke wisa neyên jî dê bişîbe mîna mirov xwe di zinaran de bavêje. Wê demê ez ê bihejim û li ser hişê xwe biçim.

Li benda min bin hevrêyên min ên xwe bi bask kirine û ber bi bêdawîbûnê firîne, ez ê werim.

21 Sibatê 2006

Merheba zarokê dil bi hest

Min nîvro bi we re parve kiribû û niha seet 23.00'ê şevê ye, hîn ronahî nehatiye qûtkirin. Ez nikarim li benda sibê bibînim û min xwest niha parve bikim. Ez vê êvarê berpîrsê tevlozyonê bûm, hevalek ji taxima me ya din hat û banî min kir û got; hevala Hîlal û Aysel banî te dikin, karê wan bi te heye. Min jî got, ma wê çi karê wan bi min hebe, gelo henekan li min dikin? Wê jî got; na. Min got; ez nayê. Ji ber ez îro erkdar im, nikarim werim. Ev gotinên min, bi kêfa hevala banî min kiribû neçû. Di demjimêrên şevê yê dereng de hevala Hilal û Aysel hatin, banî min kirin û ez derketim derve. Berî ez pîrs bikim, wan dest bi axaftinê kir. Ji min re tiştên mîna; te çima hevala Bêrîvan şkandiye? Niha digirî û hwd. gotin. Di aliyê din de jî hewl didan xwe cidî bikin. Ez xwe nas dikim, zû bi zû kesê naêşînim. Ya din jî negengaze wê kesê di asta bigirî de bişkênim.

Ji ber vê wan nêrî ez ji vê bawer nakim, di bin stêrk û tarîtiyek kêr de gotin; rojbûna te pîroz be û rojbûna min pîroz kirin. Ez matmayî mabûm, pîrs dikim û dibêjim rojbûna çi? Dema min pîrs dikir wan jî di aliyekî de bîranînên xwe derdixistin. Ez dibêjim; îro ne roja jidayîkbûna min e, hîn çar roj mane. We zû rojbûna min pîroz kir. Kenekê ez girtime û dengê min di nav tarîtiya şevê de deng vedide.

Taxima hevala Bêrîtan ji bo min dikevin liv û tevegerê, dema bêdengi-ya taxima me dibînin, taxima me jî rexne dikin. Hemûyan jî ev nêzîkbûn û sekna min a îro di nav xwe de nîrxandine. Hinek dibêjin; di çavên wê de xemgînî dihat dîtin û hinek ji dibêjin; pîr bi fikar xuya dikir. Ew vêdibêjin, ez dikenim. Ev nêzîkbûna wan a bi nîrx pîr bi kêfa min hat, lê mixabin roj tevlihev kirine û ez zû anîme çîhenê. Yek jî dixwazim îsal jidayîkbûna xwe bi agirê pîroz re pîroz bikim. Bila zayîna min azadiyê ji gelê min re bîne, ez vê dixwazim. Heval çiqas li min difikirin. Ez li hem-berî hezkirina hevalên xwe ên hêja li ber xwe ketim. Dema mirov pîr

zêde tê hezkirin di bin wê hezkirinê de dimîne. Bi taybet dema mirov ji bendewariyan re nebe bersiv. Dema tu bi wan re eleqedar dibî, ji bo hevrêyên xwe ked da, wê demê tama hezkirinê cudatire û mirov di nav wê hezkirinê de xwe azad hîs dike.

Mîna hevala min Mizgîn dibêje; hezkirin bi çend peyvan nayê vegotin. Hezkirin di dil de tê hîskirin. Hezkirina bi kedê tê stradin dibe dîrok, ev di jiyana mirov de şopên kûr û watedar dihêle. Di dîroka 18'ê mehê de konferansa qadro çêbû, derfetê min çênebû, lê di demek kin de ez ê bi we re parve bikim.

Ev konferansa qadro pir girîng bû û nîqaşên pir kûr pêk hatin. Ev konferas dereng ketibû, lê dîsa di vê pêvajoyê de lidarxistina vê konferasê wê di nav rêxistinê de kombûnekê ava bike. Zû hatina cîhanê hestek pir xweşe, ji ber ji jiyane pir hez dikim.

21 Sibatê 2006

Merheba Rêberê min

Di van rojan de pir bi coş im, dilê min di qefesa xwe de hilnayê. Min bersiva bi mehan bû li bendê bûm çirûskek hêviyê girt û ji bo alîkariya min ji pêvajoyê re çêbibe riya min vedibe. Di vê wateyê de ez xwe bi şans hîs dikim. Xweza jî bi awazên xwe vê kelecana min parve dike. Roj hemû bedewiya xwe ya mîna her carê diparêze, di aliyê din de jî asîmanê şîn...Berf jî hêdî hêdî dihele, li hinek cihan ax xuya dike. Ev cihên reş li kêleka berfê dîmenek cuda dafirîne. Dar jî mîna bûkekê xuya dikan. Li ber bawezîna bayê pêlên xwe hîs dike û bê sebir li bendê ye ka dê kengê pora xwe dirêj bike, cilên bûkaniyê li xwe bike. Dema di van mehan de li daran dinêrî, tu kelecana li gel wan hîs dikî. Ew jî ducanî dibin, zîl didin û pişkên xwe vedikin. Di biharê de reng û bedewiya her darekê cuda ye. Diyar bû ez ê di roja robûna xwe ji van deran veqetim. Piştî hefteyek din ez ê ji vê herêmê veqetim. Dê ev veqetin ji min re pir zehmet were, lê wate didim van zehmetiyan. Xwezî berî ji vê herêmê derkevim, li herêmê hemû bigerim. Xwezî ew şansê min heba min hemû heval bidîtan. Ez ji 2004'an ve li Zagrosê me û me di ber hev

de ked da. Vê kedê hişt em li beramberî hev hezkirin û rêzgirtinê pêş bixin.

Hevalên min ên hêja, ez pir dixwazim we bibînim, lê weke hûn jî dizanin ew derfeta min nîne. Xwezî bi hevala Berçem re hatibam. Min hûn dîtiban. Nedîtina we û dubare bi we re nejiyîn wê di dilê min de bimîne, di vê mijarê de dê dilê min her tim bêşe. Lê bi bêrîkîra min a li hemberî we ez ê ji çar aliyan ve vê xebata xwe hembêz bikim. Bi qasî min erka xwe bi ser xist, ez ê bikarim ji hêvî û hezkirina we re bibim bersiv. Ji bo min a herî girîng hezkirina min a li hemberî hevalên xwe mezin kirin û mîna volkanekê xwe di dilê dijmin de teqandine. Rêhevalên min, dixwazim hûn bizanin ku ez pir ji we hez dikim. Hem jin hem jî xort, naskirin û bi we re jiyan ji bo min gelek bi wate û watedare. Dibe me gelek caran ji ber taybetmendiyên xwe yên paşverû û serdest hev êşandibe. Dibe ev êşandin hinek caran li pêşiya me bûn asteng, lê hinek caran jî di peywendiyên hevaltîyê de pêşketin afirandiyê. Ev jî di encama têkoşîna me de pêkhatine. Jiyan li ser qanûnên diyalektîkê hatiye avakirin, li cihekî ev qanûn bi awayek bikêr neyên bikaranîn, li wê derê felcbûn, xitimandin, tirs, dubare û hwd. pêş dikevin. Li cihekî diyalektîkî riya xwe bibîne û qanûnên xwe bikarbîne, li wê derê hêvî, hezkirin, berzbûn, rûmet, evîn, edalet û azadî pêş dikeve. Kêmasiya herî bingehîn ku em dijîn, bi taybet di peywendiyên jin û zilam de bikarneanîna vê qanûna diyalektîkê ye. Bi awayek giştî yan em pêşiya her tiştê xwe digirin a jî em xwe di nav van peywendiyên hestiyarî de dikin kole û desthilatdar. Ger em bi awayek zanistî, ya perwerde û çarser dike nêz bibin, em dikarin peywendiyek jin û zilam a rast bafirînin. Em ê bikarin bibin a xwe û em ê hevdu jî ew qas lewaz nekin. Em ne bikevin nav sîronên kaptalîzmê ne jî nav pîvan û çanda wê. Di vê wateyê de ez wate didim rastiya di mijara jin û zilam de tê jiyan. Bi taybet di mijara zehmetiyên tîr jiyan de divê bi lez em xwe zana bikin, da ku em bikarin xwe ji vê paşverû û kirêtiyê rizgar bikin.

Em ji xwe re dibêjin, em şervanên azadiyê ne. Wê demê em li gor vê şervantiyê bijîn, an em ê ji rewşa şervatiyê bikevin rewşa kesek tenê xilas dike û reben. Dibe mînak ez ê bidim ji we re giran were, lê dîsa dixwazim bêjim. Mînak, pişikêkê bifikirin, pişik li cihekî asê maye û ni-

kare derkeve, ji bo were xilsakirin dike newnew. Êdî ger kesek xwedî wijdan hebe dê wê pişikê xilas bike. Ango ev pişik li ber insafa kesekî maye. Niha pêvajoya em di nav re derbaz dibin jî bi vî rengî ye. Ger di kesan de wijdan hebe, wê li hemberî pargalê têkoşîn bike, lê ger bi wê kesê re wijdan nemabe li cihê têkoşîn bike dê xwe bide jiyîn. Em nikarin xwe radestî insafa dewlet û wijdana hinek kesan a kor bikin . Em ê têkoşîna vê bikin û xwedî wijdan bin. Dê destê me li ser dilê me be, em ê kêlî bi kêlî nîrxên hatine avakirin biparêzin û êşên gel di dilê xwe de bijîn. Ez di wê baweriyê de dema hemû heval jî hewl didin wisa nêz bibin û bi vî rengî bijîn. Hevalên di vî alî de lewaziyên wan hebin jî dê van mijaran derbaz bikin. Dibe gelek mijarên me yên em tê de zehmetiyan dijîn hebin; ger em di bin van zehmetiyan de bin nekevin, wê demê em ê bibin jin û xortên herî bi hêz. Di vî alî de Zagros ji bo min bû cihê xwe perwerdekirinê. Min Zagros weke gava destpêkê girtibû dest, ev gav di jiyana min de bû ezmûnek. Hevalên min ên hêja, ez pir tişt ji we hîn bûm û di vê mijarê de xwe li hemberî wê deydar hîs dikim. Dixwazim hûn bizanin ez di vê mijarê de pir hizirim ka ez ê deynê xwe çawa bidim. Ji niha ve ez êşa veqetînê di dilê xwe de dijîm. Dilê min jan dike. Xemgîniya ji hevalên xwe veqetîn ez hejandime, rondikên xwe dadiqurtînim, divê rondikên min, min nedin dest.

Jin razeke, gerîla jî bi razan hatiye nuximadin. Divê Marya jî xwe bi razan bixemlîne. Gava min a duyemîn bi razan tijî ye, jiyana tijî bi raze. Divê henase girtin û dayîna te jî bê bihîstin û zanîn. A ku vê razê bedew dike jî ev nepeniya wê ye. Hevalên min, dê veqetina ji we ji bo min pir zehmet be, ji we dûr jiyîn tê wateya ber bi rêwîtiyek bi tenê bi rê ketine. Ez ê bi vê tenêbûnê re bijîm, wê ev tenêbûn bibe dosta min û ev dost wê bibe raza min.

Di kêliyên wisa de mirov ti gotinê nabîne ji hevrê û dostên xwe re vebêje, ji ber gotin ne eynika dilê min e. Peyv nikarin min pênasê bikin, an ez nikarim xwe bidim pênasêkirin. Hevalên min ên hêja, ji ber ez ê ji we veqetim dilê min veguheriye zeryaya xemgîniyê. Ji we pir hez dikin, li xwe baş binêrin.

Hevala we ya pir ji we hez dike.

Merheba Rêberê min

Rêberê min, pir dixwazim we bibînim, nêrin û tiştên di dilê min de derbas dibin bi we re parve bikim! Rêberê min, mirov her tim li hemberî we xwe rihet hîs dike. Ez nebûm xwedî wî şansî ku gel we bimînim, lê dema min dahûrandinên we xwendin û CD'ên we guhdar kir min ev pir zelal dîtîn. Dema mirov li gel we be mirov pir rihet dikare tiştên di dilê xwe de parve bike. Hûn wî zemînî dafirînin, di ferdekî de çiqas kêmsî hebin jî, hûn hem aliyê wê yê kirêt hem jî yê xweşik dibînin. Bi vî rengî hem baweriya kesayet li hemberî xwe çêdibe, hem jî hêz û rêbaza bikare li hemberî van aliyên xwe yên kirêt şer bike ji we fêr dibe.

Rêberê min, dema min dest bi naskirina rastiya we kir, dema ez fêr bûm hûn ew qas nîrx didin mirov, xweza, zarok û jinê zêdetir bi we ve hatim girêdan. Yek jî serhildêriya we ya li hemberî kevneşopî û toreyên civakê, têkoşînkirina we ya di temenê zarokatîyê de ez pir dam fikirandin, zêdetir bi we ve hatim girêdan. Rêberê min, ez tevî têkoşînê bibûm, lê ji ber min rastiya we zêde nas nedikir, heybet, otorite û tûjbûna we ez ditirsandim. Lewra min şansê we bibînim paşde vege- rand. Ez bûm dîlê bêzanebûna xwe. Niha jî ez êşa vê dikişînim. Mirov li kesek bikare pê re parve bike digere, li hevalekê digere ji bo bikare her tiştê xwe parve bike. Lê mirov nikare her tiştê dilê xwe parve bike, teqez aliyek mirov her tim girtî dimîne, ev aliyê girtî gelek caran li pêşî- ya mirov dibe asteng.

Rêberê min, ez ji vê bawer dikim ku aliyên her mirovek ên bi hêz û lewaz hene. Dema ez van aliyên xwe yên bi hêz û azweriya xwe ya aza- diyê bi wan re parve dikim, ji ber ew van hestan najîn, ev li hemberî min zêde tê dîtîn, an jî dema ez bixwazim lewaziyek xwe parve bikim bi awayek çareser nêz nabe. Pê xemgîn dibe lê bi awayek çareser nêz nabe. Dema wisa jî dibe tu nikarî bi awayek baş parve bikî, her tim ali- yek te vala û kêr dimîne. Ev kêmbûna li ser mirov û coşa mirov jî ban- dor dike. Di vê wateyê de ez pir dixwazim ji kûrahiya dilê xwe bi we re parve bikim, ji ber van neparvekirinan birîndarim û gelek heval jî birîndarin. Ew jî van êşan dikişînin.

Bikarim silav bidim

Bê ku bi asîmanan ve asê bimînîm

Bikarim bi te re parve bikim

Hestên xwe yên pak

Bi awaza gitarê ji te re vedibêjim

Dilê min tazî ye

Bê ku bi zimanê zilmê ve asê bimînîm

Bi qasî darekê azade

Di rastiya te de

Min coşa jiyânê

Hebûna xwe û vîna xwe keşf kir

Bê ku li sîyan asê bimînîm

Ji te hezkirin

Bi te re parvekirin

Di xwezaya hestan de

Weke robarekî herîkin

Bi gotineke pak

Bi rûkeniyek rêhevaltî

Silav ji te re Rêberê min

Weke bikarim bêjim

Dem

Tu dîsa bê wext li derî didî, dengê derî nayê bihîstin, ji ber tu dereng ketiyî. Wext mîna robarek bêrawest diherîke. Li ser veqetîna me re sal derbas bûn. Îro dîsa min bêriya te kir, ez li ser te hizirim û kêliyê ke-tim nav xeyalên ez ê te bibînim. Îro tu anî bîra min û min dît ku min pir bêriya te kiriye. Di xeyalên min de em ê rojekê li welat hev bibînin, wek berê bi te re ketin nav sohbetan û nîqaşkirin hebû. Gelo wê derfeta min a dîtina te çêbibe? Na, hevala min êdî kêmek zehmet e.

Caran dihizirim, gelo em çiqas netebîtî bûn ne wisa. Em bi rêzîkan dilîstin, dînitîyên me bê sînor bûn. Tu dosta min a herî hêja û her tim cihek te yê taybet di rûpela dostaniya min de heye. Niha di vê kêliyê de jî pir dixwazim tu li vê derê bî. Dixwazim bi te re li çîyan bigerim, li gel çûkên stranan dibêjin rêwîti kirin, piştî em westîyan piştî xwe dayîna hev, bi hev re min tama hewayê dawerivandina hundirê xwe û piştî wê jî mîna zarokan li ser çîyan bi hev re bezîn... Bi qasî dixwazim ev pêk werin nikarim ji we re vebêjim. Min digot qey tu di girtîgehê de yî, lê di kêliyê de li ser telefonê dengê we yê gur bihîstin hestek pir cuda bû! Hevala min di wan çirkeyan de min nedizanî ez ê çî bihizirim û çî bêjim, tenê min xwest gotinên we guhdar bikim. Ez bawerim ji parkirinên me yên ji dostaniyê hatine wergirtin e, dema bi telefonê bi we re daxivim min dîsa xwest nazdaariyên xwe li we bikim. Gotinên te gotibûn hîn li ber guhên min deng vedidin: Dubare dengê te bihîstin ez gelekî kêfxweş kirim û wê ev moral bi salan min bi rê ve bibe. Bawer bike dosta min ez jî pir kêfxweş bûm û ev moral ez jî bi salan bi rê ve birim. Pir dixwazim te bibînim, min pir bêriya te kiriye. Dibe gelek caran min tu êşandibe, ji ber vê jî li min biborîne. Her cara vê peyvê bikartînim her tim ev gotina te tê bîra min, dema min digot; qisûrê nenêre, te jî digot; ger qisûrek hebe ew jî ya te ye.

Tu dizanî, ez gelek caran li te digeriyam, cihê te di jiyana min de her tim vala dîma. Demek dirêj min ev valatî jiyana kir. Min her tim tu fêr

dikirî. Berî ez zehmetiyên xwe vebêjim di kîjan mijarê de zehmetiyan dikeşînim te ez fêm dikirim. Min ji her kesê hêvî dikir weke te min fêm bike. Dema ez nehatiban fêmkirin, min xwe aciz dikir û digot; çima ez nayên fêmkirin, an jî niyeta min ev nebû, hûn çima wisa fêm dikin. Di nav van zehmetiyan de gotinên te dihatin bîra min û dîsa weke te digot xurûra min li pêşiya min dibû asteng, min bi xwe re şer dikir. Lê niha dixwazim tu bawer bikî min ev zehmetî derbaz kirin. Dizanîm tu rewşa min pir mereq dikî. Bawer bike dosta min, ez niha pir baş im. Lê ger min tu dîtiba ez ê hîn baştir bûma. Ez niha mezin bûme, ez bi henekên te pîr bûme, heta ez dikarim bêjim du tayên pora min spî bûne û mîna ji te hez dikim ji van tayên para xwe yê spî pir hez dikim. Mirova bedew, ez dostaniya te maç dikim hevala min a xweşik.

25 Sibatê 2006

Merheba dilê min

Îro ev bû du car em hev dibînin. Ya rast ger derfetên min heba ez îro ji te qut nedibûm û dê min gotiba wê te jî guhdar kiriba ma ne wisa?

Îro roja jidayîkbûna min e, li gor fermiyetê di nasnama min de 25' ê Adarê hatiye nivîsîn. Lê dayîka min her tim digot; tu meha Sibatê jidayîkbûyî û ev bi salane ez jî bi vî rengî pîroz dikim. Ez dixwazim roja jidayîkbûna xwe ya îsal bi çalakiya xwe pîroz bikim, lê hevalên min dîsa ji bo min pîroz kirin. Berî vê çend rojan ez anibûm cîhanê. Me îro jiyana xwe asayî berdewam kir. Me perwerde dît, li ser CD'ê me dahûrandinên Rêbertî guhdar kir û piştî nîvro jî me li ser fermanarbûnê talîmat xwend. Piştî wê jî îştîma hat girtin, me soza xwe ya girêdana bi Rêbertî re nû kir û ez li dibistanê mam, min bi hevalekê re nîqaş kir. Min ji vê hevala xwe re got; divê tu bi taybet nêzîkatiyên xwe yê çîna biçûk dahûrînî û li ser mijarên li pêşiya te dibin asteng yek jî ev nêzîkbûna te ya çîna biçûk e. Dema me wisa nîqaş dikir, hevala Dîlan ji yekîneyê bi lez hat banî min kir. Hat û got, li yekîneyê perwerde heye, ji rêveberiya biryargeha navendî hevala Rojda jî cihê xwe tê de digire û ji bo em bi lez biçin îsrar kir. Di aliyekî de min nedixwest bawer bikim lê di aliyê din de jî neçar mam biçim. Min destpêkê kêmek xwarin xwer. Hevala Bêrîtan digot; lez bike divê em bigihîn perwerdê. Min kêmek din lez da

xwe, yekîne hemû di taxima hevala Bêrîtan de kom bibû. Dema ez nêzî derî bûm min fereq kir hundir tariye. Di hundir de min dengê pist pistê dibîhîst. Min li hemberî vê dûmenê xwe paşde kişand. Hevala Bêrîtan û Adar çengê min kişandin û ez bi dehfan xistim mangê. Çawa ez nêzî derî bûm, li hemberî gotinên rojbûna te pîroz be rû bi rû hatim! Bi dengê fitikan, hema bi carekê pêxistina ronahiyê re ez ketim nav hestên pir cuda. Gelo dema mirov nû ji dayîk dibe hestên wisa balkêş dijî? Ti kes nizene, dibe wisa be.

Coş û morala hevalan di çavên wan de diyar dibû, min hemû yek bi yek maç kirin. Ji min re cihek taybet ê rûniştinê amade kiribûn, destekulîlek kom kiribûn. Rengê kulîlkên destpêka biharê zer in. Zer hem berekete û hem jî veqetîne. Bi rastî jî agahiya ti kesê nîne ez ê çend rojên din ji van hevalan veqetîm. Ji van kulîlkan re dibêjin, berfîn. Hevalan bîdon ji xwe re kiribûn darboqe û lê didan. Bi awayek pir xweşik dilîstin. Piştî wê dest bi stran gotinê kirin. Destpêkê jî hevala Jîyan dest pê kir û ji me re stranek bi Rusî got. Ji derveyî min hemû hevalan stran gotin. Ji ber yekîne hemû jî kêrhatibûn, femandara me ya yekîneyê dibêje; em ê yekîne giştî biçin radyoya Mezebotamya. Di vê kêliyê de ez jî dikevim nevberê û dibêjim; dengê min nexweş e, lê di aliyê şanoyê de xurtim. Ew jî dibêjin; haa baş e, tu jî were.

Ez bi awayek pir kûr li hemû hevalan dinêrim. Ji xwe re pirsan dikim û dibêjim; ez ê çawa ji we veqetim, çawa qut bibim. Min rojbûna xwe daye aliyekî û li ser hevalan difikirim. Di vê navberê de hevala Jîyan paste çêkiribû, hem jî pasteyî bi gûzan çêkiribû. Pasta têr gûz çêkiribû, taybetî dida min. Li hemberî vê hezkirina hevalan li ber xwe dikevim, ji ber ez ji wan re nabim bersiv an jî nikarim bibim. Her tim vezasiya min di roja jidayîkbûna min de çêdibe. Gelo ev veqetîn dişibe veqetîna ji rehma dayîkê? Her tim vê êşê dijîm. Nabêjim veqetîna vê carê ji çiya, veqetîna ji hevalane û ez ê veqetim. Hîsên hevala Hîlal pir bi hêz in û yek jî ji ber hevalek pir kevne ji hinek tiştan guman dike. Me şahiya xwe bi govendê bi dawî kir. Ango me xwest xilas bikin, lê hevalan piştî govendê jî stran ji xwe re gotin. Dengê hevala Nûcan a nû hatibû tabûrê pir xweş bû, dengê wê yê dilşawate heye. Hevalek pir kêrhatî ye, mirov dikare pê re eleqedar bibe. Ger mirov rast bi rê ve bibe dê bibe milîta-

nek pir xurt, hevalek ji pêşketinê re pir vekiriye. Ez ê êdî van roj û nêvengên bi nîrx nejmî û van hevalên wisa bedew jî nebînim.

Bi rastî jî hatina cîhanê pir xweş e. Ger li van zayînan wate û misyon were barkirin, wê zayîn kêfxweşî, coş û azadiyê bafirîne. Bi rastî jî hezkirina hevaltiyê pir cuda ye. Dayê, xwe aciz neke û xelet tê negihije, hezkirina hevaltiyê dayîk û bav jî dide jibîrkirin. Cihê rêhevalên te yên têkoşînê pir cuda ye, tu henase bi hense bi hev re dijî, tu bi hev re di zinarên mirînê de derbaz dibî, kêfxweşiyê bi hev re dijî û heta pariyek nan jî parve dîkin û bi hev re dixwin. Ji bo gule li te nekeve hevalê te xwe li pêşiya te dike mortal û dide ber guleyan. Ma wê ev hevaltî çawa neyê hezkirin? Ya pîroz jî ev e, ev hevaltî ye. Hinek mirovan çawa xiyanet li vê hevaltiyê kirine, çawa tema vê hevaltiya pîroz negirtine? Hevrêyên min, ji ber min kêlî û şevê wisa bi we re jiyan kir pir kêfxweşim. Wê ev kêlî di jiyana we de bibin bedewî û dîrok.

24 Sibatê 2006

Li benda min be

Hêrsa te veguherî volkanekê

Volkana te di gulpikan de bişkiwî

Kenê te li ser rûyê beybûnan ma

Tu bi Viyanê ji nav dilê me çêbûyî

Tu xemzaya vînê bûyî

Tu bi pêtên agir bûyî xwedewenda vînê

Dema tu bi agir direqîşî

Te şopa evîna xwe li ser zinaran hiştiye

Û dara jiyanê ya her tim şîn bibe

Mîna agir

Asî û sotîner kir
Bi berbanga sibê re Viyan çêbûn
Bi hezaran bi te re dimeşin
Lehenga evînê
Dixwazim destê te bigirim
Ez ê bibim qêrîna evîna te
Di rûyê dijaminê bêbext de biteqim
Ez ê hesreta te bigihînim azadiyê
Dilşewata min
Ma dibe ez îske îskên te yên girî ji bîr bikim?
Ma dibe ez îsyana te ya bêdengiyê dijî
Ji nedîtî ve bêm?
Her kêlî, her roj dilê min tê qemçîkirin
Xwê li ser birîna min dîkin
Birîna dil veguheriye kangirênekê
Êdî divê ev hêrs bê vereşîn
Ma ne wisa?
Lehenga evînê
Yan jî em ê mîna libên qumê ber bi bayê demê bikevin
Te beriya min êşên dîrokê vexwarin
Lê vê carê
Ez ê bibim pepûleya sêyemîn
Ber bi dilê azadiyê ve bifirim

Li benda min be,

Ez tēm

Ez bi xwe re hêvî,

Evîna Zîlanê tînim

Li benda min be.

28 Sibatê 2006

Merheba dosta bi demê re ketiye pêşbaziye

Ev çend roj bûn ji te dûr bûm. Hemraza min, bawer bike min pir bêriya te kiriye, ji ber wê jî hema çawa hatim, min rûpelên te bêhn kir. Hîn lingên min şilûpilin, ji gorên min dilopên avê dikevin xwarê. Ew derfet çênebû em goreyên xwe zuha bikin, ji ber divê em tevî perwerdê bibin. Mijara îro ya perwerdê jî sizma ye. Tiliyên min jan dikin, lê ev negirînge, bê ku guhdar bikim van rêzikan dinivîsim. Daxwaz û bendewariya min a bi mehan pêk hat. Herî dawî bîryara min a ji bo çalakiya fedayî hat pejirandin. Ji ber ev pêşniyara min hatiye pejirandin, pir kêfxweş bûm û ketim nav kelecaneke. Hevrê Viyan, ji ber ez ê werim gel te pir kêfxweş im. Ez ê bigihim serkeftinê.

Dost û hevala min, ez li benda te me. Xwezî tu niha zû hatiba. Bi qasî êşên zayînê dikşînim ji hal ketim, êdî dixwazim hêvîyê belav bikim, tu yê alîkariya min bikî ne wisa? Hevala min, dizanim tu ji min pir hez dikî. Vê hezkirina xwe bi azadiyê tacîdar bike. Dibe ji te re zehmet were, lê divê tu vê zehmtiyê bi ser bixî. Tu dizanî, dema ez bixwazim tişteki bikim, ti kes nikare min jê vegeirîne û tiştê ez nexwazim bikim jî ti kes nikare bi zorê bi min bide kirin. Ango ger tu alîkariya min nekî jî ez ê vê bi şêwazekî bi ser bixim, lê ez dixwazim bi alîkariya te bibim bûka azadiyê. Tu dibêjî, ji ber min dengê te bihîstiye ez pir kêfxweş bûme. Ji bo min jî dengê te bihîstin û bi te re nîqaş kirin pir watedar bû. Em hundirê vê kêfxweşiyê bi bîrdoziyê dagirin, bila ev kêfxweşî her timî be, dem-demokî nebe. Ji ber ez ê te piştî salên dirêj bibînim pir bi şansim, ew derfet bi destê her kesê nakeve û ji ber te ji bo min şanseke wisa nas

kiriye pir kêfxweşim. Bifikire hevala min, ji nav hezar mirovan te ez guncav dîtîm. Ez ê vê baweriya te bi serkeftinê dagirim.

1 Adarê 2006

Bihar

Ax dixwaze xwe bi coşa biharê bixemlîne, bi helandina berfê re pîvok û nêrgizên bê sibir li bendê bûn li rûyê me dikenin. Li hemberî xwezayê beydan dixwînin. Ji giyayên di vê demê de şîn bûye yek jî guhereş e. Ji ber li ser pelên wê yên dirêj deqên reş hene û dişibe guh, jê re dibêjin guhreş. Ev giya pir zû şîn dibe, lê ji ber pir zû qert dibe mirov êdî nikare bixwe. Endamên xwezayê bi hev re ketine nav pêşbaziye ka dê kî destpêkê mizgîniya biharê bide. Bêguman kîjan bi lez serê xwe hilde wê ew mizgîniya biharê bide û bêhnek xweş ji hezkiriyên xwezayê re belav bike. Xweza û mirov weke hev in, herdu jî xwedî şaneyên zindî ne, cudabûna wan tenê ew e mirov xwedî zekaya analatîk e. Yan di nav her tiştê xwezayê de aqle û parçeyek zekaya wî heye. Bihar û gerîla çiqas dişibin hev. Gerîla bêsebir li bendê ye ka dê kengê demsala zivistanê xilas bibe. Bi çar çavan li bendê ye û dixwaze bihar hema zû were. Gerîla jî bi hev re dikevin pêşbaziye. Ka wê kîjan destpêkê hest û ala xwe ya serkeftinê bigihîne pêvajoyê, ka wê kîjan destpêkê ji Rêbertî, gel, zarokan re bibe bersiv û dê di dilê kê de dengê tilîliyan bilind bibe?

Jiyan pêşbaziye martonê ye, em li hemberî demê di nav pêşbaziye de ne. Gerîla jî mîna biharê bêdeng bêdeng diherîke nav nepeniya axê û dilê dijmin. Çem û kaniyan mil dane hev û di welatê min de digerin, kuîlkên xecxecokê bi tirêjên rojê re govend girtine. Ji biharê re dibêjin; demsala hezkirin û evînê dipije. Ez ê evîn û azweriya xwe li ser vê axê biçînim. Ez ê weke Zîlanan hilbêm, weke Zîlanan bijîm mîna lêdana dilê biharê. Ez bê sebir li bendê me ka ez ê kengê bibim perperîk, kengê weke pîvokan serê xwe rakim û ji cîhanê re bikenim, ez ê kengê mîna tirêjên rojê bikevim nav axê.

2 Adarê 2006

Merheba zarokê leheng ê şerê hêviyê dide

Carekê vedibim û carekê jî tîm girtin. Ewrên reş û tarî xwe li dor xeylên min dalîne, lê ez ê bin nekevim û dozaja şerê xwe zêde bikim. Rêxistin dîsa bi min re nîqaş dike. Dixwazin asta lêhûrbûna min û asta xwe avakirinê bizanin. Min berî vê çend rojan hêviyek girtibû, lê niha rêxistin dibêje, divê tu kêmek din lêhûrbûn bikî. Ez wate didim nîqaşên bi min re dikin, lê hêviya min bê av nehêlin. Diyar dikin, divê tu bi lez biryarê nedî û pir baş lêhûrbûn bikî. Di van nîqaşan de ez nêrînên wan ên ji bo min hîn zû ne ferq dikim. Tê gotin; tu dikarî bi şêwazên cuda jî xebatan bimeşînî û ji min pirs dikin ka xalek din a te paşave dikişîne heye yan na. Dixwazin ji min re bêjin, divê tu dudiliyek herî biçûk jî nekî pirsgrêk, dinirxînin û dixwazin bêjin, çi dibe bila bibe ger dudiliyek te hebe em ê bi rêzdarî nêz bibin. Dixwazin fêr bibin, ka hezkirina min a li hemberî Mizgîn ji bo min dibe asteng an na.

Ez wate didim vê nîqaşa rêxistinê û ev pirs jî didin nîşan rêxistin bi awayek çiqas hesas nêzî mirov û endamên xwe dibe. Min ji van nîqaşan baweriyek mezin girt û min fêhm kir divê ez bi awayek hîn cidî û kûrtir nêz bibim. Rêxistin naxwaze ez tengaviyan bijîm, ji bo ez van tengaviyan nejim jî di her alî de hewl dide min bi zana û lêpîrsîn bike. Ev nîqaşa jidil pir bi wadetdar bû û carek din ji ber li hemberî van nîqaşên hevalan min biryarek wisa girtiye pir kêfxweş bûm. Ji bo ez bi ser bixim ez ê li ser ziraviyên wê yên herî biçûk jî bifikirim û di çarçoveya vê nîqaşê de lêhûrbûn bikim. Li gor min yek jî mijarên li pêşiya jin dibin asteng û wê paşve dikişîne, yek girêdanbûna wê bi malbatê ye, din jî feraseta hezkirina sexte ya li hemberî zilam dijî ye.

Ez di van mijaran de xwe di ber çavan re derbaz dikim. Ez pir ji malbat û Mizgînê hez dikim. Lê ez ne alîgirê ferasta hezkirina bi xwînê ve girêdayî me. Ez di ferqa wê zanebûnê de me, divê ez hezkinê bi zanabûn, rûmet û fedekariyê bistirim. Divê ev hezkirin ne ji bo kolatîyê, ji bo azadî û gelê min ê mazlûm re xizmetê bike. Ez ji gelê xwe hez dikim û ez ê bi vê hezkinê bi ser hedef û armancên xwe de biçim. Di sala 1999'an de û berî wê jî li pêşiya min gelek vebijêrik hebûn, rêxistinê ez nedîşandim çiya, li qada min xebat dimeşand jî gel nedixwest ez werim çiya. Min bi ferzkinên xwe biryara xwe ya werim welat bi rêxistinê da pejirandin û min xatir ji malbata xwe xwest, piştî hatim. Ez ji malbata

xwe hez dikim û min ev hezkirin jî bi hezkirina gel re tacîdar kir. Tiştên dixwazim bikim, teqez divê heta dawî bimeşim û gihiştina encamek watedar e.

Ez nêzîkatiyên xwe yên li hemberî zilam jî di ber çavan re derbaz dikim. Min ji yekî hez kiribû û min ew hişt û derbazî welat bûm. Di derbarê van salên derbasbûyî de dubare xwe lêpîrsîn dikim. Weke miroveka ji pergalê bandorbûyî û di bin siya zêhniyeta desthiladtariyê de mezinbûyî, weke jinekê lewaziyên min jî hene. Hewl didim van lewaziyên xwe jî dahûrînim. Niha di dilê min de xortekê min paşde bikişîne nêne, ji ber ez hîn rastî xortekî ku evîndarî wî bibim nehatime. Ma wê evîna patron û karker çawa be? Ma evîna kole û serdestan dikare bibe çî? Mirov ji vê re nikare bibêje evîn, encex mirov dikare ji vê re bêje ajoyên xwe tatmînkirin. Lewra evînek bi kole wê mirov li hemberî ahlaqa azadiyê ber bi xiyametê ve bibe. Evîna kolayan nabe û nabe jî. Min xwe wisa qane kiriye, ji van tiştên min nixandine bawer dikim û li gor baweriya xwe jî dijîm. Koleyên bawer kiriye û bi dilê xwe bûne kole; ez bawer dikim, ez ê ji dil azad bibim. Mafê min ê herî xwazayî jî xwe azad kirine.

3 Adarê 2006

Ji bo giyana min, ji nav lehiya hestan çend dilop

Ev demek pir dirêj çêbû min ji te ti agahî negirtine. Ji wan deran qet qaz û quling nafirîn û bi van deran re derbaz nabin. Min pir bêriya te kiriye giyana min, ez dixwazim tişteki ji te re îtiraf bikim. Ji roja em ji hev veqetiyên heta niha min qet ji bo te nenivîsiye û ev nayê wê wateyê min te ji bîr kiriye. Ji bo vê hezkirinê bi azadiyê re tacîdar bikim, ji kêliya min bi azadiyê re hevpeyman daniye heta niha tenê tiştê dihizirim ez ê çawa erka xwe ya pîroz bi ser bixim. Ez di derbarê te de jî hizirim. Ger ez çalakiyek wisa pêk bînim wê bandorek çawa li ser te bike? Ez dizanim tu yê pir xemgîn bibî, wê agahiya min a şehadetê ji te re pir giran were, lê ez di wê baweriyê de me tu yê wate bidî.

Giyana min li gel te ew hêz heye.

Dil dixwest ti şehadet û mirin çenebin, lê weke tu jî dizanî rastiya cihanê bêwijdan e. Rastiya me ya gel, derftên me yên welat... Axa me ya taze her tim hatiye mêgtingehkirin û dagirkirin, li hemberî van êrîşan hemûyan jî her tim têkoşîn hebûye û egîdên me jî bi lehengî şehîd ketine. Îro jî ev zext, zordarî û dagirkirin bilind kirine û berdewam dike. Em jî li hemberî vê têkoşîn didin. Em hîn negihîştîne encamê û me tam serkeftin bi dest nexistiye. Ji bo em gel û welatê xwe ji tenêbûnê rizgar bikin bedelên wê hene. Bê bedel têkoşîn nayê dayîn. Her roj hevalên me şehîd dikevin, ez jî dikarim bibim yek ji van hevalan. Dibe şêwaza şehadetê cuda be, lê ez birayra vê şêwaza şehadete didim û bi guleyek bê navnîşan naçim. Şansê mirov nîne biryar bide jidayîk bibe yan na, lê şansê mirov heye çawa bijî û çawa bimre.

Min dikariya mirinek ji rêze hîlbijêrim an jî di nav diywariya şer de şehîd bikevim. Lê di aliyek din de ger mirov xwe bi xwe biryara rêbaza şehadeta xwe bide hestek pir cuda ye, wateyek cudatir lê bar dibe. Ger rêbaza şehadetê ya ez bihizirim û biryar bidim hebe, wê ev şehadet bi xwe re jiyanek nû bafirîne. Ya ji bo min bi nirx û watedar ev e, ango ji yana nû ye. Ger pir bijî û jiyanê watedar neke, wê demê bila jiyanek kurt, bi wate û birûmet hebe baştire. Çiqas xweşe mirov bi rûmet şehîd bikeve! Bi coş dibim û di nav deryaya kêfxweşiyê de melevaniyê dikim.

Ez di wê baweriyê de me tu yê wate bidî van hest û nêrînên min. Divê tu bi hestiyar nêz nebî, çalakiya ez dikim divê di aliyê nêhrandina min de bigirî dest û bi zanabûn nêz bibî. Ez weke ferdekê divê ji van tiştên tîn ji yîn qut neyê destgirtin, weke ewlad û parçeyek vî gelî werim destgirtin. Ger wisa bibe hûn ê çalakiya min fêhm bikin. Dixwazim tu fêhm bikî ku ez ji te pir hez dikim û dizanim tu jî ji min pir hez dikî. Divê tu li hemberî vê hezkirina min xwe xembar nekî. Divê tu ji berê zêdetir jiyanê hembêz bikî. Hem li şûna xwe hem jî li şûna min jiyanê di nav coşa biharê de bi coş bijî. Vê ji dil bijî, ji ber dizanim tu çiqas zehmetiyan bibîni û êşan bikişîni jî parve nakî, her tim tavêjî dilê xwe. Vê ji bîr neke giyana min, em pir bi şans bûn; piştî çend salan me dîsa hev dît û carcaran em hatin gel hev. Me kêfxweşî û dilşadî jiyan kir, lê bi hezaran mirovên ev kêfxweşî û şans nejiyîne hene.

Gelek dayîkan ewladên xwe fedakirine û êş kişandine, lê ji van fedekariyan jî nerevîne. Giyana min, ez jî dixwazim bibim yek ji van ewladan. Em hem xwîşk hem jî hevalên hev ên têkoşînê ne, rêwiyên hevî û şervanên azadiyê ne. Di vê navberê de ez mizgîniyekê bidim te; wê biraziyek me çêbibe û jinbira me got, ez ê navê te lê bikim. Ji min re got; ger navek din ê tu dicibînî hebe, em wî lê bikin. Min jî got; na, ez ji navê Marya hez dikim. Jinbira min nizane ka kure yan keç, lê li gor navê keçan hîlbijartiyê pê hesyaye wê keç çêbibe. Wê ev biraziya min jî pir serhildêr be. Ger kur çêbibe bila navê wî yan Umud an jî Mazlûm be. Giyana min bi te re hevaltîyek me ya pir xweş çêbû. Hem li malê hem jî li çiyayên azad. Ev hezkirina me her tim riya rast nîşa me da. Giyana min, li xwe pir baş binêre, li tendirustiya xwe baldar be. Ez bi hezkirina dilê xwe re te hembêz û maç dikim.

4 Adarê 2006

Merheba jîna zehmtiyan bi azadî û serkeftî nê tacîdar dike

Di nav tabûrê de hewayek vesaziyê rabûye, di dil û hizra her kesê de vesazîbûn heye. Ka em binêrin wê vesazîbûn çawa çêbibin!

Bi rojane em ji bo 8'ê Adarê amadekariya şahiyê dikin. Di nav amadekariya şahiyê de mirov di gelek aliyan de dahûrandin dike, bi taybet kaprîsên jinê, aliyên wê yên kariyer û dudiliyên wê pir baş dibîne. Ji ber pir hestiyare carekê bê moral e, cara din jî bi moral e. Weke meha Sibatê dem demokî ye. Li gel vê jî min îsrara jin, ezma wê ya serkeftî nê, narî nê, ahenga wê ya hûnerê û hezkirina wê ya bi ti tiştan nayê guhertin jî dît. Min hewl da li hemberî hinek nêzîkatiyên mirovan tengav dikin moralê xwe nexînim. Ji ber van xebatên zêde dijwar ev çend roj bûn min nekarî parve bikim. Xebatên me yên şahiyê baş bûn, me temeshevî dilxweş kirin, kêr jî be me ew kêfxweş kirin. Me bi skêcên xwe hemû dan kenandin, di aliyê din de jî skêca min gelek heval matmayî hiştin. Hinekan digot, me wisa dizanî hevala Marya gihiştîye, lê ew jî têra xwe dîne. Di aliyê din de jî dibe çavkaniya xwe ji karektera pêvajoyê bigire, di çavên hevalan de kêf û xemgînî bi hev re dihat xwendin. Di dîroka me de êş û dîlşadî bi hev re di heman robarî de herîkin. Ji ber vê yekê jî êdî em fêr bûn ev rewş heta şaneyên me bi cih bûye.

Rêbertî hîn di nav çar dîwaran de henase digire, dijmîn dîsa zextê li ser gel dike û tevî van êşan hemûyan jî dîsa dikene. Em hewl didin van rojan bi awayek hêjayî wê rojê pîroz bikim. Vê roja pîroz di serî de li Rêbertî pîroz dikim. Ji ber ti kesî bi qasî Rêbertî zanabûna zayenda jinê pêş nexistiye û jin negihand cewhera wê. Yê hişt zanabûna azadiya jinê pêş bikeve, xebata jinê weke xebata nîvcomayî dinirxîne, hêviyê qut nake û pir ji jinê bawer dike.

Min ev roj ji bo bîranîna şehîdên me yê em anîne van rojan pîroz kir. Yek jî cejna hevalên li Bakûr ên her kêlî rû bi rûyê mirînê ne pîroz be.

8 Adarê 2006

Hevaltî

Hevaltiya rast di dîrokê de şîn dibe

Hevaltî çavkaniya me ya hezkirinê ye

Em bi vê çavkaniyê azad dibin

Li ser axên Mezopotamya

Em ê evîn, bêrîkirina xwe

Bi xwîna xwe ya zalal av bidin

Mîna baxçevanekî

Çeka me saza me ye

Awaza me sonda me ye

Em ê evîna xwe biqîrin

Qêrîna xwe ya azadiyê

Wê azadiya me li Zagrosan dengvede

9 Adarê 2006

Herî dawî zivistan xilas bû

Di van rojên em gav tavêjin nav biharê di tebûrê de hewayê vesazîbûnê rabûye. Her hevalekê xwe ji bo pratîkê amade kiriye û ya herî girîng jî ji bo ji pêvajoyê re bibin bersiv dixwazin biçin qada Bakûr. Di tabûrê de vesazî çêbûn; yekîneyek derbazî Çarçêla bû, yekîneyek jî wê weke xweser bimîne. Ez bi komekê re ji tabûrê derketim. Em koma biryargehê ne. Em komek pir qerebalixin û hema bêje hemû jî ferman-dar in. Min ji wan re got; ez ê biçim Bakûr, vesaziya min ji bo Dêrsimê hatiye çêkirin û min her kes bi vê yekê da bawerkirin. Min îro dev ji cixarê jî berda.

Me bi hevala Bêrtîna re ji bo biçin Bakûr xeyal dikirin. Min hevala Bêrtîtan ber bi Botanê ve oxur kir. Ez wê kêfxweşiya di çavên wê de qet ji bîr nakim. Min ew bi awayek germ hembêz kir, maç kir û min di dilê xwe de jê re got, oxur be û ji te re serkeftînxê dixwazim. Veqetîn pir zehmete û xemgîn jî dibim lê tiştê min xemrevin dike erka min a pîroz e. Ji bo erka xwe ya pîroz bi serkeftî derbaz bikim divê pir lêhûrbûn bikim. Çalakiya fedayî ya li Wanê ti kesê negirte ser xwe, lê bawerim hevalekî pêkaniye. Di plansazî û keşfkirinê de kêmasî derketine, di encama vê de jî li cihek şaş hatiye teqandin û encamek nebaş da. Zerar daye mirovên medenî. Ev berûvajî bîrdozî û felsefeya me ye. Ez hevalê şehîd ketî difikirim. Kî dizane bi kîjan hêviyan ew pîm kişandîye. Niha li hemberî van nebesiyan bi hêrs dibim û nikarim qebûl bikim. Divê ev çalakî li sînorê Kurdistan û metropolên Tirkiyê pêk werin. Ez jî pir bi kelecanim, di encama ferzîkirinê min ên zêde de pêşniyara min hat pejirandin û êdî rojan dijmêrim. Xwezî hema zû amdekarî xilas biban. Çiqas xweş e, ez ê bi biharê re bibim rêwiya hêviyê, ez ê bi ava azadiyê xwe bişom, van hestên bedew ên dijîm nikarim vebêjim.

Hevala Zîlan, Sema û Viyanan jî ev hest jiyan kiribûn. Ez ê jî weke we di nav şînahiya asîman de melevaniyê bikim. Ez ê ji Rêberê xwe re bi-bim henase, bibim qêra gelê xwe û kenê li ser rûyê zarokên nû ji dayîk dibin. Çiqas xweşe mirov di riya çareseriyê de bibe dilopek hibîr û çirûskek, çiqas bi wate ye. Bi qasî bi wate jiyîn, şehadetek bi wate jî ji bo kêfxweşiya gelê xwe wek erkekê digirim dest. Yê şoreşa dîrokê diza-

ne, pê dihesse ka wê çî rû bide, di wê zanabûnê de divê çî bikin. Ez jî weke şoreşgerekê dizanim ka ez ê çî bikim. Şoreşger û milîtan dîrokê diguherînin, ez jî dixwazim renek bidim vê dîrokê, ev jî weke milîte- nekê mafê min ê herî xwezayî ye. Îro hevalê Jêhat hatiye gel me û min ji wî re got; ez diçim Dêrsimê. Min ev bi wî jî da bawerkirin û li gel yên diçûn Bakûr angû bi me re wêne girt.

Niha xweza jî hestên min parve dike. Asîman şipûşîn e, li hinek cihan parçeyên ewran hene û hewayek têhngerm xwe li rûyê mirovan dide, porê min ê keş jî li ber vî bayî bi coş dibe. Li çiya hinek cihan berf û li hinek cihan jî ax xuya dike. Ez jî li vî warê mîna bihûştê dilê xwe dikim kaniyek û dirîjinim ser van rûpelan. Roj jî têra xwe min germ dike. Ez ê êdî dest bi nameyên xwe bikim û çiqas zû binivîsim ji bo min ew qas baş e. Evîna min, li benda min be, vaye ez tîm.

11 Adarê 2006

Merheba Rêberê min

Ji kêliya min bi azadiyê re hevpeyman çêkirî heta vê kêliye, ez di dilê xwe de hestên cuda cuda û bi wate dijîm. Weke wijdan xwe rihet hîs dikim, derengmayîn min tengav dike. Lê ez vê pêvajoyê ji bo xwe bi hêz amade bikim bi lêhûrbûnkirinê derbaz dikim, teqez divê bi ser bixim. Rêberê min, çalakiya ez ê pêk bînim divê weke çalakiya hevala Zîlan deng vede. Divê erzan û ji rêzê şehîd nekevim, divê şehadeta min di welatan de deng vede.

Rêberê min, ez hest û coşa serkeftinê pir ji kûr dijîm û di wê baweriyê de me ez ê bi ser bixim. Ji bo ez rê nedim kêmasiyek herî biçûk jî xwe ji her aliyan ve di ber çavan re derbaz dikim. Ez ê li bajarekî bi tenê bim û cihên dijmin lê dimîne keşif bikim. Di bajarek ew qas mezin de bi tena serê xwe mayîn wê kêmek zehmet be, ez ê di vê mijarê de zehmetiyan bijîm. Ez ê di wan kêliyên xwe yên bi tenê de her tim bi we re nîqaş bikim. Ez ê her tim bi we re pave bikim, di rih, fikir û hest de her tim bi we re bijîm. Rêberê min, di vê hevpeymana min girtî de ez bi tenê nînim. Dîsa nahêlin bi we re hevdiîtin pêk were, çiqasî ji we ditirsin. Ev tirs ji bê baweriyê tê, ji ber cewherê wan xaliye bê bawerin.

Rêberê min, ev çend rojin min nenivîsandiye. Ji ber min nenivîsandiye ji xwe pir hêrs dibim, ger min ji xwe re plan kiriba min ê nivîsandiba. Min wextê heyî baş rêxistin nekir. Min pir dixwest 4'ê Nîsanê binivîsim û hestên min ên ku rojê jiyane bi we re parve bikim, lê çend roj bi ser re derbas bûn hîn min nenivîsandiye. Ji vê kêliyê şûn de jî ti wateya wê nema ez binivîsim, a bi wate ew e tiştên min di kêliyê de jiyîn bi awayek xwerû û bi awayê min jiyaye vegotina wan e.

Rêberê min, êdî ez hatime dawîya amadekiriyan. Ev bi mehan bûn ez li benda vê kêliyê bûm. Xwezî zû ev roj derbaz bibin û êdî bi rê bikevim. Ez ê bi vê lêhûrbûna min jîyan kiriye bibim hêlm û mîna pişkan vebim. Her kêliya derbaz dibe ji bo me windahî ye. Wextê tê windakirin dubare vegerandin pir zehmete. Tu dikarî her tiştî di kêliyê de qezenc bikî yan jî winda bikî. Rêberê min, ev bi mehan bû min ji hemû hevalan re digot; ez ê biçim Dêrsimê û niha jî heval diçin warê bêrîkirinê min, ez pir hestiyar bûm. Dema hemû hevalan dihizirin ez ê jî bi wan re biçin Dêrsimê, di kêliya dawî de fêhm kirin ez naçim. Ez bûm pê heneka hemû hevalan. Rêberê min, ez her tiştî bidin aliyekî bi rastî jî hestên pir cuda dijim. Ez li ser navê hevalên xwe yên çûn Dêrsimê, qada Bakûr kêfxweş bûm. Veqetîna ji wan ji min re pir zehmet bû. Her çendî min dizanî ez ê bi wan re neçim û ez ê ji wan veqetim jî dîsa dilşkestî û xembar bûm.

Xwezî êdî ez jî ber bi êvarê çûbam. Wext mîna şûrekê ye, ger tu wext qut nekî wê wext te qut bike. Divê ez lez û sivik tevbigirim. Çend roj derbaz bûn min ji gula xwe agahî negirtiye. Rêberê min, dixwazim herî dawî bi wê re baxivim, dixwazim dengê wê bibihîzim, coşa dilê xwe bi wê re parve bikim. Rêberê min, ne ku ji ber xwîşka min e, bi rastî jî ew jinek pir xweşik û milîtaneke. Rêberê min niha bi xatirê we.

13 Adarê 2006

Merheba kulîlka min a mizgînî yê

Di van rojan de çiqas dixwazim tu li gel min bî. Min dixwest van hest û kêliyên bedew ên dijîm bi te re parve bikim, lê dîsa tişteke nabe, bi van ristan jî be dixwazim bi te re parve bikim. Ez pê dihesim ku ez azad bûme û li gor felesefeya dîn bûme firîşte. Ez nû nû bersiva tiştên bi

salane lê digirim û dûv wan dibezim dibînim. Yan min bersiva wan dizanî, bes min nedixist pratîkê, ji ber vê yekê pir caran difetisim û nêzîkatiyên bêhemdê min derdiketin. Şer û nakokiyên min dijiyan ji ber tiştên min dizanin min nedikarî xwe li ser lingên xwe bigirim bû.

Min her tim xeyal dikir û digot; ez ti carî nabim mirovek erzan û ji rêzê. Min bi vê nêrînê jiyan dikir. Bi salane ji bo vê bafirînim, min bi xwe û nêvegê re şerek hundirin jiyan kir. Lê weke tu jî dizanî nebesî û hinek nêzîkatiyên min ên bi lez nedihêlan ez xwe ava bikim. Di encama heyîna min de berhema wê nedîtî û ev bi min re encama mantîqê dev jê berde pêş xist. Lê azweriya min a azadiyê hişt bi min re rastiya bibim jinek şerker, têkoşer, bi rêgez û bi vîn bafire. Ez dihizirim ger di bin siya mantîqê dev jê berde nebûma, teqez ez ê zêdetir pêş ketibam û min ê berê azweriya xwe ya azadiyê tacîdar kiriba. Ya rast ez niha di wî alî de nerihetim. Dibe ev nêzîkatiya min zêde zerar nedabe rêxistinê, lê bi zerar dayîna min re jixwe zerar daye rêxistinê jî. Ji roja min rêxistin nas kirî, li hemberî pergalê nakokiyên min derketin, min biryar da ez ê jiyan zarokên di kolanan de mezin dibin biguherînim û bi rê ketim heta vê keliyê min her tim têkoşîn kir. Di heman demê de ji ber min têkoşîna xwe nedigihand lûtkeyan, her tim xwe tevgav dikir. Ji ber vê yekê jî car caran diketim rewşek mîna bifetisim janên zayînê jiyan dikir. Kulîlka min a evînê, ez dihizirim tiştê hişt ez van êş û janan bijîm çavkaniya xwe hem ji kêmbûna kapasîte û hem jî xwe di rastiya rêxistinê de kûr nekirin digirt.

Tiştên min bi ti kesê re parve nekirine niha bi te re parve dikim. Em li malê jî dostên hev ên herî nêz bûn, vê dostaniya me rohanî da tekoşînê û li vir jî parkirinên me çêbûn. Min ji van parkirinan hêz û moralek mezin girt. Tu dizanî, piştî çend salan min dîsa hewl da meqyajê li xwe bidim. Ya rast ez nabêjim min kir, hevalekê meqyaja min çêkir, min xwe pir cuda hîs kir. Li şûna rûyê min ê xwerû rûyek cuda ketibû şûnê. Vaye jinê wisa li hemberî wê biyanî dikin, ji bo xwe bi zilamekî bide ecibandin an bi kêfa kesekî were bi kiloyan boyê li rûyê xwe didin. Min li malê jî ji meqyajê hez nedikir, min bikarnedanî, dibe ji ber vê be min nedikarî meqyajê li xwe bidim. Ez ê bi çeka pergalê wê tarûmar bikim. Ez ê bi vê

meqyajê pergalê bixapînîm, ji ber vê armanca xwe hewl didim bi awayek baldar rengên wan lihevhatî bikarbînîm.

Tu dizanî giyana min, dema min wêneyê xwe girt hestek kêfxweşiyê pir cuda xwe li dor beden û rihê min aland. Ez ê çawa vê ji te re vebêjim nizamim? Hema mîna wan sivoriyan dema di biharê de xwe ji vî alî baz-didin aliyê din. Ew tevger û zindibûna sivoriyan didin nîşan ka çiqas bi coş û kêfxweşin. Yek jî mîna kanî û robarên biharê yên bi coş diherikin ez jî heman coşê dijîm. Ez îro mîna robarên gur û geş diherikim. Ava robaran axa zuha û qelîşî ji nû ve zindî dike, ez jî ji bo xeyal û hêviyên gelekî ji nû ve jindar bikim ji lêvên terîkê re bibim dilopek av, dilê wan hênîk bikim.

Yek jî tu dizanî min çî hîs kir? Pê dihesim ez ê bi ser bixim. Divê ev çalakiya min zerar nede gele min, Rêberê min û rêxistinê. Tu dizanî ez çî xeyal dikim? Çalakiya min pêk hatiye û encamek pir baş girtiye. Parêzer tekmlê didin Rêberê min û gotinên di kêliyê de ji devê Rêberê min derdikevin mereq dikim. Dê ew gotin di pey min de werin. Ji niha de gotinên Rêberê min, min dixê nav kelecane. Ma bi awayek serkeftî derketina pêşîya wî tiştek ne xweşik e giyana min?

Îro wêneyên me bi hev re girtibûn hatin. Dema min li wêneyan temaş kir hema bi carekê xemgîn bûm. Dema em di bin beteniyê de bûn me bi hev re di wênekêşa ku me dizanî tijiye li pozan digeriya. Ew kêlî çiqas bi ken bû lê ez wê demê pir aciz bûm. Îro pênc hevalan wêneyê min girtin û xwestin ez li pişt wêneyan nivîsê binivîsim, min bi carekê xwe wek artîsan hîs kir, lê ya rast artîsên herî mezin şoreşger in. Şoreşger mirovên bedew û belkêşin. Yên din mirovên ne ji dil û dil xalî ne. Jiyana her şoreşgerekî/ê romanek e. Yê artîs tiştên tîn jiyîn mîna tîn jiyîn hewl didin bijîn, artîs listokvaneke, ew jî dizane ku tê xapandin. Lê şoreşgerî, yê dijî, yê pê dihesê û rola xwe dilîze, pêş dikeve ye. Li kêleka rola şoreşger dilîze ya artîstan nejidil tê dîtin. Bêguman ji bo şoreşger huner avakirin jî pir cuda ye. Lewra li gor min Şehîd Serhed şoreşgerê hunerê yê herî mezin e.

Dixwazim nameyên xwe binivîsim. Nêvengê guncav peyda kirin pir zehmet e. Ger roj her wisa sahî bin ez ê nameyên xwe li erazî binivîsim.

Gerîla pir şiyar e. Ger di destê min de lînûsa metotê bibînîn wê yekser gumanan jê bikin, ez çiqas bizivînim, hewl bidim wan qane bikim jî mîna ji gotinên min bawer bikin wê dîsa di gumankirinê de berdewam bikin. Baş bû min rapora xwe ya fedayîbûnê veşartî nivîsand û da. Tu dizanî, ez niha li ser kevirekî rûniştîme, hewl didim dengê xweza û dilê xwe guhdar bikim. Dilê min ji min re dibêje tu yê ser bixî, di vê serkeftinê de wê hezkirina Mizgîn û hevalên te ya li hemberî te ji bo tu bi ser bixî bibe hêz. Ez jî pir ji te hez dikim giyana min.

Mizgîn giyan, tu jî bi hezkirina min hewl bidî xwe li ser piyan bigirî û xwe xemgîn nekî, mîna her tim dijîm tu yê bijî. Ji ber jixwe ez ê her tim bijîm. Ji bîr neke, di gîrnijîna her zarokê de veşartîme, di nihêrîna zarokan de veşartîme û di nav kêfxweşiya bîranînan de dijîm, jixwe ya girîng jî ev e. Jiyan ji bo min mîna darekê temen dirêj jiyîn nîne. Ji bo min a girîng divê ew veqetînen fîzîkî ji bo nîrxên jiyanê bin û ji bo jiyanê nîrxek avakirine. Ma ne wisa ye giyan min, evîna min?

16 Adarê 2006

Azadî

Eniya min ber bi asîmanan ve bilind dibe

Destên min gerdûnê hembêz dikin

Lingên min, min dibezîne

Ji bo ala serkeftinê bilind bikim

Bi hestên serkeftinê ji cîhanê re dikenim

Dilê min di nava ewran de çip çip lê dide

Di nav dilpakiya asîman de

Rêwiya ber bi bêdawîbûnê ve me

Di herîka min de xeyalên min

Di dilê min de evîna Îmralî

Di dilê min de azadiya gelê min
Bêrîkirin, hesret,
Stranên evîna hevalên xwe
Azweriya wan a ji bo asîmanên şîn
Bi xwe re dibim
Bêdawîbûn jiyana min e
Azadî rihê min e
Yên bin axê fikrên min in

16 Adarê 2006

Merheba şîrîka tenêbûma min Mizgîn giyan

Min du nameyên xwe xilas kirin û niha jî dor hat nameya ez ji bo Rêbertî binivîsim. Ez pir bi keleca im, ez çawa hezkirin, girêdan, evîna xwe pênase û vebêjim nizanim. Gelo wê pênûs û lînûs bibin eynika evîna min? Lê na, ev negengaz e, ma ne wisa ye dosta min a hêja? Lê ez vî dengî ji kûrahiya dilê xwe dibihîsim; Rêbertî livîna dilê keçên egîd, keçên şerker û jinên girêdayî hîs dike, dibihîse. Ev deng aramî û dîlfirêhiyê dide min. Dema gihiştim serkeftinê, strana azadiyê qêr kir wê tu û Rêbertî dengê min bibihîsin. Tu dizanî, ez dixwazim bi awayek serkeftî derkevim pêşberî we. Ez ji xwe re plansaziyên cur be cur dikim û di hemûyan de jî serkeftî derbaz dibim. Bi ser xistin hestek pir cuda ye. Ez ê vê serkeftinê ne xeyalî, veguherînim rastiyê.

Me îro yekîneya Çarçêla bi rê xist. Ji ber wê biçin pratîkê pir kêfxweş bûn. Ji ber ji wan veqetiyam pir hestiyar bûm û min li pişt wan slogana Bijî Serok Apo qêr kir. Sala 2006'an wê bibe sala serkeftin û serfiraziyê. Her roja derbaz dibe ji bo me windahiyeke, ji ber her wexta derbaz dibe temenê Rêbertî didize û diçe. Mirov bi qasî ji mirovan hez dike ew qas dibe mirov. Ez bawerim civakbûn ji hev hezkirinê re dest pê kiriye. Ji bo ez jî ji we hez dikim azad dibim.

Merheba bihar û xunçeya min

Îro dîsa gelê min ê cefakar li kolalan bû hezkirin, azwerî û evîna di dilê xwe de bi aşkireyî qêr kirin, ji rêveberiya KT û DYE' re gotin; Rêber Apo vîna me ya siyasî ye. Bi coşek mezin qêr kirin. Dema min li dîmenan mêze dikir dilê min jî bi we re lêdida, ez jî li vir hevalbendiyê ji sloganên we re dikim. Bihara min a şîrin, cejna te ya Newrozê pîroz be, ez bi hestên xwe yên gihane lûtkeyê û bi germahiya agir we maç dikim.

Îro rojek pir xweş e û gelê me jî vê rojê dixemlîne. Bihara min a şîrin, Newroza sala 1993'an tê bîra te. Em hemû malbat çûbûn û Elîf ji guleyên hatibûn avêtin tirsabû, me kengê behsa Newrozê kiriba wê digot; ez nayê. Leşkerekî bi qundaxa çekê li milê min xistibû û ez li erdê ketibûm. Piştî wê zilamek temen mezin ê welatparêz ez rakirim û dam meşandin. Ez qet pîrozbahiya Newroza sala 1993'an a li Çiftilika Sultan a Stembolê ji bîr nakim. Dema wê rojê û vê rojê tînim beramberî hev di navberê de çiqas cudabûn heye.

Hevala min a hêja Mizgîn, dema gelê Kurd wisa serhildêr li hemberî pargalê disekine kêfa min pir tê. Me jî weke hêza biryargehê bi derfetên xwe Newroz pîroz kir. Hejmarek me pir kêr maye lê tevî wê jî em pîroz dikin. Ji ber jixwe Newroz di dil de tê hîskirin û ev hîs hestan dehf dide û mirovan dixê tevgerê. Me bi hevala Gulistan re li gir gir pê xist û bi sloganên xwe re me girêdana xwe ya bi Rêbertî re dubare nû kir. Hevala Gulistan stranan dibêje, ez jî guhdar dikim. Tu dizanî, ez nizanim stranan bêjim, ji guhdarkirinê pir hez dikim lê nikarim ji ber bikim. Me govenda xwe girt û piştî em çûn me televîzyon guhdar kir. Di vê navberê de bi berdewamî nameyên xwe dinivîsim. Piranî di manga rêveberiyê de dimînin û lêhûrbûn dikim. Tevlî xebatên giştî nabim. Ji ber ez tevlî nabim xwe rihata hîs nakim, xwezî min zû nameyên xwe xilas kiribam û tevlî xebatan bibam. Jixwe ji ber di manga rêveberiyê de dimînim her tim dibim pêhenekên hevalan. Dibêjin; heval te ji bo asta jor amade dikin û henekên xwe li min dikin, ez jî têra xwe bi wan dikenim. Bila ez bibim pê heneka wan, lê bila ez tenê pê nedim hesandin.

Bi qasî ji destê min tê hewl didim bi baldar tevger bigerim Ez coşa xwe bi gotina xwe ya ez ê biçim Dêrsimê dixemilînim û didim nîşan. Gerîla xwedî taybetmediyek pir şiyar e, ez kêmek dihizirim û piştê gotinên xwe dibêjim. Giyana min, ez her tim behsa xwe dikim, bawerim min tu tengav nekirbe. Min pir bêriya te kiriye, min rewşa te pirsî, tu hîn li Xinêrê yî û neçûyî tedawiyê. Dihizirim gelo wê dîsa derfet çêbibe, ez herî dawî bi te re baxivim? Wê çiqas baş bûya. Te bi hezkirin maç dikim.

21 Adarê 2006

Merheba kulîlka min a mizgîniyê

Ez îro westandinekê li ser xwe hîs dikim. Ji min re wisa tê, min hezkirin, girêdan û armanca xwe di nameyan de tam nedaye der. Hestek wisa li gel min ava bû, lewra xwe westayî hîs dikim. Giyana min, peyv nikarin bibin dengê dilê min. Min îro jî hewl da hezkirina xwe ya li hemberî gel bi peyv û hevokan vebêjim. Ka em binêrin tu yê çawa bibinî? Xwezî ew şansê min hebûya min ji te re xwendiba û min nêrînên te jî girtiban. Ez nêrînên te mereq dikim. Lê di wê baweriyê de me wê te ji min xweşîkir anîban ziman. Ji ber tu xwîşka min î van gotinan nabêjim, ji ber tu jin û hevrêyek xweşik î dibêjim. Ger kesek were wan aliyan ez ê ji te re nîşe binivîsim. Ev demek dirêj çêbû min ji te re nîşe nenivîsiye, bawerim tu nahizirî min tu ji bîr kiriya ne wisa? Ez nikarim te ji bîr bikin, ji ber tu mamosteya min a jiyanê yî; şagirt ti caran mamosteyên xwe ji bîr nakin. Ez wan nihêrînên te yên watedar maç dikim.

22 Adarê 2006

Merheba gula min

Her roj kelecaneke cuda dijîm. Jiyan her tim ji min re dibe fêrker û matmayî dihêle. Îro ji kêfxweşiyên çavên min tijî bûn. Nizanim ev şanseke yan rasthatineke. Nikarim bêjin ev rasthatineke, lê ev tiştên te jiyan jî nikarim nav lê bikim. Hevala Melsa ya em bi hev re hatibûn welat, ji bo perwerdê bide hatiye Zagrosê. Ez dubare bi dîtina wê pir kêfxweş bûm. Çi tiştêk seyre ne wisa, em bi hev re derbazî welat bibûn û niha dîsa di rojên xwe yên dawî de bi wê re me. Ew dê perwerdeya

sabotajê bide. Ev hevdîtina watedar ez gelek hestiyar kirim. Çavên min tijî bûn, çend dilop rondik ji çavên min hatin xwarê, lê min rê neda zêde biherikin. Min kêfxweşiya xwe xist dilê xwe. Gula min, bi rastî hevaltî hestek pir cuda ye.

Min ji te re nîşeyek pir lezgîn şand. Min di nîşeyê de direwek biçûk kiriye. Ji ber min direw li te kiriye li min biborîne, min nedikarî di nîşeyê de binivîsim. Yek jî divê pir veşartî were girtin da ku ez bi serkeftî derbaz bibim, ger gelek kes bibihîzin ti wateya xwe namîne. Min rapora xwe ya fedayîtiyê jî veşartî nivîsand û da rêxistinê. Dibe di navbara hevaltî û dostandiyê de veşartîbûn nebe, lê ji bo vê xebatê divê vaşartîbûn hebe, ji ber di vê xalê de em gelek caran winda dikin. Dixwazim tu vê jî bizanî, baweriya min pir bi te heye, ger tu li gel min bûya min ê ji te re gotiba û nîqaş kiriba. Dibe ez xwîşka te bim lê di navbera me de hevaltîyek ji xwînê wêdetir heye. Ji ber bi te re wê hêzê dibînim dikarim rihet bêjim. Ji ber tu ne mirovek mîna hinek mirovên dikevin nav nêzîkatîyên cuda yî. Tu jinek a di kesayetiya xwe de pîvanên milîtaniyê avakiriye, sekna te her tim moral daye min û bûye fêrker. Ji ber min xwîşkek weke te heye pir ser bilind û serfiraz im. Dihizirim gelo ez nameyê bihêlim, lê di aliyê din de jî dibêjim pêwîst nake. Şaş fêm neke, ne ku naxwazim binivîsim, ji ber min di rojnivîsên xwe de nêrînên xwe bi te re parve kirine, lewma dibêjim pêwîst nake.

25 Adarê 2006

Merheba evîna min

Duh ji ber neşiyariyek herî biçûk fûnya di nav me de teqiya, em sê heval birîndar bûn. Birînên me zêde negiranin, lê divê tedawiya wan baş were kirin. Ez ê pir zêde behsa vê qezaya bêwext nekim. Dixwazim qêr bikim. Dîsa heval şehîd ketine. Hem jî behsa çar hevalên şehîd bikin. Di nav hêrsbûnek wisa de me, nalet ji vê bêedaltîya cîhan û serdestiyê re be. Di aliyekî de em şehîdan didin di aliyê din de jî em hevalan ber bi Bakûr ve oxur dikin. Wê îro hevalên biçin Amed û Dêrsimê kom bûn, kelecaneke seyr xwe li giyana min pêçaye. Min wisa hîs kir weke ez ê jî bi wan re biçim. Ez bi hevalên di koma Dêrsimê de ne hevpeymanan çêdi-

kim û dibêjim; albûnên xwe neyînî û ez ê jî çenteyê xwe sivik bigirim, hûn ê jî di rê de çenteyê min rakin.

Hevalên dizanîn ez diçim Dêrsimê kêfxweş bûn. Ez jî kêfxweşim, ji ber ez rihê xwe bi we re rêdîkim. Ez ê bi bedena xwe re bibim xunçeya hêrsa hevalên xwe yên şehîd a di nîvî de mayî. Ez nikarim biçim çiyayên Bakûr a ev çend salin hesreta wê dijîm, ev li gel min xemgîniyek seyr ava dike. Belê, kî dizane dê piştî çend salan çend ji van hevalan bijîn, ji niha ve naxwazim vê bihizirim. Tu hezkirina min bû Dêrsim, nikarim werim gel te. Pir baş li hevalên min binêre, wan biparêze, vê ji bîr neke çiya dostê gerîla ye.

Piştî demek dirêj min agahî ji hevala Arjîn a parçeyek dilê min e girt. Ji min re nîşe nivîsandiye û gotiye ez diçim Botanê. Min hîn nîşe nexwediye, hevalan li biryargehê ji bîr kiriye. Hema dixwazim zû bibe sibe, biçim biryargehê û bêrîkirinên evîna dilê xwe bixwînim. Hevala Arjîn, min pir bêriya te kiriye, xwezî min tu cara dawî bidîta. Êdî em nikarin hev bibînin. Tu dizanî heval, min wêneyê te di rojnivîsa xwe de bi cih kiriye. Li wêneyên te dinêrim û kêma jî be bêrîkirinên xwe sivik dikim. Dizanim çavên te niha li rê ne. Tu dihişî ka wê kengê koma Dêrsimê were û niha tu jî li benda min î. Dizanim te jî bêriya min kiriye, li min biborîne wê hêviya te di dilê te de bimîne. Pir dixwazim te bibînim lê derfet nîne. Tu dizanî her roj dereng dikevim? Çalakiya diviyabû min di meha Kanûnê de pêkanîba, ez ê di vê mehê de pêk bînim. Êdî ev derengmayîn behna min teng dike, tu min fêhm dikî? Di wê baweriyê de me tu min fêhm dikî, ji ber bi rastî tu jinek têkoşer î. Herî dawî te ferzkirina xwe da pejirandin, ez li ser navê te pir kêfxweş bûm. Tu digihî evîna xwe ya Bakûr, li şûna min jî li Botanê bigere. Li şûna min Gabar, Cudî, Garisa û Feraşînê bibîne. Li şûna min dest bide axê û henaseyek kûr bigire.

Êdî tu yê bi hevala Bêrîtan re baş bigerî. Min û hevala Bêrîtan her tim bi hev re xeyal dikir û ji xwe re digot; em ê li Bakûr, Botanê wisa bikin û wisa alîkarî bidin hev. Bi hevalên weke we bedew re jiyîn wê gelek xweş ba. Hevala min Bêrîtan, ji ber min ji te veşartîye tu ji min aciz nabî ne wisa? Te di wateya min bawerî nedayê te de negirtiye dest ne wisa?

Hevala min Arjîn, ger derfet bibînîm ez ê bersiva nîşeya te binivîsim. Li vir naçarim dawî li van rêzîkên xwe bînim. Ez bi hesret û bêrîkirina di dilê xwe de we maç dikim.

26 Adarê 2006

Jiyana nû

Min dilê xwe bi serkeftinê qifil kiriye

Azadiyê dadîqurtînim

Ji evîna Viyanan

Dibim robarek bi coş diherikim

Ji nav dilê biharê

Ez bi te re rê dikevîm di rêwitiya hêviyan de

Min xeyalên xwe di kenê zarokan de çand

Ji bo lêgerîna me ya azadiyê

Heta dawî bimeşe

Di baranên nîsanên de jindar dibe

Jindar dibe jiyana nû

Hest,

Fikra min bi serkeftinê qifil bûye

Dema hêvî

Xeyalên min bi demê re avîsin

Wê dem kenên dîlgirtî jindar bike

Hewar û figanên bê dawî

Qêrînen li hemberî rojê

Wê Roj bi azadî

Di girava Îmralî de vede

27 Adarê 2006

Merheba kulîlka min a mizgîniyê

Her roja derbaz dibe dereng dimînîm. Ji ber ez ji dengê gelê xwe yê gur dibe nabîm awazek, di aliyê wijdanî de nerihetîm. Hema wisa bêdeng bêdeng lê temaşe kirin min qehir dike. Weke gerîlayekê dixwazim alîkariyê bidim gelê xwe, dixwazim di agirê evîna wan de bibim çirûskek. Dixwazim li hemberî guleyên li ser zarokan tîn reşandin bibim bersiv. Divê destên jopan radikin bişkênîm, êdî dixwazim di dilê yên polîtîkayên çareserîya bê Rêbertî dimeşînin de biteqim.

30 Adarê 2006

Merheba kulîlka min a mizgîniyê

Pîştî demek dirêj min ji te agahî girt, yek jî min ji dostên xwe yên hêja nîşe girt. Ji ber min ji we agahî girt gelek kêfxweş bûm. We hemûyan jî gotiye, em dixwazin te bibînin lê derfet dest nade vê. Dizanim derfet dest nade, min jî pir dixwest herî dawî we hemûyan bibînim. Dostên min, ez nikarim we bibînim, lê ez ê ji we re nîşe binivîsim û ji ber min bi we daye bawerkirin ez ê biçim Dêrsimê lêborînê ji we dixwazim.

Mizgîn giyan, roja nîşeya te ghişt destê min, min jî ji te re nîşe nivîsand. Te pir xwestiye min bibînî û ji bo vê gelek ferzkirîye. Bila nedîtina min di dilê te de nemîne, ya girîng ne hevîdîtina fîzîkî ye. Jixwe em di rih, fikir û dil de her tim bi hev re ne û ya watedar jî ev biheverbûne. Ez bi te re ber bi evîna xwe ve rêwîtiyê dikim, ez ê bi moralê min ji te girtî bi ser bixim.

Ez duh çûm serdana yekîneya xweser û min xwest herî dawî wan bibînim. Min ken, qêr û wateya di çavên wan de di dilê xwe de neqîş kir. Ji heval, çiya veqetîn pir zehmet e, ger ev erk neba ez ji çiyên vene-diqetiyam. Bi awayek pir veşartî min dengê dilê wan dizî. Bi awayek vaşartî min germaya bedena wan dizî. Bi hezkirina ji kûraniya dilê xwe

ew hembêz kirin û min herî dawî ew rûyê wan yê paqij û narîn ramûsand. Li min biborînin ji ber min vaşartî xatir ji we xwest. Di veqetînê de min hezar nifir ji dijmin û emperyalîzme re kirin. Di rûyê wan jinan de mirov êş dibine.

17 Nîsanê 2006

Merheba dilê min yê bi dilopên baranê dagirtî

Ez îro xwe bi tenê hîs dikim, hestên seyr û tevlîhev dijim. Duh min bi awayek vaşartî ji hemû hevalan xatirê xwe xwest. Bê ku hevalan pê bidim hesandin, min bi ramûsandina xatirxwestinê dilê wan mac kir, min herî dawî li heval û çiyayên li pişt xwe hiştî mêzand. Mîna zarokê bi coş bûm. Êdî dema hatinê hatibû û êdî ez ê ber bi bêrî û evîna xwe ya bi mehan li bendê bûm bi rê ketibam. Heta min çeqoya xwe ya makêtê jî ji hevalek xort re hişt. Hevekeke pir nîrx didimê. Ji ber neçûm serdana manga çapemeniyê, min nîşeyek nivîskî hişt.

Ez bi moralek mezin ber bi hêviyan ve bi rê ketim û dîsa kêfxweşiya min di gewriya min de ma. Dijminê nalet dîsa derketiye operasyonê, ji ber vê yekê milîsên hatiba ez biribam nayê. Bi vê agahiya nalet hevalan dîsa ez şandim biryargehê. Dibe pevçûnek dem kurt çêbibe lê ez pir tengav kirim. Ez nabêjim hêviyên min vemirandin lê bandor li ser moralê min kir. Ew qas bi kelecana bûm. Ez dibim mijara pê henekên hevalên li biryargehê jî. Ez bi vê rewşa xwe hevalan didim kenandin, lê hundirê min xwe dixwe û dikemîre. Êdî hedara min nemaye. Hema dixwazim zû pêk bînim. Êdî dixwazim hêrsa di dilê min de kombûye veriştinim. Yan wê ev hêrs min felç bike.

21 Nîsanê 2006

Dost

Her çendî veqetîn bi qasî mirinê zor be jî

Ez ê ji bo hêviyên mezin êşên veqetînê bijîm

Dema jidayîkbûm
Ji şax û welatê xwe
Mîna kulîlkekê hatim hilkirin
Ji dayîka xwedavend hatim biyanîkirin
Di nava dîwarên beton de
Bê kok tertûbelav bûm
Dema jidayîk bûm
Tovên veqetînê di dilê gelê min de reşandin
Veqetîn ji xemginiyan re avis bû
Ez ê bi dilê xwe yê şorşergerî
Veqetînan bikim mebesta hevgehînan
Ji mirinê jiyana nû bafirînim
Bila gule bibarin
Bila veqetîn hebin
Êdî ev dil guh nade van
Her çendî veqetîna ji dostaniyê jan bide dilê min
Lê
Jiyanek ji hezkirinê
Diyarî dost
Nifşê nû dikim
Di okyanûsa hezkirinê de melevaniyê dikim
Bi pêlan re şer dikim
Kêliyêk jî be

Da ku hezkirina xwe ji îmrâlî re biqêrim

Dosta min ger veqetîn zehmet be jî

Ji bîr neke

Tu nehatî jibîrkin

Tu yê neyê jibîrkin

Tu dara hezkirinê ya di dilê min de mezin dibe

Ji bo hêviyên mezin êşên dostaniyê berçav digirim

Jiyanek ji hezkirin,

Ji azadiyê diyarî te dikim

Dostaniya xwe bi azadiyê tacîdar dikim

Her tim bi te re dimeşim dost

22 Nîsanê 2006

Merheba zarokê azad ê di dilê min de

Ez demjimêrên rêwitiya xwe ya Zagrosê yên herî dawî dijîm. Bi rastî ji heval, ji çiyayên azad, dostên xwe yên ji giyana xwe zêdetir ji wan hez dikim veqetîn pir zehmet û êşek pir mezine. Bi hêza min ji Rêbertî girtî hewl didim van zehmetiyan derbaz bikim. Yek jî weke bedela hezkirina min, bi kenekî xwe van zehmetiyan derbaz dikim. Bêguman ez ê hesabê van êşan ji KT û emperyalîzma bi nalet bixwazim. Niha ev êşên dijîm, li kêleka êşên gel û Rêbertiya min dikişîne misqalek jî nîne.

Em duh ji hevalan veqetiyan. Rojên min li Zagrosê jiyankirin di her warî de dagirtî bûn. Di her gavek xwe de ji Zagrosê dûr dikevim. Em riya xwe berdewam dikin, rêzanên me hevalê Cudî û Sinan, hevalên pir fedakar in. Bi wan re rêwîtiyek wisa kirin ji bo min pir watedar e. Ger derfetên xwezayê me tengav bikin jî, dîlnizmî û rêzdaniya van herdu hevalên me yên rêzan, hemû zehmetiyan ji bîra mirov dibe. Destê min pir zehmet pênuşê digire. Hewa pir sar e û di aliyekê de jî berf dibare.

Li erdê çend metre berf heye, me jî mîna çûkan xwe xistiye bin kevirekî, em hewl didin xwe ji berfê biparêzin, lê em nikarin xwe ji sermayê biparêzin. Herî dawî min di vê rêwîtiyê de serma û erdnîgariya Garêya Bakûr dît. Em ê piştî kêliyêk din bi rê bikevin, ez herî dawî di nav berfê de li Zagrosê dinêrim. Ji bo hêviyên mezin divê em daxwazên xwe yê takekesî feda bikin, ez jî daxwazên xwe yên takekesî ji bo azadiya gelê xwe û cîhanek xweşik diyarî zarokan bikim feda dikim.

Her çendî niha recifandina hevalê Sînan weke derûnî li ser min bandor bike jî, hewl didim guh nedimê û berdewam dinivîsim. Min çûna xwe ya Zagrosê wek gava destpêkê û cihê ezmûnê girtibû dest. Niha min kêmek ji van ezmûnan derbaz kirine, lê ezmûna herî mezin ji vir şûn de dest pê dike. Divê bi awayek şahane ji hêvî û bendewariyên hevalan re bibim bersiv.

Zogros, ez nabêjim bi xatirê te, ji ber te jî bi xwe re dibim û diçim. Ez bi te re hezkirinên hevalên xwe yê bedew dibim warê bêdawibûnê. Çiyayên bedew, min bi we re tama azadî, hezkirin, evîn û dostaniyê girt. Min di vî baxçê azadiyê de bîranînên pir xweşik jiyan kir. Hûn di rêwîtiya azadiyê de ji min re bûn fêrker. Min xatirê xwe ji hinek hevalan nexwest, min ji wan re negot, divê ev weke bêbawerî neyê fêmkirin, ji bo bi ser bixim divê min ev kiriba. Yan bawer bikin, hevalên min ên jin û xort, min dixwest herî dawî we hembêz bikim. Berf niha rawestayê û divê em êdî bi rê bikevin, neçarim navber bidimê.

30 Nîsanê 2006

Dubare merheba rojnivîsa min

Piştî meşa 3-4 seetan şûnde em gihiştin Deştê Xanê. Hema hevalek çû keşf kir û piştî wê me agirek biçûk pêxist. Me bi vî agirê biçûk goreyên xwe zuha kirin. Piştî sermayê duh şev ev agir û tava car caran xwe nîşa me dide pir baş bû. Ez qet nedihizirîm ez ê di van rojên dawî de bîranînên ew qas romantîk bijîm. Vaye gerîlabûn jî ev e.

Ji vir şûn de êdî dev ji navê Marya berdidim. Ez navê xwe ji van çiyên û yek jî ji dilê hevalên xwe re dihêlim. Hewl didim fêrî navê xwe yê nû

bibim, lê navek pir balkêşe, naveke wateya wê nizanim. Ka em binêrin dê ev nav li gor taybetmendiyên min be?

Bê ku li hevalên li biryargeh û li cihên din bifikirim xwe nagirim. Ji niha ve min pir bêriya wan kiriye, yek jî dema ji hevalê Cudî û Sînan veqetîm wê hîn nebaştir bibe. Îşev ez ê di warek nû de bi tenê bim. Wê îro bajarê min bike mêvan, ez ê cara yekem van deran bibînim. Ji jiyana û bîranînên xwe yê gerîla derbazî jiyana bajaran bûyî wê pir zehmet be. Divê ji niha ve di her warî de zehmetî û neyênîyan hesab bikim û li ser ziraviyên wê yê herî biçûk bihizirim. Liv û tevgerek min a şaş wê xebatên min û keda hevalan vala derbixe. Divê di vê erka xwe de qet rê nedim kêmasiyan.

Pêdiviyên şoreşê berî daxwaz û azweriyên min tînin û ez bi vê feraseta felsefê re jiyam. Di vê wateyê de li pêşîya vê erka min ti astengî nînin. Lêhûrbûna min di vê pêvajoyê de kirî nehişt ez di dilê xwe de tiştek cuda biçînim. Ya herî rast jî ev e. Ger hezkirin zerar û êş bide mirovên tu jê hez dikî wê demê bila ew hezkirin nebe, ger hebe jî bila neyê go-tin. Bila di dil de veşartî bimîne. Di wê baweriyê de me hezkirina herî rast jî ev e. Ne raste mirov, mirovekê bike malê xwe, ez her tim ji vê reviyam. Ne bila hevalek min bike malê xwe, ne jî ez hevalekî bikim malê xwe. Ger hezkirinek hebe bila di xwezaya xwe de bê ku were qirêjkirin bimîne. Di nav têkoşîna me de hinek kesayetên hundirê hezkirî xalî kirine. Her tim berteka min ji vê re çêbû. Divê em hezkirî bi paşverûtiyên xwe re qirêj nekin û li ser hezkirî sih çênekin. Min ti carî nexwestîye zerar bibim mirovên li hemberî xwe. Ev veqetîna dibe di wateya hestiyarî de hevalên min bandor bike lê rastî ye, ji ber ez di wê zanebûnê de me ka çi dikim. Ez di wê baweriyê de me wê mirovên jê hez dikim û hevalên min ên nîrx didim wan jî bi zanabûnê bibim. Kurt be jî min xwest di derbarê vê xalê de hinek tiştan derbixim zelaliyê.

Ji we hemûyan pir hez dikim. Ez ê bi hezkirîna xwe ya li hemberî we jî bi ser bixim. Dubare we bi agirê dilê xwe hembêz dikim û maç dikim. Lez dikim ji ber em ê dîsa bi rê bikevin. Ez ê piştî çend demjimêrên din xatirê xwe ji jiyana xwe ya Zagrosê bixwazim.

30 Nîsanê 2006

DUBARA VEGERA WELAT

Ji evînek nîvco mayî

Ber bi rêwiya hêviyê ve...

Ji Gîtar, dar, keskesor, robar

Ji evînek nîvco mayî
Ber bi rêwitiya hêviyê ve...

Merheba hêvî û xeyalên li ser avê melevanî dîkin

Dixwazim bi îske îsk bigirîm. Dixwazim bazohên di dilê xwe de dijîm bi rondikên çavên xwe xalî bikim. Piştî mirov rih bi hêvî û xeyalan nede qazanckirin, di nav valatîyê de çi wateya henase girtinê heye. Tiştê mirov berz, xweşik dike ma ne xeyal û hêvî ne? Ma Mirovê Zana jî nabêje; min ti carî xiyamet li xeyalên xwe yên zarokatîyê nekir. Belê, çima armanc, xeyal û hedefa datînin pêşîya mirov pêk nayîne. Ez naxwazim tabloyek reşbîn xêz bikim, min jî dixwest mîna wênesazekî tabloyek xweşik xêz bikim. Dixwazim bi beden û xwîna xwe re binivîsim. Ji ber min ev jiyan kir, bi coş bûm û bi coşa xwe re dilxweş bûm. Lê nebû, têrê nekir. Jixwe ya hêla ez ji her tiştî tam bigirim armanc, xeyal û hêviyên min bûn.

Xeyalên pêk neyên wê di tarîtiyê de mîna xweliyê li ber hewa belav bibe. Bi jana dilê xwe, bi westandina rihê xwe û bi bêçaretî û reşbîna fikra xwe re neçarim rastiya heyî û tabloya dilê xwe xêz bikim. Belê, ez ê ji vir şûn de çi bikim? Ez ê çawa bikim? Ka min herî dawî li van çîyan temaşe kiribû, ka min hêviya havalan û ronahiya di çavên wan de girtibû. Ka min ê bi wênesaziya xwe re girêdana xwe nîşa Mirovê Zana bida. Ma hemû jî vala bûn? Ma qey divê min macera bijîba. Belê, niha dîsa di nav jiyanek ji rêzê de me. Gelo min xeyalên ji xwe mezintir ki-

ribûn? Qaşo min ê ber bi dawîbûnê ve baz bida û ez ê di nav şînahiyên de hatibam xemîlandin. Ka ez ê bigiham Zilan, Sema û Viyanan, min ê ala azadiyê bilind kiriba. Xeyal û hêvî hemû vala derketin. Ez dikarim hestên min jiyane weke min ne jiyane hesab bikim? Wê di hest, dil, fikra min de jî Viyan û Lewend bijîba. Lê niha ez li vir im, hûn dizanin çiqas bi qehre? Hûn, şevên bi îske îşk giriyame dizanin? Hûn dizananin, dema ez li ser rîyan dimeşiyam dil û mejiyê min bi hezaran mirovan re bû? Hûn dizanin, ji bo bi ser bixim min kîjan pêl daqurtandine?

Belê, xemgîn im. Hûn çiqas bêjin em ji te fêm dikin, hûn fêm nakin, tiştên min jiyane fêm nakin. Ez ê ji vir şûn de çi bikim? Ji zinaran ketim valetiyekê. Baskên min şkestin, di valatiyê de diperpitim. Belê, ti gotin nikarin tiştên min di van 10 mehan de jiyane vebêjin û pênasê bikin. Tenê ez dizanim ka min çi jîyan kir. Min dixwest di lênûsa xweşik a Ronahî daye min tiştên bedew tê de binivîsim, lê nikarim ji tiştên min di cîhana xwe ya hundirin de jiyane birevim.

28 Cotmehê 2006

Vegotin zehmet e

Çawa mirov nikare wextê tê windakirin paşve vegeirîne, vegotina tiştên mirov dijî jî pir zehmet e. Niha vegotina lêhûrbûna xwe ya çar mehan û maceraya xwe ya pênc meheyan a li Stembolê pir zehmet e. Ji ber gotin ne rihê tiştên min jîyan e. Ev hefteyek çêbû hatime gel hevalan, ev hefteyeke ji bo çiya û hevalan bibînim digirim. Hemû tiştên min bêriya wan kirin bêhn dikim û tam dikim. Min ew qas bêriya birîqîna di çavên hevalan de kiribû nikarim pênasê bikim. Gerîla weke her carê hîn bi moral, zindîbûn, dilgermbûn, sadebûn û hevaltiya xwe taze û zindî digire. Xwezî derfeta her mirovekê heba gerîla dîtiba û gerîlabûn bijîba. Gerîlabûn pir cuda ye. Her tim li hevalan dinêrim di her tiştên dikin de dibînim min hinek tişt jiyane. Her tim vê pirsê ji xwe pirs dikim? Gelo ez ê weke van hevalan zindî bimînim? Ez ê vegeirim wê coşa xwe ya berê?

Ew hêza min heye? Ev pirsên min hîn bê bersivin. Ev tiştên min jiyane wê di kesayetiya min de weke şopekê bimînin. Tiştên min jiyane ez nikarim di xeyal, fikir û dilê xwe de mîna min nejiyane bihesibînim, nikarim ji rêzê nêz bibim. Çawa dema min ev biryar girt bi coş û kêfxweş bûm, niha jî ez ê vê êşê bikişînim û dikişînim jî. Lewra dilê min şkestiye, bi xeyalên şkestî nêzî jiyane dibim.

Rêberê min, dibe tu ji vê rewşa dijîm aciz bibî lê ne di destê min de ye, ez vê weke bêçaretîyekê nanirxînim. Rêberê min, min xwest bedana xwe bixim mûm û wê hûcreya sar germ bikim. Dihizirim, ew hûcreya sar germkirin û ronî kirin mafê min ê herî xwazayî ye. Ji ber xeyalên min pêk nehatin xwe pir nebaş hîs dikim. Yek jî wisa dihizirim, tiştên min jiyane, hest û fikrên min ên di derbarê we de û dîsa nameya min ji bo we nivîsandî mîna hemû wek gotinên vala bûn. Her gotina di pratîkê de pêknayê, fikir û hestên bê wateye û her yek ji wan mîna girêkên korin. Rêberê min, tenê tişta min aram dike, min her tim di rih û hestên xwe de ew kêliya ez ê çalakiya fedayî bikim jîyan kir, kêliyêk jî be ji armanca xwe dûr neketim. Min ti carî nehişt navberek herî biçûk jî bikeve navbera hezkirina min a li hemberî we û girêdana min a bi hevalên min re. Min nêzîkatiyên hevalên kêliya bihîstibûn jî di dilê xwe de hîs kir û jîyan kir. Rêberê min, nikarim vebêjim, min ew qas xwe kêfxweş û aram hîs kir ku ez ê destê dirêjî we dibin bişkênim. Min xwe azad hîs kir, bergeha min a li hemberî jîyan, mirov û xwezayê jî pir cuda bibû. Kêliya min a li kêleka zinaran xwe bi bask kiriba û firîbam tevgera xwîna min hat sekiandin. Nehêlan bifirim, dubare hatim destpêkê. Jîyan bi hemû leza xwe dimeşe, têkoşîn bi hemû germbûna xwe ve dimeşe. Min jî qebûl kir dubare vegerim qada gerîla, lê ev tiştên min jiyane ji min re wisa tê weke ji sifrê dest pê dikim. Dibe her tiştê min weke fîzîkî li pişt xwe hiştî weke xwe mane, tenê ez di serdemên cuda re derbaz bûm. Li gor gelek dangan divê ji cihê min hiştiye dest pê bikim, lê wê hêzê di xwe de nabînim.

Rêberê min, ji vê rewşa xwe dibizdim, ev bizdandin wê min ber bi ku derê ve bibe û bibe kîjan bîra kûr a bê binî. Gelo ez ê bikarim li hemberî vê hêza şerkirinê ava bikim? Min pir dixwest bi hevaleke pêvajoyên weke min jiyane nîqaş bikim! Dibe wê demê min ji xwe re riyek derke-

tinê dîtiba û ji vê dilşikestinê rizgar bibam. Nîqaşên min bi hevalan re çêdibin, lê her tim sergirtî dimînin, danakevim kûraniya wê, bendewariya min a daketina kûraniya wê jî xetayek e. Ger min jî ev pêvajoya jiyan nekiriba, di şûna min de hevalek din heba, wê min jî ew fêma nekiriba û min ê bi axaftinê giştî re derbaz kiriba. Wate didim hevalan. Min duh rojnivîsa xwe ya kevin ji hevalan girt û ketim nav dudiliya ka vekim an na. Herî dawî min wêrekiya bixwînîm kom kir û min xwend, di aliyek din de rondikên çavên min hatin xwarê. Ji ber min ê carek din ev gotin nexwediban, min wisa dawî lê anîbû û bi wî rengî ji rojnivîsa xwe veqetî bûm.

4 Cotmehê 2006

Tenêbûn şevên tarî yên mirovan e

Bi çêbûna vesaziyê re niha li biryargehê me. Mayîna li vir min tengav dike, ya rast pirsgirêk ne ev dere, ji ber hîn nizamî ka çawa tevî jiyanê bibim. Xwe pir bê hêz hîs dikim. Min şevê din pir dixwest hevala Mizgîn li gel min be. Ez li dosteke ku bikarim rihet pê re baxivim digeriyam, bi dilê xwe min banî wan kir. Ger hevala Berçem li gel min ba, dibe wê baştir ez fêma kiribam. Dibe me bi hev re riyek çareseriyê dîtiba. Şev ew qas dirêj kir, ji min re wisa hat weke qet nabe sihar. Dema sipêdê rabûm çavên min werimîbûn û dilê min parçe parçe bibû. Ev hestên dijîm dibe ji hinekan re çewt werin. Min weke din xwest ji bo pêşerojek xweşik a herî girîng ji bo azadiya Rêbertî şehîd bikevim. Ji bo min şehîdbûn wê ji nû ve bi azad jiyankirin ba, lê mixabin niha dijîm. Bi hestên şkestî û hilweşiyayî di nav fitloneka jiyanî nizamî çî bikim de dijîm. Ji ber ev îdea min pêk nehat, nikarim di xwe de hêza xeyalên nû ava bikim. Dîsa ev mekan bi tarîtiyê tê dorpêçkirin û min jî dibe cihên dilê min ên tarî.

Sibe 9'ê Cotmehê ye, ango salvegera wê roja bi nalet a komploya li ser Rêbertî pêkanîne. Niha wê her kes dest pê bike li ser vê komployê bifikire û gelek mirov jî hewl didin, lê ti kes weke Rêbertî êşa vê roja bi nalet nakişîne. Rêberê min, wê wêrekiyê di xwe de nabînim hestên xwe yên li hemberî we bînim ziman, ji ber gotinê jiyanê ava nekin vala ne.

Merheba Ronahî

Min gelek bêriya te û ferdên malbatê kiriye, pir caran wan bîranînên me bi hev re jiyane dihizirim. Aliyê rêwîtiya min a Stembolê ya herî xweş jî naskirina we û ew germbûna we ya jidil hîskirin bû. Kî dizane ka niha hûn çi dikin? Ji bo navberdayînê hîn çend seet hene, dibe weke mîna gelek şevan bê xewî û li ser mekînê dihinijî. Min şevê din dîsa hûn di xewna xwe de dîtin. Ez pir mereqa dayîka te Leyla jî dikim, gelo ji nexweşxanê derket? Hêvîdarim rewşa we baş be.

Piştî demek dirêj şûnd îro xwarinpêj im. Dibe li wir jî min pir caran xwarin çêdikir. Lê li vir bûna xwerinpêj pir cuda ye, yek jî ji bo min pir cuda ye. Ew roja me di firinê de nan çêkirî tê bîra te? Min bîranînek xwe ya dema di nav gerîla de xwaripêj bûm ji we re vegotibû. Min ji we re min xwarin çawa çêkiribû û piştî wê jî min ceza girtibû vegotibû. Tam kêliya min ev bîranîna xwe parve dikir, ger şaş nebim li ber çavên me di firinê de nan dişewitî û me jî bêhna wê nedigirt. Nebêje, bêhna şewatê li ser taxê ketibû. Dayê ji derve bêhnê digire û tê li derî dide. Me dîsa fêhm nekiribû û dema me ferq kir nan mîna tiriye reş reş bûye. Me ji yê digotin; ev nan çima ev qas şewitiye, digot; em ji nanê şewitî pir hez dikin ji ber wê me ev qas sor kiriye. Lê ji ber tiştên me digotin me bi xwe jê bawer nedikir, me xwe dida dest.

Vaye îro dîsa xwarinpêj im û bîranînên min zindî bûn, ji bo neşewitînim hewl didim pir baldar nêz bibim. Di wê baweriyê de me tu kengî rastî bêhnek şewatê werî wê ew nanê me şewitandî were bîra te. Weke mîna niha hatî bîra min. Min bihîst tu yê werî, bi vê agahiyê pir kêfxweş bûm. Dubare dîtina te û yek jî di nêvgena gerîla de ez pir kêfxweş kirim. Dixwazim te di van çiyayên bi heybet de bigerînim.

Merheba kufîlka min a hezkirinê

Min pir bêriya te kiriye û piştî ev pêvajoya min jiyan kirî şûnde gelekî dixwazim te bibînim. Pir dixwazim bi te re parve bikim û germahiya di

dilê te de hîs bikim. Xwezî derfet heba min te dîtiba. Ez ji te re nabêjim, min ber bi hêviyê ve rêwîti kir. Divê ez vê biryara pîroz a min di jiyana xwe de daye bi te re parve bikim. Me ti carî tiştê ji hev neveşart, ez vê jî nikarim ji te veşêrim. Bawer bike ku lîka min a hezkirinê, dema ev pêkhatiba min dixwest tu bibîhîzî, dê wê demê hîn watedartir ba. Lewra tiştên niha ji te re vebêjim û parve bikim tesîr, hest û xeyaleke. Keştiyek li pişt hatî hiştin û xeyalên terîqîne. Ji ber vê pir dixwazim te bibînim. Dixwazim zehmetiyên xwe parve bikim. Li xwe pir baş binêre evîna min.

9 Cotmehê 2006

Çarçêla min

Çarçêla min, tu dilê Zagrosê yî. Zagros bi te xweşik dibe, bi te re jîndar dibe. Çarçêla min, tu taca serê Zagrosê yî. Her kes ji bo vê tacê bixe serê xwe bi hev re dikevin pêşbaziye. Yên lewaz taca te dixin serê xwe û bi hêz dibin, kirêt bedew dibin. Tu mirovan ber bi zelalî û xwerûbûnê ve dibî, di robarê hezkirinê de jiyanê fêrî wan dikî. Bi fêrbûna te re hevaltî zêdetir kûr dibe û vediguhere hezkirinek watedar. Çarçêla min, tu ji bo min lêgerîna jiyanê ya jênegerî. Te nêrîna min li hemberî jiyan, ked û hevaltîyê zêdetir watedar kir. Min îsal bêhn li axa te nekir. Min ji wan avên te yê zelal venexwar, sermaye berfê di bedena xwe de hîs nekir. Li min biborîne Çarçêla min, dema min îro li wêneyan nêrî, kêmek mabû bigrim. Di maceraya xwe ya Stembolê de dema min pirs deryayan dikir, bêdawîbûna deryayê dihizirim, her tim golên te dihatin bîra min û yek jî li wan mekanên xweş ên min bîranînên xweş derbaz kirin dihizirim.

Îro hevalekê ji gel te, ji wan baxçeyên te yê xweşik gulek zer û şîn da min. Ev jî rasthatinek e, li ser rûpela dinivîsim jî gulên zer hene. Min her dem mereq dikir û digot; çima ev qas gulên te yên zer hene ji xwe pirs dikir. Ez her tim dihizirî, gelo remza xemgînî û veqetînê ye, yan jî pêna-seya êşên em dijîn e. Dibe tenê min bi tiştên neyênî ew rengên zer ên xwezayê nixandine, ji ber zer di heman demê de ronahiya bereketê ye. Rengê hinek kesên din e, rengê di bin tirêjên rojê de têdighije ye, rengê ronahiya rojê ye. Hinek kesên din di bin girnîjînên rojê yên zer de

têdighin û her sibê bi rojê re dest bi jiyanê dikin. Roj dibe strana me ya evînê, em gerîla jî dibin dost û siya wê. Em di bin siyan de xwe diveşêrin ji bo şefeqên nû hembêz bikin. Ji bo dengê strana rojê bilind bikin.

Roj ji aliyê rojhilat ve bilind dibe û ronî dide her deverê. Em şervanên bawerî û azadiyê jî, me li ser van axan tove hêvî, hezkirin, azadî û zanabûnê çand. Wê robarê jiyanê ji van waran biherike. Ji bo her kes kulmek av ji vî robarî vexwe dê bi hev re bikevin pêşbaziye, wê bedewiya welat û çiyayên me keşf bikin, wê demê Çarçêla min, ez nahêlim destdirêjî li ser te bikin. Tu yê di xwezaya xwe de bimînî. Tu dizanî, yek jî min ji Gola Wanê pir hez kir, ew jî wekî te xweşik bû.

10 Cotmahê 2006

Rast beşdarbûn; tê wateya zayîn û bişkivandina xunçeyek nû

Şerê hundirîn ê min daye û di dawiyê de encama min jê dest xistî ev bû, bêguman min hîn tam encam negirtiye. Ji bo encamek rast jî wext pêwîst e. Ez di nav nêvenga biryargehê de dimînin, gelek heval ji bo demek kurt li vir dimînin. Hêza biryargehê ya kevin guheriye û rûyên nû hatine. Bi qasî min şopandiye rêbaz û danûstandinên kesayet û felsefa min li hev nake hene. Mirovên hewl didin bi rêbaz û danûstandinên herêmî û çînî diyalog pêş bixin hene. Yek ji van rêbazên peywendîyan naecibînim, ji ber vê tercih dikim dûr bikevim.

Asta peywendîya min a bi giştî re dê di nav hinek sînorên diyar de be, ez ê çalak tevî xebatên pratîkê bibim, lê di asta peywendîya min a ta-kekesî de bi xwe re sînordar mayîn hîn rastir dibînim. Di nav nêvenga biryargehê de her tim li şehîd Zîlan digirim. Min ti carî texmîn nekiribû dê wisa zû şehîd bikeve. Di kêliyên xeyalên şehadetbûna xwe dikir û amadekariyên wê dikir de, şehîd ketina hevala Zîlan pir zora min çû. Gelek hevalên mîna Zîlan li vir hene lê dîsa di nav zeryaya hestan de rengek hevala Zîlan ê cuda hebû.

Bi livandînek herî biçûk re lêgerînên nû dest pê dikin

Ev çend roj çêbûn gihiştîme warê bêrîkirinê. Lê hîn tiştên min jiyane derbaz nekirine û zehmetîyan dijîm. Rojane dinivîsim, li hemû dibista-

nan geriyam, hevalên ev demek dirêj bû min nedîtibûn dîtîn. Dubare heval dîtîn bi rastî pir xweş e û pir kêfxweş bûm, lê min nedixwest bi vî rengî bibînim. Piştî min serkeftin bi dest xistiba, ber bi bêdawîbûnê ve bi bask bibam û firîban şûnde, dixwest van mirovên xweşik bibînim.

Ya girîng ne hevgîhîna fîzîkî ye, ya girîng ew e di dilê min de ew qet nedîtine bi çalakî, sekin, bawerî û hewla xwe ya azadiyê xwe gihandina wan bû. Hevalan dibînim, hewl didim bi wan re tevbigerim, lê bi giştî nekirim xwe tevî wan bikim. Xwe bi tenê hîs dikim, di aliyekî de daxwaza tenêbûnê dikim, dema bi tenê jî bim ji tenêbûna xwe ditirsim, ango du tiştên balkêş dijîm.

Ez li asta hevalan a nîqaş û rojevên wan dinêrim. Hewl didim aliyê hatine guhertin keşf bikim. Beşek heval di nav jiyana rojane de ne, ev rewş li gel hinekan bûye fêrbûnek. Li kêleka vê jî hevalên xweşik ên xwedî ûtopyyên bi hêz hene. Mirovên di paşverûtiyên xwe de ferz dîkin sih dixin ser têkoşîna me û zerar didinê. Gelê me yê hêja jî bi awayek ew qas çarçar li hemû gerîlayan dinêre, weke şoreşgerek li hemberî vê rastiyê şerm dikim. Divê ez bi vî rengî nebim, divê xwe bi aliyek stêrkê ve bigirim û rabim ser piyan. Dibe niha gelek tişt dubare û ji rêzê werin, lê ji bo xwe kom bikim divê êdî ji cihekî dest pê bikim, an wê ev rewş min ber bi tenêbûnê cuda ve biçe.

Heval jî bi min re nîqaş dîkin. Hewl didin bi min re bibin alîkar. Di derheqê biryara hatî guhertin de hewl didin pêvajoyê bi min bidin fêmkirin. Di encama van nîqaşan de min ev tişt dîtîn: Her tişt ji min û hewldana min re dimîne. Ger ev tevizandin veguhere tarzêkî dê xeter be û li ser biryara min a azadiyê jî bibe sîber. Bêrêziyek wisa li xeyalên xwe nakim û divê nekim. Ger hewl bidim di penceryek cuda de lê binêrim dibe wê demê baştir fêm bikim û ez ê aliyê divê ji xwe serfiraz jî bibim bibînim.

Bi nêrandinek îdalîst re girtina dest dê nerast be, di heman demê de di aliyê neyênî de jî girtina dest rast nabe. Wê demê ger min çalakî pêkanîba dê wateya xwe dîtiba. Lê piştî guherîna pêvajoyê dê çalakiyek wisa xizmet ji armanc û ûtopyyên min re nekiriba. Nefret lê were, çima ew pêdivî zû pê re negihandin? Sedema wê dipirsim û dîsa dijmin

derdikeve pêşiya min, lê dihizirim xetayên me jî hene. Min dikariya zelal bikim ka pêdivî gihiştin cihê xwe yan na, piştîre çûbam. Tenê bi gotina min rêkir, niha gihiştine, nebese.

Dihizirim ji vir û pê de ezmûnek zehmetir heye. Divê vê ezmûnê derbaz bikim. Divê ez di nav lêgerîna xeyal û hêviyê de di jiyânê de pêk bînim de bim. Bi vî rengî kêr jî be ez ê ji jiyânê tam bigirim û egerek min a jiyânê hebe. Bêguman derbazkirina van zehmetiyan bes nebe û dê ev zehmetî her tim di quncikek dilê min de bimîne. Ger carek din pêwîst bike, bi van derfetên rêxistinê dayîn min jî be, ez ê xwe dubare ava bikim, hêviyên xwe mezin bikin û ji siberojê re bêjim merheba.

Piştî çend rojan dîsa li biryargehê me. Hemû hevalan amedekariyên xwe yên wergehê pêkanîne. Qaşo ez jî endama biryargehê me, lê tevî ti xebatan nebûm an jî tevî nebim. Ya rast min dixwest tevî bibim û bi wan re kar bikim. Li vir hevalên pir xweş hene, lê peywendî û serweriya rêxistinê lewaz tê dîtin. Di nêvengê wiha de mirov xwe rihet nabîne û nikare bibe. Ka em lê binêrin dê çi bibe, ya rast ev nêveng min tengav dike û naxwazim li vir bimînim. Divê wan bikişînim rastiye. Piştî çend roj din şûnde ez ê bikevin rêwîtiyekê, bê sebir li benda wê keliyê me. Vê carê wê kêmek dirêj be. Ev demek pir dirêj çêbû min havala xwe Mizgîn nedîtiye. Dê ev hevdîtina min ji bo wê bibe sîprûz. Ya herî girîng ez ê biryara xwe ya azadiyê ji wê re vebêjim û parve bikim. Ji ber ez di wê de rihê jinek azadbûyî dibînim, lewra êşa niha dijîm dixwazim parve bikim û dizanim dê ew jî bi qasî min xemgîn bibe. Tu jî di zanabûna vê de yî, ji bo gerîlayek jin rêgezên xwe yên jiyankirinê hene. Ev rêgez jînê nêzî azadiyê dike û ez jî dixwazim azad bibim.

21Cotmehê 2006

Ji bo hevrê Seyvan

Merheba zarokê esmer. Bi rastî jî nizamim ji ku derê dest pê bikim, lê dixwazim vê jidilbûna xwe bêjim, lêborîna xwe ji te dixwazim. Bi baweriya tu yê niha min hîs bikî, tiştên min berê negotibûn dixwazim niha bêjim. Min tu nas nekirî, ji ber min tu nas nekirî sar nêzî girnîjînên te yên hevaltiyê bûm, min bersiv neda hevaltiya te, lewra bi rastî pir

xemgîn bûm. Ya din jî dema min bihîst em bi hev re di heman nêvengan de mane, ji xwe hêrs bûm. Min çawa te nas nekiribû, min çawa ew nêzîkatiyên te yên jidil û dilnizim nas nekiribû? Dixwazim tu bizanî bi rastî pir xemgîn bûm.

Çima te xwe neda naskirin zarokê esmr, çima? Dizanim kêmaniya min e, min tu nas nekirî. Hîn gotina te ya dawî li ber guhên min deng vedi-de; ma tu yê jî çûba? Te bi dengek ew qas nerm û dilovaniyekê pirs kiribû, dema ji wir veqetiyam min li ser dilovaniya te lêhûrbûn kir. Tu dizanî, dilnizmiya te ya di femandartiyê de pir bi kêfa min çûbû û min di dilê xwe de gotibû; ji me re fermadarên wisa kedkar û dilnizim pêwîstin.

Dema salên borî û dîtina te ya di wan rojên dawî de didim ber hev, min tu pir pêşketî dît. Êdî tu ne ew zarokê bêdengî; tu bibû ciwanek bi awayek çalak, zindî tevî dibe, bal û heyraniya her kesê li ser xwe kom dikî. Tu dîsa femandarî û femandarekî cihê xwe di dilê her kesê de çêdike yî. Tu bi jiyana, çalakî û lehengiya xwe ve ji me re bûyî mînak, hemû hewldana min dê li ser şopa we meşin be. Ji bo êdî girnîjînên bi hevaltî di nivî de nehêlim ez ê rûyê her hevalekê di reşka çavên xwe de xêz bikim. Dubare lêborînê ji te dixwazim.

21 Cotmehê 2006

Hevalên min ên hêja

Direvim ji cîhana xwe ya hundirîn û hizirandinên xwe. Gelo ev çareserîye kesek nizane, lê herî kêm niha ev rêbaz pêwîst e. Xwe li ber herikandina jiyana rojane berdidim. Hewl didim li gor perspektîfên hevalan dayîn tevbigirim. Mijûlbûnên jiyane yên rojane nahêlin bi tenê biminim.

Belê, van rojan wê hinek heval bikevin rêwîtiyek dirêj, dê biçin warê xerîbiyê. Ez ji van çûyînan pir bandor dibim. Dema li wan hevalan dinêrim, tiştên min jiyane dîsa dijîm, ji bo min demek pir zehmet e.

Min hewl da tiştên min jiyane, ango ezmûnên xwe ji wan re vebêjim, hêvî dikim ji wan re bûm alîkar. Hevalên min ên hêja, serkeftinê ji we re

dixwazim û dixwazim dîsa we bibînîm. Dixwazim li wan macerayên we jiyane guhdar bikim. Di wê baweriyê de me hûn ê bi ser bixin. Piştî mirov bi aramanca xwe ve kilit bû, bi evîna xwe re bû yek şûnde ti hêz nikare li hemberî serkeftina mirov bibe asteng û hûn jî dê bi serkeftinê wegerin. Em bi bêrîkirina hevaltiyê we hembêz dikin. Hevalên min, riya we ya serkeftinê vekirî be. Dema we zehmetî kişand Rêbertî û hevalên xwe yên we li pişt xwe hiştî bihizirin. Di wê demê de wê li pêşiya we tiştê jê re tê gotin zehmetî, namîne. Dizanim heval, hesreta çiya pir zehmet e û êşek herî mezin e.

Ez ê sibe biçim gel hevala Mizgîn, kêmek bi kelecanim. Di aliyekî de naxwazim sibe biçim, dixwazim biriqandina di çavên hevalên xwe de, kelcan, xemgînî, bîranînên wan ên herî dawî bibînîm û li gel wan bimînîm. Her çendî ji bo min zehmet jî be, dixwazim di bîranîna herî dawî de bi wan re bim. Hevalên min, dilê min bi we re ye û wê bi we re bimeşe.

Jiyana gerîla pir bi renga, di kêliyê de tu gelek hestan di nav hev de dijî. Îro cejne, ango rojek divê kêfxweş û aramî be. Ji bo zarokan jî şahiyek e. Di van rojên wiha de her tim bendewariyek çêdibe, bi kelecana li bendê ne ka wê kengê li derî were xistin. Belê, îro min li malbata xwe ya hêja ya bi mehan li gel wan mabûm geriyam, ew kêfxweş kirin, min jî kêfxweş dike. Min di telefonê de germbûna wan hîs kir. Dihizirim gelo ez ê çawa hêjayî hezkirina van mirovan bim. Min jidil ji wan hez kir, bûn parçeyek ji min. Di kesayetiya wan de min carek din dît gelê me yê hêja çiqas fedekar e. Dibe gelek malbatên hevalan ev qas nixir nadin zarokên xwe lê didin me. Ji ber vê sedemê di destê mirov de nîne bi gelê xwe ve neyê girêdan. Ya rast, a jê re tê gotin hezkin jî ev e, rêz, hezkin û nixra bi xwînê ve negirêdayî.

Ronahî, te her tim ji min re digot; bê ku fêrî me bibî her tim çiya dihi-zirî. Ji ber pir li ser gerîla dihi-zirim, te her tim gazindên xwe li min dikir. Lê ez vê jî bêjim, raste hatime vir, gihiştim evîna xwe lê bawer bikin min hûn ji bîr nekirîne û ez ê ji bîr nekim jî. Hûn ji bo min nixra herî mezinin, hûn navê jiyana bi rûmet û hezkin jiyînê ne. Ji we hezkin, jiyana bi rûmet jiyîne, hezkirina herî berz afirandine û mirov bikare bibe şervanê

hezkirinê. Hezkirina herî rast çirûska ronahiya di dilê gelekî de di dilê xwe hîs bike. Di vê wateyê de qet negengaze keda kesekê ji bîr bikim, ger wê kedê ji bîr bikim wê demê ez ê keda Rêbertî di ber me de dayî ji bîr bikim. Ev jî ne li gor me ye, ne li gor felsefeya me ye. Ez we maç dikim û her tim wisa bi coş bimînin.

23 Cotmehê 2006

Tiştên mirov jê bawer dike, divê mirov bizane di oxura wê de bijî û bimre

Tiştê herî dawî bêjim min di destpêkê de got. Her kêliya tê jiyîn ew qas bi wateye mirov nikare bi ji hev bike. Tu dixwazî wê kêliya derbaz-bûyî bigirî lê tu nikarî bigirî. Kêlî girtin pir girîng e lê pir caran em nikarin bigirin. Tiştên divê di kêliyê de werin kirin em nakin û gelek caran dibin dûvîkê demê, li dûv wextê dibezin.

Piştî rêwîtiyek dirêj a Qendilê dubare vegeriyam. Tu çûbûyî. Min dixwest te bibînim, ji ber vê min hewl da zû werim, lê dîsa negihîştim te. Bawer bike hevala min, tiştên niha tu dijî hîs dikim. Hest, zehmetî tenêbûna te û bêrîkirinên te yê li hemberî hevalan hemûyan niha dijîm. Ez dibim tu, tu dibî ez.

Hevala min a evîndara jiyane, ez ê ti carî te ji bîr nekim. Tu hevalek min a jin a bi keda Rêbertiyê hatî strandinî. Bi hêviya em ê hev bibînin, li Zagrosê li benda te me.

Hestên min ew qas gur û dijwarin nikarim bi lêv bikim. Niha di van kêliyan de dil û zimanê min kilît bûye, di nav tenêbûna hêrsan de ma-me. Gotina nehatiye gotin, evîneke di nivî de mayî. Wisa ye hevala min, awaza veqetînê her tim bi êş e. Bawerim wê ya min jî bi vî rengî ba; xeyalên di nivî de mayî, evîna di nivî de mayî.

Piştî çend mehan şûnde min hevala Mizgîn dît. Qet ne li bendê bûm ku em ê dîsa hev bibînin. Kêm jî be min hesret û bêrîkirina xwe derbaz kir. Kêliya em ji hev veqetiyar qet ji bîr nakim, ji bo tu negirî te çavên xwe ji min direvandin. Dizanîm veqetîn ji bo te zehmet tê lê jibîr neke kufîlka min, her veqetînek hevgehînek nû ye, her rondik jî ji dîlşadiyek

nû re ducanî ye. Weke demsalan, yek jî weke dema sîber û ronahî cihê xwe bi hev diguherîne. Tu çi dibêjî bêhna min a biharê? Tişta herî zêde bi kêfa min çû jî, ew kêfxweşî û matmayîna dema ez dîtîm bû. Li gor hinek hevalan ez mezin bibûm, pêşketî bûm, xweşik bibûm û zêdetir têgihîştî bibûm. Ger mirov xwedî têkoşînek rast be, têkoşîn mirovan bedew û balkêş dike. Lê na, ger di tarzê têkoşînkirinê de dudilî, hesabên xweperstiyê hebin, wê demê ger aliyek te yê xweşik hebe dê bi demê re ew jî birize yan jî di bin sîbera kirêtiyan de bimîne. Dema min biryara azadiyê da, min ew dema şahane jiyan kir, min dît kêlî bi kêlî xweşik dibim. Di heman demê de min gelek aliyên xwe yên xweşik hem di rih de, hem jî di hest û fîzîkî de keş kirin. Azadî mirovan xweşik dike. Têkoşînê ez xweşik kiribûm. Qendîl bû yek ji cihên ez destpêkê bi gerîlabûnê dam naskirin. Min hemleya xwe ya destpêkê û ezmûnên xwe yên şer li Qendîlê dîtibûn.

Min hevaleke dema em bi hev re di şerê Qendîlê de bûn dît. Me li ser wan rojan nîqaş kir û got; min di çalakiyê de çawa bombe teqendiye, piştî teqiya şûnde bi coşa zarokekî çawa ji cihê xwe hilpekiyam, min çawa qêrîna kêfxweşiyê dida û ev moralek çawa daye wan. Ez cara yekem li vir rastî şehadatê hatim, min cara yekem hevalên şehîd raki-ribûn. Dema min hevalên xwe oxur dikir min dîtibû êdî venagerîn û dilê min ev qet qebûl nekiribû. Min girêdana mirovan a li hemberî hev li vir nas kiribû. Qendîl, mejiyê zarokatiya min a di PKK'ê de ye. Bi hevala Mizgîn re li van deran gerîn pir xweş bû. Cihê hevalên şehîd lê radizin dîtî, ez xistm nav kelecane. Ez pê hesiyam ew heval pir nêzî min in. Mîna xwe dirêj kiribin û wisa li min dinêriyan. Min li gel wan xwe pir aram hîs kir û min nexwest ji gel wan veqetim. Dema min dest li axa goristana şehîd Qehreman da min ti nîşayên mirinê hîs nekirin, jiyan hebû, min dengê wan dibihîst. Min gotinên hevalê Qehreman ê digot; “ez ê te bikim reklam” dibihîst. Hûn nemirine dijîn, ji ber we di berdêla baweriyên xwe de mirin veguhert jiyanê. Bi xatirê we mirovên xweşik.

Hema bêje min gelek deverên Qendîlê dîtî. Ji çiyayên wê bigere heta saziyên wê li gelek deverên wê geriyam. Min gelek hevalên gazî dîtî. Hinekan lingê wan, hinekan destê wan nebû, hinekan jî pirsgirêkên xwe

ya piştê hebûn. Lê tevî vê jî bi îda û rik têkoşîn didin. Ev îsrara hevalan moral û hêz da min.

Li gel van tiştên xweşik, bi awayek pir zeel mirov dikare aliyên van saziyan ên dema pêş rêxistin û me qadroyan tengav dike çavdêrî bike hene. Bi taybet nakokiyên peywendiyên di navbera jin û zilam de kûrkirin, ev ciheke ku divê li ser vî alî lêpirsin û nîqaşkirinek diyar were çêkirin. Ango li şûna saziyek bibe cihê herî zêde tê de peywendiyên rêxistinî û tarzê têkoşînê pir baş were bicihkirin, tam berovajî wê mirov nêzîkatiyên lihevkerî û nakokiyên hatine tevîzandin dibîne. Bêguman ev li zora mirov diçe, ji ber ev qadên xebatê proja Rêbertiyê bûn. Dema ev qadên xebatê hatin avakirin, ji bo hinek kes werin û pîvanên xwe yên jiyanê tê de bimeşînin nehatiye avakirin. Bawerim divê nîrxandinek wisa kirin şaş nebe, ji ber dema min asta peywendiya birjûwaya biçûk a asta wê nayê derbazkirin ferq kir, ne ku bi zora min neçû. Heta gelek kesayet vê astê najîn û ji vê zêdetir dijîn.

Min ev rastî dît. Ger tu li gor qadên xebatê qadroyan ava nekî, wê encam wisa be. Gelek kesayet ji wan xebatan re hêz nayînin û saziyê weke zemîna xwe tê de bide jiyînê bikartîne. Ji xwe re jî qilifek dîtiye û dibêje; ez têkoşîna siyasî didim, tevî di aliyê rêxistinî de ne pêşketiye xwe siyasî dibîne. Pîvanê siyasîbûnê yê herî diyar jî şêwazê peywendiyên e, ya di peywendiyên de wînda dike û di peywendiyên hevaltiyê de bê rêxistinî be ti siyaseta bi ser bixe nîne. Te tiştê ji siyaseta fêma nekiriye, bîrdozî hundirîn nekiriye, tu têkoşîna çî didî? Li şûna herî zêde di vî zemînê de têkoşîna bîrdozî bê dayîn, têkoşîna hundirîn tevîzandiye û dibêje em têkoşîn dikin. Ev nêzîkatî pir zora min çû û min rexneyên xwe jî kirin.

Qendîl bi xatirê te, dema li Qendîlê bûm min bêriya Zagrosê dikir. Aliyê vê rêwîtiya min a herî xweş dîtina erdnîgariya Xakûrkê bû. Divê mirov li deverên Kurdistanê bigere û xweşîkbûnên wê keş bike. Yek jî ev demek dirêj bû min meşa gerîla nekiribû, di tarîtiya şevê de nemêşibûm û di bin stêrkan de rêwîti nekiribû. Dubare jiyîna vê pir xweş bû. Her çendî zehmetiyê vê rêwîtiyê hebin, min serma heta hestiyên xwe hîs kiribe jî, bi rastî hatina me ya bi meş ji bo min pir baş bû. Divê kêmek din nobedar şiyar bikim, an ez ê rêgeza gerîla ya herî girîng bin

pê bikim. Lewra neçarim navber bidim. Em niha li biryargehê dimînin. Navber.

Piştî nobetê dubare merheba;

Gera Qendîlê pir baş bû, hişt ez ji xwe dûr bikevin û li ser pirsgrêkên di nav rêxistinê de derdikevin serê xwe bêşînim. Tiştên min dixwest bi hevala Mizgîn re nîqaş bikim, hemû pê re nîqaş kirin. Di vê wateyê de pir rihetim û herî kêrîkê vê dizanim; herî kêrîkê dikare texmîn bike ka ez dikarim çi bikin û ger şهادeta min çêbibe jî dê amade be. Herî kêrîkê jî vir û pê ve bi hizra ez ê rojekê şehîd bikevim bi jî.

Ti carî naxwazim ne Mizgîn ne jî mirovên din ji ber şهادeta min êş bijîn. Lewra bila her tim ez êş bijîm, lê bila Mizgîn an jî mirovek din nekişîne. Ger hezkirina min, êş û zehmetiya bi yê li hemberî min bide jiyîn, wê demê bila nizane baştîre. Ez ê lêhûrbûnên xwe di derbarê mijara divê hezkirinek rast çawa bê jiyîn de kûr bikim û ez ê wan rêgezên di keseyata xwe de jiyânî bikim. Her tişt ne gotin hezkirina rast jî ne li kêleka hev, her tim bi hev re bûne. Ya girîng li hemberî tiştên tu hîs dikî durist nêz bibî û bi dirûstbûna hezkirin dide te bizanî bi jî.

20 Mijdarê 2006

Raza jiyanê di cîhana mirov a hundirîn de veşartîye

Pêvajoya ez li biryargehê dimînim dixwazim bi awayek pir baş bigirim dest û xwe ji nû ve ava bikim. Dixwazim derketinek bi hêz pêk bînim, li ser vê bingehe bi ser xwe de diçim. Ya herî girîng jî hewl didim bi moral tevî jiyanê rojane bibim û tiştên dikim zewq digirim. Çavdêriya derdora xwe dikim. Dema hevalên jin bi awayek pir xwezayî kom dibin, dest bi nîqaşan dikin pir bi kêfa min diçe û hema bi temaşekirina wan re dimînim. Di kêliyên wisa de li wan temaşe kirin, guhdar kirin pir xweş e. Ji yekbûna jinê moralek şahane dafire. Em îro weke jin çûn ber bêtêlê, divê di pêvajoya nû de perwerde çawa were dayîn hat vegotin. Çarçoveya perwerde pir watedar bû, hemû mijar bi rastiya Rêbertî ve girêdayî bûn. Perspektîfên hatine dayîn di derbarê em ê di pêvajoya li

pêş xwe çawa amade bikin de bûn. Niha hevalên di hemû herêman de cih digirin heman hestan dijîn.

Cîhana jinê ya hundirîn, hestên wê her tim mîna razekê ne û nepenîne. Diyalektîka jiyanê jî wisa ye. Teyabetmediya mirov a ruhî di jiyanê de jî xwe dide der. Jina bi girtibûna hundirê xwe re, xwerûbûna di dilê xwe de mîna avek zelal di jiyanê de xwedî cihek diyare. Di nav vê cîhana razdar de xwe jî digirim dest, xwe noqî cîhana xwe ya hundirîn dikim û li sedema tengaviyên xwe digerim. Xwe didim ber pirs û lêpîrsînan. Min hîn ew şkestina di dilê xwe de jiyanê li ser xwe neavêtiye. Sedama dihêle gelek caran tengav bibim ev e. Pir dixwazim bi tiştên di dilê xwe de hîs dikim, tiştên dijîm re tevî bibim, lê ji ber rastiya jiyanê û paşverûyên di hundirê xwe de dijîm nikarim vê bikim. Gelek heval hene ku dixwazim jidil bi wan re parve bikim lê paşverûtî rê nade vê. Ez di diyalogên xwe yên bi mirov re teknîkî û seranser dimînim. Her tim wisa gotinên qilasîk dubare dikim. Tu çawanî baş î, baş im hwd. Li gor gelek mirovan rewşa min pir baş e, ji ber digerim û li gor dilê xwe dijîm. Bêguman ger xweşe lê dema aliyek mirov vala be, dilşkestî be mirov ji gerê ti tamê nagire.

Dixwazim dîniyan bikim û bibim zarokek. Dixwazim bi zimanê dilê xwe bibim çalakiya jiyanê. Nêvenga ku xwe tê de rihet nebinim rengê min diyar nebe, di nav rengan de xwe weke pelek payîzê ê zenûn hîs dikim, rihek balkêş dijîm. Jiyanê bajaran red dikim, naxwazim biçim lê di aliyekê de ji bo bigihim ûtopayên xwe xeyalên wê dikim.

22 Mijdarê 2006

Warê xwedavendan Zagros

Dem bê rawest mîna robarekî rîya xwe dibîne, tê û diçe. Demên wisa ji bo me pir bi jan derbaz dibin. Ev demek dirêj çêbû agirbest hatiye ragihandin û ji bo agirbest xirab nebe em weke rêxistin û pêkhatiya qadro çî ji destê me tê dikin. Lê KT'ê û hevkarên wê bê ku rawestin operasyonan pêktînin. Gelek hevalên me şehîd dike, di pêvajoyên wisa de em gelek şehîdan didin. Di her operasyonê de destê me li ser dilê me ye, bi tîrsa her kêlî em agahiya şehadetekê bigirin dijîn. Duh nûçe-

yan dîsa navê hevalên şehîd ketine da. Li Erzurumê 6 heval û li Botanê jî 1 heval şehîd bûne, du heval jî birîndar ketine dest û niha ev heval jî şehîd xistine. Ev şehadet me bi hêrs dike û xwê li ser birîna min dikan, birîna xwîn jê tê, jan dike. Ger bi vî rengî bidome agirbesta yekalî dê xirab bibe. Li ciheke ku her roj şehadet lê çêdibin bi filî ew agirbest bi dawî bûye. Li hemberî van êrîşan hemûyan jî ji bo neyên provoksoyonan ti lewaziyar nadin dest.

Bi xirabkirina agirbestê re em ê Rêbertî û hêviyên mirovên li gel çareseriyê ne vala derxin. Yan teqez me yê li hemberî van şehadetan mafê xwe bersivdaniyê bikaranî ba. Bila KT'ê dua bike bisekîne yan em ê çawa rehê wî yê jiyanê bidin dizanîn. Şehadet pir li ser min bandor dike û hêrsa min jî mezin dike. Tengasiyên min berdewam dikan, bi şev her tim şiyarim û çi dihizirim nizanim. Tenê di nav hizirandin û xeyalên tevlihev de me. Ez dibînim piştî maceraya xwe Stembolê şûnde pir hestiyar bûme, ez jinek xwedî hestên bi hêz bûm. Lê niha hestiyarî li pêş dikeve û qet nikarim li pêşiya rondikên çavên xwe bibim bendav, rondikên çavên min mîna robarekî dikerikin. Dixwazim vê **bêhngengiya** dijîm li ser xwe bavêjim, ji ber hîs dikim difetisim.

Belê, warê xwedavendan Zagros, gelo ez ê bikarim weke te bi hêz bibim, dîsa wekî berê bi te re bi coş bim? Dema li nepeniyên te dinêrim li gel min ezma ji nû ve xwe avakirinê pêş dikeve. Divê em hêjayî te û dîroka te ya raborî bin. Bawerim a hêjiyî Zagrosan, avakirina xwedavenda ne. Dîsa tîm dawîya rojek din. Roj jî çû ava û hemû germahiya xwe bi xwe re bir. Siyên li pişt wê man jî min direcifîne, oxur be roj, em ê sibê di berbangê de li benda te bin. Tam li ser vî çiyayî. Min îro biryar da, rojnivîs û nameyên min nivîsandine bixwînim. Min hemû hêza xwe kom kiriye, ev demek dirêj bû min ew wêrekî di xwe de nedît bixwînim, lê herî dawî min bi ser xist û ez ê bixwînim. Ji ber vê navber didim zarokê bêdeng ê di dilê xwe de.

Merheba zarokê evîndarê hevaltiyê

Serdemên dîrokê yên pir girîng hene. Mîna yên ev roja wan nebe dê siberoja wan nebe, yê dîroka xwe nizanibe dê pêşerojek wan a sexlem jî nabe. Îro ji bo gelê me rojek dîrokî ye. Îro salvegera damezrandina

PKK'ê ye. Roja berxwedana gelê Kurd e, nûjenbûna wî ye. Ji ber vê sedemê 27'ê Mijdarê ji bo me wateyek xwe ya pir girîng heye.

Ji tinebûnê hebûn avakirin pir zehmet e. Yek jî ger ev gelê Kurd be, ji xwe biyanî bûye, xwe û rastiya xwe înkâr dike û li ser hêviyên Kurdên hewl didin bi rûmet bijîn beton hatibe rijandin. Li van rojan mêzandin û ew roj şirovekirin mirovan dixê şaşîyan, ji ber îro gelek bi zanabûyî heye. Nîfşek bi cewher û kokên xwe ve mezin dibe heye. Yek jî bi hezaran gerîlayên xwe hene.

Ya ku em anîn vê rojê hewldanên Rêbertî û keda hevalên şehîd bûyî avabûye. Ev roj bi coşek mezin hat pîrozkirin, bi awayek hewayê cejnê derbaz bû. 27'ê Mijdarê cejna gelê Kurd ê bi rûmet e. Me gerîla jî di nav derfetên xwe de cejna xwe pîroz kir. Di wê baweriyê de me her hevalek girêdana xwe ya bi şehîd û Rêbertî re di ber çavan re derbaz kiriye û lêpirsîn kiriye. Îro xala herî zêde li ser hizirim ev bû. Divê bi agirê şoreşê dubare ji nû ve xwe ava bikim û di her mercî de bizanim li gor esasên partiyê xwe tevî bikim.

Rêberê min, cejna we pîroz be. Ji ber me ev roj bi hev re pîroz nekir aliyek dilê me xemgîn bû.

Rêberê min, coşa îro di çavên gelek hevalan de dihat xwedin. Îro hevalên jin pir dilşad bûn. Gelo kê texmîn dikir em ê van rojan bijîn? Niha bi hezaran heval vê rojê pîroz dikin.

Bi boneya vê pîrozbahiyê hevalên ku ev demek dirêje me nedîtine dibînin. Di rojên cejnê de mirov diçin serdana hev. Em jî hevdişînek bi komî pêktînin.

Hevaltiya di PKK'ê de nîrxek pir cuda ye. Ji derveyî vê hevaltiyê ketina pey peywendiyên cuda fêm nakim. Peywendiya şoreşgerî ya herî rast di PKK'ê de heye, yê van rastiyan nebîne kor e û kesayetên ji rastiya xwe dûrin. Asta wan a peywendiyê xwe dispêre hemrazîyê, ji vê peywendiyê re jî peywendiya şoreşgerî nayê gotin. Dihizirim peywendiyên wisa li peywendiya şeroşrerî heqaret e.

Belê, bê ku lêpîrsîn bikin, fêm bikin, bê ku ji bo rastiya her tiştê xwe danîn holê, dema te xwe tevî jiyanê kir, te xwe di binê bîrek kûr de dibînî. Piştî ketî binê bîra kûr jî qêr, bang dikî, lê kesek dengê te nabîhîze. Dema em bi awayek rasterast tevî jiyanê dibin, bê ku lêpîrsîn bikin, bê ku fêm bikin û çavderî bikin, bê ku bikivin zanabûna wê em sih dixin ser îdealên xwe yên azadiyê yan jî jiyanê bê wate dikin. Dihizirim, ez pir girêdayî hevaltiyê me. Lê aliyên divê lêpîrsîn bikim jî hene. Di heman demê de mirovên ji wan re dibêjim hevalên min, divê sekna wan a li hemberî azadiyê lêpîrsîn bikim. Lê heke li gor dilê xwe nêzî wan bim, ez ê di wir de pêşketin, xweşîkbûn û hevaltiya rast ji holê rakim. Ev jî teqez dijî lêgerînên min e û ger wisa bikim ez ê berovajî lêgerînên xwe yên azadiyê bikevim. Lêpîrsîn di dilê mirov de firîşteyek e, divê ez ji vê firîşteya xwe ya jêneger veneqetim. Riya ku bibim mîna firîşteyekê bi vê ve girêdaye.

27 Mijdarê 2006

Perwerde

Di nav tevgera me de yek ji xebata herî zêde girîngî tê dayîn perwerdeye, di eksena vê perwerdê de ya xwe zelal dike pêşketina mirov e. Perwerde di jiyana me de bi qasî av û nan cihê xwe digire. Rê û pira bingehîn a me nêzî azadiyê dike perwerde ye. Divê ji cahêltî, paş-verûtiyê her tişt bê hêvî kirin û xwe ji mirovên cahil parastin hebe. Cahêlî, li ku derê çi ji mirov bike û çawa bike nediyar e. Ji ber vê yekê her tim evîndarê pêşketin û zanabûnê bûm, ji bo xwe perwerde bikim her tim hewldanên min çêbûn. Heta ji ber vê rexne jî li ser min hatin. Ji ber ez bi tenê bi xwe re mame.

Kes pêwîstiyên xwe destnîşan dike, ger xwe bi rêxistin bike û girîngî bide perwerdeya xwe ya sexsî wê pêş bikeve. Mirovê pêş dikeve dikara

li ser xeta milîtanîyê bimeşe. Mirovê cahîl nikare bibe xeta milîtantîyê û di nav şoreşê de zemîna xeterîyê ye.

Ev du roje me weke hêza biryargehê dest bi dewereyek perwerde ya nû kiriye. Nîqaşên îro pir balkêş bûn. Heke em bi vê bizavê biçin em ê pêşketin û veguherandinên girîng ava bikin.

29 Mijdarê 2006

Zarok

Me filmê bi navê “Bav û Kur” guhdar kir, çîrokek bi êş bû. Ji bo Denîzê pir xemgîn bûm. Ya rast di kesayeta Denîz de ji bo hemû zarokan xemgîn bûm. Em li gor cîhana zarokan nêzî wan nabin. Em li gor ferasta xwe zarokan bi rê ve dibin û dixwazin mîna me bin. Yê herî zêde êş dijîn zarok in. Yek jî di şoreşa me de zêdetir zarok êş dijîn. Bavê hinekan şehîd e, yê hinekan di girtîgehê de ye, yê hinekan jî ne dayîk ne jî bavê wan heye. Heta ev zarok mezin dibin rû bi rûyê gelek zehmetîyan tên. Çend mirov zehmetiyên van zarokan hîs dikin, jê re dibe çareserî û bi jiyana xwe ji van zarokan re bersivan peyda dikin?

Tê bîra min, dema zarok bûm, keça meta min Neşe, zehmetiyên xwe bi min re parve dikir. Di wî temenê xwe yê biçûk de jî ez dihizirim û min digot, xwezî ez di şûna Neşe de bam ji bo Neşe ev zehmetî nejiyaba. Meta min dayîka Neşe ya jinbavê bû. Dayîka jinbav çiqas hewl bide, çiqas jê hez bike jî lê dîsa di dilê zarok de her tim valatî û bêrîkirinek heye. Yê di nav malbatê de herî zêde zehmetîyan dijîn zarok in. Li nav malbatên di navbera dayîk û bav de aramî nebe kî dizane zarok çiqas zehmetîyan dijîn. Yek jî îşkenceya li zarokan tê kirin bi ti awayî na-pejirînim. Zarok tenê ji însafa dayîk û bav re hiştin ji bo civakekê ne hewlestek têrker e.

Belê, zarokên xweşik hûn bê gunehin, mîna firîşteyekê ne. Lewma ew qas bi zarokan ve girêdayî me. Di kesayeta Denîz de li ser hemû zarokan hizirim û îşev ji bo wan xembar bûm. Her zarokê ji dayîk dibe ji ber pergale gelek pirskirêk li benda wan e û hêza wan a van pirsgirêkan pêşwazî bikin jî nîne. Dostên min ên biçûk hebûn. Bêrîtan, Bihar,

Devrîm, Şîlan, Dîlan, Mizgîn û gelek zarokên din ên min navê wan neni-vîsîne. Ya rast niha mezin bûne. Gelo ez tîm bîra wan? Ger wan ez ji bîr kiribim jî lê min ew qet ji bîr nekirine û ji wan pir hez dikim.

1 Kanûnê 2006

Rojên min ên biryargehê

Roj bi hemû leza xwe derbaz dibin. Pergalek jiyanê hatiye rûnişkandin. Em li gor wê tevî dibim û rojeva herî girîng jî perwerde ye. Pirsê em hemû ji xwe dikin, ez ê çawa başdarî perwerde bibim? Ev di wateyekê de lêgerîneke.

Dema ez li Stembolê bûm min her tim xerîbiya hevalan dikir. Ji ber min ew nedîtin, min ew qas êş û zehmetî kişandin lê niha ez bi rihê zarokatiya bi xwe re nêzî jiyanê nabim. Bêguman dikare were pirsikirin ji ber çi? Hevalên li vir li gor derûniya xwe nêzî min dibin. Cilên ji wan re dibin ji min re nabin û ji bo min teng tên. Wan wate neda min lê ez wate didim xwe û li gor vê şêwe didim xwe.

2 Kanûnê 2006

Rêwiyek hêviyê me

Di nav vê dema windabûyî de

Qibla min jî azadî ye

Ji evînek nîvco mayî ber bi rêwîtiya hêviyê ve

Piştî demek dirêj min navek li rojnivîsa xwe kir. Di encama tiştên berê min jiyîn de min ev nav hilbijart û ev helbesta jor nivîsand. Ev rojnivîsa min jiyana jinek êş dikişîne digire dest, lê ti carî hêviya xwe qut nake û serpêhatiya jiyanek her tim li pey hêviyên xwe dibeze, ango jiyana min, hêviyên min. Navê rojnivîsa min, ji evînek nîvco mayî rêwîtiya ber bi hêviyê. Ev nav nîşaneyê tiştên min jiyîn e.

Navê rojnivîsê xwe her tim di encama tiştên dijim de hildibijêrim û dixwazim min vebêjin. Ka em lê binêrin ez ê bikarim awaza dil û tiştên min jiyîn lê bikim?

Merheba qêra evîna di nîvî de mayî

Dilê min tijî bûye, pir tengav dibim. Piştî lêhûrbûnek pîroz şûnde ji ber nebesî û bê rêbaziye hinek mirovan, hinek pirsgrêkên bi şexs ve tên girêdan û nazdariyên wan kişandin bi rastî jî ji min re pir zehmet tê.

Belê hevalên min, hûn ne mirovên xirab in. Dema we gav avêt vê şoreşê teqez tiştên we jê bawer dikir hebûn. Ez we tewambar nakim lê tiştên hûn dikin jî rewa nabînim û qebûl nakim. Ez ê xwedî helwest bim lê ez ê hevaltiya xwe ya bi we re jî bidomînim. Heke bi rastî şerê bûna hevalek rast hebe di wê demê de dê ew hevaltî xwe bispêre bingeheên sexlem. Yan bê ku li pişt xwe binêrin dê dev jê berdin.

Dema li ser van tengasiyên min erk jî zêde bû min qebûl nekir. Ez naxwazim hevalan bişkênim. Ez naxwazim vîn û biryara wan vala derbixim lê hêvî dikim ji min fêm bikin. Min diyar kir ez di vê pêvajoyê de erk nagirim, tevî wê jî îsrar kirin. Negirtina min a peywirê bû sedema gelek mirov nirxandinên cuda bikin. Lê ti kesê ji wan tiştên min di hundirê xwe de jiyane fêm nekir.

Ez gumanek wisa dijîm; gelo ger erk bigirm li ser lêhûrbûnên min bandor nake? Min bi erk re sînordar nake. Ji ber dema peywirek wisa digirim ser milên xwe, hemû enjriya xwe didim xebatên giştî û ji xwe re wext venaqetînim. Hewla min hemû ew e xabata dikim baş bikim û ji ber vê jî di navberê de winda dibim. Yan dixwazim zêdetir ji nêz ve bi mirovan re mijûl bibim, dixwazim bi keda xwe alîkarî bidim wan. Yek ji pîvanên milîtanîyê yên ji bo min pêwîst ev e. Lê ger di nav lêhûrbûnek wisa de erk negirim wê baştir be. Ger bibim şervan ez ê taybetmendiyên milîtanîyê zêdetir pêş bixim. Ez ê bi vî rengî baştir aliyên xwe yên ne li gor milîtanîyê şênbertir bikim. Dema mirov erk digêr taybetmendiyên mirov her dem dernakevin holê. Carnan wisa pêwîst e.

7 Mijdarê 2006

Merheba mirovê jiyanê di şexsê xwe de xweşik dike

Merheba Rêberê min

Perwerdeya me bi hemû leza xwe berdeyam dike û li ser rastiya Rêbertî perwerde dibînin. Di perwerde de kêliyên hestiyar tên jiyîn, mirov di çavên hevalan de wê kûrbûna hestan hîs dike. Ez jî weke her hevalemê pir hestiyar bûm û min xwest kêmek bigirîm. Min xwest êşa ji ber pêknehatina çalakiya xwe di dilê xwe de vale bikim. Min xwest êşên min kişandine bi hevalan re parve bikim, tiştên di dilê xwe de qêr bikim lê dîsa min nekir û bi tiştên di hundirê xwe de bi tenê mam. Pêwîstiya xwe pir bi parvekirinek xwezayî dibînim. Dixwazim bi hevalan re kûr û bi awayek vekirî nîqaş bikim.

Gelo ya ez dijîm valatiyek manewî ye? Pêwîstiya min bi hezkirin û eleqedariyê heye? Berî vê bi vî rengî li min nehatibû. Dixwezim derbaz bikim. Lê bi şewazekî dîsa derdikeve pêşiya min. Derbazkirina hinek tişt çiqas zehmet e. Ez her tiştî di cih guhertinê de dibînim. Ya rast a min jî reveke, jixwe ez biçim ku derê tiştên dijîm bi xwe re dibim. Di nav hêzek pratîkê de dibe valatiya di dilê xwe de bi hezkirina wan û keda bidim wan re tijî bikim.

Di aliyekî de dixwezim li vir bimînîm û bi awayek zelal rû bi rûyê tengasiyên xwe werim, ez ê hêz û wêrekiyê bidim nîşan. Lê dema teng dibim dîsa îsyana min dest pê dike û dest bi hizirandina gelo min çima zêdetir ferz nekir dikim. Di rastiya xwe de min nexwest van binivîsim lê dema min pêênûs girt destê xwe dilê min mîna baranê rijîya ser rêzikan.

Li ser rastiya Rêbertiyê lêhûrbûn dikim. Di nav pîvanên jiyanê de li hêza wê jiyankirinê digirim û bi awayek hêjayî xeyalên min were dixwazim bijîm. Dihizirim divê mafê jiyanê were dayîn. Min xwest barê dîrokê hilgirim ser milên xwe lê nebû. Rêberê min, qet nebe tiştên di nav wext de tên jiyîn her kêlî bi we re bim.

Îro girêdana di navbera bêrîkirin û azadiyê de hat lêpîrsinkirin. Bêrîkirinên me dide nîşan ka lêgerînên me girêdayî çi ne. Min bêrîkirinên xwe di ber çavan re derbaz kir, di xala bêrîkirinên min xizmeta çi dikin de hewl da kûr bikim. Xeyal, hêvî û bêrîkirina min a herî mezin ew e wê

kêliya Rêbertî digihe gelê Amadê bibînim û bijîm. Qêr û coşa gelê xwe di dilê xwe de hîs bikim û êdî ev gel êşan nekişîne.

Sedema Rêbertî hîn van êşan dijî sûçê civaka ji xwe re dibêje em milîtanin. Dîsa meha Sibatê tê, dîsa dilê me wê bi çermixê were biz-markirin û birîna me kûrtir bibe.

8 Mijdarê 2006

Merheba zarokê dilê min ê bi hewla xwe ji mirinê jiyan ava kirî

Gotina, “li şûna jiyan lê hebe, hêvî jî heye,” ji min re pir bi wate hat. Min wayetên kûr li vê gotinê barkirin, dubare li tiştên dijîm zivirim û min lê nêrî. Ez bi xwe êş didim kişandin, rihê xwe diguvêşim û cîhana xwe teng dikim. Li şûna jiyan lê hebe li wir hêvî heye, guhertin veguher-tin heye û ji jiyanê kole hesabxwestin heye. Agir bi çirûskeke pê dikeve û piştî wê vediguhere pêtek gur, her weke pêlên deryayê. Di destpêkê de pêl bi awayek sivik dest pê dike li bedena te didin û piştî wê dîsa pêl tînin vê carê jî tu xwe di bin pêlan de dibînî. Di nav herikandina pêlên tînin û diçin de di xebatek herî biçûk de ger tu bikarî serkeftinan bi dest bixî û bigihî azweriya wê di wê demê de te agirê hêviya xwe geş kiriye. Yek jî dema li ser vê xeyal zêde dibin wê demê dê jiyan ji te re zêdetir bi wate were.

Kêfxweşî mirovan nêzî azadiyê dike, bêmoralî jî mirovan ji jiyanê aza-diyê dûr dike. Ger li vir bim divê bizanim li gor wê bijîm. Bê ku ji rasti-yan qut bibim xwe bispêrim xweşîkbûnê jiyanê.

Divê li hemberî serdestiya zilam xwe azad bikim. Carnan pir kenê min tê, hema mîna palyanço xuya dikin. Hinek xwedî kesayetek cûce ne. Nirxandinek hevala Viyan hebû digot; serdestiya zilamê faodal ê xwe di-ecibîne. Ev nirxandin tam li gor hinek hevalan e. Xala herî zêde dike-ve ber çav jî dixwazin bi jinê re peywendî danin, xwe nêzî wê bikin lê dema bersivê ji jinê negirin vê carê jî bertek digirin. Li derdora jinê dizivirin, piştî wê ji bo lewaziyek herî biçûk a jinê bigire û bixe rojevê, dixwazin rêza ji jinê re tê dayîn bipelîxînin. Bi kurtahî pir bi kêfa xwe dê

jinê bînin asta xwe. Raste ev nêzîkatî hene lê em ti caran tavîz nadin. Heta rastî cihê xwe dibîne.

12 Mijdarê 2006

Merheba keça hezkirin û evînê ji xwe re dike jiyân

Di kêliyê de pir tiştan dihizirim. Di aliyekî de gelek tiştên min bêriya wan kirine dixwazim bijîm, lê di aliyê din de jî tiştên min bêriya wan kiriye qet naxwazim bijîm. Ev çend sal çêbûn Rêbertî hîn di navbera çar dîwaran de ye û bi tenê ye. Gelo niha Rêbertî çi dike, çi dihizire? Xwezî niha bibam çûkek, min fir daba û li ser milê Rêbertî veniştibam. Min niha çiqas dixwest bibim çûkek û ji nêz de germahiya wî hîs kiriba. Yek jî min dixwest feraseta xwe ya hezkirin, xweşikbûn û vînê ya di jiyanê de bi Rêbertî re pave bikim.

Rêberê min, hûn min dibîhîzin? Xwezî min deng û dilê xwe gihandiba we. Rêberê min, sala we ya nû pîroz be.

Tiştên me di sala 2006'an de nekirine, giraniya wê didin sala 2007'an. Daxwaziya min tenê dîtina Rêbertî û xilasbûna êşên gelê Kurd e. Nizanim çavkaniya xwe ji ber em derbazî salek nû dibin, lê di mejiyê min de gelek tiştên û diçin. Gerdun, xweza, gel, Rêbertî, dayîk û bavê min, xwîşk û birayên min, hevalên min Arjîn, Diljîn, Nûjîn, Rojhan, Gulan, gelek hevalên min ên din û bîranînên min. Ma îşev li çi nahizirim?

Min îşev xwest di televîzyonê de bernama sersalê guhdar bikim, lê pêşkeşvan di axaftina vekirinê de silav ji Rêbertî re rênêkir, ji ber vê pir bi hêrs bûm û hema dîsa rabûm hatim. Ev çi pêşkeşvan e!

Merheba Mizgîna min a dilê wê ji hezkirinê dikele, sersala te ya nû pîroz be. Bê ku te bihizirim nikarim bijîm. Xwezî hûn jî li gel me ban. Min pir xerîbiya we kiriye, ger şerm nebe, ez ê mîna zarokan bigirim. Ez ew qas hestên dijwar dijîm nikarim bi lêv bikim. Kulîlka min a Mizgîniyê, kêma jî be dixwazim bêrîkirên xwe bi wêneyan debaz bikim. Min Elîf giyan ji bîr nekiriye, yek jî Ridwan, Îbo û biraziyê me yê destpêkê Azad. Ez Azad pir merek dikim, teqez niha bûye zarokek pir xweşik. Ji ber dayîk, bavê wî û em metên wî jî pir xweşik in, ew niha bi me çûye. Ger

rojekê Azad ev tiştên min nivîsandine bixwîne wê bibêje, ma qet aliyek min ê xweşik nîne. Êêêê, Azad giyan, tu biraziyê me yê destpêkê yî, ji ber vê çendê hestên xwe çawa parve bikim nizanîm. Dixwazim jiyanek xweşik ji bo te bihêlim. Dixwazim welatek azad tu tê de bilîzî û nêvengek bi çanda xwe henase bigirî diyarî te bikim. Ez bawerim weke metekê diyariya herî xweşik ez bidim te wê ev be. Îbo giyan, tu bûyî ciwanek têgihîştî, lê hîn di mejiyê min de ew rewşa te ya dilşad û netebitiyên te zindîbûna xwe diparêze. Ji te pir hez dikim.

Em dikevin salek nû û wê sala nû bi gelek rehendên xwe ve bibe destpêkek nû. Ka em binêrin, wê ev sal ji bo min çawa be? Ger hezkirin jiyankirin be, ez jî bi qasî di oxura vê jiyane de bimrin jê hez dikim. Ez ê jê hez bikim.

31 Mijdarê 2006

Hezkirin

Di kenê we de dilê min lêdide

Di pakbûna we de dostaniyê dibînim

Di robarên çavên we de hezkirin diherike

Ez bi hezkirina we heme

Bi coşa we şerê jiyane didim

Dema hezkirin berz dibe wateya xwe digire

Hezkirin me digihîne azadiyê

Bi lêdana dilê we re dilê min lê dide

Ev dil dixwaze kenekî tevî kenê we bike

Ji we hez dikim

Ramûsanekê li ser kenê we datînim

1 Çile 2007

Merheba sala nû

Em di salek nû de ne, min salek din li pişt xwe hişt. Piştî demjimêr 12'an me şahiyek çêkir. Ez pir ji van şahiyên gerîla yên xwezayî û xwerû hez dikim. Di van kêliyan de mirov pir baş dibîne heval çiqas girêdayî hev û ji hev hez dikin. Ev atmosfer tabloyek hezkirinê bû, wênesazek jî nikare tabloyek hezkirinê wisa xweşik û watedar xêz bike. Di vê nêvengê de mayîn û bûna parçeyek vê hezkirinê xweş e. Dihizirim ez jinek bi şans im. Ger min şoreş nas nekiriba, gelo dê wê demê rewşa min çawa ba? Ez bawerim min nikaribû xwe ji qurbanbûna pergale xilas kiriba. Hezkirina hevaltiya di nav gerîla de mîna av û hewa bê dawî ye. Tu çiqas hez bikî, werî hezkirin dîsa jê têr nabî û her dem dixwazî bijî. Hevaltî ji ber vê hezkirina kûr pîroz dibe. Di oxira hezkirinê de mirin, bûna kedkarê hezkirinê pir xweşik e.

Di rastiye de tu namirî, tenê guhertinek fîzîkî çêdibe, ji ber tu hezkirinê mezin dikî û tînî astek jêneveger. Her kes nikare hezkirinê mezin bike. Dibe her kes li pey hezkirinê dibeze, dixwaze hezkirinê tam bike lê ji ber di xwe de hezkirin ava nekiriye nikare tama hezkirinê bigire. Mirov çiqas ji tişteki hez bike ew qas ked di ber wê de dide. Tu çiqas ji jiyanê hez bikî, tu yê ew qas jiyanê rakêşwer bikî. Ger li cihekî lewaziyek hebe di bingeha wê de bêhezkirin heye. Di vê wateyê de divê ez hezkirina xwe ya li hemberî Rêbertî, gel û hevalan dubare di ber çavan re derbaz bikim. Bi hêviya ev sala nû bibe sala hezkirinê, bi coşa wê re dest bi vê salê dikim.

1 Çile 2007

Merheba dilê ji agir

Piştî mehan roportaja min di biharê de dabû guhdar kir, dema min ew axaftin kiribû ez bi kîjan hestan axivibûm û niha bi kîjan hestan

guhdar dikim? Di ferqa hestiyarbûna xwe de me lê tişteke ji destên min nayê. Dema min guhdar kir çavên min tijî bûn. Min nexwest li gel hevalan bigirîm û li ser moralê wan bandor bikim lê bawerim min bandor kir, lêborînê dixwazim.

Cara yekem bi vî rengî li xwe guhdar dikim û min tişteke keşf kir. Pileya dengê min, ken û hinek tevgerên min ên rû dişibin yên Elîf giyanê. Di kêliyê de di nav wan hestên dijwar de min hîs kir ez Elîf giyanê guhdar dikim, Elîf giyan pir dişibe min. Elîf giyan xwezî rojekê derfet çêba te guhdar kiriba. Pir xwezayî hatiye kişandin û kêfa min ji vê xwezayîbûnê re hat. Evîn hestek pîroz e, lê ger tu bikarî li gor rêgezên evînê bijî. Yan dê evîn hemû bedena te bişewitîne, rihê te dîl bigire. Evîndarbûyîn tişteke xweş e lê ger tu hêjayî wê evînê bî û mirovên li hemberî te jî hêjayî vê be. Yan dê ev evîn veguhere peywendiya patron û karer an jî veguhere peywendiya hezkirinek klasîk. Ez hîn li bersiva ew pirsê hevala Gulistan wê demê ji min kirî digirim. Ez evîndar bûme? Evîndar bûyîme? Vê evînê ji min re çi anî? Çi ji gel min bir? Li gor asta zanabûna xwe min rêgezên evînê jiyan kir? Yan jî min hestek pîvanên feodal û birjûwaya biçûk derbaz nekirî jiyan kir, da jiyîn?

Kes nizane ka dê jiyan kengê çi fêrî te bike û nîşa te bike. Ya rast jiyan bi serê xwe sûprîzeke. Ti kes nizane mirovan ji ku derê û ber bi ku derê ve dibe, her weke pelên payîzan. Ez ê bi êş û bêrîkirinê xwe hezkirina xwe ya azadiyê mezin bikim.

1 Çile 2007

Merheba zarokê xeyel û hêviyên xwe di nav tirsan de dijî

Yên sir û seqema zivistanê ya herî dijwar hîs dike û dijî gerîla ye. Di nav derfetên vê zivistanê de çûk, sivorî, hirç û gelek lawirên min navê wan nenivîsandine ji cihê xwe dernakevin. Xwe ji ber xeteriyên xwezayê diparêzin. Xweza biqasî dosta gerîla ye, dikare bibe dijminê wê. Dema berf dibare daran dixemilîne pir kêfa mirovan tê û her cara mirov lê dinêre dike evîndarê xwe. Gengaz nîne mirov şahanebûna van dîmenan di dilê xwe de hîs neke. Lê yek jî ew qas êş û zehmetiyên vê

berfê hene? Me di van hewayên bi berf de ew qas şehîd dane, hejmara wan nayê zanîn.

Îro ji biryargehê komek heval ji bo tevî konferansa HPG'ê bibin birêketin, niha lingê wan şilûpil bûye, lam û difîna wan hemûyan sor bûye. Bi xwezayê re di nav têkoşînê de bûyîn pir xweş e. Di jiyana gerîla de ti zehmetî li hemberî xebatên rêxistinî nabin asteng. Tiştê dibe asteng jî bi dilê gerîla û vîna wî re derbaz dike, hemû astengiyan ji holê radike. Tiştê dihêle gerîla bi hêz bibe ev sekna wî ya bi vîne. Gerîla li çîyan çûkek, di deryayan de qaqlîbazêke û li ser kulîlkan perperîke. Mîrov hebûnek difikire ye, gerîla jî ew e yê ku pêwîstiyên pêvajoyên dîrokê hîs dike.

Tê xuyakirin hêviyên me li zivistanê barkirin dê bê encam bibin. Ji bo biharê bi lezek dijwar xwe amade dikin, dema mîrov amade be tiştêkî ava neke nîne. Ev bihar wê bibe biharek cuda. Di hevdiştinên Rêbertî yên dawî de hişyariyên cuda hene û divê êdî çi were kirin gel û gerîla biryarê bide. Ev gotin ji aliyê gerîla û min ve talîmatek e. Wê bibe pêvajoyek ez bikarim strana xwe ya di nîvî de mayî qêr bikim. Gelo ez ê bikarim dubare di heman astê de amade bim?

Pêwîstî dibînim xwe dubare bigirim dest. Di xala biryarê de ti guhertin nînin, heta dikarim bêjim min biryara xwe kûrtir kiriye. Lê hinek pirsên mejî û dilê min dikemirînin min ditirsîne. Ger bêjin, tu deşîfre bûyî, tu yê werî girtin an dîsa biryar were guhertin? Wê demê ez ê çi bikim? Tu yê di lûtkeyên herî jor de hêviyan bijî û piştî wê tu yê ketinekê bijî, nabe ev wisa nabe. Gelo wê carek din hêzek min a ku van derbaz bikim hebe? Vaye di vê mijarê de di nav dudiliyekê de me. Lê hestên min, min ber bi evîn, xeyal û berpirsyariyên min ên dîrokî ve dibe. Gelo ez ê bikarim hema wisa li vê pêvajoyê binêrim? Na negengaz e, divê bi vî rengî xwe tevî nekim, an ez ê ji aliyê wîdanî ve biperçiqim. Ev ji bo min hîn tirsaktir e. Dê ev ji bo min bibe mirin.

Ti mijarek li pêşîya min bibe asteg nîne, min li gel xwe bersiva gelek tiştan dîtiye û xwe qane kiriye. Ev çi jiyana şexsî be, çi malbat be û çi hezkirin be li pêşîya min ne asteng e. Tenê rastiya dijim li pêşîya xwe asteng dibînim. Belê, ma gelo dê dîsa ev şans çêbibe? Bawerim ji vê

seetê û şûnde bi awayek sexlem gihiştina min a Stembolê wê pir hêsan nebe.

6 Çile 2007

Hezkirin, nîrx û hêviya di jiyanê de tê avakirine

Hevaltî, dostanî li ser nîrx û hezkirinê pêş dikeve û tê avakirin. Hezkirin di dilê mirov de mîna sûlav û okyanûsekê ye. Hezkirin kede û serkeftine. Dixwazim xala îro jê bandor bûm bi dengê dilê xwe re parve bikim. Ev bûyera rû bi rûyê wê hatime derûniya gelek mirovan jiyankiriye. Ez ji gotinên hevalek kevin bandor bûm. Got, ez li quncikekê hatime jibîrkirin, em nayên bîra ti kesî. Ez pir xemgîn bûm, mirov çima derûniyek wisa dijî? Hestên xwe bê nîrx û tine hesibandin mirovan ber bi kendal û tenêbûnê ve dibe. Ev jî xilasbûna mirov e. Mirov ne hebûnek bê nîrxê, yek jî ger ev qadroyek vê şoreşê be divê tenêbûn û bê nîrxiyê nejî.

Ev rewşên wiha caran ji şêwegirtina malbatê digire. Malbat nîrx nade zarok an jî hezkirina xwe nade hîskirin. Dema wisa dibe zarok dihizire qey nayên hezkirin û her dem hewce û birçiyê hezkirinê ye. Her dem dixweze bibe cihê rakêşweriyê. Divê di şoreşê de derûniyên wiha werin derbazkirin. Divê mirov xwe nespêre ti kesê. Ji hêza xwe bawer be û li şûna li benda mijûlbûnê be, bila ew bi xwe bi derdor re mijûl bibe. Divê ked were dayîn an ma wê heta kengê ev bendewarî berdewam bike? Divê mirov bizane ji jiyanê moral bigire, heta ger pêwîst bike divê mirov bi xwe moral bide xwe. Ger li kêleka me, di nav me de mirov û jinek vê derûniyê bijî bê ku xwe lêpirsîn nekim nikarim derbaz bibim. Di mijara hezkirina hevaltîyê de dana hîskirin li ku derê kê mame, ez çima ji wê mirovê, hevala xwe re nabîm çirûska ronahiyê? Çima peywendî û tarzê me yê jiyanê mirovan ber bi tarîtiyê ve dibe? Ev rewş min ditirsîne, gelo her ku mirov kevin dibe dikeve nav rewşek wisa?

Ger tu bikarî bikevî dilê mirovan, tu yê dilê xwe veguherînî okyanûsekê, mîna çûkek sivik û azad bî. Ez hevalên xwe qet ji bîr nakim, ji ber ew çavkaniya min a hezkirin û jiyanê ne. Ew ji bîr kirin tê wateya dilê xwe derxistine. Li gor ev negengaz e, wê demê mirov nikare heval,

dostên xwe ji bîr bike û dev ji hezkirinê berde. Hezkirin ne tê firotin ne jî tê kirîn. Hevaltî û dostanî bi ti tiştî re nayê guhertin. Heval û dosta min tu ne bê nîrxî. Hezkirin tenê nayê wateya bibêje ji te hez dikim û nîrx didim te.

7 Çile 2007

Belê, hevalên min ên xweşik

Hevalên min, hesreta min a herî mezin, hevpeymana azadiyê ya min bi gel û welat re çêkirî pêkanîna wê ye.

Bi saya teknîka pêşketî min wênayên warê xeyalên xwe dîtî û hevalên xwe yên berî salekê çûbûn wê derê dîtî. Mirov nikare çiya û hevalan di nexşeyên wêneyan de bi cih bike, lê em çî bikin carnar mirov hesreta wan dîmenên di nav nexşeyan de ye jî. Çûna wan çiyayên bi heybet gerîlatî kirin, bi hevalan re heman coş jiyîn, heman henase girtin jî heye. Belê, xwezî niha li gel we bam.

Di van rojan de dîsa xewnên tevlîhev dibînim. Pir caran tiştên wê biqewîmin berî wê hîs dikim û ev bi awayek parçe parçe di xewnên min de derdikeve der, lê hinek caran nikarim dahûrînim.

Rêbertî di derheqê pêvajoya li pêşîya me perspektîf da, ev perspektîf bersiva xeyalên min e. Çiqas xweş ji gelê xwe re bibim bersiv û ji Rêbertiya xwe re bibim rêheval. Yan ez ê bi ser bixim û bigihînim encamê yan jî ez ê jiyanek ji rêzê berdewam bikim. Ev jî ne li gor min e, her çendî ev di demek kin de min têr bike jî lê piştî wê dibînim esas tiştê dixwazim ne ev e û zehmetiyan dijîm.

Belê, bawerim a herî rast xeyal, hêviyên xwe di nîvî de nehêlim û dubare şansê xwe bicerîbînim. Ger wisa bibe ez ê nêzî hevalên xwe yên Dêrsimê jî bibim.

15 Çile 2007

Merheba keça dilê wê bi qasî yê zarokekê xeydok

Ez her tim mereq dikim porê hinek mirovan çima zû spî dibe, min îro bersîva vê girt an jî fêm kir. Ger pirsgirêkek neyê derbaskirin û ew pirs-girêk xwe dubare bike wê bi xwe re bêçaretîyê ava bike. Bêçareserî jî di dil û fizîka mirovan de nexweşîyan peyda dike.

Em weke civata li biryargehê dimînin perwerde dibînin. Me dîroka PKK'ê ya van salên dawî dît, dîroka PKK'ê mîna avekê jiyane; tu çiqas vexwî jê têr nabî, çiqas fêr dibî her dixwazî fêr bibî. Em encex dikarin şoreşgeriya rast di dîroka PKK'ê de bibînin. Lê yên li vir perwerdê cidî nagirin hene û dixwazin rojevên sunî ava bikin. Di nav tevgera jin de çima tasfiyekar derketine, ev çima her tim tê dubarekirin? Ya rast pêwîst nake jin xwe cuda rêxistin bike. Weke ev pirs nebes bin, heval vê jî dikin mijara henek û pêkenînê. Pirsgirêkên derdikevin tînin dubare-kirin û ger ev pirsgirêk çareser nebin wê di demê pêş de bi xwe re pirs-girêkên cuda bîne. Îro êdî ji acizbûnê destên min direcifin. Ji ber nêzîkbûnên hinek kesayetan hemû xebatên me bandor dike, xebatên rêxistinî bi hincetên cur be cur re astang dikin. Bêdengmayîna hevalên xort a li hemberî van rewşên tînin jiyîn û ev rewşa wan a bêdeng pirs-girêkên xwe kûrtir dikin. Ger wisa bidome perwerde wateya xwe winda dike û dibe sedema em wext jî winda bikin. Ji vir şûn de divê li hemberî hinek tiştan helwastên tûjtir were dayîn an wê jiyana rêxistinê xirab bikin û li pêşîya pêvajoyê bibin asteng.

18 Çile 2007

Keça evîndara hêviyê ya di pîvanên jiyane de taviz nade

Di wê baweriyê de me nakokî û pevçûn her tim hinek tiştan ava dikin. Ev di xwezayê de jî wisa ye, jiyana zindiyan a dijberî hev heye. Di vê xalê de nakokî û pevçûnek heye lê ne rewşa mijarek mîna dijberên hev tine dikin. Ev nakokî carnan bi awayek hilhevkirî carnan jî bi pevçûn hebûna xwe didomînin. Bêguman ev lihevkerî bi şêwazê bişibin hev jî nîne. Di nakokî navbera herdu dijberand de tiştek nû ava dibe. Pevçûn heye, xweza yeksane, parçeyek bi tena serê xwe zêde ti nirxa wê nîne. Xweza di nav cudabûna parçeyên xwe yên cur bi cur de wateya xwe dibîne û xweşîkbûnê dafirîne.

Ger em vê di aliyê jiyana xwe de jî bigirin dest tak bi serê xwe nabe tiştêk, biqasî civak heye ew tak jî heye. Biqasî xwe gihand partîbûnê ew azade û nirxa mirov heye. Nirxa xebatekî hemalwarî ti carî ji azadî û îdolojiya me re nabe bersiv. Her tiştê ji îdolojiya me qut tê destgirtin û tê kirin bê nirxe. Pêkhateya me ya li vê derê bi gelmperî ji hevalên di pratîkê de mayîne, di aliyê pratîkê de ti pirsgirêka wan nîne lê di mijara îdolojiyê de nebesiyan dijîn pêk tên. Niyeta wan paqije lê hinek taybetmendiyên kasayetî yên çînî û herêmî hene. Ev taybetmendî jî li pêşiya pêşketina hevalên min û di jiyana tevgerê de nebin xwedî têgihiştinek baş dibe asteng. Ev rastî êş dide min.

Mînak min hevalek rexne kir. Ji ber rexneya min bi min re naxive. Ka ez bêjim rexne nerast bû, lê bi wî rengî jî nîne. Ez xwe jî lêpîrsîn dikim lê rexneya min di cihê xwe de bû. Min got, ev heval di peywendiya xwe ya bi hevalên din re bi awayek madyatcî nêz dibe. Ev encama min di çavderiya jiyane de bi dest xistiye, ew jî niha bi min re naxive. Ev nêzîkatî mirovan ber bi mecbûriyê ve dibe. Lê ev nikarîn li pêşiya min bibin asteng. Ji dijmin her tiştê hêvîkirin lê dema mijar dibe hevaltî her tiştê disekine, mirov tiştên wisa ji hevalên xwe hêvî nake. Ev taybetmendî çanda gundîtiyê ye û dê bi demê re veguhere bertekên cuda. Şêwazê peywendiya bêrêxistinî ango li gor pergala tarzê zilam veguhere rêxistinbûna çetegeriyê. Jixwe ya min ditirsîne jî ev e. Jin hevala te ye tu xwe dispêriyî, lê peywendiyên bi zilam ên dostanî û hemraziyê jiyane xirab dike. Ji ber di van peywendiyên de rêxistinbûn nîne dikarin her tiştî di navbera xwe de nîqaş bikin, heta ji bîr nakin ji nîskê dikin gîsk. Şêwazê têkiliyên teng ti kesî nake partî. Belê, ji rika bahozan ez ê serhildêr bim û li ser piyan bimînim.

17 Çile 2006

Merheba hevala min a hêja Mizgîn

Min pir bêriya te kiriye û pir dixwazim te bibînim, pir dixwazim bahozên di dilê xwe de bi te re pave bikim. Di van rojan de kûr nanokiyên dijîm. Ji rêzêbûnên di nav jiyane de pir zora min diçe û dema hewl didim fêr bikim nêzîkatiyên teng pêş dikevin. Hevala min a hêja Mizgîn,

ez jî carnar dixwazim weke hinek mirovan normal nêz bibim. Lê, nabe
û di dilê xwe de janek kûr hîs dikim.

Di vê demê de dudiliya gelo ji hinek mirovan re bêjim heval an na
dijîm. Hinek şexs ne hêjiya vê têgeha pîroz in. Ev şexs an wê birevin an
jî bi awayek her kes xetayan bikin ji bo çavên hinek hevalên me jî vebin.

Belê, ji bo ji we re bêjim heval zehmetiyan dijîm, ji ber hûn jiyana
rêxistinê tine dihesibînin. Peywendiyên herêmî û ahababî, tenê bi hinek
kesan re teng mayîn, di bin navê peywendiyên civakbûnê de jin li gor
xerîzeyên xwe bikaranîn. Yên tevî vê şêwaza peywendiyê nebin jî bi
nêzîkatiyên bixin bin zextan û biçûkxistinê hewl didin bişkênin. Ango
êrîşî yê li gor wan nebe dikin. Ev nêzîkatî tenê aydê tasfiyegeran e. Ya
herî xeternak van tiştan di bin qilîfê hevaltî û şoreşgerbûnê de dikin. Ez
vê nakoyê li hemberî hemû hevalên xort najîm tenê li hemberî hinek
hevalên xort dijîm. Ya rast jina bi zilam re dibe yek nikarim bêjim heval.
Yên wisa dibe bi qasî hejmara tiliyên destan kêmin lê di encamê de
hene. Nediya ka ev jin çî red dikin û çî jî qebûl dikin. Berjewendiyên
wan li kîjan alî bin teraziya xwe li gor wî alî eyar dikin. Teraziya wan pir
sexlem e û her dem dizanin teraziye di hevsengiya wê de bigirin. Jinên
wisa pir kirêt dibin li gor berjewendiyên xwe bi herdû zayendan difîzin.

Belê, hevala min a hêja Mizgîn, min serê te êşand lê min pêwîstî dît bi
te re parve bikim. Tu dizanî, qet naxwazim bibe sibe. Ji ber naxwazim
rûyê wan ên kirêt bibînim.

18 Çile 2007

Merheba kulîlkên min ên bêrîkirinê yên min li pişt xwe hiştine

Her tiştê mirov dijî, di dil û mejiyê xwe de qeyt dike. Her weke
makîneya wêneyan dema dîmenekî digire. Bûyer, diyarde, mirov, hest
û bi kurtasî gelek tiştên tu dibêjî min ji bîr kiriye, di kêliyê tu qet nafi-
kirî de dizivirin. Ba, gotin û darek tiştên te berê jiyîne tîne bîra te, car-
nan jî di xewnên te de xwe didin nîşan. Bîranîn wînda nabin.

Piştî 9 salan min şevê din hevaleke ku min di jiyana medenî de nas di-
kir di xewna xwe de dît. Ez qet li wê nehizirbûm lê min di xewna xwe

de dît. Gelo çavkaniya xwe ji bêrîkirinê digire yan jî dema min carcaran xwe lêpîrsîn fikir û çûm raboriya xwe digire? Di xewna xwe de em diçûn cihên me her tim hev didît û ez gerîla bûm. Te dixwest em biçin cihên em her tim diçûnê. Min jî digot; em biçin cihek bêdeng, gelek tiştên dixwazim bi te re parve bikim hene. Em li nêvengek qelebalix bûn û tiştên min dixwestin parve bikim parve nedikir, di dilê min de dima. Min pir dixwest bi te re tenê bimînim lê min nedizanî ez ê bi te re çî parve bikim. Di rastiya xwe de ger tu hatiba welat dê baş ba, dibe wê demê me parvekirinên kûr pêkanîban. Dihizirim teqez em ê pir li hev ketiban. Lê dîsa heval piştî salên dirêj te dîtî pir xweş bû. Li xwe pir baş binêre, bi hêviya em hev li ser lûtkeyên çîyan bibînin li benda te me.

22 Çile 2007

Ji bo dayîka min a xweşik a hezkirinê bi rondikên çavên xwe av dide

Dayê çî seyre, nizanim ji te re çî binivîsim. Bi demê re mirov biyanîbûnekê dijî. Ya rast ev biyanîbûn te ji nixrên te qut dike. Ger tu jinek bî tu yê dayîka xwe her dem di dilê xwe de hîs bikî, ji ber tu rû be rûyê heman êş û bûyeran tê. Li her cihê hişmendiya serdest lê heyî li wir zilam heye. Yê vê zilm, êşê dijî dayîk, jin, zarok û kesên temen mezinin. Belê, dayîka min, te bi sosîn û beybûnên Zagrosê re maç dikim û lêhiya hezkirina di dilê xwe de vediguherînim robarekî û tevî deryaran dikim. Bi qasî derya û okyanûsan ji te hez dikim. Dayê tu dizanî, gerîla di pênasekirina hezkirinê xwe de pir zehmetiyan dijî û ew hezkirin her tim di qefesa dil de veşartî dimîne. Dilê her gerîlayek jin mîna okyanûyane. Dayê tu dizanî, bi qasî ji te ji dayîkên cefakar ên din jî hez dikim, ez xwe weke parçeyek we dibînim. Bawerim bêrîkirin û hezkirina dayîkê ev e; ji hemû dayîkên kedkar hezkirin.

Belê dayîka min a bedew, gelo wê şansek min ê din çêbibe te dubare bibînim an jî wê hevalên min dayîkên xwe bibînin? Bi ser re sal derbas bûn, ew zarokên tevî gerîla bûne niha mezin bûne, hîn dayîkên xwe nedîtine. Ger rojekê rastî hev werin dê dayîk ewladên xwe nas bikin? Divê nas bikin, ma ne wisaye dayîka min. Dayîkek ti carî bêhna zarokên xwe û wateya di çavên wan de jibîranake. Dayîkek bi qasî dijî nêrînên

zarokên xwe di dilê xwe de neqîş dike. Dizanim bêhna azadiyê ji dilê dayîkan tê. Dizanim tu dixwazî di heman çeperê de bi keçên xwe re henase bigirî û herdu keçên xwe hembêz bikî.

Belê dayîka min a bedew, dilê xwe dikim destegulek û ji te re rêdikim.

23 Çile 2007

Ji bo jina xweşik a li pey îtopyayên xwe dibeze

Ti peyv nikare rastî, azwerî, azadî û xweşikbûna di rihê te de pênase bike. Encex dikarim li hemberî xeta te ya jiyânê xwe lêpirsîn bikim. Jina bedew, negengaz e mirov li hemberî zehmtiyên te jiyane hêrs nebe. Di şexsê te de min dubare ev rastî dît. Divê mirov zehmetiyan veguherîne hêz û azadiyê.

Tevî bi ser re sal derbas dibin jî hîn xalên di hişmendiya zilam de xwe dubare dikin hene. Jina bedew, min di şexsê te de êşên hemû jinan di dilê xwe de hîs û jiyân kir. Divê şêwe bidim hestên dijîm û dixwazim xwe li kêleka we hêdika dirêj bikim û razim, dixwazim bibim heval. Ger mirinek min hebe bila weke te be, bi egîdî be.

Tu dizanî jina bedew, hevrêyên te jiyana te zindî kirin, film çêkirin. Di-be ew romana te dixwest binivîsî te nenivîsand lê hevalan ew jiyana te ya destanwarî kir filim. Tu dizanî malbat û derdora min ji ber azweriya li hemberî te dijiyan têkoşîn nas kir. Ez di wan deman de zarok bûm, min ji mezinan dibihîst; jinek hatiye girtin, telis bi serê wê de girtine û piştî birîna mala welatparêz a lê dîma. Dema dibin mala welatparêz a lê dima tevî wê zexta dijim jî ji dijmin re gotiye; ez vê malbatê nas nakim û ji ber vê girtine.

Ji zarokatiya xwe heta niha min her tim mereq dikir ka ev jin kî ye. Bî vê jinê re navendek hêza ez ber bi xwe ve dibirim hebû. Dîsa piştî salan min fêhm kir, ji ber agahiyên nebes tu berdayî. Hat gotin ku piştî tu hatî berdan şûnde derbazî çiya bûyî. Jina bedew, min ba û evîna te wisa nas kir. Min wê demê dizanî navê vê jina ew qas tê behskirin Şîlan e. Lewra min jî xwest navê xwe bikim Şîlan. Bê ku agahiya navê te ye ketim nav lêgerîna navan. Vê carê jî min navê Bêrîtan nas kir. Dema ketim nav

pirsên wateya Bêrîtan çi ye, Bêrîtan kî ye, min bersivên xwe yek bi yek dîtin.

Navê Bêrîtan navê eşîrekê ye. Di heman demê de min fêhm kir navê jinek gerîla ya ji bo radest nebe xwe di zinaran de davêje xwarê Bêrîtan e. Zarokek berxwedêr dilê min dorpêç kiribû û min bi vî rengî fêhm kir tu Şîlan î. Her çendî bi giştî nebe jî îro jiyan, azweriya te ya azadî û hezkirina te fêhm dikim. Ger bi we ve girêdayî bim divê weke we bim. Dîsa salvegara şhadeta hevala Viyan nêz dibe. Lê Rêbertî hîn di Îrmaliyê de ye, ger ji duristbûnê çirûskek herî biçûk jî hebe, wê ev çirûsk agirê min gur bike.

30 Çile 2007

Merheba şînoka jiyanê di asta azweriyê de di dilê xwe de hez dike

Ger tu wate bidî jiyanê, jiyan pîroz e. Di çavkaniya jiyanê hemû de her tim lêgerîna xwe gihandina jiyanê herî xweşik heye. Di çavkaniya şerên ji bo azadiyê tê dayîn de xwesteka xwe gihandina jiyanek baş heye. Ji bo şoreşgeran jiyan pîroz e. Em mirovên xwe weke şoreşger dizanin jî ji bo vê hemû zehmetiyan didin ber çavan. Şoreşger baş dizanin wê li ku derê çi bikin. Dema wexta wê hat bê ku tiştekî bihizirin ji bo jiyanek birûmet giyana xwe feda dikin. Ji bo jiyanê xweşik bikin şerên herî mezin didin.

Ji bo şoreşgeran di jiyanê bi berxwedanî jiyîn azadî heye. Bi qasî te ji diyalektîka jiyanê fêhm kir tu ew qas azadî, bi qasî tu azad bûyî dê wate li jiyanê bar bibe û mîna biharê xweşik bibe. Jiyan ji bo gerîla bi coş, zindî, macera û romantîk derbaz dibe. Tama jiyanê bi çiya, xweza û demsalan re cudatir e. Gelek wate û xweşikbûnên te di mirov de nedîtin li çiya dibînin û dijî. Xweza mamosteya mirov e, mirov li hemberî xwezayê şagirt e. Mirov bê xweza hebûnek bê hêz e, mirov bi xwezayê re heye. Ger jiyan yekpare be berz dibe. Ez di asta azweriyê de bi jiyanê ve girêdayî me, dema nêzîkatîyên jiyanê xirab dikin derdikevin li hemberî vê ew qasî bi hêrs dibim nikarim vebêjim. Pîvanên pergale di vê nêvengê de nayên jiyîn, ger li hemberî vê bêdengiyek hebe wê demê tê wateya bêrîkirina jiyanê kevîna heye. Divê em nehêlin jiyanê me ji

rêzê be. Jiyan ji bo me nirxa herî pîroz e. Ev jiyan dareke û bi xwîna hevalên me hatiye avdan. Bi qasî mirov ji jiyanê hez bike wê azad bike û azad be.

2 Sibatê 2007

Ey jiyan!

Dixwazim te vebêjim
Bi rîtma coşa dilê xwe
Tu dibî rengê min
Ez ê bibim soz û çalakiya te
Vaye ev e ya jê re dibêjin bêdawîbûn
Di xemzeya zarokên nû ji dayîk dibin
Û zarokên zozonan de
Bûna dîrok û şînbûn
Azadî
Û
Jiyana bêdawî jî ev e

4 Sibatê 2007

Merheba keça pêşerojê dibîne

Gelek caran jiyan dubare dibe. Bûyer û diyarde hema weke hevin, tenê lîstîkvan diguherin. Sedema vê dubarekirinê lêpîrsîn dikim û encama gihiştîmê ev e. Em heman ferdên civakê ne angî ji heman hevîrî ne. Ez vê di wateya biçûkxistinê de nabêjim. Lê derûniya xwe biçûkxistin û hişmediya bi bişaftina dijim re avabûye. Dibe ji vê be di nêvengên cuda de heman pîrsgirêk xwe dubare dike. Qêra serhildêriya di dilê min de dipirse û dibêje; dîsa çi dibû lê çi bikim divê qêra xwe bi te nedim hesandin, tu min fêhm dikî? Ez serê xwe dişibînim guldangekê û

dixwazim tovên azadiyê yên tê de hatine çandin diyarî hemû mirovên xweşik bikim. Lê tovê li ser vê axê hatî rijandin kurm û kevir nahêlin ev tov mezin bibe. Her tim tengav dikin, rehên xwe bernadin kûraniyê. Kêmek maye em perwerdê xilas bikin, lê xalên di nebesiyên bîrdozî de derdikevin berdewam dikin. Hinek kesayet nelêhûrbûnên xwe bi tiştên cuda ve dinixûmînin. Ev nêzîkatî mejiyê min ditevizîne. Nêzîkatiyên mîna; “rêveberî bersiv nedaye daxwazên min, ji ber vê dikarim jiyanê xirab bikim, ez ê serî li pîvanên belav, şêlo, ligorxwebûn, bêdisîplînî, peywendiyên ahababtiyê bidim, bila ti kes dengê xwe ji min re neke,” di kesayetên weke bîrdozî zelaliyê najîn de serwere.

Li hemberî van hemûyan jî xwe li ser lingan girtin pir girîng bû. Ev nêzîkatî di mirovên min ji wan re digot hevalên min in didîtin de ez êşandim û xemgîn kirim. Lê divê rastiya serdestiya zilam jî li ber çavan were girtin û jina dikeve bin bandoriya vê rastiye baş were dahûrandin. Sedema dihêle hişmendiya serdest rabe çargaviyê ji ber paşverûtiya jina kole û seknên bi parçe ne. Pirsgirêkên di vê nêvenga biryargehê de xwe dubare dikin, di gelek hevalên jin de matmayîn, bertek û reşbînî ava kir. Lê tevî min berê wê du mehan qêr kir, hinek hevalên me bawer nekir, gotin tu zêde dikî yan jî nexwestin vê xeteriya tarzê peywendiyê bibînin. Weke jinekê helwesta xwe nîşa nedan. Îro jî hatine, ji bo vî agirî vemirînin dibezin avê. Ji rika hemû zehmetiyan re xet û jiyana partyê dana avakirin moral da min. Min ji vê encamê pir hêz girt. Encama zehmetiyan dîtin pir xweş e ji ber mirov carna encama wê nabîne. Di nav berfê de bûna berfîn pir xweş e.

8 Sibatê 2007

Mirovê berz ê hewl dide mirovê nû ava bike

Rêberê min, ez ê sibe dîsa bizmarên çarmixkirî di dilê xwe de hîs bikim, bijîm. Bi ser re sal derbaz bûn lê me hîn hûn di nav wan çar dîwaran de azad nekiriye.

Rêberê min, ger hûn neban wê rewşa jinê çawa ba? Hizirandina wê jî mirovan dibizdîne. We bîrdoziya rizgariya jinê danî holê, we ev qas zeel kir lê nêzîkatiyên zilamê serdest vê bîrdoziyê di cewher de qebûl

nake. Rêberê min, dihizirim û ji xwe re dibêjim; ger we ev tespîten dîrokî yê di derbarê jinê de negotiban wê çi ba? Weke jinekê li hemberî keda we xwe deyndar hîs dikim. Di vê wateyê de hewldana min a herî mezin rastî jiyanî kirin û li ser vî hîmî wê jiyîn û têkoşînkirin çêbibe. Bê ku pes bikim, ez ê îsrar bikim dil û hizra xwe veguherînim kulmekê li hemberî firtoneyan bisekinim û bêjim ez li vir im. Bê ku mirov zehmetiyan bikişîne bijî gavên mezin jî nayên avêtin.

Di xala bîrdoziya me jiyanî bibe de yên bê bawer nêz dibin jî hene. Bi awayek vekirî van nêrînên xwe nayînin ziman lê di rastiya wan a jiyanê de ev bi awayek pir vekirî tê dîtin. Yên bawer nakin guhertinek çêbibe û yên dibêjin wisa hatiye wê wisa jî biçe hene. Hişmendiyeke pir xeter e! Wê demê em têkoşîna çi didin? Ya yên vê rastiye dijîn? Tu yê şehîd bikevî û tu yê çima şehîd bikevî nizanî.

Rêberê min, ez bi bêrîkirîna di dilê xwe de we hembêz dikim û maç dikim.

14 Sibatê 2007

Merheba raza xeyal û azweriya min

Zivistan sir û seqema xwe li pişt xwe dihêle û bi coşek mezin silav dide biharê. Berf bi ronîya rojê re, bêdeng bêdeng dihele û hêdîka diherîke nav axê. Ax jî dixwaze şîn bike, bi kulîlkên reng bi reng ji me re bikene. Dema demsala zivistanê ji biharê re ducanî be, bihar jî ji hêviyên me yên azadiyê re ducaniye. Ji bo bigihîn vê hêvî û azadiyê dikevin pêşbaziyeke bêhempa. Çawa em fêr bûn ji nav zehmetiyan hêvî, hezkirin, azadiyê bafirînin, dizanin bikenin jî. Gelo çavkaniya xwe ji rastiyan dîrokî yên me jiyane girtine nizanî? Em weke gel û taybet jinên Kurd dizanin di nav zehmetiyan de bi hêvî bin. Ji niha ve gelê me xwe ji raperînan nû re amade dike û em gerîla jî ji bo hema zû derkevin pratîkê bêhedar ranawestin.

Xeyalê me gelekî Bakûr e, her hevala diçe Bakûr bi coş û moralek mezin diçe. Yên li pişt wan dimînin jî dikevin nav xemgînî û çavên wan tijî rondik dibin. Hesta hevalên xwe oxir kirin û li dawî mayîn ti peyv,

gotin nikare pê nase bike. Ji ber rastiya dijmin, çûyîn heye lê zivirandin nîne. Gule navnîşanê pirs nakin, mîna bayekî li bedena te dikeve, tu destpêkê germahiyekê hîs dikî û piştî wê tu lertzînekî dijî. Ji lertzînê re dibêjî xêr hatî û dikenî. Di vê kêliyê de dixwazî di şûna hevala xwe de bî. Êdî çi dibe bila bibe teqez divê ez jî biçim Bakûr û Batonê. Mîna çûkekê hemû astengiyên ji holê rakim bifirim li Botanê venîşim. Li qadên Botanê nîrxê hevaltî û mirovan zêdetire. Li benda min be Bakûr, ez tîm bi te re dibim heval.

18 Sibatê 2007

Merheba kulîlka hezkirinê

Baran bê navber dibare. Dengê baranê tiştên esas bixwazin binivîsim asteng dike. Dengê baranê ji nêz de bihîstin pir xweş e, ji zarokatiya xwe heta niha pir ji baranê hez dikim. Lê heriya piştî baranê derdikeve, yek jî dema ew herî bi pêlavên me ve dimîne pir aciz dibim. Çi seyre tu ji baranê hez bikî lê ji heriyê hez nakî. Tu yê ji gulê hez bikî lê ji stiriye wê hez nekî. Tê bîra min, dama baran dibarî min xwe davêt kolanan û rê bi rê dimeşiyam. Di demên wisa de min pir dixwest bi hevalek li gel aram dibîm û nîrx didimê re bimeşim. Tiştê herî zêde min jê hez dikir yek jî ev bû.

Duh rojbûna min bû û min ev ji hemû hevalan veşart. Ya rastî di van mehan de vezasiya min çêdibû. Lê îsal hîn vesaziya min ji min re nehatiye gotin lê min xwe li gor Bakûr amade kiriye. Her destpêkek zayînek nû ye. Ez dixwazim jiyaneke bi heybet li vê destpêkê bar bikim. Divê azadiyê li jiyaneke bar bikim û bijîm.

Baran min ber bi kulîlka min a hezkirinê Elîfa min ve dibe. Dayîka min a bedew, naxwazim tiştek bi te were, tenê carekê dixwazim te bibînim. Her çendî te nebinim jî min dixwest hevala Mizgîn te bibîne. Dayîka min a bedew, dixwazim cîhanek xweşik diyarî te bikim. Min pir bêriya Elîfê jî kiriye, xwîşk û birayên xwe yê din, bavê xwe jî.

Ji we hemûya pir hez dikim; Ûmran, Emîne, Elîf û Mizgîn.

Ji evînek nîvçe mayî, ji rêwîtiya hêviyê re merheba

Min xwest ji kêlekek jiyana xwe, ji parçeyek dilê xwe û ji evîna xwe ya nîvco mayî dest pê bikim. Ji bo min hebûna herî pîroz û herî bi nirx Rêber APO ye. Rêberê min, tiştek bi we bûyîn tê wateya tinebûna Kurdistan, bûna agir û şewîtandin. Rêberê min, ger tiştek bi we bê wê demê çi wateya jiyankirina min heye? Ger azadiya we pêk were wê demê jiyana ji min re dibe jiyana. Rêberê min, min xwest hezkirina xwe ya li hemberî we qêr bikim lê di nîvî de ma. Rêberê min, ez ê nîşa bidim ka çi qas bi we ve girêdayî me. Ez ê nîşa her kesê bidim ka wateya destê xwe li Rêber APO dayîn tê çi wateyê.

Rêberê min, we her tim hewl da em şiyar tevbigerin lê me qet fêmanekir an nexwest fêman bikin. Cidîbûna komployê me bi hev neda hîskirin. Pêkanînen di pergala Îmralîyê de tê pêkanîn ji yên hûcreyekê wêdetir û dîsa jî em fêmanakin dijmîn dike. Gelo mirovek bi tena serê xwe di hûcreyekê de heta kengê dikare bîmîne? Dijim bi plansaziyek demdirêj bi ser me de hat û hewl da me fêrî jiyana bê Rêbertî bike. Em jî fêr bûn, sal derbaz bûn û me hîn ti guhertinek di şertên Rêbertî tê de dijî neda avakirin. Her roja diçû şert zehmetir kirin. Divê gelê Kurd êdî hêrs, kîn û tola xwe bi yek dengî bîne ziman. Êdî em weke gel ti tiştên wînda bikin nîne.

Tenê nirxa me ya azadiyê nirxa Rêber APO û şehîdên me avakirîye. Ger em li hemberî vê komploya navnetewî encamek dernexin em ê weke gel dîrokê wînda bibin. Em ê weke jin jî ketîbûnên herî mezin bijîn û êdî jin azad nabe. Wê koletiya jin bi awayek herî kirêt berdewam bike.

Rêberê min, em jin ti carî we bernadin. Ger tenêbûn mijara gotinê be em ê hemû vê tenêbûnê bijîn. Me ji zanabûna we jiyana û rûmet dît. Em ê êdî vê jiyana bi rûmet wînda nekin. Hemû cîhan ji hêza we ditirse, ji ber vê jî bi awayek dizîka we jehirî dîkin. Ew wêrekiya wan nîne vekirî bi we re şer bikin. Bi pêşxistina komployan hewl didin we tine bikin. Lê nikarin we tine bikin. Rêberê min, hezkirina dilê xwe ya mîna xunçeyan dibişkive vediguherînim biharê û dixwazim diyarî we bikim.

28 Sibatê 2007

Merheba Avaşîn

Piştî çend mehan şûnde dubare Avaşîn dîtin hestek pir xweş e. Avaşîn ti carî delalî, pakbûn, herîkandin û xwerûbûna xwe winda nake. Ji roja destpêkê min Avaşîn dît heta niha qet nehatiye guhertin. Kengê Avaşîn dibînim mîna zarokêkê bi coş û kelecana dibim. Hema zû dixwazim bigihim Avaşîn û parve bikim. Avaşîn dilê Zagrosê ye. Avaşîn jiyan, zindîbûn û xwerûbûnê li Zagrosê bar dike. Ji rîkê hemû zehmetiyan dîsa rêwîtiya xwe berdewam dike. Di nav çiya û kevirena hişk de wisa nazdar nazdar diherîke, mirov ji meyzekirina wê têr nabe. Ax ew pêlên Avaşînê hene, li pişt xwe dizivire, digirniye dîsa rîya xwe berdewam dike û diherike. Robar û çemên avê yên mezin tirsekê dixwe dilê mirovan lê Avaşîn mirovan natirsîne, berovajî wê di mirov de xwesteka bi Avaşîn re rêwîtiyê bike pêş dikeve. Tu di hemû rêwîtiyên xwe de bi Avaşîn re li çiyana bigerî nawestî, berovajî wê her tim dixwazî rêwîtiyan bikî û tu her tim mereq dikî ka Avaşîn dibe mêvanê kîjan çiyana, bajar û bajarokan. Kî dizane Avaşîn çend giyan, bextewerî dide çiya û mirovan.

Belê, dixwazim xwe noqî kûrahiya Avaşîn bikim û bi pêlên wê re têkoşîn bikim. Kêliyên qaqîlbaz firînen xwe yên berz dikin, baz di daketinên xwe yên herî tûj de tama azadiyê dikin, ez jî bi zelalî, pakbûna te dixwazim xwe ji rihê koletiyê bişom û mîna berfînekê di kendalên Zagrosê de şîn bibim. Avaşîn, min jî bigire bi xwe re bibe. Bêhna dîrokê ji te tê, tu dîroka şaristaniyê ya heta roja me ya îro hatî yî. Avaşîn kî dizane te şahîdiya kê û çi kiriye, kî dizane tu bûyî hêviya jiyana gelek mirovan? Min dixwest çîrok û evînen di hembêza te de jiyane binivîsim. Dixwazim ji bo nîfşê nû ji kenê te yê şîn û hezkirina te kêliyêkê bafirînim. Dixwazim weke te rêwîtiyek bêdawî bikim û weke te ji bo dîroka mirovahiyê mirasekê bihêlim. Tu çi dibêjî? Weke jinek gerîla ji bo nîfşê nû jiyane azad bihêlim? Wê bibe hevîdîna me ya dawî û herî dawî jî be min dixwest te bibînim û wan pêlên te hîs bikim. Ez ji mêzandina te têr nabim.

Tu dibînî Avaşîn, jin çiqas evîdarê te ne.

9 Adarê 2007

Merheba bahoza dilê min

Dema bihar tê xemgîniyek xwe dor bedena min dalîne. Veqetîn li deriyê dilê me dide. Gelo rêgeza xwezayê ye, çima her tim veqetîn hene? Bihar ji bo gerîla serpêhatiyek veqetînê ye. Her hevalek bi çenteyê pişt xwe ve bi bask dibe difire cihekî. Me ji bo Bakûr heval oxir kirin û îro jî vesaziya hemû hevalên li biryargehê diman çêbû. Hema bi carekê biryargeh xir û xalî bû. Me zivistanek din jî li pişt xwe hişt û silav da biharê. Ji rîka hemû zehmetiyan me xwe gihand rojê. Belê, dîsa me hemû heval oxir kir piştî wê ez ê bi rê bikevim. Li pişt hevalan mayîn mirov qehir dike.

Belê, hevala min a hêja Mizgîn, ez ê di wateya fizikî de ji te qut bibim, dizihirim tu yê wateyê bidî vê veqetînê. Divê evîna xwe ya di nivî de mayî pêk bînim. Dixwazim dubare şansê xwe bicerîbînim. Ji bo jiyana Rêbertî dixwazim van zehmetiyan hemûyan bijîm. Bawer bike gula min, ez rojekê ne ji te, ne ji çiya û ne jî ji hevalan dûr jiyan nakim. Min her tim bi Rêbertî re rêwîti kir lê divê ya vê carê cuda be û wê cuda jî be. Hevalên min ên bedew, ez ê dîsa ji we veqetim lê rihê min dê her tim bi we re be. Di jiyana we ya şoreşgerî de serkeftinên mezin dixwazim.

12 Adarê 2007

Merheba keça dilê dîl

Hinek kêlî hene tu nizanî bigirî yan jî ji kêfan bikenî. Ez di nav hestên pir dijwar de me. Rêberê min, min xwest bi we re henase bigirim lê guncav nedîtîn. Sedema guncav nedîtînê; ji ber çûn û hatina min a berê xeteriya ez ê deşîfre bibim. Dikariyan rêbazekê peyda bikin. Min dubare gelek tişt jiyan kir. Lê belê ew hêvî hatibû dayîn û min xwe di her warî de amade dikir. Piştî vê bersîvê şûnde min ji we re got; divê biçim Bakûr, êdî ez li vir namînim û pêşniyara min a çûna Bakûr hat pejirandin. Lê tevî pêşniya min a çûna Bakûr hat pejirandin jî ez kêfxweş nebûm. Ma neçare her tim wisa bibe? Destpêkê hêvî digirî piştî hemû hêvî vediguherin xweliyê. Xeyala salan bû li bendê bûm pêk tê lê piştî çî? Gelo tişteke bi Rêbertî were ez ê bikarim rakim?

Em di pêvajoyek pir hesas re derbaz dibin. Divê em pêwîstiyên pêvajoyê baş bipeyîtînin. Pêvajo gavên dîrokî ferz dike. Pêwîstiyên demkî ne mayînde ne. Divê di vê pêvajoyê de gavek dîrokî were avêtin an em ê pêvajoyê bi serkeftinê tacîdar nekin. Pêwîstî bi gavek şexsî heye. Di her heyamekî de hevalek bi rengê xwe gavek avêtiye û bi vê gava xwe re jî pêngavek nû daye pêvajoyê.

Rêberê min, dixwazim bi giyan, rih, hest û nêrînên xwe re şeyanê dostaniya we bim. Her kêliya dijmin we jehir dike ez ê çawa tama ji jiyane bigirim? Giyanek min heye, em wê jî bikar naynin. Êdî naxwazim mîna temeşevanekê rawestim, wê heya kengê ev bêdengî berdewam bike? Divê mîna volkanekê di nêvenga dijmin de biteqîbam. Hinek nêzîkatî çawa dibin bila bibin ez ê baweriya xwe ji bo pêşerojê nebîrim. Bi rojevên ji rêzê mijûl bûyîn ji xwe re rojevên sînî ava nakim. Ez ê nehêlim kesek azweriyên min ên azadiyê bihincirîne. Dê lêhûrbûnên min her tim mîna kaniyekê biherike nav axê.

16 Adarê 2007

Merheba bihara min

Êdî weke berê bi te re parve nakim. Ji bo vebêjim pênûsek min a baş nîne. Jiyan bi hemû reng, sûpriz û êşên xwe ve berdewam dike. Di aliyekî de agahiyên şadetan digirim, ji aliyê din ve jî Rêbertî jehirî dikin. Di aliyê din de heval û gelê me digirin. Sibe 21'ê Adarê ye. Cejna gelê Kurd û Rojhilata Navîn e. Bi rastî di atmosferek wisa de mirov dê çawa Newrozê pîroz bike jî dide fikirandin. Gelê me wê Newrozê bi awayek şeyanê wê pîroz bike, wê bi yek dil û yek dengî azadiya Rêbertî biqêrin. Wê tehmûla van qêran nekin, wê dîsa êrîşî gelê me yê welatparêz bikin. Lê divê piştî vê rewşa Rêbertî bi hezaran rabûna ser piyan, ji sala 1999'an xirabtir kiriban. Xwedî li Rêbertî derneketin êrîşan zêdetir dijwar dike. Divê gavek were avêtin, bi vî awayî em li pey pêvajoyê tên kaşkirin. Nahêlin hevdfîtin bi Rêbertiyê re çêbin. Wisa diyar dibe wê ji vir şûn de nehêlin çêbibe.

Tengav dibim, bêhna min teng dibe. Demek berî demekê êdî dixwazim derbasî Bakûr bibim. Bawer dikim ez ê li wir hinek tiştan bi-

kim. Hevala min Ronahî, me duh ji nûçeyan bihîst hûn hatine binçavkirin. Ez rewşa we mereq dikim. Rewşa dayîka te çawa ye, niha dijmîni îşkence li dayê jî kiriye. Niha wê dayîk di girtîgehê de çi bikin, wê tenduristî û bedena wan li hemberî wan şertan li ber xwe bidin? Hêrs dibim. Kî dizane niha Melsayê, çiqas xerîbiya dayê kiriye. Xwezî derfetên min çêbiba bi we re axivîbam. Ya zarokên din? Gernas, Hozan, Bêrîvan û Berxwedan bêyî we bifikirim nikarim bijîm. Dizanim niha hûn pir xemgîn dibin. Niha Seda weke her carên din bi nêzîkatiya xwe berpirsîyar hewl dide alîkarî bide xwîşk û birayên xwe, wan aram dike. Gelo niha apo jî girtine? Hêvî dikim tiştêk bi wî nehatibe. Hûn malbata min nin, dixwazim hûn bizanin ji we pir hez dikim. Min pir bêriya we hemûyan kiriye rihê min. Gelo ez ê carek din we bibînim?

20 Adarê 2007

Ti tiştêk min ji azweriya min gav paşde nade avêtin

Dahûrandina min hem pir hêsan e hem jî pir zehmet e. Carnan li hemberî tiştên mirov dijî peyv wateya xwe nabînin. Em gelek tiştan ew qas bi lez dijîn, hestên me mîna pêlên deryayan carekê bilind dibin carekê jî dadikevin. Sala borî di nav deman de min çiqas hestên kûr jîyan. Min xwe pir nêzî azadiyê hîs dikir. Min xwe ji hemû xwestekên xwe yê ji rêzê şûstibû, bergeha min a li hemberî jîyanê guherîbû, ketibûm wê zanebûna kûrtir li jîyanê binêrim. Ew êşên min jîyan pîroz bûn, bêriya wan rojan dikin û lêdigerim. Bi hêviya ez ê tiştêkê bikim, bi hemû ziraviyên wê min lêhûrbûn dikir û xwe lêpirsîn dikir. Ma ew lêhûrbûnên min bi dest xistibûn tenê ji bo demekê bûn? Na, ne wisa bû lê piştî wê min belavbûnek jîyan kir. Ev belavbûn ti carî li pêşîya azweriya min a azadiyê nebû asteng. Ti tiştêk min ji azweriya min nade vegerandin. Ez li benda wê kêliya dê xeyalên min pêk werin mam. Ez ji hêz û xeyalên xwe bawer dikim. Dibe ez derftên xeyalên xwe li Bakûr pêk bînim bibînim.

Ji Zagrosê veqetîn ji min re pir zehmet tê, pir fêrî hevalan bibûm. He ma zû dixwazim biçim Bakûr, ji serpêhatiyek nû re derî vekim. Divê bi hêz û çalak tevî bibim. Ji bo vê yekê ji niha ve xwe amade dikim. Tiştê herî zêde li ser bisekim divê zêde xeyalî nêz nebim. Divê li gor rastiya

Bakûr a objektîf nêz bibim. Çûyîna Bakûr yek jî hesreta hevala Viyan bû,
divê vê hesret û qêrîna di nivî de mayî pêk bînim. Min a din pêk ne-anî
bila ev pêk were.

24 Adarê 2007

Bê çirûsk ma welatê min

Ji welatê rojê hatime

Ji baranê herîkim nav axê

Di şefeqan de jîndar bûm

Di xemzeyên zarokên zozanan de

Ji cîhanê re keniyam

Demek dirêj li benda baranê mam

Min rondikên xwe herikandin nav dilê xwe

Tayên spî ketin nav porê min

Bedena min ji xemgîniyan westiya

Em zarokên rojê bûn

Me her roj bi agir rûyê xwe dişûşt

Bi germahiya agir

Me bi pîrozbûna rojê re jiyan hembêz dikir.

.....

Ev dil

Li ber sotîneriya rojê diqemire

Bê ku xembar bibe ji cîhanê re dikene

Li ber baranan bi coş dibe evîna min

Hezkirina min dibe robar, diherike ber bi deryayan ve

Di dilê gelê xwe de stranek gerîla me

Deng vedidim

Li lûtkeyên Cudî, Çarçêla, Mûnzûran

Li ber bayê dikevîm

Merheba, merheba zarokno

Ji gel Rojê

Ji we re hezar silav anîne

2 Nîsanê 2007

Merheba evîna min a azweriya hêviyê

Ev bendewarî min gehir dike. Hemû heval çûn lê ez hîn li vir im. Nizanim ji ber çi hevalên jin her tim dawî kom dibin. Dixwazim demek berî demekê tevî komê bibim, bawerim wê di dawiya vê bendewariyê de bêjin tu naçî Bakûr. Lewma êdî hema zû dixwazim biçim. Ji ber ez ê ji hevalan veqetîm pir xemgîn dibim. Gelek caran veşartî li hevalan dinêrim, hest, hizirandinên xwe vediguherînim kulmekê û dişîdînim. Hewl didim xwe ji bo kêliya veqetînê re amade bikim. Pir fêrî Zagros û hevalan bûme, xwe li vê derê aram hîs dikim. Lê êdî divê mîna qulîngan ber bi aliyê Bakûr ve bifirim. Îro dilê min bêhn fireh û hênîk bû. Îro cilên gabardînên li Bakûr li xwe bikim hatin. Ketim nav kelecenakê, mîna zarokan bi coş bûm. Negengaz e mirov li hemberî cil û bergên azadiyê bi kelecane nebe. Hevalan kedek pir mezin di ber dirûna wan de dane. Hevalê Heqî dirûnvanek pir xurt e. Bi awayek pir temîz û paqij nêzî karê xwe dibe. Di hevaltiya xwe de jî wisa ye, durist e û hewl dide tiştên herî xweşik ji bo hevalên xwe çêke. Ji bo tu mirovekî nas bikî divê tu li karê wî yê dike temaşe bikî. Belê hevalê Heqî, keda te di ber cilên min û yên hevalên din de dayî pir spas dikim. Hevalê Aram û Orhan jî pir paqij nêzî karên xwe dibûn. Bîranên min bi van hevalan re jiyane tê bîra min,

ji bo ez ê wan nebînîm xemgîn dibim. Dizanim ez ê pir bêriya van deran bikim. Di zanebûna vê rastiya bi êş de jiyîn hez dikim. Em hewl didin dilê xwe yê gerîla weke okyanûsekê mezin bikin. Divê em bizanin bi ken zehmetiyan pêşwazî bikin. Di şoreşê de veqetîn fîzîkî ne. Bi hev re mayînen bi fîzîkî jî xweşin, lê ger ev nebe nayê wê wateyê em ji hev hez nakin, em di rih de bi hev re ne û ez ti hevalên xwe ji bîr nakim. Hevalên min çavkaniya min a jiyane ne.

3 Nîsanê 2007

Dilê min mîna volqanekê ye

Wê rojek were ez ê êdî li van deran nebim. Ez ê hemû hevalên xwe li pişt xwe bihêlim û biçim. Ew qas ne hêsane çûyîna ji van deran. Bi hatina biharê re Zagros û Şamkê ew qas xweşik bûne hema dixwazim lê binêrim. Dixwazim bîranên min li vir jiyane û vê derê bi hevalan re parve bikim.

Li vê biryargehê bê ku rawestin dixebitin. Ger li derekê pergalek hebe tu çiqas ked bidî qet ne xema mirov e, lê cihê bêpergalbûnê lê hebe kî çî dike ne diyare. Hinek xwe didin jiyîn, hinek jî ji bo ji wî alî bibezin aliyê din xwe dikujin.

Rêberê min, li we dihizirim, hûn bi tena serê xwe li hemberî cîhanê şer dikin. Lê ez di nav civata hevalan de me jî nikarim tengasiyên xwe derbaz bikim.

6 Nîsanê 2007

Merheba bavê min ê por spî û kedkar

Van rojan bê navber bavê xwe di xewna xwe de dibînîm. Çi seyre, min ti deman ew qas li ser hev bavê xwe di xewna xwe de nedîtiye. Gelo ji ber dixwazim wî bibînîm ew qas wî di xewnên xwe de dibînin an ji ber ez ê êdî nebînîm? Dibe ne yek ji van jî be, dinya biçûk e û te hew dît em li cihekî rastî hev hatin.

Ya rast tiştê herî dawî di dilê min de maye şkandîna min a wî bû. Min çima nêzîkatiyek wisa raber kir nizanim. Min dixwest hemû gumanên

min dijiyan bi wî re parve bikim. Di wê baweriyê de me ger min vegotiba wê wate daba min. Bavê min mirovek bi feraset û rêgez e. Pîvanên wî yên jiyanê zelal in. Her tim li pey rastiyan e û dixwaze her kes li ser bingeha van rastiyan bijî. Mirovên bi wî re dijîn jî hewl dide jiyanê wan li ser van pîvanan bimeşîne. Wan dikşîne rastiye.

Bavo, bawerim ji ber min pir bêriya te kiriye ew qas dibê mêvanê xewnên min. Hêvî dikim tiştêk bi te nayê û ne nexweşî. Hîsên jinê bi hêz in, lewma ditirsim. Keça te Maray a pir ji te hez dike.

10 Nîsanê 2007

Xwestek û bêrîkirin

Bêrîkirin mirovan ber bi tenêbûnê ve difirine. Bêrî û xwestekên mirovan gelek in. Tiştên em dixwazin ne gelek in. Di jiyanê mirovekê de tiştê herî xwezayî ya pêwîst, xwestekên wê yên jiyanê ne. Ji roja mirov ji çanda xwedavendiyê hatiye biyanîkirin heta roja îro êdî dikare bigehe xwestekên xwe yên herî xwezayî. Mirov bûye cenewarê mirov. Nîfşê xwe dixwe, serf dike. Lewma jiyanê aniyê rewşa êdî mirov nikare bijî, kirêtî di jiyanê mirovan de tê û diçe.

Yên bi awayekê herî xweşik û xwerû dijîn gerîla ne. Gerîla di hinek mijaran de xwe diparêze, lê taybetmendî û paşverûyên me bi xwe re ji nav pergala anîne hene. Hestên xizmetê ji şoreş û pêşketina mirov re neke, xwestek jî çêdibin. Lewma mirov raziye ketîbûnê herî mezin dibe. Ji jiyanek azad direvin.

Em her dem bêriya jiyanek xweşik û welatek azad dikin. Divê em ji bo van bêrîkirinên xwe şerên herî mezin bidin. Nirxê bê şer, bê ked nayê bidestxistin. Di aliyekê de dema xwestek, bêrîkirin mirovan berz dike, fêrî firdana li ber kendalan dike, carnana tam berovajî wê dibe sedem mirov ketîbûnê herî mezin bijî. Ji ber vê yekê pîrsa were pîrskirin ev e: Çi dixwazim, bêriya çi dikim? Divê ev hest ji kûr de were lêpîrsîn. Divê mirov her tim xwe lêpîrsîn bike, jiyanekê bê lêpîrsîn dişibe meşa di tarîtiyê de. Divê em xwe ji kûr bigirin dest û lêpîrsin bikin. Di vê mijarê de kêma dimînin, ji ber xwe ji kûr nagirin dest em mirovên li hemberî

xwe jî nadin dahûrandin. Ji ber vê jiyana me ber bi şêlûbûn û ji rêzêbûnê ve diçe. Em bi seknên xwe jiyani heqeretê li gelek nîrxan dîkin. Çi bi zanebûn çi jî bê zanebûn bê kirin, lê di encamê de rastiyeke bi vî rengî ya tê jiyîn heye.

Nizanim min pê nûs girt destê xwe lê ya rast min xwest bêrîkirinê xwe vebêjim. Niha strana Rotînda ya bi navê Hêvî dibêje, her cara vê stranê guhdar dikim kizîni ji dilê min tê û bê ku biwestim û bêzar bibim her dixwazim guhdar bikim. Gelek bîranînên min bi vê stranê re hene. Li hevala Arjîn dihizirim. Min pir bêriya Arjînê kiriye, wê jî gelek ji vê stranê hez dikir. Hevala Arjîn niha li Botanê ye û herî dawî ew gihîşt bêrîkirinê xwe. Niha çavên wê li rê li beda min e. Li benda min raweste hevala min, ez ê jî weke te bigihim bêrîkirinê xwe.

Em her tim li rawestgehan digihîştin hev. Niha jî Botan bû rawestgeha me.

20 Nîsanê 2007

Jiyana me

Jiyana gerîla di hinek aliyê xwe de dişibe jiyana Koçeran. Jiyana Koçeran bi xwezayê re yek e û xwerû ye. Cîhanek wan a li gor xwerûbûna xwe heye. Hezîkirinê zêdetir ji kûr de hîs dîkin û dijîn. Di wan de nejidilbûn nîne, hezîkirin û rêza wan rasteqînî ye. Di biharan de diçin zozanan û di payîzê de jî vedigerin. Di nav xwezayê de her yek ji me mîna qulînga ne. Çiyager in. Ew şansê me çêdibe ku her derê bibînin. Yek jî ji xwe re ew qas dostên xweş peyda dîkin.

Di wê baweriyê de me divê mirov hemû deverên Kurdistanê bibîne. Kurdistan mûcewhereke ku hîn nehatiye keşfkirin. Divê mirov te nas bike, welatê min ê bedew! Em ji te hatine biyanîkirin, ketine rewşa kesayetên nexwezayî. Hezîkirin û hestên me jî nexwezayî ne. Ronahiya bajaran çavên mirovan dîtîsîne, lê di nav vê teyîsandinê de gelek kirêtî û sextekarî hene. Tu di nav wê jiyane de ji kirêtiyan hez dikî û bi tehmûlkirina kirêtiyan ve dijî. Ango çiravê mîna bihûştê pêşkeşî te dîkin û tu jî dibî piyonê wê pergalê. Her kêlî, her roj çerx te dadîqurtîne.

Belê, welatê min ê delal, divê em bi wateyên mezintir li te binêrin û nirxa te baş bizanin. Ji ber ez gerîlayek im pir bi şans im. Mîna qulingan hemû çiyayên welatê xwe dibînim, ji ber dibînim gelek bextewer im. Êdî ez ê ji derveyî Zagrosê bifirim warên cuda. Ez di dilê xwe de livandinan dijîm, dixwazim mîna perperîkan bifirim. Piştî çend mehan êdî min ji xwe re rextêk çêkir û bi kêfxweşiyek mezin didim piştî xwe, ango mîna şervanekê me. Êdî dixwazim 24 demjimêran bidim piştî xwe û xwe fêr bikim. Carnan hinek kêliyên ku rextê xwe ji bîr dikim hene lê hema piştî wê tê bîra min dubare didim piştî xwe. Çek û rext parçeyeke gerîla ye, tiştên gerîla yên herî bi nirx ev in. Min berî vê ji ber xebatan rext danîbû. Niha bi coş û kêfxweşiyek pir mezin didim piştî xwe. Dê ev ji bo armanca min a dixwazim xwe bigihînimê bibe alîkar. Gerîlayek bê cebîlxane gerîlayeke xwe radestî kemîna dijmin dike ye. Em gerîla di zanabûna vê de tevdigerin. Jiyana gerîla evîneke mirov jê têr nabe.

13 Nîsanê 2007

Merheba dilê min ê ber bi rêwîtiya hêviyê ve dîçe

Piştî salan hêvî û xeyalên min pêk hatin. Di destê min de çeka min, li piştî min çente û min xatirê xwe ji hevalan xwest, ji geliyê Şamkê xwe berdidim Çemço. Dilê min bi hêviyan dagirtiye û bi coş im. Êdî ez ê gelfî, deşt û çiyayên bi hesreta wan bûm bibînim. Ez ê êdî hêrsa dilê xwe ya mîna volqanekê mezin bûye biteqînim. Ez ê tola hevalên xwe yên şehîd hildim. Me gelek giyan dan hembêza vê axê, misoger em ê hesabê vê bixwazin. Em zarokê agir û rojê ne; heta ferdê xwe yê dawî dildarê azadiya xwe ne û girêdayî hevaltiya xwe ne. Ev ji bo şoreşgeran nirxa herî mezin û rûmeta me ya mirovahiyê ye. Em ti carî rê nadin pêl rûmeta me bikin. Di vê wateyê de ji ber ez ê derbazî Bakûr bibim pir kêfxweş im.

Berî dest bi vê rojnivîsa xwe bikim, dixwazim rojnivîsa xwe ya din temam bikim, herî kêm çend gotin jî be binivîsim lê ji ber lezgîne neçar mam hema zû ji hevala Mizgîn re bişînim. Êdî tu yê dawî temam bikî. Ji Zagrosan veqetîn ji bo min ew qas hêsan nebû hîn jî bêriya hemû deverên Zagrosê dikim. Rihek Zagrosê yê nepenî yê ku mirovan dikîşîne

xwe heye. Ez bawer dikim balkêşiyek ji dayîka xwedavend mayî heye. Yek jî demsala biharê xweşikbûnek cuda li Zagrosê bar dike. Şamkê jî ew qas xweşik bibû; her dever kesk bibû, giya mezin bibû, bi zindîbûna xwe re dest dihejand û dikeniya. Ma ez ê gulên dara behîvê çawa ji bîr bikim? Zagros cihek xwe yê taybet di jiyana min de çêkir, ez ê ti carî ne Zagrosê ne jî wan rojên xweş ji bîr dikim. Dema ez ji Qendîlê bi bask bûm firiyam Zagrosan min her tim digot; Zagros gava min a destpêkê ye. Ger ez di vê gava xwe ya destpêkê de bi serkeftî bim wê demê gava duyemîn dê bi hêztir be. Zagros ji bo min pira derbazî Bakûr bibim bû, hêviya min a rêwîtiyê bû. Min pir ji Zagrosê hez kir û pir pê ve hatim girêdan, lê min her tim bawer dikir divê biçim Bakûr. Aliyek Zagrosê Bakûr e; Çarçêla, Cîlo, Geliyê Zap û beşek Şehîd Rustem jî qada bejahî ya Colemêrgê ye. Gever, Şemzînan û Çelê digire nava xwe. Xetêke hem li aliyê sînorê Bakûr hem jî li aliyê sînorê Başûr dikeve.

Di pêvajoyên pratîkê de tu hemû enerjîya xwe ji bo şert û mercên Bakûr amade dikî, di pêvajoya zivistanê de ji ber li xeta Başûr amadekariyên zivistanê çêdibin bi awayek giştî dikevi rehavetê. Derfet û şêwazê jiyane vê li gel te dide avakirin. Belê, di navbera du pergala de asê mayîn. Lê yek jî aliyên vê yê erênî hene. Ger ji aliyê Bakûr ve êrîşek çêbibe tu dikarî ji bo xwe weke xeta paşvekişandinê Başûr bikarbîn. Zagros weke arazî pir xweş e, tenê yek kêmasiya wê heye, ew jî mirov nikare di her demsalê de gerilatiyê bike. Di demên berê de wisa nebûye. Zagros warek dîrokî ye û devereke divê ji aliyê her kesê ve bê dîtine. Ya rast weke gerilayek romantîk dikarim hemû temenê xwe li Zagrosê derbaz bikim. Lê emperyalîzim û KT nahêle em bibin gerilayên romantîk. Her roj hevalên me şehîd dixê, Rêbertiya me jehirî dike, mirovên me yê welatparêz di komkujiyan re derbaz dike. Ji ber van rastiyên heyî ne gerilatiyek romantîk, divê mirov di nav diywariya şer de gerilatiyê bike, cihê vê jî Bakûr e, qadên hundir e.

Xunçeyên Zagrosê yê hêviyê, ji we veqetîn ji min re pir zehmet tê, fêrî nêvengek din bûyîn ez ê zehmetiyan bijîm. Ger şansê min hebe ez ê we bibînim. Ev heftiyek çêbû ji we veqetîme lê di mijara hûn guherînan çawa dijîn de bi heval Agirî re nîrxandinan dikin. Ji Zagrosê ez, heval Agirî û Zîlan hatin. Pêşniyara min Botan û Dêrsim bû. Ez ji herdu-

yan yekê dixwazim, hevalan vesaziya min ji bo Xerzanê û ya hevala Agirî jî ji bo Erziromê çêkîrbûn. Ji bo min a girîng rast tevî pêvajoyê bûyîn û çûna Bakûr e. Ji ber vê cih zêde ne girîng e, ya girîng mirov bibe xwedî tevîbûnek rast û bi hêz. Niha em bi koma Erziromê re di heman mangê de dimînin. Bi vî rengî ew şansê me çêdibe em hevalên diçin Erziromê nas bikin. Li ser çawaniya hevalên dê biçin Bakûr pir baldar hatiye sekinandin û hemû kom hevsengin. Ji kêfxweşiyê çavê hemû hevalan dikene. Ez hinek hevalên di koma Xerzan û Erziromê de ne nas dikim. Hevalên ji wan pir hez dikim û nirx didimê. Daxwazên baş û ji bo mirovan pêwîst be bila pêk werin. Tiştê ez dikim jî nirxandinek îdealist e. Ma wê kî qebûl bike? Belê, cihê xwe di koma Bakûr de girtin xweş e. Rojev, peywendiyên me û feraseta me ya berpirsyariya jiyane pir cuda ye, divê em di nav peywendiyên xwe yên jiyana û hevaltîyê de pîvanên Bakûr bidin rûnişkandin.

Tiştê me bigihîne azadiyê dê ev pîvan be. Azadî rêgeza xwe paqijkirinê ye. Pîvanên jiyana Bakûr jî pîvana li hemberî xwe şer kirin û paqijkirinê ye.

Kulîlka min a berfinê, kulîlka min a mizgîniyê Mizgîn

Herî dawî jî be dengê te bihîstin pir baş bû. Dema axivim ketim nav kelecane, tiştên min dixwest vebêjim di kêliyê de min ji bîr kirin. Deng û zindîbûna te hîskirin pir xweş bû. Min pir bêriya te kiriye, gelo rojekê derfeta min çêbibe te bibînim? Li ser bêtêlê bi hev re axaftin bêrî û hesretên mirovan derbaz nake. Ez diçim warên ji te pir dûr, lê kêliyê jî be ji te dûr nakevim. Ji ber te jî bi xwe re dibim. Veqetîna me tenê fîzîkî ye, lê vê ji bîr neke, em weke rihê her tim bi hev re ne û hêviya xwe ya em ê rojekê hev bibînin qut nakin. Ger bi ser re sal jî derbas bibin rojekê teqez rojekê em ê hev bibînin. Bayên Bakûr dê silavên min ji te re bîne û dê hezkirina di dilê min de hilgire û li ser rûyê te belav bike. Çûna min a çiyayên Bakûr divê kêfxweşî bide te. Ji ber ez pir kêfxweş im. Diçim kulemk ava jiyane ya bi salane hesreta wê bûm vexwim. Gula min, mereqa min neke. Ez ê hemû zehmetiyan derbaz bikim û ez ê ti carî mirineke ji rêzê nepejirînim, lewma bila dilê te rihet be giyana min.

Merheba hêviya di şefaqê de hiltê û mezin dibe

Çavên hemû hevalan dibirîqe. Her hevaleyê ji deverekê hatiye. Ji hemû koman re civîn hat lidarxistin û di derbarê plansaziya hundir de çûn vesaziyekê. Îro di koma Xerzanê de jî vesazîbûn çêbû. Vesaziya min ji bo taxima duymîn hat çêkirin. Ya rast vê ez kêmek tengav kirim, dê taxima yek bi koma destpêkê re biçe, dê taxima duyem jî piştê biçe. Ez naxwazim neyênî bifikirim, sala borî komên Dêrsimê yên dawî neçûbûn. Hêvî dikim em bêşansiyek wisa nejin. Pêvajoya li vir di her warî de ezmûneke.

Ev çend roje ez nikarim dayê Leyla ji dil û mejiyê xwe derbixim. Gelo di girtîgehê de çi dike, rû bi rûyê kîjan zehmetiyan in? Ya zarokên wê? Niha, xwîşka Yasemin wan dibêjin; em ji bîr kirine. Ez ji we pir hez dikim û min rojên gelek xweş bi we re derbaz kir, ez ê çawa wan rojan ji bîr bikim?

Hewl didim erdnîgariya Xerzanê xeyal bikim. Min aliyê Batman û Sasonê dîtibû lê aliyên din nizanim. Hevalên di koma Xerzanê de, ji derveyî rêveberiyê hema bêje hemû di sala 1999'an de başdar bûne, hevalên kevin û bi ezmûnin. Her hevaleyê xwedî taybetmediyek cuda ye. Divê hemû heval aliyên hev ên erênî û neyênî bipeyîtînin, aliyên xwe yên nebes bi rêbazên rêxistinî û hevaltiyek jidil temam bikin.

Di van kêliyan de Kuro Jaro ew qas xweşik xuya dike! Roj çûye ava, êdî em ber bi êvarê rêwîti dikin. Di xwezayê de atmosferek tenê û bêdeng heye. Asîman veguheriye rengê şînê spî, mîna wênesazek li ser tabloyê firça xwe gerandibe. Aliyek Kuro Jaro berf e, aliyê ku tav lê dide berf heliye. Me rojek din li pey xwe hişt. Em ê ji rojek nû re bêjin merheba.

Ez ê ti carî pes nekim

Baranên Nîsanê bê navber dibarin. Baranên Nîsanê ji bo xwezayê gelek berhemdar e. Ji bo gerîla jî baranên Nîsanê berhemdar e, dibe se-

dem xunçe zû bişkivin. Bi xwezayê re bûna yek gelek xweş e. Em duh ji koma Erziromê veqetîn û derbazî cihek din bûn. Ez hîn navê vir fêr nebûme. Em giştî kom bi awayek mîna moriyan ketin tevgerê û me mangeyek xweş dît. Me maseyek ji kevin ve mayî jî tehmîr kir. Dema mirov di ber her tiştî de ked dide û encama wê dibîne pir kêfxweş dibe. Me karê xwe xilas kir. Em ê sibe dest bi perwerdeya xwe bikin û ji sibe û pê ve dest bi hejmartina rojan bikin. Ger ti rewşên cuda pêk neyên em piştî du mehên din rêwî ne. Her êvar berî bikevin xewê xwe lêpirsîn dikim, di mijara di kîjan mijarê de kêmbûnên me hene hewl didim xwe kûr bikim, lê ev têrê nake divê zêdetir bi ser xwe de biçim. Ger êdî cebilxana me hatiba me yê li gor giranbûna cebilxanê piştî xwe fêr kiriba. Ji ber ev nêzî saleke min ne rext ne jî çek hilnegirtiye ez ê kêmekê zehmetiyan bijîm. Lê ez vê ji xwe re esas digirim. Ez ti carî pes nakim û ez ê bi îsrar bim. Ger ez bi îsrar û xwestek bikim ez ê bi ser bixim û divê bi ser jî bixim.

Em her roj di derbarê Xerzanê de tiştên nû fêr dibin. Her agahiyek me di derbarê qadê de ronî dike. Beşek Xerzanê daristanek têr û gur heye, beşek wê jî zozan e û em fêr bûn heval carnî di nava vê daristana gur de rîya xwe winda dikin. Ka em binêrin dê koma me kîjan macerayan bijî? Li Xerzanê tarzê tevgerkirina hevalên jin bi şêwazek yek an jî du ye. Dihizirim di vî alî de ez ê li qada pratîkê rû bi rûyê çî tiştî werim.

Îro min piştî çend salan hevaleke ku min li Stembolê nas dikir dît. Min ew nas nekir, lê wî ez nas kirim. Ez çûm rojên berê. Bîranîn û parvekirin mirovan dehfî nîrxên berz dike. Hinek bîranîn jî hene mirovan hêrs dike. Di sala 2002'an de ez li Qendîlê di perwerdeya qadro de bûm, dê hevalê Baran derbazî Bakûr biba û hatibû min bibîne. Lê min tenê karîbû pênc çirkeyan li ser lingan wî bibînim. Ji ber sedema em hêza perwerdê ne hevalên di rêveberiya me de cih digirtin nehiştibûn em hev bibînin. Hevalê Baran çû Dêrsimê û piştî çend mehan şûnde şehîd ket. Hevalê Kemal û Abdurehim ên min di xebatên ciwanan de nas dikir jî şehîd ketin. Me ew qas hevalên bedew û bi nîrx winda kirin! Gelek caran li wan digirim û dema wan nebînim bi çar destan bîranên xwe hembêz dikim.

Li gel vê barana Nîsanê ya romantîk mûzîkek jî heba dê pir xweş ba. Îro strana Rotînda ya bi navê Dimeşin Zagros, Çarçêle ya me ji hevalan re xwestibû di radyoyê de hat weşandin. Hêvî dikim hevalên li Zagrosê guhdar kiribin. Rotînda Zagrosê pir xweş pênase dike û stranên xweş çêdike. Ez dengê Dîno jî pir dicibînim.

Di roja me ya îro de yê hunerek baş dike nîne, hunermedên me hema bêje ka kî dê zêdetir stranên evînî bêjin ketine pêşbaziye û dibin çavlêkirina pargalê. Dema hunermend nebin ronahiya civakê dê civak ber bi tariyê ve biçe. Ka ew mûzîkên berê? Di stranên berê de rihê şoreşgertiyê hebû, lê yên niha mirovan dehfi nav lêgerîna ji xwe re evîndarekî bibînin. Di wê baweriyê de me dê hunermendên bi hêz derkevin. Aram Tigran hîn jî hunermendek bi hêz e.

Mizgîn giyan, bê ku te bibînim naxwazim biçim û hîs dikim ez ê te bibînim piştî biçim. Îro ez di derheqê navê xwe de tiştêk nû fêr bûm. Li Mêrdin-Bagokê şêftên bi dest hatine çêkirin hene, li wir qralek û keça xwe hebûne. Navê keça wî jî Marya bûye. Şer derdikeve, qral naxwaze biçe şer, lê gelê Bagokê û artêşa wî dixwazin ew biçe şer. Tê bîra te, navê wê jina dayîka me li min kiribû di dema şoreşa Îslamê de cihê xwe di nava artêşê de girtibû. Niha ez jî weke gerîlayekê di Rojhilata Navîn de şerê azadiyê dikim. Xwe gihandina dîrokê, nirx li dîrokê barkirin pir xweş û watedar e. Ka em binêrin ez ê li Xerzanê bibim xwedî rolek çawa? Ji te hez dikim Mizgîn giyan.

24 Nîsanê 2007

Gerîlatî

Jiyana gerîla evînek e. Jiyana gerîla deryaya rengan e, jiyaneke her tim herikbar û bê rawestane. Rawestandîna tê wateya bédengî, dubare û xilasbûnekê. Taybetmendiya gerîla ya herî diyarkar jî xuliqandina wê ye, xwe bê çare nahêle, tiştê jê re dibêjin nabe di nav vediguherîna çêbûne, ev jî ji bo mirovên asayî mîna bûyerek mûcîzewî ye.

Di pêvajoyên pratîkê de ronahî nîne lê belê tengaviya wê qet naçê. Em li derdora çarberê bi awayekî kom rûdin û li derdora pelên germ

nîqaşên kûr dest pê dikin. Hinek bîranên gerîla yên bi ken hene, êdî ji kenan êş dikeve zikê mirov. Tavheyv jî hevalbendiya nîqaşên me yên kûr dike. Ez xwe li ser piştê dirêj dikim û dest pê dikim li stêrkan dinêrim. Gelek stêrk hene û her stêrkek jî cudabûnek xwe heye. Dema ez zarok bûm min her tim li asîmanan dinêriya, ger li asîmanan pir stêrk heban wê demê dihat wateya dê roja din hewa xweş be. Ger stêrk kêmban yan jî qet nehatiban dîtîna moralê min xirab dibû û diçûm gel dayîka xwe, min ji dayîka xwe pirs dikir û digot, dayê wê sibe hewa çawa be? Ji min re digot; biçe li asîmanan binêre.

Bê ku li stêrkan binêrim nikarim çavên xwe bineqînim. Bi giştî mirov stêrka herî zêde dibirîqe hildibîjêre lê min her tim stêrkên herî zenûn hîlbijartin. Lê ji ber çî nizanîm, di van rojan de stêrkên herî zêde geş diecîbînim. Ji ber kêmek hewa sar e min piştî xwe daye piştî hevala Roza û hêdîka dikevim xewê. Bi dengê nobedar yê dibêje Sarya! Sarya! şiyar dibim. Hevalek xurt hatiye nobedar şiyar bike lê kî ye nizanîm. Min jî got; hevala temam tu biçe ez ê hevala Sarya şiyar bikim. Bang dike û dibêje; liste. Ji ber qet hêza min nîne ez jî banî hevala Sarya dikim, ew jî şiyar dibe û diçe lîstê digire. Tê hundir û dibêje; tu jî nobedar î. Ez jî qet xwe bi ser ve nabim, ji min re weke mîna henek dike tê. Tam ez ê bi xew ve biçim bi dengê wê şiyar dibim û min xwe amade kir û em çûn cihê nobedariyê. Li cihê nobedariyê ti kes nîne. Striyên dara diryê jî bi lingê min re diçe, canê min hinek êşîya lê pir ne girîng e. Berî em werin nobedar cihê nobedariyê hiştibû û çûbû. Ev kêmasiyek e lê ji ber roja destpêkê bû me girîngî nedayê. Ba tê, sermayek biçûk xwe li dor bedana min pêçand. Bê ku hevalên niha li lûtekeyên herî jor qadan digirin nehizirim nikarim xwe bigirim. Cihê wan bilind e û li wir bagerên pir dijwar radibin. Cihên bilind her tim sar in. Ji ber pir zêde li ser hevalan hizirime dem pir derbaz bûye, hevala Sarya jî ji xwe re diçe û tê. Her cihê ez diçimê rastî navê Sarya tîm.

Dema li Zapê bûm vesaziya heval Sarya û Eyrehan ji bo Zagrosê çêbibû, rêzanê wan ez bûm. Hevalên Zapê ji hevala Eyrehan pirs dikin û dibêjin; tu û kî diçin? Ew jî dibêje; Ez, Sarya û Marya diçin. Hevalên guhdar dikin wisa fêma dikin qey hevala Eyrehan dixwaze henekan bi hevalan bike. Hevalek jî dibêje; min Sarya fêma kir lê Marya fêma nekir.

Hevala Eyrehan dest bi pênasekirinê dike; Hevala Sarya hevalek cuda ye, hevala Marya jî hevalek cuda ye. Hevalên guhdar dikan fêmkirin navê Marya heye. Bi vî rengî navê Sarya û Marya tê fêmkirin. Dema hevala Eyrehan ji me re vedigot, em ji kenan diketin, êdî Sarya û Marya parola me ye. Hevala Eyrehan li Bakûr e. Her cara navê Sarya dibihîzim ew parola tê bîra min.

Pîştî me nobet dewrî nobedaran kir yekser çûn razan. Dema min lingên xwe dan ber çarberê germ dibim û radizêm. Bi dengê rojbaşê şiyar dibim. Seet 04.30 e û hema zû xwe amade dikan. Pîştî wê ber bi cihê îştîmayê bi rê dikevin. Di vê şevaqê de hemû heval pir zindî xuya dikan, weke qet nerazane û her tim şiyar mane. Di van seetên sibê de xireta kesê nîne baxive, lê em dikenin û henekan dikan. Li cihê îştîmayê pîştî me soza xwe nû kir şûnde bi awayek dilrihet dest bi roja xwe dikan. Em êlek, rext û çekên xwe datînin û pozîsyona werzîşê digirin.

Her çendî werzîş ji bo min dibe cihê moralê, lê di aliyê din de jî ji min re her tim bûye cihê şahî û kenînê. Her hevalek cuda werzîşê dike. Di her hevalekî de dîmenên cuda derdikevin holê û yên van dîmenan digirin dest bi ken dikan, lê em hewl didin cidiyeta werzîşê xirab nekin. Îro komîsyon her em dan bezandin. Gelek hevalên jin ji bezê derketin, pîştî me kêmekê bêhna xwe vekir şûnde dubare dest bi bezê kir, her çendî min got ez dernakevim jî lê dîsa derketim. Ji bazdanê mîna çogên min tevîzîbûn. Hevala Rûha dibêje, ji difina xwe henase bigirin û bistînin. Ez di dilê xwe de bi henekî dibêjim; ji serma difina min hatiye girtin, gelo ez ji devê xwe henase bigirin û bistînim dê çawa be. Vê bezê em pir westandin û em hemû di nav xwêhdanê de mabûn. Dema em gihîştin cihê mangê her yek ji me karek kir û me taştêya xwe li ber agir xwar. Li ber germahiya agir xwêhdana me ziwa bû û cemedana me bi şev depo kiribû jî dest bi helandinê kir. Niha tav leşê min dişewitîne, her çendî min ji xwe re siberek dîtibe jî dîsa tê li laşê min dide.

25 Nîsanê 2007

Merheba dildara çiya

Jiyana me bi hemû leza xwe dewam dike, em waneyên teorîk dibînin. Me perwerdeya stratejiya parastina rewa û gerîlayên moderin bi dawî kir. Wanaya gerîlayê moder hevalê Nûman da. Di ûslûbê wî de aliyê ajîstasyonê pir bi hêz e. Ji ber xîtabek wî ya helbestwarî hebû hevalan dest bi helbest nivîsandin û slogan avêtinê kirin. Li gel van tiştên bi ken me pir zêde li ser gerîlayê moderin lêhûrbûn kir. Em derbazî Bakûr dibin, ger di vê mijarê de lêhûrbûna me nebe em ê winda bikin. Ger em rêgeza gerîlaya pênc tilî pêk bînin em ê encam bigirin û bigehin serkeftinê. Tekmîla perwerdê hat girtin. Di wê navberê de noqî nav rêzîkên min dinivîsandin bibûm lê guhê min li ser hevalên nîrxandin dikir bû. Weke hevalê Nûman rewşa min a noqîbûnê ferq kiribe, pîrs kir û got; hevala Marya tu çi dibêjî, wane hat fêmkirin? Ez jî bi awayek şaşmayî rabûm ser xwe û min got; wane baş derbaz bû û pîrsgirêkên me yê pratîkî hene. Min henesayek kûr kişand. Kom li ser hev nîrxandinan dikin û em xwe ji lihevkirina navên cuda xilas nakin. Navê koma Xerzanê bûye Tarzan. Ez bawerim kom çavan dadgire, weke pratîkî jî bi hêz in, kêmek qelebalixbûn heye, lewma jê re dibêjin Tarzan. Di heman demê de hatiye gotin; koma Xerzanê pîr sosyal e. Em vê weke gotinek xweş bigirin dest an weke rexneyekê fêm bikin? Di nêvengê wisa siyasî de ji taximek hevalên jin re gotin sosyal, divê mirov li ser nîrxandina taxima hevalên jin ên li derveyî sosyalbûnê hiştin bihizire. Divê mirov ji nêvengên bê nakokî û nîqaş bitirse. Ev nêvengên wisa pêşketinan ava nakin, rêxistinbûnê ji holê radike. Nêvengên bi nakok û nîqaş ji min re her tim hatiye wateya vekiribûnê. Lê gelek caran ev çûye heta hev kişandina nîqaşên cuda û hiştiye hincirandinek çêbibe. Divê mirov bi baldar be ku neşemîte ser vê. Ev rêbazek dem kurtî ye yan ji berpirsariyê revek e, tê wataya serî li ya herî hêsan dayîn e. Ya rast di nêvenga Bakûr de nakokiyên jin û xortan çawa tê jiyîn mereq dikim. Ji guhdarkirinê an ji yê jiyîn kirî bihîstin û yekeser rû bi rûyê wê hatin cuda ye. Mirov hebûnek çiqas bi mereqdar e. Mereqdariya zêde mirovan tengav dike. Divê mirov hinek tiştan ji bûyîn û demê re bihêle. Bawer dikim bi derbazbûna Bakûr re wê di bergeha nêrînê min de guhertin çêbibe. Dem fêrker e.

29 Nîsanê 2007

Ji bo kulîlkên min ên hezkirinê yên min li Zagrosê hiştî

Gelek bîraninên li vir dijîm dişîbînim bîraninên min li Zagrosê jiyane. Ez pir bêriya wan rojên min li pişt xwe hiştine dikim. Baran jî bê rawestan dibare û piştî baranê roj ji me re dikene. Ewrên mîna berfê spî di asîmanên şîn de rêwîti dikin. Ev ewr ji Bakûr ber bi Zagrosê ve rêwîti dikin. Silavên min jî bibe ji bo hemû çîyan. Negengaz e mirov bi heybeta Zagros û hevaltiya wê ve neyê girêdan. Li vir baran, li Cîlo û Çarçêla jî berf dibare. Çarçêla û Cîlo di nav xemla berfê de silav dide bihar û gerîla. Zagros cihek xwe yê girîng hem di aliyê dîrokî de hem jî di roja îro de di dilê min de heye.

Ev demeke me dest bi perwerdê kiriye û hatin û çûyîn nîne. Ez pir fêrî cihek wisa mayînde bimînim nînim, lê ji ber pêvajoya perwerdê ye hewl didim xwe fêr bikim. Min duh ji havalan nîşe girt. Ji wan agahî girtin, dengê dilê wan guhdarkirin xistim nav kelecaneke pir mezin. Di kêliyekê de wisa aram bûm ku nikarim vebêjim. Ji wan pir hez dikim. Li Zagrosê hevalên min ên pir hêja çêbûn û hîn gelek hevalên min ên bedew li Zagrosê ne. Li gor heybeta Zagrosan hevaltî avakirin pir watedar e. Nivîsandine û gotine, ji ber ji Zagrosan veqetîme pir xemgîn bûne, li ser navê min kêfxweş bûne, lê ji ber ji wan veqetîme jî dîlşkestî ne. Kulîlkên min ên hezkirinê, ez ji we venaqetim ji ber we jî bi xwe re dibim. Ji bo me ya girîng û watedar xwe gihandina bihevrebûna di rih de ye. Hûn jî ji bîr nekin, ji we pir hez dikim û her tim hez bikim. Dilê gerîla mîna okyanûsekê ye, ger heval û dostên nû nas bikim jî ez ti carî hevalên min li pişt xwe hiştin ji bîr nakim. Nirx û cihê her kesê cuda ye. Kulîlkên min ên hezkirinê, xwezî dîsa ew derfeta min çêbiba min hûn dîtiban.

31 Nîsanê 2007

Xweza azadiyê di nav xwe de dihevinê

Ez çawa zimanê xwezayê pênase bikim, dengê wê çawa qêr bikim, bedewî û aramiya wê bi kîjan hevokan pênase bikim? Xweza bi gotinek tenê muhtêşem e. Di nav xwezayê de mezin bûn mirovan jî azad dike, dibe ji ber vê yekê be gelê Kurd û gerîla ev qas ji çîyan hez dikin. Ev

çend rojin ew qas tişt hene ku dixwazim parve bikim lê min ji vê re qet wext nedît. Perwerdeyên me hem teorîk hem jî pratîk didomîn. Me di derbarê herêma Xerzanê de agahiyên berfireh bi dest xistin. Navê Garzanê yê esas Xerzan e, ango tê wateya dewlemendiyê. Araziye Xerzanê pir fireh û hişk e. Aliyên wê yên zozan jî hene lê piranî bi daristan in. Di araziya Xerzanê de bajar û bajarokên tê de cih digirin; yên mîna Bitlîs, Mûş, Sason, Şîrwan û Kurtalan hene. Yek jî ya balkêş, navê çiyayên aliyê Başûrê Mûşê û Dorşînê bi peyva Şêx dest pê dike û navê zilaman e. Mirov di nav peyvan de pir baş fêr dike dîr xwe çiqas bi sazî kiriye. Weke tê fêmkirin em ê li Xerzanê li hemberî paşverûyên dîrî pir şer bikin.

Piştî nirxandina hevalê Kemal hema dixwazim zû biçin. Herî dawî em digihin encamê ku li Xerzanê ceşx nînin. Bi taybet Şîrwan bi ceşxên xwe tê naskirin, lê bi nirxandina hevalê Kemal re em fêr dikin ew ceşx bûne welatparêz û ev dibe mijara henekan.

Em şevê din seet di 02.30'an de ji xew rabûn û ketin rê. Hevalên ji çapemeniya YJA STAR jî bi me re hatin. Tavaheyvê hebû, bayek tenik dihat û em bi awayek yek rêz bi rê ketin. Her kes heman gavê tavêje, di heman ritmê de hevalbendiya ahenga şevê dikin. Em rêgezên gerîla yek bi yek pêktînin. Em çekên xwe li gor ronahiya tavaheyvê carekê dixin destê çepê carekê jî yê rastê. Dema ronahiya tavaheyvê li çekan dixê çek dibiriqe. Em diçin girê Şkefta Birîndaran. Hevalên heta salên 1996'an li wir şehîd ketin li vir hatine vaşartin. Navê xwe ji bûyerên di operasyonê de hatine jiyîn digire. Di dema operasyonê de di şkeftê de hevalên birîndar tên veşartin, yek direve, dijmin tîne wê şkeftê û bi çekên kîmyasalê 28 hevalan şehîd dixin. Weke mîna qelekê ye, derdora gir bi latan hatiye dorpêçkirin. Aliyek wê li Zagrosê aliyê din jî li girê Kuro Jaro dinêre. Weke hembêza xwe vekiriye xwestiye Zagros û Zapê bixe bin baskên xwe. Çîroka çiyayan gelek in, ger vebêjim wê lînûs têrê neke.

Îro hewa hinekê bi mij bû me baş li Zagrosê nenêrî. Dubare Zagros dîtin pir baş bû, dema mirov li wan dinêre negengaz e hestiyar nebe. Niha li pişt van çiyayan heval hene û hemû jî xwe li gor întîşarê çeper

girtine. Ji ber ew qas bi Zagrosê re kûr çûbûm min dengê hevalên ji hêza Erziromê yên li bin kevir derbaz bibûn û banî min kirin nebihîstîye. Hinekan ez ji pora min nas kirim, hinek hevalên xort jî ji ber hezkirina min a li hemberî Zagrosê texmîn kirine ya li Zagrosê dinêre ez im.

Em hevalbendiya ahenga xwezayê dikin. Giya ew qas mezin bûye hema mirov dixwaze xwe li ser dirêj bike û wisa razê. Giya nivînên me ne. Dema em di nav giya de dimeşin bêhna wê jî hildimijîn hundirê xwe. Bêhna parfûma xwezayî jê tê. Li ser vê rêwîtiyê em strana Kawa ya bi navê “hûcra min tarî” guhdar dikin. Vê stranê her tim kizênî ji dilê min anîye. Di aliyekî de şertên Rêbertî di nav de ye difikirim di aliyê din de jî li dayê Leyla dihezirim. Gernas ji vê stranê pir hez dikir. Belê, ji mirov, xweza û zarokan pir hez dikim.

6 Gulanê 2007

Merheba dilê min ê bi coş diherike

Jiyan bi bîranînên hestiyar ve dagirtiye. Ya rast jiyan bi xwe hest e, mirov bi xwe hest e. Divê hema mirov nebêje hest û derbas bike. Ger hest nebe di fikir de rih nagire, fikir wateya xwe nagire. Heta ez bîranîna xwe ya duh pir pê hestiyar bûm nebêjim derbaz nabim. Duh merasîma Eqedemiya Mehsûm Korkmaz hebû. Milîsên me yên li Îranê dimînin wêneyê Rêbertî li ser berikekê çêkirine û ji hevalê Cuma re şandine, hevalê Cuma jî şandibû akademiyê. Di navbera merasîmê de dema hevalê Şahîn wêneyên Rêbertî yê li ser berîkê hatibû çêkirin vekir me hemûyan bi yek dengî Bijî Serok APO qêr kir. Dengê ew qas ji dil bû ketim nav kelecaneke û di kêliyê de min Rêbertî nêzîkî xwe hîs kir. Demek dirêje me hezkirina xwe ya li hemberî Rêbertî qêr kiriye. Xwezî Rêbertî li vî dîmenî temaşe kiriba. Duh rojek girîng bû gelek hevalan şansê hev dîtîne bi dest xistin.

Waneyên me yên teorîk bi dawî bûn û giranî didin perwerdeya leşkerî. Niha em meşa bi şev dikin. Weke fîzîkî diwestin lê weke rih pir zindî ne, piştî westandinê dengê kenê me li hawirdorê deng vedide. Divê em li Bakûr haj ji dengê xwe hebin bi taybet yê min. Li gor zindîbûna me xweza jî bi me re di nav ahengekê de ye, ya rast em li pey xwezayê

diçin û li gor demsalan xwe amade dikin. Dema em destpêkê hatin vê wargehê dar hîn nebişkivîbûn. Niha pel vebûne û roj bi roj mezin dibin. Di hewayê de jî guhertin hene. Li şûna hewayê sar bayek têhngerm bê ku mirovan aciz bike tê. Piştî van mehan wê hewa germtir bibe û giya zer bibin. Di nav xwezayê de mirov biba çemek avê wê çiqas xweş ba! Jiyana gerîla her tim herikbare û bi nûbûnan dagirtiye. Her tim xwe nû dike, lewma gerîla mîna avekê ye, Avaşîn, Ferat û Dicle ye.

Em nêzî roja dayîkan dibin an jî me derbaz kiriye. Di derbarê dayîkan de dixwazim nameyekê binivîsim. Mijara bingeîn a îro dixwazim vebêjim û parve bikim di jiyana me de xala herî girîng e. Mirov hebûneke ku mirovan matmayî dihêle. Di navbera şêwe û cewher de di gelek mirovan de bi qasî zinaran cudabûn heye û her tim cewher ez matmayî hiştîme. Ezmûnên jiyanê dibe alîkar mirov zû hev nas bike. Lê dema em mirovan digirin dest an li gor xwe nêz dibin an jî ji ber divê şêwazê em dixwazin bibe mirovan baş nas nakin. Divê em bizanin bê berçavk û bi çavek vekirî lê binêrin. Mirovên min nas kirine min dostaniyên pir bi hêz ava kirine. Min li qadekê zehmetî kişandine lê min pir ji wê qadê hez kiriye û ji wê qadê nerevime. Lêgerîna min ya çûna qadên cuda çênebûye. Yek bi hinek mirovan re di demek kurt de weke tu bi salane wan nas dikî diçî parvekirinekê. Bi riya empatiyê tiştên hev yên dijî hîs dikî, bê ku pêdivî bi gotinê hebe hev temam dikin.

Em ê îro derkevin arazî û em ê dîsa çiyayan keşf bikin. Li benda min rawestin çiyano, ez tîm.

10 Gulanê 2007

Ji bo dayîka min a xweşik a afirandina hezkirina kedê

Ez ji ku derê dest bi gotinan bikim nizanim, ji ber gotinên di qirika min de dibin girêk. Ev venegotin ji bêrîkinê ye, bêriya te dikim. Her cara te dihizirim bêrîkirînen min di dilê min de birînen kûr vedike. Weke dînan bêrî û hezkirina xwe li gel bayê ji te re dişînim. Bêrîkirina keçekê ya dayîka xwe hestek cuda ye. Bêriya te dikim dayê. Bêriya tu porê min mist bidî dikim. Dema min weke zarokekê serê xwe danî ser çonga te, te destên xwe di nav porê min de dibir û danî di aliyê din de jî bêriya wî

dengê te yê nerm ji bo min çîrok vedigotin dikim. Dayê tu dîrokekî, ez bi dîroka te azad dibim. Ez di te de xwe dibînim. Min her tim xwestiye wê melûlbûna çavên te jê bibim, ji ber vê yekê rû bi rûyê şer û zehmetiyên bê hempa hatim. Dixwazim jiyanek tijî kêfxweşî diyarî we dayîkên hêja bikim. Her cara jinên êş dikişînin dihizirim dilê min jan dike û di aliyê wijdanî de nerihet im. Dayê, her çendî di navbera me de çiyayên bi berf hebin jî lê tu bi qasî henaseyekê nêzî min î. Tu dilê min î, ez li ser lûtkeyên çiya ji bo te hezkirin û bêrîkirina xwe qêr dikim. Bila dil û çavên te her tim li aliyê rojê binêre. Di şevên tavaheyvê heyî de her tim li te dihizirim û xeyal dikim. Dayîka min a bedew, bêrîkirina min.

13 Gulanê 2007

Dilê min ê bi coş ê ji gerîlatiyê têr nabe

Gerîla jiyanek nepenî ye. Ez jî mirovek nepenî me, ji ber gerîla me. Gerîla hem xweşik û hem jî balkêş e. Di atmosfera Başûr de hewl didim atmosfera Bakûr bijîm, ez dibêjim em hewl didin ji ber em hîn li Başûr in. Di navbera jiyana Başûr û Bakûr de bi qasî çîyan cudabûn heye. Tu di Başûr de rastiya dijmin pir kûr hîs nakî, ji ber vê çendê tu dikevî rehavetê. Rehavet ji bo gerîla dijminê herî mezin e. Belê, amadekariyên me berdewam dikin. Di aliyekî de kêliyên ji bo em derbazbûnek baş pêk bînin amadekarî dikin, hevalên me heta henaseya xwe ya dawî li hemberî dijmin têdikoşin û şer dikin. Aliyê şoreşa me yê herî girîng jî ev e; heta dawî bi doz û rûmeta xwe ve girêdayîne û bi lehengî şehîd dikevin. Her çendî aliyê kêr hebin jî gerîla û gel hev temam dikin. Li Ewropa grêva birçîbûnê destpêkirin pir girîng û watedar e. Ev çalakî mîna şeqamekê li rûyê pergalê dikeve. Ev çalakiya hevalan weke gerîlayekê min dixê nav kelecaneke pir mezin. Gelê Kurd heta mirinê bi Rêbertî û şehîdên xwe ve girêdayî ye, ev jî moral û hêz dide min. Ez jî weke gerîlayekê xwe li hemberî gelê xwe lêpîrsîn dikim. Hevalên di grêva biçîbûnê de ne pir lewaz bûne. Em jî amadekariyên xwe dikin. Hemû cebilxaneya me temam e. Bi hatina cebilxanê re çûna me nêz bû. Her hevalek bi kelecaneke mezin çek û rextê xwe amade dike. Çavê her hevalekê mîna strêkan dibiriqe. Min jî rextê xwe çêkir, dema min çêdikir

hevala Mizgîn hat bîra min û min pir xwest li gel min ba. Ger niha li gel me ba wê henekê xwe li rextçêkirina me kiriba û bela xwe li me daba. Min pir dixwest wê rextê min çêkiriba. Min ê qet ti caran ew rext venekiriba heta min rojekê ew dîtiba. Bawerim ez ê wê nebînim û biçim.

Belê evîna min, her çendî te nebînim ez ê te di dilê xwe de şîn bikim. Ez ê zehmetiyan li ser te hizirandinê derbaz bikim giyana min, min wêneyek ê herî dawî me bi hev re girtî li gel xwe girt. Min yek jî ji te re rêkir. Li li ser tiştên te ji min re gotin bihizirim û baladar tevbigerim. Bi hîskirina te re ez ê bêhna çiyayên azad hilmijim. Bila dilê te rihet be û ji ronahiya hêviya xwe bawer bike. Hêvî firîşteya min a parastinê ye.

16 Gulanê 2007

Xiyanet, ji nixrên mirovahiyê qutbûn û mişextbûne

Têgehên hezkirin, azadî, evîn û hêvî nixrên mirov ên herî bingeşîn, lê cihê xiyanetê di ti civakan de nîne. Min bi peyva xiyanetê dest pê kir, ji ber dîroka me bi xiyanetê dagirtiye. Di encama xiyanetê de Rêbertî di nav çar dîwaran de henasa jiyanê dide. Ev xalek herî girîng e. Ma qey di pêvajoya koma destpêkê de jî Şahînan xiyanet nekir? Ma di girtîgeha Amedê de li kêleka berxwedaniyê teslîmiyet nehat jiyan? Yek jî em weke gelê Kurd her tim rû bi rûyê xiyanetan tên. Gelo ma ev çarnûsek e? Bê guman na, lê rastiyeke heye ya tê jiyan heye. Her xiyanetek li gor rengê xwe aliyek xwe yê kirêt heye, lê ji çiyên azad jinek bireve xwe bixe hembêza zilam, koletî û xiyanetek wisa bi rastî nayê qebûlkin. Li hemberî xiyanetan hizir û hestên min ditevîzin. Mirov ew qas berovajî soza xwe nakeve û xiyanetê li mirovên jê hez dike nake. Ez ji dilê xwe ve hatim birîndarkirin, a rast mîna min dixwest bibînim dît. Lewma min bayê xiyanetê hîs nekir. Yan ez di wê rewşa nikarim pirsirêk û mirovan dahûrînim de nînim.

Reva Nûjîn ji bo min dersek mezin bû. Dema çûye bê ku şerm bike go-tiye; ez pir ji we hez dikim lê dîçim. Mirov ew qas bêrû jî nabe. Tu têgeha jinê jî qirêj dikî. Dibe tu weke biyolojîk jin bî lê te tiştêk ji cewher û rûmeta jinê negirtiye. Me tu dost û milîtan dizanî lê tu nebêjî te di hundirê xwe de xiyanet diheband. Bi hêrs im, dê li hemberî yên

wekî te her tim hêrsa min hebe. Di pêvajoyek wisa de jiyana Rêbertiyê di xeteriyê de ye revek wiha bê exlaqî ye. Cuda pênaseyek vê nîne. Bi salane di nav partiyê de me, cara yekem mirovek ku jê pir bawer dikim direve. Min nedizanî bertekên min ev qas kûr in. Ez xwe lêpîrsîn dikim. Ez çawa bi sextekariyên te hatim xapandin. Tu yê jovan bibî, hem jî jovaniyeke ku veger û çareserîya wê nebe. Gelekan gotin hezkirin û xwe avêtin çembera xiyaretê lê di agirê xwe de hatin şewitandin. Ji bê rûmetiyê serê xwe xistin bin axê, bûn yek ji figûrên sîbera xwe. Tu yê jî wisa bibî.

Di aliyekê de xiyaret çêdibe di aliyê din de jî gelê me bedena xwe di-din ber mirin û grêva birçîbûnê. Ji van mirovên hêja jî bandor nebûn. Dema li grêvên birçîbûnê dinêrim dilê min jan dike, min jî dixwest bi we re bikevin grêva birçîbûnê ya bê dorveger. Herî kêma dibe wisa tiştên min di nivî de hiştin temam bikim. Em di nav amadekariyan de ne, hinek komên me bi rê ketin. Her ku kom bi rê dikevin êdî dor tê me û em bi kelecaneke mezin li bendê disekinin.

Çi rewşek bi seyr e, sala borî di van rojan de dilê min kîjan kelecaneke dijiyan niha kîjan kelecaneke dijiyan. Tenê gumana min ew bû ez werin girtin û bi ser nexînim. Di aliyekê de min tenêbûn dijiya di aliyê din de jî bi hezaran mirov di dilê xwe de hîs dikir. Dema wan pêvajoyan dihezirim dilê min jan dike. Hemû êş û janên bi azadiyê ve girêdayî watedar in.

19 Gulanê 2007

Yê ji mirinê jiyan afirandî

Mirovê bi erdem, milîtanê PKK'ê. Hinek kêlî hene mirov ti gotinan nabîne wê kêliyê pênase bike. Belê mirovê xweşik, ma gelo ji te dihesidim? Min duh hejandinek pir mezin jiyan kir, ez ê çawa vebêjim nizanim. Gelo ma ez ê li hemberî çalakiya her hevalekê vê çewisandinê bijîm? Her roja heval bedena xwe bi bombeyan dorpêç dikin dijiyan û vedixwînin dueloyê, negengaz e ez li vir bandor nebim.

Her kes li ser çalakiya te nîqaş dike, ev çalakî di rojava her kesê de hat bicihkirin. Tu ji pêvajoya bêdeng re bûyî deng, te tarî ronî kir. Dijmin li

hemberî heybeta te matmayî ma, tirs a mirinê ew dorpêç kirine. Dil û çavê me hemûyan li metropolan bû û tu bûyî bersiv. Gelo dema te destê xwe avêt pîmê bombê te çi hîs kir? Di wê kêliyê de te çiqas xwe nêzî Rêbertiyê hîs kir, van hemûyan mereq dikim. Tu li derdora xwe hebûna ti zindiyên hîs nakî, tenê tişt a tu hîs dikî, dihezirî û qifil dibî serfiraziya serkeftinê ye. Di wê kêliyê de tenê tu û armanca te heye, ji derveyî wê cuda tiştek din nîne. Kilîda hemû cîhanê azad bikî di destê te de ye, hema zû dixwazî kilîdê vekî û hemû cîhanê azad bikî. Mirovê bi erdem, di qata pêrozbûnê de ji min re jî cihekî veke. Rojekê, teqez rojekê ez ê jî werim. Wê şopdarên te jî çêbibin. Ji mirinê rev di heman demê de navê bêrûmetiyê yê din e. Ger tu di oxira tiştên pê bawer dikî de di kêliya wê de nizanî bimirî, ger tu ji vê birevî tê wateya tu bê exlaqiya herî mezin dijî.

24 Gulanê 2007

Ger te dilê xwe bi armancê re kir yek tu yê tam li duwazdan bidî

Ji bo gerîla avêtîna guleyan pir girîng e. Dema te çek girt destê xwe divê tu cuda tiştek din nehezirî, tişt a tenê tu bihezirî divê armanca te be. Gelek caran dema em çekê digirin destê xwe hizir û dilê me li hinek warên din digere. Ji ber vê yekê bala xwe hemûyê nadin ser hedefê û tu nizanî gule diçin li ku derê dikevin. Divê derûniya te rihet be. Divê tu nebêjî guleyeke û hema wisa derbaz bikî, bi îdaya tu yê li hedefê bidî çekê digirî destê xwe. Di nav komê de ya herî baş guleyan tavêje ez im, lê belê vê sibê gule avêtina min li gor duh paş ketibû û vê ez pir tengav kirim. Min xwe ji bo yên piştî nîvro amade kir.

Çalakiya hevalê Erdal pêk anî ez pir bandor kirim. Di mijara ji bo hestiyar nêz nebim de bi ser xwe de diçim. Di gule avêtina piştî nîvro de tenê li ser hevalê Erdal hizirim, min xwest wê kêliya bombe bi bedena xwe de teqandî hîs bikim. Bi wê hîskirinê min pêl tetîka qilêşê kir û min lê xist. Herî kêr divê mirov bihezire tabela jî dijmîne û wisa lê bide. Piştî nîvro gule avêtina min baş bû. Min ji hevalê Erdal hêz û moral girt. Niha di nivîs nivîsandinê de gelek zehmetiyan dijîm. Pêşiyên her çar aliyê min dorpêç kiriye, dixwazin destê min gez bikin û xwîna min vexwînin, lê ez dev jê barnadim. Di navbera nîvro de ew qas pir in, dengê vizeviza

wan ê bi hev re derdixin min hêrs dike. Niha çarşeva reş hebûya ji bo min xwe ji van pêşyan biparasta min ê li xwe kiriba.

Piştî gule avêtina bê alîkar, me gule avêtina kêlekê ceriband. Yê destpêkê gule avêt hevalê Rojhat Markoz bû. Sê gule avêtin. Yek li nîvekê xist û ya din jî li jora wê ket. Em jî pir kêfxweş bûn ku gule li tabelayê ketin. Piştî hevalê Rojhat hevelek din çû. Çavê me hemûyan li ser tabelayê bû. Em bi carekê çi bibînin? Mêşa li ser nîveka tabelayê bû firiya, çû û tabela spî ma. Tu nebêjî reşahiya cihê me dizanî hevalê Rojhat lê daye mêşek bû. Bi vê re pirqînî bi hemû hevalan ket. Hevalê Rojhat jî bûna mijara henekê xilas nebû.

25 Gulanê 2007

Mirov

Mirov bi razan dagirtiye. Dema cihê zemîna parvekirinê dibîne dil weke robarekî dest bi herikandinê dike, tu hewl didî bedavan ava bikî lê nikarî pêşiya wê bigirî, robar bê rawest dest bi herikandinê dike. Dema gotin têrê nekin, vê carê jî bi tevgerên dest û carnan nêrînên xemgîn an jî xwînşîrin hevalbendiyê ji axaftinê re dikan. Tiştên te bi salan li ser hev kom kirin bi wî rengî ji dostên xwe re parve dikî. Dema tu wisa li pişt xwe zivirî û nêrî tu di wê kêliyê de hîs dikî çiqas pêwîstiya te bi parvekirinê heye. Ez ji te re nabêjim dosta min lê min hew nêrî em bûne dost û hevalên hev. Lê çîroka min xilas nebû, xîlxa nebûn bêrîkirinên min. Bêguman armanca min ew nebû te xemgîn bikim lê divê ji te re strana jiyanê qêr bikim. Divê ji te re êş, kêfxweşî, bêrî û hêviyê vebêjim. Ez ji êşan natirsim, êşan jî bi qasî kêfxweşyan hez dikim. Em ji bav û kalên xwe fêr bûn di nav xemgîniyê de tama azadiyê bigirin.

Jiyan bi rastiyan xwe ve xweşik e, ez wisa ji jiyanê hez dikim. Carnan hinek kêlî hene tu di dilê xwe te tiştêkî hîs nakî, di hinek kêliyan de jî tu ji dijiwarîya hestan diwestî. Ji hizran tu hewl didî ji şaneyên mejî alîkarî bigirî. Tê gotin, mirovên tenê bi xwe re girtî mayî hestên wan zêdetir dijiwar in lê ez bi vî rengî nahizirim. Ez di wê baweriyê de me, di mirovên pir vekirî de jî hestên zêde dijiwar tînin jiyan. Ji ber ew her tim hestên di dilê xwe de dijî parve dike, dixwaze parve bike û gelek caran

dema encam nagire, vê carê dê dest bi hest û hizrên cuda jiyînê bike. Wê her tim wisa berdewam bike. Di roj û kêliyê de ji mirov fêmkirin caran mirovan bi hêz dike. Ya rast ev jî di rastiya mirov û xwezayê de heye.

Gelek mirovên zanyar derketine, lê hîn di gelek aliyan de ne mirov ne jî xweza nedahûrandine. Ez her roj di xwezayê de cudabûnan dibînim û dijîm, lê bi qasî xwezayê kêrhatî nînim. Ji ber bi qasî xwezayê ne xwedî hêza pênasekirinê me. Dibe çavkaniya xwe ji tengbûna xezîneya min a peyvan digire yan jî xwe dispêrim hêsanîyê. Ji bo xwe vebêjim û pênase bikim ked nadim. Hinek caran xwe pir ziwa hîs dikim, ji min re wisa tê weke ez tiştekî hîs nakim lê rastî ne bi vî rengî ye. Mirov hebûneke hîs dike û dihizire ye.

28 Gulanê 2007

Ji tenêbûnê netirse

Bi tenê mayînê re jiyan naqede

Dema bi tenê bî jî

Dikarî hezar mirovan di dilê xwe de hîs biki

Dema li nav hezar mirovan jî

Dibe tenêbûnê bijî

Tu dihizirî cîhan keşf kiriye

Piştî salan tu fêr dibî ku te nas nekiriye

Tenê di jor de li cîhanê nêriye

Te cîhan di kefa destê xwe de biçûk kiriye

Tenêbûn

Deriyê ji esîl û erdembûnê re tê vekirine

Ji tenêbûnê netirse
Bes tu
Di dilê xwe de rojê,
Di bedena xwe de bayê hîs bike
Tenêbûn riya diçe azadiyê ye
Ji azadiyê nayê tirsîn
Azadî tê jiyîn
Azadî pêşbaziye maratonê ya bêhempa ye
Azadî şervantiya evînê ye

30 Gulanê 2007

Ji bo hevalê Erdal ê yekbûna gelan di dilê xwe de mezin dike

Di oxira baweriya xwe de cihê pêwîst dike bijî û cihê hat jî bê ku tiştekî bihizirî bimirî!

Vaye lêgerînên rast ev in, ango tu yî hevalê Erdal. Tiştên mirov dike mirov jiyan, bawerî, pîvan û lêgerînên wê ne. Te jî azweriya xwe ya azadiyî bi vî rengî danî holê. Ez li hemberî çalakiya te hejiyam, bandor bûm. Ez soz didim te hevalê Erdal, dibe ew şansê min ê di dilê dijmin de çalakiyê pêk bînim çênebe, lê ez ê di jiyanê de bi we ve girêdayî bimînim û ez ê tola te ji dijmin rakim. Hevalê Erdal, te di nameya xwe de gotiye, dibe ew şansê me yê em ji dayîk bibin nebe lê şansê hîlbijartina me ya divê em çawa bijîn heye. Min jî dema nameyên xwe nivîsandin heman xal dest nîşan kiribû, lê te xweşiktir daniyê holê. Min nameyên te pir kûr û bi hestan dagirtî dît. Ez di nameyên te de fêrî dîkin tu mirovek çiqas hêja û bedew î. Hez kirina herî mezin, hez kirinên di oxira hez kirinê de tê avakirin e. Hevalê Erdal, rastiyeke me ya bi vî rengî heye! Êş bi rastiyan dagirtiye. Di aliyekî de hevalên hemû zehmetiyan didin ber çav, di aliyê din de jî mirovên rûyê zehmetiyan jî nabîne û xwe tavêje hembêza kirêtiyan hene. Kirêtî û xweşîkbûn her tim di nav pev-

çûnekê de ye; her wisa mîna rûmet û bêrûmetî, azadî û koletiyê. Ev nakokî di nêvenga me de jî heye. Hevalê Erdal, hinek caran rû bi rûyê nêzîkatiyên sînorê tehmûlîkirina min derbaz dike tîm û zehmetiyan dijîm. Hinek caran ev zehmetî min dibe hizra; ma ez neçarim nêzîkatiyên van ferasetan daqurtînim. Ji ber gelek kesayet li gor rastiya PKK'ê najîn û di bin navê rêxistinê de nêzîkatiyên xwe yê xweperestî û çînî ferz dikin. Ji bo ez van bijîm nehatime lê wisa hinek caran aliyên min ên hêsanî hilbijartin derdikevin holê. Ez li ser van nêzîkatiyên xwe lêhûrbûn dikim ez ê bi lez van derbaz bikim.

Te di nameyên xwe de xala me rastiya PKK'ê jiyanî nekiriye, têkoşîn nekiriye dest nîşan kiriye. Min ev xal bi awayek di cih de ye di dilê xwe de hîs kir. Ger têkoşînek hebe jî lê pir tûj û dijwar nîne. Ji ber vê jî pîvan tevî hev bûne. Kî ji bo rêxistinê, kî ji bo gel têdikoşe nediya e. Ev nediya di gelek qadroyan de tengaviyan dide jiyîn. Nakokî zêde dibin. Tiştên min ji rastiya PKK'ê fêhm kirî û her tim dixwazim pêk bînim ev e. Bê ku guh bidim ka kî çi dike di rîya tiştên jê bawer dikî û bi baweriya xwe meşîn ji bo min bûye pîvana bingeşîn. Ji ber vê ez rêwiya xeyal û baweriyên xwe me. Ti hêz nikare min ji lêgerînên min veqetîne, ger werim veqetandin wê demê mirîme. Wê ev mirin ji mirina fîzîkî wêdetir be. Yê dizane çawa dike wê bizane çawa bijî û çawa bimre jî. Hevalê Erdal, ez dihezirim gelo dubare ji rêxistinê re bêjim, biryara min nayê pejirandin? Rêbertî li ser çalakiyê ti nixandin nekiribû. Ev jî tê wê wateyê divê çalakiyên bi vî rengî neyên kirin. Divê tu li hemberî şerê topyekûn derbazî têkoşîna topyekûn bibî. Ez perspektîfa vê pêvajoya dîrokî wisa fêhm dikim. Ez ê bi vê azweriyê bijîm, wê jiyana min bibe di oxira armanca xwe de bi rê ketin be. Ez ê bi ronahiya we re bi rê bikevin hevalê Erdal.

3 Pûşberê 2007

Dunya!

Keça Botanê ya rûken û egîd

Dilên tirsonek

Ji sekna te ya bi heybet dibizdiyan
Awirên te yê bazan
Fermana Azadiyê dide
Mirov dibûn evîdarê
Wan çavên te yê mîna xezalan
Dil dixwest
Wê pora te ya te ji zerê tavê girtî mist bidim

Kenê te yê mîna zarokan
Bi coş dikir awaza azadiyê
Keça Botanê ya dilê bi hêvî
Te bi hezaran hêvî jîndar kirin
Li çiyayên Botanê
Koçeran bi te re tama evînê kir
Hezkirina di dilê te de bû şîtil
Bi berzbûna hezkirina te re hêvî bû jîyan
Tu hêvî bûyî
Tu ji dilên reşbîn re bû ronahî
Keçên ciwan ji te fêr bûn
Li hemberî çarenûsa xwe îsyan bikin
Pêlên serîrakinê Botan dorpêç kir
Erd û ezman hejiya
Çanda hezar salî dijîn

Di nav çar dîwaran de
 Bedenên dihatin qamçîkirin
 Gihiştin azadî û ronahiyê
 Li Botanê hewar bilind dibin
 Zarok xemgînin
 Ma hema wisa bê ku li pişt xwe binêrî çûyîn dibe?
 Welatê min xwîn digirî
 Gabar tu çawa dikarî xezalên nazdar bidî?
 Me dizanî ku tu dosta me yî
 Xwe sipart hembêza te
 Dunya hîn di temenê ciwaniya xwe de bû
 Hîn ji henasa jiyanê têr nebibû
 Gabar heft giyan ketin axê
 Ma wê çawa dil vê rake?

4 Pûşberê 2007

Merheba kulîlka min a mizgîniyê

Xwezî te zanîba min çiqas dixwest berî tu biçî te bibînim. Çavên min her tim li rê ye. Rojên min kêman mane, ez pir dixwazim te hembêz bikim û bêhna te hilmijînî dil û hinavê xwe. Ez hîs dikim tu jî dixwazî min bibînî. Ez nizamim ka wê carek din ew şansê me yê em dîsa hev bibînin çêbibe. Dê sal vê bide nîşan. Ez ê bi hezkirina te bijîm û henase bigirim. Ji bo te ne êşînim jî ez ê bi hemû hêza xwe bi ser xwe de biçim. Ger rojek tişteki tu pê xemgîn bibî bikim, di wê demê de êdî her tişt ji derveyî vîna min pêş ketiye. Ez çawa her tim bi te ser bilind im, ez ê di nav jiyanek tu jî bi min ser bilind bî de bim. Ez ê her tim bêriya te bikim Mizgîna min.

Wê roja din hevalek ji bo min bibîne hat gel min. Min pir bêriya wê hevalê kiribû. Dema min ew li hemberî xwe dît min qêrek da. Suprîzek pir xweş bû. Bi qêra min re hevalên di taxîmê de ji xewa xwe ya şîrin şiyar bûn û hinek hevalan fêr kirin qey tiştêk bi min bûye. Lê dema fêr kirin tiştêk bi min nebûye xwe bi min re aciz kirin û min şiyarî ji bo dengê xwe girt. Li Bakûr veşartîbûn û bêdengî esas e. Divê hinek din dengê xwe kêr bikim û qêrên xwe kêr bikim an wê ev qêrên min, me êşkire bike. Deng û qêrên min li gor Zagrosê min li vir pir kêr kirine, lê ev têrê nake.

Ger çûna min a Bakûr neba min xwe komî ser hev nedikir. Tiştên ez li vir dijîm dixwazim li wir jî bijîm. Ez ê li wir tevlihbûna bi hêz esas bigirim, dihezirim ez ê bi vî rengî ji Rêbertiyê re bibim bersiv. Berê vê jî tercîha min her tim qadên zehmet bû. Tevî min dizanî ez ê zehmetî bijîm jî min zorî hîlbijartibû û ev taybetmendiya min ez bi hêz kirim. Di min de vîn û serhildêrî da avakirin.

Ez ê neçim cihê Mazlûm, Egîd û Yildizê lê gerîlatî kirine, lê ez ê li cihê tu lê mayî gerîlatiyê bikim. Belê hevala min a bedew, ez ji te û hemû hevalên li Zagrosê pir hez dikim.

Amadekariyên me yên ji bo çûna Bakûr didomin, rêgezên li Bakûr ên heyî li vir dixim parçeyek jiyanê me ya li vir. Ger bi çanda gerîla jiyan hat avakirin dê ew jiyan serkeftinan bi dest bixe. Êdî bi şev çûyîna erkan çêdibe, em êdî her tim êvaran dimeşin. Me dev ji roj berda. Bi şev çûna peywiran zêdetir xweş e. Em bi hênîkahiya şevê re rêwitiya xwe dikin. Em komê heval çûn lojîstîkê, berpirsyarê komê hevalê Andok e. Em weke şervan bela xwe li wî dixin, fermanîdar fedakarin, divê her tiştî ew rake û hwd.

Heval barê xwe pir zêde giran dikin, barê min li gor yê wan sivik e. Kom alîkarî dide hev û pir bi moral in. Ji ber vê germîna hevaltiyê barê te çiqas giran be bila bibe tu guh nadiyê. Her ku em dimeşin bacanên li ser piştê hevala Zeyneb diparçiqin û ava wan diherike, piştê hevala Zeyneb hemû bûye ava bacanan. Bi gotinên havalan mîna heval pêwîst nake em salçê bigirin jixwe hevala Zeyneb ji me re salçe çêkiriye dengê kenê hemû hevalan bilind dibe. Her ku em dimeşin cemedê li ser

goştê mirîşkê ya li ser piştê min dihele û di ser piştê min de diherîke, xwe pir nebaş hîs dikim. Êdî goşt li ser piştê min dest bi kelandinê dike û ev jî dibe mijara henekan. Heval dixwazin barê min bigirin lê ez nadim. Jixwe ez qirêj bûme, bila ew jî qirêj nebin. Hevalê Rohat çeka min digire û bi stranên em digihin wargeha xwe, ez bawerim wê îşev li Başûr peywira me ya herî dawî be. Hevalên xort me vedixwînin çay vexwarinê divê em biçin. Wê kî di vê rewşê de rûne. Çawa hatim hema min cilên xwe guhertin. Hevala Zeyneb bi wê westandina xwe cilên xwe şûştin. Lê min cilên xwe neşûştin, ji ber bi ava cemidî paqij nabin. Çawa min çavên xwe danîn ser hev hema razam. Ez bi dengê rojbaşê şiyar dibim. Hevalê Bahoz hatiye dê civînê lidarbixe.

5 Pûşberê 2007

Dixwazim hinek tiştên ji wê roja din mayîn niha temam bikim. Min wê roja din peywira xwe nivîsandibû lê min hemû nenivîdandibû. Belê, bê ku serê xwe bişom diçim civînê. Min cilên zêde dîtîn lê êlek nîne. Min herî dawî çareserî di êlekê xwarinpêj girtinê de dît. Xwarinpêj hevalê Rojhat Markoz bû. Min ew wêrekî di xwe de nedît êlekê wî bixwazim. Dixwazim fermanدار me ya timê hevala Rûksen bixwaze. Ez ketim pey hevala Rûksen bezim xwaringehê. Ez di nav cilên hevala Avesta yên min li xwe kirine de winda bûme, dema em çûn xwaringehê hevalê Rojhat goştê me anîbû hûr fikir. Hevala Rûksen got; cilên hevala Marya qirêj bûne, êlekê xwe bide wê. Hevalê Rojhat bi awayek matmayî li me dinêre. Di destpêkê de hizirî qey em henekan dikin lê dema li rewşa min nêrî fêr kir ku em cidî ne. Hema çû êlekê xwe girt û anî. Bi ken got; tu êlekê min jî qirêj nekî. Bi vî rengî tiştên bi serê min de hatin hemû komê fêr kir. Hevalên di komên din de dema ez di nav van cilan de dîtîm bi nîşaneyên çavan pirs kirin û gotin ev çi rewş e. Lê ez wan bê bersiv dihêlim.

Civînen hevalê Bahoz berdewam dikin. Di me de lêhûrbûnek pir xurt ava kir. Me ji van civînan hêz û moral girt. Bi awayek gelmperî em bi moralin lê têrbûna bîrdozî esas e. Dema min hevalê Bahoz dît bê ku wê kêliya me xatir ji hev xwest nefikirim nikarim xwe bigirim, xatirxwastînek pir cuda bû. Xatirxwestînek em êdî hev nebînin bû. Di navberê de

ez çûm gel hevalê Bahoz lê ez nas nekirim. Di navbera duyemîn de dubare çûm û dîsa nas nekirim, ez jî êdî neçûm gel. Ez li bendê bûm min nas bike, ya rast pir ne girîng e. Karê wî pir e, di rojê de bi hezaran mirov re daxive, ji ber vê asayî ye ji bîr bike û neyê bîra wî. Min ji ezmûnên xwe yê jiyane ev encam bi dest xist: Wê bendewariya te ji kesekê nebin û tu yê bi hêza xwe ya cewherî zehmetiyan derbaz bikî. Min her tim bi vê felsefeyê jiyane kir û dijîm.

Di vê pêvajoyê de çalakîyên pir baş çêbûn, dijmin li hemberî van çalakîyan bêcare ma, li Kurdistanê rewşa awarte hat ragihandin, dihezîre qey wê bi vî rengî encam bigire lê hemû vala ne nikare encam bigire. Herêma Başûrê Kurdistanê jî daye ber topbaranê. Xakûrkê, Zagros, Metîna, Heftenîn û Zapê cihê em niha lê ne toparan dike. Di navbera topbaranê de me xwe da cihê ewle, em li guleyên hewanê yê di jêr kevîran de diteqîyan dinêrin. Seet ji 11'ê şev heta 2' yê şevê berdewam kir. Bi taybet qada cihê Eqedemiya Ş. Bêrîtan lê ye topbaran dikir. Piştî heval gihiştin cihê bi ewle çiqas dixwazin bila bavêjin ne girîng e. Wê ji bo me baştir be, wê bi awayek aborî û moral birûxin. Îşev hemû Kurdistan di întîşarê de bû û li guleyên mîna strêkan diteqîyan dinêriyan. Êdî em ji temaşekirinê zivêr bûn û xewa me tê, bawerim xewa dijmin jî hat, ji ber wê seet di 2'ê şevê navber dayê. Em jî piştî wê razan. Ez û hevala Delîla bi hev re di cihê xwe de razan, sibê spor nebû û bi germahiya rojê re baştir razan. Em bi dengê rojbaşa hevala Sarya re şiyar bûn, hîn xewa me tê lê em neçarî rabin.

Hevalên di taximê de behsa tiştên şevê rû dane dikin û li ser pêvajoyê nîrxandinan pêş dixin. Nêvenga nîqaşa taximê dişibe panêlekê. Îro jî roja me ya nexweşxanê ye, ji komê em pênc heval diçin doktorê diranan. Bawerim wê ev çûyîna me pir bi kêf be. Dema em nêzî nexweşxanê bûn em çi bibînin? Topên hewanê ew der perîşan kirine. Darên ew qas mezin qulipandine û çalek sê metre hatiye vekirin. Dema me çal dît em matmayî man. Em li ser ka kîjan made ev qas dijwar e nîqaş û nîrxandinan pêş dixin. Me navek jî li xwe kiriye; ekîba ziyanê di cihê wê de diselimîne. Em lêkolînan dikin, yek bi yek li cihên hewan lê ketine dinêrin û parçe ji destekî derbazî destê din dibe. Ji vê ekîba me tenê qemera kêr e. Em hevalê Zerdestê jî yekeya çapemeniyê dibînin,

ew jî ji bo lêkolînê hatiye. Em derbazbûnên xwe ji wî re peşkeş dikin. Em parçeyek hewanê yê me dîtî ji bo nexweşxanê weke bîranîn dibin û em weke hêza Bakûr derbazbûnên xwe ji wan re jî pêşkêş dikin. Me pir zêde xwe daye vê ekîba xwe ya xebatê. Ev ji bo hevalên gulê ne-avêtine bû ezmûnek. Bi vî rengî dê li hemberî teknîkê xwe çawa biparêzin hat dîtîn. Dihizirim dijmin çiqas bê aqil e. Niha dijmin wisa fêhm dike gelek kes kuştine û birîndar kirine. Ew nizanin ji bo me bû ezmûnek.

10 Pûşberê 2007

Merheba hevalên min ên bi strêkan re direqisin

Jiyana gerîla bi rengan dagirtine, ez bawer nekim mirovên asayî bi qasî gerîla bi coş û kêfxweş nêzî jiyana bibin. Di heman demê de yê bi qasî gerîla wate dide êşên xwe jî tineye. Gerîla evîna jiyana ye, gerîla azweriya min e. Ez ji şoreşgertiyê rih digirim. Em di nav jiyana gerîla de lê hinek caran em di ferqa van nirxan de nînin, em jiyana gerîla ji rêzê digirin dest. Divê pîrozbûna jiyana gerîla were zanin. Jiyana gerîla ji bo evînek jêneveger û bi hemû zehmetiyên xwe ve xweşik e.

Civîna me hîn didome. Di civîna duh de ji aliyê hevalê Bahoz ve nasnameya me hat girtin. Nasnameya min negirt, got te nas dikim lê ez hiziribû qey min nas nake. Ez li bendê bûm li ser rêwîtiya min a Stembolê bi min re diyalog bike, dema behs nekir ez tê gihîştin min nas nake. Duh şev, şevêk pir cuda bû. Hevalê Bahoz bi moralên xwe yê suprîz rengêk cuda da wargeha Bakûr. Piştî civînê got; xebatek heye. Her kesê ji hev pirsî û got; xebata çi heye. Bersiv nayê dayîn. Lê hema me mijar fêhm kir. Ji ber hevala Delîla komîsyon e. Ger hevala Delîla di nav kar de be wê demê tê wateya moral heye. Dengê hevala Delîla pir xweş e, dema wê guhdar dikim şehîd Newal tê bîra min.

Em erkên xwe yê rojane xilas dikin û dema seet bû 9 di mijara çûyîna de dudiliyê dijîm, xwe pir westiyayî hîs dikim. Di aliyê din de jî cara yekem şahiyek hevbeş bi awayê hemû kom tevî dibin çêdibe û dixwazim bi hevalan re bikenim, kêfxweş bibim. Dizanim ez ê bêriya vê rojê bikim û lê bigerim. Girêdana min a bi hevalan re ez birim cihê şahiyê. Stêrk li asîmanê şîrî tarî dibiriqin, bayek têngem xwe li rûyê me

dide. Yek jî agirek gerîla yê şevê ronî dike heye. Şevêk pir romantîk e, şev jî hevalbendiyê ji romantîkbûna gerîla re dike. Agir ji bo gerîla wate û xweşîkbûnek xwe ya cuda heye. Agir pîroz e.

Hevalên cihê xwe di koma Amedê digirin hatine, cihê xwe girtine. Em jî cihê xwe digirin. Di çavê hemû hevalan de hezkirin û hevaltî tê xwendin. Çav mîna stêrkan dibiriqin. Dil û çavên me bi agir re direqisin. Em nikarin çavên xwe ji agir vegehnin. Her kes cihê xwe digire û dema min hevalê Elîşêr weke pêşkêşvan dît matmayî dimînim. Bi hevalê Agirî re ji bo em di navberê de silav bidin hev hevpeyman çêdikin. Di navberê de çend çirke derbaz nebûn, ez vexwandin ser dikê. Ez matmayî mam, di vê tarîtiyê de ez çawa dîtim? Dizane dengê min nexweş e lê dizanim ji ber sedema nîrx dide min banî min kir. Bi vî rengî ez çûm ser dikê û bê ku tiştêkî nebêjim nikarim biçim. Min bîranînek xwe ya min di pêngava yekemîn de jiyan kirî vegot. Bêguman ji ber meha lehengiyê bû bê ku hevalên şehîd bîr neyînim min nekarî derbaz bikim. Hevalê Qehreman, min ti carî te ji bîr nekiriye û ez ê ji bîr nekim jî.

Her ku şahî berdewam kir hevalên cihê xwe di rêveberiyê de digirin derketin ser dikê stran gotin an jî bîranên xwe vegotin. Fermandarên me pir kêrhatî ne. Ger dijmin bizane fermandarên me ev qas xwezayî ne wê tiliyên xwe gez bikin. Dibe aliyê fermandarên me yê kêrhatî jî hebin lê li gel wan coşa jiyan û hezkirina mirovahiyê heye. Ev jî wan rakêşwer dike, gelek hevalên me yê deng xweş hene. Ev atmosfer ew qas jidile, ev hestên hevaltîyê her tim ez bandor kirime. Her hevalek bi awayek cuda hestên xwe tîne ziman û parve dike. Bi vî rengî bi mirovên tu qet nas nakî jidil parve dikî. Nêvenga gerîla warê firîşteyan e. Gerîla mîna zarokêkî pîr û pak e. Lewma mirov ji jiyana gerîla têr nabe. Ji hemû parçeyan heval hene, bi reng û lehçeyên xwe ve şevê bi coş dîkin. Çapemeniyên me jî bê rawest bê ku biwestin wêneyan digirin, her tim li ser piya ne, em ji xwe re dilîzin ew jî ji bo vê şevê di dîrokê de neqîş bikin hewl didin. Mirov li hemberî hewldanên wan nikare ti gotinan bêje. Hevalê Cesur û Elî jî hevalên hêja ne. Ez van gotinan ji bo em diçin Bakûr nabêjim, bi rastî jî milîtanên hêja ne. Bi xwezayî bi ked û hewldanên xwe re rêz bi dest dixin.

Belê hevalên min ên çapemeniyê, mîna hûn vê şevê ji bîr nekin em ê jî we û vê deryaya hestan ti carî ji bîr nekin. Mane me hemûyan kulim û qurtek ava vê lehiya hezkirinê vexwar, ma ne wisa? Bi helbesta hevalê Elîşêr re çavên min tijî dibin. Helbestek li ser hevala Viyan nivîsiye, hevala Viyan jî pir ji şevên wisa hez dikir. Hevala Viyan ma bê ku em te bi bîr bînin dikarin derbaz bibin? Te evîn û fêrkera agir ji me re vegot. Pêtên agir wêneyê te xêz dikin, te çawa bi mirinê leyîst nîşa me dike. Te ji bîr kirin xiyamet e.

Seet derbaz dibin şahiya me bi stranên hevala Delîla û bi marşên em dibêjin re bi dawî dikin. Ma bê govend dibe? Bêguman nabe, gerîla mîna komîka strêkan destê hev girtine û li derdora agir xelekek ava kirine. Gerîla bi qasî şerker e di aliyê çandê jî ew qas bi hêz e, her kes di heman ritmê de dilîze. Komek stranan dibêje koma din jî lêvedigerîne. Bêguman di vê navberê de yên dengê wan nexweş jî di vê qoroya xwazayî de xwe dinixûmînin, yek ji wan jî ez im û stranan qêr dikim.

Zap îşev bi coşa gerîla deng vedide, çûk jî bêdeng bûne û li vê govenda bi heybet dinêrin. Hevala Viyan pir ji govendê hez dikir. Bê rawest heta 12'ê şevê govend hat gerandin. Me xwest hîn bilîzin lê ji ber sibe civîn heye, lewma em neçar in navberê bidin govendê. Şehîd Sefqan gerîla pir baş bi lev kiriye; gotinên wî yên mîna gerîla bê ku birçîbûn û tînbûnê guhdar bike şer dike, azweriya gerîla ya govendê tîne ziman. Bê ku birçîbûn û tînbûnê guhdar bike bi mirinê re tê reqîsîn. Ji 8'ê Adara sala 2006'an şûn de min govend nekiriye. Ez têra xwe lîstîm. Bila hemû şevên gerîla wisa bin, bila her tim di nav dostaniyê de bi hezkirinê jiyîn be. Ez neçarim navberê bidimê. Çend hevokên din hebûn min dixwest binivîsim lê bila bimîne.

10 Pûberê 2007

Jiyan bi suprîzan dagirtiye

Ma gotin û stranek çi nayîne bîra te? Gelek tiştên tu nikarî pênasa wan bikî di kêliyê de vedibêje. Min duh strana şehîd Newal guhdar kir û min dîsa di dilê xwe de janek hîs kir. Hestek pir balkêş e. Ev stran raboriyê tîne bîra min.

Duh piştî demek dirêj civîna taximê ya xweser çêbû. Hevala Roza civîn bi rê ve dibir. Pêdivî bi civînek wiha hebû û ji civînê gelek encam hat girtin. Bi giştî xala di lêhûrbûnên hemû hevalan de yekbûyîn çênebû, nixandina di taximê de bi giştî kesayet bi xwe re sînardar dimîne û divê ev xal bi lez were derbazkirin hat kirin. Li gor rastiya jiyane jiyanê û dana jiyanê bi rêgeza vekiribûnê dest pê dike. Di vê wateyê de mirov çî qas ji jiyane hez bike wê ew qas xwedî lê derkeve, ew qas çareser û afrîner be. Divê mirov ji rexneyan netirse. Ger rexneyek şaş hebe yan jî di cara destpêkê de mirovan tengav bike, lê tevî her tiştî di wir de rêgeza vekiribûnê heye. Nêrînên kesayet çî be anîna ziman girîng e. Di wir de te tenê rexne nake di heman demê de bi şewazê nixandînan xwe ve xwe û lêhûrbûnên xwe jî datîne holê.

Li ser gelek hevalên di taximê de rexne hebûn, li ser min jî rexne hebûn. Rexneyên hatine kirin erênî dibînim. Her çendî di hinek xalan de zehmetî bijîm jî lê tevî her tiştî erênî dibînim. Di nêvengên nû yên perwerde de di serî de her tim zehmetî dijîm, lê piştî bi demê re min nas dikin ev zehmetî derbaz dibin. Em mirovên çawa ne pir zêde di nêvengê de nadin diyarkirin. Yek jî dema tu diçî qadek nû ev zêdetir zehmetir dibe. Yek jî ger di cara destpêkê de tu çavdêriyek şaş bidî derêdî tu ji hinek nixandînan xilas nabî. Li gor rastiyan her mirovekê girtina dest wê hîn pêşketin û fêrkertir be. Lê bê ku mirov nas bike hema wisa raseterast binirxîne, nêzîkatiyên demkî weke feraset û felsefeya jiyane bigirî dest tu yê wînda bikî. Niha dem nîne yan min dixwest rexneyên ji bo min hatînan parve bikim. Rexneyên nû hatin. Gelo ev guhertineke yan jî encama nenaskirinekê ye? Di niha de naxwazim nav lê bikim. Divê mirov ji tiştêkî re deriyek vekirî bihêle, ez dixwazim piştî hinek xalan berfireh vekim.

12 Pûşberê 2007

Pênûs û lînûs dostên mirov in

Min hîn pênûsek ji xwe re nedîtiye, yên min girtin di dawî de xilas bûn û wan jî êdî îşyan kir. Min pênûsên xwe yên xilas dibin azad berdan, ger naxwazin binivîsin bila nêvîsin. Hem çawa be ew jî mafdar in, bi qasî min guhdar dikin ew jî westiyar. Min her tim ji lînûs û pênûsan hez

kiriye û her her tim li gel xwe radikim. Ger ew li gel min nebin wisa hîs dikim qey tişteki ji min kême e. Dema di sala 1998'an de hatim girtin, parêzer hat pirsî û got; ez ê li malbatê bigerim ji te re çi pêwîst e? Min jî tenê pênûs û lînûseke ku rojaneyên xwe tê de binivîsim xwestibû. Wê demê parêzer matmayî mabû li hemberî vê xwesteka min. Ji ber min lêdan xwaribû tişortê li ber min qetiya bû, kitek bilava min nebû û çenteyên min winda bû. Yek jî lêva min teqiya bû, çavên min werimîbûn ango rewşa min perîşan bû. Parêzer wisa fêhm kiribû ez ê cilan bixwezim ji ber wê jî li hemberî xwesteka min a lînûs xwestinê matmayî mabû. Piştî wê demê parêzer hat hevdîtinê pirsî min destpêkê jê kirî; lînûs û pênûs hatine bû. Parêzerek pir şîrîn bû, ji Dîlokê ye, ger şaş nebin navê wî jî Salih bû. Ji Komeleya Mafê Mirovan (KMM) hatibû.

Roj bi hemû leza xwe ve diherikin. Bendewariya di dilê min de min tengav dike, lê em neçar in bisekinin ji ber cuda ti vebijêrka min a din nîne. Em dixwazin ji yekîneyê re şîrînahiyê çêbikin. Ez û hevala Rûksen bi hev re di germahîya nîvro de ketin ser rê. Ji ber em ê ji hevalan re pasteyek xweş çêkin em pir bi moral in. Ji wargeha xwe çûna cihê firinê pir zehmet e. Me tiştên pasteyê girtine gel xwe, di destê her yek ji me de telîsên spî û sênî hene. Di rê de ez û hevala Rûksen bi hev re bi rewşa xwe dikenin. Em dişîbin wan Çîngeneyên van sêniyên spî dikin û yên li sûkê lalîkan difiroşin. Ji ber Çîngeneyan biçûk dibînim vê nabêjim, tenê min di wateya pişeya wan de got.

Hemû heval razane, em jî bi armanca em ê tişteki xweş çêbikin gavên xwe bi lez tavêjin. Em gihiştin firinê, nanpêj hene lê ji bo xilas bikin kême maye. Hema em hevîr amade dikin. Lezoya me nîne, lê weke alternatîf ji bo tama wê xweş be fantayê dixin hundirê wê. Piştî nanpêjan hema me dest pê kir. Lê piştî wê em çi bibînin? Keka me çêkirî di binê sêniyê ve maye û jê dernakeve, ji bo em derbixînin bi kevçîk pê re mijûl dibin, vê carê hûr hûr dibe û nêva wê jî hevîr e. Li hemberî vî dîmenê rûyê me tîrş dibe lê di aliyê din de em moral didin hev. Em dibêjin ji ber hîn tîrş nebûye lewma wisa dibe. Em kêmek din hevîrtîrş dixin nav. Yek jî me gelek hevîr kiriye. Em kêmek radiwestin, dubare çêdikin, lê dîsa heman tişte! Em çi dikin çênabe, moralê me xirab bûye. Seet jî derbaz bûye, bû dereng û em nikarin qurabîyan jî çêbikin. Ev hevîr kêrî ti tişteki nayê.

Tenê li hemberî me sekiniye û bêhna me teng dike. Hemû heval jî li benda pasteyê ne lê em ê dest vala biçin. Çend hebên me çêkirine sar bûne tam dişibin TNT'ê. Çareseriyek tenê heye ew jî em hevîr birjînin. Em sêniyan dişon, heta me paqij kir me îşkence kişand. Kekên bi sêniyê ve mayîn jê venabin, em xweliyê diceribînin nabe, kêmek paqij dibe lê ya din pê ve dimîne. Morelê me di asta herî jêr de ye. Hema yek dest li me bide em ê bigirin. Pratîka me tasfiye derketiye û em êşiyane. Hemû cilên me bûne ar. Em naxwazin di rê de ti kes me bibîne. Heta em li cihekî rêya xwe diguherînin. Dema em gihiştin xwaringehê tiştên hatine serê me vedibêjin. Hevalê Amed dibêje; ya me jî wisa bibû û hewl dide moral bide me. Berî me hevalê Amed û Îsyan xwestine çêbikin lê ew jî serkeftî nebûne û heta wê demê me gelek henek bi wan kiribûn. Gotinek pêşiyar heye; “loman ji ciranê xwe neke wê were serê te jî.” Me jî lome kir û hat serê me. Bi vê pratîka xwe me li wargehê mijarek bi ken ava kir. Em dibêjin ne ji ber sedama karbonatê bû, lê em texmin dikin hevîr ji ber fantayê xirab bûye.

Riya mangeya me di ber xwaringehê re derbaz dibe yan qet niyeta em biçin xwaringehê nîne. Hevalê Îsyan û Rojhat jî hatin pastê bixwin. Tenê ji bo teşqeleyan çêkin. Êdî em jî bi henekên hevalan dikenin, bi nirxandinên wan re em jî tengaviya di dilê xwe de davêjin û weke bîranînekê derbazî çîroka me dibe.

13 Pûşberê 2007

Hestiyarî zehmetiyan dide jiyîn

Kêliya em li bendê bûn hat, dê koma destpêkê bi rê bikeve. Bi hevalên cihê xwe di komê de digirin tê nîqaş kirin. Her hevalek pir bi kelecane, ez jî di nav bendewariyê de me. Min dixwest cihê xwe di koma destpêkê de bigirim lê nebû. Ya rast bi vê ez êşiyam. Hevalên diçin pir kêfxweşin û ger baskên wan hebin wê bifirin. Ji hêza Xerzanê timek diçe, du hevalên jin û du jî hevalên xort hene. Yê ji komên din jî biçin hene. Ji gel me hevala Rojna, Sarya, hevalê Serhed û Demhat diçin. Ji roja tevî gerîla bûme heta niha ez hevalê Serhed nas dikim, min ti carî ev qas ew kêfxweş nedîtiye. Kêmek maye bireqise, ji ber em hevalên jin li wir in nalîze lê bê ku destê xwe li milê xwe nede derbaz nake. Hevalê

Serhed hevalek pir kevin û di temenek pir biçûk de beşdar bûye. Ji aliyê hevalan ve gelek tê hezkirin. Hevala Sarya jî ji Kurdistanê, Amedê pir dûr jiyaye, ji ber vê yekê jinek dildara Amedê ye. Ji ber dê biçê wan deran pir kêfxweş e. Hevalê Demhat di nav xwezayê de mezin bûye, hevalek pir xwerû, rast û pir bi hevaltiyê ve girêdayî ye. Cewherê xwe yê koçeriyê diparêze û ev cewher wî dike şervanê azadiyê.

Hevala Rojna hevalek jin a kevin e. Pir hestiyar e, ji ber vê çendê her tim zehmetiyan dijî, di warê bîrdozî de pir bi hêz nîne lê aliyê wê yê pratîkî pir bi hêz e. Ji wan jinên Dicle ya serhildêr e. Ji ber em ê ji hevalan veqetin dilşkestî ne. Her çendî em ê dubara wan bibînin jî lê dîsa veqetîn pir zehmet e. Ti kes nizane di rê de wê çi çêbibe, her cureyên dibêtiyan hene. Her hevalek di zanabûna vê de ye. Çûyîn hêsan e lê li pişt ên diçin rawestin pir nexweş e. Ger tiştek bi hevalekî were wê demê mirov zêdetir bondor dibe.

Hevala Zîlan û Agirî yên em bi hev re ji Zagrosê hatin çûn. Hevala Zîlan diçe Dêrsimê û hevala Agirî jî diçe Erziromê. Hevala Agirî hevalek pir ciwan û bi coş e. Milîtanek her tim bi coş û moral tevî jiyânê dibe ye. Hevala min Agirî ji Botanê ye, vê carê jî diçe bibe keça Erziromê. Ez bawer nakim carek din bibînim. Ji ber êdî pir zehmet e. Ez gelek ji hevala Agirî hez dikim, mirov ji coşbûna wê moral digirt. Ji ber ez ê ji wê veqetim çavên min tijî rondik bûn, qirika min tevîzî, peyv derediketin û tenê min karî bi dengê nizim bêjim; serkeftin. Wê jî ji min re digot; divê tu negirî. Hemû heval bi awayek di yek rêzê de ber bi rêwîtiya hêviyê ve dimeşin.

Hevalên min, min jî dixwest bi we re bim, oxir be, bila riya we vekirî be. Serkeftin.

15 Pûşberê 2007

Hevalên min bê tinebûna we bêrikirin belav dibe

Ev der bêdeng bûne û li we digerin. Me hûn her tim di qada voleybolê de didîtin û niha çavê me li we digerin. Di jiyana PKK'ê de şûna her hevalekê cuda ye, bi rengê xwe rengê cuda dide jiyânê. Wê çend rojên

din koma din jî bi rê bikeve. Hîna navê wan nehatine ragihandin, lê dizanim ez di koma dawî de cihê xwe digirim. Ji ber vê moralê min pir xirab e û xwe pir westiyayî hîs dikim. Ger îsal neçim Bakûr dê rewşa min pir xirab be û êdî nikarim xwe komî ser hev bikim. Şansê komên herî dawî dimînin zêde nîne. Şansê komên destpêkê diçin zêdetir e.

Min duh şev hevala Mizgîn di xewna xwe de dît, her cara zehmetiyan dijîm her tim wê dibînim. Min pir bêriya wê kiriye û hêviya xwe ya dîtîne hîn taze digirim. Ew her tiştê min e. Di kêliya xwe ya herî tengav de Rêbertî û li te dihizirim, her dizirim rêya rast dibînim, ji derveyî xwe derdikevim û dibim hûn. Mizgîniya min, dilê me cihê zehmet dixwaze, dilê min Bakûr dixwaze. Ez dihizirim ez ê li cihên dûr xwe bibînim û nas bikim. Êdî dixwazim ji hinek tiştan re meydan bixwînim, ger ez şervana azadiyê me wê demê divê bizanim li gor rêgezên azadiyê bijîm. Azadî bi koletiyê nayê dest girtin, bedel dixwaze. Her tişt ji bo Rêbertî ye. Ji ber vê henase digirim û dijîm. Dema wexta wê hat jî dixwazim şehîd bikevim. Ya ji xwe re esas digirim hezkirin e. Ez ji bo hezkirinê dijîm. Ya min digehîne erdembûna mirovbûnê hezkirin e.

Hevalên mayîn jî di mijara ka wê kengê biçin de bêsebirin û her roj rext û çeka xwe paqij dikin. Cebilxanê dibin û tînin. Ez demsalek din a havînê di nav bendewariyê de derbaz dikim.

16 Pûşberê 2007

...

Li pey xwe gihandina kêliyê me

Kêlî hîskirin û jiyîne

Negirînge beriya wê çî bûye

Bê ku guh bidî salên te windakirine

Bikarî vê rojê azad bijî

Bi pakbûna beybûnan

Ji mirov,

Xweza û jiyane

Hez dikim

7 Pûşberê 2007

Ji bo keça Wanê ya xembar

Hîsên jinê pir bi hêz in, tiştên berî wê rû bidin hîs dike. Ev hîs hinek caran ji bo hinek kêliyan baş e lê ji bo hinek kêliyan qet nebaş e. Bi tiştên berî rû bidin hîskirin di heman demê de zûtir dest bi êşkişandinê dike. Hevala Cîhan a di taximê de pir bê moral e û her tim digirî. Em dixwazin moral bidin wê lê qane nabe û ji hîsên xwe bawer dike. Heval dihizirin wê ji komê derbixin. Ji wê re hîn nehatiye gotin lê wê bêjin. Hema bihizire, dê ji xeyalên bi salan mezin kirine bê qutkirin û tişteke ew qas hêsan nîne. Wê jî dixwest bi hêz tevî vê pêvajoyê bibe û lêhûrbûnên wê ser vê bingehe bûn. Ez xwe dixim şûna wê, min qet nedikarî xwe kom bikim. Tişteke ji destê min nayê. Hêviya xwe qut neke, sala bê ger Xerzan nebe tu yê teqez biçî Botanê. Di jiyana te ya nû de serkeftinan dixwazim.

16 Pûşberê 2007

Welatê min ê xweşik

Xew ji çavên min dirije lê ez ê nerazim, li hemberî xewê şer dikim. Ez bawerim ev westandin çavkaniya xwe ji germahiya nîvro a rojê digire. Hevala Rûksen a li kêlekê razaye hercar xewa min tîne lê ji rikan ez ê nerazêm. Duh 17'ê Pûşberê bû. Salvegera şhadeta hevala Sema ye. Me merasîma leşkerî çêkir, piştî wê me rapor û nameyên hevala Sema xwend. Ez kengê van nameyan dixwînim weke nû dixwînim hîs dikim. Her tim wê kêliya destpêkê dema min hevala Sema dîtî, piştî wê dema xwe dişewitîne, ji ameliyatê tê derxistin, piştî şehîd dikeve û ew pêvajoyên diçe Agiriyê dihizirim. Hevala Sema jî pir zehmetî jiyîne û di encama zehmetiyên xwe de jî gavek pir mezin avêtiye. Weke jineke xwe ji xweliya xwe afirandiye, pir jê bandor dibim. Ez rêbazê hevala Sema ya destgirtina xwe ji xwe re mînak digirim. Divê her milîtanek jin xwe di vê astê de bigire dest. Tiştên jiyane pir baş pêname kirine. Hevalên di meha

Pûşberê de şehîd ketin pir in. Cihê her hevalekê cuda ye, di vê şoreşê de gelek egîd ketin bin vê axê. Şer her roj giyan digire, şer helweşînere, gelek rûxandinên şer di welatê min de ava kirine hene. Dixwazin welatê min veguherînin çolekê. Welatê min ê xweşik, tu yê her tim di dilê min de mîna baxçeyek gulan bimînî.

18 Pûşberê 2007

Ji bo Mizgîn

Mizgîna min

Her li te digirim

Di nebûna te de

Di okyanûsan de bi rê dikim

Ev dil dixwaze

Di her berbanga sibê de

Bi te re şiyar be

Rojan dijmêrim, tu nehatî

Belê dizanim giyana min

Tu yê werî

Dê tu astengî, mertal, çiyayan derbaz bikî

Û werî

Bila hatina te dereng bikeve

Bes bila tu werî!

...

Bi te re me xwe berda nav şeran

Li hemberî mirinê singa me vekiriye

Me ji jiyana bêdawî qurtek av vexwar
Ger mîna stêrkan bişemitim ji vî welatî
Bila miradek te hebe
Bila ji çavên te rondik nebarin
Ji dûr ve jî be
Ez te hîs dikim û dijîm
Kêm maye roj biçe ava
Wê roj xatir ji me bixwaze
Di şefeqa sibê de li benda te me
Tu yê werî ne wisa?
Li te digirim
Min bêriya te kiriye giyana min

19 Pûşberê 2007

Rojek din

Me televîzyon guhdar kir, dîsa windahî hene. Ev nûçe êdî me tengav dikin. Windahiyên dijmin jî gelek hene. Malbat hewar dikin, ma wê kî qêrînên wan bibîhîze, qet di xema Serokê Giştî yê Tirkîyê Yaşar Bûyûkanî de nîne, mirovek bêhest e yan wijdana wî ranedikir dê xwe kuştiba. Lê ji ber ew qas bêhest e ji xwe kuştinê wêdetir plana ka wê hîn xwîna çend mirovên din vexwe dike.

Ez dixwazim tişteke min di jiyana xwe de cara yekem dîtî parve bikim. Dibe kesên zanyar sedema vê bizanîn lê ez naxwazim di derbarê wê de tiştekî bizanim, bila berdewam min bandor bike. Di van kêliyan de divê qemereyek min hebe û min girtiba lê mixabin qemereya min nîne. Gelo hevalê Cesur ev dîmen dîtiye? Ger bibîne teqez wê bigire. Dibe ev tişt wan di berê de dîtibe. Na, çi dibe bila bibe divê ev dîmena xwezayê bê girtin.

Piştî me nûçe guhdar kir şûnde em ketin rê, di wê kêliyê de çi bibînîm! Li asîmanan tevhevy derketiye. Belê, cara yekem heyv dernakeve, cara yekem stêrk dernakevin, lê ya vê carê cuda ye. Di heyvê de stêrk heye. Ez cara yekem dibînîm di nav heyvê de stêrk heye. Ya ku cara yekem dibîne tenê ne ez im, gelek hevalên weke min cara yekem dibînin hene. Em bihevrebûna stêrk û heyvê çawa binirxînin?

Min duh bi navê hevala Mizgîn helbestek nivîsand, min îro jî nîşeya wê girt. Ez pir kêfxweş bûm. Em di rih û hest de heman tiştan hîs dikin. Mizgîn giyan, xwezî te bizanîba min çiqas bêriya te kiriye, ji te pir hez dikim. Di kêliyên van rêzikan dinivîsînîm de mêvanek me heye, ew qas şîrîne çawa pênase bikim nizanîm. Bêdeng tê û em jî bêdeng li wê dinêrin. Tu dizanî mêvanê me kî ye? Sivoriyek e. Tê ji telîsê nan ji xwe re nan derdixe û bi awayek ew qas şîrîn nan dixwe nav herdu destên xwe û şîrîn şîrîn dixwe. Yek jî dema parçeyên nan ên ji xwe mezintir radi-kîşîne û dibe pir komîk e. Di vê kêliyê de min wêneyên wan girtiba û ji te re rêkiriba wê çiqas xweş ba ne wisa? Lê ji ber makîneya wêneyan nîne nikarim bigirim. Çapemeniya me teqez ji van xweşektir dîmen girtine. Lê min dixwest ew niha li vir ban û wêneyê van sivoriyan girtiba. Di vê navberê de hevala Rûksen dibêje; “hema tu her tiştî dinivîsînî.” Ne wisa ye. Ji ber gelek tiştên min parve nekirîne hene. Ez jiyanê bi hemû aliyên xwe ve hîs dikim û dijîm hem jî bi tama gerîla. Ev tiştên dinivîsim, parve dikim tenê ji tiştên dijîm beşek e.

Hevalê min Metîn, piştî demek dirêj min ji te agahî girt. Pir dixwazim te bibînîm. Tu hatî lê ez diçim warên dûr, em ê dîsa hev nebînin. Ma ew qas hêsan e piştî neh salan tevî derfetê dîtîne hebû jî bê ku bibînîm diçim. Min her tim xeyalên ez ê te bibînîm kir lê nebû. Dibe em di sala bê de hev bibînin. Ez ê teqez rojekê we bibînîm hevalê Cuma, min nasnavên we eciband. Dihizirim, niha hûn pir mezin bûne, gelo ez ê te nas bikim. Ez ê teqez nas bikim, ez ti carî wê sima û jidilbûna li ser rûyê we ji bîr nakim. Rojên me yên zarokatiyê çiqas xweş bûn ne wisa?

Belê, xwezî hevalê Mazlûm jî şehîd neketiba, me ew jî dîtiba û hembêz kiriba. Min ji wî re gotiba; em mezin bûne û hatin tu yê bibî

fermandarê me? Wê ji xwe re bi me kenîba û derbaz biba. Ez dîsa hes-tiyar dibim. Ez naxwezim te tengav bikim.

Piştî demek dirêj em ê biçin Zagrosê. Hema zû dixwazim bi rê bikevim. Ji ber ez ê hevalên li wir bibînim pir kêfxweş im. Divê ez hilkişim ser çiyayên Zagrosê û bêjim; ey Zagors ez ê ji te re stranên nebêjim lê ez dikarim dilê xwe bikim helbest û mîna baranê bi barînim. Zagros warê evîn û hêviyê ye. Zagros bi heybet e, giyan e, dema hez kir tam hez dike, dema hez neke jî bê ku dudiliyê bijî bi mirovan dide hîskirin ku hez nake. Zagors cihek te yê taybet di jiyana min de heye, min rojên herî xweşik di hembêza te de jiyên kir. Te hezar caran silav dikim, Zagros, Çarçêla, Govendê û Cîlo.

20 Pûşberê 2007

Tevî her tiştî jiyên xweş e

Li gor bernamê em bi rê dikevin, ber bi Zagrosê dimşin. Weke koma Xerzanê dê ev meşa me ya bi hev re bibe ya dawî. Em bûn du kom, êdî em ê bi awayê kom tevger bikim. Tav jî êdî hêdî hêdî destê xwe li me dihejîne û dibêje bi xatirê we. Dîmena bi avabûna rojê re pêk tê pir hez dikim, yek jî dema gerîla di van qadan de dimeşe dîmenek pir zêde bedew derdikeve holê. Gerîla ji bo hêviyên nû rêwîtiyê dike. Gerîlatî pir xweş e, dema te wext dît hema divê rûnî û li gerîla binêrî; meşa wê, tevgera wê ya bi hev re û bi rê ketina wê. Gerîla her tim rûkene, bi hez-kirin jiyên hembêz dike. Di çavên hemû hevalan de bîriqandinek heye.

Wê rawestgeha me ya destpêkê Çemço be, barê me giran e, ji niha ve em xwe fêrî barê giran rakirinê dikin. Di çenteyên me de guleyên B-7, C-4 û tiştên me yên şexsî hene. Cebilxane barê me yê herî bingeşîn e. Em nêzî Çemço dibin, hîn jî mîna berê herikbar e. Min pir bêriya van deran kiriye, hestek pir balkêş xwe li dor dilê min radipêçe. Bêrî û kêfxweşî di nav hev de ye. Hîs dikim ez ji van deran im, ez keça van waran im, di dilê xwe de livandineke nikarim pênase bikim hîs dikim. Em li gor rêgezên gerîla tevger dikin. Yek bi yek bi navber dimeşin, ez jî li dawî me.

Cihê em di tarîtyê de tê re derbaz bûne hewl didim keş bikim, dixwazim fêb bikim ka çi guhertin çêbûne. Giya pir bilind bûye û di bin germahiya rojê de hişk bûye. Stîrê di çong û lingên me re diçin. Min pir zêde xwêhdan daye, çente jî piştî min birîn kiriye. Weke li ser piştî min topa agir heye ew qas dişewîte, lê ev şewat li pêşiya min nabe asteng û meşa xwe berdewam dikim. Li ser rêya giştî meşin pir zehmet e. Em li Çemço ne, seet jî pir zêde derbaz bûye û bûye dereng.

Di tarîtyê de şûşeyên avê tên dagirtin û heval tênîbûna xwe dişkênin. Dixwazim qêr bikim, dubare ev der dîtin pir xweş e. Em ê îşev li Çemço bimînin û sibê bikevin robarê avê. Bi hevalê Amed re me nîşeya xwe ya nobedariyê dinivîsin, berpirsîyarê ewlekariyê fedekarin. Hevalê Amed nobeta destpêkê digire, ez nobedarê rojbaşê me. Ew dest bi nobetgirtinê dike, ez diçim gel hevalên jin xwe dirêj dikim. Em ji xwêhdanê şilûpil bûne, barangirên me qet ba nagirin, me pir germ dike. Ez xwe ji vî alî diqulipînim aliyê din, nikarim xwe li ser piştê dirêj bikim ji ber şewata piştî min jan dide. Di demjimêr 4'an de ez nobedar im. Ez di demjimêr 4'an de şiyar dibim, hîn kesê ji bo nobedariyê banî min nekirîye. Ez serê xwe ji bin barangirê derdixim, hevala Roza û Rûksen jî şiyar bûne, ew ji serma nerazane. Nobedar jî hatiye li çend metre wêdetir sekiniye. Radibim diçim gel nobedaran. Tu nebêjî nobedar pir zêde li cihê hevalên jin geriyaye, herî dawî dema dibêje ez dîsa lêbigerim reşahiye ferq dike û hatiye.

Belê, ez û hevala Delîla nobedar in. Hewa ronî dibe û êdî em xwezayê pir xweş dibînin. Tîjî derdora min darên tûyê ne, heta hevalên xort mangeya xwe di bin dara tûyê de çêkirine. Hema ez û hevala Delîla bi hev re dest bi tû xwarinê dikin. Di van demjimêrên sibê de tama tûyan pir xweş e, tu ji xwarin xwarina wê têr nabî. Bi vî awayî min û hevala Delîla me taştêya xwe xwar. Sibehek pir xweş e, berî em bêjin rojbaş hemû heval rabûn. Em jî diçin kêmekê xwe dirêj dikin. Em nîvor radibin, piştî em nanê xwe dixwin şûnde ji bo em westandina xwe li ser xwe bavêjin dikevin avê. Hinek heval pir xweş melevaniyê dikin. Yek jî divê em li vir masiyan bixwin, di vê avê de masiyên xweş hene. Hevalên xort dixwazin masiyan bigirin lê nagirin. Li gor heval behs dikin masî nînin. Lê ez dizanim min her sal ji vî robarî masî dixwarin. Hevalên jin bela

xwe li hevalên xort didin ji ber masî negirtine. Vê mijarê em gelekî dan kenadin. Hevalên me mîna masiyan ji avê dernakevin. Em vê rojê bi hewayek seyranê derbaz dikin. Em dixwazin êvarê nûçeyan guhdar bikin wisa rê bikevin, em diçin cihê herî nêzî wir gel hevalê Defîl. Jenerator xirabûye, em nûçeyên 7'an derbaz dikin lê heval pê re mijûl dibin. Em jî ji bo çay vexwin li derdora masê kom bûne. Hinek rûniştine û hinek jî ji bo rûniştinê li cih digerin. Hema bi carekê em hevalê Rojhat li erdê dibînin. Dema ew dikeve ji ber serê wî li kevir dikeve qêr dikim. Hevala Roza lê dinêre ka tiştek lêhatiye yan na. Ew bi xwe jî bi ketina xwe matmayî mabû, bi dengê aram dibêje; kê wisa kir. Hemû hevalên li derdora masê bi vê ketina wî ji kenan dikevin. Bi îtîrafkirina hevala Roza re hevalê Rojhat çima ketiye vedibêje. Tu nebêjî hevala Roza bi wî dengê xwe yê nerm re ji hevalê Rojhat re gotiye; tu biçe li ser kursiya din rûne. Lê hevalê Rojhat nebihîstiye. Bi vî rengî xwe avêtiye ser axê, ya rast ax nîne herî ye, berî vê seetekê ev der hatibûn şilkirin.

Belê, hevalê Rojhat bû herî. Ez bawerim kêmek xurura wî êşiya lê nade der. Ji ber hevalekî kêmekê ji xwe hez dike ye. Bê ku em henekê xwe lê nekin nikarin xwe bigirin, em jê re dibêjin; biçe cilên xwe bişo, tu bûyî herî. Ew jî dibêje, tiştek nabe, lê kî dizane di dilê xwe de çi dibêje? Em navê Çemço diguherînin û navê Rojhat Hemdem ê Goyî li vir dikin. Ev bûyer dê weke bîranîneke koma Xerzanê bimîne.

Piştî me nûçeyên 08.00'an guhdar kir şûnde ber bi Şamkê ve bi rê dikevin. Şamkê dikeve Başûrê Zagrosê, gundek pir xweş e. Gundek hatiye valakirin û êdî ji mirovan ti şop nînin. Êdî gerîla li gund dinêrin. Yê niha li Şamkê dinêre jî hevalê Silêman e. Hevalê Silêman weke temen mezin e, lê bê ku pîrbûn û westandinê guhdar bike bi şev û roj kar dike. Ez heta vî temenî hatim lê min kesek weke hevalê Silêman kedkar nedîtîye. Kesek ji aliyê hevalan ve tê hezkirin. Mirov ji nîqaşên wî têr nabe, ew daxive tu moral digirî, ûslûpek wî yê balkêş heye. Em di hembêza Zagrosê de meşa xwe berdewam dikin. Rêzan li cihêkî rê şaş dike, bi rêyek cuda ve diçe û avek derdikeve pêşiya me. Em bi ser keviran re derbazî aliyê avê yê din dibin, lê Rojhat (M) dikeve avê. Kenê min tê lê ez xwe digirim. Dibe ji bo heriya li ser xwe paqij bike bi zanabûn xwe xistibe avê, dibe wisa jî nebe, ev nîrxandina me ye.

Ji cihekî şûnde êdî ez dibim rêzan. Di tariyê de rê dîtî zehmet e, lê ji ber arazî nas dikim nabe pirsgirêk. Em hildikişin Şamkê. Bîranînên min yek bi yek zindî dibin. Min li vir rojên pir xweş derbaz kirine. Neqeba Cîloyê Biçûk û girên Îranê li pêşberî me ne. Em diçin cihê dirûnxanê yê kevin. Rê hemû herî ye, lingên me dikevin nav heriyê, lê herî zêde hevalê Delîl dikeve nav heriyê. Dema ez cihê dirûnxanê yê kevin dibînim bê ku hevalê Heqî û Aram nefikirim nikarim xwe bigirim. Ev der her tim hevalên hêja tîne bîra min. Tevî hevalê Aram ji lingê xwe birîndar e jî hildikişe gir û ji min re telefon vedikir.

Çawa serê xwe datînim hema radizim. Dema çavên xwe vedikim fêma dikim bûye sibe. Piştî min çavê xwe şûştin karê min ê destpêkê dibe tû xwarin. Min pir bêriya hemû hevalên Zagrosê kiriye. Dixwazim hemûyan bibînim. Kî me dibîne matmayî dimîne. Ez coş û dilşadiyek pir seyr dijim, xwe ji vê derê hîs dikim. Em diçin hem hevalê Silêman hem jî hevalên cihê xwe di yêkeya çandiniyê de digirin bibînin. Dema em dîtî bi qîrên tijî hezkirin em kêfxweşkin, em bêrîkinên xwe bi mêzekirina hundirê çavê hev re derbaz dikin. Lingê hevala Sarya yê birîndar bibû hîn sax nebûye, ji ber vê li gel hevalên yekeya çandiniyê dimîne, pir tengav dibe. Hemû heval di pratîkê de ne, ew jî ji ber lingê xwe nikare derkeve pratîkê. Hevalê Silêman pir zeyîf bûye, ez jê re dibêjim; kêmek navber bidê, hinekê bêhnxa xwe vede, lê ew dibêje; na, berxwedan jiyane. Em bi hêviya em ê êvarê dîsa hev bibînin ji wir dûr dikevin.

Li vir hevpeyvîn hatibû kirin. Demjimêrên sibê yên zû bûn, hîn gelek heval razabûn. Hevalê Emîn di destê wî de qemere û di nav bedewiya xwezayê de dîmenên min digire. Tiştên tîni jiyîn di jiyana mirov de her tim şopekê dihêle. Em digehin cihê xwe, dixwazim mîna zarokan bidim ber qêran. Heval me vedixwînin wargeha xwe. Em hevala Roza qane dikin xwe amade dikin û bi rê dikevin. Her çendî germahiya tavê me biqemire jî bê ku guhdar bikin dimeşin.

Endamên yekîneya xweser hatine guhertin, çavên min li hevalên kevin digere lê di naskirina van hevalan de jî xemsar nêz nabim. Hevalên di koma me de yên bi awayek şerm nêz dibin jî hene. Ez hîs dikim divê bi wan re jî mijûl bibim. Yekîneya xweser ji bo me dilxweş bikin hemû

mîna moriyan dixebitin. Xwarina me ya êvarê gelek dewlemend e, ji xwezayê sûd wergirtine û eprex çêkirine.

Dar hatine komkirin, dê êvarê agir were pêxistin. Em ê dîsa şevek gelek xweş derbaz bikin. Amadekariyên şahiyê tê kirin, hemû heval li derdora agir civatek dostane avakirine. Di kêliyên wisa de mirov hestên pir cuda dijî. Em bi dengê hevala Nûcan ê bi şewat strana li ser hevala Viyan nivîsandî guhdar dikin. Negengaz e mirov jê bandor nebe? Di vî temenê xwe yê ciwan de barê têkoşînê hildaye ser milê xwe, hevala Viyan hîskiriye û stran nivîsandiye. Yên ji xwe re dibêjin em hunermendin bila bibînin huner çawa tê çêkirin. Ger derfet ji hevala Nûcan re were dayîn dê nîrxên pir hêja derbixe holê.

Govendek pir mezin hat gerandin. Çawa hevala Emîne û Gulistan hatina me dibihîzin ji Nevre bi lez tînin gel me. Em bi dîtina wan gelek kêfxweş bûn. Mayîna fermanbaran wisa bi avaniya xwe re pir watedar e. Hevala Emîne û Gulistan hevalên xwedî hestên pir xweş in. Heval û fermanbaranên tînin hezkirin. Bi keda xwe ev girêdan û hezkirin avakirine.

Pîştî hevalan xwe amade kir, di tariyê de xatir ji hev xwestin û bi hêviya em ê di rojên azad de hev bibînin ji hev veqetiyên. Hizra min diçe ser henekên hevala Emîne û Gulistan. Ling û piştî min şewitiye û di ser de jî xemgîniyekê xwe li dora dilê min pêçaye. Di tarîtiyê de ber bi roniyê ve dimeşin, kêma maye dinya zelal bibe. Hevala Zeyneb li dawî maye û ez bi wê re dimeşim. Ez cara yekem araziya vê derê dibînim. Lingê min ê şewitî mîna derzî lê bikevin jan dike û hewl didim tiliyên lingê xwe nedim erdê. Lê mixabin vale ye. Piştî heval gihiştin ser avê demek dirêj şûnde em jî digihin wan. Piştî me hinek navber da şûnde dîsa bi rê dikevin. Piştî em hinekê dimeşin şûnde em dîsa ji hevalan vediqetin, şîverê bi şîverê rêya xwe berdewam dikin. Piştî cihekê şûnde dewsa lingan heye, em jî dewsa lingan dişopînin û dimeşin. Li kêleka robarekî dengê hevalên xort tê. Em diçin, diçin kes tineye. Ji bo em derbazî aliyê din bibin darek ji bo bi ser re derbaz bibin heye, ez û hevala Zeyneb alîkarî didin hev û derbazî aliyê din dibin. Em li wan deran jî dinêrin kesek nîne. Em hinekê bêhna xwe vedikin. Ez çiqoletiya li gel xwe di-

kim du beş û dixwin, dê kêmek enerjî bide. Piştî kêmekê digerin şûnde em havalan dibînin. Min gotibû em ê hevalan bibînin.

Ber bi êvarê em diçin gel tabûra şehîd Rustem. Rê hemû evrazî ye û germ e. Li ser rê kaniyek pir xweş heye, ew qas xweş e mirov ji vexwarina ava wê têr nabe. Avek pir cemidî ye, bi gelemperî ava Zagrosê xweş e. Bi îsrara hevalên di tabûrê de şev li tabûrê dimînin. Em li vir rojek watedar dijîn. Me di havalîya hevalên tabûrê de jî ti kêmanî nedît. Me daxwazên wan ên serkeftinê girtin û êdî diçin şkefta birîndaran.

Dinya gewir bûye. Em kom bi kom wêneyan digirin, em van kêliyên li ser çîyan di dil û dûmenan de bi cih dikin. Ez îşev çend caran ketim, di rastiyê de ez yeka pir dikevim nînim lê tiliyên min ên şewitî nahêlin ez lingê xwe baş danim erdê. Piştî rêwîtiyek çend rojan em gihîştin cihê xwe. Hema piştî lîsteya xwe ya nobedariyê şev dinivîsim şûnde tîm gel hevalên jin. Çay hatiye çêkirin, piştî çayekê vedixwim şûnde xwe dirêj dikim, ji ber sibe xwarin pêj im.

Piştî min sibê taştêya xwe xwar yekser diçim xwaringehê. Ez biryar didim petatan sor bikim, pir westame lê ne girîng e.

26 Pûşberê 2007

Qêrîna hêviya berfînê

Berfîn di cihên asê de serê xwe radike, bê ku guh bide zehmetiyên dijî ji xwezayê re dikene. Li gor rêgeza xwezayê di nav zehmetiyan de mezin dibe. Gelek mirov dixwazin weke berfînê serhildêr be. Ger zimanê gulberfînê heba dê gelek tiştên ji me re vegotiban heban. Ma ew qas hêsan e berf û axa hişk qelişandin û bêje vaye ez li vê derê me?

Bûna berfîna şoreşê zehmet e. Em mirov her tim serî li hêsanîyê didin û dixwazin di rêyên kurt de encam bigirin. Dema ji riya kurt encam negirt vê carê jî dikevin nav bêhêvî, reşbînî û bêbaweriyê. Ev rewşa ruhî dibe sedem em wext winda bikin. Jiyanê bi destê xwe difetisîne. Divê mirov li ser vê bingehe xwe bigehîne rastiya berfînê, zehmetî li pişt xwe

hiştin û ji cîhanê re kenîn, mîna gulberojê wizeya xwe ji rojê girtin di nav hezkirina tirêjên rojê de silav dayîna jiyanê...

Belê, ji evinek nîvcomayî ber bi rêwîtiya hêviyê ve, ez ê bibim qêrîna hêviya berfînê, ez ê şoreşgertiya herî bi heybet bijîm. Şoreşgerî pêşbaziya maratonekê ye, di bezê de sekin nîne, di şoreşgeriyê de jî rawestandin nîne. Şoreşgerî û PKK'ê ava jiyanê ye. Her çendî mirov vexwe jê têr nabe. Ez ê xwe di nav vî ruhî û ava zelal de ji nû ve ava bikim. Bi pakhûna zarokekê ez ê xwe û jiyanê keşf bikim. Roj û meh derbaz dibim em hîn li van deranin. Dijmin ewlahiya rê girtiye lewra çûyîna me giran dikeve. Ka bila em sexlem biçin a din ji bo min nepirsgirêk e. Em her roj agahiya şehadetan digirin, hinek caran qet naxwazim nûçeyan guhdar bikim. Ji biharê û wir ve nêzî pêncî heval şehîd ketine. Windahiye dijmin jî çend qatê vê ye. Qet di xema hukumeta KT'ê de nîne, kurê kê miriye mir, a ji bo hukumet û artêşê girîng windanekirina serdestiya xwe ye.

Li ser hevala Dicle çend gotin jî be dixwazim binivîsim, lê niha wê hêzê li gel xwe nabînim. Hevala min Dicle, dema min xwe gihand wê hêza vegotina te ez ê vebêjim. Ez ê te ji nîfşê nû re vebêjim. Niha li min biborîne. Ev çend rojin hevala Rengîn civînan ji me re lidardixe. Yek bi yek bi me re nîqaş kir, van nîqaşan aliyek da lêhûrbûnên me. Hevalek kevin, ezmûnên wê yên şer û jiyanê hene, nîqaşên wê fêrkerin.

Piştî van lêhûrbûnan em diçin arazî û vê carê xweser, tenê em hevalên jin dê biçin. Hevalên xort jî cuda bi awayek kom dê biçin cihek cuda. Em ê cara yekem wisa bi hevalên jin ên di qada navîn de dimînin tevbigerin. Ji ber em ê weke hevalên jin biçin, em hemû jî pir bi coş in. Nêvenga hevalên jin pir cuda ye, mirov di vê nêvengê de xwe azad hîs dike. Piştî me xwarina îro ya êvarê xwar em ê bi rê bikevin. Em bi biryarin em ê di vê gera xwe de masiyan bixwin. Ez pir ji masiyan hez dikim, di rastiye de birca min jî masî ye, divê masiyan nexwim lê pir hez dikim. Ez nizanim ji ber bircê min masî ye, ji avê jî pir hez dikim. Li benda me be Çemço, em dîsa tên.

9 Tîrmehê 2007

Divê dostanî weke avê zelal û bi qasî asîman şîn be

Duh şev tevgerîna me ya xweser dest pê kir. Dema jin xwe bi xwe dimîne parvekirin û xweşikbûnên zêdetir bi îhtîşam derdikevin holê. Divê mirov hinek caran derfetên wisa yên bihevrebûnê ava bike. Nêvengên wisa hîn zelaltirin. Ev çiya bi firîşteyan hatiye dorpêçkirin, kenê mîna pakbûna zarokekî di dol û newlan de olan dide. Gihiştina jinê ya rihek wisa hevbeş di aliyekî de hem min kêfxweş dike hem jî di aliyê din de xemgîniyek xwe li dor bedena min dalîne. Ew şansê me yê em van rojan bibînin çêbû, ya hevalên me yên ku ev roj xeyal dikirin û negihiştinê? Niha em li ser xeyalan wan van kêliyan dijîn, ji ber vê bi xwezayî hem kêfxweşiyê hem jî xemgîniyê bi hev re hîs dikim û dijîm.

Ev cihê em hatinê bi yek gotinê cihek pir xweş e. Ji vê derê re dibêjin, Sêgoş e. Min dixwest yek bi yek li tehtên derdora wê yên dişibin qelayekê binêrim. Her xeyala min e, dema em gihiştin serkeftinê dixwazim li her devera Kurdistanê bigerim dîmenê wê bigirim û nivîs binivîsim. Di biharê de ev der zêdetir xweşik dibin. Ji van derên bilind sûlav diherikin, lê ji ber demsala havînê ye niha ziwa bûne, li benda biharê ne. Belê, ger heval vî robarî bibînin ma qet dikarin xwe bigirin? Piştî me taştêya xwe xwar şûnde hema dest bi masî girtinê dikin, du bombe hatin teqandin. Ji masiyan zêdetir em bi avê dilîzin. Piştî em demek dirêj di nav avê de man, em dicemidin û direcifin. Lêv û rûyê me şînrêş bûye lê tevî wê naxwazin ji avê derkevin. Ev sêgoşe hema ji jinê re hatiye avakirin. Gelek deverên Kurdistanê yên xweş hene lê ez bawerim ji nav Zap û Kuro Jaro de cihê herî xweş ev dere. Piştî melevaniyê hinek ji me diçin xwe dirêj dikin hinek jî tama xwezayê digirin. Nobedarên me yên roj hene. Em rûdinin ser sifrê. Hevala Dilovan ji bo destê wê qirêj nebe bi naylonê masiyan digire. Di vê navberê de hevala Pelşîn û Binevş jî goşt naxwin. Hevalan ji wan re got; ger hûn goşt naxwin çima masiyan digirin? Wan jî got; me ji bo hevalên xwe girtin.

Belê, hevaltiya PKK'ê di her kêliya jiyanê de xwe dide hîskirin û jiyîn. Ma wê di nav vî robarî de kîjan hêz qêrînên me bitebisîne! Em mîna zarokan bi avê dilîzin. Em avê dibijiqînin hevdu. Ava di destê me de belav dibe û mîna dilopên baranê bi ser me de dibare. Her hevaleyê hevdu şiyar dike ji bo neçin cihên kûr. Ez bawerim min jî kêmek fêlbazî kir, ji ber wê hevala Binevş bi zimanek henekî min şiyar dike. Bi ser re demek dirêj naçe hevsengiya xwe wînda dikim, av diçe devê min û bi avê re şer dikim. Hema hevala Şervîn û Zeyneb tîn destê min digirin û min dikişînin kêleka robar. Di wê kêliyê de gotinên hevala Binevş di mejiyê min de deng vedida. Ji ber şiyar nêz nebûm ev bi serê min de hat. Bi dîntîyên xwezayê re henek nayên kirin. Piştî wê şaşmayîne serê xwe dişom û dest bi nivîsandina van hevokan dikim.

Em ê heta sibe li vê derê bin, wisa diyar dibe wê ev meşa me pir xweş derbaz bibe, dê bi hezkirina jinê ev robar gur bibin. Dibe carek din ev kêliyên xweş nekevin destê min. Her hevaleyê wê biçe herêm û eyaletekê, ka wê dîsa kengê kî vê civatê bîne gel hev, pir zehmet e. Em weke hevalên jin ên derbazî qada navîn dibin nirx û wateya van rojan zanîn tama van rojan digirin.

10 Tîrmehê 2007

Dicleya min

Wê di hembêza welatê min de Dicle her tim bijîn.

Dicle nazdar nazdar bi coşa gihiştina ber bi çiya û deştên nû ve diherike. Dicle nasekine, mîna wext diherike, bêdeng dadiwerive nav axê û digihe tovên nû. Dicle her dem nûjen dike, rih dide xweza, berf, ax, lêvên terîkî û jiyanan. Dicle ma wê çiya bê te çi bikin? Hema wisa bê ku li pey xwe nenêrî neçe, bêguman em dizanin cihên divê tu xwe bigihîne hene lê em çi bikin em ji te têr nabin?

Dicle, tu di dilê keçên Kurd de destan û efsaneyekî, em bi çîrokên te mezin bûn. Dil dixwaze weke te nazdar, herikbar û zelal be. Te bihîst Dicle? Keçên egîd ên hatine ku dawî li qêrînên te yên nezalal bînin hene. Her yek ji ya din lehengtir e. Ev keç keçên bi xweşikbûna xwe dibin

ronî û yê xwe di agirê azadiyê de dişon. Dîcle van keçên leheng nas bike, dibe êdî ew şansê te yê dîtîne nebe. Ji ber ew bi mirinê re di-reqisin. Ew çirûskên agir ên ji tarîtiyê derketine. Navê wan Dîcle, Binevş, Xelat, Hêvî û Rûken in. Mîna navê xwe bi coş in.

Dîcleya min, gelo ez ê bikarim te vebêjim? Ma hema wisa bi carekê çûyîn dibe? Tiştên divê me kiriban hebûn. Ka me yê bi hev re li ser lût-keyên çiyayên Dêrsim qêr kiriba û gotiba azadî. Tu yê biba fermadar, te yê ji min re behsa Dêrsimê kiriba. Ma te ji bîr kir? Ka me yê di rojên azad de li Dêrsimê hev bidîta.

Bi hêrs im, guleyên bê navnîşan tu ji me girtî. Dibe stranek azadiyê ya te herî dawî dixwest ji bo dost û çiyar qêr kiriba heba. Dîcleya min ji kenê te hesidîn. Li te digirim Dîcleya min. Bibêjin; Dîcleya min bi hevalên xwe re li ser çiyayên Dêrsimê dîlanê digêrîne. Dilê min şkestiye, Dîcleya min, pênaseya êşa dostaniyê nîne, bê te rêwîti kirin pir zehmet e.

Ez ê xeyalên te hildim ser milên xwe, dê xeyalên te di nîvî de nemînin. Bê ku zarok bitirsîn dê di kolalan de azad bilîzin. Gelê Kurd ê çavê wan bi ken dê bi lehengiya te azad bibe Dîcleya min.

Dixwazim hinekê hevala Dîcle vebêjim. Hevala Dîcle li Riha-Wiransahrê ji dayîk dibûye. Di temenek biçûk de bi malbata xwe re diçe Ewrûpa. Ji aliyê mamê xwe ve tê mezinkirin. Li Ewrûpa têkoşînê nas dike, bi keça apê xwe hevala wê ya herî nêz hevala Nûjiyan re derbazî welat dibe. Hevala Nûjiyan di bin aşûta hatî jiyîn de şehîd dikeve. Hevala Dîcle jî bi hevala Binevş re şehîd dikeve.

Hevala Dîcle bi jiyana xwe ya hevaltiyê fermanbarek xwezayî bû, bi tevlibûn û berprisariya xwe ya xwezayî mînak bû. Hevala Dîcle bi jiyana û sekna xwe fêrker bû. Her nêvenga diçûyê hezkirina hemû hevalan dikişand ser xwe. Bi hezkirin bi dost û hevaltiyê ve gêrdayî bû. Ji dilê Ewrûpa yê sar bandor nebibû. Hevala Dîcle bi bêrî û hesreta welat mezin bibû. Piştî têkoşînê nas dike şûnde, tevî dixwaze zû derbazî navgerîla bibe jî ji ber derfet dest nade, hevala Dîcle demek dirêj di nav xebatên gel de dimîne. Piştî wê bi ferzkirina xwe derbazî welat dibe. Di

çavên hevala Dîcle de nêrînên, çawa kulîlk bê kok mezin nabin, ez jî bê welat û çiya nikarim bijîm, cihê min çiya û gerîla ye, hebû.

Hevala Dîcle tercih kir bibe xezala çiya û bêrîkarina di dilê xwe de kom kirî gihand Dêrsimê. Dîcle şervana azadiyê û jinek bi jiyana xwe re azad bû. Bi ked û hewldan azadî straye. Ez li hemberî têkoşîn û bîranîna wê bi rêzdarî bejna xwe ditewînim. Hevala Dîcle hevalek min a milîtan a ji xwe re mînak digirim e. Ez ê bi ronahiya şehîdan bimeşim.

Dîcleya min

Dîcleya min sûrgûna welat bû

Li sûrgûnê evîn jiya

Bi dilê xwe yê ciwan ve tevî jiyanê bû

Hêzeke her tim ew dikişand demên berê hebû

Dîcle

Dibû hestek û efsûnek nedihat pênasekirin

Di bin ronahiya hemû bajar pêçayî de

Dibû dosta şevê

Mîna sûlavan bi coş bû

Ev coş têrê nedikir

Her tim aliyek wê bi tenê bû

Bi vê tenêbûna xwe ve mezin bibû

Bê ku ew bi xwe jî di ferqê de be

Dîcleya min

Li zaroktiya xwe digeriya

Li welatê rojê yê li dû xwe hiştibû digeriya

Nedikariya li sûrgûnê azad be
Nedikariya di qefesan de ken belav bike
Di tenêbûna şevê de
dilê xwe li ser çiya
Û welatê rojê mohr kiribû
Ma wê kîjan bager ev bêrîkirin vemiranda?
Dicleya min
Evîn di bêriyên xwe de veşartibû
Ji qulingan fêrî firdanê bibû
Bi eslê teyrê baz firdabû çiya
Dilê wê bi coş bû
Berî roj biçe ava
Diviya agirê gerîla hembêz kiriba
Sûrgûn şewitandibûn
Êdî ew gerîlaya çiya bû
Kulîlka çiyayê welatê rojê
Dilsoza stêrkan bû
Dicleya min evîna çiya bû
Fîşekan ji nişkê ve dilê wê dizî
Bi rûkenî mirin hemêz kir
Dicle bêdawî bû
Wê zanîbû di bêdawîbûnê de azad be
Fîşekan nedikariya kenê wê bikuje

Dîcleya min
Rêwiya Munzur û bageran bû
Dîcleya min
Li sûrgûnê şingirtî
Li welatê rojê stranek evînê tê jiyîne
Li çiya ala hêviya diheje ye
Dîcleya min
dostaniya te dilê min germ dike

11 Tîrmehê 2007

Her rêwîtiyek ji macera û pêşketinên nû re ducanî ye

Meşa me ya çend rojan bi dawî bû. Ez ê qet van rojan ji bîr nekim. Min di vê rêwîtiyê de bîranînên gelek xweş jiyan kir. Ez pir bextewer im ku bi hevalên xwe yên jin re me. Her cîhanek jinê mîna okyanûsekê ye. Dema te wêrekî girt di nav vê okyanûsê de dest bi melevaniyê kir, tu rastî ew qas tiştên xweşik tê ku mirov nikare pênase bike. Cîhana jinê, jiyana gerîla bi qasî cîhana zarokan pîr û pak e. Jin ji ber vê pak û xwerûbûnê ye ev qas bi hezkirine. Jin jiyane hez dike û azad dike. Nikarim jiyan û jinek bê hezkirin bihizirim. Gerîla kedkar û şervanê herî mezin ê hezkirinê ye. Ev rêwîtiya me bû okyanûsa hezkirinê ya herî mezin. Her hevalek têra dilê xwe kêfxweş bû. Ez jî pir kêfxweş bûm lê min pir dixwast hinek dostên min li gel min ban. Yek jî hevala Mizgîn li vir ba wê çiqas xweş ba.

13 Tîrmehê 2007

Merheba jina ji agir, hezar caran merheba

Tu niha pir dûr î. Ew şansê min ê bikarim ji we ne agahî ne jî silavekê bigirim heye. Ez rewşa te pir mereq dikim. Arjîna min, ez hîs dikim tu di nav wan diwariyan de zehmetiyan dijî. Ez dizanim, şehadeta hevalên

te, tu pir bandor kirî, hêrsa xwe gur kiriye. Ez dizanim tu ji bo di cepeyên herî pêş de şer bikî çiqas hewldan didî.

Hevala min Arjîn, xwe dixim şûna te û hewl didim tiştên tu dijî hîs bikim. Dibe tu pir dûr bî lê tu di dilê min de yî, parçeyek ji min î, negengaz e te hîs nekim! Gelo hevala Diljîn niha çi dike? Gelo ez ê rojekê wê bibînim? Arjîna min, ez li hemberî we xwe kêr hîs dikim, we berî min xwe avêt meydana şer, hûn zehmetiyan didin ber çav. Ez jî di nêvengê rihet de dijîm. Min gelek mirov nas kir û niha gelek ji wan şehîd bûn. Lê ez hîn dijîm, ev min diqehirîne. Ger bi we re di nav heman derfetan de bijîm, ez ê baştir fêr bikim PKK'ê çawa heta van rojan hatiye. Min ew qas bêriya te kiriye ku nikarim vebêjim, di vê rêwîtiyê de xeyal dikim te bibînim. Hevala min Arjîn, bi bêrîkirina dilê xwe te maç dikim.

14 Tîrmehê 2007

Divê hêzên demokratîk serbikevin

Roj li dû rojan baz dide. Yê li nav me revîne di derheqê xeta me ya derbazbûnê de agahî dane dijmin, ji ber vê yekê derbazbûn zehmet dibe. Yek jî plansaziya dijmin a îsal pir cuda ye, dixwaze derbazbûna Bakûr asteng bike, hemû hevalên li Bakûr dimînin îhma bike û piştê êrîşê Başûr bike. Me her tim hewl da çaresariya bi demokrasî û biratiyê ve girêdayî pêş bixin û em hîn têkoşîna vê didin, lê KT'ê di bêçareseriyê de îsrar dike, dijminatîya civakî pêl bi pêl mezin dibe. Ma êdî kî dikare pêşîya wê bigire, mirov qet naxwaze ji vir şûn de bihizire. Di nav civakê de di navbera gelan de aramî nîne, tirs heye, mirov di malên xwe de nikarin rihet razin. Zarok jî ji van tiştan hemûyê bêxeber mîna xwîşk û bira bi hev re dilîzin. Zarok fêrkerin lê mezinan her tim ev ji nedîtî ve dîtine û di şaşîyan de îsrar kirine.

Belê, ev bendewarî me hemûyan tengav dike. Em hêviya xwe qut nakin, bi baweriya dê rêxistina me riyekê bibîne sebir dikin. Jixwe rastiyekek PKK'ê bi vî rengî ye. Di kêliyên herî tengav de çareseriyên wisa peyda dike, hem me hem jî dewletê matmayî dihêle. Ji ber vê yekê ti carî hêviya xwe qut nakin û bi baweriya di kêliyên herî tengav de, rêxistin pêvajoyên herî zehmet ên dijî derbaz bike, her tim bi moral tevli dibim.

Rêxistinê hemû pêvajoyên zehmet derbaz kîrin û dê van pêvajoyên zehmet jî derbaz bike.

Em weke rêwiyên Bakûr dema li rawestgeha Zapê disekinîn gelê me jî bê nevbêr têkoşîna demokrasîyê dide, bi coşek wisa têkoşîn didin me jî bi coş dike. Qêrînên wan ên azadî û Birêz Ocelan dîsa li dilê dijmîn dikeve. Di vê pêvajoyê de çalakîyên weke siyasî pêk hatin pir bi bandor bûn. Dubare her kesê fêr kir ku azadiya gelê Kurd, Rêber Apo ye. Ji derveyî vê cuda ti azadî û daxwazên wan nîne. Bi rastiya gel li derdora Rêbertî dibe xelek, me pir bandor dike. Em ê di hîlbijartinê de li gelek deveran bi ser bikevin û li hinek deveran jin jî namzetin. Ji niha ve van hevalên jin bi ser xistiye. Ji aliyê gel ve bi coş û hezkirin tîr pêşwazîkirin.

Hezkirina gelê Kurd qezenckirin erdembûna herî bilind e. Ji ber gelê Kurd ji her kesê hez nake, dê ji kê hez bike baş dizane. Ji bo hîlbijartinan çend roj mane, dema rojev dibe hîlbijartin ez dibim hedefa hinek henekan. Henekên xwe li min dîkin û dibêjin; gelo dê îsal zaveyê we serbikeve? Ez jî dibêjim; ew ne zaveyê me ye, ji ber xanima Emîne ne Kurd, Erebe, lê ew gotinên min cihê xwe nagirin ji ber di encamê de ji Sêrtê ye.

Mirovên me yê li Sêrtê dijîn bi dîn ve pir girêdayî ne, ji bo wan bawerî berî her tiştê wan tê. Di mijara rastiya dîn û baweriyê de lewazî hene. Bi awayekî kor bi dîn ve girêdayî ne. AKP'ê jî ev bawerî kiryê amûra siyasîyê, bi vê riyê dîngan digire. Di rastiya xwe de dîn ji cewherê wê hatiye valakirin û mirovan dixapînin. Lê hîn ne di zanabûna vê de ne, li pişt çarşew û perdeyan mejiyê xwe veşartî digirin û di tarîtiyê de dijîn. Her wiha vî dînî hest, raman û hiş felc kiryê.

Dibînim, dîn bandoriya xwe li ser min jî kiryê. Tevî li Stambolê mezin bûme jî bandora wê li ser malbata min bi hêz bû. Dema zarok bûm min nakokî jiyan kir û hewlest girt. Di vê demê de ji bo min rojî negirtin û nîmêj nekirin çalakîyek herî mezin bû. Niha divê navberê bidimê.

20 Tîrmehê 2007

Ji ber mêvanên duh hatin neçar bûm navberê bidimê, lê bi çend gotinan be jî dixwazim temam bikim. Dema min nêrînên xwe bi dayîka xwe re parve dikir min xwe zêdetir bi hêz hîs dikir, pêdiviya xwe bi lêkolîn û lêhûrbûnê dibînim. Di nav malbatê de li ser diyardeya dîn nîqaşkirin weke heqaret li Xwedê tê kirin dihat destgirtin. Dayîka min ji min pir hez dikir lê ji van nêrînên min hez nedikir. Lê dayîka min dihizirî qey ez dîn bûme. Mejiyê xwîşka min jî tevlihev dibû, wê ji kê bawer bike nedizani. Di meha remezanê de her kesê rojî digirt, min nedigirt lê di mijara rêzgirtinê ti kêmasî dernediket. Çawa dayîka min diçû cihekî hema min xwîşka xwe ya biçûk Elîf rêdikir dikanê. Min tiştên mîna nan, hêk û hwd. dida kirîn. Heta me xwarin amade dikir dayîka min dihat, bêguman li gel wê xwarin xwarin nedibû. Me sifre radikir lê ji bo em xwarina xwe bixwin îsrar dikir. Bavê me bi awayek kor bi dîn ve girêdayî nebû. Di girtîgehê de mabû û li ser van mijaran perwerde dîtibû. Ji ber welatparêz e ji gelek aliyên xwe ve cuda bû, pir zêde xwe tevli jiyana me nedikir û her tim ji me re digot; divê hûn di riya rast de bin. Me jî tercîha xwe li gel riya rast, şoreşgeriyê kiribû, ji ber vê bavê min her tim bi me serbilind bû. Bavê min di mijara divê hûn karê xwe baş û serkeftî bikin de her tim em şiyar dikirin.

Dema em werin ser bandoriya dîn a li ser min jî; her çendî di temenê xwe yê biçûk de min li hemberî vê têkoşîn kiribe jî lê dîsa bandoriyên wê pir kûr in. Girtina min a di hinek mijara de û bi lez nêzî bûyer û diyardeyan bûyîn çavkaniya xwe ji wê derê digire. Nêzîkatiyek min a mîna çarçar û teqez nêzî tiştan dibim heye. Lê rastiya mirov û ya jiyanê pir cuda ye. Divê em kuantomîk nêzî jiyan, cîhan û gerdûnê bibin. Paşverûtiya dîn civaka me ber bi tarîtiyê ve dibe.

Di aliyê girsaya Botanê de mijara divê herî zêde bê guhertin nêzîkatiya wan a li hemberî dîn e. Wê sibe her tişt zelal bibe. Em binêrin ka wê Sêrt û Riha xwe ji AKP'ê xilas bike? Ya rast di vê hilbijartinê de dikarin bersivê pir baş bidin AKP'ê. **Yûhkirina** li CHP'ê gelek watedar bû. CHP'ê xwest Elewîtiyê bikarbîne û dangan bigire. Girseya Dêrsimê Denîz Baykal jovan kir. Ev helwest gelek watedar bû.

Belê, niha her kes li benda sibe ye ka wê kengê bibe sibe. Divê di vê hîlbijartinê de teqez aliyên demokrat serbikevin an dê şkestin çêbibe. Bi qasî di çapemeniyê de tê xuyakirin ger komplo û fêlbaziyên cuda nebin em ê bi ser bikevin.

Dîsa bi hincetên cuda nehiştin hevdiştin bi Rêbertî re pêk were. Dixwazîna pêvajoyê ji perspektîfên Rêbertî qut bi rê ve bibin. Rewşa tenduristiya Rêbertiyê mereq dikim, heyeta çû Îmralityê ti daxuyanî nedan. Ev wextê em wîndî dikin Rêbertî ji me qut dike û ji bo tenduristiya wî jî xeteriyek herî mezin e. Di vê hîlbijartinê de tenduristiya Rêbertî ji rojevê derxistin. Lê ji bo me ti carî girîngiya xwe wîndî nake, tenduristiya Rêbertî her tim di rojê me de ye. Hemû têkoşîna em didin meşandin ji bo derxistina Rêbertî ya di navbera wan çar dîwaran de ye. Lê ji ber tempo û tevgerîna me ya têkoşînê lewaz e nikarin dijmîn bînin ser rê. Bi salane Rêbertî di Îmralityê de ye û Rêbertî jehirî dikin. Ez êdî nikarim rakim. Em pir axivin. Ji xwe re dibêjin; êdî bes e. Ji ber vê çendî demek berî demekê zûtir dixwazim biçim Bakûr. Em ê li wir bi awayek dijwar li hemberî dijmîn têkoşîn bikin û şer bikin. Bi vî rengî ez ê hevaltî û milîtanîya xwe ya nebes derbaz bikim.

Rêberê min, dizanim hûn li her kesê dihezirin û ji bo bibî alîkar di navbera wan çar dîwaran de kedek pir mezin didî. Sing bi sing li hemberî dijmîn şer dikî. Rêberê min, ez ê di pratîkê de bûna bersiv esas bigirim. Ango wê gotinê min bibe çalakiya min. Pênaseya dirustbûnê ya herî berz jiyanîkirina gotin û hestan e.

Rêberê min, ez silav û hezkirinê xwe ji we re rêdîkim.

21 Tîrmehê 2007

Dil hinek caran mîna volakanê hinek caran jî mîna avek rawestî ye

Gelek caran tiştên ez di cîhana xwe ya hundirîn de dijîm nikarim pêna-se bikim, bi taybet ji roja ketime nav koma Bakûr heta niha zêdetir di hundirê xwe de girtî mayîn heye. Ez vê ferq dikim û dixwazim derbaz bikim. Dixwazim mîna dema li Zagrosê bûm bi coş, moral bîm û vê bîdim diyarkirin. Cihê xwe di nav koma Bakûr de girtin bi serê xwe mora-

lek e lê ev têrê nake. Lê rû bi rû hatina hinek ferasetên di nav komê de ne li bendê bûm û hinek nêzîkatiyên di nêvengê de derketin ez pir dam êşandin.

Belê, tevî her tiştî divê mirov moral bide xwe û bizane ji xweşîkbûnên jiyanê tam bigire. Çavkaniya min a moralê Rêbertî, şehîd û mirovên hêja yên ji wan hez dikime. Hezkerin çavkaniya min a jiyanê ye. Min bihîst wê hinek heval werin. Ji kêfan dilê min bi coşekê hat dorpêçkirin. Ez xwe li gel wan azad hîs dikim û rihê min ê zarokatiyê xwe dide der. Ez ê ji wan hevalên xwe yên hêja bixwazim bila di rojnivîsa min de nivîs ji min re binivîsin. Dema min li Xerzanê bêriya wan kir ez ê nivîsên wan bixwînim. Ji wan deran silav rêkirin pir zehmet e lê ez ê hezkirina xwe li ber bayê berdim. Dê ba were xwe li bedena wan balîne, dibe ew jî di wê kêliyê de wî bayê têhngerm ê tê ferq nekin, lê pir negirîng e. Piştî min hezkirina di dilê xwe de li ber bayê berda şûnde ya din negirîng e. Hezkerin azadiyek bê bendewarî ye.

21 Tîrmehê 2007

Min bêriya dostên xwe kiriye

Di encama nîqaşên mehan ên hatin kirin de hîlbijartin çêbûn. Lê nîqaş û nirxandin hîn berdewam dikin. Hîlbijartin di rojeva gerîla de ye. AKP'ê weke partiya yekem bû desthilat. Di dilê gel de baweriya wî dizî û bi siyaseta kirî bû yekem. Mirovên me bi dîn ve girêdayî ne, lewma em li hinek deveran serneketin. Bi derketina parlementerên serbixwe demokrat, welatparêz û Kurdên bi rûmet di nav hewayê cejnê de pîroz kirin. Gel pir bi coş e, vîna xwe xistin meclîsê. Dijmin hema jimara parlementerên bi hinek hincetan kêmtir dike, hedefa wan li pêşiya bûna kom astengî avakirine. Di vî hîlbijartinê de gelek tiştên bi ken derketin. Em li kîjan bajarî bi ser ketine moralê hevalên ji wê herêmê pir baş e û yên din jî bê moral in. Me li Sêrt û Rihayê bi ser xist, ev baş bû. Bi taybet serxistina me ya li Dêrsimê pir baş bû. Li hemberî CHP'ê bû darbeyek.

Dê koma Amedê piştî me biçe, lê weke wê pêşiya me biçin her êvar xatirê xwe ji me dixwazin. Dema em sibê wan dibînin dikenin, henekên xwe li wan dikin û dibêjin; em bawer in benzîna seyarê xilas bûye.

Di van rojan de xewnên balkêş dibînim. Min wê roja din di xewna xwe de apê xwe Şakir ê piştî ez tevî dibim şûnde dimire dît. Ez di ber wî re derbaz dibûm û min silav nedidayê. Ji ber min silav nedidayê bi min re aciz dibû. Min ji wî re digot, min tu nas nekirî û wisa dizanî tu miriyî. Wî jî ji min re digot; ez nemirîme. Hestên min tevî hev dibûn. Di xewnek xwe de jî dema min nûçe guhdar dikir min xwe didît. Hevalek şehîd didanê lê wêneyê didanê yê min bû. Min nedizanî min ew wêne kengê girtibû. Hevalek jina ya li kêleka min hewl dida bîne bîra min. Lê dîsa nedihat bîra min. Ez di xewna xwe de dibînim şehîd dikevim lê tiştekî hîs nakim. Bê ku xewna min temam bibe bi carekê şiyar dibim. Çi seyr e, ez di vê pêvajoyê de qet li ser van xalan nehizirîme, min fêm nekir.

Min duh xwest li ser dostaniyê helbestekê binivîsim lê min temam nekir. Ez ê we nebînim û biçim, lê hûn her tim bi min re ne, ji ber we di dilê xwe de vedişêrim û bi xwe re dibim Xerzanê.

Belê, hevala min Melsa, ez ê te jî nebînim û bifirim. Ez pir dixwazim te bibînim û bi te re parve bikim lê bawerim şansek min ê bi wî rengî çênabe. Min xwest ji te re nîşe bişînim. Lê hat gotin; tu çûyî peywîrê. Tu jî çûyî Bakûr û hatî lê ez hîn li vê derê me. Hevala min Melsa, li pêvajoya em bi her ve başdar bûne dihizirim. Jiyana welat ji me re çiqas rakêşwer hatibû. Nîqaşên me yên li ser lehçe û devokên Kurdî tê bîra te? Min pirs kiribû û gotibû; li gel we çî ji bolanê re dibêjin? Te û Ezîz xwe avêt navberê û gotibû, balon. Min jî henekên xwe bi we kiribû û gotibû; balon Tirkî ye, Kurdî pimpimok e. Pirqênî bi we ketibû û we her carê dixwest bi min bidin gotin. Meşa te ya mîna xezalan bê ku zehmetî bijî, gerîn li gel min heyraniyek ava kiribû. Lê meşa min mîna bengunnan bû? We di tarîtiya şevê de ez ji meşa min nas dikir. Dema sipîh ketin laşê hevala Bêrîtan wê jî ferq nekiribû û hema li hember xwe dixwerand. Me wisa fêm kiribû qey ji fasûliyan elerjî çêbûye. Piştî wê bi mêzekirina hevalên bi ezmûn re me fêm kir sipîhan ew dorpêç kiriye. Tê bîra te me çiqas henekên xwe li wê kiribû?

Hevala min Melsa, ez wan rojan qet ji bîr nakim. Tu dizanî her çendî bîranîn kevin bibin jî lê ji bo me her tim zindî ne. Bê ku hevdu carek din nebînin me xatirê xwe ji hev xwestibû lê binêre bi rîya hîs û nivîsê be jî

tên gel hev. Vê carê bi hêviya di rojên azad de hev bibînin bi xatirê te. Piştî çend salan jî be ez ê dîsa we dostên xwe yên hêja bibînim, ji bo min netirse.

24 Tîrmehê 2007

Ji baranan ber bi okyanûsa hezkirinê ve herikîn

Tevî bi salane di nav xwezayê de dijîm, dîsa li hemberî xwezayê dikevim nav kelecane û mîna gelek tiştan cara yekem dibînim hestiyar dibim.

Wê roja din baran barî, nebêjin di vê mehê de baran nabare ji ber lehî rabû. Hinek heval ji ber baranê direvîn hinek heval jî weke dînan xwestin di bin baranê de şil bibin. Di rastiya xwe de ev hewla wan pêwîst nekir, jixwe baran bi carekê mîna lehiyê bariya, her dever şilûpil bû. Hevalên jin porên xwe vekirine, destên xwe jî mîna teyrê baz vekirine û bi baranê re direqisin. Jin û xweza dostên hev ên nayên qutkirinin. Dema dilopên baranê dikeve nav golên avê yên biçûk pir xweşik dibin. Ka em ji bedewiya piştî baranê re çi bêjin? Keskesor derketiye, xweza ew qas pîr û pak tê xuyakirin nikarim pênase bikim. Dilopên baranê yên li ser pelên daran kom bûne mîna rondikên çavan xuya dikin. Gelo ev barana ji me re xweş hatî, ji bo xwezayê xemgînî bû? Çiyayên daristana wê nîne, mîna qelayekê disekine. Ewr di dostaniya germê de bûne komik, bi cilên xwe yên spî ve ji me re dikenin. Li hemberî van dîmenan dixwazim bigirîm. Gerîla çiqas bi şanse, xwezayê bi hemû xwerûbûna xwe ve di dilê xwe de hîs dike û dijî.

28 Tîrmehê 2007

Hezkirin

Dema wext tê li ber dil disekine hezkirin vediguhere evînê. Dema wext tê li sêvê dikeve sêv bi tirêjên rojê re sor dibe û dest bi ghiştinê dike. Dema wext tê silav dide çûkan êdî çûk dest bi firînê dikin. Dema wext di dilê gerîla de dibe hest gerîla jî êdî dest bi rêwîtiya hêviyê dike û bi rê dikevin. Li ser piştê wî çente, rext, di destê wî de çek û yek jî di dilê xwe de hêviyê hildigire, serê wî berz e, bêrîkirinên xwe li pişt xwe dihêle û ji hevghîninên nû re hembêza xwe vedike. Bêguman êşa veqetînê jî radike.

Rûyê gerîla her tim ber bi hezkirin, rûmet û rojê ye lê em çî bikin diya-
lektîka xwezayê ye, herî zêde êşên xwe hembêz dike. Ji ber vê ye li ber
sîbera hezkirinê xemgînî heye.

Her hevalek gelek hevaltî jiyane, lê gelek ji wan şehîd ketine. Gerîla bi
vê êşê ve riya xwe berdewam kiriye, lê li kêleka vê jî zaniye girêdan,
hezkirin, hêvî û xeyalên di nîvî de mayîn pêk bînin. Wext mîna robarekî
diherike. Wext hat li ber dilê me sekinî û du komên me bi rê ketin. Ko-
ma hevala Roza û Hozan Amed çûn. Koma hevalê Hozan ji heval Dilo-
van Şîrnex, Şervîn Erzirom, Ronya Erzirom, Firat Sûrûç, Şoreş Amed,
Harûn Amed, Yûnis Piling û Rênas pêk dihat. Koma hevalê Hozan
rêwiyên Erziromê ne, wan xwe bi bask kirin û ber bi Erziromê ve firiyan.
Aliyê vê rêwîtiyê ya herî watedar jî amadebûna hevalê Abbas û her
wiha lidarxistina civînê bû. Me hêz û moralek mezin ji hevalê Abbas
girt. Ji roja koma destpêkê heta îro têkoşîn dide û bê ku bizane wes-
tandin çî ye ji bo bîrdozî, rastiya Rêbertî bide fêmkirin bi seetan li ser
piyan dimîne û civînan lidardixe. Ji ber sekin û nirxa hevalê Abbas a
dide mirov heta xwe lêpirsîn nekim nikarim derbaz bikim. Gelek moral
ji ked û hewldanên hevalê Abbas digirim. Hevalê Abbas hevrêyê
Rêbertî û milîtanêke rastiya Rêbertî di kesayeta xwe de şênber kiriye.
Xwezî ew derfet heba me hevala Sozdar û hevalê Cemal jî dîtiba.

Di merasîmê de destpêkê hevalê Abbas, piştî hevala Roza û Hozan
axivin. Hest ew qas dijwar bûn vegotina wê zehmet e. Yên diçin dema
kêfxweşiya çûn û êşa veqetîna dijîn, li ser rûyên hevalên nedîçûn Bakûr
jî xemgînî û tîrsa dê carek din hevalên xwe nebînin serwer bû. Hevala
min Şervîn jî pir giriya. Hevala Şervîn ji Amadê ye, di sala 1995'an de
beşdar bûye, dema beşdar dibe temenê wê pir biçûk e. Tevî wê li
qadên herî zehmet maye û niha bi îsrara xwe diçe Bakûr. Milîtanên
PKK'ê her tim zehmetiyan hildibijêrin, ji hêsanîyê hez nakin. Em ji wan
venaqetin, peyvên me yê hevdişîn û gihiştina hev tevî asîmanan dibe.
Koma hevala Roza ya ku wê beriya me bigihin Xerzanê dê ji bo me çay
çêkin, hema çawa em gihiştin wir em ê çay vexwin. Piştî rêwîtiyek wisa
bêguman çayek vexwarin pir xweş dibe. Her ku kom diçin wextê me jî
nêz dibe. Ger ti kêmasî dernekevin piştî çend rojên din em ê jî bi rê
bikevin.

Riya we vekirî be hevalên min ên hêja. Ji we pir hez dikim.

Gerîla

Gerîla hêviya okyanûsê
Evîna azadiyê ye
Mîna qulingan,
Mîna bayê li her derê
Gerîla dostê çiya,
Dostê mirovên bindeste
Ez ê biçim bê ku li pişt xwe binêrim
Dema di dilê min de êşa veqetînê lêda
Ez ê bi hêvî ber bi pêşerojê ve bimeşim
Ji dostan veqetîn zehmete
Berdêla azadiyê jî
Veqetîna ji dostaniyê jiyîne
Dilê min dûr diçe
Ez hezkirin,
Evînê
Li dûriyê dijîm
Bêrîkirin
Mîna guriya agir bedena min dorpêç dike
Dilê min
Li bîranîn û wêneyên nezindî dikeve

Bêrîkirinên xwe dikim stran,

Helbest

Ji çîyan re diqîrim

29 Tîrmehê 2007

Di germahiya Tebaxê de evîn jiyîn

Weke hêza Xerzanê em komek biçûk mane. Ji ber em ji bendewariyê tengav dibin her tim ji xwe re kar derdixin. Di destê hevalên xort de gêzik nakeve erdê. Hema derdor şil dikin û dimalin.

Nêveng paqij nebe divê ji şêwazê wê yê lêhûrbûnê bê lêpîrsînkirin. Dema lêhûrbûna mirov komî ser hev nebe, teqez xwe di şêwe û nêzîkatîyên wê de diyar dibe, atmosferek belav ava dibe. Bi ya min divê di cil û bergên mirov de jî rêkûpêkiyek hebe. Divê hatina wê/î xweşik nebe. Mînak, dema cilên leşkerî li gor pîvanan tên dirûn zêdetir xweşik rûdin li dema li gor pîvanê nehatin dirûn mirovan sistopisto dide nîşan. Di vê wateyê de gerîla hêjayê xweşikbûnê û xweşikbûn jî li gerîla tê. Her nêvenga şoreşger diçinê rêkûpêkiyê didin wê nêvengê. Gerîla xuliqkar e, hêzeke bi xwe bawer e.

Meha Tebaxê ji bo gelê Kurd cihek xwe yê girîng û watedar heye. Pêngava 15'ê Tebaxê ji nû ve zînbûna gelê Kurd e. Ez 2'ê Tebaxê ji malê derketim û 18 Tebaxê jî gihiştim gerîla. Her rojek wateyek xwe ya cuda heye. Ji min re 2'ê Tebaxê ji nû ve jidayîkbûn e. Ez her sal tevlibûna xwe li ber çav re derbaz dikim û hewl didim aliyên xwe yên kêrmanî mane biselimînim. Divê kêliyên dîrokî neyên jibîrkirin.

Divê jiyane ji kûr hîs bikî

Em hîna di nav bendewariyê de ne, jiyane xwezayî û kolektîf heye. Jiyana te çawa be şer û tarzê te yê hevaltiyê jî bi wî rengî ye. Bi mêzandina civak û jiyana ferdekî jî tu dikarî civak û ferdî nas bikî. Divê tu nebêjî jiyane û hema derbaz bikî, her tişt di nav ziraviyên jiyane de veşartî ye. Em pêşeng û hilberînerên jiyane nû ne. Ji bo jiyane nû di serî de baş dahûrandina demboriyê û divê bê redkirin, an dê şibandin

derkeve holê. Di derbarê tiştên kevin û nû de dahûrandinên Rêbertî yên pir şênber, zelal hene û herî zêde tevgera PKK'ê xwedî dahûrandinên ev qas kûr e. Lê weke qadro û avanî me ev dahûrandin zêde cewherî nekiriye yan me di kesayeta xwe de jiyânî nekiriye. Ji ber vê di navbera jiyana nû û kevin de asêbûnek tê jiyîn. Dema ev asêbûn zehmetî ava dike hembêzîkirin û bêrîkirina jiyana kevin çêdibe. Dema li gor xwe kêfxweşibûn çêdibe jiyana nû hembêzîkirin çêdibe û li hemberî ya kevin hêrs dibe. Rewş û rihek balkêş e. Çavkaniya vê ji xwe di bîrdoziyê de nekûrnekirê tê. Em komek şoreşgerên dilê xwe dane vê bîrdoziyê ne lê me xwe ji hişmendî û fêrbûnên kevin ên di kesayetiya me de hatine rûnişkandin paqij nekiriye. Gelo li cihek seknek bi vî şêwazî, jiyaneke ji rêzê û nêzîkatiyên rojane hebin mirov dikare bêje li wir şoreşgertî heye? Bi ya min ev tiştê nerast e. Min her tim xwestiya bibim jinek gerîla ya bi hêz. Hinek xalên dihezînim min tê de guhertinek çêkiriye caran caran derdikevin pêşiya min û şoreşgertiya min bandor dike.

Duh şev em dîsa bi avêtina hewan û obûsan şiyar bûn. Berî hewan û obûs bîn avêtin bi sê-çar çirkeyan yekî ez şiyar kirim. Ez şiyar bûm, min li derdor nêrî, kes tineye û derdor bêdeng e. Fenera hevala Rûksen pêketibû. Min li demjimêrê nêrî, demjimêr dihat 11'ê, di kêliya min dubare xwest çavên xwe danim ser hev bi carekê dengê teqînekê hat û nesekînî. Hema bi lez em çûn cihek xwe yê întîşarê. Dengê pir nexweş derdikeve, erd û asîman diheje. Ji ber avêtina obûsan arazî dest bi şewatê kir. Ba tê, agir gurtir kiriye, weke guriyên wê bigihin ber asîmanan. Em nikarin biçin vemirînin jî ji ber avêtina obûsan berdewam dike. Dilê min bi qirçqirç dişewite.

Ev dîmen şewitandina gundan û mişextkirina mirovan tîne bîra min. Wî gelî di dilê xwe de kîjan êş jiyane û rû bi rûyê kîjan bêçaretîyê hatine? An zarokên ji her tiştî bê xeber? Di mişextbûnê de biyanîbûn çawa bi êş jiyane? Yek li lawiran dihezînim. Gelo lewirên di nav vê daristanê de dijîn xwe rizgar kirine? Teqez niha kîso, jûjo û morî di nav daristanê de şewitîne. Teqaz niha lawir jî bi hezaran nifir li mirovan dîkin. Ev hizir min dibe û diçe, demjimêr derbaz dibin. Avêtina obûsan berdewam dike, êdî xewa me jî tê, xwezî hema niha obûs sekînîba da ku em jî razaban.

Baş e, cihê me saxlem e, şkeft û binkevîrên me yê xwe li bin biparêzin hene. Gelo dijmîn dizane çiya çawa me bi şefqeta dayîkê hembêz dike û diparêze? Ew fêma nakin, tenê ji tûndiya teknîkê fêma dikin, li ser ka dê tûndî çiqas ziyan bide dihizirin. Ey dijmînê bêkêr, hûn bavêjin, bila çiya jî me biparêzin, da ku aborî û moralê we têk biçe.

5 Tebaxê 2007

Merheba

Li her derê xwîn û rondik. Cihê rondik lê nebe nîne, her wiha ger ev der Rojhilata Navîn be şer hîn diwartir e. Piştî êrîşên hewanan şûnde koma Amedê hat gel me. Êdî em li jêrî wan nin. Kêma maye heval şehîd ketiban. Kevirê hevalê Elî xwe li pişt veşartibû hewana lê ketibû, ger ew teht li wir neba yan jî stûr neba dê hevalê Elî şehîd ketiba. Bi zêdebûna jimarê re ev der dîsa bi coş bûn. Dema ev der bêdeng bûn sivoriyan bi awayek rihet li ser vî çiqîl xwe tavêtên ser çiqîlê din, deng derdixistin, guz jêdikin û davêtin lê niha bi dizîka dest bi tevgerkirinê kirine. Ev çend sale ez di nav gerîla de me lê cara yekem sivoriyê reş dibînim. Ev sivoriyê reş bi qasî sivoriyên zer ji min re şîrîn nayên. Ez bawerim ji ber van sivoriyên reş dişibînim mişkan.

Em van rojan Roj TV'î guhdar nakin. Ji ber avêtina obûsan parçeyek ji sêla me qut bûye. Ji ber sataleyt xirabûye dîmen reş-spî ye, piştî wê bi reng bû. Qenal zêde bûne û teknîkî pir pêş ketiye.

Dîsa operasyon hene. Ji ber operasyonan ji herêma Dêrsimê agahiyên zelal nayên girtin lê dibêjin 6 heval şehîd ketine. Malbata hevalê Medenî, cenazê hevalê Medenî girtine. Nayê zanîn ka ew hevalên din kî ne. Pêşveçûnên li Kurdistanê tên jiyîn encex dikarin di radyoyê de fêma bikin.

Di pevçûnê de subay û serbaz mirine. Tiştê herî balkêş jî her leşkerek berî bimre li malbata xwe digerin, ji wan re dibêje em dimirin û gotinên xwe yê xatirxwestinê dibêjin. Ev mirov a hîs dikin dê bimrin an ji ber rastiya şer tirsê her kêlî wê bimrin dijîn. Pir eşkereye derûniya mirinê di kûr de dijîn. Malbata gelekê didin televîzyonê lê malbatên li hemberî

vî şer û dewletê îşyan dikin nadin. Malbatên şer û netewperêziya Tirk teşwîq dikin bi rojan dibin rojeva çapemeniya wan a sereke. Çiqas heyf e! Ji ber cahilî, paşvrûtî, netewperêziya hovber malbat êş dikişînin û zarokên xwe jî dikin goriyê çerxa dewletê. Mirov xemgîn dibe, ji bo dewlet temenê xwe dirêj bike gelekî dixe şûna cahilan û her roj mirovan ber bi mirinê ve dibe.

A rast mijara dixwazim parve bikim ev e. Mirin çi ye? Her kes li gor felsefe û şibandina xwe wateyekê lê bar dike. Li gor rêgezên xwezayê jî wateyek mirinê heye û ez vê zêdetir nêzî xwe hîs dikim. Weke rêxistin, wateyek em li mirinê bar dikin heye lê ya girîng şoreşger û ez çawa nêz dibim. Leşker ji mirinê ditirsin, em jî ji mirinê natirsin. Ez dihizirim ez nêzî raza mirinê bûme, min ew raz derxist holê. Bêguman mirinek ji rêzê naxwazim lê dema cihê wê hat divê bizanim bimrim jî. Ya rast ji bo şoreşgeran diyardeya jê re dibêjin mirin nîne, ji ber em tenê cih û nêveng diguherînin. Raman, hest, xeyal her tim dijîn û ji nifşekî derbazî nifşek din dibe. Em mîna giyayekî şîn nabin û hişk nabin. Şoreşgerê dema piştî mirinê di dilê xwe de hîs dike qet namire. Vaye min ev serdem û pêvajoyê jiyana kir. Bi ken bi ser wî cenawirê jê re dibêjin mirin û tarîfî meşiyam. Min diyardeya jê re dibêjin mirin li bin xist.

Dizanim mirin navek jiyane yê cuda ye. Jiyana jî navek mirinê yê cuda ye. Bêguman divê bi mirinê jiyana nû bi hêz bikim, ji nifşê nû re pêşerojekê bihêlim. Ji ber serdemên min jiyane nêzîkatiyek min a bê tirs heye. Ev nêzîkatiya min, min ber bi mirinek hêsan ve nabe? Divê li ser vê xalê bihizirim ji ber ti gumanan najîm, ev jî ne tiştêk asayî ye. Li gor xwezaya mirov divê li hemberî mirinê bertekek wî ya hundîrin derkeve. Di aliyê din de divê hinek tirs hebe. Tirs di wî de tedbîrê pêş dixe, ajoyên parastinê yên lawiran jî hene û li hemberî mirinê her tim di pozisyona parastinê de ne. Divê weke Zîlan, Bêrîtan û Semayan xeyalên xwe pêk bînim. Wan hevalên hêja, bi jiyana û mirina xwe ve di derbarê azadiyê de ji bo me gelek tişt hiştin. Divê ez jî vê jiyane dewrî nifşê nû bikim, mîna çûkekê ber bi bêdawîbûnê ve bifirim.

Em rêwiya hêviyê ne

Li benda min be

dilê min ê dilê evînê
Dê hêviyên min di nîvî de nemînin
Dê xeyal di bayê Bakûr de jîndar bibin
Min
Di mirinê de ronahî,
Azadî
Û evîn tam kir
Ya tê gotin tariye
Perdeyek nepenî ye
Bêhêvî tarîbûn û mirine
Em rêwiyên hêviyê yên nîfşê pêşerojê ne
Lewma bêdawiye vedixwin
Livandineke nikarim vebêjim
Û zarokên welatê min
Di dilê min de azad dijîn
Bi azad diqîrin azadiyê
Êdî di çav û dilê wan de
Tirsa windakirinê nîne
Êdî mirin ji kur tê bila were
Bi xêr were
Ez ji yên mirinê jiyane ava dikime
Li benda min be hêviya min
Evîna min

Merheba hevala min Mizgîn a bi bêrîkirina wê dil dişewite

Ez pir bêriya te dikim û dixwazim te bibînim. Em ê di nav van rojan de biçin. Nedîtina te dê di dilê min de bimîne, wê daxwazên te yên serkeftinê xêr ji bo min anîba. Herî kêr min carekê dîtiba, bêrîkirina xwe derbaz kiriba, te ew tiliyên xwe yên narîn di nav pora min de bir û anibî, me dîsa şerên şîrîn kiriba û te dîsa bi nîqaşên birdozî ez ronî kiribam. Dizanim tu jî pir xemgîn dibî. Dilê xwe teng neke. Ger me hev dîtiba wê baş ba lê vê ji bo xwe neke xem. Ez qet naxwazim tu xemgîn bibî. Ez te jî bi xwe re dibim. Her çendî li dûr jî bim ez ê bi bîranîn û hezkirina we re hestreta xwe derbaz bikim. Divê mirov fêrî li dûr jiyîn û bêrîkirinê bibe, ma ne wisa ye hevala min?

Pêdîviya min gelek bi vê rêwîtiyê hebû. Dibe hûn bêjin; her tişt ne Bakûr e. Dibe hûn bêjin; tu pir xeyalî nêz dibî, lê ez vê bêjim; dixwazim li Bakûr hinek tiştan bikim, êdî dixwazim bibim kedkara hinek nirxan ava dike. Dizanim nehêsane lê dixwazim zehmetiyan bijîm. Ez di wê baweriyê de me wate didim hest û ramanên xwe. Min tenê xwest tiştên dijîm û ramanên xwe parve bikim.

Min hevalê Metîn jî nedît, min pir dixwest wî bibînim. Dibe hinek caran her tiştê mirov dixwaze pêk neyê. Tiştek nabe bila hevdîtînen me di pêşerojê de veşartî bimînin. Ya girîng fêmkirina em çi dihizirin û hîs dikin e. Dûrî hezkirina me winda nake, berovajî wê kûrtir dike û mîna pêla agir dorpêç dike, ma ne wisa ye hevalên min? Di diyalektîka jiyanê de jî veqetîn heye, em jî parçeyek ji vê rêgeza diyalektîkê ne. Her veqetînek ji hevdîtînek nû re ducanî ye, di heman demê di dawiya her hevdîtînekê de jî veqetînek heye. Veqetîn hezkirin û bihevrebûnên herî berz ava dike, em tenê di nav veqetînan de nefetisin û bizanin melevaniyê bikin.

Ez berî vê li Zapê nemabûm. Di pêvajoya ez li vir mam, min reng û jiyana Zapê hemû li ser rûpelan neqîş kir. Bi vî rengî ez ê vê pêvajoya komê bi coş dawî bikim. Rojnivîsa min a ji evîna dilê min nîvco mayî ber bi rêwiya hêviyê ve şahîdî kirî, kombûna tiştên min jiyane heta vir ez

anîm. Ez ê li Bakûr dest bi xeyalên nû, bi tiştên min jiyane dest bi jiyân, rojnivîs û dostên nû bikim. Evîna nivco mayî min digihîne Bakûr, roj-nivîsa min a nû jî dê min bigihîne Rêbertî. Bi van hêviyan bi rê dikevim.

10 Tebaxê 2007

Lawê Colemêrgê yê egîd, hevalê min ê hêja Şiyar

Colemêrg, Sûmbûl, Çarçêla û Cîlo ketine nav bêdengiyê. Ez jî xemgînîm bi vê çûyîna te ya zû. Çiya tu neparastî, lê te çiqas bawerî dabû çiya. Dema bi carekê min wêneyê te li pêşberî xwe dît matmayî bûm, min bawer nekir tu yî, lê bi rûyê xwe yê paqij, çavên belek û bi sekna xwe ya egînd re tu bûyî! Ava Cîlo ya sar bi ser laşê min de hat xwarê. Tu kengê çûyî Dêrsimê? Te berî vê mehekê ji min re agahî şandibû û gotibû; çima nehatiye Botanê, bila were Botanê, bila qadê neguherîne. Ka min ê li Botanê te dîtiba û ji wir çûbam Xerzanê. Gelo ma neçare her tim wisa bibe? Êdî nikarim rakim, ji bo min giran tê. Te ji min re gotibû; divê tu neyê girtin, divê ez te di televîzyonê de nebînim û bi vî rengî şiyariyek dostane kiribû. Dema li bajar bûm her gava min davêt, her tim ew şiyariya te ya dostana li ber guhên min deng vedida. Ez sax û saxlem ghiştîm lê niha ez te di televîzyonê de dibînim. Li hem-berî çiyayên Dêrsimê bi hêrs im, we yek bi yek digire û dibe. Lê min çiqas ji Dêrsimê hez dikir. Zagros û Colemêr bi bîranînên te dagirtine. Ti kes naxwaze bawer bike. Ma tu hatiba, me li Govengê dîlanek girtiba, me ji dengê te yê dilşewat strana Suna guhdar kiriba, wê çi ba?

Ez bawer nakim tu di nav xewa bêdawî de yî. Na, na! Tu li Botanê yî, ez ê werim te bibînim, ji wî dengê te yê nerm gotinên tu çawanî şoreş-ger bibihîsim. Ez ê çavên te yên mîna stêrkan dibiriqin û mîna çûkan coş bibînim. Ez ê wê şekira qend a te çêkirî bidizim. Dibe vê carê hevala Berçem li gel min nebe lê ez ê ji bo wê jî bigirim. Dema te jî lalîk vala dît, dê mîna sivorî dilê te bisekine, li pey me baz bidî lê em ê dîsa şekira te nedin. Kî şekir ji te bixwaze tu yê me weke navnîşan bidî dest. Ew roj çiqas rojek xweş bû ne wisa? Ez naxwazim li pişt we bigirîm lê bê hebûna we weke dojahê ye. Ka em ê bi hev re derbazî Bakûr ban? Ez nizamim çi bêjim.

Merheba, rêwîya hêviyê ya ji evîna nîvco mayî

Ev çend rojin em di rê de ne. Civînek hebû û bi boneya vê civînê me gelek heval dîtî. Bê ku sotîner û germbûna tavê guhdar bikin meşîyan. Me roj li pişt xwe hişt, silav da sîber û pelên daran. Di van rojan de dîtîna hevalan pir baş bû. Dibe em êdî nebînîm. Ez ji şهادeta hevalê Şiyar pir bandor bûm. Heval dîtî, bi hevala Berçem û Gulistan re parvekirin pir baş bû. Min fêhm kir ka şهادeta hevalê Şiyar çawa çêbûye. Ji bo Botanê hevaleyê muhabere bike pêwîst e, hevalê Şiyar jî ji bo biçê Botanê pir ferz dike. Ji ber berê muhabere kiriye wî rêdikin. Berî bîst roj derbaz bibin di peywirekê de şehîd dikeve. Hevaleyê jî dikeve dest. Kê şهادeta hevalê Şiyar bihistiye pir pê bandor bûye. Hevalê Şiyar, hevaleyê pir dihat hezkirin û nîrx jê re dihat dayîn. Mîna hemû cîhanê li ser milê xwe radikim, giraniyek li ser milên min heye. Min bêmafî li çîyayên Dêrsimê jî kir, li min biborînî çîyayên bedew. Li hemberî vê agahiyê tevîzim, min çî gotiye nîzanim. Ji ber agahiyên şaş min jî çîyayên Dêrsimê re serî kir.

Rengê porê min mijara nîqaşa hevalan e. Rengê zer, sor û kestane. Ez payîzê li ser pora xwe didim jiyîn. Sorbûna pora min bala hevalê Abbas jî kişand. Weke porsor banî min dike. Heval jî bi pîrçepîrç dikenin. Dibe kesek din wisa banî min bike ez ê pir aciz bibim lê dema hevalê Abbas wisa dibêje kêfa min tê. Ji ber ez ê di bîra hevalê Abbas de weke keça porsor bimînîm.

Ev meşa me xweş bû. Her tişt jî bo hezkirinê ye. Bi qasî te hez kir tu yê werî hezkirin. Di destpêkê de hezkirin mîna çîrûskekê ye, piştî wê vediguhere robarekî û robar jî ber bi okyanûsan ve diherikin. Te hew dît te mîna okyanûsan kûr, mezin, berz hezkiriye û hatî hezkirin. Hezkirin bê bendewarî hez dike û ked dide. Min di vê rêwîtiyê de fêhm kir ku derfeta hevala Mizgîn a hatinê nîne û bê ku wê bibînîm ez ê biçim. Ji ber ez ê wê nebinîm, ez ê li ser bêtêlê bi wê re baxivim. Ez li benda agahiya wê me.

Di Tebaxê de vejandina jiyanê

Gelo havîn her tim wisa germ in? Ev germahî mirovan tengav dike. Dema em rûdin li ser rûyê me mîna av biherike xwêhdan tê xwarê. Li ser gumlekê me nexşe çêdibin.

Sibe 15'ê Tebaxê vejîna gelê Kurd, cejna rûmetê ye. Wê sibe li her deverê di hewayê cejnê de were pîrozkirin. Dê gerîla jî vê rojê bi coş pîroz bike. Kê dizanî dê rojek were, ev roj weke cejnê were pîrozkirin? Guhertinên ji duh û îro hatin jiyîn mirovan hestiyar dike û di nav matmayînê de dihêle. Em bi saya keda Rêbertî hatin van rojan. Rêberê min, cejna wê pîroz be. Rêberê min, ez hezkirina xwe bi bêhna rihanê re rêdîkim. Ez her tim bi xeyala ez ê rojekê te bibînim dijîm, bi vê hêviyê têkoşîna xwe xurtir dikim Rêberê min.

Min sala borî pîrozbahiyên gerîla yên 15'ê Tebaxê di televîzyonê de temaşe kiribûn û çavên min tijî rondik bibûn. Di wê kêliyê de nebûna li gel wan êşek mezin dabû min. Min çiqas daxwaz dikir ez vê roja cejnê bi hevalên xwe re pîroz bikim. Li hemberî her geliyekê dibînim pir hestiyar dibim. Ew rojên bêrîkirinê di kevin de man û ez niha li gel gerîla û hevalên xwe me. Dixwazim vê rojê pir cuda pîroz bikim. Divê weke rojeke asayî derbaz nebe, li gor rihê vê rojê dagirtî bijîm. Dema min li pişt xwe zivirî û temaşe kir divê nebêjim; xwezî min ev kiriba. Dibe êdî hevalên li vir jî nebînim, her hevalek dê biçe cihekî, dema min li pişt xwe nêrî naxwazim bi xweziyan re bijîm. Divê mirov parvkirina di hevaltiyê de winda neke.

Sala were ez ê 15'ê Tebaxê li Xerzanê pîroz bikim û van rojên xweş weke parçeyek bawêşinkê bi bîr binim. Em tama nirxa van rojan nizanin. Dema wext derbaz dibe jî lêdigerin. Li gor rihê 15'ê Tebaxê jî nû ve jidayîkbûn, bi biryar û wêrekiya şehîd Egîd ve dîrok û pêşeroj hembêz-kin, di Tebaxê de azadî afirandin.

14 Tebaxê 2007

Bûna ronahiya te

Bûna tirêjek ji Rojê

Bi tirêjan cîhan û dil ronîkirin
Di nav bêdawîbûnê de bûna stêrkek
Li lûtkeyên çîyan henase digirim
Bi gavên lez dimeşim
Hemû ji bo te ye azadî
Bi qasî henaseyekê nêz
Bi qasî stêrkekê dûrî min î
Di Tebaxê de evîndarê rojê bûm
Roj û heyv gihiştin te azadî
Bi tirêjan re kûr diçim
Rêwîtiyên min dûr û dirêj dibe
Her tim rêwîyek pêşerojê me
Bûna parçeyek ji rojê
Di nav agirê pîroz de berê xwe dana asîmanan
Egîd û Zîlan hîs kirin û jiyîn
Em ê di Tebaxan de bijîn
Hêvî
Hezkirin
Rûmet
Û azadiyê

15 Tebaxê 2007

Ez ji kulîlka xwe ya mizgîniyê li benda silavekê me

Ev çend roj çêbûn hîn ti deng û agahî nîne. Îro cejne. Xwezî niha hinek hatiban, mizgînî daban û gotiban; Mizgîn giyan û hevalê Cuma hatine. Wê sprûzek çi qas mezin ba! Ez bawerim dê dilê min sekînîba. Ya min jî xeyal e, lê dîsa pir xweş e. Mizgîn giyan, dûrî me bandor nake, ji ber em parçeyeke ji hev qut nabin, di vê wateyê de di navbera me de ne çiya ne jî zinar hene.

Dema derketim ser lûtkeyên Xerzanê ez ê ji bo te jî stranan qêr bikim. Dê hezkirina di dilê min û peyvên di okyanûsê de birijin ser rêzikan. Di demên herî zehmet de te hîs kirin û hizirin dê hêz bide min. Ez dizanim ez ê pir bêriya te bikim lê em ê van pêvajoyên bêrîkirinê jî derbaz bikin. Mîna gelek zehmetiyên me derbaz kirin hevala min a hêja. Cejna te ya 15'ê Tebaxê pîroz be û bila ev rojên te xweş derbas bin.

15 Tebaxê 2007

Merheba zarokê ji nû ve ji dayîk dibe

Ev çend rojin em di nav liv û tevgerekê de ne. Pîrozbahiya 15'ê Tebaxê duh hat pîrozkirin û bi coşek mezin hat pîrozkirin. Ji ber duh di nav wê civata gerîla de bûm pir dilşad bûm. Ez 18 meha 8 di sala 1999'an de beşdarî gerîla bûm. Gihîştim gerîla, min hensa jiyana nû hilmijand hundirê xwe û gihîştim van rojan. Min bi azwerî azadî û têkoşîn hembêz kir. Îro jidayîkbûna min e, roja azadiya min e, hevalên min ên hêja jî dibêjin; hemû pîrozbahî ji bo te ne. Ev nêzîkatiyên hevaltiyê ez her tim ji dil bandor kirime. Ev kêlî ew qas xweşin, dema hemû heval li hev kom dibin okyanûsek hezkirinê ya bê hemta derdikeve holê. Bûna parçeyek ji vê civatê pir xweş e. Çavê hemû hevalan weke stêrkan dibiriqe, hembêzkirinek ji dil heye. Eqedemiya Mahsûm Korkmaz amadekariyek pir xweş kiriye. Li hemberî van amadekariyan hestên min ên welatparêziyê nepixîn, min xwest weke pêvajoya xwe ya di welatparêziyê de bi nîşana serkeftinê, destê min li hewa bi srûd û stranan re hevalbendiyê bikim. Min destên xwe rakirin û piştê dîsa daxistin. Çend sal bi ser hinek srûd û stranên me re derbaz bibe jî, lê dîsa wate, nirx û

balkêşbûna xwe diparêze. Xwepêşandana qomando jî pir xweş bû, tenê kêmasiya wê kêmbûna jimara hevalên jin bû.

Ger guleya hevalê Egîd a li koletiyê xistî neba, me yê ev kêliyên pîroz nejbûn û gelek bi navê gelê Kurd jî neba. Hemû nirxên îro hatîn afirandin bi keda Rêbertî û hevalên şehîd bûyîn re ava bûne. Divê nirxa van rojên pîroz baş were zanîn û ji rêzê neyê destgirtin. Îro ji bo min rojek pir cuda ye, roja ez hatim welat, 15'ê Tebaxê dihat pîrozkirin û ez bi hevala xwe ya hêja Mizgîn a bi rojan bû li bendê bûm û bêriya wê kiribû re axivim.

Ez pir bi kelecana bûm, ez bi carekê wisa hizirim dilê min dê vê dijewariya hestana ranake. Dema dihezirim ka çi vebêjim, çi parve bikim, her tişt ji bîra min çû û min xwe li ber herîkîna dilê xwe berda, bihîstina dengê hevala Mizgîn aramiyek wisa di min de ava kir; dilê min bêhnfireh bû û min xwe pir bi şens hîs kir. Ji ber xwîşkek min a milîtan wisa heye serbilind im û dixwazim ew jî bi min serbilind be. Piştî min hevala Mizgîn dît şûndê êdî çavên min li paş namîne. Em ê dîsa hev bibînin. Rojên azad pir nêzin, wê stranên azadiyê berz bibin, dê êdî çavê gelê min ne bi girî be.

Gotinek heval L...ya ji min re gotî hebû. Ji min re digot; hevala Marya tu yê tenê xwe nefikirî, tu yê hevalên ji te hez dikin jî bihezirî û xwe biparêzî. Tiştê hîşt heta niha di nav tevgerê de li ser piyan bimînim mirovên min ji wan hezkirîye. Hezkirina min, min ji gelek tiştan diparêze û hêza zehmetiya derbaz bikim dide.

Rûmet bi hezkirinê mezin dibe. Ya ku mirovan dike mirov hezkirin, rûmet, azadî û hêvî ye. Mirov bi van nirxan heye, ger yê ku xwedî van nirxan dernekev em nikarin ji wî/ê re bêtînin mirov.

Min careke din roj û jiyana min bi hezkirinê hembêz kirî dît. Ez ê guh nedim tiştên bê wate yên min jiyane û hinek nirxandinên ne di cihê wê de ne. Belê, piştî ez evîndarê hêvî, azadiyê bûm şûnde, di armanc û lêgerînên xwe de zelal bim, wê demê ez ê guh nedim tiştêkî û divê di pêşerojê de çi bikim xwe qîfil bikim. Divê wextê vala vala winda nekim. Ez di vê jiyana pîroz de li bendê nebin her kes weke hizir û hîskirina min, min fêma bike û hîs bike. Ji bo min ya girîng ew e çiqas li pey rasti-

yan dibezim û çiqas bi wêrekî hembêz dikim. Dema mirovekî digirim dest ji xwe bi rê dikevim û ji bo wê/î neêşinimm rastiya wê çi be hewl didim wê bibînim û fêr bikim. Ez ji bo xwe çi dixwazim ji bo nêveng û mirovên li hemberî xwe jî wê dixwazim. Ez weke hinek mirovan nikarim propagandeya tiştên dikim û dihezirim bikim, ev ne li gor min e. Xwe li ber bayên bi wate xistin û xwe nepenîkirin li gorî min e. Hîskirin û dayîna hîskirin li gorî min e. Ango di xwezayîbûnê de jiyîn û dayîna ji-yankirin, bê ku cih ji tevgerîn û gotinên xemîlandî re bihêlim, bi hîskirinê re jiyîn. Wisa dihezirim ku; ya jiyanê bi wate, xweşik û mirovan azad bike ev felsefe ye.

19 Tebaxê 2007

Nirxa me ya herî pîroz şehîdên me ne

Me îro weke hêza Bakûr xebatek pîroz birêvebir. Wê ti heval vê rojê ji bîr nekin, dê dil û mejiyê xwe de bi cih bikin. Li her deverê goristanên navendî tên çêkirin. Hevalên berî wê şehîd ketin jî em li vir kom dikin. Li Zap û Kure Jaro keç û lawên egîd ên di nav xewa bêdawîbûnê de razane hene. Em nizanim ev hevalên şehîd ketin kî ne. Em îro bi hevalên di koma Amedê de cih digirin re çûn Şkefta Birîndaran. Em çûn gel hevalên li wir ên bê deng razabûn. Em ê cara dawî wan aciz bikin. Dilê me di kefa destê me de ye û pir baldar dikolin. Ji dilê ti havalan nayê van mirovên pîroz bêşîne.

Min berê hevalên şehîd ketin dîtibûn lê wisa ji hembêza axê derxistin û dernexistibû ser rûyê erdê. Her hevalek çîrok, cîhan û şêwazek xwe ya şehadete heye, lê em yek ji van jî nizanin. Em ew qas li hemberî dijmin bi hêrs dibin nikarim vebêjim. Her hevalê tê derxistin li ser serê wî/ê kom dibin, bi hevaltî dest didinê û dilê xwe dikin yek. Cilên leşkerî û şûtika li ser wan saxlem e lê tiştên din rizîne. Ya mayî hestiyên van mirovên xweşikin. Em hestiyên li nav cilan derdixin û dixin telîsan, bi hêviya em ê nasnama wan bibînin axê dikolin, li berîkên wan dinêrin lê em nasnama wan nabînin. Hinek hevalan lingê xwe nîne, hinek heval jî ji serê xwe derbe xwariye ji ber vê çendê qepaxa serê wan parçeparçe bûye. Bejna hinek hevalan dijrêj e, ya hinekan jî kurt e. Em encex ji şêwaza hestî van tiştan fêr dikin. Ji berîkên wan pîmê bombê û gule

derdikevin. Destê hinekan hatiye girêdan, diyare ji destê xwe giran birîndar bûye û piştê şehîd bûne. Ev dîmen me qehir dike, hestên mirov nikare bi lêv bike dijî. Ez hest û ramanên van mirovên pîroz ên berî şehîd bikevin mereq dikim. Kî dizane niha çi hizirîne û xeyal kirine?

Hinek heval jin in an xort in em fêr nakin. Lê cihê serê cenazeyekî toqeyek porê hebû. Toqa wê reş bû, dema min girt destê xwe pir bi kelecana bûm. Çavên min tijî bûn, di nav hestên nikarim bi lêv bikim de me. Ne diyare dibe di nav van hevalan de hevalên jin ên cuda hene lê ji ber toqa wan a porê nîne nikarin zelal bikin. Bi her gora em vedikin re weke dilê me wê bisekine, ew qas êş dijîn. Her hevaleyek li gorî derfetan li tiştê cuda hatiye pêçan. Hinek li batenî, hinek li barangir, hinek li naylon û hinek jî li keyfê hatine pêçandin. Tiştê hemûyan a herî diyarker jî gora ris e. Yek jî li ser çongên wan lastîka ji bo gore sexlem werin girtin heye.

Belê hevalên pîroz, xwezî derfet heba testa DNA hatiba kirin û nasnameya we hatiba eşkerekirin. Em bi we pir serbilindin, em jî dixwazin weke we cihê xwe di qata pîrozbûnê de bigirin.

20 Tebaxê 2007

Merheba, rêwiya hêviyê ya ji evînek nîvço mayî

Me duh piştî nîvro hevalên şehîd ên din jî ji cihê wan derixist. Yên ku herî zêde nîrxê hev dizanin heval in. Şehîd ji bo me nîrxê herî berz e, ew her tim ronahiya rê û asoya me ronî dikan. Me nedizana kî bûn lê ya girîng ji bo kîjan armanc heta dawî li ber xwe dane û şer kirine. We ev roj afirandin û em henase girin û dijîn. Em bi xwîna we gihîştin van rojan, xwîna we dara jiyane av da û şîr kir. Me rehên xwe berdan nav dîrokê. We ev jiyana azad kir. Ez ê ti carî we ji bîr nekim.

Me di nav vê xebata pîroz de agahiya mizgîniyekê girt. Bi vê agahiya mizgîniyê em hemû bi coş bûn, ji kêfê em nizanin em ê çi bikin, em ê êdî biçin, di nav du rojan de em ê bi rê bikevin. Çavê hemû hevalan dibiriqe. Dawiya sabirê kêfxweşî ye, em ê bibin rêwiyan hêviyê. Dawiya sebrê silametî ye.

Her hevalek bi coşek mezin xwe ji bo azadiyê amade dike. Min herî dawî xwest van hevokan binivîsim. Ji kêfan hinek hevokan şaş dinivîsim. Çenteyên me pir giranin, ji bo sivik bikin tiştê herî biçûk jî nagirn. Di çenteyên me de guleyên B-7, C-4, fûnye, qesetor û tiştên cuda hene.

Dema em civakê bûn çenteyên me bi tiştên xemîlandî dagirtîbû. Di civakê de ji bo tu xwe bi zîlam bidî ecibandin maske li rû dihatin kirin. Lê niha ti pirsgirêka me ya mîna em xwe ji bo kesekê bidin ecibandin nîne. Ji bo bigihin jiyanek azad, reh, cînsê xwe li hemberî xwe û dijmin têkoşîn dikin. Her çendê ji eniya me dilopên xwêhdanê werin xwarê jî, mendilên me şil û pil bibin jî em bi hezkirin dest li vê xwêhdanê dikin. Ji ber ev xwêhdan nîşaniya rûmetbûnê ye. Çawa bend û rih yeksane, hizir û pratîk jî yeksane. Mirov encex dikare bi kedê xweşik bibe, encex bi kedê dikare azad be.

Rêberê min, ez berî her tiştî silav û hezkirinên xwe ji we re rêdîkim. Ez niha pir kêfxweş im û dixwazim dilşadiya xwe parve bikim. Ez ê vê carê bi ser bixim. Bi salane di nav vê têkoşînê de me. Di hinek aliyên diyar de bi hewldana xwe têkoşîn kir. Lê ev tempoya têkoşînê li hemberî bîrdorziya Rêbertî ava kirî lewaz e. Ev şewazê têkoşînê ya min dixwest nebû. Armanca min bûna xwedî têkoşîna ji rêzê nebû. Rêberê min, ez ê li Bakûr têkoşîna xwe hîn tûj û bi îdatir bi rê ve bibim.

Divê gotina min bibe çalakiya min. Her ku têkoşîn dikim xwe zêdetir nêzî we hîs dikim. Weke hûn li gel min bin hîs dikim û bi coş jiyanê hembêz dikim. Rêberê min, hûn her tim bûn ronahiya di dilê min de. Bi felsefeya we dixwezim biwestim û bibim jinek leheng. Êdî weke wijdanî dixwazim hinek tiştan bikim. Her roj cezayê hûcreye didin we û li bendê ne em hezim bikim, lê ez êdî nikarim rakim.

Li hemberî rastiya Rêbertî ez dibîmin di cewher de rast nêzî Rêbertî nabim. Bi salane Rêbertî di nav çar dîwaran de ye û hema em jî lê dinêrin. Ev rewşa temaşekirinê ne li gorî lêgerînên min e, ev ne zarokê azad yê di dilê min de ye. Her çendî serkeftinê bi dest bixim di wê baweriyê de me weke milîtanek jin ez ê xwe ji koletiyê paqij bikim.

Rêberê min, bi ked û hewldana xwe re dixwazim qeftek kulîlkên çiya ji we re bişînim. Dil dixwest biharê bîne welat hezkirinê û wisa ji we re rêkiriba. Ez hezkirina xwe ya dilê min yê jinê de ya mîna robaran bi coş dibe ji we re rêdîkim. Hemû hevalên diçin Bakûr ji we re silav û hezkirinê xwe rêdîkin. Xeyalê hemû hevalên jin dîtina we ye. Em ê bi rêwîtiya Bakûr ve bigihîn we. Rêberê min, her çendî weke fizîkî we nebînim jî ne girîng e, ji bo min a girîng gihiştina we ya hevalên min ên hêja û gelê me yê welatparêz e.

Amadekarî berdewam dikin, ji koma Amedê û ji koma me jî komek diçe. Lê koma hevalê Qehreman dimîne. Ew jî bê rewast dixebitin, ji bo me amadekariyan dikin. Ya rast li gor pergala jiyanê îro em nanpêj û xwarinpêj bûn lê niha ew hem napêj hem jî xwarinpêj in. Darûniya yên dimînin pir nebaş dibe, me ev pêvajo jiyan kir, ez derûniya wan baş fêm dikim. Yek jî divêtiya nehatinê ew jî dizanin. Lewma dilê wan şkestiye û ji ber em jî ji wan vediqetin xemgîn dibin. Em çi bikin? Çavê dijmin kor bibe!

21 Tebaxê 2007

Bi hezkrin ji Mizgîn giyan re

Ez niha nizanim çi binivîsim, pir bi kelecana im. Hestên min pir dijiwarin û di nav dijiwariya hestan de winda dibim. Di vê kêliyê de ti peyv nikarin tiştên dijîm û hîs dikim pênase bikin. Piştî salan em ê biçim Bakûr. Ji ber ji te û hevalên xwe yên hêja vediqetim xemgîn im lê em çi bikin, ji bo em hinek tiştan bafirînin divê hinek tiştan feda bikin, ev berdêl jî ji we dûrbûn û veqetîn e. Heta berdêl neyên dayîn azadî nayê bidestxistin.

Belê hevala min a hêja, piştî salan derbazî welat bûm min tu dîtî û em ê ji hev veqetin, lê em ê dîsa hev bibînim. Ez ji vê bawer dikim. Sal jî derbaz bibe, li dawiya dinê jî bim teqez em ê rojekê hev bibînin. Ji te pir hez dikim, dê ev hezkirin min bigihîne te. Ez ji hêza hezkirinê bawer dikim, hezkirin dermanê her tiştî ye. Mereqa min neke, wê ev rêwîtiya Bakûr pir li min were.

Min ev rojnivîsa xwe di pêvajoya komê de nivîsand, hîn xilas nebûye lê negirîng e. Pozeke wêneyan a min girtî heye, wî jî rêdikim. Yek jî nîşeyên xwe rêdikim. Ez naxwazim wan bişewitînim. Tu wan jî baş biparêzî ez ê kêfxweş bim, ew bîranîn ji hevalên min mayîne. Bîranîn ji bo min girîngin, dixwazim wan biparêzim. Ger demê pêş derfet çêbibe ez ê ji Bakûr ji te re nîşe binivîsim. Silavên min ji hevalê Cuma re pir bêje û li şûna min wî maç bike, bila pir baş li xwe binêre. Min vê carê ew nedît lê teqez ez ê rojekê bibînim. Ez silav û hezkirinên xwe ji we re rêdikim. Ger tu bi Elîf re baxivî pir silavên min lê bike û bila silavên min pir li dayê L. jî bikin, ji wan pir hez dikim. Silavên min li Melsa, Dilgeş, Armanc, Aram û gelek hevalên min navê wan nedaye bike, ez ê li şûna wan hilkişim ser lûtkeyên çiya û hense bigirin, ez ê li şûna wan stranên azadiyê qêr bikim. Ji we hemûyan pir hez dikim. Bila di dilê te de hêvî kêr nebe.

Bi hêviya em ê hev bibînin bi xatirê te! Hevala te Marya ya pir ji te hez dike.

Kulîlka min a hezkirinê

Em ê sibê bi rê bikevin. Ez qoliya xwe ji te re rêdikim. Bîranîn e. Dixwazim tu bi kar bînî. Hevala min a Mizgîn, her cara te lê meyzê kir bila dilê te aram be. Min xwest vê rojnivîsa xwe bi te re xilas bikim. Her wiha ez ê bi te re rêwîtiyê bikim. Ji te pir hez dikim.

Hevalên cihê xwe di koma me de girin; heval Ruksen, Cihan Wan, Zeyneb Soran, Delîl Çinar, Rojhat Markoz, Rojhat Cîlo, Hewrê û Fuat Amed. Hevalên di koma Amedê de jî cih digirin; heval Savuşka, Fîdan Qamişlo, Rojhat Bêlatî, Agirî, Hebûn, Mahsûm, Orhan û Yilmaz. Ji ber bi wan re me pir dilşa me. Di PKK'ê de hevaltî pir cuda ye. Yek dema ev dibin rêwîyên hêviyê hîn cudatir.

Ji te pir hez dikim. Ez ê bi hezkirina te xwe bigihînim azadî û rûmetê. Ez ji hemû hevalên li wir silav û hezkirinên xwe rêdikim. Ez te bi okyanûsa hezkirina di dilê xwe de hembêz dikim û maç dikim.

21 Tebaxa 2007

JI BO MIZGÎN GIYAN

Rêwîtiya Bakûr....

Merheba Mizgîn giyan

Hevala min a hêja, mamosteya min a jiyanê, hevrêya min a têkoşînê ez weke fîzîkî ji te dûr dikevim. Ez di wê baweriyê de me her veqetînek

ji hevghînek nû re cudanî ye, weke xunçeyên biharê. Ez ê her tim bi te re rêwîtiyê bikim, bi te re bijîm û dilê min ê bi hezkirina te lêbide.

Tu dizanî, min navê vê rojnivîsa di destê xwe de kir Mizgîn giyan, tu mizgînî û hevala min a hêja yî. Ez ê bêrî û hesreta xwe bi parvekirina bi te re derbaz bikim. Dema dibêjim; Mizgîn giyan dikevim nav kelecaneke, mîna tu li gel min bî hîs dikim hevala Mizgîn. Ji ber pir dûr im netirse. Wê hezkirina te min biparêze, bila ew dilê te yê şîrîn nekeve nav guman û tirsê.

Ez jiyanek bi mizgîn xeyal dikim. Wê mizgîniya herî mezin jî derketina Rêbertî ya di navbera wan çar diwaran de be. Bihizire Mizgîn giyan, yek were û bibêje; Rêbertî ji zindanê, ji wê hucra tarî rizgar bûye. Wê mizgîniyek çiqas xweş be, ez ê di wê kêliyê de bifirim. Mizgîn giyan ez her tim vê xeyal dikim, ji bo vê kêliyê dijîm.

Ez ji evînek nîvço mayî ber bi rêwîtiyek hêviyê dimeşim, ez ê di serpêhatiyên xwe yên li Bakûr de rê ji nîvço mayînan re nehêlim, ez ê her tiştî bi îda bijîm. Demsal di dostaniyê de jiyîn û hevaltîyê hembêz bikim, ez ê xemgîniyan li piştî xwe bihêlim, silav bidim roj û baranê. Bi hezar caran merheba Mizgîn giyan.

24 Tebaxa 2007

Dilê me pareçparçe ye

Em destpêkek rê û hêviyek nû dijîn. Rêwîtiya me ya hilkişandin û daketin roj li pey hev anîn. 22 mehe em bi merasîmek mezin ber bi Zapê ve hatin oxirkirin. Em û koma Amedê bi hev re ne. Min dixwest robarên di dilê min de cih digirin ên bê moralin, ji bo moralê hevdu bandor neke tavêjin hundirê xwe, lê em hevalên hev in û em fêhmîyên yên li hemberî te çî hîs dike û çî dijî. Belê Mizgîn giyan, min navê vê rojnivîsa xwe kir Mizgîn giyan, ji bo ku her tim bibim xwedî jiyanek xweş û bi mizgînî.

Em berî vê du rojan bi agahiyekê hejiyan û me hîn xwe kom nekiriye. Koma berî me bi rê ketibû rastî dijmin hatine û bûyera nikarim vebêjim, qirika min ditevîzine û min bi hêrs dike; hevalên di komê de şehîd ketine. Nebûna wan hevalan û hizirandina êdî nedîtina wan hevalan pir

zehmet e. Lê me peyman dabû hev, ew dê pêşiyê çûban çay çêkirban, em jî dê biçûban çaya li ser pelan hatî çêkirin vexwariba. Me soza dubare hev dîtin dabû. Her hevalek yek bi yek tê ber çavên min. Nêrîna hevalê Erdal a pak, coşa hevalê Andok a mezin, lêdana dilê hevala Delîla yê mîna dilê zarokan lêdida, îda û biryara serkeftina hevala Roza ya bi rengê jinê, kêliyên hevalê Rohat yên hêvî dikir dubare Xerzanê bibîne û bijî. Hemû jî mîna perperîkan firiyan. Hemû jî li pey evîn, bêrîkirinên xwe çûn û qurtek ji ava bêdawîbûnê vexwarin. Bi hêrs im, soz didim we, soz didim we ez ê hesabê vê bipirsim.

Gelo jiyan dê hîn çi fêrî me bike, çi nîşa me bike! Ez ji hevalên li gel xwe hêz digirim. Ez pir ji hevala Şavuşka bandor dibim. Hevalê Îsyan kurê xalê wê bû, li wêneyê wê yê di televîzyonê de derketî nikarî lê binêre, lewma nûçe guhdar nekir, lê di nav me de ya herî bi hêz a xwe li ser piyan girt yek jî ew bû. Tevî di dilê wê te bahoz diqewimîn jî, ron-dikên xwe bi dizîka dibarîne, tevî hemû êşa xwe, hewl dide bi me nede hîskirin. Ez rêz ji vê hewla hevalan re digirim.

Ez êşa tiştêkî pir dijîm. Ew jî ew e ku weke tê xwestin parvekirinên me bi hevalên xort re çênebûn. Tiştê li pişt ên diçin dimîne parvekirinên tîr jiynîn. Bi nîrxê hev zanîne tevgerkirin û her wisa weke dê tiştêk çênebe jî bi awayek rexnekir û lêpîrsîner nêz hev bibin. Dilê min parçe-parçe ye, em çi bêjin jî êdî nikarin wan paşve vegerînin.

28 Tebaxê 2007

Rojên me weke jehrê derbaz dibin. Hema mirov dibêje qey dem rawestiye. Em hewl didin xwe mijûl bikin lê dîsa dema derbaz nabe. Em her tim bi heman êşan re dijîn, nebûna wan hevalên xwe yên hêja hizirandin ew qas zehmet e, ez bawer nakim û naxwazim bawer bikim. Dema bi xew ve diçim û dubare şiyar dibin hêvî dikim her tişt cuda be lê dîsa ev rastî mîna zileyekê li rûyê min dikeve û dihejim. Malbatên hevalên şehîd dixwazin cenazeyên xwe bigirin lê ev dijminê xedar cenazeyan jî nadin. Ji bo neyê zanîn çekên bi kîmyewî hatine bikaranîn wisa dikin. Teqez niha dilê dayîkan parçe-parçe ye. Gelê Kurd vê êşê ji kûr de dijî. Bi vî rengî xwedî derketina gel a li gerîla mirov dide hizirandin. Gelê me tevî hemû çewisandinan serî natewîne, gelê Kurd gelek bi wêrek e.

Hema di heman rojan de çalakiyên gerîla yên bersivdanê bû helwestek mezin û tola we hat rakirin. Xwîna we li erdê nema, nîşa dijmîn da ka li hemberî gerîla derketin tê çî wateyê.

Hevala min a Delîla, dema min rojnivîsa xwe dinivîsand te her tim digot; min jî binivîse û te her tim bi navê Sorê banî min dikir. Ev pir bi kêfa min dihat. Em bi hev re çûbûn pêwîra herî dawî û destpêkê. Hevala min a Hêja, min nedixwest te wisa binivîsim. Min ê li Xerzanê gihîştina te ya bi şehîd Mizgîn re nivîsandiba. Min ê stranên te yên li Xerzanê nivîsandiba. Tu jinek şoreşger a hunermend bûyî, her kes nikare vê bi ser bixe lê te ev bi ser xist. Evîna te jî mîna ya şehîd Newal di nîvî de ma. Gelo ma neçare çarenûsa hemû jinên hunermend ên şoreşger wisa be? Li hemberî vê rastiye îşyan dikim!

Hevala min a Delîla, te jiyan bi hezkirin jiyan kir û em ê bi hezkirina te bi rê bikevin. Ez kêliya pêvçûnê dihizirim, gelo we di wê kêliyê de çî hizirî û çî got? Hevalên min ên Hêja, min ê ji we re silavên hevalên li vir dimînin anîba, nîşeyên ji bo we hatibûn nivîsandin hebûn, min ê ew nîşe bi dest xwe daba we, min ê roniya di çavên we de girtiba û bi we re kêfxweş bibam. Dilê ji bêrîkirina hevaltiyê dikeliya wê silavek bida hêviyê. Bê ku silav bigihînim we, we xatir ji me xwest. Ez ê qet 25'ê Tebaxê ji bîr nekim. Ez ê roja 25'ê Tebaxê weke rojek reş bihesîbînim.

30 Tebaxê 2007

Merheba Mizgîn giyan

Em li cihek pir xweş in. Asîman xwe bi rengê şîpûşîn xemîlandiye, bayek têhngerm tê. Darên çînar û berûyê ev der bi rengê kesk xemîlandine. Yek jî çemek heye, di rastiye de herikandina van çemên biçûk her tim aramiyê dide min. Lê di nav rojan de ji xweşikbûnên xwezayê tam nagirim. Di nav vê xweşikbûnê de hîs dikim difetisim û teng dibim. Lê ez xwezayê pir hez dikim û tenêbûna xwe bi xwezayê re parve dikim, lê niha nikarim vê bikim. Niha çiya û xwezayê ji xwe re biyanî hîs dikim. Ez dixwazim ya di dilê xwe de di zinaran de bavêjim. Li hemberî vê ben-

deweriyê êdî îşyan dikim. Dema min sînorên Zapê derbaz kir min wisa hiziribû em ji bendewariyê xilas bûn. Lê niha dîsa em di nav bendewariyê de ne.

30 Tebaxê 2007

Merheba mirovê berz ê rojê di dilê xwe de mezin dike

Dem ji bo yên demê xwe vala derbaz dikin mîna demjimêrek di cihê xwe de rawestî ye, lê dem ji bo yên dem bi dagirtî dijîn mîna robarekî diherîke û ew bi dem re dikevin pêşbaziye, dixwazin bikevin pêşiya dem. Ez wisa dihizirim dagirtîbûn an jî valatiya dem bi cîhana ferd a hundirîn û asta lêhûrbûna dijî ve girêdaye. Rêberê min, her ku we dihezirim hêza min a watedayîn zêdetir dibe.

Divê dem baş birêxistin bikim, lêhûrbûnek rast û gelemperî bijîm, kuştina dem ne ji bo min ne jî ji bo partiyê sûda xwe heye. Wê têkoşînê lewaz bike. Rêberê min, em bi nêzîkatî û pratîkên xwe ve li hemberî keda we ya di ber me de dayî berûvajî dikevin. Ji ber vê sekna me dijmîn hîn zêdetir har dibe û we dixe hûcreyan. Sedema van valahiyan lêpîrsîn dikim, dixwazim ji xwe bi rê bikevim û analîz bikim. Weke qadroyekê pîrsgirêkên min jiyane û şewegirtina kesayeta min nebûye xwedî dahûrandineke kûr û bi xwe re şerek ji dil bi rê ve nebiriye. Ez nikarim bêjim ji ber min êş û xwe biçûkxistina hinek tiştan nejiyane. Min jîyan kir lê min hêza xwe veguhertinê ava nekir. Ev tişt di min û gelek qadroyan de hiştiye di navbera me û Rêbertî de valatî werin avakirin. Di mijara rast û girêdanbûnê de ti gumanan najîm lê erkên xwe yên milîtanbûnê tam bi cih neanîn. Ev jî wê rastbûn û girêdana min bixe mijara nîqaşê. Ez dixwazim vê ji dil diyar bikim; min ti carî nexwest bibim qadro û mirovek ji rêzê. Ez wê baweriyê de me ez ê li Bakûr hinek tiştan biguherînim. Rêberê min, dixwazim valatiyan dagirim, ez êdî nikarim bi van valatiyan re bijîm. Ez weke jinek milîtan ev pêvajoya dîrokî ya em di nav re derbaz dibin nikarm bê wijdan nêz bibim. Divê ji mirov û civaka bê wijdan were tirsîn, ji ber cinawirbûna herî mezin di nav xwe de vedihewînin. Wijdan sosyâlîz me, wijdan çanda dayîka xwedawend e. Ez di nav me de vê nêzîkatiyê dibînim; hinekan wijdana xwe bi yetkiyê straye, ger yetkiya wan hebe li hemberî jîyanê berpîrs-

yarin, xwe milîtan didin nîşan, lê ger yetkiya wan nebe nexweş û bê hêvî ne. Di navenda her tiştî de xwe dibînin û wisa dihizirin qey cîhan li derdora wan dizivire. Rêberê min, ez ê xwe ji xweliya Sema bafirînim. Bi serkeftina Viyanê bi ser bixim.

Temenek windabûyî, jiyaneke li pişt xwe hiştî

Di şoreşa me de gelek egîd û gernasana di dema xwe de risata xwe leyîstine û demga xwe li dîrok û dilê mirovan daye. Dîrokek me ya bi êş heye. Gelek hevalên şehîd bûyîna ne navê wan ne jî gorek wan heye. Di berê de derfeta arşiv û nasname girtinê nebû, yêna dihatin girtin jî hinek caran diketin destê dijmin û carinan jî hevalên cihê wan dizanîn şehîd dibûn. Ji ber derfetê çapemeniyê nebûn, lehengî li wê eyalat û herêmê sînordar diman. Lê di roja me ya îro de ne bi wî rengî ye. Şoreş pêş ketiye, çapemenî pêş ketiye û kêliya hevalek şehîd dikeve agahiya hemû cîhanê jê çêdibe.

Belê, hevala Fîdan bi hevalê Xalid re maye, her ku behsa wî dike di dilê min de hest û kêfxweşiyek pir cuda ava dibe. Van mirovên xweşik bi jiyana xwe re dilê van hevalan qezenc kiriye. Ne pêkane mirov jê bandor nebe. Heval Fîdan bi kelecaneke wisa behsa hevalê Xalid dike ku nikarim pênase bikim.

Hevalê Xalid bi fermandartiya xwe ve kesayeteka mînak bû. Hevaleke ku di aliyê leşkerî de pir şiyar bû û pir girîngî dida perwerdeya avaniyê. Di sala 1996'an de li Zagrozê bûye û di sala 1999'an de jî li Botanê di kemînekê de şehîd dikeve. Hevalê Xalid hevalek dilnizim û dizanî potansiyala di mirov de derbixê holê. Di wê pêvajoyê de tevî gelek kes bê bawer nêzî jinê dibûn jî lê baweriya hevalê Xalid a li hemberî jinê pir zêde bû. Hevala Fîdan mînakekê jê dide. Timek hevalên jinê yêna tepe digirtin di keşa sibê de agir dîtine. Ji derveyî dijmin gundî jî dihatin vê qadê. Agahî didin wargehê. Tevî gelek hevalan ji wî re gotine neçe jî lê hevalê Xalid rîya çend seetan meşîye û çûye tepe. Piştî hat eşekerekirin şûnde hat fêmkirin ku eydê gundiyeke ye. Dema hat fêmkirin ne dijmin e hevalên jin bûn mijara henekên hevalên xort. Hinekan gotine; hevalên jin tirsîyane ji ber wê agahî ji wargehê re şandine. Hevalê Xalid pêşîya van gotinan hemûyan girtiye û gotiye; heta niha kîjan ferman-

darê mangê wisa şiyar nêz bûye? Ger ew agir ê dijmin ba wê çî biba? Leşkerbûn, şiyarî û cidiyet mijara tedbîrê ye. Nirxandinek bîrdozî kiriye û bi nêvengê daye hîskirin ku hevalên jin çiqas şiyar tevdigerin.

Hevalê Xalid femandarek e û femandarî xizmetkirine, bi vê ferasete ji her kesê zêdetir kar dike. Cilên xwe pîne dikir, lê yên avaniya xwe nû dikir, birçî dimîne lê ji bo birçîbûna avaniya xwe derbaz bike riya çend rojan dimeşe diçe erzaq tîne û di heman şevê de vedigere. Hevalê Xalid femandar û milîtenek PKK'ê yê rasteqîne bû.

3 Îlonê 2007

Merheba Mizgîn giyan

Em dîsa li rawestgehek hêviyê sekînin, em vê carê rastî rawestgehek li ser sînor hatin. Îro em bi hevalan re çûn nav baxçe. Robarek heye, ava wî pir sar e, di vî hewayê germ de mirov ji vê ava cemidî têr nabe. Gundek mezin e, her cure fêqî heye. Ji daran fêqî komkirin pir bi zewqe. Kî dizanê mirovên li vir çiqas ked di ber van deran de daye. Min dixwest çîroka vî gundî û çima ev gundê xweşik hiştine çûne fêr bibim. Me sêv, tirî û xox kom kir. Gûşiyên tirî ew qes bilindim destê me nagihê, ez bi daran hewl didim bînim jêr lê gûşiyên tirî dikevin erdê û parçe dibe. Pîrîkên me hatin bîra min, wan çawa bi hostatîyek mezin tirî kom dikir. Mirovên pîr di her warî de xwedî ezmûn bûn. Ji rewşa min tê fêmkirin ku ecêmî me. Porê min hemû tevîhev bibû, ez dişibîyan pîresehrek ecêmî. Heval Cîhan ê ku vê rewşa min dibîne ma bê ku nekene dikare derbaz bike? Me çar qasa fêqî kom kir. Qaşo me yê destpêkê keşfa wê kiriba piştî me yê kom kiriba. Dema di ber ava Xabûr dimeşim fêm dikim min pir bêriya Zagroz û Avaşînê kiriye. Min gelek av dîtin, Botan, Hêzil, Dîjle, Xabûr, Basya lê yek jî bi qasî Avaşînê ji min re rakêşwer nehatiye.

Merheba okyanûsa dilê min

Mizgîna min, ev çend roje dixwazim ji te re nîşe binivîsim. Min fenera destan dît û dixwazim îşev li ber awaza robarê diherike ji te re binivîsim. Ez her şev serê xwe datînim kêleka vî robarî dikevim nav kûrbûna

xeyal û hizirandinan. Dengê van avên biçûk her tim aramî daye min. Ji van şevan ya kêr agir e, ji ber ewlekariyê agir kirin qedexa ye. Agir ji bo gerîla destek germ e. Nîqaşên li ber agir û çaya li ser pelan hatî çêkirin pir xweş e. Mizgîna min tu jî dizanî, min pir bêriya wan nîqaşên kûr yê me li ber agir dikir kiriyê. Te di kêliyên herî zehmet de, di şevên herî sar de tama pîrozbûna agir girtiye. Ez jî dixwazim van rojan bi hemû rastiyan wê ve bijîm. Gerîla û zehmetî parçeyên hev û dostên hev ên nikarin ji hev veqetin. Tu ji min fêr dikî ne wisa? Mizgîna min, ez jî dixwazim wêneyê jiyana xwe xêz bikim, dibe bi qasî wênesazekî nikaribim baş firçe bikarbînim lê weke jinek gerîla di wê baweriyê de me ez ê dilê xwe li ser çiya û di dilê hevalên xwe de neqş bikim.

Hevalên me yê hêja Rojna, Sarya û Asmîn yê gihîştîne Xerzanê li ser navê YJA Starê çalakî pêkanîne. Em bi vê agahiyê pir kêfxweş bûn. Dij-min niha matmayî maye. Piştî şhadeta hevalan çalakî pêkanîn pir watedar e. Min pir dixwast li gel wan bim. Ez pir evîndara şer nînim lê dema dijminek te yê mîna cinawiran hebe, ji bo em mafê xwe yê rewşa bi dest bixin tevî nav şerên dijwar dibin. Ez bawerim ti kes naxwaze weke mirov û gelekê ku hatî biçûkxistin û naletkirin bijî!

Gerîla li aliyê mazlûman e. Dilê min jî di azadiya zarokan de lêdide. Divê zarok azad ji dayîk bibin û mezin bin. Di vê welatê min de zarok azad ji dayîk nabin, zilmek wisa heye. Şer û lêgerînên min ên bê dawî ji ber vê ye.

Şer

Di nav qelebalixa şer de ji dayîk bûm

Şer weke ewrên reşin

Li ser gelê min digere

Em di nav şer de fêrî rojên ronî bûn

Em di nav şer de fêrî hezkirinê bûn

Me di nav şer de adelat, aramî ava kir
Bêguman
Şerê me ne şerê zarokan ê di nav kolanan de ye
Di şerê me de şer veşartîne
Em
Zarokên welatê rojê ne
Bi şer mezin bûn
Şer çiqas xeyal, hêvî
Bajar, bajarok rûxandin
Ma ez ê çawa ji bîr bikim êşên gelê xwe
Vaye ji ber vê ye
Şerê min ê li hemberî jiyane

8 Îlonê 2007

Merheba Mizgîn giyan

Jiyan bi êş, zehmetî, kêfxweşî û dilşadiyan ve dagirtiye. Tu dikarî hemûyan di kêliyê de bijî. Dikare were pirsîn ev çawa dibe, lê tê jiyîn, yek jî ger tu gerîla bî tu yê vê bi awayek zela bijî û dijî. Kêfxweşiyên me jî li gor kes, cih, dem û nêveng diguhere. Ya rast min dixwast ji mirovekê bipirsim ka tu herî zêde çi zehmetiyan dijî. Ez bawerim bersivên wê ez ber bi gelek encaman ve birim. Ger ev ji min hatiba pirsî min ê gotiba ez ji nêzîkatiyên polîtîk ên li hemberî hevaltiyê pêş dikevin û hişmediya nêvengê ji bo berjewendiyên xweparêz polîtîze dike zehmetiyan dijî. Ger mirovek bi awayek yetkî, serdest nêzî hevalên xwe bibe û xweparêz be ji vê bandor dibim. Ev çavkaniya xwe ji hişmediya dewlet û serdestiyê digire. Di civaka şoreşgeran de ev nayên jiyîn lê ger tu lê binêrî yên xwe PKK'yî dibînin lê hîn nebûne PKK'yî hene. Şoreşgeriya me carnana di şêwe de dimîne. Ez gelek caran şoreşgerek çawa me

û divê çawa bim lêpirsîn dikim. Dema tişteki red dikim hewl didim el-ternatîfa wê jî pêş bêxim. Hinek caran kêm dimînim lê li hemberî zehmetiyan bin nakevim û şer dikim. Dema dibînim encam nagirim, disekim û ji dem re dihêlim. Dizanim bi mantiqek îdare pirsgerêk çareser nabin.

12 Îlonê 2007

Merheba dilê min ê her tim di nav şer de

Ev sal ji bo rêxistin, gel û me gerîla salek pir giran bû. Me ev giranî hîn di dilê xwe de û li ser milên xwe ranekirîye. Ti kesê, em gerîla jî di nav de bi qasî Rêbertî giranbûn û zehmetiyên pêvajoyê hîs nekiriye û nejiye. Rêbertî dibêje; ez ne rêberek pratîkî me, ger hûn ê têkoşîn bikin rast û baş têkoşîn bikin! Ev helwesta Rêbertî ez pir hejandim. Dema encamên derketin digirim dest xemsariya xwe jî dibînim. Ev xemsariya me, em ber bi xefik û dayîna berdêlên giran ve birin. Em di nav pêvajoyek pir giran re derbaz dibin.

13 Îlonê 2007

Bi navê Mazlûm diqîrim

Mirov hinek caran bi qasî okyanûsekê kûr e, xwedî nêrînek rast û zelal e. Hinek caran kêliyên wisa hene hestên min di dilê min de dîl tên girtin. Dîl tên girtin hevok.

Piştî çend salan min heval Mazlûm dît. Dema derbazî welat bûn hîn pir biçûk bû. Li warên azad mezin bûye û bûye ciwanek têgihîştî. Dema min ew wisa dît ez matmayî mam. Hema weke şehîd Mazlûm e. Bejin, çav û sekna wî. Tenê cudabûna di navbera wan de ji şehîd Mazlûm biçûktir e. Hevalên Mazlûm hîn pir ciwan e û şoreşgereke divê were parastin. Şehîd Mazlûm birayê me bû, dibeziya her karî û hewl dida alîkariya me bike. Dema tevlî gerîla dibe me bi wê coşa xwe ya zarokatiyê ve gotibû; me jî bi xwe re bibe. Şehîd Mazlûm gotibû; ger we bibim wê rêxistin we paşde vegerîne, ji ber temenê we hîn pir biçûk e, mezin bibin piştî başdar bibin. Hevalê Mazlûm rêwiya Gabarê ye, bi wî dilê xwe ya biçûk re diçe hesab ji dijmin bixwaze û şer bike. Me soz da hev,

wê mirinek ji rêzê çênebe, em ê dijmin kêfxweş nekin, em ê bi hebûna xwe bibin tirs û xofa dijmin. Oxir be, bila riya te vekirî be, em di rojên azad de hev bibînin. Serkeftinê ji bo te dixwazim.

Ne ji te re dibêjim neçe, ne jî bimîne

Lê çi bikim dilê min li dû te tê

Di tarîtiya şevê de xemgîniya min veşartîye

Qirîka min ditevîze û ziman nagere

Gavên xwe hêdî bavêje

Ji te re nabêjin neçe

Li pêşiya xeyalên te nabim sîber

Lê çi bikim, vaye ditirsim.

15 Îlonê 2007

Merheba hestên ji dilê westîyayî diherikin

Weke agahiya şhadeta hevalan di van rojan de nebes be di ser de jî girtîna hevalan çêdibe. Girtîgeh ji bo gerîla her roj ji mirinê xirabtir e. Wisa bihizire tu xezala çiya dixî qefesê û jê re dibêjî bijî. Ma wê çawa bijî! Fêrî bûye di çyan de azad bijî, deriyên hêsin dil tengav dike, raman digûvêşîne, dil ji bêrîkariya hevaltîyê dikele. Ji asîmanê şîn dûrmayîn, wê çav çawa fêrî nedîtina stêrkan bibe û çawa fêrî wê hûcreya çend metre bibe. Barê şoreşê yê herî giran di girtîgehê de jiyîne.

Berî vê çend rojan jî hevalê Sînan Cîlo hat girtin. Çi seyr e, ji şiliyê revî ket ber şirîkê. Girtina hevalê Sînan li zora min diçe, di qadên herî zehmet de ma, di nav dijmin de ma, tevî nû bû jî xwe rizgar kiribû. Ji bo erkek pîroz lêhûrbûn dikir. Hevalê min ê hêja Sînan, bi girtina te gelek xemgîn bûm, divê wisa neba. Dizanim ji bo te jî pir giran bûye. Ji wê yekîneya lêhûrbûnê hevalê Orhan hat girtin, piştî hevalê Şiyar li Botanê şehîd ket û hema piştî wê jî tu hatî girtin. Ew qas tiştêk bi êşe ku

êdî dil û bedena min diwestîne. Ez ti carî alîkarî, fedekarî û hevaltiya te ya di rêwîtiya min de dayî min ji bîr nakim. Ez naxwazim ji we veqetîm lê ji bo armanca xwe min êş û xemgînî bi ken daqurtandin. Hevalê min ê Sînan dema min tu oxirê Botanê kirî bi hesta ez ê dîsa te bibînim oxir kir lê nebû.

19 Îlonê 2007

Merheba PKK'a ku jiyanê bi hezkirinê dihûne

Me weke kom çûna xwe wisa hiziribû û xeyal kiribû lê bi agahiya ji ber ewlekariyê wê komek biçûk biçê li ser moralê me hemûyan bandor kir. Dilê me nagire kes bimîne lê em çî bikin şert û mercên objektîf vê ferz dike. Vaye veqetîn hat ber deriyê me. Dema navên ka wê kî bimîne û kî biçê di lîstê de hat xwendin min got qey wê dilê min bisekine. Henasa min qut dibû, weke bi ser pira siratê re derbaz dibûm. Dema nav dihatin xwendin min çavên xwe girtin, dema navê min hat xwendin min henaseyek kûr kişand. Ez li ser navê xwe pir kêfxweş bûm lê ji bo yên dimînin jî pir xemgîn bûm. Derûniya hinek hevalan ranekir ku xatirê xwe ji me bixwazin. Her kes dixwaze derfetên herî zehmet berî hevalên xwe bijî, ger şehadet çêbibe dixwaze vê berî hevalên xwe pêşwazî bike. Bila hemû êş ji bo min û hemû kêfxweşî jî ji bo hevalên min be. Berpîrsên komê heval Delîl Çinar, Ruksen Efrîn, Rojhat Markoz, Hewrê û birêz Marya Umud. Yekîneyek biçûk e, hemû heval ji hev hêjatin. Di meşa me ya destpêkê de heval Ruksen û Rojhat nexweş ketin. Hevala Ruksen zû sax bû. Nexweşiya hevalê Rojhat berdewam dike û ji bo em xemgîn nebin jî dibêje; ez baş im, tiştê min nîne lê ji rewşa wî diyar dibe pir nexweş e.

Ji bo min hevaltî tiştê pîroz e. Dixwazim vê hezkirinê berz bikim. Ez ji bo vê dijîm, ji bo bedewiyê bafirînim. Ez xwe di gelek alîyan de lêpîrsîn dikim, dê ev lêpîrsîn min bigihîne hezkirina rast.

22 Îlonê 2007

Merheba Mizgîn giyan

Ev çend roje em li wargehê dimînin. Derdora vê wargehê bi giran dorpêç kiriye, giya zer bûye lê çend kanî hene. Li van deverên şil giyayê şîn diyar dibe, di nav giyayê zerbûyî de ev şînkahî dilê mirovan şad dike. Ev der ji min re pir bê deng tê û nepenîbûnê hîs dikim, heyv jî pir xweş xuya dike. Çiya li gel min hestên pir cuda ava dike, peyvên ku bikarim hestên xwe pênase bikim nabînim. Ya rast ev jî dibe, dibe çavkaniya xwe ji kêmbûna xezîna min a peyvyan bigire.

Sprûzek çêbû û dê tima me ya din jî were. Bi vê agahiyê em gekel kêfxweş bûn. Hevalê Delîl hevalek pir hestiyar e. Ger te ew di nêz de nas nekiribe pir sar diyar dibe lê dema tu pê re di nav diyalogê de bî tu fêhm dikî ne wisa ye, kesayetek bi hevaltiya xwe ve girêdaye. Heval Hewrê hevalek zekî, kêrhatî û têgihîştî ye. Tevî hevalek nû ye jî di gelek aliyan de xwe pêş xistiye û di nav malbatê de bi perwerdeyek baş re hatiye mezinkirin. Hevaleke ji rêzîbûnê hez nake. Zarokê malbatê yê destpêkê ye û li xwîşk û birayên xwe nêriye, vê jî hiştiye di wî de feraseta berpirsariyê pêş bikeve. Di warê leşkerî de jî baş e. Aliyê hevalê Rojhat ê leşkerî di pêş de ye, bi coş û wêrekiyek mezin nêzikî her tiştî dibe. Ev rihê wî yê şerker, dihêle wî her tim zindî û tevger bigire. Hêrsbûna wî ya pêşketinê li pêş e, di hevaltiya xwe de jî pir fedakar e, girêdanbûna wî ya rêxistinê hiştiye bikeve bin berpirsartiyê û bi ezma divê ya herî baş bike nêz dibe. Ez û heval Ruksen jî di wê baweriyê de ne em ê di vê rêwîtiyê de alîkarî bidin hev.

Şehadeta hevalê Sînan ji kûr de dilê min birîndar kir. Vî dijmînê bi nallet jiyankirina wî zêde dîtî û şehîd xistiye. Ez naxwazim ji şehadeta te bawer bikim. Em nûçeyan li ser radyoyê dişopînin û çapemeniya dijmin dibêje; li Kato 11, li Zagrozê jî 14 heval şehîd bûne û windahiyên xwe jî dide. Ji bo KTê mirina nîrxa leşkerên wî bi qasî nîrxa pelek cixarê ye. Her roj leşker dimirin lê qet di xema wan de nîne. Ger li metropolan çend çalakî pêk hatiban wê ji bo gel pir baş ba û dê gerîla jî hinekê he-nase girtiba.

Fermendarê vê wargehê heval Cemşîd, hevalê Dilgeş nas dike û me bi wî re gelek nîqaş kir. Bawerim niha guhên wî dike zinge zing. Hevalê min ê Dilgeş, ew qas tişt hene bi te re parve bikim ku nikarim vebêjim.

Xwezî te zanîba çiqas dixwazim bi te û hevala Arjîn re parve bikim. Dixwazim mîna canîkan bi qasî bikarim baz bidim û bi qasî bikarim qêr bikim. Lê wisa diyar dibe zarokê di dilê min de bê ku bikeve nav ti qalîban dixwaze bi xwezaya xwe re bijî. Ma çawa ji te re vebêjim hevala min a hêja? Piştî westandina bi bezê re çongek ji dil ku bikarim serê xwe danîm ser dixwazim. Dibe ev rewşa min a ruhî seyr were lê bawer bike ez bi hîskirin dijîm.

Çi seyre, piştî demek dirêj şûnde min dayîka xwe di xewna xwe de dît. Dayîka min bi bizavek lez hatiye min bibîne, hema ez rewşa bavê xwe pirs dikim û ez fêm dikim bavê min qirîza dil derbaz kiriye. Bi awayek matmayî dibêjim; mane nexwaşiya bavê min a dil nebû. Hema di kêliyê de li gel min hesta ev demek çiqas dirêje ji malbata xwe dûr mayîme pêş dikeve. Piştî wê bi dengê hevala Ruksen a got; tu nobedarî şiyar bûm. Hêvî dikim bavê min nexweş neketibe.

24 Îlonê 2007

Merheba Mizgîn giyan

Guhertinên di xwezayê de min pir bandor dike. Tu li çiyayekî dinêrî, di nav tarîtiyê de li serê çiya ronahiye mîna şîr spî dike dibînî, ev ronahî te ber bi xwe ve dikîşîne. Çavê te jê nagerin, bi mereq berdewam lê dinêrî. Bi carekê çî bibînî, giloka agir bi heybet serê xwe ber bi asîman ve bilind dike, mirovan mest dike. Her kes li gorî hêza xeyalên xwe dinirxîne, dişibîne hinek tiştan lê ji derveyî hemû nirxandinan ronahî li ser erdê bi kenê xwe re li asîman digere. Dema heyranî lê dinêrim vê ferq dikim; min çiqas bêriya hilhatina rojê û avabûnê wê kiriye. Îsal derfetê min ê bi rojê re li ser lûtkeyan hevdiştin pêk bînim nebû. Ez îsal hema di newlan de mam. Her carê weke nû dibînim dikevim kelecane. Dema her hilhatin dibe girjîneyek nû ya zildayînê her avabûn jî xemgîniyê li ser cîhanê belav dike. Bê gûman li pey xwe ronahiya xwe ya hêviyê dihêle û dibêje bi xatirê we. Di nav gotina bi xatirê te de heyv silav dide mirovan. Gerîla parçeyek xwezayê ye. Xweza bi mehdara dayîkekê û jidilbûna dostekê re bi eşq gerîla diparêze. Gerîla jî evîna jiyanê ya xwezayê rakêşwer û xweşik dike ye. Gerîla bi eşq xweza, azadî û jiyanê hembêz dike.

Di van şevan de heyv û stêrk dilopên sohbetên me ne. Ya rast navê her stêrkekê mereq dikim, her çendî navê hinek stêrkan bizanim jî lê ji lêgerîna me ya fêmkirinê re nabe bersiv. Me nav li gelek stêrkan kir lê me kir û nekir navê stêrka destpêkê çêdibe nehat bîra min.

Tenê du hevalên jin li cihekî mayîn çiqas zehmet e. Belê, cara yekem demek wisa dirêj weke du hevalên jin li gel hevalên xort dimînin. Em li Başûr her tim bi awayê boluk, taxim û tîm diman. Em du kesin, bi taybet di mijara serşûştinê de zehmetiyan dijîn. Li vir zêde derfet dest nadin. Me duh weke tîm nan çêkir, nanê me weke me dixwest xweş derneket. Piştî çêkirina nan me xwe avêt serşoyê. Paqijbûn rihê mirovan pak dike. Qirêjî rihê mirovan diwestîne. Piştî serşûştinê xwe weke çûkekê sivik hîs dikim.

Xeta em ê tê re derbaz bibin operasyon heye û di bendewariyê de ne. Ez bi hevalê xwe yê Mazlûm re li dû hev rêwîne. Em xwîşk, bira û di heman demê de hevalên xwe yên hêja li Başûr dihêlin û diçin. Hevalê min ê Mazlûm ciwanek pir cuda ye, ger tiştek li wî were ez ê nikarim rakim. Rastiya şer cuda ye, her kêlî çî rû bide nediya e lê dîsa wê ji min re pir giran were.

26 Îlonê 2007

Roniya min î

Dema dilê min li ber bahozaan dikeve, li te digirim

Min bigire û bibe warên dûr

Warên kesek nikare xwe bigihîne

Xeyalek wisa dikim

Jiyanek bi rengê şîn e

Cîhanek kirêtî lê najîn

Dilê min

Jiyanek bi keskesorê re direqise dixwaze

Xeyalên min rêwiya şevên bêdengin

Dosta min,

Dibe tu min seyr bibînî

Lê çi bikim

Rihê min hîn jî zaroke

29 Îlonê 2007

Merheba hêvî û evînên nîvço mayî

Dilê her gerîlayekî bi hêvî û evînan dagirtiye. Ji bo hêviyên xwe pêk bîne li hemberî êş û zehmetiyên bê hempa li ber xwe dide. Hemû hewldan ji bo jiyanek azad ava bikin û pêşerojek azad diyarî zarokên nû ji dayîk dibin bikin. Bûna şervanek azadiyê yê gelekî bêguman ne hêsa-ne! Kesayet û hestek şahane divê.

Em hîn di bendewariyê de ne. Ev bendewarî derûniya mirovan têk di-be. Hemû rê girtine û rê nade em biçin. Ev jî ne bes e demsala biharê hat, ger wisa berdewam bike em ê ji ber derfetên demsalê nikarin biçin.

Dê duh êvarê komek çûba. Piştî xwarina êvarê xwarin şûnde çenteyê xwe dan pişta xwe. Di dilê xwe de hêvî, serkeftin, hezkirin çandin û li ber çavên me dûr ketin. Dema me dilê xwe bi êşan dipêça bi hatina agahiyekê kom paşve hat vegerandin. Ew du çirke nebû derketibûn, hîn rondikên çavên me zuwa nebibû. Piştî vê atmosfera hestiyar dengê kenê me bilind bû. Em zehmetiyên xwe jî bi ken û henekan derbaz dikin. Mizgîn giyan, dema heval vegeyriyan mîna me bi sanale hev nedîtiye hev hembêz kir. Mirovên di nava PKK'ê de dînen azadiyê ne, ger em dîn nebin em nikarin zehmetiyan veguherînin hêzê. Dijmin xeta me ya derbazbûnê girtiye. Heval berî bikevin pevçûnê paşve vedigerin û agahî didin. Me dîsa di nav bendewariya rojek din de çavên xwe danîn ser hev.

3 Cotmehê 2007

Di payîzê de barana hezkirinê ye dibare

Di gerîla de nîrx û xweşîkbûnek cuda ya her rojê, her şevê û her kêliyê cuda heye. Dilê gerîla yê bi hezkirinê dagirtî jîyanê pir rakêşwar dike. Di şevên payîzê de di bin stêrkan de, li ber agir, li ber çaya germ a demkirî dikevin nav nîqaşên kûr. Di demên berê de bav û kalên me li ber kuçik bi seetan sohbet dikirin, çîrok dihatin vegotin û ev sohbet ew zêdetir nêzî hev dikir. Di roja me ya îro de nêvengên wîsa germ dîtin pir zehmete. Bi taybet di civakê de bi pêşketina teknîkê re, zewq û lêgerînên mirovan jî guherîn. Lê em gerîla her tim sohbetên wîsa germ dijîn.

Hevalê Rojhat Markoz duh şev pirsî û got; di cîhanê de lewirê herî xweşîk kîjan e. Min jî bersiv da û got; xezal e. Dema heval Hewrê û Rojhat gotin; yê herî xweşîk ker e, bi vê feraseta wan a xweşîkbûnê em hemû kenîyan. Hevalan pirsîn û gotin; yê ku herî zêde ked dide ker e, çima rêz ji keda wî re nayê dayîn? Hezkirina hevalan a ker û tevî pir ked dide jî rêz jê re negirtin bi biçûkxistina wî ve girê didim. Heval, a tê çewisandin hildibijêrîn û hez dikin, dema em vê bidin ber mirov divê ne yê popiler, ê ku ked dide û tê çewisandin hez bikin û berz bikin. Ez weke jinekê wîsa dihizirim, di gelek aliyan de ziraviyan dihizirim û nêz dibim. Lê divê darez û nêrînên xwe yên li hemberî ker neguherîm, li gorî keda wî nîrx bidimê.

Heval Hewrê xwe tavêje navberê û dibêje; hûn herî zêde ji çi hez dikin? Bê ku em bihizirin bersiv didin. Hevala Cîhan dibêje; ez herî zêde ji kesk hez dikim, hevalê Rojhat ji agir, hevalê Dalîl ji zerya û hevala Zayneb jî ji xwezayê hez dike. Hevalê Gelî dibêje; ez ji ajokariyê hez dikim, hevalê Yilmaz jî dibêje; ez ji her tiştî hez dikim, di heman demê de ji tiştêkî jî hez nakim. Dema min got; ez jî hevaltî, dostaniyê hez dikim, heval Hewrê got; ew ji ken pir hez dike. Dema her kesê ji tiştên jê hez dikir vedigot li hemberî vê nîrxandî jî pêş diketin. Hat nîrxandî ku, hevalê Gelî pir xwezayî ye, hevalê Delîl ji rastiya xwe dûr e, hevala Cîhan, Zayneb û Denîz jî di bersivên xwe de pir giştî dimînin. Ez kesek ji biçûkatiya xwe de pir nîrx didim hevaltîyê. Hevalê Rojhat Markoz nîrxand û got; bersiva herî xweşe. Li ser girêdana Zerdûşt, girîngî û

balkêşbûna agir a di civaka Kurd de hat nîqaşkirin. Pirs li dû hev tên kirin. Heval Hewrê pirs dike û dibêje; hûn herî zêde ji kîjan rengî hez dikin. Hevala Cîhan dibêje; kesk û heval Rojhat jî dibêje; ji şîn hez dikim. Dema dibêjim; ez jî ji şîn hez dikim, şîrove dest pê dikin.

Şîn azadiyê pênase dike, reş reşbîniyê pênase dike lê gorî vegotina pergalê bi ya min reş gihîştîbûn û hemû rengan di nav xwe de di-hewîne. Piştî wê pirsgirêka welat tê. Bersiva me, em li her devara Kur-distanê bigerin bû. Em derbazî pîşeyan dibin. Hevala Cîhan xwestiye bibe dîrokzan. Hevalê Rojhat û Hewrê jî xwestine bibin pîlot û ez jî dibêjim; min jî dixwest bibim parêzer an jî rojnamevan. Vê carê jî he-valê Rojhat dibêje; parêzer her tim birçî ne lê ez vê şîroveyê na-pejirînim.

Şevên payîzan dirêjin. Pirsên îşev lêhûrbûn di mirov de dan avakirin, ev bi xwe nasîn û zanîne ve girêdayî bûn. Her çendî weke pirsên ji rêzê bên dîtî jî ya rast kesayeta mirov, nêrîn û feraseta wî ya xweşîkbûnê datîne holê. Ev kêliyên bi vî rengî ji bo min nîrxek pir mezin heye. Ez dixwazim van kêlî û parvekirinên bi hevaltî bê ku heval bikevin ferqê bigirim qemerê. Gerîla xwedî binyatek xwerû ye, mirovên paqij û xwerû ne.

Em diçin mangê, dem hîn pir zû ye. Xewa min nayê û li ber ronahiya fenerê dest bi pirtûk xwendinê dikim. Pel û ristên pirtûkê min dikişîne xwe, demjimêr derbas dibe, dilê min çay dixwaze. Dengê hevalên xort tê, ew jî hîn nerazane û di dilê xwe de dibêjim; li şûna min jî çay vexwin. Dengê ewran lêhûrbûna min belav dike û kêr maye dilopên baranê naylonê biqetîne. Di vî dengî de xew kirin zehmete.

Çawa ku sibê radibim xwe didim ber bayê payîzê. Giyayî hişkbûyî bi awayek pir zindî xuya dike, hest bi bêhna axê jî dikim. Henaseyek kûr digirim. Her kes razaye, ez weke xezalan digirim. Van demjimêrên sibê yên zû û van rojên payîzê bi hîskirin jiyîn hestek bi coş bi mirov re ava dike. Divê her sibe van gerên bi vî rengî bikim. Gavên xwe li gorî rîtma mûzîkê bi lez dikim. Di nav vê muwazambûna xwezayê de rihê xwe mîna yê zarokan hîs dikim. Were bayê min ê bi coş, ez bi te re difirim.

Merheba bahoza di dilê min de

Mirov ji bo hinek xeyal û armancan dijî. Di civakê de tê gotin; bila pîşeyek min ê baş hebe, mirovek baş ku pê re bidim û bistînim hebe û malbatek min a baş hebe. Ciwan jî dibêje, bila perê min hebe û ti kes xwe tevî min neke. Ji bo karkerekî tengaviyên xwe yên aboriyê derbaz-kirin girînge. Di xeyalên zarokeke ku di kolanan de dijî bavek baş an jî dayîkek baş hebe. Her tim nêvenga malbatek germ xeyal dike. Jiyan di aliyê jinê de jî weke îşkenceyekê ye, ji xwebûnê derketiye, tiştên tenê di destê wê de hêvî ye. Hinek di encama çavlêkirinê de, hinek jî ji ber sedemên aboriyê tevî nav qirêjiyê dibin û êdî didomîne. Beşek ji wan jî dixin nav vê qirêjiyê. Xala ku ew tev heyf dikin; xwezî wisa neba. Hest û nêrînên van mirovan jî hene lê bi pêşerojek baş hêza xwe bi rêxistin nakin.

Jiyan ji bo me şoreşgeran jî wateyek xwe ya cuda heye. Em ji rêzê nêzî jiyane nabin. Ji bo em jiyane xweşik, azad bikin di nav lêgêrîn û têkoşîna wê de ne. Lêgêrînên me yên jiyane jî bo pêşerojek azad avakirine. Xeyal û hêviyên me azadiya Rêbertî û azadkirina gelê Kurd e. Ji bo em bigihin van armanc û xeylên xwe divê em zehmetiyan bijîn. Daxwazên şoreşgeran ên şexsî jî pêş dikevin lê ev bi rêxistin kirin, daxwaz bi dawazek giştî re, bi rizgariya gelekî re kirina yek girînge. Şoreşgertî kesayetek muwazam dixwaze.

Ez weke mirovek gav avêtiye nav vê şoreş û azadiyê nebesiyên min jî hene. Giraniya pêvajoya ku em di nav re derbaz dibin min tengav dike. Min xwest bi tevîbûna xwe ya gerîla re dozaja têkoşînê berz bikim û êdî ev jî ji lêgêrînên min re nabe bersiv. Du salên din dixwazim di asat herî jor de têkoşîn bikim. Dixwazim girdêna xwe ya bi Rêbertî re bihêztir qêr bikim lê bê encam dibim, tiştên dixwazim ji dem re dimînin û ev windabûna demê min hêrs dike. Rewşa Rêbertî ya tenduristiyê her roj zêdetir ber bi xirbûnê ve diçe. Bi vî şêwazî nabe, tempoya têkoşîna em bi rê ve dibin lewaze. Ji ber vê em nikarin derfetên jiyana Rêbertî biguherînin. Dijmin her tim textîka me mijûlkirinê bi rê ve dibe. Dixwaze me

fêrî jiyanek bê Rêbertî bike, rewşa Rêbertî min pir tengav dike û giran tê. Ji ber nikarim tiştekî bikim jî êdî hundirê min xwe dixwe.

Rêberê min, dixwazim vî giyanî, vî dilî di berdêla jiyanek xweşik de, di berdêla xeyalek rasteqînî de feda bikim. Wijdana min jan dike. Tehmûla min nîne hûn di nav wan derfetan de bijîn. Tiştek nekirin wê min xilas bike.

7 Cotmehê 2007

Merheba azweriya min a azadiyê

Robar difûrin, lehî serê xwe digirin û diherikin. Hema weke Avaşînê tevahî Kurdistanê hembêz dike bê ku li dû xwe binêre. Dilê me yê gerîla jî îşev mîna sûlavan bi coş dibe. Dê îşev Mem û Zîn, Ferhat û Şîrin şahidiyê ji ghiştina şervanên azadiyê ya bêrî û azweriya xwe bike.

Piştî çend mehan kêliya em li bendê bûn hat. Min îşev hemû xemgîniyên xwe, pelên payîzê ji bîr kirin. Mizgîn giyan, ev demek dirêje dixwazim bi te re parve bikim lê niha ez li ser destpêka riyekê me. Ez qet naxwazim tiştek li ser vê şeva xweş bibe sîber lê teqez ez ê rojekê ji te re vebêjim.

11 Cotmehê 2007

Merheba dilê min ê dildarê hevaltî û mirovahiyê

Dijmin paşvekişiya lê niha jî Cejna Remazê ket navberê, li hemberî çûna me bû asteng, pirs nekin çawa çêbû, vaye bû. Ji ber Cejnê milîsê dê hatiba me biba nehat. Lê em çiqas kêfxweş bibûn, heta em wisa hiziribûn em ê demek dirêj çay venexwin ji ber me tonek çay vexwaribû.

Li hemberî dijmin zêdetir bi hêrs dibim, em di welatê xwe de jî weke biyanî û dizekî bê deng digerin. Li her derê sînor hatine xêzkirin, cîhan beş beş kirine û parçe kirine. Ez jiyanek ji derveyî sînoran digirim, ji ber vê ev qas dildara gerîla me. Ya herî girîng sînorên me mirovan di hizir û hestên xwe de avakirin e. Em ji hev re ji hişmendiya xwe ya paşmayî sînorên wisa ava dikin, hinek caran em jiyanê tînin rewşa nayê jiyînê.

Jiyana PKK'ê pîroze, em nîrxê vê pîrozbûnê nîzanin û aliyên xwe yê azad bibin req dîkin. Hinek caran em nahêlên mirovê li kêleka me pêş bikeve, wê jî dişibînin xwe, em şibandinek li gorî pîvanên xwe ava dîkin. Ger li gor me çênebû jî, cuda be em wê deh caran jovan dîkin. Ev aliyên xwe yê xwe nenas ango nexweşiyên me tevgerê jî tengav dike û dixitîmîne, hilberîn û afirandin pêş nakeve. Xwezî her mirovek di zanabûna nêzîkatiyên xwe de ba. Ez her tim xwe di van mijaran de digirim dest. Ma ez ê çima hinek kesan bîsepînim, ma çima hinek kes wê li ser nêrîn û hestên min sepandinê çêke? Azadiyê ji van rastiyên tî jiyîn qut nagirim dest. Bi qasî min sînorên kor ronî kir ez ê azad bibim.

12 Cotmehê 2007

Merheba rêwîtiya me ya dildara azadiyê

Niha di van kêliyan de bayek sar xwe li dor bedena min pêçaye. Pora min li ber bayê difire û lêvên min zuwa dibin. Di van kêliyan de li hemberî çiyayên Bakûr li ser lûtekya çiyayekî rûniştîme, li bendêne ku tarîfî bikeve erdê. Hemû hevalan xwe bi çiqilên daran nixumandine. Bê ku em Kemal Sunal bi bîr neyînin nikarin derbaz bibin. Kemal Sunal mijara me ya henekê ye. Me hemûyan jî çiqilek darê yê mezin girtiye destê xwe û li hev dikevin. Ya rast hîn gelek aliyên me vekirîne. Ez li kêlekekê rojnivîs dinivîsim.

Pîştî çend rojan şûnde merheba

Dixwazim ji cihê mayîm dîsa dest pê bikim. Me sînor derbaz kir û bi gavên lez gihiştin ser axa Bakûr. Qadek bi xetere, barê me girane lê bê ku em giranbûna bar bihirizrin divê em bimeşin. Ez bawerim ev lûtkeya em hilkişîne ser pezkovî jî nikarim bi vir ve hilkişin. Cihên ew qas asêne ku bi barên li ser piştê xwe ve mîna meymûnan dimeşin. Hevalên ku zehmetiyan diji hene, barê heval Ruksen û Zeyneb hat sivikirin.

Êdî em li Bakûr in, divê em li gorî şert û mercên Bakûr tevbigerin. Ji ber hinek hevalên komê nexweş ketin em giran tevdigerin. Di nav tarîtiya şevê de di bin ronahiya qereqolan de gundan li dû xwe dihêlin û westandina xwe li ber kaniyekê derbaz dîkin. Ji bê xewiyê çavên min

dişewitin. Piştî me bêhna xwe vekir dîsa bi rê dikevin. Hevalê Delîl û Hewrê nexweşin lê vîna xwe pir tengav dikin. Ez jî li dawiyê dimînim, ez û hevalê Hewrê bi hev re dimeşin. Bi gavên giran giran dimeşin. Ev rê jî xilas nabe. Ji rika hemû zehmetiyan di bin barana dibare de digihin wergeha xwe. Her hevalek li ber darek, li ber teraşekê ji xwe re cihekî dibîne û radize. Lê di vê palê de cih dîtî pêkan nîne. Rêzanê me pir fedakarin, di mijara cih çêkirinê de alîkariya hevalên jin dikin û destpêkê jî ew noberdariyê digirin. Ji ber westandina şev laşê min jan dike. Baranek hûrhûr dibare, barangirê xwe dikişînim ser xwe û çeka xwe dixim bin ewlehiyê. Bi dengê hevalê Qehreman şiyar dibim, ez nobedarim. Rêzanê me agir hil kiriye, banî me dike û hema em li derdora agir xelekekê çêdikin. Di meşa duh şev de hevalê Rojhat Markoz fedekarê komê bû. Tevî barê wî pir giran jî bû çekên hevalan radikir. Ji ber mirov xwedî hevalên wisa nin pir bi şanse.

Em êdî li qûntarên....in. Cihek gelek ji me mereqa wê dikin, dibêjin cihek pir zehmete û em ê jî di vê riyê re derbaz bibin. Em demjimêr di 13.30'an de bi rê dikevin. Rê her evrazî bû, ji piştî me dilopên xwêhdanê tîn xwarê. Dema çenteyên me xwêhdana piştî me weke sînge-rekî dikişîne xwe xwêhdana li ser eniya xwe jî bi destmalê paqij dikin. Di vê meşê de yê li pêşiyê dimeşe hevalê Fuat e. Hema zû dixwazim ji ava ku me weke tedbîr li gel xwe anî xilas bibim. Bi taybet, li ser piştî min giraniyek wisa çêdike nikarim pênase bikim. Ji bo avê nedim kesekê hevalê Fuat ez hişyar kirim. Av mirovan ji hal dixê. Hişyarî di cihê xwe de bû, hevalan jî ev kir mijara henekan. Em vê riya bi navûdeng xilas dikin, bayek ne ji rêzê tê. Em li jêr dinêrin mat dimînin û dibêjin; ev em in bi vir ve hilkîşin.

Min navê komê kiriye teyrê baz. Weke teyrê baz firiyan û veniştin ser vê lûtkeyê. Min dixwest van gelî û çîyan bi qêrîna xwe ya azadiyê vebêjim lê di dilê min de ma. Hevalê Çiya yê ku em pêşwazî kirin pir germ nêz dibe. Hema me dibe hundirê şkeftek bin erd. Ji bo me dilxweş bike hemû derfetên xwe seferber dikin. Ji serma destên min direcifin, neçarim navberê bidimê. Em ê îşev demjimêr di 02.00'an de bi rê bikevin, ber bi Kato Jirka ve bi rê bikevin.

Merheba evîna min

Min duh şev gotibû em ê bi rê bikevin lê baranê rê neda û me di cihên xwe yên germ de şevêk din tama xewek rihet girt. Bi berbanga sibê re karê me yê destpêkê çay çêkirin bû, di aliyekî de çay çêdikin, di aliyê din de jî xwe germ dikin. Bêguman agirê guniyan weke yê daran nîne lê li vê derê ev dîtî jî mucîzeyeke. Em li vir avê bi îdare bikartînin, em kêmekê qirêj bûne. Porê me jî qirêjê nayê şekirin lê ne girînge, ka em vê rêwîtiyê bi encam bi dawî bikin. Di vê şefeqê de koma Amedê ji bo me sprûzek xweş çêkir. Dema me ew dîtî em matmayî man, ev qas em ne li bendê bûn. Riya dû şevan di şevêkê de derbazkirine û hatine. Rû bi rûyê dijimin hatine. Tarzê gerîla yê tevgerkirinê pêkanîne û bi serkeftî xilas bûne. Jimara wan ji ya me kêmtire. Hevalên jin ji ber şert û mercên payîzê yên hewa û ewlekariyê derxistine. Dubare hevalên di koma Amedê de dîtî pir baş bû. Piştî nîvro koma me bi rê dikeve. Berfek tenik dibare û piştî wê vediguhere baranê. Ewr û bager bê navber li hev dikevin, baran ji bo bibare li ber xwe dide, bager jî ewran ferz dike û herî dawî bager ji me re dikene. Baran radiweste.

Em ê îşev di şkeftê a li hemberî Kato Marînosê de bimînin. Her hevalêk dibeze karekî, hinek bi nobedariyê re mijûl dibin, hinek bi xwarinê re û hinek jî ji bo binê mangê giya kom dikin. Em jî diçin avê û guniyan kom bikin. Li ber bayê bi awayek dîn û har tê gunî komkirin zehmete, divê em guniyên zuwa kom bikin. Dema kom dikim dikevim nav kûraniya bîranînên xwe yên Çarçêla. Dema min nû dest bi gunî komkirinê kir çiqaş teng dibûm lê piştî wê min bi zewqek pir mezin kom dikir.

Mange tê raxistin. Wisa diyar dibe ku weke li erdê mînderên ji pembû hene, destê hevalê Hewrê sax be, pir zêde giya kom kiriye. Hevalê Rojhat wisa dihizire ava ku me aniyê em bi îdare bi kar nayînin hema radi-be bîdonek avê vedişêre. Bêguman pêşeroj hizirin başe. Di nav komê de ya herî zêde avê bi kar tîne ez im. Divê ez xwe fêrî bê avî û qirêjbûnê bikim. Dema me rojek wisa bi dawî kir, hestên min weke pêlên deryayê difûrin, pir şadim, ez li gel mirovên ku nirx didim wan im. Şevbaş Mizgîn giyan.

Merheba dilê min ê ji kulîlkên çiya jiyanê mezin dike

Pîştî şevê sir û seqem em ê bi rê bikevin. Dil û sohbetên me yên germ sermayê weke mûmekê dihelîne. Em weke civata stêrakan rûniştîne û ji xwe re lîstok dilîzin. Peyvekê ji tîpa dawîya navan çêdikin. Peyvên gelek dewlemend derdikevin holê, hevala Zeyneb û Hewrê bi Kurdî û Farsî dibêjin, em jî bi Kurdî Tirkî dibêjin. Di dawîya lîstoka me de yên neşewitîn herdu Rojhat bûn.

Pîştî nîvro koma pêşiyê derdikeve, piştî wê jî em derdikevin. Em bi koma Amedê re dibin yek, ber bi Kato Marînosê ve rêwîtiya xwe berdewam dikin. Heval ew qas xweşik dimeşin ku nikarim bi lêv bikim. Rûyê xwe yê mîna heyvê, gerîla van çîyan zindî digire, ev meşa gerîla ya wisa li pey hev û rêz bi rêz gelek bi kêfa min tê. Bi gewrbûna berbanga sibê re talimat hat dayîn ku divê koma Amedê vegere Başûr. Tevî îsrara hemû hevalan lê dîsa jî biryar nehat guhertin û wan bi awayek dilşikestî, çav şil xatirê xwe ji me xwest, bê ku bixwezî ji me veqetîyan. Lepik û çîkolatên li gel xwe anîbûn didin me. Ji ber dûrbûna Amedê û şert û mercên payîzê kom bi paşde tê kişandin. Di tarîtiya şevê de goştinê serkeftin riya me ronî dikin.

Kato pir bilinde, ev der hemû qeşa girtine, em mîna penguwanan dimeşin. Ger tu van deran nas nekî tu yê hema winda bî. Her der dişibe hev û tam weke qelayan e. Em digihin wargehê. Ji ber operasyon derketiyê hêza Colemêrgê wargeha xwe guhertine û kes me pêşwazî nake. Ne ava me heye ne jî erzaqê me. Piştî nîvro rêzanê me dikeve tevgerê, wisa diyar dibe em ê çend rojan li Kato bimînin. Li Kato mayîn û têkoşîn kirin vîn dixwaze, li vir her tişt bi vîn tê kirin. Her ji ber çî be em li vir dîsa rastî taybetmendiya zazonan a jêneger tên. Hevalên xort rihên xwe berdane, ji sermayê rûyê wan şewitiye. Li Çarçêla her tim hevalên xort rihên xwe berdidan û me hevalên jin jî ew rexne dikirin.

Em xwe li ser axa rojê hembêz kirî dirêj dikin, bedena me germahiya rojê hildimje. Li vir rojên me di şeftan de derbaz dibin û hemû amadekariyên xwe em bi xwe dikin. Kêliyên ku jiyana me weke robarekî dihe-

rike, di nav vî robarî de pêla min çawa pêş dikeve? Piştî salan hatina min a Bakûr ji bo min nirx û wateyek xwe ya dîrokî heye. Divê xwe li ser binyata van nirxên bi esîl ava bikim, li derdora xeyal û hêviyên xwe xeyalên xwe bihûnim. Divê xwe bigihînim kûrbûna rastiya Rêbertî, aliyên xwe yên nebes di vê rêwitiya hêviyê de derbaz bikim. Divê her milîtanek PKK'ê xwe her tim lêpirsîn bike. Ya rast pirsgirêk tenê bûna milîtanek PKK'ê nîne, pirsgirêk te çiqas serxistiye ku bibî mirovek bi erdem an na. Em xwe ji paşverûyên civakê paqij nakin, ji ber vê em nagihin qata erdembûnê. Em gava destpêkê tavêjin lê her di wê gavê de dijmêrin. Ji Katoyan bi hezkinên xwe.

17 Cotmehê 2007

Merheba Mizgîn giyan

Li Kato jiyan berdewam dike, tevî hemû zehmetiyan dîsa henekên xwe bi jiyanê dikan. Berfê mîna perdeyek spî Kato nixûmandiye, deşt ripûreşin. Hema demek berê demekê dixwazim biçim cihê xwe yê li deştê. Di vê demsalê de li Kato mayîn tê wateya bi rêgezên xwezayê re liyîstin û li hemberî rêgezên xwezayê derketine. Bi armanca em dîmen nedin her tim di hundirê şkeftan de dimînin. Ji ber hewa bi ritubet e dest û rûyê me diwerime. Di vê rêwitiyê de wata û nirxa her zehmetiyekê heye. Lê ez qet fêrî qirêjiyê nebûm. Ev qirêjî derûniya me bandor dike. Pora min ji qirêjê bûye demûş, êdî naxwazim şe bikim, ji qirêjê diwere.

Her çendî veqetîn min bêşîne

Di nav tenêbûnê de bifetisim jî

Bila rêya te vekirî be

Hezkin

dostanî di nav êşan de tê mezinkirin

Tu dilê min

A di rêwitiya hêviyên min de

Di nepeniya li ser rûye avê neketî de

Merheba Mirovê Zana yê azadî diyarî mirovahiyê kirî

Ez nizanim ez ê çawa hestên xwe bi lêv bikim, di vê rêwîtiya hêviyê de hûn di xewnê de jî dîtî hestek pir cuda ye Rêberê min. Di bin keviyek li ser lûtkeyên Kato we moral da min. Ez nabêjim xewne û hema derbaz bikim, mesaja we dayî min çî bû şirove dikim.

Rêberê min, em li Stembolê li cihê Kapaliçarşiyê bûn. Ez çend metre-yan li dûrî we bûm. Qerebalixek pir zêde hebû û li pêşiya we madeyên teqmeniyê yên dişibayan moltofan hebûn. Hemû camên maxazan şikes-tibûn, girseyek pir mezin derdora we dorpêç kiribû. Min hûn di nav wê komê de didîtin. Piştî wê min di seyarê ji bo kêmendaman hatibû çêkirin de zarokek didît. Min mereq dikir ka çima ew zarok li wê derê ye û piştî hevalekî digot; ji bo kes Rêbertî nas neke ew zarok danîne wê derê. Dema em wisa daxivîn qerebalixek çêdibe û her kesê ber bi wî alî ve baz dida. Ez baz didim û tîm gel we, seyarê digirim. Dixwazim we biparêzim lê dinêrim ku hûn ne di hundirê seyarê de ne, tenê zarokek heye. Ez wisa dihezirim ku heval textîk pêş xistine hûn xistine bin ewlehiyê ji ber wê wisa kirine. Piştî wê şiyar bûm Rêberê min.

Rêberê min, hûn rastiya jiyan û têkoşîna min nin. Ez çiqas zehmetî bijîm jî ez ê ti carî dev ji ezma xwe ya têkoşînê berendim. Ez ê li ser bingeha rastiyan min ji vê tevgerê fêhm kirin û bawer kirin bijîm. Girêdan, bawerî û lêgerînek rast wê min bi rastiya PKK'ê re yekpare bike.

Di vê demsala payîzê de rêwiyên rojê ne

Piştî bendewariya bi rojan ber bi Kato Jîrka ve bi rê dikevin. Bîranîn û tiştên me li Kato Marînosê jiyane di boxçika dilê xwe de vedişêrin, ji lûtkeyan ber bi deştan ve gav davêjin. Her ku dadikevin jêr, bayek têngerm xwe li rûyê min dide. Ji ber ev bi rojane em rûniştîne zehmetiyan

dijîn. Hema çawa ku me navber dayê her kes dest bi kuxe kuxê kir. Ji bo deng dernekeve xwe tengav dîkin lê mixabin vala ye. Heyv şahidiyê ji vê meşa me re dike, şevê gelek romantîk e. Lê belê zelalbûna heyvê xetirîya xwe ji bo me heye. Li hemberî heyvê tedbîran digirin û riya xwe berdewam dîkin. Bi dûrbîna şevê me çavdêriya arazî kir û em wisa meşîn. Riya îşev rihet bû. Em digihin cihekî rûdinin, em ê îşev li vir bimînin. Cihê me zuwa û germe. Hema zû lîsteya nobedariyê derdixim û dest bi nobedariyê tê kirin. Hewl didim birazêm lê xewa min nayê. Nobedariya hevala Cîhan jî xilas dibe, hevala Ruksen radike û li şûna lîsteya nobedariyê kaxeza şekir dide û dibêje; hevala Marya ev daye min. Her çendî dibêjim; min lîste daye te jî lê nikarim bi heval bidim fêmkirin. Ji bo ku pirsgirêk dernekeve zêde dirêj nakim. Lê dema sibe destên xwe di berîkên xwe de digêrîne lîsta nobedariyê dibîne û ez jî bi vê dîkenim.

26 Cotmehê 2007

Merheba ya ku dilê wê dîlgirtî

Em şev û çîyan li dûv xwe dihêlin û gihiştin...yê. Îşev barê me pir girane, em ji bo hevalên birîndar ên Bestayê derman dibin. Ji ber barê giran piştam min mehf bûye. Em li wargeha şehîd... Bêhna xwe vedîkin û demjimêr di 04.00'an de bi rê dikevin. Rêwîtiya me ya bi xirûciran dest pê kiribû bê kêmasî bi encam bû.

Hevala Ruksen li dawî maye, hevalê Delîl jî bi wê re maye. Heta ku agahî ji rêzan re hat şandin heval tevlî reşahiyê bûn û çûn. Hevalê Delîl berpîrsê komê li ser bêtêlê ne bi navê qod bi navê rêzan bi xwe banî wî dike, hevalê ku rêzanê me ye jî dibêje; bi qodê min banî min bike. Dema mijar tê fêmkirin hema hevalê Rojhat dikeve navberê, cihê ku em lê ne vedibêje. Ji ber li ser bêtêlê axaftin di warê ewlekariyê de baş nîne, fîtîk dikevin navberê, bi riya fîtîkê hewl tê dayîn bi rêzan re bikevin pêwendiyê. Dengê fîtîkan bi dengê wîzîniya bayê re winda dibe. Herî dawî hevalê rêzan ji fîtîka bi hêz fêm dike ku em li ku derê disekin. Em henekên xwe dîkin û dibêjin; koma çekên giran li dawî maye. Kenê min tê lê nakenim.

Divê kom bigihe cihek bi ewle. Bi vê tempoyê nepêkane em bigihin Katoyê Jîrka. Ji bo ewlehiya hevalan hevalê Delîl çente dixwaze û hevala Zeyneb çanteyê xwe didê. Êdî tehmûla hevalê Delîl namîne û nîqaş derdikeve. Şeva ku me bi ken dest pê kiribû divê bi nexweşiyek wisa re bi encam neba. Bi awayek ji hev qut me meşa xwe berdewam kir. Hevalê Hewrê ji bo me li dawî maye, li ser vegotina xwe ya muwazam em xwe digihînin tehtên mezin. Hevalê rêzan tê pêşiya me. Em digihin wargehê. Hevalê Fuat û Rizgar ên li pêşiyê hatibûn çay çêkirine, piştî westandinek wisa çayek vexwarin pir baş dibe. Her çendî hemû westandina min negire jî kêmekê sivik dike. Ez nizanîm ez ê çi nav li vê rêwîtiyê bikin lê tenê bi gotinekê kembax bû.

28 Cotmehê 2007

Merhaba ya ku dilê wê li ber bawezîna payîzê tê kişandin

Rêwîtiya me bi hemû leza xwe didome. Em gihiştin Kato Jîrka. Ev der navê xwe ji eşîreta vê herêmê digire. Min ji Kato Jîrka hez kir, aliyeke wê yê ku mirovan dikişîne xwe heye. Berî vê çend rojan li vir operasyon derketibû û 7 heval şehîd ketibûn, 2 jî radest bibûn. Berî vê jî operasyon derketiye, li ser keviran şopên gule û hewanan hene. Ji bo ewlehiyê wargehek xweşe lê deşifreye. Mayîna me li vir nebaşe. Rawestgeha me ya piştî vê qada Basta ye. Di vê rêwîtiyê de şansê me yê dîtina gelek cihan çêdibe.

Belê, Mizgîn giyan, ji çavên min rondik tê xwarê, dibe ku tu bêje lewazî ye lê çi bikim êdî dilê min tijî bûye. Nêzîkatî û gotinên hinek hevalan ez pir bandor kirim. Ez ê bêhnfirehiya xwe hemûyê bidim nîşan û hewl bidim van rojan derbaz bikim. Di hembêza çiyayên Kato Jîrka de rojên min dilşikestî derbaz dibin, tenêbûna xwe bi spartina çiyaran re derbaz dikim. Ma divê em vî dilê ji pola bihînin? Hinek caran ev dil êdî raneke. Hêza ku dihêle li hemberî van zehmetiyan hemûyê xwe li ser

piya bigirim, baweriya me ya li hemberî xwe û azweriya min a azadiyê ye. Hêza min a ji xwe bawer, hêza serkeftinê dafirîne. Min niha pir dixwest hinek hevalên min li gel min bin û vê pêvajoyê bi wan re parve bikim. Tenê xwesteka min çûna Herekolê û dîtina hevala min Arjîn e. Min pir bêriya wê kiriye.

30 Cotmehê 2007

Bi her şeveqekê re rojek nû hiltê

Weke her carê bendewarî berdewam dike. Ev çend rojin em li Kato Jîrka ne û wisa tê xuyakirin ku em ê hîn bisekinin ji ber ku li Besta operasyon heye. Me li Kato Jîrka çavên xwe bi bager û berfê vekir. Vê sibê zivîstanê bi hemû sir û seqema xwe silav da me. Ger em zû negihin Xerzanê dê rê bên girtin û em ê li Besta bimînin. Hêvî dikim wisa nebe.

Şopên dilşikestinê di dilê min de hene lê ez nahêlim ev li ser jiyana min a rojane bandor bike. Bi şev xewkirin û di kêliyên xewkirinê de dengê derdixin serê xwe digêr û diçe. Hinek daxivin, hinek dikuxin û hinek jî weke dengê trenê deng derdixin. Yê ku nobedare û van dengan guhdar dike ji kenan dikeve. Ev deng dibin mijara nîqaşên destpêka sibê.

Li ser lûtkeyên Kato dar nînin lê gerîla xuliqandina xwe bi kar tîne ji darên ku berê li vir hatine şkandin ên mayîn û bi darên du santim derbaz nakin çay çêdikin. Li cihek wisa û di vê demsalê de ev parçeyên biçûk dîtin jî başe. Agir wê jî bê dûkêl e, dema te bi awayek bêhnfireh û ziravî pê xist bi çirûskek herî biçûk re dest pê dike, weke bi leza rîtma jineke balê dike pêtên agir jî gur dibin û hemû parçeyên daran dorpêç dike, di nav sermayê de guriyên agir direqisin. Ev îskanên me yên çay jî temem dikin xweşikbûnek cuda dide. Me şaşalên avê birine kirine îskan, hinek weke bermîlan, hinek jî weke sêniyan diyar dibe. Dîsa di nav îskanan de çay vexwarin tamed xwe ya cuda heye. Yek jî li rex vê penîrê sîrîk ê ku koçeran çêkirî heye. Bi awayek pir baldar hatiye çêkirin. Mirov ji penîr têr nabe, destê ya ku penîr çêkirî sax be. Di çanda koçeran de penîrê bi giya bi navûdenge. Ji gelek cureyên giya sûd digirin. Li kêleka vî penîrî divê penîrê Amedê yê bi kezî jî heba. Bi qasî min

jiyana rojane ya Bakûr şopad pir zêde savar tê bikaranîn. Li Başûr herî zêde birînc tê bikaranîn, li vir jî savar. Dema ar nebe hema savar tê çêkirin û tama wê jî pir xweşe. Ya rast di nav vê heybetbûna çîyan de tama her tiştê xweşe û ya herî girîng jî nirxa mirov heye. Girêdana hezkirinê ya bi hêz heye. Ji jiyana gerîla pir hez dikim, ev roj jiyîn gelek watedare.

31 Cotmehê 2007

Merheba dilê min ê hewla jiyane ji nû ve dafirîne

Duh li ser ligan jî be min bi hevalê Delîl re nîqaş kir û vê nîqaşê dilê min bêhnfireh kir. Ez hevalê Delîl li Zagrosê nas dikim. Ji min re got; divê tu dudiliyê neji lê ger di tevlîbûna jiyane de hinek mijaran hesab bikî û wisa tevlî bibî wê baştir be. Dilê min hinekê rihet bû, herî kêr heyîna kesê mirov nas dike başe. Ez pir ji vî aliyê PKK'ê hez dikim. Her çendî hinek tişt dereng jî be rastî li ser rûyê avê dikevin. Ez ji vê mijarê vî tiştî fêm dikim; nirxa tu didî mirov divê zêde nedî der.

Di vê demê de xebatên rêxistinî nehatin bicihanîn. Lewma seknek belav derket holê û vê jî di giştî de xwe da der. Ji ber fermanîdarên tîme rista xwe nelîstin û xwe di rêşbîniya xwe de sînoordarkirin xemsariyek wisa derxist holê. Min weke qadro û jinekê dizaniya divê tekmîlên xweser bînin girtin û nîqaş pêk werin. Lê ji ber rewşa fermanîdar a ruhî û asta wê ya ferasetê di wateyekê de min xebatên xweser ên werin kirin vala dîtin, ji ber ku li hemberî rexneyên ku min dikirin hincet pêş dixistin û her her tim ji rastiya xwe revek heye. Li hemberî seknek bi vî rengî nêvengên me yê xweser zerar dibînin. Di tekmîla îro hatî girtin de dîsa ji xemsariyên rêxistinî re hincet hat dîtin û dîsa nêrînen li hemberî min pêş ketin qaşo bi awayek şîyarî hatin kirin. Pir ne girînge, dê ev roj jî derbaz bin. Rojeveke wisa ji rêzê avakirin di aliyê min de windakirina demê ye. Mizgîn giyan, şopên dilê xwe yê bi rojane tê qemçîkirin dixwazim bi rêzkên helbestan bi te re parve bikim.

Li benda min be jiyana nû

Mîna qulinkek birîndar

Di qelîştokên jiyanê de difirim
Êdî baskên min vî dilî ranake
Di nav kolalên bajar de
Di tarîtiya şevan de difirim
Ji bo hemû firdanên min
Berbangên nû hemêz bike
Dilê min dibe hêrs
Di nav teqînek volkanek bê wext de me

Li benda min be
jiyana nû ya bêriya wê dikim
ji bo te her tim singa xwe ji şeran re vedikim
Nebûna te di dilê min de birîneke
Qulîngek birîndarim li vî bajarî
Kêliya digihim te,
Te winda dikim
Û dîsa bê rawest difirim
Ji bo carek din bigihim te jiyan a azad

2 Mijdarê 2007

Dema dil dibin xunçe û dibişkivin hêvî jîndar dibin

Piştî çend rojan ez nû agahiya şhadeta te digirim. Ev xemsariya min a di mijara hevaltiyê de dide nîşan. Min qet nezihirîbû tu yê di demek ew qas kin de şehîd bikevî. Çi seyre, te di mijara ez hişyar tevbigirim de ew qas şiyar kiribûm. Niha ez hatime nîvê riya rêwîtiya hêviyê û dijîm, lê tu

tevlî nav kerwanên şehîdan bûyî. Ev sal ji bo min salek nexweşe, heval û mirovên herî zêde ji wan hez dikim winda dikim. Heval Şiyar, Sînan û piştire tu!

Sal û rojên me bi hev re derbaz kirin, kêliyê li dû xwe hiştin yek bi yek li ber çavên min zindî dibin. Xendeyek li ser rûyê min peyda dibe û piştî wê ew xende di xetên rûyê min de ditevîze. Hevdîtina me ya herî dawî hîna weke duh li bîra min e, dengê kenê te hîn li ber guhên min e. Dê Cîlo bê te çi bike? Ka te yê dîsa li çiyayên Cîlo gerîlatî kiriba. Di nivî de man xeyal û hesretên te. Xeyalên te xeyalên min in, hesretên te hesretên min in, wê nivco mayîn nebin, dê her tişt di herikbariya xwe de bimeşe. Bîranînên we çavkaniya têkoşîna me ne.

4 Mijdarê 2007

Berfînên payîzan

Em xatirê xwe ji Kato Jîrka dixwazin û di tarîtiya şevê de dikevin ser rê. Êdî em derbazî warê ...dibin, rawestgeha me ya destpêkê dibe ew der. Ez berî vê di van deran re derbaz bûme, dixwazim girêdayî wan rojan hinek tiştan bi bîr binim. Dema em xwe berdidin jêr em rastî komeke ku ji eyaleta hundir derbazî Başûr dibin tîn, çend xulekan navber didin. Di van kêliyên kurt de gelek tiştan bi cih dikin û bi hev re nîqaş dikin lê em fêm dikin ku ev çend roje hevalan xwarin nexwariye. Ji ber operasyon hebûye birçî mane, em nanê xwe derdixin û parve dikin. Em weke koma ji Başûr hatine Bakûr, ji koma Başûr re merasîmê çêdikin û bi rê dikevin.

Hevala Zeyneb nikare bimeşe, tempoya me dadikeve, di bin van baran de bi awayek giran meşin weke îşkenceyekê ye. Em hevala Zeyneb dixin pêşîya komê û dimeşin. Ez xwe nagirim, li pişt xwe dinêrim û dibêjim; hevala Cîhan em hemû bûne weke werdekan.

Dikenim, dîsa em ê heta sibê li ser rîyan bimînin. Em derbazî qada têr daristan dibin, ji ber mayîna me ya demek dirêj a li zozanan, di nav daristanê de meşin zehmetiyan dijîn. Bi vebûna hewa re em rojbaş didin hêza biryargehê. Piştî demek dirêj em hevalên jin dibînin. Bi

awayek dilxweş me pêşwazî dikin, hemû jî hevalên nasin. Hevala Nûda, Çîçek, Stêrk, Avyan û Bêrîvan. Piştî me çayek germ vexwar şûnde heval amadekarî dikin û em diçin serê xwe dişon. Rengê me vedibe. Bi çavek roj guhertinên di daristanê de dîtî min dixê nav kelecane, pel zer bûne hinek jî weşiyane. Ev ahenga rengan gelek kêfa min diçe. Bi awayek bêdeng silavên hevala Adar ji şehîd Sorxwîn re vedibêjim.

Di rojeva Bakûr de her tim dijin û operasyon heye. Di vê navberê de civîna xweser tê çêkirin. Tê gotin ez û hevala Cîhan wê derbaz bibin. Piştî rojekê li biryargehê dimînin şûnde derbazî herêma din dibin. Hevala Nûda jî bi me re tê, dê ew jî derbasî Cudî bibe. Ev meşa me ya îşev ber bi heval Arjîn a bi salane min nedîtiye ve diçe. Em digihin yekîneya hevalê Haşim û nobedara ku me pêşwazî dike Arjîn derdikeve. Di tarîtiya şevê de dosta xwe Arjînê di nav qîr û warên hezkirinê de hembêz dikim. Piştî çend salan hevala Arjîn dibînim û hema zû dixwazim bi wê re bikevin nav nîqaşên kûr. Piştî bêhnvedana çend demjimêran radibim dixwazim wext binirxînim û li hevala Arjîn digirim. Ew jî xwarinpêj e, ji ber edamên taximê çûne peywîrê ew jî ji neçariyê bûye xwarinpêj. Kêm jî be em fersenda bi hev re nîqaşkirinê dibînin, bêrîkirina salan di nav çend demjimêran de bi cih dikin, bi bayê payîzê re xatirê xwe ji wê jî dixwazim û xemgîniyek xwe li dor bedenê dipêçe. Li hemberî gotinên hevala Arjîn ên mîna heval Marya şehîd nekeve, ger tu şehîd bikevî ez ê nikarim rakim, ez jî ji wê re dibêjim; tu yê jî hişyar tevbigêrî. Ev gotin dilê min birîn dike. Bêguman naxwazim mirovên ji wan hez dikim bêşînim, ez ê bêriya te bikim, bi xatirê te.

7 Mijdarê 2007

Rêwîtiya me ya berdewam

Baran li ser van pelên zerbûyî dibare, xweza tê şûştin û xwe nû dike. Baran li ser dilê me giran dibe û em dicemidin. Ez li ser a ji niha û pêve dihizirim û dixwazim xwe ji bo ya ji niha û pêve biqewime amade dikim. Di vê navberê de em dibin mijara henekên hevalan. Ger hevala Cîhan nemeşe tê wê wateyê ez ê jî bimînim. Ji ber vê yekê heval dibêjin, pastaporta te di destê hevala Cîhan de ye. Dibêjin, hevala Mar-

ya ne ji bo nexweşiya hevala Cîhan tirsaye, ji bo xwe tirsaye û wisa berdewam dikin.

Tevî hemû tiştî hevala Cîhan dimeşe, ew jî naxwaze bimîne. Ji bo serxistina hemû tiştî em hinek zehmetiyan dibînin, lê pir zêde pirsgirêk nîne. Barê hevalên xort pir girane û ew jî bi zorê dimeşin. Em hatin nêzî Herekolê cihê jê re sêriyan tê gotin sekinîne. Me xwarin xwar û hewl didin razin. Di sermayê de razan zehmete, lê yên dikarin dirazin. Ez û hevala Cîhan dikarin kêmkê razin. Dema em gihiştin deriyê Herekolê ji ber bagerê weke em ê bifirin li me hatibû. Qeşayê hemû der girtiye, yek jî berf bariye. Dema em gihiştin deriyê Herekolê min destên xwe di bagerê de vekirin û da ber qêran û got, Azadî! Rojhat Cîlo yê li pişt min tê dibêje, derew e, lê ez guh nadimê û dengê di hundirê xwe de bi serhildêriya Herekolê re dikim yek. Piştî em seetekê di lûtkeya Herekolê de dimeşin û şûnde digihin wargehek nû. Hevala Hebûn tê pêşwazîkirina me. Hevala Hebûn yeka minyon, bejna wê jî kurt, kumek jî daye serê xwe û tam şibaye zarokek kur. Dema hevala Hebûn ji deriyê şkeftê derket, hevalê Rojhat Markoz wisa zanî ew zarokek kure bi dengeke xwîngerm dibêje; were were, banê gel xwe dike. Dema hevala Hebûn hat ez hembêz kirim, matmayînek bi hevalê Rojhat û Delîl re avakiribû. Dema hevala Hebûn çû bixêrhatina wan jî kir, hevalê Rojhat fêmkir ku hevalek jin e. Ma wê êdî kî min bigire. Ji bo hevalê Rojhat vê rewşê veşêre, vê carê banê hevalê Hawrê dike, lê êdî ew ketibû destê me, çî bike jî vala bû. Hevala Hebûn agahiya wê ji tiştên diqewimî nebû, li min dinêrî, bi vê westandinê ez çima ew qas dikenim. Hevalê Delîl xwe negirt û vê rewşa komîk bi hevalan re par dike, em fêmkirin hinek din jî wisa zanîne hevala Hebûn şervanek nû ye.

Ji ber rewşa hewayê nebaşê û em jî pir westane em biryar didin îşev li vir bimînin. Em pir baş dirazin. Cihê me germ e û me sê batanî avêtine ser xwe. Roja din jî berf û bager rê nade. Em neçarî diçin. Ev heval ji ber me li vir mane, an derfetên zivistanê ji wan re jî zehmet e. Di van deman de kes li van deran namîne. Gotine, vaye em ê îro-sibe dakevin, amadakariyên xwe ji nekirine. Pêlavên wan qetyane û lingê wan ji dervene, goreyên wan qet zuwa nabin. Hevala Dicle û Rojda ji ber vê her tim dicemidin, lê naxwazin em pê bizanin. Tevî hevala Rojda ji milê

fîzîkî ve zehmetiyan dibîne jî bi îdea û biryara xwe niha di nav van derfetên zehmet de bi coş gerîlatiyê dike. Erê, divê mirov ji bo tiştê jê hez dike xwe li ber hemû tiştî bigire. Ez jî amade me di vê riyê de hemû êşan bijîm.

Bagereke metrsîdar heye. Manga me, ango em diçin bin kevirekî, ba berfê hemû tîne hundir. Ji bo pêşiya berfê bigirin hevala Hebûn bi naylonê derî girtiye û roja din jî em bêhna xwe vedidin. Dema em sibê radibin derî hatiye girtin, berfa ku bayê aniye tam diwarek çêbûye. Hevala Dicle û Rojda bi zorê derî vedikin.

Îro hewa pir xweş e. Em tama germahiya roja di lûtkeya çîyan de digirin. Piştî me taştê xwar û şûnde bi rê dikevin. Ji ber hevalê Delîl fêmkiriye ez nexweşim, ji ber vê bar neda û erzaqê rê jî nedaye min. Ev hizirandina wî ez bandor kirim, barê hevalan jî pir giran e, di vê wateyê de ez xwe rihet nabînim.

Dema tav eniya me germ dike, berf jî lingê me dicemidîne. Tevî bi see-tan em di berfê de dimeşin nikarin Herekolê xilas bikin. Ango ew qas cihek firehe. Di vê navberê de dengê helîkopterê tê. Bi carekê tirs dikeve dilê me, ger di ser me re derbas bibe derfeta xilasiya me nîne. Em ê di berfê de wisa bimînin. Lê şansê me heye helîkopter nayê ser me, em jî axînek kûr dikşînin û rîya xwe berdewam dikin.

Piştî vê westandinê em bi guniyan agirek xweş pê dixin. Çay tê çêkirin, qeliya ku me anî jî dixwin. Westandina me namîne, em hemû li derdora agir rûniştine. Hinek gore û hinek jî pêlavên xwe zuwa dikin. Hevalên xort dîsa cihê herî xweş ê şkeftê ji min û hevala Cîhan re dihêlin. Ji ber hundir şil e hinek ji wan li derve radizin. Cihê me zuwaye tenê lingên me dicemidin, lê dîsa em dikarin bêhna xwe vedin.

10 Mijdarê 2007

Riya me kê maye

Em gavên xwe davêjin qadê. Li van deran berf nîne, daristan û lat hene, tam jî araziyeke weke ez dixwazime. Ev der warê min e, ez her gava davêjim hewl didim girêdayî demên borî hinek tişt bîna min, lê ez

arazî nas nakim. Ez cara yek di van deran re derbas dibim, nizanim gundê min jî li kîjan alî ye. Hewl didim ji agahiyên rêzan sûd werbigirim, lê dîsa jî fêr nabim. Çi tiştek bi êşe mirov cihê lê jidayîk bûye nas nake. Piştî salan weke gerîlayekê, weke şervanê gel tîm ser van axan, ez digihim kok û cewhera xwe, tiştên min winda kirî carek din qezenc dikim. Ev der qadeke girîng a Botanê ye, ji ber arasteyên dijmin bi giştî qismê welatparêz koçî metropolan kirine. Ji yê mane jî hinek di halê xwe de ne, hinek welatparêzin û hinek bûn sîxûr û cehş. Divê em pir bi şiyarî li vê derê tevbigerin. Divê kes me nebîne. Di vê navbêrê de ez nikarim xwe ji gotinên hevalan xilas bikim. Di demên derbasbûyî de gundiyan jehir xistine nav xwarina hevalan û heval şehîd xistine.

Ez pir hestên zêde dijîm, ez digihim rûmeta dîtina gelek xweşîkbûnên Kurdistanê. Hewa dîsa xirab dibe, ji ber zilmata tarî em nikarin şev bi-meşin, ji neçariyê navberê didinê. Cihê em lê dimînin pal e. Ez û hevala Cîhan hema li cihekî em lê razin digerin. Em cihekî dibînin, em hema barangirê xwe dikin çadir û li ser yekê jî rûdin. Baran dest bi barîna dike. Hevalê Rojhat Markoz û Hewrê jî cihek bi çadir çêdikin, lê cihê wan çal û xwar e, hevalên din jî wisa li ber baranê hewl didin di kîsê xewê de razin. Şev hemû baran barî, em dixwazin demek berî demekê bibe sibe, lê şev pir dirêjin. Dikin nakin nabe sibe, hemû kesê para xwe ji baranê girtiye, şev hemû heval şiyar dimînin, qet nerazane, kêma jî be em hinek razan.

Bi ronîbûna hewayê re em şiyar dibim, piştî baranê roj li rûyê me dike û hevalê Egîd ê rêzan hema agir pê dixê, em li derdora agir kom dibin. Hilm ji cilên me yê şil bûne radibe. Çadîra min û hevala Cîhan çêkirî pir komîk çêbûye. Yê çadirê dibîne dikene, em jî dibêjin; ji ber me baran zêde cidî negirt, me wisa çêkir. Jiyan bi hemû dilgermiya xwe ve weke robarekî diherike nav dilê me, cihê em lê nêzîkê ye. Her carê gundî tîm û derbas dibin, em jî hewl didin dengê me nebihîzin û me nebînin.

Demjimêrê 11'an. Yek jî em çî bibînin? Koçer li pişt me tîm û hema em xwe li pişt dehlên di palê de vedişêrin, koçer tîm û di ber me re derbas bidin. Keçeke koçer li pêş dimeşe. Zilam jî ji bo hêstiran bi-

meşînin her carê didin ber qîran û dijûnan dibêjin. Li gor gundiyan normale, lê li gor me tiştêk şerme. Lanet be, li vir ev gundî hema dijûnên xitabî dayîkan dibêjin. Ne di zanabûna wê de ne çî dibêjin. Em dikarin xwe nîşa van nekin. Ev der tijî gundî ne. Bi motorê daran dibirin, ji bo gerîla di van daristanan de bi cih nebin taybet van daristanan dibirin, a dikin nebes be yek jî taybet daran ji cihên derbasbûnê dibirin. Em roj hemû dimeşin. Ava me xisal bûye, qirika me ji têhna zuwa bûye, em xwarina nîvro jî bê av dixwin. Penîr jî mirovan tam tî dike. Em pêwîstiya xwe ya avê ji barana şev bariye û li çalên li ser keviran kombûyî digirin, şaşalê xwe tijî dikin û heta em rûyê xwe jî pê dişon. Ez dihizirim pir baş bû şevê din baran barî.

Piştî em roj hemû meşîn, em tîni li cihekî disekin. Em îşev li vir in, em ê sibe ber bi ava mezin bimeşin. Em ji ber xwêhdanê dicemindin, lê cihekî me germ e. Cihê min û hevala Cîhan baş e. Piştî sibê hawirdor ji milê rêzan ve hat raçavkirin agir tî pexistin û em dest bi tevgerê dikin. Cihê me cihek metirsîdar e, em li hemberî gundên Şîrvanê ne. Ev wargeh rêzikan bi me dide pêkanî. Me dijmin û çiya li pişt xwe hiştin û kesekê em nedîtin. Li vir jî em di rewşek wisa de ne şivan û bizinan der û dora me girtine. Em fêman nakin ma van bizinan cihek din nedîtine? Tîni li ber difina me diçêrin. Yek jî ev der latîni çî dibînin fêman nakim. Ji tîrsa wê bizanek were vir û şivanek li dû were, em nikarin bikuxin jî. Di nepenîyan de ketina rê pir xweş e, ger em îşev jî derbas bikin rîya me xilas dibe. Ji niha de min dest bi hizirandina veqetîna ji hevalên di vî komê de kiriye, piştî rêwîtiyek ew qas xweş veqetîna ji wan dê ji min re zor bê. Ne hêsane ku mirov ji hevalên xwe veqete!

13 Mijdarê 2007

Rêwiyên hêviya serkeftinê di dilê xwe de şîni dikin

Piştî hemû amadekariyên me bi dawî bûn, em di nav gund re dimeşin. Nan û şekira me xilas bûye, lê di xema kesê de nîne, ji ber em sax û selamet heta vir hatin. Du rojên me mane ji bo em bigihin gel hevalên Xerzanê. Em di nav gundan re di cadeyan de dimeşin. Ev xeta rê metirsîdar e, em hewl didin şiyar û bi tevdir tevbigerin. Min di “99” an de jî

li vê avê dabû. Ez ji warên Botanê re dibêjim; bi xêr bimînin û ji erdnîgariya Xerzanê re jî dibêjim; merheba.

Hevalê Agir ê rêzan nan û helaw li van deran veşartîye. Nan nabîne lê helawê dibîne. Di rêwitiyan de helaw pir xweş e û enerjî dide. Yek weke min ji şîrînahiyê hez dike ma qey helawê efû dike? Hinek nan li gel me heye, em wî jî dixwin.

Min cara yek ew qas zehmetî di meşe de kişand. Ji ber min kom neçar bû hêdî bimeşe. Hevalan dixwest çente û çeka min hilgirin, lê min neda, lê di dawiyê de min xwe li ber îsrara hevalê Hewrê negirt, min çeka xwe dayê, lê ez pê dihesim ku pir nebaş im. Ev dem pir xirab in. Mirov xwe bê çare dibîne. Hevalê Fuad li dawî bi min re dimeşe, li gor bizava min dimeşe. Di nav komê de yê herî mezin û têgihiştî hevalê Fuad e. Hevalê hewl dide bi feraset nêzî bûyerên jiyanê dibe. Hevalek bêdeng û di mijara ewlekariyê de pir şiyar e. Tevî nexweşiyên hevalê Fuad ên fîzîkî hene jî, min rojekê nedît gazind kir û li pêşiya meşa xwe kir asteng.

Bi vê bizava giran di dawiyê de em îşev gihiştin wargeha em lê bibînin. Min her wisa dizanî Şîrwan mezin e. Em çawa gihiştin wargehê hema min xwe dirêj kir. Ez şev qet nerazam û bawerim min nehişt hevala Cîhan jî razê. Cihê em lê bûn tavê lê dida, ev der germe li gor cihên din. Dîsa hezkirina ma ya agir a ku dest jê nayê berdan dikeve dewrê. Hevalan agir pêxistine û weke stêrkan li derdora wî kom bûne. Ez kêr im û ez jî beşdarî wê kombûna hezkirinê dibim. Piştî ji min re gotin, derbasî be henekan dest pê kir. Ji min re dibêjin; ji ber te pir helaw xwariye tu nexweş ketiyî, ez jî guh nadimê. Ji ber şekir nîne li şûna şekir em çay bi helawê vedixwin. Dema tu ji derve dinêrî lûlkse, lê ma tu yê çi bikî, li şûna şekir tu çaya xwe bi helawê vedixwî. Em heta êvarê li vê wargehê dimînin û bi tariya şevê re dikevin meşê. Ev şev şeva dawî ye. Em gelekî dimeşin lê ev rê xilas nabe. Her çendî hevalê Agir ê rêzan gotibe em ê heta sibe bimeşin jî, lê em hêvî dikin rê kurtir be. Her diçe cade dirêj dibe û diçe, em jî hîn dimeşin. Demjimêr 3'ê 35'an dide nîşa û êdî em nêzî wargehê bûne. Robarek derdikeve pêşiya me, em ê li vê avê bidin û derbas bibin. Dema ez li cemidîna avê dihizirim xwe wêrek dikim.

Em pêlavên xwe yên qirêj dixin berîka êlekê xwe û delîngên xwe jî heta ser çongên xwe radikin. Ji bo em nekevin hevala Cîhan destê hevalê Delîl girtiye û min jî destê Rojhat Cîlo girtiye. Av weke qeşayê ye, ez dixwazim gavên xwe lez bikim lê nabe. Ji ber lingê hevalê li gel min şewitîne nikare bi lez bimeşe û her wiha ti wateya delîng rakirina min jî nema, ji ber ez hemû şil bûm. Di dawiyê de em bi serkeftî gihîştin milê din ê avê. Em hema goraan dixin lingên xwe. Piştî pênc deh çirkeyan em meşiyar hinek hevalên Xerzanê me pêşwazî dikin, piştî silavdayînek germ em derbasî wargeha bingehîn dibin. Hevalê Rizgar Êrsî me pêşwazî dike, hîn dinya tam ronî nebibû, lê em hev nas dikin. Min berê hevalê Rizgar nas dikir. Femandarekî ez pir nirx didimê; hevaleyê di jiyar û femandartiya xwe de dîlnizim û mirovhez e.

Heta dinaya ronî dibe em di stargehê de dimînin. Dinya ronî dibe, raçavkirina derdor tê kirin û piştî wê agirek mezin tê pêxistin. Em jî hem xwe germ hem jî xwe zuwa dikin. Hevalê Rojhat Markoz dibêje; ji ber hûn bejin kurtin şil bûn, lê em bejin dirêj şil nebûn. Min nikaribû ji ber bejna xwe ya dirêj li Kato Marînosê cihekî bibînim, lê li vir bi kêrî tiştekî hat.

Erê, em niha li hemberî Sîser li Şêx Cuma ne. Me bi mehan xeyala vê derê dikir, niha xeyala me dibe rastî. Em dijîn, li bendê mayîna bi mehan em wisa bi serkeftî bi encam dikin. Hemû heval pir kêfxweşin û çavên wan dibiriqin. Hevalên li vir jî bi hatin me pir kêfxweş bûn. Bi mehane çavên wan jî li rê li benda me bûn. Erê, her wiha em hatin dawiya rêwitiyekê, lê em li vir ji nû ve dest bi jiyana nû dikin.

15 Mijdarê 2007

Tîqetîqa kenê li Xerzanê bilind dibe

Çend roje em li Xerzanê ne. Em di nav jiyana Bakûr de ne, lê em hîn tam fêr nebûne. Ez hewl didim jiyar û hevalên li vir nas bikim. Diyarê hevalên li vir piranî ciwanin, lê diyare di milê pratîk û jiyana vir de şehreza û serwerin. Roja destpêkê ji bo em bêhna xwe vedin roj hemû ji me re hiştin. Lê dema bû roj, me nikaribû xew bikin û me bêxewiya xwe ji bo şevê hilgirt. Ji ber hejmara hevalan kême bi hev re diçin her karî û

mirov bi westandinekê dihesê. Em jî demek berî demekê beşdar biban û me hinek barê wan sivik kiriba.

Duh ji aliyê hevalê Rizgar ve civîn hat lidarxistin. Hem di derbarê pêvajoyê de hem jî di derbarê qadê de agahî hat dayîn. Me jî di derbarê rê û rêzanan de agahî da. Vesaziya komê hat çêkirin. Hevalê Hewrê û Fuad ên di komê de diçin herêma Tetwanê. Ew ê zivistanê li wir bin, êdî wê vesazî di biharê de çêbibin. Em di heman wargehê de dimînin. Piştî karên rêxistinî hatin meşandin rêz hat serşûştinê. Ji ber cih nîne û hejmara hevalên xort zêdertire destpêkê ew diçin serê xwe bişon û piştî tarî dikeve erdê nû vedigerin. Bila zêdekirin nebe, lê bi rastî di tariyê de jî dibiriqin. Ser û rihên xwe kur kirine, rûyê wan zindî bûye û heta hevalê Xeyrî yê li vir dimîne vê sibê çûye gel hevalê Hewrê û nas nekiriye, wisa zaniye hevalekî ji qadên din hatiye çûye gel û silav dayê. Hevalên li gel jî dest bi ken dikin. Qaşo ez û hevala Cîhan me yê piştî nîvro serê xwe şûştiba, lê ji ber nêzîkbûnên hevalan ên kêfî me nikaribû îro jî biçin serê xwe bişon. Êdî em ê jî sibe biçin. Em pir qirêj bûne, ez nikarim porê xwe vekim û şe bikim, ji ber qirêjê porê min diweşe.

Min û hevala Rojna silav da hev. Me pir nikaribû baxivin, peywendî qut bû. Ew jî li başûrê Mûşê dimînin. Herêmeke Xerzanê ye, lê nêzî neh şevan ji me dûrin. Em tenê dikarin biharê wan bibînin. Min bêriya gelek hevalên xwe yên li Başûr hiştine kiriye, xwezî ew jî li vir bûna. Hejmara vir kême li vir hevalên jin tenê ez û havalê Cîhan in. Ez dixwazim di warên Xerzanê de bi hêz beşdar bibim, ji ber vê jî ez lêhûrbûn dikim. Ez ê tevlibûna bi reng û cewhera xwe bingeh bigirim û hewl bidim xeyalên xwe pêk bînim.

17 Mijdarê 2007

Merheba Mizgîn giyan

Heşt rojin ez li Xerzanê me û rojên min tijî tijî derbas dibin. Ji ber vê dem nabînim bi te re parve bikim. Ez keşfa ferqa di navbera jiyana Başûr û Bakûr de tam dikim. Ji gelek aliyên ve cuda ne. Hevalên li vê herêmê dimînin zindibûn û reng didin Şêx-Cuma. Jiyana li vir di hembêza Kurîs, Kember û Sîser de mezin dibe û pêl bi pêl Kurdistanê

hemû dipêçe. Li vir tevlîbûnek bê hesab heye. Ez moral ji tevlîbûna hevalan a bi coş û bi moral digirim. Jiyanek wisa bê hesab mirovan ji taybetmendiya xweperstî û xwebûniyê pak dike û kes ji gelek hêlan ve lêpirsîna navxweyî dike. Bi çavdêriya hefteyê min baştir bingaha azadiya di jiyane de û hevaltiya ji dil dît. Mirov fîzîkî diweste, lê rihetiyek di rih û hest de heye.

Erka me ya destpêkê bi serpêhatî derbas dibe. Em ê cara yek biçûna ser kaniyê. Hevala Cîhan li pêş çû. Heta min şaşal amadekirin hevalên din jî çûbûn. Min jî li ser vegotinê xwe berda nav daran, herî dawî min xwe li ber robarê Şêx-Cuma dît û min hîn ne havala Cîhan ne jî kanî dîtibû. Min dest bi gerîna nav bejahiyê kir û banî hevala Cîhan dikim, lê kes bersivê nade. Ez gelekê digirim, dem jî gelek derbas bûye, êdî min zanî wê heval mereqa min bikin û bikevin gumanan. Demek berî demekê ez vegeirîm cihê ez tê re çûme ser robar û bîdonên xwe dadigrim. Bi dengê xişênîyê re ez li derdora xwe dinêrim lê kesê nabînim û çek jî li gel min nîne. Guman bi min re çêdibe, lê hema ez xwe kom dikim û dibêjim; li gor ne dijmîne, îhtîmaleke hevalên derbas dibîne. Ez her berdewam avê dadigrim û reşahiyekê li hember dibînim.

Ez dibêjim ew kî ye, bersiva digirim dibêje; heval e. Yê tê hevalê Rizgar G, ye. Ew jî şaş maye, dema min dibîne fêma dike ku min kanî nedîtiye. Hema li pişt min hevalê Rizgar Êrsî yê di wargehê de mabû tê. Tiştê ez jê ditirsîyam ev bû. Ez bi rewşa xwe dikenim. Dema ez hevalê Rizgar dibînim kenek min digire. Ez di erka xwe ya destpêkê de li Xerzanê winda dibim. Hinek heval jî dipirsin û dibêjin; dema tu bi tenê mayî tu girî û tirsayî.

Piştî demek dirêj û şûnde min derfet dît bi bêtêlê bi hevala Zozan re baxivîm. Her çendî bi riya bêtêlê jî be persfektîf da me. Bi taybet girîngiya beşdariya weke jin li Xerzanê û dîsa divê weke du hevalên jin em pênehesin bi tenê ne. Min bêtêlê û hezkirinê xwe ji hemû hevalan re şandin.

Divê ez di hinek xalan de guhertinê bidim çêkirin, bi taybet divê ez dengê xwe nizim bikim. Ya din jî divê ez bi Kurdî baxivim. Hevalên li vir bi Kurdî daxivin, xweş nîne ez bi Tirkî baxivim û bersiva wan bi Tirkî

bidim. Ez dixwazim bi Kurdî baxivim, lê ji ber fêrbûna dev ez Tirkî daxivim. Ev diçe şirovekirinek şaş û bêhna min teng dike.

22 Mijdarê 2007

Hezkirina min a li ser baskê stêrkan rêwîtiyê dike

Zivistan li ber derî ye, bi sermayaya xwe hemûyê ve hebûna xwe di bedena me de dide hesandin. Jixwe rêbaza dema hatina zivistanê bi sermayê dide hesandin. Ji ber vê pêla sermayê xwezayê jî di hundir de xwe komî serhev kiriye, pelên hemû daran werîne. Gur jî şev li dû dîtina nêçîrê ne. Em gerîla li hemberî sermayaya zivistanê li ber xwe didin. Em hîn neçûne wargeha xwe yê zivistanê. Êdî em ê îro biçin. Ez di derfetên Bakûr de zehmetiyan naçim, lê ez nizanim ez ê ji niha û pê ve zehmetiyan bijim an na. Xala ez tê de zehemtiyê dijim di yekîneyek wisa biçûk de cih girtin û mayîna me du hevalên jin e. Ez carna li hinek kesên xemgînî, zehmetî, kêfxweşî, hest û hizirandinên xwe pê re parve bikim digirim. Ez ne di wateya ku nikarim bi hevalên li vir dimînin parve bikim dibêjim. Hinek avaniya kesayetîya min cuda ye. Ez di parkirinê de hîlbijêr im, ev jî di hinek deman de ji bo min dibe sedema zehemtiyê. Weke ez dixwazim nikarim bi hevala Cîhan re bidim û bistînim. Avaniya kesayetên me cuda ne. Em her du bi hev re di zanabûna divê em derfeta jiyane ava bikin de ne. Ka em lê binêrin wê çawa be?

28 Mijdarê 2007

Azadî kêliya tê hîskirin tê jiyîn

Amadekariyên me duh hemû bi dewî bû û em ber bi wargeha xwe ya zivistanê ve diçin. Hevalê Xeyrî û Zagros çûn peywirê. Me jî mala xwe daniye ser çenteyê xwe. Jixwe mala gerîla çente û cihê lê bi cih dibe ye. Barên me giranin. Hevalê Rizgar ê berpisyarê herêmê li dawiyê maye û şopên me xirab dike, digihê min û bidonê avê yê di destê min de digire. Ez naxwazim bidim, lê pir îsrar dike. Em her ku bi lûtkeyan ve hildikişin lingên me dikeve nav berfê. Em hîn duh di vir de derbas bûn, ew qas berf nebû. Niha jî li pêşîya meşa me dibe asteng. Ev berf zuwa ye dest û lingan dişewitîne. Her ku em pêşde diçin, êşa dest û dilngê min li dilê

min dide, weke wê dilê min bisekine li min tê. Bi carekê dixwazim biqîrim. Ên ku di berfê de nameşin tê wê wateyê xwe radestî mirin û bêçaretîyê kirine, ji ber ez vê rastîyê dizanim bi ser lingên xwe yên qerisî de diçim. Ez li dawiyê mame. Min ji bo barê li pişt a xwe êlekê xwe weke qonfilaj bikaranîbû, ew jî di rê de ketiye û min ferq nekiriye. Rewşek sosrete ji ber wêne û rojnivîsa min di berîka êlekê min de bû. Ger îşev berf bibare wê êlekê min bibe gome. Ez encex dikarim biharê bibînim, ez nikarim biçim lê bigerim. Demek berî demekê dixwazim bigihim hevalan. Hevalê Rojhat Markoz û Delîl li ber latekê navber danê û li benda min in. Ez digihim wan, piştî bêhnvedanek kurt em meşa xwe berdewam dikin. Hevalê Delîl kitek lepişkê xwe dide min, destê min pir germ dibe. Rê jî nizane xilas bibe, êdî ez pê dihesim hêza min nemaye. Hevalê Baran tê û dixwaze barê min bigire. Ez hinekê didimê. Hevalê Baran weke xilaskar digihe hewara min. Alîkariya di van kêliyan de mirov bandor dike, ji mirov re dibe moral û hêza manewî.

Em digihin wargehê, di hundir de agirê gerîla pêxistine û heval li derdor kom bûne. Hema cihekî didin min jî. Ji min re dibêjin; divê tu dest û lingên xwe zêde nêzî agir nekî. Hevala Cîhan jî pir zehemetî dîtiye, heval çûn pêşîya wê û anîne. Hevalê Delîl jî barê xwe yê nan nêzî mangeyan daniye. Di derfetên asayî de rîya seetekê bûye du-sê seet û em ew qasê tengav bûn, em hatin asta ku barê xwe li dû xwe bihêlin. Lê ya herî nexweş windakirina êlekê min e. Ji ber min êlekê xwe wînda kiriye bi leşkertiya min ve girê didin, lê ez guhdar nakim, ji ber henekan dikin, ger cidî bêjin ez ê pir pê bandor bibim. Min di vê rêwitiyê de carek din fêhm kir ku divê em di şert û mercên Bakûr de bipijîn.

Hevalê Zagros ê ji erkê hatî tiştên me li dû xwe hiştine anîne. Tişt a îşev a herî xweş dîtina êlekê min e. Heval sax bin bê ku li giraniya barê xwe binêrin girtine û anîne. Dema em rojekê wisa bi encam dikin westandîna xwe ji xewê re dihêlin. Em sibe bi rojbaşê re radibin, qet niyeta min nîne ez rabim, lê ji ber em û hevalên xort li heman cihî dimînin divê ez rabim.

Em di bin erdê de qesran ava dikin, her hevalek weke morîyan dixebite. Em tunelan çêdikin. Keda her hevalekê ew e ku li vê wargehê tiştek

baş bike. Kolektîvîzim azadî û jiyaneke xweşik dixuliqîne. Ya jiyana gerîla balkêş dike yekbûna rih û jiyana kolektîfe. Dema jiyana wisa diherike ez hewl didim bigihim vê herikînê. Weke jin xwe di derfetên Bakûr de bi rêxistinkirin girînge, bawerim fetisandina vê dijîm. Divê mirov di nêvengên giştî de bi reng û cewhera xwe weke berfînekê hebe. Divê mirov di nêvengên giştî de her tim bi lêpîrsîn nêzî xwe bibe, lêpîrsîn mirov her tim komî ser hev dike. Erê, tevî hemû tiştî bi venegotina tenêbûna xwe keda tevîbûna vê lehiya hestên kolektîf didim. Çiqas zehmet e? Belê, tevî her tiştî hewl didim tenêbûna xwe ya nikarim rave bikim ve, xwe ber bi pêlên hestên hevbeş berdim.

30 Mijdarê 2007

Hezkirin bi qasî têkoşîna te bilind e

Ev bû çend roj min bagera dilê xwe bi te re parve nekiriye. Bi pêhesîna vê kêmaniyê ez lêdanên di hundirî xwe de hembêz dikim. Em li wargehê bi cih bûn, ez û hevala Cîhan di mangeyekê de ne. Manga me pir bêdenge ango em pir hêminin, berdewam dixwînin û hewl didin dema xwe binirxînin. Em serê sibê taştêya xwe li manga xwe dixwin, di seetên din ên xwarinê de em bi hevalan re ne. Pir zehmete mirov du kes tenê be, êdî me hêdî hêdî dest bi jiyankirina zehmetiyên wê kirine. Em carna ji hev jî aciz dibin. Ez wisa dihizirim divê li cihên wisa kesayet hevgirtî be, lê avaniya kesayeta me cuda ye. Em di pencereyên cuda de li jiyane dinêrîn, cudabûna kesayeta me bandorê li ser mêzandina me ya jiyane jî dike. Ez dihizirim em ê di wargeha zivistanê de çar mehan çawa derbas bikin. Weke kesayet cihekî dikarim xwe lê perwerde bikim e. Heval hemû hema ketine nav hewayê lêhûrbûnê. Hema hema heval hemû pirtûk dixwînin û li gel vê sihetên xwezayî û nîqaş çêdibin. Ez pir zû fêrî vê bi hev re bûna hevalan bûm. Hemû jî hevalên hêja ne.

Hevalê Xeyrî muhabîrê me ye. Hevalek ciwane, lê bi ezmûnên xwe yên jiyane ciwantiya wî di siyê de dimîne. Di aliyê ewlekariyê de hevalek pir şiyare. Li gor çavdêriya min yekî pir ji xwendinê hez dike ye. Li ku derê dem hebe hema firsendê nixîne û pirtûk dixwîne. Min bizava zû ya

hevalê Baran a di xebatê de dît, lê avaniyek wî ya bêdeng heye. Hevalekî weke avên bêdeng kûranyê di hundirî xwe de dijî û jiyanê bi dahûrîn digire dest. Hevalê Erhan jî yekî fedekar, dibeze hemû karan û hevalekî bi morale. Hevalê Çiya yekî durist û di hevaltiya xwe de jidil û fedekare.

Em ê vê zivistanê bi van hevalan re derbas bikin û wê keda min hemû li gor xeyala xwe jiyan be. Çavkaniya xeyalê min jî erdemkirina jiyanê ye. Di livîna hezkirinê de jiyan bihêz kirin û di lûtkeya hezkirinê de xwe nû kirin! Û bi zanabûn di rastiya Bakûr de jiyan.

7 Kanûnê 2007

Merheba dilopa dilê min

Hest û hizirandinên min weke pêtan gur dibe li ber bayê Bakûr ê azad. Xwe li jiyan û bedena min dipêçe. Ez li warên jê hez dikim û bi hevalên xwe yên nîrx didim re me. Ez niha ya demekê weke bêderfet dihat dîtin û nedigihîştimê hîs dikim û dijîm. Ez dipirsim. Di nav jiyanê rojane de gelek caran hatim Bakûr, an jî vê bes dibînim? An jî ji bo ez ya din pêş bixim asoya min têrê dike? Her çendî bêhna mirov di hinek xalan de teng jî bibe, lê ez di rih de firehiyê dijîm. Ez dixwazim jiyanê bi bê hesab tevlihbûn, jiyan û hezkirinê bi rêz û keda xwe ava bikim.

Em li ser bernamêyek çawa di destêpêka biharê de pêkbûnê dihezirin û lêhûrbûnê hev kûr dikin. Di vê navberê de jiyanê me ya bi hevalên xort a hevbeş berdewam e. Ger em vê jiyanê hevbeş baş tehlîl bikin, wê dinyaya zilaman jî baş were naskirin û em ê weke jin bikarin têkoşînek hîn şênbertir bidin. Di heman demê de mirov dikare xwe jî di civatên wisa de baştir dahûrîne. Jiyanê hezkirin û rêz tê de hebe dê têkoşînek hundirîn azadiyê ava bike. Di vê wateyê de weke jinekê barê min girane, ji ber ez di vê jiyanê de berpirsyarim û pir jî vê jiyanê hez dikim. Li cihê sazûmanîya rêxistinî lê hebe divê mirov nekeve nav tirsan.

Di navbera taximan de vesaziyeke çêbû. Ez, hevalê Agir û Rojhat Mar-
koz bûn rêveberên taximan. Hevalan qet ji min nepirsîn. Jixwe min li
Başûr îtiraza erkê kiribû, ez her ji erkê direvîyam. Ez wisa dihizirim de-
ma şervan bim, ez ê zêdetir bi cewherî beşdar bibim. Li vir min nikaribû
erkê îtiraz bikim. Ji ber weke hêza YJA-Star divê em nûnertiya xwe bi-
kin. Di derfetên wisa de nehilgirtina berpirsyartiyê rast nabe û wê bibe
nêzîkbûnek bê wate. Ne bi hestê xwe, divê ez bi zanabûn û rastiye re
bikevim rê.

Li Başûr pir êrîşên asîmanî yên firokeyan hene, li qadên Bakûr jî
oparsyon berdewamin. Di van demên dawî de me li Gabarê 8 hevalên
xwe windakirin û di nav van hevalan de hevala Bêrîtan Goyî jî heye. Li
hemberî vê şehadetê tiştên dijîm û pê dihesim nikarim bînim ser ziman.
Ez niha hêza vegotina van mirovên xweşik di xwe de nabînim. Ev win-
dahî ji milê me ve pir girane, em her roj di vî şerê qirêj de mirovên bi
rûmet winda dikin, dixwazim ev êşa em dijî bi dijmin jî bidim jiyîn. Ger
em derbeyan li dijmin nedin wê dijmin berdewam xwîna hevalên me
bimije. Di jîyanê de diyardeyek bi qasî şer hilweşandinê çênake. Rastiya
vî şerî bi qasî agir sotîner e, bê ku li pişt xwe binêre dikare mirovê tu
herî zêde jê hez dikî bibe. Ji ber vê ez ji şer nefret dikim. Dibe weke
nakokiyekê were. Dibe ku bêjin ger tu ji şer hez nakî, çima îdaeya te ya
di çeperên şer de cihgirtin heye. Ez ji vê bawer dikim; ji bo şer were
sekinandin divê mirov têkoşînek bi hêz a şerkirinê bide, an jî ji derveyî
vê rastiya KT'ê cuda ti hilbijartin nînin

17 Kanûnê 2007

Merheba dilê min ê di deryayan de bi rê ketî

Dilê min li lûtkeya çîyan, di nav biriqîna stêrkên di dilê Sîser de vê şevê
li her derê lêdide, li her cihekî bêhnekê vedide û pêş de diçe. Agirê bi
pêtên xwe mangê germ dike hestên di dilê min de bilind dibin û bi
hestên ez girtim û birim re carekê pê hesiyam ku li her derê me. Ez bi
tenêbûna di dîwarên Îmraliyê de, komên di bajarên mezin de bê hêvî
ketine rê, destên biçûk ên genim davêjin ber kevokan û bi lêdana dilê
lawên ku pêşeroja wan nediya dihesim. Ez hemû dema xwe te bi cih
dikim, ev şeva tiştê de hatî jiyîn û yên bê jiyîn ji gerdûnê didizim.

Dilxweşiya bi xwe re mayîne dijîm. Dema ez di xwe de civakekê ava dikim, di civakekê de li xwe digirim. Weke payîzê hizirandin û hestên min rêwîne, weke mînaka lavlavkê jiyanê hembêz dikim.

21 Kanûnê 2007

Merheba jiyanê min a şer

Pêşeroj û paşeroja her mirovekê heye. Qurtek tenêbûna her mirovekî ya jiyî û wê bijî, an di jiyanê xwe de jê têrnebûyî, demên ne girêdayî xeyalên wê ye hene. Ji ber vê milek jiyanê kême. Bêguman a herî gîrîng jî windakirina dem û hezkirinê ye. Nikarin robarên diherikin paşde bînin, nikarin pêşiya dema diherike were girtin û jiyanek bê hezkirin nabe. Jiyanê bê hezkirin têhnîbûnê herî kûr ava dike. Hezkirin weke deryayan e di dilê mirovan de, ger dilê xwe di deryayan de tahir kiribe, mirovên bi hezkirin jiyanê dijî mirovên herî kêfxweş in. Ji ber di wan de dilavoaniya dinya, xweza û mirov heye û dizanin jiyanê bi zehmetiyên wê ve jî bijî. Carna ya herî zêde fêr dike êş e, yek jî ger tu şoreş-ger bî zêdetir fêr dike.

Êdî ez ne roj mehên li Bakûr mame dijmêrim û salek nû li Bakûr derbas dikim. Li gor bernamaya jiyanê Bakûr me jî dest bi perwerdeya xwe kir. Hemû heval cihê xwe di komiyonên perwerdê de digirin, dema em li gor derfetên Başûr tînin ber hev derfetê kêmin, em nikarin belgeyên perwerdê peyda bikin. Dema hejmara me jî kême be, mirov dikeve nav gumana gelo encama em dixwazin dikarin ji perwerdê bigirin. Di rastiya xwe de ger perwerde li ser bingeha cewhera kesayetê were dîtin, encamgîrê û jixwe ya li Bakûr jî tê esas girtin ev e. Jiyanê li Bakûr ango bi qasî min heta niha şopandîye, li gor Başûr jî polîtîkayê şûştin, lê dema em li ziraviyan dinêrin qurnazî li ber çavan dikeve. Di vê wateyê de divê di nav avaniya Bakûr de wisa xeyalî û li gor niyeta xwe nêzîkbûnê nebin. Carna hinek nêzîkbûnê min ên saf û li gor niyata xwe çêdibin. Ev nêzîkbûnê di jiyanê de bi min re bê ewlehiyê tîne. Di nîvengên siyasî de bi rihê zarokbûyîne mirov rast nade fêmkirin, berûvajî wê nade fêmkirin û hestên baş mirovan xilas nake. Zehmetiyek min a pir cidî nîne û heta ji aliyekê ve mirov pir bi şansim. Ji ber ez bi mirovên pir ji wan hez dikim re li Bakûr im.

Ez ê bibim xwedî jiyanek nû

Jiyan bi tiştên ecêb û sprûzan ve dagrtiye. Ez qet carek din nedihizirim ez ê vê nexşa bûye lênûsa dilê min bigirim destê xwe. Ez dema niha rûpelên wê ji hev ve dikim kelecane û xemgîniyek min digire. Di jiyana xwe hemûyê de min cara yek biryarek wisa girîng girt û li gorî pêwîstiyên biryarê dijiyam. Ew rojên min muhteşem bûn, min hemû tiştên herî xweşik dijiyam û aram bûm. Di aliyê wijdanî rihet de bûm, her ku dihiizim ez ê ji bo Rêbertî û hevalên xwe bibin bersiv bi coş dibûm.

Kes nikare bikeve navbera girêdana min a bi Rêbertiyê re. Hezkerin bê bedel nîne. Ji ber hezkerin nirxa di encama kedê de pêktê ye. Li ser vî esasî dixwazim bi girêdan, hezkerin û hestên xwe yên azadiyê biqîrim.

Dema min biryara azadbûnê girt pir êş kişand. Azadbûn bê êş nabe. Lê li hemberî êşkişandinê min her tim hêviya xwe gihandina azadiyê di xwe de parast. Ji ber vê êşkişandin û zehmetî jî bi nirx bû. Ji ber baweriya xwe min bi pêkanî êş, zehmetî û bêrî hembêz kirin. Bi carekê ez bi fîzîkî û rûhî bi tenê mam. Lê dîsa baweriya ez ê bi ser bixim hemû deman hêz da min. Vê hêzê coşek wisa da min, min coş û morala bi hezar mirovan di dilê xwe de hîs kir, di wateyekê de êdî ez ne ez bûm. Min xweşikbûnên her hevalek xwe di nav di dilê xwe de jiya û pê dihe-siyam. Ji bo min a herî zehmet wê ji niha û pê ve be û zehmetiyên ez bijîm ji niha de dibînim. Ez dixwazim ji vê rewşê derkevim û dixwazim bigihim wê rewşa xwe ya kevin. Ger bi vî rengî lêhûrbûnê berdewam bikim, ez ê kemînekê ji xwe re amade bikim û ez ê sih bixim ser biryara xwe. Ger te biryara azadbûnê girtibe û ew hêz di xwe de avakiribe wê demê tu dikarî vê rewşa xwe jî bidî derbaskirin. Ji derveyî derbaskirinê ti çareya min nîne. Yan ez ê li gor pêwîstiyên pêvajoyê bi lezgînî xwe amade bikim, an jî ez ê jiyanek erzan a ji derveyî pêvajoyê bijîm. Li gor jiyanekê erzan û tijî ji rêzêbûnê ne li gor min e, wê demê divê ez vê girêka kor çareser bikim. Encex ez dikarim ji xwe re bibim hêza çareser-riyê û riyeke xilasîyê bibînim. Ez dikarim destpêkek nû bidim çêkirin.

Pîroziyên jiyanê

Her roj, meh û sal li gor rêgeha xwe nirx û wateyek xwe heye. Her roj û kêlî dîroke ji bo tevgarên şoreşger, ji ber dem pîroze ji bo wan. Bi zanîna vê nirxê jiyîn, rakirina ala rûmetê û gelê mazlûm gihandina azadiyê erka me ye. Ên ku nirxa demê nizanin xezîneya xwe ya herî mezin winda dikin, ji zanabûna azadî û hezkirina okyanûsan bêpar dimînin. Bi qasî nirxa jiyana pîroz dizanî dikarî qurtên ava pîroz vexwî. Jiyanê ji rêzê, me ji hezkirin, lêgerîn, ji xeyalên me qut dike û di nav lehiya hestên bêwate de dibe reşbîniyan.

Erê, me salek din bi êş û hezkirinên xwe ve li pişt xwe hişt. Sala 2007'an saleke êşên wê giran bûn. Jehr dan Rêbertiyê, li pêşiya hevdiştinên wî astengî çêkirin. Gelek binçavkirin û girtin çêbûn û di nav gerîla de windahiyan komî çêbûn. Me ev sala derbasbûyî her bi hejandinan derbas kir, ji hemû mirovên ji dil girêdayî tevgera azadiyê re zehmet hat û hejandin da jiyîn. Êş û xemgîniyên me serwerî kêfxweşiyên me bûn. Ji rika hemû zehmetiyan em dîsa bi hêvî li pêşerojê dinêrin û di kûrahiya hêviyê de jiyanê hembêz dikin. Wê hêvî me bigihîne azadî û evînê. Ez kelecane ji hezkirin û tîqetîqa kêne zarokekê ya ji bo jiyanê digirim. Ez ê ji tevgera perperîkekê bibim dilopa jiyanê.

Merheba Mizgîn giyan

Min dixwest demjimêr û rojên dawî yên sala 2007'an bi te re parve bikim, lê hêzek di hundirî min de bû asteng. Ez dixwazim bi bergeha pêhesînên xwe yên sala 2008'an parve bikim.

Ez di nav gelek hest û hizirandinan de me. Dema milek min dibe kelecane û kêfxweşî, milek min jî xemgîne, em hîn duh bi şehadeta 14 hevalan hejiyan. Me ev şehadet ji bîr nekirine, lê ma tu yê çi bikî êşên me diyalektîka şoreşgertiya me ne. Em têkoşîna ku ji êşan kêfxweşiyê ava bikin didin. Em nikarin hevalên me yên şehîd bûne paşde vegerînin, lê em dikarin dildariya wan a ji bo azadiyê bidin jiyîn. Li ser vî bingeşê wê sala nû hembêz dikim. Ka bizane ez li kê nehizîrîm? Hestek xerîb xwe li

min pêçabû. Niha Rêbertî çî dike? Gelo li ser parznameyên nû dixebite, an jî li ser wê sala nû ji bo gelên bindest çî bîne dihizire? Rêberê min, min dixwest li gel we bim. Dema ez li roj, meh û salên Rêbertî bi tenê derbaskirine dihizirim qehr dibim.

Lê ez bi dilê xwe yê gerîla ve di lûtkeya Sîser de bi hevalên xwe re me. Lê dilê min ji we qut nîne, bi lêdana dilê we re dikevim rê. Dema em diketin sala nû ez li derdora xwe li yekê digeriyam ku pê re sihbet bikim, min dixwest hestên xwe pê re parve bikim, lê min kes nedît. Tenêbûn weke min ji xwe re dîl bigire, lê min ev tenêbûn weke dilopekê parçe kir û weke robarekê herikîm nav çiya û mirovên ez ji wan hez dikim. Bîranînên min ên serê salê yek bi yek zindî bûn. Cara yek ez sersalek nû wisa zivêr derbas dikim. Hevalên di taximê de dema xwe bi temaşekirina filîm re derbas kirin. Ew şabûn, lê ez bi van tiştan bandor nabim. Ji ber vê taybetmendiya xwe ez bi xwe re mam. Vê şevê tiştên herî baş min kirî, ji 12'an re 10 çirke man ez çûm derve. Ger demek kurt jî be di bin stêrkên li hemberî Kurîs dibiriqin de min dilê xwe bi xwezayê re kir yek û min xwest kêliyêk tenê jî be guhertinên di çiyên de hîs bikim. Min henaseyek kûr girt.

Em vê sala nû bi taximek hevalên xort re pîroz dikin. Mirov her ku bi xortan re dijî wan baştir dahûrîn dikim. Zekaya analatîk a di xortan de, wan li hemberî jiyana sar dike, ji ber milê hestî lewaze. Min weke jinekê ev careke din hîs kir û jiya, bandora zekaya hestiyar zêdetir li ser min heyê. Divê mirov her du rêbazên hizirandinê bike yek û bijî.

Di destpêkê de sala we ya nû pîroz be Rêberê min, ez ê bi hêviya gihiştina we têbikoşim. Mizgîn giyan sala te ya nû ji pîroz be, bila hemû rojên xweş û kêfxweş ên te bin. Bila xemgînî û êşên te yên min bin. Ez di baweriya jiyana min a Xerzanê baş derbas bibe de me. Ez bi hezkirina di dilê xwe yê navemire de te hembêz û maç dikim.

1 Çile 2008 / sibê 5.45

Ez bi rengê xwe heme

Gelo divê mirov li gor xwezaya xwe bijî an neji? Ya rastî ev hemû pirsîn, lê her tim min ji wê bawer kiribû ku xweza û cewhera wê/î çi be divê li gor wê bijî. Ger xwezaya min ziyane nade hawirdor, heval, têkoşîn û heta ger ziyane nade xwezayê, wê demê çi wateya wê heye ji vê were tirsîn. Lê ger astengiyê çêdike ez dikarim li vir bisekinînim. Dikarim xwe sînordar bikim. Ez şervanek im, ango şervanê azadiyê me, ez şervanê ûtopyayan im. Şervantiya min, min ber bi rastî û lêgerînan ve dibe û min xweziyî dihêle. Mirovên herî zêde gelemperî dikin, mirovên herî zêde ji rastiya xwe direvinin. Bi qasî mirov bi rastiya xwe re rû bi rû tê, dikare têkoşîna azadiyê bide û civakbûnê bi dest bixe. Bi qasî dixwazî redkar nêz bibe, bêje ku te pirtikên jiyane yên heyî û hebûna wan naheşî, dibe ku tu xiftanek bihurdar li ber xwe bikî, vêca dema tu bi xwe re mayî, tu yê çawa li xwe û gerdûnê binêrî? Tu yê bêjî tu sextekarî yan tu yê dîsa xwe bixapînî? Li gor rastiya jiyîn rûmeta herî bilind e, min her tim ji vê bawer kiriye û ez ê pê bawerbûnê berdewam bikim.

Li gor hinekan ev hizirandinên min bê watene û dibe nekeve serê wan, lê min bawer kir û felsefeya jiyane ye ez di oxura wê de têkoşînê dikim. Ger hizirandinên min tewş jî hatibin, di encamê de ez bi hizirandin û xwebûnê heme di vê gerdûnê de. Gerdûn jî bi rengê min û rengê yê din hevsengiyê ava dike û xwe berdewam dike.

5 Çile 2008

Hezkirin dostê min ê herî bilind e

Tiştê dihêle mirov were beramberî hemû zehmetiyan çi ye? Min hem di kesayata xwe de hem jî di kesayata mirovan de demên bersiv ji vê re dîtî hebû. Me qern û sedsal di navbera xwe de hişt ji bo pêşerojê sêlim danî, ji ber em li dû hinek tişt û ûtopya bi dest bixin. Tiştê dihêle mirov bibe xwedî ew qas lêgerînan çi ye? Azadî, hezkirin û rûmeta di mejiyê civakê de veşartî mayî yan jî bihûştê li ser rûyê erdê ya em lê digerin e. Em li dû van in, ji ber ev di jiyana me de kêma in. Lê ya herî girîng jî hezkirina mirov a jiyane ye. Ez dihizirim ya dihêle mirov li hemberî zehmetiyan bi hêz be hezkirine. Hezkirin, hêza hêvî, sebir û berxwedanê ava dike.

Mirov di demên herî bêçare û bi tenê de livîna hezkirina di dilê xwe de hembêz dike û asoya mirov ronî dibe. Hezkirin dibe dostê te yê herî nêz. Gelek deman pirsgerêk, kêmanî û şaşiyên sînorê tehemûla mirov derbas dikan çêdibin hene, lê ger girêdana te ya hezkirinê bi hêz be tu dikarî êşa xwe daqurtîni û şandsek din bidî jiyane. Weke fedekariya dayîkekê ji bo zaroka xwe dike tu jî nîşa jiyane bide. Hezkirin weke kaniya bê ku li beramberî xwe tiştekî bixwaze, her ku diherike bi hemû zelalî û pakbûna xwe ve diherike.

7 Çile 2008

Bê ku li hemberî hêrsê bin bikevî divê bizanî bijî!

Gelek caran hêrs û qehir mirovan ber bi cihên nediyar ve dibe. Divê mirov di kêliyên wisa aciz de bizane pêşî li acizî û hestên xwe bigire, lê mirov di gelek deman de bi ser naxe. Li hemberî hêrs û aciziyê bin dikeve. Mirov gelek caran di van deman de dibe sedem derdora xwe jî ne-rehet bike. Mirovên pir ji wan hez dikî ji xwe didî revandin. Dema hêrs û acizbûn bi dawî dibe hesta jovanîyê dikeve navberê, lê wê êdî bi kêrî çî bê, qewimî û çû. Lê ger şansê te hebe dibe bikarî dilê mirovên li hemberî xwe xweş bikî, tu yê hewl bidî dilên te şkandine baş bikî, dibe bi ser bixî. A girîng di demên wisa de serwerkirina hizirandinê ye. Rêbaza herî baş min ji bo xwe di van demên hêrs de esas girtiye, ji nivengên qelebalix dûrketin û bi tenê mayîn e. Ger derfeta min hebe digirim an jî mizûkê guhdar dikim. Ger ez yekê ji van jî nekim, herî kêr rêbaza serlêdan dikim nivîs dinivîsim û dixwazim hêrsa xwe bi vî rengî kontrol bikim. Di demên xwe yên aciz de naxwazim kesê bêşînim, ji ber vê tenêmayînê esas digirim. Ez mereq dikim gelo her acizbûn neyînî ye? Li gor min di cewhera her acizbûnekê de bertek heye û aciziya neyê birêxistin kirin xirab dike û dişkêne.

Dema di çalakîyê de tu rû bi rûyê şehadeta hevalên xwe têyî, an jî bibînî bi bedena hevala/ê te ya şehîd hatiye listin, tu ji acizbûnan şêrî dibî. Di vê kêliyê de tu nikarî bi tendurust bihizirî, hestên te, te dehf dide û bi çavkorene tu yê biçê ser dijmin, an bê ku tu encam bigirî tu yê venegerî, an tu venagerî. Acizbûn carna mirvan dehfî bêwatebûnê dide. Erê, ez naxwazim bikevim nav nêzîkbûnên bê wate, ji ber ez di nav jiyana

û kombûnek bi wate de me. Lê divê ez dilê xwe bi qasî şînahiya asîman fireh bikim, tevî hemû zehmetiyan hêz ji mirovên ji wan hez dikim bigirim û dixwazim di her kêliyê de wan hîs bikim û bijîm.

11 Çile 2008

Çav hêviya veşartî ya di xunçeyan de ye

Gelek lebatên bedena mirov hene, li gor min a herî zêde balkêş çav e. Çav dîtî nê tenê dabîn nake. Gelo çav hemû heman wateyê vedibêjin? Li gor min çav hemû weke hev in, a cuda, cudabûna mirov e. Qerektera mirov çawa be çavên wan jî wisa ne.

Gelek wate hene, dibe her çav vê wateyê venebêje. Mirovên hestiyar zêdetir bi çavên xwe daxivin. Tiştên nikare bi peyvan îfade bike bi çavan vedibêje. Mirovên di warê hizirandinê de pêşketine tenê tiştên xwestiyê pê bihese dide hesandin an jî vedibêje. Jixwe gelek caran nizanin bi çavan bidin vegotin, ji ber bi wê/î re tenê ziman heye. Wateya kûr a di çavan de parçeyek mirovên hestiyar in. Ew çî dijî çavên wan dide hîs kirin. Hinek nihêrîn sar in, hinek tijî kelecane, hinek bi kînin û yên hinekan jî tijî hezkirine. Yek jî nihêrînên xemgîn, bi kîn û sar giraniyê dane ser dilê mirov. Ji ber vê ez hezkirina jiyanê ya di çavan de dişibînim xunçeyên di destpêka biharê de bejin didin. Bendewariya xweza û hemû gerîlayên li Bakûr di teqandina wê nepeniyê de ye. Dema ew xunçe dibişîşe xweza dikeve nav kelecaneke nepenî. Bê ku çûk û perperîk bisekinin difirin. Ji ber vê ez ji nihêrîna paqij a zarokek bi hezkirin dinê re hez dikim. Nihêrîn ji bo pêşerojê ducanîne. Nihêrîn xwe kêlî bi kêlî neqîş dike di dîrok û dilan de. Çav vedibin, hêvî li pişt wê vediguhere rista helbestan. Wisa dibe rêwiyê hezkirina okyanûsan.

12 Çile 2008

Bi hezkirina mirovê zana hembêzkirina jiyan û gerdûnê!

Ez di hemû deman de li we digirim mirovê zana. Ji duh heta îro, ji îro heta sibe. Her ku we nas dikim, xwe, civak û gerdûnê nas dikim û wate didimê. Hûn wateya azadiyê ne, dixwazim bi hezkirin felsefeya we û ji jiyanê hez bikim. Hezkirina we gelek ji nû de ava kir û di qernek nirxa

mirovahiyê hatî tinekirin de we ji nû de nirx tevî nirxa mirovahiyê kir, we rastî, rûmet, hêvî, azadî, hezkirin û gelek tiştên nikarin binivîsim di tarîtiyê de hatibû çalkirin gihand ronahiyê. Hemû jin û zarokên dilê xwe dane azadiyê û heyranî we bi xeyala dîtina we ve dijîn.

Bi nirxa hûn didin mirov we em ji zihniyeta koletiyê xilas dikirin, bi xwe bawerbûn pêş dikeve. Em bi fikir û hestên xwe dest bi hezkirina jiyan, mirov û xwezayê dikin. Mirovê zana, dema felsefeya we min bi kelecane dike lêpîrsînên wîdanî min difetisîne. Êşa aliyên xwe yên min dahûrîn nekirine dijîm RÊBERÊ MIN.

13 Çile 2008

Hêvî aliyek mirov ê veşartî ye dest jê nayê berdane

Di kêliyê de hestên min ji bo hêviyê diherike û diguhere risteyan, berî ku hêviyê li baskê teoriyê bar bikim dixwazim bi te re parve bikim û vebêjim Mizgîn giyan. Hêvî bawerî û çavkaniya jiyana min e. Ji bo min her roja diçe zêdetir dibe azweriya dest jê nayê berdan û nirx qezenc dike. Hêvî ji bo min felsefeya jiyan û eşqê ye. Gelo mirovên bê hêvî, felsefe û eşq dijîn hene? Ya rastî ez naxwazim bersivê bidim. Di her demên derbas dibin de hîn zêdetir pêwîstiya mirov bi hêvî û hezkirinê çêdibe, di rastiya xwe de ne weke pêwîst bêriya wê tê kirin. Pergala çewt mirov dehî nava valatiya manewyetê kirine û ev milê mirovan birçî ye. Gelek mirov hezkirina rast û hêviyê najîn, wisa bawer dikin ku bêhêvîbûn çarenûsa wan e. Weke jinek gerîla hêviya di dilê min de rizgariya gelekî û jin bi cewhera hestên xwe ve jiyîn û azadbûn e. Di vê wateyê de PKK'ê tevgera hêviyê ye. Di vê pêvajoyê de hêviyê cihê girîng di jiyana min de girt. Ez di xwe de rihek û di rihekê de jiyanekê dafirînim. Hêvî parçeyek min e, hezkirin û bêrîkirina min a bêdawî ye. Hêvî dîroka mirovahiyê, tembûra çîroka jiyana min û çîrûska dest jê nayê berdan e.

16 Çile 2008

Neparvekirin Parvenekirin

Çima weke ji hundirê mirov tê nikare bijî? Çima nikare hizirandin û tiştên di nav de ne parve bike? Mirov hebûnek dihezîre û hîs dike ye. Hizirandin û hestên nayên parkirin di nav robarê demê de mahkûmî rizandinê ye. Em li dayîkekê bi hizirin. Jineke ducanî nemzeta dayîkîtiyê ye. Dayîk neh mehan zarok di zikê xwe de radike. Ev zarok kêlî bi kêlî gelek hest û hizirandin bi dayîkê dide jiyîn. Ger dayîk ev tiştên jiyîne binivîse, têkildarî rastiye dê bibe roman û tiştên li hemberî zaroka xwe jiyane vebêje wê çiqes bibe nîrxek mezin ne wisa? Wê cîhana jin a ji derve li dîrokê bê neqşandin. Dema li ser hizirandina te re roj derbas dibin û tu parve nakî, peşemânî dijî lê piştî çi? Mirov hebûnek balkêşe. Ez dihezirim gerîlayek, çi jin û çi xort ferq nake, ger hemû tiştên dijî yan hizirandin û hîskirinên xwe bi hemû rastiya wê ve parve bike yan wate bide tiştên dijî û bi nav bike bawerim wê gelek pêşketin çêbibin. Gelek caran mirov nîzane wê hizirandin û hestên xwe çawa pêname bike. Hinek deman mirov pir tengav û aciz dibe, lê li çavkaniya van tengaviyan nagere û heta hewl nade sedema wê bibîne. Heta hinek nîzanin çi dijî. Ango ew qas ji xwe biyanî ne. Yê li hemberî xwe biyanî ne li hemberî jîyan û gelê xwe jî biyanî ne. Em weke koçberan disekin li gel tiştên me jiyîne û rawestgeha tiştên em ê bijî.

Çiqas sosret e! Em mişextên hizirandinên xwe û tiştên dijî ne. Ez jî mişextê tiştên min di vê pêvajoyê de jiyîne, dema mirov li jiyana xwe dihezîre encama gihîştîmê dibe ev. Jîyan çawa di hûrguliyên xwe de veşartîye, ger aliyên tak ên veşartî werin zelalkirin wê gavên mezin ên di asta pêkanîna şoreşê de werin avêtin. Mirovên nîzanin çi dijî û ji tiştên dijî direvin her tim mahkûmê kor û kulek rêveçûnê ne. Yê pîroziya jîyanê fêm nekin, wê her tim bi rûyê nerast ê seranserîya jîyanê cîhanê hembêz bikin.

17 Çile 2008

Azadkirina jîyanê bi parkirinên rast jîyanî dibe

Tak û civak xalên berdewam ên mejiyê me mijûl dikine. Di hinek çaxan de dema civak di asta herî pîroz de cihê xwe digire, di hinek çaxan de jî pîroziya civakê hatiye jibîrkirin û tak li ser civakê re hatiye girtin. Her wiha bi hêrsa bi hezar salan nîrxên mirovî hatine binpêkirin, ên paşeroj

xistine nav çalên tarî bê binyat bejin didin. Pêvajoyên dîrokî em fêrkirin ku divê tiştek nebe qurbanê hev.

Em bi parêznameya Rêbertî dixwazin bersivê ji nakokiyên xwe re bibînin. Di xala heta ku derê civak û heta ku derê tak zelalbûn çêbû. Di dema civak û tak bigihin hevsengiya bi hev re bûnê wê azadî pêş bikeve. Ne takên bê civak û ne jî civaka bê tak dikare azad bibe. Di dema civak û tak di pîvanên bingehîn de gihiştin hev jiyan azad û bi aramî dibe. Ya di nav civakê de guhertin, pêşketin û dînamîzmê bixe tevgerê wê jina azad û serfiraz be. Azadiya jinê azadiya civakê ye. Azadiya civakê bi şikandina zincîrên koletiya jinê re derbas dibe. Çendî mantiqê civaka zayentperest were derbaskirin em ê ew qas bibin xwedî jiyanek xweşik. Jin dikare bi serê xwe jî têkoşîn bike, lê wê guhertin bi bizavek giran çêbibin, lê ger ji milê xortan ve jî têkoşîn were pêşxistin dê bi leza ronahiyê pêşketin çêbibin.

Her tiştên em bixwazin xweşik be divê bi hev re ked û xebat bê dayîn. Ma jiyan ji xebat, ked û parkirinê pêknayê û xweşik nabe? Tak û civak, jin û zîlam bi nîrxdayîna hev re dikarin bibin xwedî jiyanek rast, an wê her tim di nav sekenek her tim êş didin hev de bin. Ger pêkenîna rojê ya bi dinyayê re hebe çi pêwîstî vê heye.

22 Çile 2008

Divê ew qêr bijî

Dema salname heman rojê dide nîşa, ez wisa bawer dikim ku divê bersiva wê qîrê were dayîn. Sedema hatina min a Bakûr jî ew qêrîn di derfetên Bakûr de teqandina di dijmin de bû. Ger aliyên min ên kêr hebin jî ez ê li hemberî her zehmetiyê serkeftinê esas bigirim. Divê ez hêz ji gula berfînê bigirim, ger ev gul tevî hemû hişkbûn û asêbûnê şîn û mezin dibe, wê demê mirov çima hêza derbaskirina zehmetiyan ava neke? Girînge mirov bi xwe bawer be û ger bi îsrar be, di wê baweriyê de me ku dikare derbas bike.

Îşev bi hevalê Rizgar re nîqaşên me yên kûr çêbûn. Mijara me ya destpêkê dîroka jin bû, piştî wê artêşbûna jin û piştî wê jî gihiştin roja

îro. Me li ser mijarên rojane û xalên dihatin jiyîn pir nîqaş kir. Gotin gotinê vedike, demek dirêje bi vê gelemperiyê min bi kesekê re nîqaş nekiribû, ji bo min pir baş bû. Hevalê Rizgar, heval û fermanzarek wisa ye jig elek aliyên wî re rêz digirim. Hevalek wisa ye ji bo pêşxistina fermandarî, dilnizimiya avaniya xwe pêş bixe hevaleke di her warî de ke-dek mezin dide. Ji xebatên hizirandinê heta rêbazên çareserkirina pirs-girêkên rojane aliyên wî yên mînak hene. Ya herî girîng ji bo bi rastiya Rêbertiyê re bibe yek seknek wî ya xwe lêpîrsînkirin heye. Di rastiya xwe de gelek fermandar dikarin vî hevalê hêja ji xwe re mînak bigirin. Ezmûnên wî yên jiyanê mirov çiqas nêzî rastiye dike û bi rastiyan ob-jektîf re dike yek.

Erê, Mizgîn giyan tu qiralîçeya xewnên min î, min dîsa tu di xewna xwe de dîtî. Ez rewşa te mereq dikim, xwezî min kariba agahî ji te girtiba. Ma çûkên penaber nafirîn li wan deran ji bo ez agahiya mizgîniyê ji te bigirim û fêr bibim ka rewşa te baş e.

24 Çile 2008

Dîroka jinê di hest û nêrînên wê de veşartîye

Em di hembêza Sîser de bi komek hevalan re waneya dîroka jin dibînin. Ew biyanîbûna ji aliyê pergalê ve li ser zilaman hatî sepandin, pîrsgirêk ji cewhera wê razberkirin û dîrxistine.

Ez komûsyona vê waneyê bûm. Min dema perwerde dida min fer-senda xwe kûrkirinê jî dît, min bi waneyê re xwe jî di ber çavan re der-bas kir. Ez çiqas ji xwe biyanî me û tiştên ji zîhnîyeta zilam bandor dibim çi ne? Ev dişibe rêwîtiyek dûr, her ku lêhûrbûn dikim lêhûrbûnê zêdetir esas digirim. Bi hevalan re rû bi rû di nav lêhûrbûnekê de bûyîn, rêbaza herî baş di jiyanê de li ser perwerdê goftûgo kirine. Tiştên mirov li ser lêhûrbûn bikin ew qas pirin. Ev çi ne? Gerdûn, jin, mirov û em jinê nas dikin? Ger em nas dikin, ev naskirin çawa ye? Cihê serweriya za-yendperstiya civakî li ser hebe, ew cih ji xwezayîbûnê re nîne, bi taybet ger tu jinek bî.

Em çiqes nasnameyek bi qeyran dijîn. Ji aliyekê ve nêzîkbûnên ji aliyê seweriya zilam ve derdikevin pêş, ji aliyên din ve jî nefêmkirin û nehîskirina biyanîbûna hemzayendan te. Biyanîyê rastiya xwe, ji bo guhertinê girtî û xwe di nav zîhniyetek mûkemel de dîtî û jiyîn carna wisa giran tê nikarim vebêjim. Cîhana min a rûhî bi rakirina van zehmetiyê dijî. Ez jî weke jinekê ji ber vê dîroka tarî êşê dikşînim. Ez jî di nav dîroka jina azad a nehatî nivîsandin de bi hêviya bijîm êşan da-diqurtînim. Di demên wisa de dilê min dibêje; divê tu li roja ji Îmrîyê bilind dibe binêrî. Ji evîna tîrêjên roja min bi kelecana dîke û çavên min dibiriqîne dibim şervan.

26 Çile 2008

Merheba Mizgîn giyan

Ez qet nedihzirim ez ê li Bakûr bi ferastên wisa bêwate û bêniro re rû bi rû werim. Bakûr ji bo min warek pîroz bû, min bi vê pîroziyê hest û hizirandinên xwe strabû. Ez çiqas cuda li hevaltiya Bakûr hiziribûm, gelo hemû xeyal bûn? Nabe rastiyeke ew qas metirsîdar li Bakûr hebe, an ev der jî qirêj bûne? Lê ka stargeh û warê min ê azadiyê bû. Min ê li Bakûr bi rihê li vir xwe ji nû de avakiriba û min ê gavên azadiyê avêtiba.

Mizgîn giyan, ez ji hinek aliyan ve bêhêvîbûnê dijîm. Min nedixwest vê rastiyeke îfade bikim, lê ez vê dijîm. Ez ji nêveng û jiyana Başûr revîm, lê di aliyekê de min kêmanî kir. Ez bi hest û hizirandinên xwe bi rê dikevim. Min zindîbûn û bizava xwe xistiye quncigekê. Rêbaza jiyana min a rojane wisa derbas dibe. Sibê di 7.30 'ê de diçim perwerdê, heta nîvro di perwerdê de me. Piştî perwerdê dadikevim warê xwe yê xweser. Ez şev heta dema razanê yan dixwînim an dinivîsim. Ger komîsyon bim amadekarî dikim. A min bi hêz dike hezkirina min a ji bo we ye Mizgîn giyan. Ez ê bi çirûska hezkirina we bikevim rê.

7 Sibatê 2008

Ez ti caran naxwazim vê roja tarî binivîsim

Ez dixwazim 15'ê Sibatê weke min nejiye bihesibînim. Ma ev tişt nehatiba jiyîn wê çi biba? Aliyên me yên qirêj ev afirand, roja me ya pîroz

di navbera çar dîwaran de hepis kir. Ez di dilê xwe de êşek kûr dijîm û naxwazim 15'ê Sibatê bijîm, dubare dubare jiyîna vê me û min qehr dike. Weke ez li hemberî Rêbertiyê dirûtiyê dikim. Ji ber ev bû 9 sal Rêbertî hîn jiyane di quncên tarî de bi rê ve dibe. Ez weke endamek vê rêxistinê çi dikim? Ez çima xwe li ber herîkîna dem û nêvengê dihêlim?

Rêberê min, ez nizamî çî bêjim. Ji ber her rexnedayîna me di 15'ê Sibatê de dayî dubare dibe. Ji ber wê ez naxwazim bi wî rengî xitab bikim. Ji ber dema ez bûm xwedî çalakiyek bi hêz ez ê weke zarokekê destgulekê ji kulîlkên welatê xwe bidim we û dixwazim bi kelacana di hundirê xwe de bigirijim.

Rêberê min pir zora min diçe. Em bi ava jiyana we henase digirim û hêza tehemûlê didim nîşa. Ji rika hemû zehmetiyan ez ê bi karanîna vîna xwe ya şoreşgertî li hemberî xwe û paşverûtiyên nêvengê re şer bikim. Rêberê min, ez dîsa pirsgrêkên me û yên xwe ji we re dibêjim. Min nedixwest tengaviyên xwe ji we re bêjim, lê hinek tişt ew qas giranin. Ger kêmek jî be min rastiya Rêbertiyê nas nekira min ê rest kişandiba. Êdî tişteke mirov wînda bike nîne, bila tenê rûmet û lêgerîna mirov a azadiyê hebe û her tim têbikoşe.

Ji ber têkoşîn li hemberî hinek paşverûtiyên nêvengê nehatine kirin, ji ber wê ew qas li ser pîvan û paşverûtiyan sepandin heye, ger bi rengê tûj serdeçûyîn çêbibe wê bitemirin.

Bi hezkirinên xwe re Rêberê min.

15 Sibatê 2008

Derbazî biharek nû, salek nû û herêmek nû dibim

Ez bi hevalan re dest bi serpêhtiyek nû dikim. Ez di hemû tiştî de destpêkan dijîm û ez ê bijîm. Cara yekem ez di jiyana gerîla de ew qas hezkirin û hevaltî dijîm. Ez jî weke xweza, gerîla û jinê di nav xwezayîbûnên û nûbûnan de me.

Divê ez dest bi rojnivîsek din bikim. Lê lênûsek ez rojnivîs binivîsim nîne, lê ez ê di lênûsa têbiniyan de binivîsim heta ez lênûseke li gor

rengê dilê xwe bibînim. Gotin ji guh şop di dil de dihêle, lê nivîs ji nifşekî derbasî nifşê din dibe. Ji ber nîrx û wateyek nivîsê heye. Xweşikbûn tenê di jiyana azad û hevaltiya mirov li ser bingehek rast avakirî de ye.

Jiyanek tijî nûbûn li benda min e, piştî mehek din êdî em ê ji wargehan derkevin û dest bi pratîkê bikin. Ez bi kelecana im, ez xeyalê gelek tiştên ez ê bijîm dikim. Ez dixwazim çalakî li navenda Sêrtê bê kirin û di çalakiyê de leşkeran dîl bigirim. Ez dixwazim zehmetiyên min di vê wargehê de jiyîne veguherînim hêza çalakiyek mezin. Ez pir bi ferasetên takekes û nêzîkbûnên bi rik êşiyam û vê di min de li hemberî jiyanê dilşkestinek bi xwe re anî, lê bê ku guh bidim van nêzîkbûnan û li pêşiya xwe bikim asteng ez ê li dû xeyalên xwe bibezim. Di nav zîhniyeta zîlam de parkirina jiyanê ew qas zor e. Pir caran redkirin û biçûkxistina jina xwedî lêgerîn û daxwazên li gor xwe li jinê gerîn heye. Min cerekê din di vê wargeha zivistanê de fêhm kir ku divê em weke hejmar pir bin. Ger em sê hevalên jin ban me dê li vir pergala xwe ya rêxistinî bihêztir bida rûnişkandin û me dê renek cuda bida giştî.

Li Başûr tak di nav ziraviyan de nayê dahûrandin, ji ber vê tak bi çewtiyan re dimîne. Di rastiya xwe xalên zanistîya cins bi mirovan dide wînda kirin de di nav ziraviyên wê de veşartîye. Dema min ev rastî dît, min rêxistinbûna di ziraviyan de bingehek girt. Ez dibêjim; em ji cinsê xwe hez dikim û hêz jê digirin, lê rastî wisa xuya nake. Jiyan weke her demê mamostayek fêrkere. Em weke şervan û şagirtên vê jiyanê gavên nû davêjin pratîk û jiyana nû. Ev rastî min zêdetir wêrek dike û lêgerînên min bi hêz dike.

3 Adarê 2008

JI BO EGÎD

Rojnivîsa Xerzanê

Ji gîrnijînek te ya nîv mayî

Ji bo Rojê

Bûna Rêwî...

Ez zaroka şerê we me...

Merheba şervanê azadiyê yê di dilê min de

Em îro zayînek nû pêk dînin. Ez di îdeaya xwe carek din ji serhildêriya Bakûr pêk bînim de me. Îro ji bo min rojek cuda ye. Roja êş û hezkinên xwe bi ken diniquînîm.

Perwerdeya me ya zivistanê xilas bû û em ji bo biharê diçin rêgehên nû. Li Başûr jî oparasyon li ser hevalan heye. Em dixwazin barê hevalên li Başûr sivik bikin. Ez pir mereqa hevalan dikim. Di sir û seqema vê zivistanê de di çeperan de mayîn û şerkirin pêwîstî bi vîn û bawriyê heye. Girêdana hevalan a ji bo Rêbertî, gel û baweriya wan a ji bo azadiyê vê vînê derdixîne holê. Derfetên zivistanê yên zehmet wan bi hêz dike.

Îro platformên giştî hatin çêkirin. Piştî pêvajoya çend mehan perwerdeya ku min li Bakûr derbaskirî platforma min jî çêbû. Ez dixwazim rast û nerast wate bidim hemû rexneyan û wisa bijîm. Ez li Bakûr armanc dikim xwe ji nû de ava bikim. Ev platform di vê mijarê de ji min re bû alîkar. Ez dixwazim hinek zehmetiyên rû bi rûyê wan hatime parve bikim. Di platformê de min balkişand ser yek du xalan, lê hinek zehmetiyên min dîtin di hundirê min de man û min nikaribû îfade bikim.

Nêzîkbûna zîlam ji bo bûyer û diyardeyan pir cuda dibe. Xwedî zîhniyetek xwe esas û navand dibînin heye. Ji ber vê sedemê derûnî û hestên jinê fêhmakin û ji bo fêmkirinê jî hewldanek wan a pir cidî nîne. Dibe hemû heval ne wisa bin, lê piranî wisa nin. Ger hûn rastiye bixwazin ez ne li bendê me hemû rastiya jinê fêhmakin.

Di platforma min de tevî ez pir ji jiyanê hez dikim, nêrînên pêwîst bû ez hîn zêdetir tevî bibam hatin. Weke jinekê, bawer dikim divê ez hîn zêdetir di bîrdoziya rizgariya jinê de xwe kûr bikim.

Erê, di vê pêvajoyê de hinek zehmetiyên hundirîn hebûn, lê min destûr neda bandorê li ser jiyana giştî bike. Tevî min pir hewldan dan jî min pir zehmetî jiyân kir. Bi nêzîkbûnên desthilatdarî û jintiyê re jiyîn ew qas zor e! Li gel nêzîkbûnên hevalên xort zehmetî kişandin, bi helwesta hinek hevalên jin ên ji derveyî partiyê jiyîn zehmet bû. Ango ez ê van rojên bi êş di rojnivîsa xwe ya nû de binivîsim.

Yek jî îro roja ji dayîkbûna min bû. Min kes pê nehesand. Ez zayînek bi êş pêk tînim. Di berê de di rojên ji dayîkbûna min de vesaziyên min çêdibû. Lê vê carê ez bi rêbazek pir cuda pîroz dikim. Di hembêza Sîser de weke jineke li xwe digere di bêdengiya şevê de rojbûna xwe pîroz dikim. Ez pîrozbahiyên berê tînim bîra xwe. Bi taybet ez pir bêriya hinek hevalên xwe yên hêja dikim. Ger îşev ew li gel min bûna wê ev şev pir cuda ba. Ya girîng her roj veguherandina rojbûnek nû û tamkirina kêliyên azadiyê û jiyîn e. Ez dîsa di qêrîna bitenêbûnê de dikevim rê. Kê dizaniya ez ê rojek wisa derbas bikim? Piştî xwe didim cewhera xwebûna xwe û salek din li dû xwe dihêlim û pêşde diçim. Çavên xwe bi bêrîkin digirim, dibe ez hinek hevalên xwe yên hêja di xewna xwe de bibînim. Ji bo ez ji wan re bêjim ez pir bêriya we dikim û ji we hez dikim.

Hevaltî û dostaniya wan ew qas ji dile mirovan tim ber bi jiyana nû ve dibe. Li hemberî zehmetiyan hêza sebirkirin û bêhn firehiyê dide. Hevaltî tenê hêza ketina riyên raste.

25 Sibatê 2008/ Çiyayê Sîser

Jiyan di înkarkirina hestan re derbas nabe

Dema min îro rondik dibarandin min serî hilda li hember tiştên dijîm. 25'ê Sibatê hem rojbûna min bû û hem jî roja platforma min bû. Cara yek hinek rexne û şirove di vê platformê de hatî hebûn. Ez bi hinek şiroveyan hesiyam, lê min weke pirsgirêk negirt dest. Ez sedema wan dahûrîn dikim, ez weke xalên dikarim derbas bikim dibînim. Ji ber li ser rastiyên ez beşdar bûme min nêzîkbûnên nîvengê yên polîtîk di ber çav re derbas nekir. Ez bi safî beşdar bûm, min hinek pratîkên fêlbaz nexist hesabê û bi coşa hestên xwe beşdar bûm. Lê gelek kesan pir tiştên min

jîne, nejiîne. Tiştên em pêdihesin di rastiya bîrdoziyê de najîn ji ber wê em tengav dibin û dimînin.

Li gel van zehmetiyên giştî zehmetiyên din jî hene. Ya herî zor jî nêzîkbûnên hemcînsê te ye. Mirov diwestîne û tengav dike. Ez niha vê baştir fêhm dikim, çima di jiyana xwe de tim binketî û ji hezkirinê mahrum maye.

Ya herî girîng jî divê ez ji pêvajoyê re bibim bersiv. Ez di vê xalê de xwe lêpîrsîn dikim. Di hinek pêvajoyan de tu dixwazî hinek tiştan derbas bikî, yan tu nabî xwedî rêbazên derbaskirinê. Lê tevî van hemûyan jî tiştên jin dijîn dilsoz û girêdayîne. Lê zîlam ne wisa ye, ji ber hiziran-dinên xwe yên sûdparêz menfieta wan li kîjan alî be li gor wê nêz dibe, dikare piştî xwe bide bûyerên herî manewî û binrix. Weke pîvan ez xwedî li rastî û şaşiyên xwe derdikevim. Ez dema vê dikim bi rewakirina kêmaniyên xwe nakim.

Bi redkirinek çors, bi înkara tiştên min jiyîne guhertin û veguhetin, azadî nayê afirandin. Jiyana di înkara hestan de derbas nabe. Ya girîng rast nêzîkbûna hestan e.

Jiyana me her bi nîvçemayînan pêk tê? Weke aliyê jiyane balkêş dike jî ev e. Her tim di asta bi mereq hiştinê de mane. Tiştên tijî tijî dema wan temam bûne carek din derfeta jiyîn û hevesa wan nabe. Tiştên nîvî mane wê sibe weke stranekê bê qêrîn û nûbûna xwe diparêze.

29 Sibatê 2008

Merheba keça rojê, a hevghîna çiyayê Sîser bi heybeta xwe pêk tîne

Em her 8'ê Adarê bi hestên cuda dijîn. Dem dîsa li karkerên jin ên 8'ê Adarê digere. Ji sêsed, şeş û pênc rojan tenê rojek a me ye û dibe aga-hiya gelek jinan ji vê rojê nebe. Em weke ew jinên vê rojê bi bîrtînin, tam li gor naveroka vê rojê najîn. Jinên di cîhana zîlamên serdest de, jin di bin siya zîlamên de jiyanekekê bi rê ve dibin, bi hest û ramanên xwe najîn. Jina dibêje; ez dijîm li gor pîvanên pergale ji xwe re cih dibîne. Ev jî cewhera jinê temsîl nake.

Wateya herî mezin ji bo 8'ê Adarê, mirov xwe di pîvanên azadiyê de lêpirsîn bike û tiştên ber bi ramanên koletiyê ve dibe ret bike. Sala nû kirina destpêkek nû û azadî hembêzkirin wê ya herî bi wate be. Ya herî girîng li dû bêriyên xwe yên rast ên te di dilê xwe de mezin kirî, şînkirina hêviyên windabûyî yên welatê me yê xweşik e.

8'ê Adarê roja têkoşîna azadiyê digihîne lûtkeyan.

Lê gelek jin di vê rojê de ji “hevserê” xwe lêdanê dixwe, bi şkestina di çav û dilê xwe de vê çewisandinê ji xwe re weke çarenûs dibînin û serê xwe li ber ditewînin. Dayîkên me yên bi qêrînen xwe yên ji bo azadî û serî rakirina li meydana rastî barikat û eşkenceyan tên. Piştî wan didin ber copan û zikê wan didin ber pehînan, bi porê wan digirin û wan davêjin girtîgehan. Lê tevî hemû tiştî henaseya azadiyê digirin.

Di nav jinan de, ên herî bi şans jinên xwe gihandine felsefeya Rêber Apo ne. Jinên di nav PKK'ê de hinek cuda dijîn, bi xweşikirin û watedarkirina jiyanê re dijîn. Jinên gerîla îro kêfxweşiyek kûr û kelekcanekê dijîn. Bi xwezayê re di nav hev de, bi stranên çûkan re bi coş dibin, xwe ji siya zilaman xilas dikin û vê rojê weke jin pîroz dikin. Rihê 8'ê Adarê di lûtkeya çiyayan de bi agirê tê pêxistin mezin dibe. Dem û gerdûn ji aliyê jina azad û civaka azad ve weke robaran diherike çiyayan. 8'ê Adarê bi eşq û jiyan, di lûtkeya çiyayan de bi civata jinan pîroz dikin.

Par ez û hevala G. em bi hev re çûbûn tabûra Çarçêla. Roja me di rê de derbas bibû, lê ev ger pir xweşiya min çûbû. Meşek xweş bû. Min pir bêriya hevala G, Mizgîn û gelek hevalan kiriye. 8'ê Adarê li we pîroz be, jinên dildarên azadiyê.

Em îsal vê rojê li Xerzan di lûtkeya çiyayê Sîser de bi du hevalên jin û deh hevalên xort re pîroz dikin. Cara yek ez 8'ê Adarê bi hevalek jin tenê re pîroz dikim. Ew hevala jin a bi tenê li gel min, ji ber nêzîkbûnên xwe yên çewt û şaş da nîşa, di wateya sekna jin de seknek rast neda nîşa min bi rojan nîqaş kir. Nêzîkbûnên wê min tengav dike û di rojên dawî de jî min hewlest girt. Min bi sînora dida û distand. Bi wesîleya 8'ê Adarê min xwest vî sînorî rakim. Hêvî dikim nêzîkbûnên xwe dubare neke. Tevî heqareta li min kirî jî min dîsa xurura xwe da aliyekî. Min got

bila mezinatî ji min be. Ez bawer dikim di nêzîkbûnên xwe de bertek ji bo jin û tevgera jin heye.

Di rastiya xwe de ez îro bi tenê nebûm. Ji ber ez hest û ramanên bi hezaran jin di dilê xwe de hildigirim. Di vê roja girîng de biryarên min ji bo xwe girtine ez ê berbangana hembêz bikim.

Min îsal 8'ê Adarê li çiyayê Sîser pîroz kir. Ka em binêrin ez ê sala li pêş xwe li ku derê pîroz bikim?

Bi hêviya hemû roj bi azadî bin, bi hezkirin bimînin hevalên min ên jin.

8 Adarê 2008

Azadî

Di hûcreya xwe ya çend gavî

Ya roniya rojê nabînim de

Di warê xwe yê xweser

Ku min bi roniya fanosê xemilandî

Bêhn vedidim

Di koşka tenêbûna xwe de

Noqî xweşîkbûnên dinyayê bûm

Min tama azadiyê

Weke jinekê jiyan kir

Min

Di bihûşta warên welatê xwe de

Di bedewiya çiyayan de

Di çend gavan de

Di hêlîna çûkekê de jiyan kir
Dema min sal li du xwe hiştin
Û xwe dirêjî bedewiya asîman kir
Her tim destpêk jiyan kir

Di dinyaya Împaratorên biçûk de
Her tim tiyê parkirinê bûm
Di çolan de hesreta avê hatim hiştin
Di warek çend gavan de
Li hevaltiyê geriyam
Dema lêdana dilê bi hezaran mirovan
Di kêrahiya dilê xwe de dijîm
Di warên çend metre gav de dîl hatim girtin

Min bêriya we kir jinên xweşik
Min bêriya kulîlkên dilê xwe kirine
Jiyana bi we re ya li van warên bihûştê hebû
Hilmijîna biharan a bi we re hebû
Weke xezalan bûna gerîlaya çiyân hebû

Di navbera me de çiya, deşt û bajar
Ev dûrî û riyên qet nizanin xilas bibin

Dîsa jî

Nikarin min ji we qut bikin
Her tim di çavkaniya hezkirina we de
Bi tamkirina hêvî, eşq û azadiyê ve dijîm

Her ku ava jiyanê vedixwim
Dilê min dibe pola
Bi serbilindiya berfînekê
Dibim şervanek

Her çendî ev koşka çend metreyî
Bibe qefesa min jî
Ez di nav bêriyên jinên zanyar de
Dibim serpêhatiya dinyayê

Di mangeyek yek kesê de
Împratorên biçûk
Serdestiya xwe bisepînin jî
Nikarin mohr li azadiya dilê min bixin
Sînor û barîkatan nas nakim
Ji ber azadî banî min dike

10 Adarê 2008

Azweriya min a jiyanê êşan paqij dike

Mirov carna ji hemû deman re meydan dixwîne û di vê kêliya demê de tiştên ji bo wê serî hilde ew qas pirin. Bi taybet li hemberî neheqî, pêşbiryar û bêmafîyan xwe bi hêrsê dipêçin û serî hildidin.

Her çendî gelek caran bibe riya bidestxistina azadiyê jî, gelek caran weke agirê bi pûş bikeve dibe sedema tu pir tişên hêja ji dest bidî. Tu yê bi navê azadiyê derkevî ser rê û serî hildî. Ger te xwe baş guncûpêş nekiribe, rastiya pergala û dijmin nedahûrandibe tu yê bikevî xefikê, tu yê nikaribî xwe ji bûna pariyê pargalê rizgar bikî. Tu yê koletiya herî kûr bijî, wê tenê şansê henasegirtinê ji bo te bihêlin. Tu yê di ramana xwe de azad bî, hemû dîwaran derbas bikî û hemû sînoran rakî. Tu yê bi raman û hestên xwe li gerdûnê bigerî, bikevî ser riya herîkîna dîrokê û weke bifirî. Tu bêdawîbûna di raman de nizanî, tu yê her hewl bidî azad bihizirî. Girtîgeh, bend û kelepçe xwe li lingên te dipêçin, pêşbiryar siyê dixê ser ramanên te û wê hewl bidin te di warek teng de dîl bigirin.

Heta pêşdarezîn hebin her çendî aliyên mirov ên erênî hebin jî wê ev ji nedîtî ve werin. Dê ev lîstoka kes di serê xwe de ava dike jiyanê kor bike. Weke encam hemû hestên bê raman tînin hiştin ên herî zêde zîyanê didin rêxistinê ew bi xwe ne. **Tiştê herî zêde di nav nêvenga PKK'ê de ji min re giran tê bûyerên xwe kuştinê ne. Ez zehmetî dikşînim di fêmkirina xwe kuştinê de. Dema ez li qada Başûr bûm min digot, bila birevin lê bila xwe di nav me de nekujin. Ji ber peywendîya jin û zilam ên xwe kuştinê çêbûn. Lê dîsa piranî jin bûn. Bingeşa vê dîsa zîhnîyeta civaka zayendperst bû.** Jin xwe di girêkên kor de difetisîne. Hemû hêvî û hezîkirinên xwe yên jiyanê winda dike.

Divê mirov tevî hemû zor û êşan dildariya xwe ya jiyanê winda neke û her tim girêdanek wê hebe. Bêguman ti mirov mûkemel nîne. Derûniya

mirov diyardeyek pir telîhev û hinek deman di fêmkirinê de zehmetî tê jiyan.

Mirovê bi hestên paşverû nêzî cinsê hember dibe û “evîndar” dibe wisa dizane hemû evîndar bûne, ji ber wê nêzîkbûnên ji rêzê jî weke evîne digire dest. Mînak gerîlayeke li metropolan xebat dide meşandin, her tim di derûniya tê çavdêrîkirin de tevdigere. Wisa bi guman li hemû tiştî dinêre. Heta hinek deman ev rewş dibe sedem gerîla xwe bide dest.

Baş e, mirov çima serî hildidin?

Mirov nikarin hest û tiştên dijîn rave bikin. Ew mirovên xwe fêm nakin raman û hestên wan weke hêmanekê hereşe li jiyana mirov dike. Ev jî siyê dixê ser lêgerînên wan ên azadiyê.

Erê, azweriya min a jiyanê;

Di nav girêkên pêşdarez de henase digirim, carna ji bo min henasegirtin ew qas zehmet dibe nikarim vebêjim. Min zivistanek bi tenê derbas kir. Peywendiya min a bi giştî re jî ji 07.30’an heta 12.00’an, navbera nîvro xwarin xwarin û heta dema vexwarina çay. Min carna jî nikaribû nîvro van pêwîstiyên xwe pêk bînim. Tevî vê jî keda min dayî nayê dîtin. Sedema vê jî rik û pêşbiryarbûna kesên bû. Ev nêzîkbûn min bandor dike, dide zorê û li hemberî tiştên rast dizane jî serî hildide.

Duh rojek ji rojên taybet bû û min di dilê xwe de livînên bi coş jiyan. Livîneke nikarim sedema wê vebêjim. Duh sê heval ji bo çalakiyê, sê heval jî ji bo xebata mayîn çandina di arazî de ji wargehê veqetîn. Piştî şeş heval çûn em şeş kes jî li wargehê man. Ên di koma çalakiyê de; hevalê Agir, Erkan, Çiya û koma mayîn çandinê jî; hevalê Rojhat Markoz, Rojhat Cîlo û Baran bû.

Di vê pêvajoyê de pêkanîna çalakiyan pir girînge. Piştî lêhûrbûna zivistanê wê çalakiyek bi hêz deng vede. Zehmete bê zanîn wê di çalakiyê de çî biqewime. Em hemû bi guman dihizirin û hesab dikin. Dibe şehadetên em ne li bendê bin jî çêbibin. Bi van hevalan re baş û xirab rojên me yên xweş çêbûn. Çandeke hevaltiya PKK’ê heye. Her çendî hev êşandin jî hebe, divê dîsa xweş nêzî hev bibin. Nabe bi xeydandin û

şkestî ji hev veqetin. Jixwe wijdana mirov jî vê ranake. Di nav koma çûyî de hinek hevalên ez êşandim hebûn. Her çendî pêşbiryarên van hevalan derketibe holê jî min dîsa xwest bi wan re wêne bigirim. Lê hevalek nehat wêne negirt û kir mijara henekan. Dema mirov li ser riya çalakîyê jî be dikare wisa nêz bibe? Çiqas nêzîkbûnek metirsîdare.

Rêxistinbûn, divê tu vekirî rexneyên xwe li hevalên li gel xwe bikî û bi wî/ê re nîqaş bikî. An jî pîvanên hevalên xwe yên tu qebûl nakî di bin navê rêxistinbûnê de bi hevalên rêveberiyê re nîqaşkirin û di jiyane de nêzîkbûnên xwe bi acizbûn dana der ne rêxistinbûne. Min xwe di vê mijarê de qane kir; di rastiya xwe de hevaleke wisa dike hêza wê ya nîqaş û fêmkirinê nîne. Ji ber vê rêxistinbûnê wisa fêm dike.

Nêzîkbûnên wisa di nav rêxistinê de ji mirov re giran tê û êş dide. Lê dikariya wisa nebe. Ez tenê ya li hemberî xwe lêpîrsîn nakim. Ez xwe jî lêpîrsîn dikim, lê li hemberî min nêzîkbûnek ew qas şaş heye. Min ti caran weke ew nêzî min dibin nêzî wan nebûme. Ez her li ser bingeha hevaltîyê xweşik bikim nêz bûme. Lê ez her rastî van nêzîkbûnan hatim û pê êşiyam. Ez carna hatim asta henase negirim. Tevî zehmetiyên dijîm, ti caran tiştek cuda di dilê min re deras nebû. Ez ti caran naxwazim tiştek bi wan were. Daxwaza min ew e, çalakîya xwe bi serkeftî pêkbînin û vegerin.

Em hevaltîya di nîvî de mayî temam bikin. Tevî xalên ez pê êşame jî dîsa ji wan hez dikim. Em şeş heval li wargehê man. Cihê hevalên çûne ew qas diyar dibe, ji niha de min bêriya wan kiriye. Min dixwest bi wan re di vê çalakîyê de cih bigirim. Bi çalakîyê dest bi biharê kirin xweş e. Niha seet 00: 01'ê şevê nîşa dide. Divê ez biçim nobedar rakim û divê navberê bidimê.

13 Adarê 2008/Sîser

Hemû tişt bi diyardeya nîrxê dest pê dike

Bi qasî ji jiyane hez dikî, bi wate nêz dibî û ji bo jiyane xweşik bikî divê tu xwedî têkoşînek bê eman bî. An hûn nagihin jiyana azad a we xeyala wê dikir. Bi qasî rih didê hêvî û ramanên xwe dikarî bijî. Lê mixabin em

gelek caran jiyanê ber bi fetisandinê ve dibin. Bêguman têkoşîna em didin ji bo pêkanîna jiyanek azad e. Ji nezanîna derbaskirina dema pîroz em nikarin wate ji bidinê. Ji ber vê em xwe ji herîkîna derbasbûna rojê re dihêlin û rojane dijîn. Miroveke xwedî jiyanek wisa, bê ku di ferqa pir nirxan de be dijî û van nirxan hemûyan li ber herîkîna roberekî har berdide. Hemû tişt bi diyardeya nîrxê dest pê dike, dema tu nîrx didî tişteki xebat û hewldan çêdibe. Ji bo me nîrx herî mezin mirov û jiyana nû ye. Ji bo van diyardeyan em her tim nabin xwedî hewldanek bi hêz. Em a herî hêsan ji bo xwe hildibijêrin. Gelek caran an qebûl nake, nêzîkbûnên me yên biçûkxistin û bê wijdan çêdibin. Em navê vê jî dikin radîqalîzim û fereseta rêxistinê. Em paşverûtiyên xwe diveşêrin û hestên xwe hêmin dikin. Li vê derê şexs pir zêde xwe dixapîne. Dem deman em dikarin wisa bi zanabûn û bê zanabûn bikevin nav xeletiyên. Ya herî metirsîdar jî ev e, berî xwe nas bike bûna dadgerê hinek kesên din.

Ma pêwîst nake destpêkê xwe nas bike û xwe dadgeh bike? Em di xeletiyên de rêwîtiyê dikin. Ev nêzîkbûnên teng û paşverû koletiyê zêdetir dike.

Li gor xwe bûn, li pêşiya azadkirinê dibin asteng û rêxistinê ber bi zinaran ve dibe. Ev hişmendî jiyanê tevlihev dike, dibe sedem xebat û hewldanên rêxistinê jî neyên fêmkirin. Li qadên wisa divê ji aliyê bîrdozî ve bi hêz bî.

Ger di demên wisa de zanabûna azadiyê nebe bêwatebûn çeng davêje. Bêwatebûn jiyanê kor dike û mirovan xilas dike. Ez ê bi zanabûna singa xwe dana ber zehmetî, watedayîna jiyanê, azweriya xwe ya jiyanê bilindkirin û bi serhildêriya berfînekê bibin şervana azadiyê! Jiyanek xweşik bi şervantiya azadiyê pêk tê.

14 Adarê 2008/ Sîser

Merheba okyanûsa hezkirina di dilê min de

Demsala biharê muazem xweza guhertiye. Weke xweza û jiyana ji hemû nûbûnan ducanî be.

Guhertin û xweşikbûnên xwezayê avakirine bandorê li ser jiyana mirov a madî û manewî dike, demsala biharê mirovan hestiyar dike. Yek jî ez dihizirim demsala biharê kombûna hemû demsala ne. Bihar weke jinê ji bo nûbûn û zayînê ducaniye. Ne tenê weke biyolojîk bi ked, hez- kirin û feraseta xwe ya dadweriyê her tim li du avakirina cîhanek xweşik in.

Di biharê de dilopên baranê li ser canê xwe û sorbûna tîrêjên rojê di dilê xwe de hîs dikim. Em bi ahenga rengê bûka baranê diherikin azadiyê, dilê me di qefesa singa me de bi cih nabe ji ber wê kelecana me bigire û bêsebir bibin. Bihar mizgîniya jiyana nû û azadiyê ye.

Gelê Kurd di biharan de bi qêrînên azadiyê di nav pêtên agir de bi pîroziya Newrozê xwe ji nû ve ava dike. Newroz cejneke hemû kes di- kare bi hebûn, nasname, azadî, dadwerî û hezkirin bijî. Newroz ji dîrokê heta niha her tim li hemberî zilmê bûye serî rakirin. Axê Kurdistanê di nav sotînerbûna agir de azadî li lûtkeyan daye jiyîn. Ji ber vê li ser girên herî bilind, li çiyayan agir tê pêxistin û li hemberî zilma zaliman bi ge- randina govendê meydana tîr xwendin. Newroz di dilê gelê Kurd de xwedî dîrokek bilind e. Gelê Kurd bi bedeldayîna vê kevneşopiya xwe ya dîrokî derbasî sedsala 21. bûye. Ji bo gelê Kurd ê di tarîtiyê de hatî veşartin û koletiya herî dijwar dijî bigehe nasname, rûmet û azadiya xwe Mazlûm, Zekiye, Rewşan û bi sedan lehengên jin û xortên ciwan têkoşînek destanwarî avakirin.

Prometheus jî agir dizî û pêkêşî mirovahiyê kir. Rêber Apo jî jiyana xwe kir agir û bû zanayek pêşeroja me ronî dike, bi fêbûna jiyane re gelê Kurd bi xwe bûna xwe re anî gel hev.

Ev rojên em Newrozek din pîroz dikin, gelê Kurd bi tevîbûna xwebûnê bû lehî di qadan de, serî hildaye li hemberî pergala dewleta çewisîner û zextkar. Gelê Kurd sedema girêdana jiyana xwe ya bi Rêber

Apo re bi yek dengî diqêrin. Em bi fêrbûna Rêber Apo re bi coş dibin û xwe ji nû ve ava dikin.

Ji ber me ev cejna hezkirinê bi Rêber Apo re pîroz nekir dilê min ji ali-yekê ve şkestî dimîne. Rêberê min, ji Sîser heta Çarçêla ji Çarçêla heta Helgurt silav û hezkirinên xwe rêdikim û cejan we pîroz dikim. Ez niha li lûtkeya çiyayê Sîser im û heval li derdora min ji bo vê rojê derbasî pêşerojê bikin li ber makîna wêneyan digirnin. Yek jî dema ez van rêzan dinivîsim baran hêdî hêdî hûr hûr dibare. Her çendî vê baranê hinek rojnivîsa min a nû şil kiribe jî kêfa min ji barîna vê baranê re hat. Bi dilopên baranê re hestên min jî zêde dibe û dikeve ser riya okyanûsan.

Mizgîn giyan, min pir bêriya te kiriye û pir ji te hez dikim. Quling jî derbas nabin ez hezkirin û silavên xwe bişînim. Ez Newroza te jî pîroz dikim.

Dem weke robarekî diherike. Ez bi demê re salên dê nû bîn, hêvî, bêrî eşq û êşan re rêwîtiyê dikim. Weke sal û rojên ez li pişt xwe dihêlim xetên lînûsê jî bi jiyana xwe dixemilînim û tijî dikim. Ev bû demek dirêj rojnivîsa min a ji Mizgîn giyan pêk dihat xilas bû. Ev rojnivîsa min nû destpêkiriye jî di encama keda hevalan de hat rewşa lînûsa rojnivîsê. Ji ber bêhna kedê bi xwe re hildigire pir bi nîrx e.

Ez nivîsa xwe ya destpêkê di rojek wisa pîroz de dinivîsim û navê rojnivîsa xwe jî dikim Agir. Dixwazim bi gurbûna agir re jiyana mirov, xwezaya, hezkirin û sotînerbûna kedê hembêz bikim. Di dîroka mirovahiyê de nîrx dana agir, bi stirandina nîrxê gelê Kurd dide agir xwe davêjin stargeha germahiya agir. Dema bêriyên min dike xwelî û kelecana pêşerojek azad dijim, dê ev lînûsa min jî bibe dosta min. Dixwazim hemû tiştî bi wê re parve bikim. Dixwazim hemû kêfxweşî, xemgînî, tenêbûn û gelek tiştan parve bikim. Erê, agirê ji dostaniyê pêk tê, tu yê min fêm bikî ne wisa? Herî kêmtu yê hewl bidî min fêm bikî ne wisa? Netirse, ez te di bêtewebûnan de nafetisînim. Dosta min, min bi kêmanî û şaşiyên min ve weke min nas bike.

Agir di hinek deman de dostek wisa ye! Agir ji bo gerîla xwedî wateyek cuda ye. Weke tiştên ez niha pê dihesim, dest û lingên min dicemidin,

tiliyên min bi zorê pêûsê digire, lê bi hewla hizirandina germahiya agir, bi agir dihesim. Bi vî rengî li ber xwe didim û nivîsandinê dewam dikim. Dixwazim vê roja bi wate li derve li ber vê serma û barîna baranê derbas bikim.

Hewa girtiye, baran dibare û li hinek giran berf heye lê ez guh nadimê. Ji ber îro bi hezaran mirov herikîne kolanan û bi hezkirin Newrozê pîroz dikin. Bi xeyalkirina bi wan re, ez jî li qadan li hemberî efendiyê zaliman dibêjim, bi can bi xwîn, em bi te re ne ey Serok û diqêrîm. Hûn ne bi tenê ne mirovên xweşik, li pişt we bi hezaran gerîla hene. Dilê me bi yekbûna dilê we re lêdide.

21 Adarê 2008/ Çiyayê Sîser

Merheba jina ji agir

Erê, hêviya min a di dorpêça agir de, em êdî meha Adarê li pişt xwe dihêlin. Wê xunçe ji me re bêjin merheba. Em ê weke robarên diherikin riya xwe dewam bikin.

Em ê derbasî pratîkê bibin, hevalên ji bo çalakiyê çûbûn hîn nehatine. Êdî dixwazim biçim bigerim, biharê bi hemû bedewbûna wê ve bijîm. Dixwazim cudabûna vê biharê binasim. Bi biharê re bikevim nav xwezayê. Dema ji dûr de li arazî dinêrim axînen kûr dikşînim. Xwezaya şînbûyî her tim çiyayên Zagrosê tîne bîra min. Baxçeyên van gundan jî min dike geroka Şamkê, Sitûnê û Çarçêla. Min pir bêriya erdnîgariya Zagros û hevalên li wir kiriye. Zargos warê dîroka azadiyan digihîne hev; efsûna hezkirin, ked, ax û hevaltiyê ye.

Jiyana me ya li çiyayê Sîser bi nîvmayînan re diherike û diçe. Ez dibêjim nîvî ji ber di asta min xeyal dikir de em najîn. Sedema vê derfet, rastiyên hene û yek ji ber nêzîkbûnên hevalan ên şaş e. Mirovên bi qirîz dixwazin hemû tiştên li derdora xwe bi xwe re bînin rewşa qirîzê. Dema vê nekin jî rihet nabin. Yên wisa ji bo xwe di nêvenga giştî de bidin qebûlkirin dikevin nav nêzîkbûnên sosret. Hinek ji bo ya li hemberî xwe dikeve nav nêzîkbûnên xwe pêşkêş dikin û ji xwezayîbûna wan tê. Di

rastiya xwe de ev kes di rewşek ji rastiya xwe di reve de ye. Ji ber vê pirsgirêkên wê bi rengekî xwe dubare dikin û guhertinê ava nake.

Yek jî kesayetên bi qirîz wisa dihizirin weke her tim bêmafî li wan tê kirin. Di rastiya xwe de kesek wisa nîne, dema yek ji derve li wê/î binêre wê bikeve nav derûniyek wisa weke her tim bêmafî lê hatiye kirin. Ji ber di cîhana xwe ya hundirîn de wisa dihizire, wê kengê bi çi re aciz bibe û bertek bide nîşan nediya e. Divê tu her kêlî xwe ji lêdana brûskê re amade bikî.

Jina ji agir. Min nedixwest van curên pirsgirêkan bi re te parve bikim. Ez wisa pê dihesim dema parve dikim xwe bê ast dikim.

Dilê min ê di agir de rêwîtiyê dike. Dixwazim tişên xweşik bi te re parve bikim. Dixwazim bi parkirinek ji qirîzan dûr, bi biryar bi te re bibim dost û heval.

Bê ku xwe di herikîna jiyânê de bifetisîmin, bi hizirandina pêvajoyê li ser bingeha pêşveçûnên giştî bikevin rê. Ez ê qet destûr nedim tiştek li beramberî armancên min ên li Bakûr bibe asteng.

23 Adarê 2008/Sîser

Di tama destpêkan de ji nû ve vebûn

Destpêk di jiyana mirovan de hem balkêşin hem metirsîdarin. Bi qasî kelecana bi destpêkirina karekî ava dibe, aliyên wê yên nayên zanîn hem mirovan dide hizirandin û hem jî dide tirsandin. Gelo her tim destpêk xweşin? An hinek deman xirab e? Her ku bijî û fêm dike dikare bi demê re biryara vê bide. Ez ê jî weke jinek gerîla cara yekem sezoneke pratîkê li herêma Xerzanê bimeşînim. Weke erka destpêkê em ê biçin keşfê. Ger guncav be em ê çalakîyê jî bikin. Ji aliyekê ve bêhna biharê ji aliyê din ve kelecana çalakîyê xwe li dilê min pêçaye. Ger weke em dixwazin keşf nebe jî wê tamkirina hewayê biharê ya sar û germ pir xweş be.

Berî em bi rê bikevin bi agahiyek xirab hejiyan. Şehadetên li Bestayê çêbibûn ji aliyê rêxstina me ve hat eşkerekirin. Hinek heval hîn nû der-

bas bibûn û berî biharê li Bakûr bijîn şehîd ketin. Ev windahiyên bi kom ji min re giran tê û ya herî metirsîdar jî heval di wargeha zivistanê de ketine nav pevçûnê. Ji ber wê ev qas windahî hatine jiyîn. Bi vê agahiya êş di dilê me de çêkir diçin xebata keşfê.

Em xwe ji Sîser ber bi jêr ve berdidin, weke xwe ji asîmanan berdi erdê. Li ser baskên heloyan ji bilindahiyê xwe noqî jêr dikin û piştîre dîsa difirin cihên herî bilind. Em duh bi gewrbûna hewayê re bi rê ketibûn. Em di tariyê de gihîştin wargeha şehîd Selîm. Me xwest li ava Şêx Cuma bidin û derbasî aliyê din bibin, lê av pir bilind bû, ji ber hêza mezinbûna avê em nikarin li avê bidin. Em dibêjin, dibe av kêr bibê û li benda sibê dimînin. Ger ev jî nebe neçar em ê bi ser pirê re derbas bibin. Vê carê jî wê riya me pir dirêj bibê. Dibe sibe, hewa pir sargerm e. Şev ji hizirandîna min texmîn dikir zêdetir germ derbas bû û mirov ji xewa ji derve jî têr nabe. Ew qas xweşe mirov her dixwaze ji der ve raze. Di hewayê paqij de razan û bi rojbaşê çûkan re şiyarbûn tiştêk şahaneye! Bi vebûna hewayê re hevalê Zagros agirek gerîla yê bê dûkêl pê dixê. Em çaya xwe ji ava kaniyek xwezayî çêdikin. Yek jî penîrê me heye. Sifreyek dewlemend a gerîla, yek jî ez giyayê destpêka biharê tirşok û guhreşk kom dikim. Heval dibêjin; kom neke di taştê de nayê xwarin. Lê ez dibêjim; wê were xwarin û bi tam dixim nav nan. Bi penîr re dibe sendewîçek xwezayî û mirov ji tama wê têr nabe. Ma niha dibe heval, mirov li herêma Xerzanê giyayê biharê yê taze nexwe! Koma me ya keşfê ji hevala Cîhan, Zagros û Delîl pêk tê. Heval wê piştî taştê biçin avê kontrol bikin. Ger bikarin wê derbasî aliyê din bibin.

Çûn û hatin, heta jorê şûtika xwe şil bûne, dema ez vê rewşa wan dibinim dikenim. Heval heta nîva avê çûne, av derbas nekirine û paşde vegeîne. Hevalê Xeyrî û Rojhat ên ji bo gubêrê hatine, em ji bo hevalê Rizgar, Rojhat û Baran ên li wargehê mane giya dişînin. Dixwazim ew jî giyayê destpêka biharê bixwin. Min ji niha de bêriya wan kiriye.

Bi hevala Cîhan re weke jin di nav xebatên keşfê de cih girtin girînge. Hevalê Kurtay ê li Besta şehîd bûyî hevala Cîhan nas dikir û bi şehadeta hevalan pir bandor bû. Piştî vê agahiya şehadetê ez çûm û min ew hembêz kir, min nexwest wê bi tenê bihêlim û ji bo vê pêvajoyê derbas

bike ez ê bibim alîkar. Ez ê ji gelek nêzîkbûnên hevala Cîhan re hêza seberê bidim nîşan. Dema di zehmetiyê de be ez nikarim pişta xwe bidimê. Ji bo zehmetiyên xwe derbas bike ez dibim alîkar.

Xwarina me ya nîvro dîsa giya û penîr e. Hevalê Zagros dibêje; heval giya nexwin, ger hûn giya bixwin wê îştaha wan zêdetir vebe û nanê me têrê nake. Ez jî dibêjim; bila wê demê te nan pir anîba û bersiv didimê. Em henekan bi hev dikin lê bi rastî jî îştaha me pir vebûye.

Piştî xwarinê em meşyan. Piştî hemû ceribandinan em naçar man ser pirê re derbas bibin. Em carekê diçin jor û carek din tîn jêr. Giyayê min xwariye min nerehet dike, penîr pir şor û li gel wê tirşokê zexta min bilind kiriye. Gotineke şaîr heye dibêje; “xwezî min tu nedîtiba,” ez jî dibêjim; xwezî min tu nexwariba.

Em di pala Kurîs de ber bi lûtkeyan ve dimeşin. Em ê li cihê baskên he-lo jê bilind bibe bimînin. Em çaya xwe ji kaniya wargeha Şehîd Ehmed a xweşik çêdikin. Hewa germe û xwêhdan li ser eniya me bûye dilop dilop û di ser rûyê me de tê xwar. Piştî meşa me ya çend seetan em digihin lûtkeyê. Êdî em li Kurîs in û li hemberî riya îpekê ne.

Cihê em ê keşfa wê bikin li hemberî me ye lê tang nehatiye wir. Qereqol û gund li hemberî me disekinin. Ronahiya seyarana û şevê riya îpekê ronî dikin. Ba bi demê re vediguhere bagerê. Ez û hevala Cîhan kîsê xwe yê xewê dikin yek, pişta xwe didin pişta hev û di ronîya heyvê de radizin. Her carê em şiyar dibin û çavdêriya derdor dikin. Berî دنیا vebe em diçin gel hevalên xort û çend metro li jor bi cih dibin. Min li Kurîs hilhatina rojê nedît. Tişta ji vê meşê kêm ew bû. Piştî çend seetên din em ê ber bi wargeha xwe ve biçin. Em ê bi lûtkeyên Sîser ve hilkişin. Ev erka me ya yekem bû û xweş derbas bû. Bi hêviya hemû destpêk wisa xweş derbas bibin bi xêr bimînin Agir Giyan.

26 Adarê 2008

Lê digirim

Li wateya di reşkên çavên te de digirim

Hevdîtin ew qas zore
Ji bo dîtina wateya hemû temenê xwe
Min sal li du xwe hiştin
Di xemzeya xemgîniyê de
Girnijîn digihin dilê min
Di oxura dîtina te de
Rondikên min diherikin nav okyanûsan
Helbet min bêriyên xwe
Di rondikan de mezin nekir
Lê ma tu yê çi bikî!
Nikarim te nehizirim û bêriya te nekim
Her çendî awirên te ji pişt çiyayek sar binêre jî
Ez ê her tim li dilopa wateyê bigerim
Ez ê di avên çavên te yên rawestiyayî de
Melevaniya dostaniyê bikim
Di bêriya hevaltiyan de weke mûmê dihelim
Ma tu dizanî
Di sotîneriya agirekê de şewitandin
Çi ye?
Ey çiyayê çiyayan Sîser!
Di malzaroka tenêbûnê de jiyîn çi ye?
Gelo çarenûs e?
Di janên nenaskirinan de êş kişandin!

Fêm neke ku îsyan dikim keça çiya
Hêviya min tenê fêmkirin û hatina fêmkirine
Ger hemû gotinên xweşik li pêşiya min bên rêzkin jî
Wê dîsa çav û dilê min
Li du roniya di çavên te de be
Bi te re li xwe
Bi xwe re jî li te digerim
Ji bo dîtina rastiye

28 Adarê 2008/Sîser

Min pir bêriya hevala Mizgîn kiriye

Roja destpêka Nîsanê bêdeng, bê pêjin derbas dikim. Çi tiştêk seyre, di rastiya xwe de ez ne yeka di nav bêdengiyan de bimînim e. Çi bi min hatiye, yan ez kelecana xwe ya li hemberî jiyane wînda dikim? Ez fêrî tarzê qadê û nêzîkbûnê hevalên xort ên di taximê de nebûme. Dema wisa dibe ez bi tenê dimînim.

Di vê navberê de komek heval çûn li ser qereqola Şêx Cuma çalakiyê bikin. Ji bo çalakiyê min xwe pêşniyar kir, lê ji aliyê rêveberiyê ve guncav nehat dîtin. Gotin; ger hevala Cîhan neçe wê pir aciz bibe, ji ber wê gotin bila hevala Cîhan biçe. Hinek hevalan nedixwest hevalên jin di vê çalakiyê de cih bigirin, lê di encamê de hevalek jin cihê xwe di çalakiyê de girt. Pir xweş bû. Min dixwest cihê xwe di çalakiyê de bigirim, bi mehane li Bakûr im, lê hîn ez beşdarî çalakiyê nebûme û hêrsa min a divê ez li ser dijmin bibarînim bêhna min teng dike û min aciz dike.

Sedema hatina min a Bakûr hebû, armanca min ne vale rûnişkandin bû. Ez carna dikevim nav hîsên weke herêma Xerzanê li min nayê. Weke derfet û bingeha tiştên ez dixwazim bikim nîne. Ma ez li zinarekî ketim, çima rastiyan min wisa şaş bûn? Bi salan rastiyan ez li ser dimeşiyam, niha tam bûye berovajî wê. Çi seyr e.

Di jiyana mirov de nêveng çi qas xwedî bandor in, pênasikirina wê ew qas zor e. Di vê navberê de min biryar girt, heta demekê ez ê ti pêşniyariyan nekim. Ka em bibînim wê wate bidin vê helwesata min, ger wate nedin jî pir ne girîng e. Em sê heval li wargehê mane. Ez, hevalê Delîl û hevalê Rizgar ê fermanदारê herêmê bi hev re ne. Ji ber kes nîne çalak beşdarî hemû karan dibim. Ev ne cara yeke ez bi jimarek wisa kêr re dimînim ji bo wê bandorê li min nake.

Ez îro her li hevala Mizgîn hizirîm, min pir bêriya wê kiriye. Min bêriya hembêzkerin, serê xwe danîna ser çonga wê û hîskirina germahiya di dilê wê de kiriye. Niha kî dizane çi dike? Dibe 1'ê Nîsanê tijî tijî derbas dike. Ez 1'ê Nîsanê di hembêza çiyayê Sîser de jê dûr dijîm. Dibe wisa hîn baştîre û ev bêdengî min bipijîne. Feraseta min a pijînê ne ev e, dibe di min de pêşveçûnek cuda bide jiyîn.

Li pêşiya me çar demsal hene, ka em binêrin wê ew roj çawa derbas bibin?

1 Nîsanê 2008

Dem weke avê diherike

Duh ji bo min rojek pir sosret bû. Hevalên çûbûn çalakiyê bikin hatibûn, ji bo wan dilxweş bikim min hewl da lê nerihet bûm.

Duh li ser bêtêlê nîqaş hebûn. Hevala Rengîn nîqaş dimeşand, dema min dengê wê bihîst germahiyekê xwe li dilê min pêça. Di kêliyê de min xwe pir rihet hîs kir. Ez ketim nav pêhesînek weke wê hemû tişt baş derbas bibe. Daxwaziya min ew e heval hemû baş bin û min pir bêriya hemûyan kiriye.

Piştî van nîqaşan min şehadeta hevalê Adil bihist. Ez pir nebaş bûm. Şehîd Adil hevalek pir kevin bû. Hevalekî hîn zarok tevî nav refên rêxistinê bibû, ciwanî û dema gihiştina xwe di nav şoreşê de derbas kiribû. Hevalek cihê xwe di konseyê de digirt. Şehîd Adil hevalek bi jiyana xwe dîrokek bû. Mîrasa têkoşîna şoreşa azadiyê bû. Ji destpêka tevîbûnê heta niha cihê xwe her tim di nav nêvengên şerên sotîner de digirt. Her wiha dîsa di nav sotînerbûna şer de gihişt mertebeya şehadetê. He-

valên wisa bi şoreşê re mezin bûne kêrên tînin, şoreş bi xwêhdan, xwîn û keda van hevalan hat vê astê.

Ez bi hevalê şehîd Adil re pir nema me, lê hinek cihên ez nêz lê mame femandariya cephe û herêmê kiriye. Mirovên wisa bi nîrx windakirin pir garan e û bi rastî jî windahiyeke mezin e. Ez qet naxwazim ti heval şehîd bikevin, lê hevalên di nav şoreşê de mezin bûne qet naxwazim tiştek bi wan were. Divê hevalên wisa werin parastin. Hevalê Adil di pratîka xwe ya dawî ya li Gabarê de xebatên girîng meşandibû, darbeyên sehim li dijmin xisibû. Cihê xwe di gelek çalakî û keşfan de girtiye, heta di pêvajoyên dawiyê de ji aliyê rêxistinê ve hatiye rexnekirin. Ji ber ew qas çalak tevlîbûna wî rêxistinê xwestiye bi van rexneyan pêşî li şehadeteke were jiyîn bigire. Lê ma dijminê har bûye di cihê xwe de disekine? Di derfetên zivistanê yê zor de bi riya teknîkê heval şehîd xistine. Îsal pir şehadet li Gabarê çêbûn û nasnameya hinek hevalan hîn nehatiye eşkerekirin.

Mazlûm qet ji bîra min naçe. Ew jî li Gabarê dimîne. Yê herî dawî ji malbata me beşdar bûyî ew e, ew ê herî ciwan û nû yê me ye. Ez naxwazim tiştek bi wî were, ger tiştek pê were wê ji min re pir giran bê û ez nikarim rakim. Bila ez şehîd bikevim lê bila hevalê Mazlûm şehîd nekeve. Dema li şehîdan dihezirim min carekê dît digirîm. Li şûna girî bersiva herî baş bidim wan, dizanim hêviyên tu di pêşerojê de pêk bînin hene. Lê ez nikarim şehadeta hinek hevalan rakim. Ez pir bi şehadeta hevalê Adil bandor bûm, min nedixwest derdor jî pê bidim hesandin lê ez noq dibim û diçim. Mirov nizane li hemberî şehadetan çî bike, ax evîna min a di nav agir de li ber semahê sekinî!

Nobedariya min a seetek û nîv dest pê dike, ev yek xweşiya min diçe. Bi bêdengiya şevê re ez jî bêdeng dibim. Derdor guhdar dikim û bi bêdengiya şevê re dibim heval. Şev min bi xwe re dixirîkîne, bêdeng bêdeng ji xwe re xeyalan çêdikim. Xeyalên min, Xeyalên min jî her tim pêkanîna çalakiyek serkeftî bû û piştî wê jî ez ê kelecana jiyana xwe bijîm.

Divê çalakiyek yek kesî were kirin. Sibe 4'ê Nîsanê ye, îro di radyoya Mezopotamya de girêdayî jiyana Rêbertiyê bername çêkiribûn, baş bû.

Ev bernamên wisa dibin weke perwerdê. Gel ber bi Amarayê ve ketine rê, ez encama wê mereq dikim. Erê, ji ber leşker hatine jêrî me heval banî min dikin. Em ê tiştan kom bikin ji bo wê divê ez navberê bidimê.

Agir Giyan, ez bi kelecana im, dibe em çalakiyê li ser dijim bikin.

3 Nîsanê 2008/Seet:14.40/Sîser

Merheba barana Nîsanê

Barana rih dide hemû xwezayê û wisa dide mirov jî. Ger berf û baran nebarin av jî zêde nabin. Mirov nikarin di xwezayê de bê av bijîn. Baranên bi şidet di biharê de dibarin ziyanê didin pel û kulîlkên daran, lê dema mirov demdirêj dihezîre sûda wê baranê pir e. Baranên Nîsanê bi bereketin. Îsal li Xerzanê pel zû vebûn, dema hewa germ be, dar zû dest bi xemla pel şînkirinê dikin.

Her ku xweza bi bizavek lez diguhere, gelê Kurd jî ber bi Amara ve diherike. Dê vê jidayîkbûna pîroz, pîroz bikin.

Rêberê min rojbûna we pîroz be.

Îro roja xwe di baranên Nîsanê de şûştine. Îro roja rojbûna gihîştina azadiyê ye. Îro rojbûna azadiyê ye, kêliya gelê Kurd bi xwebûn û azadiya wî re dike yek e.

Rêberê min;

Hûn di girtîgehek tarî de ne, lê bi hezaran mirov bi hizirandin bi we re dijîn. Rêberê min, ez ji kulîlkên welat destegulekê ji bo we rêdikim û dilê xwe bi lehiya hezkirinê dişînim. Rêberê min, wê dijmin dîsa ji we biheside, bi hezaran mirov rojbûna we pîroz dikin. Rêberê min, ji dilê jinê, azadiya gerîla hezkirin û silavên xwe dişînim.

Min dixwest ji cihê duh di nîvî de maye berdewam bikim. Piştî çalakiya hevalan dijmin jî derket arazî, jixwe armanca me jî dijimin derxistina arazî bû. Lê cihên me bernamê kirine dijmin ne çûne wir, tam berovajî wê hatibûn jêrî wargeha me û mayînên me li wan cihan nebûn. Ji nêz ve çavdêrî dijmin kirin, ji aliyê fêmkirina bizav û derûniya wan pir baş

dibe. Bizavek wan a giran heye û weke ji hal ketine li şopên me digerin. Ger di arazî de bimînin em ê çalakîyê li ser wan bikin. Heval hemû amadene, hema em qutê xwe vedişêrin. Heval weke moriyan bê ku bisekinin ji vî alî bazdidin wî alî. Ger pevçûnek rû bide ji bo tiştên me li erdê nemînin. Di vê navberê de qesra min jî xirab bû. Me naylon û çadirên wê jêvekir û veşart, niha bi vî rengî bû qesrek pratîk, berê hundirê wê pir tarî bû. Niha ji ber hemû aliyên wê vekirîye her der bûye ronî.

Ber bi êvarî dijmin weke hatî paşde vedigere, plana me ya çalakîyê vale derket. Bêhna me teng dibe. Ez di wê baweriyê de me dikarin çalakîyek bi hêz bikin. Mirov naxwaze di vê meha Nîsanê de êşê bide kesê, lê ew bi xedarî nêz dibin, divê mirov di vê wateyê de bê bersiv nemine. Hevalên me yên herî hêja ji me girtin.

Barana Nîsanê tu berdewam bibare!

4 Nîsanê 2008/Sîser

Bi sorbûna rojê re noqî hezkirinê bûn

Roj piştî barana duh îro bi me û xwezayê re digirnije. Em jî vê girinîjînê bê bersiv nahêlin û ji bo germ bibin rûyê xwe dizivîrînin rojê. Dema roj min germ dike çûk ji aliyekî ve li derdora min stranan dibêjin. Pala Kurîs bi kulîlkên beyîvan dibe aliyekne xwezayê ya baklêş, dixwazim ji nêz ve li wan daran binêrim.

Ez duh piştî nîvro bi hevalê Xeyrî û Baran re çûm erkê. Ji aliyekî ve baran bi ser me de dibariya ji aliyê din ve jî ba dihat. Em jî di bin baranê de dimeşîyan. Ez şil dibim lê ne di xema min de bû! Tevî hemû tiştî ez ji gerê hez dikim. Her ku em xwe berdidin jêr mezinbûna pelên daran li ber çavên me dikevin. Hevalê Xeyrî bi gotina “sosret” heyraniya xwe tîne ziman. Kêfa hevalê Xeyrî ji mezinbûna pelên daran re tê. Ji bo gerîla pir girînge pelên daran vebin, dema pelên daran mezin dibin êdî pirsgerêka gerîla ya xwe veşartinê namîne. Em hewl didin ji bo şopên xwe baldar bin, lê ji ber şilbûna axê li hinek cihan dibe sedem şop çêbibe. Em pêl kevîran dikin û hewl didin di nav hejîk û pelên di payîzê de werîne derbas bibin.

Her du heval ji min nûtirin, lê heval li Bakûr ji min kevitirin. Ji ber rêzikan dizanin û weke pratîk pêktînin pir zêde tişteke bêjim nîne. Em tiştên xwe di bin kevirek mezin de vedişêrin û ji bo em cihê wê ji bîr û xelet nekin nîşanekê dihêlin. Divê mirov di ziraviyên gomê de baldar be. An wê gome eşkire bibe. Divê jorî gomê bi erdê re bibe yek. Me gomeyek pir saxlem çêkir. Piştî karê me xilas bû em ê bi rê bikevin. Baran sekinî lê em şilin. Destê me bûye toz û ax, em ava li ser keviran kombûye pê destê xwe dişon. Bi şekirê cejnê yê hevalê Xeyrî dayî em devê xwe şîrîn dikin. Ez qalkê şekir jî di bin kevirekî de bi cih dikim. Dema qalik bi cih dikim ji hevalan re dibêjim; binêrin ez gilêşa xwe jî di-veşêrim, ew jî bersivê didin û dibêjin; jixwe em her tim wisa dikin. Heta hevalê Xeyrî mînaka hevala Sarya nede nasekine. Rojekê hevala Sarya diçe gund erkê û dema vedigere dixwaze ji hevalan re bêje di kêliya erkê de çiqas şiyare. Heval ji hevala Sarya dipirsin û dibêjin; tu çawa şiyar bûyî. Ew jî dibêje; heval em heta ketin gund û ji gund derketin emniyeta çeka min vekirîbû bi vî rengî bersiv dide. Heval jî li hemberî vê bersivê digirniyin û dibêjin; hevala Sarya em her tim wisa dikin. Veşartina qalikê şekir ev bîranîn anî bîra hevalan. Erê, êdî em di rê de ne. Piştî demekê em navbera cixarê didinê. Hevalê Baran tenê cixarê vedixwe. Di vê navberê de em bîranînên hevalê Baran ên payîzê guhdar dikin. Ji ber di payîzê de hejmara hevalan kêmtir bû, hevalan xebatên hêza wan derbas dikir meşandine. Ev jî di wan de acizbûn û westandin daye çêkirin. Dema amadekariyên zivistanê xilas kirine hevalê Baran staranek nivîsandiye. Bi qasî gotinên wê tîne bîra min wisa bû: Xwezî ez dara li noqtê bam. Ji ber dar her tim li wargehê ye, daxwazên xwe bi wê re ravekirine, lê em bi vê stranê dikenin. Westandin jî nikare li hemberî ilhama strançêkirina hevalan bibe asteng. Vaye ev e şoreşgerî, henekên xwe bi zor û westandinê dikin. Piştî cixarê em riya xwe berdewam dikin û digihin wargeha xwe. Em xebatekî wisa bi dawî dikin.

Ez hez nakim bi berdewamî li cihekî bimînim. Ez dixwazim her tim bigerim û di nav tevgerê de bim. Li cihekî mayîn ne li gor min e, tevgerbûn hevsengiyê bi xwezaya min re pêk tîne. Ez hez dikim bi tevgera perperîkê bijîm. Dixwazim her tim biçim cihên cuda û tiştên cuda bijîm. Dixwazim van hemû mana li hinek cihan parçe bikim. Li hinek cihan

mayîn weke temen û dem ji min didize. Ez wisa dihizirim divê mirov jiyanê ji yeksanbûnê derxîne, divê mirov bihevrebûna rengan bibîne û wisa bijî.

Divê mirov ne cih, ne derfet û dilê xwe li cihekî bihêle û xwe di yeksanbûnan de heps neke. Divê mirov li pişt hemû tişt û sînorî bihizire û hîs bike. Piştî demekî li hinek cihan mayîn û şûnde, êdî dubarebûn û bi sînoran mayîn çêdibe. Divê mirov di nav yekbûna rengê bûka baranê de bijî.

5 Nîsanê 2008/ Sîser

Merheba hezkirina min a min di nav sotînerbûna agir de mezin kirî

Azadî di nav zehmetî û êşan de mezin dibe. Her roj qurtek ava gihiştina azadiyê vedixwim, weke bi nînokên xwe bikolim heta av derkeve ser rûyê axê. Piştî avê dixim kulma xwe, weke av ji nav tiliyên min bi herike. Rijandina avê dibe bêrêbazbûna min. Di nav ava vedixwim de êş û tenêbûna min heye, lê di astek bilind de vîn û azadiya min heye. Min gotibû; bi serhildêriya berfînê bûna şervan û hewl didim vê pêk bînim. Ger bi tenê jî bimînim û biçim ber darê îdamê jî ez ê dîsa serê xwe netewînim. Nêzîkbûnên paşverû, tarzên takekesî û serdest di riya azadiyê de her yek astengeke. Armanca min bi van diyardeyan re di nav têkoşînê de bûn û kêlî bi kêlî xwe lêpîrsînkirin, xwebûna xwe bi vê têkoşînê re ji nû de avakirine.

Têkoşîn her tim hîlbijartinan dixuliqîne. Bi qasî mirov têdikoşe dikare azad be. Weke biharê her tim xwe zindî girtin jî çavkaniya xwe ji cewhera çalabûna têkoşînê digire. Bê rêbazî mirov nade fêmkirin û tak tîne asta fetisandinê û derûniyên cuda çêdike. Bi qasî rêbaz were rûnişkandin encam ji têkoşînê tê girtin û digihe ser riya armanc kiriye. Rêbaz hem ava dike û hem jî heldiweşîne. Carna tevî tiştên rast jî tên gotin, ji bo ev neyê qebûlkirin mohra bêrêbazî li kesê ew tişt gotî tê xisitîn û dixwazin têkoşîna tê dayîn serê wê were girtin.

Duh di tekmlê de bi hinek şiroveyan li mejiyê min hat xistin. Şirove di bin navê rexneyan de dihat kirin, lê rexneyek şênber tenê jî li naverastê

tinebû. Dema nîqaş an jî bûyereke pêk tê yek alî pêk nayê, her tim du alî ye. Divê wê demê şaşiyên herdu alîyan li naverastê were danîn. Yekê bi hinek aliyên wê/î yê baş ve derxistina pêş û bi ser yê din de çûn gelo çiqas nêzîkbûnek rêxistinî û objektîfe? Ev yek mirov dide hizirandin, dibe niyet xirab nebe, lê weke nêzîkbûna pratîk ne objektîfe. Ez li vir behsa nîqaş çawa dest pê kiriye nakim. Dikarim vê bêjim, nêzîkbûnê paye, fêlbaz û teşhîrkirinê çêbûn. Min hemû tişt da ber çavan û hinek aliyê xwe yê tûj xist naverastê, nêzîkbûnê wî/ê yê paye, fêlbaziyê axatî, ji bo xwe rast derxîne serî li rêbaza çawsandinê dayîn û wê ev nêzîkbûn di pêş de kîjan encaman bi xwe re bîne danî holê. Dema ez bi van ferasetan re têkoşîn dikim, nabêjim ez çar bi çarim, ez tarz û pirs-girêkên feraseta di kes de derdikevin rexne dikim. Ez nahizirim ev kes ji derveyî rêxistinê ne, lê ez di wê baweriyê de me divê bi van nêzîkbûnan re têkoşîn were kirin. Dema têkoşîn dikim di heman demê de bi xwe re jî têdikoşim.

Ez nabêjim bila bi min re li hev bikin, berovajî wê bila bi kêmaniyên min re jî têkoşîn bikin. Lê ev rewşa dawî ne têkoşînek li ser bingeha azadiyê bû. Her wiha ev hemû feraseta yekbûna zîlamê desthilatdar bû.

Her wiha dîsa zayendperestiya civakî û nêzîkbûnê desthilatdariyê derketin pêşya min. Rêxistinbûn panzehîra van nêzîkbûnan e, rêxistinê jî bi van nêzîkbûnan re têkoşîn kir û cuda hewlesta min a tûj jî rexne kir. Bi serweriya rêxistinbûnê min moral girt û min carek din pêwîstî dît divê di pîvanên azadiyê de zêdetir xwe kûr bikim. Dibe li her derê serweriya rêxistinê nebe, divê ez ji vê re jî amade bim. Divê li gor giraniya her zehmetiyê xwe bi hêz bikim.

Ji bo li qadên Bakûr têkoşîna hundirîn bidî, divê tu di serweriya bîrdozî de kûr bî. Yek jî têkoşîna tê dayîn ger derdor jî alîkariya vê têkoşînê neke û fêm neke tak ji aliyê ruhî ve ber bi zinaran ve diçe. Yekê ku ji aliyê bîrdozî ve bi hêz be, ger bi tenê jî bimîne wisa hêsan hêsan di wateyên nebaş de bandor nabe. Ji ber ew morala xwe ji Rêbertî û şehîdan digire. Dema bi nêzîkbûnê wisa re rû bi rû dimînim her tim hevala Bêrîtan tê bîra min. Çetegeriya Ferhat çawa di bin navê rêxistinê de hevala Bêrîtan tecrît kir, hevala şehîd Bêrîtan jî çawa li

hemberî nêzkbûnên wî vîna xwe nîşan daye, divê em jî wisa bin. Têkoşîna hevala Bêrîtan a jîyanê dibe bingeha têkoşîna min.

Dema me ev têkoşîn di nav xwe de dida, leşkerên Tirk jî derketine arazî, parçe parçe li arazî dinêrin û di bin raçavkirinê re derbas dikin. Ev nêzîkbûna wan a rihet dibe bibe bingeha çalakiyek me ya xweş. Bizaveke wan a pir giran heye, hema diwestin dest ji xwe berdin û sist dibin. Hêza oparasoyê weke seet pêncan ji deşta Hevekê xwe berdan ser rê. Li ser rê weke moriyan xuya dikin, li pişt hev weke keriyê moriyan bûn. Dema ew li ser rê dimeşîyan, hema hevalê Rizgar got; ez ê biçim vê daristana li hember kontirol bikim. Hevalê Baran çawa bihîst hevalê Rizgar wisa dibêje, ket navberê û got; ez ê jî werim. Di wê navberê de min jî got; ez jî dixwazim werim, her wisa em her sê ketin ser rê.

Piştî pevçûna ruhî ya min duh jiyî, ev ger ji bo min baş bû û bêhna min fireh bû. Min hîs kir ku bêhna min fireh bû. Em her nêzî wê daristana me dixwest lê binêrin dibûn weke daristan ji me bireve. Ya rastî dema me ji wargehê lê dinêrî nêz xuya dikir, lê niha em dimeşin dimeşin xilas nabe. Dema em meşa xwe berdewam dikin carna disekinîn û çavdêriya dijmîn jî dikin, hîn ew jî dimeşin. Dema ew li me digerin em jî bi kêf çavdêriya wan dikin. Nepeniya gerîla ev e; bûna şervanên nepeniyan.

Ji ber destpêka biharê mirov dikare her cure giya li arazî bibîne. Dema vedigerin dest bi giya komkirinê dikin. Ji ber destpêkê giyayê soryaz li pêşiya me derdikeve em destpêkê soryazê kom dikin. Ez vî giyayî baş nas nakim, lê dema bostek bilind dibe ez nas dikim. Hevalê Rizgar nîşa min dike û ez jî kom dikim. Em berîkên xwe tijî dikin. Li gel min hinek nan û xwê heye, me hinek tirşok jî kom kir. Em li ser ava ji kaniyê diherike disekinîn. Dema tu tirşokê dixê nav nan, hinek xwê jî li ser dikî tama wê gelek xweş dibe û em bi îştah dixwin.

Dema em vegerîn wargehê, hevalê Xeyrî jî birinca bi giya çêkiribû. Bi rastî jî pir bi tam çêbibû, hemû hevalan gotin; pir xweş çêbibû. Hevalê Xeyrî yê ji vê rewşê pir kêfxweş bibû ez di satrançê de bin xistim. Gerîla ji lîstikan herî zêde lîstka satrançê dilîze. Bi taybet li Bakûr pir tê lîstin.

Bi qasî nêzîkbûnên zehmet di jiyana gerîla de hene, li gel vê gelek aliyên xwe yên pir xweş ên vê jiyânê jî hene. Di nav êşan de rûmet û hezkirinê bilind dikin. Divê tiştê jê re evîn tê gotin ev be. Di nav êşan de ketina rê û jiyana bilindkirin, bi lûtkeya hezkirinê ve hildikişin. Vaye jiyana ji vê pêk tê. Divê jiyana bi êş û xweşiyên wê ve were jiyîn. Divê bê wijdan nebî, jiyana û cîhanê hembêz bikî.

6 Nîsanê 2008

Agir Giyan

Em meha Nîsanê bi baran, teyrok, germahî û bi hemû aliyên wê ve tijî tijî dijîn.

Agir Giyan, bêhna min wisa teng bûye nikarim behs bikim, xwezî tiştek pratîkî heba min xwe pê mijûl kiriba. Tiştên me yên duh mabûn me di bin baranê de gome kirin. Ez ji baranê hez dikim, lê min nizanibû wê ev baran bibe rondikên çavan. Duh barê herî dawî yê min hilgirtî pir giran bû û heta min hilgirt felîşim. Tevî rê nêz bû min piştê xwe êşand û ez îro nexweş ketim.

Li Bestayê dîsa heft hevalên me şehîd ketine. Her hevalek mîsyonek wan a cuda hebû. Ez carna li hemberî şehadetên tîn jiyîn xwe bê hêz dibînim. Min piştî agahiya şehadetan bihîst bi hinceta giya komkirinê derketim arazî. Hevalan li pişt min banî kirin û gotin; were neçe baran dibare. Ma wê kî bi westandin, şilbûn û pêhesînê bihizire? Ji min re bêje; ma ev gengaze keça Sîser!

Ji bo negirîm zorê didim xwe. Her ku rondikên min hundirê min birîdar dike, baran jî weke şimaqekê li rûyê min dikeve. Baran carekê xurt dibe û carekê disekine. Ez her zorê didim xwe û bi xwe re dikevim nav pevçûnan û dibêjim; divê tu bi hêz bî, dibe windahiyên me yên girantir çêbibin.

Qralîçeya Norşînê, ma wisa ji nişkave çûyîna bêdem hebû? Ka me yê bi qulingan re silav ji hev re şandiba? Ka mane ez ê hîn çûbam warên tu lê ji dayîkbûyî û min ê behsa Xerzanê ji te re kiriba. Me dê kêfxweşiya carek din hev dîtinê bijiya. Ew rojên me bi hev re li Çarçêla derbas kirî

niha yek bi yek dijîm. Tu her li du tiştên xweşik de bûyî, te dixwest bibî xwedî jiyaneke weke xwe xweşik. Ji bo vê tu her tim bi zoriyan ve hildikşayî. Tu bi ser zoriyan de dimeşî dimeşî. Te her dixwest bibî xwedî jiyana çalakiyek bê hempa ya weke navê xwe. Te her tim têkoşîna vê dida. Tu çûyî gel Sorxwînan, niha li wî warê pêroz weke abîdeya azadiyê mezin dibî. Dema em ji hev veqetîn bi hêviya hevdîtinek din ketibûn ser rîyan û niha ez ê bê we bi rê bikevim.

Niha em ê çawa bikarin şhadeta hevalê Xelîl (Xelîl Dag) rakin? Ew her li pey xeyalên xwe bû. Xeyalên wî ew bi têkoşîna azadiyê re dabû nasîn û piştî cihê xwe di nav sotînerbûna şer de girtibû. Ew nûçegihanekî şer û gerîlayekî qilêş di destê wî de li hemberî dijmin disekinî bû. Ew yekî girêdayî hevaltî û rêhevalê hemû kesî bû. Ew yekî di nav lêgerîna jiyana hunermend; şanoger, fîlm, klîp û helbestan de bû. Tiştên hevi bes nedidît, di wî de bê dawîbûn hebû. Ew bêdawîbûna bi wî re ew ber bi çêkirina bernameyên belgefilîmên gerîla ve dibir. Divê ew li hemû deşt û çîyan bigeriya. Ew mûazam girêdayî çiya û gerîla bû. Dê hevalê Xelîl xeyalên xwe li Botan, Xerzan, Amed û Dêrsimê pêk anîba. Cihê xwe di beza mezin a maratonê de girtibû. Ketibû koma Dêrsimê. Çawa koma wan digihe Botanê bi dijmin re dikevin nav pevçûnê û kom hemû şehîd dikevin, ew û du hevalên jin rizgar dibin. Hevalek jin 'Dîrok' bi xeletî diçe gel şivanan, şivan wê jî radestî dijmin dike. Em tam nizanin çi bi hevala Berfîn hat? Hevalê Xelîl ji ber arazî nas dike di demek kurt de digihe hevalan û li gel wan dimîne. Ew pir bi biryar bû dê rêgeha xwe di jiyaneke de pêk anîba.

Min herî dawî hevalê Xelîl piştî Zapê li Bestayê dîtibû. Me wisa fêhmî dikir dê ew jî bi me re were, lê rêwîtiya wî ji bo biharê hatibû paşvexistin. Pir bi biryar bû. Min her tim jê re digot; divê tu lez nekî û hevalên din jî bi vî rengî dihizirîyan. Rêxistinê jî dixwest wî biparêze, ji ber vê yekê jî rêwîtiya wî paşde hatibû xistin. Lê guleyên dijmin ew ji nav me bir. Mîna dijmin bi serê hevalê Xelîl sond xwaribû. Çend caran hevalê Xelîl çembera mirinê şandibû. Mîna avekê herîkibû û rizgar bibû.

Hevalê Xelîl bi xwîna xwe rih da xeyalên xwe, di dilê gerîla de bê mirin bû, bû sembola hezkirina gel. Hevalê Xelîl bi serketina xwe ya di jiyaneke

de cihê xwe di dilê her kesê de çêdikir. Dema hevalê Xelîl li Zapê şanoya Manî amade dikir min ew nas kir. Min jî cihê xwe di vê şanoyê de girtibû, cara caran derfet çêdibûn em bi hev re nîqaş bikin. Di van nîqaşan de min fêhm kir ew mirovek pir hestiyar e. Bi van hestên xwe jiyan rakêşwer dikir. Di wê pêvajoyê de weke min gelek hevalan bi wê şanoyê hevalê Xelîl nas kiribû. Êdî li gelek cihan fersenda me çêbû em rastî hev werin. Min li ku derê hevalê Xelîl dîtiba hewl dida hinek tiştan çêbike. Di heman demê de dema hatibû Çarçêla ji bo nivîs û helbestên hevalan derbazî nav gel bike hewldanên wî pir çêdibûn. Vegotina hevalê Xelîl pir zehmete. Pir aliyên wî jî di nav nepeniyekê de bûn, mirov dikare bêje hevalek bê kêmasî bû. Ez van tiştan ji ber niha şehîd ketiye nanivîsim. Bi rastî jî ew mirovek muhteşem bû.

Ne gengaze mirov ji şehadeta van hevrêyên binirx bandor nebe. Hevalê Xelîl, hevalê Ararat û hevalên din xwe bi bask kirin û ber bê dawîbûnê ve firiyên. Bûn firîşte û bûn afrinerên berzbûn, azadî û serkeftinê. Her kêliya min bi wan re jiyan kirî û hemû kêlî wê ji min re bibin egera têkoşînê. Di çalakiya destpêkê cihê xwe tê de bigirim ez ê her guleyê weke agirê tolhildanê bavêjim. Ger ev agir dilê me bişewitine, hevalên herî binix ji me bistîne, ez ê vê hestê bi dijmin jî bidim jiyîn ka çawa ye.

Keça Çiyayên Sîserê!

Tu yê rê bidî min ne wisa? Divê ez tola hevalên xwe rakim û qêrîna xwe ya di nivî de mayî qêr bikim, tu min fêhm dikî ne Keça Sîserê? Ji ber vê yekê ez di hembêza te de çiqas êşan jî bikişînim ji bo min negirînge.

8 Nîsanê 2008

Merheba evîna min a di nav lerizîna agir de hîs dikim

Bi bergeha jina azadbûyî li jiyânê mêzandin û şirovekirina cîhanê. Bê ku li gor xwe li jiyân û cîhanê bînêrim bi rastiya bergeha jina azadbûyî jiyîn û pêhesîn. Ne jin ne jî zilam tam azad nebûne. Deriyê azadiyê ve-
kirîne, pêl derînceyan kirine, lê divê bi gelek pêpîlkan ve hilkişin. Yek jî yê agahiya wan ji azadiyê nîne hene.

Yek jî mijareke Rêbertî besh dike heye; ne nêzîkbûnên zilamtî û ne jî nêzîkbûnên jintî! Divê bi ronahiya vê perspektîfê nêzîkbûnên xwe dahûrînim. Hevalek xort ji min re got; tu bi bergeha jin jiyanê şirove nakî. Min jî got; pêwîstiya min bi lêhûrbûnê hebû. Hema ev peyv wisa ji xwe re nayê gotin. Mijar hemû ez çima bi xîtaba ji Sîser re dibêjim; “keça çîyan” e. An jî ez ji agir re dibêjim; “ jina ji agir.” Zora hevalên xort çûbû ez çima çîyayê Sîser dişibînim jinekê. Li gor çîroka çîyayê Sîser; Kember, Kurîs û Sîser sê xwîşk û birane. Kurîs li xwîşka xwe Kember dixê û serê wê dişkêne. Li wî cihê şandî kaniyek çêdibe. Niha li çîyayê Kember ew kanî heye. Sîser ê vê bûyera lêdanê dibîne, li birayê xwe Kurîs dixê. Hewl dide alîkariya xwîşka xwe bike. Serê Kurîs jî xweher dibe. Heya ji çîya tê serê xwe digire û dirêj dibe. Hinek jî dibêjin; ev ne xwîşk û birane, ev bûyer bûyereke eşqê ye. Sîser û Kurîs dibin evîndarê Kemberê. Şer û nakokiya wan li ser vî bingeşê pêş dikeve. Ango Sîser zilameke, çawa dibe ez wî dikim jin!

Ez dîsa îsrar dikim çîyayê Sîser jin e. Ez vî çîyayê nêzî xwe dibînim û hebûna xwe bi çîyan didim hîskirin. Niha di radyo de agahiya du hevalên me li Sêrt aliyê Aydın-Çayirliyê şehîd ketine dide. Hevalê Agir, Erhan û Çîya çûbûn wan aliyan çalakiyê bikin û hemû didin eşkerekirin ên şehîd bûne ew in. Ew hevalên em zivistanê bi hev re bûn şehîd ketine. Piştî vê agahiyê ez nikarim nivîsandinê berdeyam bikim Agir Giyan. Hizirandinên min belav bûn û hestên min dîsa noqî kûraniya xemgîniya okyanûsan bû.

10 Nîsanê 2008

Jiyana gerîla evîn û robareke dikerike

Di van çend rojên dawî de me çend tişt di nav hev de jiyan kir. Jiyana gerîla bi taybet li Bakûr cur bi cur û gelek tiştan bi hev re dijîn. Ger hestên te jî li gor bizava demê bi aheng nebe tu yê di bin de biperçiqî. Divê gerîla dil û mejiyê xwe bike weke pola. An nikare bijî. Xala gerîla ji kesek medenî cuda dike, ji aliyê felsefeya APOGERÎ ve bihêz li bûyer û diyardeyan nihêrîne.

Agir Giyan, ez nizanim ji ku derê dest pê bikim, weke bûyera pêşketî yan encama wê parve bikim? A herî baş weke herîkîna bûyerê behs bikim. Wê wisa hîn baştir be.

Hevalê Rizgar û Zagros çûbûn keşfa wargehek nû bikin. Dema em wargehê berdin cihekî em lê bi cih bibin digeriyan. Di vê navberê de em hevalên din bi pêwîstiyên ber bi êvarî werin kirin re mijûl dibûn. Di wê navberê de hevalê Rizgar û Zagros paşde vegerîn. Ez rabûm min xwe hinek amade kir û çûm gel hevalê Rizgar. Min dît heval tiştan kom di-kin, dema min pirsî çî bûye, bersiva min girtî gotin; heval şehîd ketine û em ê vê wargeha zivistanê berdin. Ez li hemberî van gotinan cemidîm. Min qet tiştek ne pirsî. Tenê bi hizirandina hevalên şehîd ketine min alîkariya hevalan kir û tişt kom kir.

Em piştî ji wargehê veqetiyar hatin gel ava Şêx Cuma, weke cara berê bilind nebû lê dîsa li gor bejna min pir bilind bû. Hevalên qelafet bi hêz bûn hema av derbas kirin û tiştên xwe derbasî aliyê din ê avê kirin. Dîsa hatin çenteyên me girtin û ez jî derbas kirim. Min destê hevalê Zagros girtibû. Av min dixişikîne serê min dizivire û min çavên xwe digirt. Bi lez herîkîna avê ez ditirsandim. Hevalê Zagros got; gavên xwe li pêşiya min navêje. Em hatin nîva avê sekinîn êdî min nikarî gavekê bavêjim, ji ber hevalê Zagros herdu destê min girtibû neçar bû naylonên di destê xwe de bihêle. Hema hevalek hat û destê min ê din girt, bi kurtasî min bi zorê av derbas kir. Li gor gotina hevalan, rengê min guherîbû.

Di dawiyê de me av derbas kir û xwe da pala Kurîs. Em heta sibê li ber deriyê şkefetê man. Piştî berbangê de em ber bi wargeha nû ve ketin rê. Cih nêz bû em zû ghiştinê. Her tim wisa di nav tevgerê de bûn xweş e, hem şansê te yê dîtina hemû cihan çêdibe û hem jî wisa nakevî bin çavdêriya dijamin.

Xwarinpêjê me yê îro xwest xwarinek xweş ji bo me çêke. Lê ferq ne-kiriyê li şûna xwê şekir avêtiye xwarinê. Min li tama xwarinê mêzand ji min re bê xwê hat, dema min ev ji wî re got; çû hinek din xwê anî avêtê. Min dîsa li tama wê nêrî. Dîsa bê xwê bû, min jî destê xwe xist nav xwê, lipên wê ji ya xwê cudatir bû, lê min dîsa avêt xwarinê. Lê piştî

min tiliya xwe xist devê xwe, min fêm kir li şûna xwê me şekir xistiye xwarinê. Pir hevalan xwarin nexwar. Lê hevalek ji bûyerê bê agahî hat bi îştah dest bi xwarin xwarinê kir. Em li bendê bûn bêje tamek cuda ji xwarinê tê, wî qet dengê xwe dernexist û hinek din xwarin xwest. Êdî min xwe negirt û dema min got; heval şekir avêtine xwarinê, xwarin hişt û li ser vê heneka rojê ya hevalê Xeyrî jî li ser zêde bû. Mînakê dayî xweş bû. Rojekê dema zarok şer dikan serê zarokekî dişkê lê zarok nagirî, dema ji nav zarokan zarokek dibêje; serê te şkestiye, dema destê xwe dide serê xwe ferq dike xwîn ji serê wî tê. Vê carê dema xwînê dibîne dest bi girî dike. Em hemû bi vê mînakê pir kenîyan.

Heval cihek nû keşf dikan. Zêdetir parastî û xweş e. Ji ber em ê çend rojan li vir bimînin hema em cihê xwe çênakin.

Em li ber tava heyvê ne heya sibê. Ez nanpêjim, li Xerzanê ez û hevalê Baran em ê nanê sêlê yê destpêka salê çêkin. Me nanek xweş çêkir. Hîn agahiyek şênber ji hevalan nîne, agahiyên tîr jî pîranî li ser bihîstina şehîdbûna wan e. Lê ez bawer nakim, ew dijîn min ev ji hevalê Rizgar re jî got. Erê, ew dijîn, ez pir ji kûr vê hîs dikim. Îro sêzdeyê mehê ye û dîsa wergeh guhertin heye. Dema dinya tam tarîbû em ê bikevin tevgerê. Demjimêr tam dihat heftan, di kêliyê de bi bêtêlê banî hevalê Zagros kirin. Dema hevalê Zagros dipirse kî ye, yê li hember dibêje; Agir e. Piştî me fêm kir ew in, em hemû pir bi kelecana bûn, ji kêfxweşîyan me nekarî xwe bigirin û ji bo vê agahiyê li çepikan dan. Em dixwazin demek berî demekê wan bibînin. Ew çûne wargeha me ya zivistanê. Hemû kes dixwaze demek berî demekê mizgîniyê bide hevalê Rizgar. Me qet navber nedayê û em gihiştin wargehê. Ji bo nebêjin, hemû kes şiyariyê dide hev. Piştî hevalê Delîl (şehîd Delîl Çinar) ji hevalê Rizgar re dibêje, ez ê tiştêkî ji te re bêjim. Weke hevalê Rizgar jî hîs kiribe pirsî û got; hevalê Agir wan hatin? Hevalan jî got; rast e. Kelecaneke xwe li hevalê Rizgar pêçabû, wî jî dest bi besebîrbûnê kiribû. Nikarî xwe bigire hema bi bêtêla biçûk bi wan re axivî. Hevalê Rizgar got; cara yek ez ew qas hestên cuda dijîm. Êdî em li benda wan nin. Roniya heyvê hawrîdor ronî kiriye. Kurîs li me hat, hevî dikan em her tim agahiyên wisa xweş bibihîzin. Em ji ber xatirê vê mizgîniya xweş peqlewa ji hevalê Rizgar dixwazin. Ew jî soz dide ku di derfetek baş de bixweze. Ew dema em li

bendê bûn hat. Dema em reşahiyên di ronîya heyvê de dilivîn dibînin, em fêhmî dikin heval hatin. Em hema diçin wan pêşwazî dikin. Hevalên xort bi hev hembêzkirin û maçkirinê hezkirinên xwe bi hev re parve dikin. Em jî bi germahiya hezkirina di hundirê xwe de silav didin wan. Dîtina wan pir xweş e û kêfxweşîyeke pênasîya wê zehmet e. Em hemû derdora wan dorpêç dikin. Em di bin ronîya heyvê de rûniştîne û bi wan re bêriyan didin derbas kirin. Wan jî pir bêriya me kiribû. Em bi mereq çîroka wan guhdar dikin. Behsa çawa ji dorpêça dijmin xilas bûne dikin.

Dema heval keşfa Çayirliya girêdayî Sêrtê dikin, zilamek pîr di wir de derbas dibe û hevalan dibîne. Piştî diçe şikayeta hevalan dike. Di nîva rojê de bi ser wargeha wan de digirin. Ew jî li dijmin didin û bi leza ro-nîyê ji wir dûr dikevin. Sê- çar rojan di nav oparasyonê de dimînin, lê dijmin wan nabîne. Hevalê Çiya cuda direve, hevalê Agir û Erhan jî bi hev re direvin. Heval berî çend rojan hatine gel hev. Tevî tam ronî nîne jî, em ferq dikin zêrî bûne û rih û porê wan tevî hev bûne. Erê, dema em guhdarî wan dikin dibînin kêfxweşîya em dijin ew jî dijin. A girîng parastina canê wan e. Demjimêr derbas dibin, dema heval hemû diçin razin ez jî diçim nobedariyê.

Erê, gerîla carek din bi serkeftina xwe ya herî bilind derewên dijmin vala derxist. Bi jiyîna van hevalan qadê, biryargeha navendî û hemû derya kêfxweş kiribû.

Ger ez hinek dereng jî mabim, dixwazim firsenda îro binirxînim û min dest bi parkirinê kir Agir Giyan. Bêdengî di xetên rû û xwîna min de diherike û diçe, lê bê ku vê ji xwe re bikim asteng, li ser têkoşîna me ya giştî û îtopyayên xwe dihizirim û moral didim xwe. Ger weke fîzîkî bi tenê bimînim û li vir bi tenê werim hiştin jî bandor nabim. Ez ê ji bo vê têkoşînekê bê hempa bidim. Ji ber rastiyeke min tenê heye; rastiya Rêbertî, şehîd û nirxên ez jê bawer dikim. Her çendî ji ber van bawerî û girêdanên min mirov pir li gor xwe nêz bibin, dibe demekî hinek pê bandor bibim, lê ji bo min nabe pirsgerêka bingeîn. Dibe berovajî xwezaya min e, lê ger mirov wisa dixwazin bila wisa be. Di encamê de gelek mirovên ez ji wan hez dikim û nirx didim wan hene. Ez bi mirovên

li vir re tevî cîhan û têkoşînê nebûme. Ji ber vê bila mirov hespên xwe bibeşîn tiştên vala û bê wate.

14 Nîsanê 2008

Merheba dilê min ê azweriya azadiyê

A jiyane azad bike nixên mirovbûnê ne. Ger bêparbûna mirovekî ji van nixan hebe, ez dihizirim negengaze azad bibe. Berî vê demekê her tim li ser jiyana hevaltî û rêxistinbûnê hizirîm. Ger nixra hevaltiyê nebe, hezkirina jiyane jî nabe. Ji ber ger hezkirina jiyane nebe wê demê hezkirina mirov jî nîne. Ên di nav nix û diyardayan de bi hêz nebin, nikare di kesayet, nîveng û jiyane de serweriya peywendiya rêxistinbûnê ava bike. Ez di wê baweriyê de me sînore azadiyê di xeta rêxistinbûnê re derbas dibe. Rêxistinbûn dihele mirov ji xirabî û kirêtiyê dûr bikeve. Ji bo xweşik bibin xwe di wateyan de dike xwelî. Miroveke parkirinê di pîvanên hevaltiya rast de pêktîne her tim xwe balkêş dike. Hevaltî jî wî/ê bi şervantiya rast re dike yek.

Agir Giyan, min di nivîsên xwe yên din de jî gotibû. Ez îro bi rastî û kêmaniyên xwe ve çî bim, min sibe jî wisa bibîne. Ez dema gihîştim mertebeya şehadetê jî bila kes nekeve nav hizirandeke sexta ya weke kêmaniyên min çênebûne. Ên di cîhana xwe ya hundirîn de derbare min de cuda dihizirîn dema ew roj hat bila cuda nêz nebin.

Agir Giyan; îro pêvajoya mehekê hat nixandin û min jî di civînê de ramanên xwe bi hevalan re parve kir. Mijarên bingeîn ên hizirandinên min li ser jiyana rêxistinî, hevaltî û ewlekariyê bû. Min taybet hewl da van mijaran binixînim. Bila em bi nêzîkbûnên vederkirinê nêzî hev nebin, hev fêm bikin û xwe tenê esas negirin. Ger em xwe nexin navenda hemû tiştî û bi empatî nêzî hev bibin nîqaşên ne pêwîst û bê ûslûbî çênabe. Bila em nixra hev bizanin.

16 Nîsanê 2008/Kurîs

Di nepeniya bîranînan de jiyîn!

Hinek kêlî hene dibe gotin tiştên tîn jiyîn venebêje. Lê ger weke hîs dike dikare heman rewşa hest û rih fêm bike. Ez îro jî bi nepeniya vê kêliya bi êş-kêfxweşiyê dihesim û dijîm. Lê ez nikarim bînim ser ziman, Agir Giyan ne derfet ne jî gengazbûna vê heye. Hinek kêliyên ez di nav de winda dibim çêdibin. Ji ber van deman, carna tengavbûnên min ên bêwate çêdibin.

Agir Giyan, tu dizanî xala ez herî zêde zoriyê dijîm çî ye? Nikarim aliyê mirovên ez nix didim wan ên baş û xirab qêr bikim. Ez weke biyanîyekê disekinim, sedema vê jî nêvenga goftugoyê nîne. Em hev şaş nas dikin û şaş şirove dikin, heta em gelek caran ji hev hêrs jî dibin.

Kêliyêk din ez ê bi hevalê Agir re biçim keşfê, ji ber min cihê xwe di vê xebatê de girtiye pir kêfxweşim. Ez bi vê kêfxweşiyê diçim. Agir Giyan ji bo çend rojan bi xatirê te.

18 Nîsanê 2008

Merheba dilê min ê dişibe rengê agir

Jiyana gerîla herî zêde di demsala biharê de bi reng e. Bi zanabûna jiyankirina kêliyê dijîn. Me bi rengê du koman xwe birêxistin kir, wê komê li ser qereqola Şêx Cuma çalakiya sekvaniyê pêkbîne, ya me jî wê keşfa girên Îskan, Werqanîz û Mûdûz bike. Ev bername keşfa duyeme. Divê her tim di plana gerîla de bernameya çalakiyê ya duyem hebe.

Her du kom bi hev re ketin ser rê. Tenê ferqa di navbera wan de xuleyeke. Hevalê Agir xatirê xwe ji hevalên li wargehê dimînin dixwaze. Em jî li pey wî xatirê xwe dixwazin. Taybetmendiya hevalê Agir xweşiya min çû. Dibêjin; di navbera şoreşgeran de xatir nayê xwestin, lê ger ji bo demek kurt ji be dixwazim roniya di çavên hevalên xwe de bigirim û wisa bikevim ser rê. Hevalê Agir nedixwest hevalên jin bi wî re biçin keşfê. Hincetek wî ya li gor xwe hebû. Bi gelemperî hevalên xort naxwazin hevalên jin bi wan re biçin erkan, ji ber dema hevalên jin bi wan re bin ne rihetin. Em ê bi vê feraseta hevalên xort re têkoşîn bikin.

Em diçin cihê xwe yê keşfê û em destpêkê Warqanîz keşf dikin. Hema li hemberî wê yekîneyên taybet hene. Çehş gir digirin. Dîsa çehş girê

Îskan digirin. Ez di vê rêwitiyê de ferq dikim ku şaşıyên me hene. Em ê bi demê re li ser rawstin. Em keşfa qereqola Mûdûz jî dikin. Ji bo pêkanîna çalakîyê pir guncav e. Di vê navberê de piştî ew bûyera hevalê Agir jiyaye û şûnde bi wî re çûna erkê pir xweşe, ez baş bi wî re li hev dikim. Em sê heval in, ê din jî hevalê Baran e. Em keşfek baş dikin. Min dixwest bi hemû aliyên xwe ve ev çar rojên min derbas kirine parve bikim. Derfeta min nîne û ez bi agahiyekê hilweşiyam, ji ber vê ez nika-rim vebêjim.

23 Nîsanê 2008

Merheba evîna min a di nav lerizîna agir de hîs dikim

Ez nikarim di vê pêvajoyê de bi kûranî bi te re baxivim. Nikarim goftu-go bikim, ev roj ji bo min pir zehmet derbas dibin. Di vê tarîtiya bê dawî de hêviya xwe bi hêz digirim. Her wiha ez naxwazim bawer bikim wisa ye. Giyanên xweşik, hizirandina bê nebûna we wisa zehmete, di vegotinê de zehmetiyê dijîm. Ka me soz dabû hev. Zû şehîd ketin nebû! Tu çima wisa zû çûyî. Ez nikarim li we nehizirim. Gelek caran noq dibim û diçim, naxwazim derdora xwe bi strana şewitî ya di hundirê xwe de bidim hîskirin. Dema hewl didim behsa we bikim çavên min tijî dibe û nikarim xwe bigirim. Nabe mirov li du şehîdan bigirê, lê hûn pir ciwan bûn û li Bakûr rojên we yên destpêkê bûn. Te têr av û hevaltiya Bakûr venexwar, ji ber vê zora min diçe. Her ku li we dihizirim êşa min zêdetir dinepîxe, ez li mirovên we li dû xwe hiştine dihizirim û zêdetir êş dik-şînim.

Ez carna bi xwe re aciz dibim, min çima hûn qane nekirin, min dizaniya hûn nikarin xwe biparêzin. Tu hîn bi paqîjiya zarokan nêzî gelek tiş-tan dibûyî, min dijwarbûna şer ji te re venegot. Ê di nav me de herî zêde ciwan û nû tu bûyî. Lê daxwaziya te ya ji bo şerkirinê, îsrara gerîlabûnê di qada Bakûr de li ser hemû astengiyan raser hat û di dawiyê de te pêşniyariya xwe bi rêxistinê da qebûl kirin. Lê çend sal bû rêxistinê tu her disekinandî û nedişandî. Nirxa her milîtanekê ji bo rêxistinê cuda ye û xweseriya xwe heye. Xweseriyên te jî hebûn. Ji ber vê diviya bû min tu parastiba.

Her roj şehadet çêdibin û min hevalên xwe yên herî hêja winda kirin. Ez pir bi şehadeta wan bandor bûm. Şehadeta we jî di asta van de bû. Mijar ne ew e, ev xizmê min e yan xizmê te ye! Tu jî vê dizanî, em weke xwîşk û bira mezin bûn. Ferq di navbera te û Ridwan de nebû, em wisa nêzî hev bûn. Yek jî dema mirov di heman armancê de dibin yek zêdetir nêzî hev dibin. Ji bo çeka birayê te li erdê nemîne te di nav dijiwariya şer de çek û navê şehîd Mazlûm girt, di warê wî de şer kir û weke wî mertebeya şehadetê wergirt. Nivîsandina van hevokan wisa zehmete, dixwazim bihizirim weke tu dijî û hîs dikî.

25 Nîsanê 2008/ Kurîs

Merheba zarokê dibeze azadiyê

Ez fêr nebûm û fêr jî nabim. Tu yê her tim di dilê min de bî. Weke tu dijî ez ê bikevin ser rîyan. Di cîhanek tu tê de nebî jiyîn û hizirandin ji bo min pir giran e. Dizanim hûn ji bo vê rewşa min nerihet dibin, çî ji vê rewşa xwe ya bê çare bikim, nikarim rakim. Ez her ku li bengîniya te ya jiyan, azadî û azma we ya ji bo têkoşînê dihizirim qehr dibim. Hestên min ên tolhildanê gur dibin. Êdî dixwazim hesab ji dijmin bixwazim, ev dijminê nemerd mirovên me yên herî xweşik ji nav me girt. Êdî ez ê çawa tehmûl û sebir bikim? Ger tenê tola hevalên xwe û we rakim dikarim hinek rihet bibim. Dema di cîhana min a hundirîn de bager radi-bin, li aliyê din herîkîna jiyana rojane berdewam dike. Ger avaniya vî cepî hemû nebe jî piranî kombûne, hevalê fermandarê qadê ji hemû hevalan re civînê li dardixe. Bi destnîşankirina xalên girîng lêhûrbûnê bi hevalan re dide çêkirin û heval jî lêhûrbûnên xwe parve dîkin. Pir metirsîdare ev qas gerîla li gel hev kom bibin, pir metrsî dane berçavan û ev civîn hat lidarxistin. Sûdên civînên wisa pir mezin e. Girîngiya tevgera jin û girîngiya hevalên jin li Xerzanê hat gotin. Bi nîşandana nêzîkbûnek durist re destnîşan kir, divê alîkarî were kirin û li pêşiya pêşketina tevgera jin astengbûn neyê çêkirin. Bêguman ramanên wisa ramanên xweşin.

Her çendî li qada Bakûr bihêzkirina vîna azad hebe, dîsa her çendî li qada Bakûr cihgirtina jinê ji gelek aliyan ve avantaj be dezavantajên xwe jî hene. Ji ber xweseriya Bakûr hema wisa her kes nayê şandin,

rêxistin hilbijêre û dişine. Divê hilbijartî bin, ji ber li qada Bakûr gelek hêvî ji kesayetên heye. Kesayetên li vir hem şervan hem jî fermandar in, ango divê ji her alî ve pîşpor û jêhatî bin. Bêguman aliyê vê yê şer, rêxistinî jî hene û divê ji her alî ve raserbûn hebe. Yê di van xalan de lewaz be, teqez hem di şer de hem di aliyê jiyanê rêxistinî de wê zîyanê bide. Divê cidiyeta şer û jiyanê bizane û wisa bijî. Xalek din a di qada Bakûr de bala min kişand, rojev û mijarên hevalan her tim li ser şer, çalakî û taxtîkan e. Girîng e rojev wisa tijî bin. Di encama nîqaşên wisa de em dijmîn baştir nas dikin. Hebûna nîqaşên wisa di rastiya xwe de girêdayî pêvajoya di nav pratîkê de ye. Ger li gel van rojevan em tarzê jiyanê xwe ya rêxistinî jî zêdetir bikin rojev wê pîrsgirêkên erzan jî neyên jiyîn.

Di destpêkê de Bakûr bendewariya hemû cihî ji hevalên jin heye. Divê hevalên jin du qat ji hevalên xort zêdetir beşdar bibin. Divê cihê jin lê be jiyanê wê derê zêdetir balkêştir bikin. Dibe ji aliyê hevalên jin ve gelek zehmetî hebin, lê berpîrsyartiyên me yê bihêzkirina vîna azad heye.

29 Nîsanê 2008/Kurîs

Evîna min a bêriyê wê dikim

Di kêliyên wisa de gelek tişt tên gotin, lê ez naxwazim behsa tişteki bikim. Ez tenê dixwazim soza serkeftinê bidim te. Tevî hemû zehmetiyan ez ê bi ser bixim, ez ê bi hêz beşdarî vê çalakiyê bibim û wisa tola hezar salan ji dijmîn û pergalê bigirim. Weke jinekê ji ber ez ê ji bo pêvajoyê bibim bersiv pir kêfxweş im. Em ê îro bikevin ser rê, em ê biçin qereqola Mûdûz a me berê keşfa wê kirî. Hevalê Rizgar û çend hevalên din du roje li wir keşfê dikin. Hêvî dikim kêmaniyek çênebe. Demek dirêje ez li ser vê qereqolê lêhûrbûn dikim.

Dibe ji qêrîna bêdeng a nîvmayî re wisa bibim bersiv. Ez her diçim paşerojê, carna bi pîrsa çima çênebû xwe xilas dikim. Ger xeyala min wê demê pêk hatiba, dibe wisa neba. Agir Giyan, ji bo çend rojan ji te vediqetim. Ez ê bêriya te bikim, ez ê bêriyên te di seyra hezkirinê de bistirim. Li min nehizire, ez soza serkeftinê didim te ez ê bi ser bixim.

Çi bikim Agir Giyan?

Mirov dikarin bê wijdan bin, mirovek çawa dixwaze wisa nêzî canê xwe dibe. Bê ku yê li hemberî xwe bixe hesabê dikarin wisa nêz bibin. Ez bawerim ev nêzkbûn hinek taybetmendiya zîhnîyeta desthilatdare.

Niha guhê hevalan li Başûr e. Pêşketinên rojane dişopînin, dema çalakiyek serkeftî be pir kêfxweş dibin. Em bi çalakiyên xwe hesab ji wehşiyeta dijmin dipirsin. Hevalên li xebatên siyasî jî bi çeka xwe ya demokrasiyê têdikoşin.

Li qada Xerzanê xwe xweser rêxistinkirin pir girîng e. Divê bi hêz xwe rêxistin bikî, çî rûnişkandina pergala jin, çî ji aliyê zêdebûna hejmarê, divê em vê mijarê zêdetir bi hêz birêxistin bikin.

Min şevê din di xewna xwe de dapîra xwe, Ruksen û hevala Zeyneb dît. Hatibûn gel me. Hevala Ruksen pir germ nêzî min dibû. Min jî ji xwe re digot; wê dapîra min çawa li vir bijî? Lê ew pir zindî xuya dikir. Ez bawerim ger agahiya dapîra min Hediye ji vê xewna min çêbibe wê pir bikene, dibe tam berovajî wê aciz bibe.

Agir Giyan niha bi xêr bimîne. Divê ez xwe amade bikim.

Cejana te ya karkeran pîroz be. Çawa be tu jî karkerê hezkirinê yî.

3 Gulanê 2008/Kurîs

Encama ji nebesiyan tê bidestxistin ji bo serkeftinê ducanî ye

Di bin her binkeftinekê de teqez nebesiyek heye, çî ji derve çî ji hundir tiştên bandor dikin hene. Mînak dibe nîşana avêtina guleya qilêş û qernasê li gor derfetên normal hatibe çêkirin, di heman demê de li gor leza bayê hatibe eyarkirin. Ger tu di hewayek nebaş de guleyan bavêjî dibe

tu li nîşanê nedî. Ji ber tiştên ji derve bandor dikin hene. Ger hewa baş û normal be, ger gule avêtin nebaş jî be wê demê ev rewş girêdayî wî/ê ye. Bawerim gelek van tiştan dizanin. Baş e, tevî em van tiştan dizanin jî em di jiyana xwe de çiqas serkeftîne? Gelek deman weke mijarên em dizanin, lê em dikarin bibînin qet ne wisa ye. Mînak weke pîrsa keşfek çawa tê kirin em dikarin pênasêya wê dirêj dirêj bikin. Lê dema tê kêliya xistina meryetê em tiştên hêsan hildibijêrin û bê ku ferq bikin lez dikin. Ji ber vê ji bo pêkanîna çalakiyê em bi gelemperî keşfê nakin, em bi keşfek sînordar radibin çalakiyê dikin. Dema wisa jî dibe çi çalakî dernakevin naverastê. Ji ber vê teqez nebesiyek xwe dide nîşan.

Vaye me xwest di dawiya keşfek wisa de çalakiyê bikin nebû. Sedema wê jî girê em ji wir ve li qereqolê bidin nedîtina qada wê bû. Me di me-safeyek nêz de keşf kir. Ji ber tengbûna demê me nikaribû ji nêz ve keşfê bikin.

Agir Giyan, min ji te re gotibû em ê çalakiyek serkeftî bikin. Mixabin nebû. Min sedemên wê li jor behs kiribû. Ya rastî koma me bi kelecane-k mezîna ketibû ser rê. Roj hemû me li gel qereqolê xwe di nav darên qaçê de veşart. Ji bo em dûmen nedin me qet tevger nekir. Roj hemû ez bi tenê bûm. Hevalê Agir, Baran û Bahoz xwe cuda veşartin. Ji bo rihet bîm min xwe tenê veşart û ez bi tenê mam.

Dema demjimêra em ê çalakiyê bikin hat û qad nehat dîtin ew qas nebaş bû nikarim vebêjim! Bihizire em ew qas rê meşîyan û me hemû dema xwe bi kar anî. Niha qereqol li pêşberî me ye lê em nikarin guleyan bavêjinê. Gelo ez dikarim vebêjim çiqas metirsîdare? Bandor li moralê me hemûyan kir, lê ma em çi bikin tiştek em niha bikin nîne, em naxwazin çalakiya tacîzê jî bikin. Li gor asta ev çalakiya me armac kirî wê ji rêzê bibe û em naxwazin guleyan vala bavêjin. Di encamê de em paşde vedigerin.

Em di meşê de zehmetiyan dijîn. Piştî bi seatan meşîyan me li ser ka-niyekê navber dayê. Bi seatane em dimeşin deng ji kesekê nayê. Bêdengiyekê xwe li hemûyan pêçaye. Me ew qas metirsî û xeterî da ber çavan. Me xwe li gel qereqolê veşart, me dest û milê xwe hejand û em ji wir hatin. Rihê dijmin jî pê nehesiya. Em hewl didin wate bidinê. Em

aliyên xwe yên kêmane dinirxînin û encam jê derdixin. Em piştî du şevan di rê de man êdî digihin wergeha hevalan. Heval jî bi çar çavan li benda me ne. Dema deng nehatiye wan jî mereq kiriye û aliyê em lê bûn mayînek teqîye. Gundîyek birîndar bûye, lê hevalan wisa zaniye em in. Pir ketine nav gumanan. Dema em sax û selamet ghiştin heval pir kêfxweş bûn.

Em çawa hatin me agahiyên xirab bihîstin. Dîsa li qada Botanê windahî hene. Endamên Konseya HPG'ê ya Leşkerî hevala Nûda û Ferhat şehîd ketine. Dijmin bînavber bi ser Botanê de diçe. Ax û warê gerîla destpêkê lê şîn bûye û tov daye dixwazin ziwa bikin. Ger me çalakiyek serkeftî pêkanîba me yê barê Botanê sivik kiriba. Me yê berê dijmin daba vir. Her şehadetek giraniyek xwe ya cuda heye. Dema şehadet di asta rêveberiyê de be, bandorê li ser xebatê jî dike. Ev windahî ji hemû hevalan re giran hat.

Ez her xewna dibînim nanivîsim. Dema hinek xewn ji min re cuda tê dinivîsim. Ji ber ev xewna min pir balkêş bû, min xwest parve bikim Agir Giyan. Min di xewna xwe de didît ez çûme erkê. Ez di nêvenga konfêransekê de bûm û yên li wir hemû hevalên jin bûn. Ez hevala Bêrîtan Dêrsim, Şefaq û hevala Rengîn dibînim. Ji bo li ser nîşeya di destê min de were sekinandin, min nîşe radestî hevala Şefaq dikir. Di navberê de hinek dem derbas dibû, lê bi nîşeyê re eleqedar nedibû. Ji min re digot; biçe gel hevalê Elîşêr, min jî digot baş e. Lê goftugoya min a bi hevala Bêrîtan Dêrsim re pir li ser min bandor dikir. Hevala Bêrîtan ew qas aciz bûye weke îşyan bike dibêje; hûn dibêjin bi hêzbûn, lê hûn her tiştî dixin navenda xwe. Ger ez xwe beşdar nekim nabe û wê xebat nemeşin. Rêveberiya akademiya Şehîd Bêrîtan a perwerdê bawernameyan jî amade nake, wê ji niha û şûnde ti kes xwe tevî neke û bila ew bi xwe amade bikin. Ew qas bi hêrs daxive, ez jî dibêjim; hevala Bêrîtan guhdarî kesê neke, kî çi dixwaze bila bêje. Ez jî dibêjim; guhdarî dengê wijdanê xwe bike û bi wijdanê xwe beşdar bibe. Ez van gotinan ew qas ji dil dibêjim, ew kêlî niha jî tê bîra min.

Ez ji vê xewnê pir bandor bûm. Hêvîdarim ti tengavî nebin. Divê di vê pêvajoyê de em bi pisgîrêkên navxweyî re dema xwe nekujin. Divê em

hevdu nehincîrînin. Divê em bikarin bi hemû potansyela xwe li her qadên xebatê li hemberî dijmin şer bikin. Divê em cihê Nûda û Ferhatan dagirin. Em salek girîng dijîn. Ji bo dijmin me tine bike hemû derfetên xwe xistine dewerê û bê sînor êrîş dike. Ji bo em jî serkeftinê bi dest bixin bedelên herî giran digirin ber çav û şer dikin. Serkeftin ji hemû demê nêztir e. Ez van gotinan ne ji bo dil rihet bikim dibêjim, bi rastî jî wisa ye. Lê bes em tenê di her qada jiyanê de nebesiyên xwe dubare nekin. Ger wisa bibe wê dîroka sekeftina salê bibe ya gelên bindest û gerîla.

Erê Agir Giyan;

Min pir bêriya Mizgîn kiriye. Ez rewşa wê mereq dikim. Ez qet ji wê agahiyan nagirim. Ger ên biçin Başûr hebin ez ê di nameya de bêriyên dilê xwe û bihara welatê xwe jê re binivîsim û bişînim. Ez pir ji Mizgîn hez dikim. Netirse Agir Giyan ji te jî hez dikim.

6 Gulanê 2008

Ji paqijiya dostaniya te re merheba!

Bûna dosta jiyan, xweza, mirov, lawiran, xwe di erdembûna hezkirinê de paqijkirin û weke mînaka lavlavkê dostaniyê hembêz bike.

Ez dibêjim hembêzkin, ji ber gelek mirov nikarin vê bi ser bixin, ji ber di jiyanê de xeydokî dijîn. Ma hemû tişt bi hest, raman, rih û hestan nayê destêpêkirin? Ger xwe nêzî xweza, lawir û mirovan hîs dikî û bi dostanî nêz bibî, ma wê ew jî bi hezkirin nêzî te nebin? Ji derveyî hinek rewşên awarte bêguman wê nêz bibin. Dostanî di keda hezkirinê de tê strandin û digihe erdembûna wê. Bêguman bi rêzê mayîn re nagihê, divê tu berî hemû tiştî xwedî dil, raman û zîhniyetek bi hêz bî.

Ger gerîla hemû nebe jî lê ghiştiyê vê astê. Dikarin bi dostanî li jiyan û xwezayê binêrin. Di bergeha gerîla de bi dostanî nêrîn heye, ji ber vê yekê bê ziyan e. Gerîla li hemberî xirabiyên serdemê hevsengiya jîngeparêzî ava dikin û hêviya mirovên bindest digihîne roniya rojê. Mixabin ên di nav gerîla de gerîlabûnê fêhm nakin jî hene. Yên ziyane didin mirov hene û didin jî. Yê gerîlabûnê weke felsefe digirin dest û

gerîlayê di APOGERIYÊ de kûr dibin dostê jiyan, xweza û mirov e. Bi paqijiya zarokekê nêz dibe. Ne-êşandinê bingehe digire. Bi hîskirina dilê moriyekê, bi hizirandina dilê kevir û bi zanabûna zindîbûna giyayekî dijî.

Dostanî û hevaltiyên bi vê felsefeyê re pêş dikevin, weteya parkirina pariyek nan û di heman çeperê de henase girtin tê çî wateyê baş dizanin. Di kêliyên êşên herî zehmet tînin jiyan de jî, ji bo zehmetî û kîrê bin bixê bi zanabûna divê bibin yek dijîn. Jiyan û dostaniyên wisa mîna evînek bê dawî û weke deryayeke pêlên xwe winda nake ye.

Vaye ez ji ber vê dildara jiyanê gerîla me. Her tim ji min re balkêş tê û ti deman wateya xwe winda nake. Her çendî ez zehmetiyan bibînim jî, zêdetir ji nû ve jiyanîkirinê dixwazim. Dixwazim gerîlabûnê bijîm û bi hevalên xwe yên gerîla re di ahenga dostaniyê de bibim yek.

Ya ku jê re dibêjim dost a min, a azadbûn û şerîkirinê nîşa min dike ye. Dost a azma tîkoşîna li hemberî paşverûtiyê û zordariyê dide ye! Dost berbestê gule û êşan e. Dostbûn a ji qirêjiya jiyanê paqij dike ye. Cihê dost lê hebin, hevaltî bi hêze û li wir xwepersetî, dirûtiyê û fesadî nîne. Li wir tim jidilbûn û semîmyet heye.

Dilê min ji bo dostaniyê lêdide û li hemberî jiyanê bi kelecana dibim. Ez nizanim dostaniya xwe çawa pênasê bikim, daxwaza bûna dost û gerîlayek baş. Ez ê bibim meşvanê awaza azadkirina dostaniyê. Ez ê dostaniyê biqêrîm bi dilên gerîlabûnê nahesin!

8 Gulanê 2008/ Sîser

Merheba Agir Giyan

Duh şervanek nû beşdar bû. Hevalan navê wê kirine Mizgîn, weke hemû hevalan vê şarvana nû pir moral da min. Keça koçer Mizgîna biçûk bûye nêvenga hezkirinê. Ger li ser bingehek rast were perwerdekirin wê bibe milîtanek bi hêz. Ji ber vê dixwazim girîngiyê bidim gelek tiştên wê. Hevalên nû her tim tevgera min ciwan dihêlin. Dema mirov nû be çiqas saf û paqij e. Ji dil, bêguman û bi sergermiya xwe ve beşdar dibin. Piştî ew sergermî hemû her yek weke bîranînan ji mirov re dimînin. Wê rojek were, wê hevala Mizgîn pir bi van rojên xwe bikene.

Erê Mizgîn, hûn bi xêr hatin warên azad. Wisa bi hevalên ciwan re jiyîn wê pir xweş be, ji derveyî vê sê hevalên din ên jin tên gel me. Ez bi vê agahiyê zêdetir kêfxweş bûm, min pir bêriya wan jî kiriye. Li qada Bakûr mirov pêwîstiyê pir bi hevalên xwe yên jin dibîne. Bi gelmeperî jin samîmî û girêdayî hevaltiya xwe ne. Divê ez ji vê şervana nû re bibim fêrkerek baş. Divê min bi jiyana min binase û ji her alî ve bibim mînak. Ev mirovên xweşik hêjayî tiştên xweşikin û beşdarî tevgerê wisa xweşik bûne. Em jî weke ên di nav vê tevgerê de dijîn, divê em xeyal û hêviyên van mirovan nehincirînin. Divê em jiyaneke xweş pêşkêşî wan bikin. Erê, gula destpêka biharê tu bi xêr hatî jiyana gerîla.

17 Gulanê 2008

Merheba dilê min ê bi tama evînê dildarê azadiyê

Jiyana gerîla weke aveke bi bizav û diherike ye. Gerîla pir zêde ji mayîn û li cihê mayînê hez nake, hez dike arazî, nêvengek û wargehên nû bibîne. Arazî hemû wargehên me ne, kîjan der ji bo ewlekariyê guncav be em li wir bi cih dibin. Em piştî demekê li wir dimînin û piştî cihê xwe diguherînin. Em deh rojên dawî her tim di nav bizavê de bûn. Me hem wergeha xwe diguhert û hem jî em bi çend goman re mijûl bûn. Di vê navberê de hevala Mizgîn a nû beşdarî nêvenga me bûye bi moral beşdar dibe. Carna di nefêmkirina me de zehmetiyê dijî. Zehmetiyek pir cidî nîne, lê nakokiyên dijî û ev jî normal e. Divê nakokiyên nû û kevin bijî. Hevala Mizgîn nakokiyên jiyana xwe ya kevin û nû dijî. Di vê navberê de em rojê demjimêrekê perwerde didinê.

Em her sê hevalên jin perwerde dibînin. Di pêvajoyên pratîkê de ev perwerde pir baş dibe. Ger em bi lêpîrsîn û dahûrîn nêz bibin jiyana me bi serê xwe perwerde ye. Demek dirêje em ketine nav pratîkê. Ez bi gelek nêzîkbûnên erênî û neyênê re rû bi rû hatim. Ez her tim li ser bingeha fêrbûnê nêzî jiyana û pratîkê dibim. Dîsa hewl didim fêrkirina jiyaneke fêr bikim û bijîm. Dibe di tevgerên weke me bi hêz de pîrsgirêk werin jiyîn. Tevî tevgera jin a Rêbertiyê ava kiriye, zîhniyeta zilamê serdest di hinek kesan de xwe dide ferzkirin. Heta hinek deman nêzîkbûnên çîneyetî jî derdikevin. Carekê hevalê Zagros gotibû; divê hevalên jin neçin erkên dût. Weke curek nêzîkbûna vê zîhniyeta

destpêkê hevalê Çiya jî dibêje; naxwazim bi hevalên jin re biçim peywirên hundirîn. Nikarim cihê xwe di gelek karan de bigirim û bi taybet biçim peywirên dûr. Gelek hencetan didin nîşan û heta ji bo sê kes neçin, du kes biçin îsrar tê kirin. Jixwe dema du kes biçin bi xwezayî yek jin û yek hevalê xort bi hev re nayên şandin. Li gel vê hevalên bi rengek eşkire yên dibêjin; bila hevalên jin bi min re neyên peywiran hene. Herî dawî nêzîkbûnên hevalê Zagros jî wisa bû. Li hemberî vê helwesta wî min jî pêşniyariya xwe paşde kişand û min got; ez jî naçim. Ger ev nêzîkbûn wisa berdewam bikin wê helwesta min jî cuda be. Min duh şev di nîrxandina tekmîlan de helwesta xwe danî holê. Heta min pir vekirî got; ger hûn naxwazin hevalên jin li herêmê bimînin, nêrînen xwe bi awayek vekirî ji rêxistinê re bêjin. Min got; pêwîst nake hûn bikevin nav nêzîkbûnên wisa.

Wê ev nêzîkbûn zêdetir xwe bidin pêş, teqez wê li hemberî van nêzîkbûnan helwesta min hebe. Bila kêmanî xwe bidin rehendek din. Kêmaniyek ji vê girantir nîne, tu jinê ji qada têkoşînê bidî sînordarkirin! Dixwazin bila bi niyeta xirab be û dixwazin bila bê zanabûn be, di encamê de ev nêzîkbûn nayê qebûlkin.

Di hinek bûyer û diyardayan de nakokiyên çînî tên jiyîn. Nêzîkbûnên çîneyetî ji zû ve ji rojava rêxistinê derketiye, lê weke wê ji nû ve li Xerzanê dest pê bike. Hinek caran ji ber nêzîkbûnan, carna jî ji ber nêzîkbûnên hevalên jin bi salane nekarîne cihê xwe li qada Xerzanê bigirin. Ji ber vê em di jiyana kirina çanda rêxistinê de zehmetiyan dijîn.

Ez li qada pratîka Bakûr baştir gelek rastiyan dahûrîn dikim. Nêzîkbûnên zîlamê paşverû baştir fêm û dahûrîn dikim. Di rastiya xwe de dixwazin nêzî jinê bibin, lê dema zemîna nêzîkbûnê nabînin li hemberî wê çeparan digirin. Li gor min mirovên belengaz van nêzîkbûnan raber dikin.

24 Gulanê 2008/Kurîs

Merheba Xwedavenda min a Agir

Bi rojane min peyvek tenê jî parve nekiriye. Lê ew qas tiştên ez parve bikim hene, nikarim vebêjim. Pênûsa min nikare weke berê zimanê min vebêje. Her ku diçe ez jêhatîbûna xwe ya vegotinê winda dikim, lê demekê rûpelan têra nivîsandina min nedikir. Ji bo rûpelên xwe bi derfet bikarbînîm min nedinivîsand, hinek caran jî ji bo valatî nemîne min bi rengêk biçûk dinivîsand.

Dema ez astengiyên li pêşiya nenivîsandina xwe lêpirsîn dikim, a derdikeve pêşiya min dîsa ez im. Weke min girêk li raman û hestên xwe xistibe, nikarim vê girêkê vekim. Dema ez dest davêjim jiyana me û lêpirsîn dikim, ji gelek aliyan ve kêr dimînin. Ji ber vê nikarim bi kelecana nêzî hinek tiştan bibim.

Tiştên dixwazim bikim her tim nîvçe dimînin. Min hîn cihê xwe di çalakiyekê de negirtiye. Çalakiyên ez çûmê jî ji ber nebesiyên keşfê û tevgera dijmin pêk nehatiye. Ez her li wargehê dimînim. Dema ez li vê dema ji dest çûyî dihizirim bêhna min teng dibe û aciz dibim. Lê min dixwest pir baş beşdarî sala 2008'an bibim. Min dixwest bi hezkirina xwe ya ji bo Rêbertiyê û çalak beşdarbûna xwe ya xebatan biqêrim. Dixwazim bibim karkera hezkirin û azadiyê.

Baranên wisa diherikin nav dilê min, ên ku min nas nekin, ez jî wî/ê nas nakim. Ên jinê nas nekin, ên li pêşiya azadiya jinê astengî wê çî fêda wan ji şoreşê re çêbibe? Dikarin keştiyê ji bo demekê ji zerayayê derxînin û bibin qeptan, lê bila em ji bîr nekin wê rojek were ew ê bi destê xwe keştiyê bin av bike. Ji ber negihîştîye wateya azadiyê û agahiya wî ji îtopyya şoreşê nîne.

Bê ku were xapandin û bixapînî, divê tu di pîvanên jiyana rêxistinê de tawîzan nedî! Di aliyekê de hem li Xerzanê gerîlatiyê dikim û hem jî ji ber jinek im pir zehmetiyan dijîm. Ji ber vê jî li hemberî yên li gorî xwe, li hemberî azadiya jin dibin asteng û nebûnê ferz dîkin îşyan dikim. Ez zêdetir rastiya çima jin pêş nakevin baştir dibînim. Jina hemû deman di cihê xwe de maye û nikare derkeve derveyî kolana xwe wê çawa pêş bikeve? Bêguman wê pêşketina wê zehmet be, ji ber di navbera çar dîwara de ne. Ger tu jinek gerîla bî, cihê xwe di çeperên şer ên herî pêş

de negirî tu yê çawa ji pêvajoyê Rêbertiyê re bibî bersiv? Tu yê her tim di cihê xwe de bijmêrî û dubarebûnê bijî.

Ez jiyanê gerîla ji hevala Mizgîn re vedibêjim û hewl didim fêrî wê bikim. Divê di van rojan de her sê hevalên jin ên din jî bigihin vir. Ez bi kelecaneke mezin li hêviya wan im. Min pir bêriya wan kiriye. Ka êdî zû werin.

6 Hezîranê 2008/Sîser

Merheba dilê min ê tijî veqetîn

Em her tim veqetînan dijîn. Dema digihin mertebeya şehadetê ji heval û dostên xwe vediqetin. Em di bihar û payîzan de ji hev vediqetin. Di rastiya xwe de em gerîla di vî cîhanê de her tim rêwîne, pêkenînan me dibin rawestgehên me yê dawî. Cuda bûna me ev e; em milîtanên PKK'ê zêdetir ji xwe re heval û dostan bi dest dixin û zêdetir veqetînan dijîn. Tiştê milîtanên PKK'ê qet hez nakin û fêr nabin vesazî ye, ango veqetînin. Dema pêwîstî û pêdivî bi vesazbûnê tê dîtin, tê çêkirin. Em di zanabûna van pêdivîyan de ne, lê em qet nikarin dilê xwe razî bikin. Em her veqetînekê bi hêviya hevdiînekê nû dijîn û weke em ê hev bibînin li hev dinêrin. Veqetînan Bakûr zortir in. Hevalên niha li gel te dibe rojekê nebin. Dibe êdî hûn hev nebînin û ew pêkenîna dawî di dilê te de dibe lehiya hezkirinê. Tevî dîtina êşa bi hezaran hevalên xwe dîsa dilê gerîla bi hêz e, dikare bi êşên xwe ve weke berfînan li ser piyan bimîne.

Nêzî deh rojin yekîneya li Sasonê hatiye gel me. Ji derveyî hevalekê ez herdu hevalên din nas dikim. Çend roj bûn li vir bûn, em pir fêrî wan bûn û wê îro dîsa biçin cihê jê hatibûn. Hevalê Xeyrî û Çiya yê li vir diman wê bi wan re biçin. Vesazaya wan jî çêbû.

Hevalê Xeyrî yekî ciwan e, hevalekê xwedî lêgerîn û her li pey îtopayên bi hêzin. Ê tenê ji bûyera Mûşê xilasbûyî ew e û 59 rojan bi tena serê xwe di arazî de maye. Heta gihîştîye hevalan pir zehmetî kişandiye lê kiriye rik û wî jî bi ser xistiye. Hat peytandin ku gerîla dikare çî bi ser bixe û da nîşan tişteke nikare vîna milîtanên PKK'ê bişkîne. Min her tim rêz da vî jiyânê û sekna hevalê Xeyrî ya bi milîtanî. Ji aliyê gelek heval-

lan ve rêz dît. Hevalê Xeyrî hevaley ciwan e lê dilê wî mezin û dildarê azadiyê ye. Em ê piştî çend demjimêrên din ji van hevalan veqetin. Her hevaley ji yê din hêjatire. Hevalê Serhed yekem gerîlayê min dît ye. Wê demê pir ciwan û her tim li ser serê wî kum hebû. Qet nedaxivî û şermîniya wî di rûyê wî de dihat xwendin. Lê niha mezin bûye û bûye fermanदार.

Hevalê Hejar ji Rojhilat e. Ji çandek cuda û ji aliyek ê Kurdistanê heta vir hatiye, ew jî bi hemû tiştên xwe ve destpêkên xwe dijî. Seknek wî ya xwîngerm, kedkar û sêpatîk heye. Tevî hevaley nû ye jî di nav PKK'ê de bûyereke pir kêmtir jiyîn jiyar kiriye. Vê bûyerê di wî de ezmûnek zêde ava kiriye.

Hevalê Çiya jî yekî pîrsgerêkên wî yê pratîkî nîne û xwedî kede. Aliyên kêmaniyên wî têde heye, asta wî ya ferasetê ye. Hîn aliyên wî yê negihîştî hene.

Aliyên hevalên me yê baş û xirab hene. Ger ev alî hinek caran bibin sedema zehmetiyar jî, lê dema veqetîn dikeve navberê hemû tiştên jibîrkirin û di xwebûnê de tiştên xweşik dimînin. Naxwazim ne ji wan û ne ji kesê veqetim. Mixabin rastiya jiyana em niha têde destura bi hev re mayîna me nade. Hevaltiya PKK'ê ya ez di dilê xwe de hîs dikim mirovan evîndar dike. Hezîkirin û rêza mirov a li hemberî xwe zêdetir dike. Mirov ji ber vê her tim dixwaze hevaltiya PKK'ê bijî.

Dema pê dihesim demjimêrên dawî hatine ber bi derî êdî zimanê min nagere û nikarim baxivim diçim. Çavên min tenê daxivin. Veqetîna êşa gîrnîjînê li ser lêvên min peyda dibe.

Hevala Mizgîn a nû beşdar bûyî û demek li gel me maye ew ê jî biçe. Hevalan ji hevala Mizgîn pîrsî; tu ji bo hevalên ji vir diçin çi dibêjî? Wê jî got; SERKEFTIN be, ji wan re bi vî rengî bersiv da. Bêguman ev peyv ji me re xerîb nayê, strana dema em ji hev vediqetin tim ji hev re dibêjin e. Ev gotin ji hevaley nû bihîstin xwedî nirxek mezintire. Êdî ew jî di rastiya gerîla de tê strandin û di rastiya PKK'ê de şêwe digire. Êdî hevala Mizgîn jî di rîya gerîlabûnê de bi biryar dimeşe.

Em hevalên xwe bi hêviya hevdîtinek din bi rê dikin. Dema ew bi rê dikevin ez jî dibim rêwiya bêdengiya wargehê.

5 Hezîranê 2008/Sîser

Merheba dilê min ê weke jin lêdide

Piştî li bendêmayîna demek dirêj û şûnde êşên bêrî, kêfxweşî û coşa hevdîtina hevalên jin dijîm. Em cara yek hevalên jin ên me ji Başûr bi ser riya Bakûr xistine dibînin. Mirov li Başûr pir zêde tenêmayîna jin dijî. Li Bakûr mirov vê tenêbûnê dibihîze û bêriya bi hev re mayîna hevalên jin dike. Dixwazî hevalên jin li derdora xwe bibînî, ferq û hîs bikî.

Piştî salekê me derfet dît ku em hevalên jin ên li qadê werin gel hev. Bi giştî hejmara me pênc e, bi hevala nû ya başdar bûye jî dibin şeş kes. Me pergala xwe li qadê hîn nedaye rûniştandin. Bi vê hevdîtînê em ê gelek tiştan nîqaş bikin û bigihin biryarê. Ew qas tiştên dixwazim bi hevalên xwe yên jin re parve bikim hene. Min zivistanê her tim digot; dema ez hevalên xwe yên jin bibînim, min çî jiye û bi kîjan zoriyan re rû bi rû hatime ez ê vebêjim. Em niha bi hev re ne û bingehek dikarin hemû pirsgirkan nîqaş bikin heye. Ez nikarim zehmetiyên min jiynê vebêjim. Weke zimanê min hatibe mohr kirin, dixwazim tenê li wan binêrim û guhdarî wan bikim.

Wan jî pir zehmetî di nav xwe de jiyan kiriye. Her heval bi rengê tenêbûn jiyan kiriye û dema em li çavkaniya pirsgirêkê digerin ev derdikeve hemberî me. Baweriyek pir zêde bi zîlam anîn, bêbaweriyê li hember cinsê xwe û xwe sipartina zîlam. Ev nêzîkatiyên xwe spatînê, sekna jin a birêxistinkirî û bergeha jin a di vî aliyê de parçe dike. Ev jî bi jinê re nehizirandina xweserbûnê bi xwe re tîne. Di encamê de jin tê bê vîn kirin û peywira xwe pêk nayîne. Di rewşa niha de gelek pirsgirêk hene. Em dema van tînin ber pîvanên rêxistinê divê em hinekan ceza

bikin. Lê ji ber hejmar nîne û bi hizirandina pêvajoyê, em guncav dibînin şans bidin hev. Dibe ev şans me komî ser hev bike û gavên bi hêz di qadê de bavêjin.

Civînek pir xweş bû. Her hevalekê nêrînên xwe danî holê. Me hewl da em pîrsgirkên xwe weke çîrokan ji hev re nebêjin. Me şans dayîna hev esas girt. Her wiha rihetbûn û kombûnek çêbû. Ger em yekbûnê di nav xwe de pêkbûnin çî bager nikare me lewaz bike.

Min gotibû; di zivistanê de bi hevalên xort re jiyîn pir zehmet e. Her roja diçe vê zehmetiyê zêdetir dijîm. Di hinekan de bê rêxistinbûn serê xwe girtiye û diçe.

17 Hezîranê 2008/Kurîs

Dilê min ê di sotînerbûna agir de dibe xwelî

Ez ê cihê jê mame berdewam bikim. Lê di destêpêkê de dixwazim behsa peywira em bi hevalên jin re çûnê bikim. Hevalên jin cara yek li qada Bakûr û li Xerzanê bi serê xwe diçin peywirê. Ev peywir ji bo min pir bi wate bû. Ez bi moralek mezin çûm. Ji bo pêkanîna hinek pêwîstî û dîtina gelê xwe yê hêja, em yekeyek hevalên jin çûn gund. Dema gelê me yê welatparêz gerîla dît ji kelecane nizanîn wê çî bikin. Em gerîla jî li hemberî van nêzîkbûnên germ li ber xwe dikevin. Ên negirêdayî welatparêziya xwe ne jî bi nêrînek sar li me dinêrin. Em jî bi hezkirina gel a di hundirê dilê xwe de nêzî wan dibin. Ger li dijî me jî bin di encamê de mirovên me ne û ji aliyê dijmin ve hatine xapandin. Ji ber nezanîna ji cewhera xwe qut dijîn.

Piştî demek dirêj em di bin fêrmandariya hevalên jin de diçin peywirê. Ez, hevala Rojna, Asmîn û Cîhan bi hev re diçin gund. Em du du ji hev vediqetin, hevala Rojna berê hatibû vî gundî. Heval mirovên li vir nas dikin. Bi baldariya veşartina gerîla, dema hewa tarî dibe ez û hevala Asmîn diçin mala gundiyeke. Kes li naverastê xuya nake. Agir pêketiye û mencil li ser agire. Em fêm dikin xwediyê malê li van derane û kûçik jî bênavber direyê. Em nikarin bê deng jî bikin. Bi reyîna kûçik xwediyê malê jî tê. Du dayîkên pîr û mamekî pîr bi bîdonên avê yên

biçûk ên di destê xwe de tên. Ez hema çûm min bîdonê di destê dayîkê de girt.

Mirovên pîr her tim tenêbûnê dijîn. Ez bi qasî zarokan ji mirovên pîr hez dikim. Em bi wan re sihetê dîkin. Ji ber dijmin ambargoyek pir giran sepanîye nikarin pêwîstiyên me pêşwazî bikin. Ji ber wê neçar in kêmek qut didin me. Em piştî ji malê derdikevin, hevala Rojna wan jî tên digihin me. Demjimêr derenge, bi tava heyvê re her der roniye. Em di bêdengiya şevê de dikevin ser rîya wargehê. Hevala Asmîn di rê de heta destê xwe nede darên fêkiyan nikare derbas bibe. Di dawiyê de ji wê re şîyarî hat dayîn. Hevala Asmîn jî weke min ji fêkiyan pir hez dike. Ev peywirek pir xweş û bi wate bû. Pir kêfxweşim ji ber bi hevalên jin re me. Hêvî dikim berdewamiya vê were.

Nêzîkbûnên hinek kesan ji zivistanê heta niha min pir nerihet dike. Xala herî zêde ez pê nerihet dibim jî helwestek rêxistinî li hemberî van kesan nayê danîn û wisa li naverastê dimînin. Tengasiya min a hundir bandorê li ser jiyana rojane dike. Carna ji nişkê ve bertek û helwestên min çêdibin. Divê demek berî demekê ez xwe ji vê rewşê xilas bikim.

Agir Giyan, êdî ez ji sextekariya mirovan zivêr bûm. Wê heta kengê kesayet li ser jiyana me bibin sîber? Di xeyal û îtopyaya min de ji van re cih nîne. Ez naxwazim van bijîm. Ji bo ez van di civakê de nejim, min jiyana şoreşgerî hilbijart. Bê zehmet bila em şoreşgeriyê jî dejenere nekin, taybetmendiyên pergala em jê hatine li vir jî nedin berdewam kirin.

Agir Giyan, dilê min di serhildêriyê de ye, divê di nav van zehmetiyan weke bazekî firînê bi ser bixim. An êdî wê çi bibe nediare, ez ê hemû tiştî ret bikim heta cezayek ji van kesan re tê dayîn.

18 Hezîranê 2008

Bi xweşiya jiyana gerîla jiyîn!

Her kêlî û roja gerîla bi cudabûnan ve tijî ye. Gerîla xwedî jiyanek bi renge. Her xebatek gerîla bi ked û hewldanê pêk tê. Heta xwêdanê nerjînî, zehmetiyan neji nikarî bigihî azadiyê.

Di nav gerîla de wate û nirxa her peywirekê cuda heye. Her peywira tu diçî bîranînên mirov zêde dibin. Em jî piştî demek dirêj, weke komekê di encama keşfekê de çûn çalakiyê pêk bînin. Min her xwestibû cihê xwe di çalakiyek bi hêz de bigirim. Ji bo pêvajoyê û bi navê hevalên jin ên li vir, ji bo pêşiya şerê herêmê vebe dixwazim çalakiyê bikim. Ji hevalên jin ez û hevala Asmîn em bi hev re diçin. Barê me girane, em her ku gav davêjin xwêhdan dilop dilop xwe di eniya me de berdide. Em her ku ber bi lûtkeya Kember ve diçin henaseya min qut dibe û disekinim, bêhnekê hildimijim û riya xwe berdeyam dikim. Hevalên dibînin ku ez zehmetiyê dijîm zû navberê didinê. Ji bo min bizava xwe hinek kêmtir dikin. Her li benda min dimînin, ez li hemberî vê nêzîkbûna wan a xweşbîn zêdetir zorê didim xwe. Koma me ya peywirê, ji hevalê Rizgar, Rêzan, Zagros, Bahoz, Rojhat û Asmîn pêk tê. Cara yek ez bi hinek hevalan re diçim peywirê. Her peywirek nîrxek xwe ya cuda heye. Ev peywir jî pir girîng e. Ger ti pîrsgirêk çênebe wê du çalakiyên bi hêz çêbibin, em ê bi van çalakiyan ji pêvajoyê re bibin bersiv, em ê tola xwe bikin gule û li dilê dijmin bidin. Ji ber diçim çalakiyê pîr kêfxweşim. Yekeya veşartî diçe, pîr metirsîdare, tevî metirsiye jî bi biryarin li ser polîsan çekê rakin.

Em şev hemû dimeşin, ji westandinê lingên min bi erdê ve dixirikin. Em bi alîkariya ronîya heyvê rêwitiya xwe berdeyam dikin. Piştî em bi demjimêran dimeşin li cihê destpêkê disekin. Hema em ji bo bêhnve-danê xwe dixin nav dehlan. Zoriyê didim xwe ji bo razim û di nobedariyê de zehmetî nekşînim. Dema demjimêra nobedariya min tê bi zorê hewl didim nobeta xwe bigirim. Lê ez di nobedariya xwe de kêmaniyan dikim û radizim. Ez ê ji ber vê rewşê bikevim rojeva hevalan. Ji ber hîn du roj riya me heye.

Agir Giyan;

Ev peywir ji bo min pîr bi wate ye, ez ê guleyan di mejiyê dijmin de biteqînim, ji ber vê guh nadim zehmetiyên fîzîkî. Em xwe berdidin nav araziya Bidlîsê. Hevalê Rizgar wan diçin keşfê. Di berê de keşfa wê hatibû kirin, lê dîsa diçin keşf bikin. Em hevalên din jî me xwe di nav devi-

yan de veşartîye. Em veşartinê esas digirin. Em bi tarîbûna êvarê re xwe didin palê. Em hewl didin cihek guncav bibînin.

Divê gerîla jî weke bazan cihê xwe li bilindahî û di cihên zehmet de çêbike. Em di palê de cih dibînin. Lê ji bo razanê divê hinek were rastkirin. Ez û hevala Asmîn, em cihê xwe çêdikin û noqî nav sihbetên kûr dibin. Demjimêr dikeve rêwitiya şevê. Hevalê Bahoz û Rêzan jî diçin avê. Bi derbasbûna çend xulekan bi dengê fîtikê re me navber da sihbeta xwe. Em ber bi cihê deng jê hatî çûn. Em hizirîn hevalên çûne avê bin, lê me dît hevalê Rizgar wan hatine. Ez li ser çongan rûniştim, me piştî navberek dayê, dikevin ser rê. Hevala Asmîn li pêş dimeşe, em hinek dimeşin lê cihê em lê dimînin qet nabînin. Heval bi rewşa me dikenin lê naxwazin gurura me jî bihincîrînin. Piştî em wî warî hemû li ber çavan re derbas dikin, em nû cihê xwe dibînin. Ez û hevala Asmîn li cihê kesek xwe lê dirêj bike, du kes lê radizin. Ez bi berbanga sibê re şiyar dibim. Berî roj derkeve, ez keşfa sibê dikim û tiştê li ber çavan xuya nake. Roj jî hêdîka serê xwe di navbera çiyên de radike û bi me re dikene. Em bi germahiya rojê re dest bi rojê dikin. Piştî taştê em li hev kom dibin û plansaziyê çêdikin. Keşf temam e. Hevalê Rojhat û Zagros wê veşartî biçin ser cihê polîsan û li wan bidin. Em ê jî li cihê cendirmeyan bixin. Wê kom di çalakiyê de berî hev dest pê nekin, divê li gor wê bi kordîne bin. Wê li gor keşfê du çalakiyên xweş çêbibin. Ger çalakiya li ser cendirmeyan baş be em ê li ser navê YJA- STAR'ê bidin.

Dilê min ê di bageran de ew qas pêwîstî bi parkirina peywira heftekê dibînim û dixwazim parve bikim. Lê pirsgirêkên niha dijîm destûr nade behsa wê pêvajoya bi wate bikim. Ger sax bimînim, ez ê biçim Bidlîsê û behsa me çawa çalakî kiriye bikim.

28 Hezîranê 2008

Merheba jina li Xerzanê xwe di tenêbûnê de veşartî

Hemû kes bi ser min de tê. Ew qas darazîn û nêzîkbûnên wan ên polîtîk hene. Li ser nêzîkbûnek min a herî biçûk û henek şîroveyan dîkin. Ber bi aliyên cuda ve dikşînin.

Ev nêzîkbûn min dixê bin zextan û zoriyê dide min. Bawerim dema hatim Xerzanê ne ji bo ez van bijîm hatim. Ez ji bo xeyal, hizirandin û hestên xwe yê herî xweşik li Bakûr pêk bînin hatim. Wê Bakûr biba warê gihîştina min a azadiyê. Ez ê li qada Bakûr ji Rêbertî û gel re bibam bersiv. Min ê weke qadroyekê jiyana ji rêzê daba sekinandin. Ez ji ber vê jiyana kolektîf esas digirim. Ji bo ji xweperstiyê rizgar bibim min jidilbûna hevaltiyê esas girt. Ji bo paqijiya ji nêzîkbûnên polîtîk min di PKK'ê de nirxa herî mezin mirov esas girt. Bi vê felsefeyê ketina rê, min ji hevalên li gel xwe hêz girt, nix da wan û min hezkirina wan esas girt. Bi wateya tevlîbûna pêvajoyê min lezbûn esas girt.

Lê li rastiya ez niha rast hatîm binêrin! Rewşek metirsîdar e, ez di he-nasegirtinê de zehmetî dijîm. Dema niyet, hizirandin, ked û vîna min cuda be, ez çawa tîm fîm kirin. Ji ber di destpêkê de min nikaribû xwe bidim fîmkirin min dest bi nefretkirina ji xwe kir. Mirov dema hizirandina baş bi hizirandina rêxistinê re bi hêz neke, kesayetên kevneperest ez gelek westandim û min diwestine.

Ez pir ji mirovan bawer dikim, ev bawerî hinek caran weke guleyekê li dilê min dikeve. Birînen kûr vedike, min bêhêz dike, ji dostanî, hevaltî, ji daxwaza jiyana jina sade dûr dixê. Hemû kes bûye dozger, di nav van nêzîkbûnên pêşdarezîn de rastî jî tenê berovajîkin. Weke pêşiya min valaye, nahizirin paşeroj û pêşerojek min heye. Di nêzîkbûnan de bê bingehiyek sotîner û bêhêzkirin heye.

Ez jinek im nikarim li gor pîvanên nêvenga giştî şêwe bidim jiyana xwe. Nêzîkbûn û helwestên dibêjin; tu nabî tu, nabe tu xweser bî û tu nikarî weke jinekê bî, hene. Her wisa ez ê her roj bimrim û zindî bibim. Ez ê bibim rêwiyê hevalê nediyarbûn û nebûna xwe ya tenêbûnê dide. Ez ê bi şkestina xeyalên xwe ve bihejim di jiyane de. Ez jinek im!

Ez ji vê rewşê re îşyan dikim. Bagera di hundirê min de dibêje; bedelê wê çî dibe bila bibe bide. Ji bo êdî mirov nebesiyên xwe bibînin. Bila êdî dest ji pîvanên xwe yê kesî yê bi bergeha çanda zilamê serdest mirovan dageh dîkin berdin. Ax hestên min! Dixwazim li du bihezaran jinên azad biçim. Rihê min, min ber bi zinaran ve dixirîkîne.

Dema li keda Rêbertî ji bo azadkirina jinê dide dihizirim, ma ez ê çawa radestî paşverûtiyan bibim? Mane ji bo Rêbertî nêvengek wisa azad ava bike bi salane di girtîgehê de jiyan dike? Li çiyayên azad xwe kuştin an jî di nav qêrên azadiyê de xeniqîn, ma ji van nîrxên hatin avakirin re nabe xiyanet? Ma sîberê naxe ser jiyanê li çiyana? Ma xemgîniyê naxe ser evîna gerîla? Ma tiştê dijmin dixwaze bike ne ev e? Bê moralî xistina nav nêvenga PKK'ê û mirov bê bawer kirin!

Ji bo ji Rêbertiyê re bibim bersiv ez ê li hemberî hemû zoriyên Bakûr li ber xwe bidim. Ez ji bo vê hatim vir. Gelo zehmetiyên min ji ber hewldanên dixwazim bibim Marya ne, yan encama taybetmendiyan min ji çînatiyê girtî ne? Yan jî ji ber weke jinekê di derheqê van hemûyan de dikarim derkevim, zehmetiyan dijîm? Dibe ji van re bersivê bibînim. Ev tespît ne ku di serê min de derbaz nebû, çûna pêşdarezek wisa dibe zû be, lê ji ber li Xerzanê têkoşîna cins ne bi rêxistinî ye, min nekarî xwe bigirim. Bêguman dema li ser vê nêzîkatiyên çînî jî zêde bûn tam dibe aloziyek. Di rastiya xwe de rewşeke were vê astê nebû. Lê helwest û nêzîkbûnên mirovên sexte. Nêzîkatiyên wan ên di cewher de cuda di rû de cuda, yê dixwazin xwe xwezayî, xweperst, bi egoyên xwe yê werimî, li hemberî hevaltiyê wê hêzê di xwe de nabînin ji dil nêzî jinekê bibin tevliheviyê bi xwe re tîne.

Mizgîn giyan!

Erê min zehmetî kişandin lê min her tim di nav xweşbîniyê de pêşwazî kir. Lê hîn jî dikarin hinek aliyên makanîzmayên rêxistinê paşguh bikin û nêz bibin. Tevî van hewldanên min ev ji min re pir bêwijdanî tê. Ger kêmkê rastiya vê tevgerê û PKK'ê nas nekim, li hemberî van ferzîkirinên li gor xwe yê heyî ez ê jî biçim ferzîkirinên ligorxwebûnê. Li şûna herêma Xerzanê ji bo jin bibe zayînek nû, berovajî mîna wê bibe nêvenga xislasbûn û qedandinê, ferzîkirinek her çendî di niyet de nebe jî di şêmbîniyê de derdikeve holê.

Ji her demê zêdetir pêvîdiya min bi hêvî, hezkirin, hevaltî û weke jin parvekirinê heye.

Mirovê Zana, bi hêz girtina ji we ez ê hêza liberxwedayîna ava bikim.

Mizgîn giyan; ez ê ji hezkirinê kulmek av vexwim û ji nav vî wextê tarî ber bi ronahiyê ve hilkişim.

3 Tîrmehê 2008

Dahûrandina kûraniya hîskirinê!

Ger mirovek di kûraniya cîhana hîsan de bijî wê di her hestekê de fêmkirinên veşartî bibîne. Ji ber ev cîhana hîsan baş nayê naskirin û fêmkirin, ji bertekeke vala ya ji hundir jî jê re hezkirin tê gotin û derbas dikin. Lê gelek caran hîskirin bi serê xwe pêş dîtineke, ê herî kêr ji bo pêşerojê dibe xwedî aqilê selîm ew bi xwe ye.

Ger her tim nebe jî em carna ji nedîtî ve tên û hinek caran jî guh nadin hîsê di hundirê xwe de. Ev bê eleqebûn bandora xwe li gelek aliyên jiyanê jî dike. Em li hemberî gerdûn, cîhan, xweza û mirovan bê eleqe dimînin. Em wisa dil hişk nêzî xwezayê dibin -ez nabêjim hemû kes- lê em ferq nakin darek çi hîs dike. Dema em bivir li darê dixin û birîndar dikin, darê wisa dihêlin diçin qet lê nazivirin û lê namêzînin. Me çi birîn di wê darê de vekirine. Dema ev dibe mirovek birîn kûrtir dibin. Divê mirov her gotinê nebêje mirov, dar, kevir û perperîka li hemberî xwe jî bihizire. Ma ne wisa ye Agir Giyan?

Agir Giyan; weke te hîs dikim û dijîm bê ku dest bidim te divê sotînerbûna te hîs bikim.

Dibe hinek bi pirsin, ev hîs ji ku derket. Ger em kûraniya hîsan û tiştên dijîn nas bikin wê di jiyanê de ew qas pir tişt derkevin pêş me!

Agir Giyan; ev rojên min derbaskirine min bi kûranî bi te re parve nekirin. Ji ber wê dibe tu fêr nekî. Ez ê bi kurtasî behsa van rojan bikim, lê dibe ji te re qut qut were.

Piştî civîna û bernameya bi zebeş hat çêkirin. Du kom çûn peywirê. Hevalên çûne peywirê ketin kemînê. Tiştê em fêr bûn heval ji kemînê rizgar bûne hevalê Rojhat Markoz winda bûye.

Piştî kemînê heval hemû belav dibin. Piştî heval hev dibînin, lê hevalê Rojhat Markoz xuya nake. Bi rojane agahî ji wî nayê girtin. Em

hewl didin bi bêtêlê xwe bigihînin wî. Hemû heval mereqa wî dikan. Di nûçeyan de jî tiştek eşkere nebûye. Ger şhadetê hatibe jiyîn wê ji hemû hevalan re pir giran were. Pêşîya peywirê morala wî baş nebû. Ez jî pir bandor bûm. Ji ber rastî nêzîkatiyek nerast û heq nekirî hatibû. Erê, hevalê Rojhat, ez rewşa te pir mereq dikim.

8 Tîrmehê 2008

Veqetîn

Veqetînên bê dem destpê kirin

Her çendî

Ez bixwazim bêjim

Hîn dem nedaye sekinandin

Hat li ber derî sekinî

Hîn simbilên genim jî zer nebûne

Valaye

Dem me cuda berba dike

Û yên ku li dû me werin...

Her tim strana veqetînê tê gotin

Her tim bêrîkirin ava dibe

Min bêriya kenên te yên bilind kiriye

Bêriya awêrin te yên bêguneh kiriye

Tu dizanî bêrîkirin çî ye?

Lê digirim
Dema dibînim winda dikim
Tirsexf bi ser min de tên
Bi hestên nediya şiyar dibim

Dilê min hêviyê hembêz dike
Hezkerinê di veqetînan de mezin dikim
Di xêr û xweşiyê de bimînin
hemû demên derbasbûyî
veqetînan...

8 Tîrmehê 2008

Merheba qêrîna agir a bêriya wê dikim

Piştî mehekê me civîna xwe ya hêza jin a duyemîn pêk anî. Em di vê civîna duyem de heft heval bûn. Li Xerzanê civînên wisa liderxistin ji bo hevalên jin pir girîng e. Nêvengên wisa fermî henase dide min û lêhûrbûnê bi min re dide çêkirin. Di heman demê de lêhûrbûna xwe bi hevalên xwe yên jin re parve dikim. Her ku diponijim rist didim xwe, dixwazim ji bendewariyên rêxistinê re, ji hevalên ku min hez dikin re jî bi pratîkek watedar hezkerin, rêhevaltiya xwe û dîsa girêdana xwe ya bi Rêbertiyê re biqêrim. Ez vê daxwazê tenê bi xwe ve sîno dar nakim, dixwazim ji bo hevalên jin jî hewl û xebat pêş bixim. Li gel van lêhûrbûnên xwe carna xwe bi tenê hîs dikim. Ji nêvengên qerebalix direvim.

Yek jî veqetîna hevalê Rojhat a ji komê li ser van bûyeran hemûyê zêde bû. Bi rojane agahiyek ji heval nayê girtin, vê rewşê jî ez pir bandor kirim. Ez nikarim li wî nehizirim. Niha di çi rewşê de ye?

Wê îşev hevalê Xeyrî û Xwînêrê ê nû hatî biçin li hevalê Rojhat bigerin. Min hemû hêviyên xwe bi çûyîna van hevalan ve girêdaye.

Min bêriya pîrqêniya kenê mirovan kiriye, bêriya rengê te yê di nav nêvenga hevalan de kiriye. Her çendî tu êşandibin jî heval hemû li benda te ne, her hevaleyê li te dihire.

10 Tîrmehê 2008

Jiyan weke roberek bêdeng diherike û diçe

Jiyan li gor hinekan bi deng û li gor hinekan jî bêdeng derbas dibe. Rih û rewşa mirov çî be jiyanê wan jî hinek li gor wê şêwe digire.

Ger mirovek heneker be jiyan her tim komîke û bi tîqetîq derbas dibe. Mirovên ji bêdengiyê hez dikin ji nêvengên qerebaxil direvin û dixwazin qesreke ayîdê wî/ê hebe. Bawerim tiştê bi qasî ken, kendandin û kêfxweşiyê xweş nîne.

Lê hinek caran ev jî hemû mirovan re balkêş nayê û bêhnê mirov teng dike.

Gelek tiştên bi wate di hinek kêliyan de jî ber hinek nêzîkatiyan wateya xwe winda dike. Carna bi zorê dikenî. Dibe hinek caran ev pêkenî tenê diran nîşadan be.

Carna hinek tişt hene divê werin rexnekirin, tu dibînî henek tê destgirtin û bi şêweyek ne yekser tê îfadekirin. Ev tarzê nêzîkatiyê fermiyetê jî holê radike. Yê tenê herêmê jî bê ku bikevin ferqê beşdarî vî tarzê herêmê dibin.

Henek kirin pîr xweşe, lê li gor min jiyan bi henekan xitimandin jî nîrxa henekan tê xistin. Ev tarz parkirina hevaltiyê jî jî holê radike. Piştî min pêvajoyek li herêmê jiyan kir, min carek din pêwîst dît tarzê xwe bigirim dest û dahûrîn bikim.

Nîrxandinên min li jor kirî jî bo min jî derbasdare. Ez jî pîr jî dînîtî, serpêhatî û henekan hez dikim, lê min henek û gelek taybetmendiyan xwe sînordar kirine. Ji ber nêveng bi gelemperî wisa bû. Mirov dikare di

nêvenga hevalên jin de rihet û xwezayî be, lê divê mirov di nêvengên giştî de ew qas rihet û xwezayî beşdar nebe. Ji ber bêparbûn ji zanabûna azadî û rastiya PKK'ê heye. Çi jin, çi zilam hîn gelek mirovan xwe ji mantiqê zayendperestiya civakî xelas nekirine. Yên bi guman nêzî tevlihbûna xwezayî dibin, bandor dibin û li gor xwe şirove dikin hene.

Ger min xwestiba bi vê zanabûnê nêz bibim jî, min nikaribû hest, kelecana, xeyal, hêvî û lêgerînên xwe yên li Bakûr ji nû ve avakirinê bixista bin venêrînê. Ji ber nirx û baweriya min dida hevaltiyê min nikarî tarzê heyî dahûrîn bikim. Her çendî di pêvajoyên destpêkê de hinek nakokî hatibin jiyîn jî, min ev nakokiyên xwe negirt dest û nenirxandin. Li gor rastiye nêz nebûm. Ez li gor hest û kelecana xwe nêz bûm, jiyam. Mirov çawa dema destpêkê beşdarî PKK'ê dibe ji hemû paşverûtiyan paqij dibe. Cihê xwe di nêvenga firîşteyan de digire û demek berî demekê dihezîre wê bi sihrekê bibe milîtan û bi daxwazek mezin beşdar dibe. Dîsa gumana wê tenê tiştek neyînî nekirin û ti gumanên wê ji vê nîne, nêzîkatiya min a ji bo qada Bakûr jî wisa bû. Ez evîndarê Bakûr bûm. Ji bo min hevalên li Bakûr diman nirxek wan a pir cuda hebû. Ji ber ew hevalên her tim di nav zoriyan de dijîn. Di vê wateyê de nêzîkatiya min a hestiyar heye. Ev nêzîkatiya min bû asteng ez nebesiyên hevalên kevin negirim dest.

11 Tîrmehê 2008

Hezkirin mirov nade revandin

Bi wateya giştî di nav rêxisitînê de kombûnek heye. Lê mixabin ên li gor van pêşketinan teşe nadin xwe jî hene. Di her fersendê de ji jiyana disiplîna rêxistinê direvin.

Di pêvajoyên dawî de reva jin û xortan çêbû. Nêzîkatiyeke çewt a dibêje; ji hev hezkirin û revîn heye. Ew qas ji rêzê tê destgirtin û bi vê asayîkirin heye. Hezkirin mirovan nade revandin, berovajî li tiştek wisa mêzandin heye. Ya di bin vê de nayê dîtin kevneperestiya jin û zilam e.

Ger mirovek ji lêgerînên xwe yên azadiyê qut bibe û biçe ku derê bila biçe wê dawiyê bireve. Hezkirin ne xiyamet e, berovajî wê zêdetir

têkoşîn kirine. Bi rastî ger tişteke bi navê hezkirinê hebe tu yê bi vê hestê hewl bidî hevaltî û hezkirin çawa tê kirin fêr bikî. Divê mirov bi navê hezkirinê dest ji rûmet, anor û nixxên mirovbûna xwe bernade.

Hevalê Bahoz Erdal duh li ser bêtêlê nîqaşek girîng meşand û nêrînên me jî girt. Min dixwest zêdetir nêrînên xwe şênbertir parve bikim lê nebû. Di wateya hestiyarbûnê de gelek nixxandin kir û got; divê tu zêdetir bi hêz beşdar bibî. Pir girîng e rêxistin baweriyê bide mirov. Piştî vê pêvajoya zehmet ev nêzîkatiya rêxistinê moral da min. Êdî divê ez zêdetir bi ser xwe de biçim û têbikoşim. Gotinek heye dibêjin; “ heriyê bavêje bila şopa wê bimîne,” ev rastiyeke, lê ya girîng baweriyê min a bi rastiya xwe ye. Bila ew kesayet her weke dixwazin nêz bibin. Piştî min ew mixatab negirtin ti wateya xwe tengavkirinê nîne. Di vê rîya zehmet de wê pir zehmetî werin jiyîn. A girîng xwe ji bo wê amadekirine.

Agahî ji hevalê me yê wînda nîne. Hevalê Xeyrî bi demjimêran li cihê kemînê geriye, lê nedîtiye û qet ti agahî nîne. Weke erd biqelişe û bikeve nav. Rewşek pir sosret e. Ez rewşa wî pir mereq dikim. Min pir dixwest carek din wî bibînim.

14 Tîrmehê 2008

Temenê min di xweşîkbûna demê de wînda dibe û diçe

Serê min wê ji hizirandina hinek tiştan biteqe. Xwezî hinek bê xem bûma. Wê demê ez ê ev qas bandor nebûyam. Ez nikarim nehizirim. Gelek caran bi xwe tenê re dimînim, ji nêvengên qerebalix direvim. Dema ev şehadet jî li ser rewşa min a jiyî zêde dibe bêhnna min zêdetir teng dibe. Ji aliyekê ve lehengî û ji aliyê din ve jî xiyamet! Ji dîroka PKK'ê heta roja me ya îro lehengî û xiyamet bi hev re meşîne. Divê ti zehmetî mirov ji ked û hezkirina Rêbertî qut neke. Jiyan û têkoşîna min hemû ji bo şehîd û Rêbertiyê ye, an min nikarî hêza li ber xwe danê peyda bikim.

Di encama tarzê hevalê em bi hev re xebata rêveberiyê dikin de em giran diçin. Rojek tenê jî ne bi min re axiviye û ne jî ez rexne kirime. Tevî em heman rêveberî ne rêzikên rêxistinê pêknayîne û diçe bi hevalên pêkhateyê re daxive. Ango fesadiyê dike. Yek jî hîn di berê de fesadiya min û xayîn Rojhat Cîlo yê revî kiribû. Niha bûye qontira, hemû rojan bi dijmin re derdikevin oparasyonan, cih û wargehên me nîşa dijmin dike.

Ev zehmetiyên ez dijîm bandora xwe li ser xewnên min jî dike. Êdî divê hinek tiştan derbaz bikim. Her ku dihizirim bi tenê dimînim, hêrs dibim, ez bûm qurbana vî tarzê herêmê yê ji derveyî rêxistinê derketî. Ger pirsgerêk û nakokî di dema xwe de hatiban çareserkerin wisa nedibû.

Ez ê li ser bingeheên rast û li gor rastiya herêmê berşdarbûnê esas bigirim. Ez ê nehêlim kes hêviyên min ên ji bo Bakûr vemirînin, ez ê hêviyên xwe her zindî bigirim. Ez ê nîşa wan kesayetên xwe nizanin bikim ka ez çiqas girêdayî nîrxê mirov û hevaltiyê me. Her çendî zehmetiyan bijîm jî, ez ji rûmet û girêdana xwe ya rêxistinê sar nabim. Ez ê weke berfînekê li ser piyan bisekinim û li hemberî ferasetên we têbikoşim.

15 Tîrmehê 2008

Merheba jiyana min a di nav şewatan de

Mizgîn giyan; bi çend hevokan ji be min xwest bêrî û hezkerinên xwe ji bo te biqêrim. Min lînûs û pêûs girt destê xwe lê min nenivîsand. Dîsa ji ber hinek nêzîkatiyên di herêmê de derketine bêhna min teng bû. Min nexwest bi vê diltengiya xwe nîşeyê ji te re binivîsim.

Di encama nîqaşên dirêj û ferzkirinan de dê hevalên jin li herêma Tatwanê bi cih biban, anga wê li wir çeper girtiban. Lê bi qasî me ji nîqaşên rojane fêhm kir hevalên jin naçin Tetwanê. Niha bi hatina koma dawî re hejmara me bû heşt kes. Ne raste hemû hevalên jin li geliyê Şêx

Cuma kom bibin, ger li vir bimînin wê xebatên me sînordar bibe û em ê bikevin rewşek pasîf. Ji qadek weke Xerzanê fireh tenê li cihekî pratîk meşandin, nîşa dide xebatên me çiqas lewazin.

Ger çûyînek a Tetwanê hebe ez ê jî bi wan re biçim. Çûna qadek nû ji bo min jî girînge. Weke jinekê li Xerzanê pratîk meşandin wê xweştir be. Ji bo çareserîya van nêzîkatîyan min gelek dide hizirandin. Bi vê çûyînê re wê por bi serê min ve nemîne. Porê min ji pir hizirandinê diwere. Ji aliyêkî ve jiyan wisa dimeşe ji aliyê din ve jî hîn agahî ji hevalê Rojhat nîne. Kes tam fêhm nake çi qewimiye. Piştî ketina kemînê û şûnde kesekê hevalê Rojhat nedîtiye. Ev nediyarbûn bêhna min teng dike.

Êdî divê ez ji lêhûrbûnên hundir derkevim û bikevim nav lêhûrbûnek giştî. Bi vî rengî beşdarbûnek bi tendirûst çênabe. Em çi bikin li Bakûr zehmetiyên wisa jiyîn jî hene. Ez ê çîroka me ya jiyanê berdewam bikim. Ji rîka hemû zehmetîyan ez ê weke berfînekê serhildêr bim, bin nekevim û neyê perçiqandin.

18 Tîrmehê 2008

Merheba hêviya min a di tenêbûnan de difetise

Li Xerzanê ferasetên girêdayî pêşdaraz û fesadiyê xwe didin jiyîn berdewam dike. Agir Giyan ez ji ku derê destpêkê bikim. Dixwazim vê rojevê bigirim. Hemû kes li ser serê min bûye dadger. Kes nabêje rastî çi ye, kes nabêje tu jî endamek vê rêxistinê yî û tu çi dibêjî. Hemû nêzîkatî û tevger bi zihniyeta zîlamê serdest dimeşe û diçe. Ji bo ez hêza sebirkirinê ava bikim di quncika taldaya tenêbûnê de henase digirim. Wê wisa çawa be? Ev nêzîkatî tenê ne ji bo min e. Ev tarzeke. Qaşo yên bi salane di nav rêxistinê de li Bakûr in. Pir zêde sûda kevinbûnê nîne. Ji ber ên wisa nêz dibin ne qadroyên Xerzanê ne. Di nav zihniyetek wisa de wê jiyan û pîvanên rêxistinê çawa be? Mantîqek bi êksenê zîlam fermanrewayê li te dike. Dema tu li gor vê mantîqê tevger nekî, tu dibî bêpîvan, ketî û ji derveyî rêxistinê.

Agir Giyan, ez cara yekem bi nêvengek wisa re rû bi rû tēm. Di nav xwe de bi nakok, ji bo derve jî di nav rewşek êrîşê de ne. Bi hev re çûne pêşdarazînek wê hevaleyê wan bireve û yên din jî demgaya “evîndariyê” lê dane.

Te bi evdalî xwe bi pêroziya Bakûr, heval û xweşikbûna Xerzanê ve berdeye. Na, na divê mirov di şerê ji nû ve xwe avakirinê de ew qas kor nebe. Ez çawa ew qas di nav gafletê de jiyam? Serhildêriya min ji bo kê ye? Kêmek mabû min bînin hemberî rêxistinê. Em hîn nikarin di derbarê hevalê Rojhat de agahî bigirin, di nûçeyan de dibêjin, li Bidlîsê kesek hatiye girtin. Hêvî dikim ne hevalê Rojhat be. Wî ew qas heq nekiribû. Êdî ev hêza mirovekê derbas dike.

Ez li hemberî tarzê herêm û feraseta hevaltiya Xerzanê hêrs dibim. Xwezî min carek din rêxistin bidîta û karîba parve bikira. Min biqêriya û gotiba, wê rastiya Xerzanê bi vî tarzî di pêşerojê de çiqas ziyane bide rêxistinê. Agahiya rêxistinê ji gelek tiştên li vir tên jiyîn nîne. Ji ber vê yê ten qadê jî xeyalî nêz dibin. Gelek caran civînên fermî şeklî dimînin. Ji ber berî civînê hinek kes hevdu bi rêxistinê dikin, dikevin civînê û li ser vîna yên din zextek giran tê meşandin. Bi vê re hevalê Rizgar ê ferman-darê qadê jî tê rexnekirin. Dixwazin bandorê li ser vîna wî jî bikin. Dema civîna cephe hat lidarxistin, tiştên di civîna qadê de tên gotin, yek tenê jî nehat ser ziman. Kesên em xebatên rêveberiyê bi hev re dimeşînin jî, tê gotin li qadê ti pirs-girêkên wî nîne û bi ti şeweyan li ser pirs-girêkan nedisekînin. Piştî jî dibêje; em bi hevalên jin re naxebitin, rewşa me di ber çavan re derbas bikin. Ji ber ew bi xwe qadroyê Xerzanê yê kevine, bêguman wisa dizane ev yek bi hêsanî nayê kirin. Ji bo hevalên jin li herêmê nemînin wisa fermî dike. Ev zîhnîyetek çawa ye? Yek alîkariya wan dike, radibe û dibêje; “divê qadroyên Xerzanê bên parastin.” An qadroyên rêxisitnê?

Agir Giyan; ev tiştên ez dibêjim; bûyerên şênber ên di jiyane de tên jiyîn û gelek nêzîkatiyên dişibin vê hene. Ji ber nêzîkatiyên xwe yên şexsî jiyana herêmê xirab dikin. Li vir li gor feraseta hinekan ger tu ne qadroyê Xerzanê bî, ti wateya qadrobûna rêxistinê û bi salan gerilabûnê nîne. Ji ber tu ne kesek ji vê malbatê yî.

Ez hîn dikarim behsa çî bikim, ev nêzîkatî ew qas zehmetiyê dide min, hinek şevên min ên nikarim razim çêbûn. Mizgîn giyan naxwazim zêde dirêj bikim. Vesaziya min çêbû. Em ê sibe biçin Tetwanê, ka em binêrin em ê li wir rastî çî bên.

Asoya min bimîne nav xweşiyê, nav xweşiyê.

27 Tîrmehê 2008/Kurîs

Merheba dilê min ê têniya hevaltiyê

Hemû tiştê dinivîsim dixwazim li gor rastiye vebêjim. Bê ku bikevim nav xeyalan hemû tişt gul û gulistane û xwe bixapînim dixwazim bijîm. Ev tiştên min jiyîne mejî û dilê min ew qas mijûl dike nikarim behs bikim. Her kêliya min bi hizirandinê derbas dibe. Xwe winda dikim. Ji aciziyên dibînim min destê xwe bilind kiriye.

Vesaziya min çêbû, ez duh ji geliyê Şêx Cuma veqetiyam. Hevalên jin hemûyan xwestin alîkariyê bidin. Ez qet vê nêzîkatiya wan a rêhevaltî û jidil ji bîr nakim. Pir girînge mirov ji hemcinsê xwe baweriyê bigire, ji aliyê manewî ve ev nêzîkatî pir bandorê li min dike.

Erê, her ku diçe nakokî û hêrsa min kûr dibe, êdî bandora xwe li peywendiya hevaltiya min jî dike. Ez di rewşek wisa de me ji giştî re nabêjim rojbaş. Hemû ji min re weke hev tîne, civata mirovên di rûyê te de dikenin û li pişt mirov jî gora te dikolin! Ji her hevaleke jin a li vir re yek dîtine. Di fermiyetê de ev qet nayê ser ziman, ji derveyî fermiyetê tê nîqaşkirin. Peywendiya kîjan hevalê rast nabînin di nav xwe de zêde zêde nîqaş dikin. Mixabin ên serê vê jî dikşînin hinek hevalên rêveberiyê ne.

Derûniya min bandorê li fîzîka min jî dike û ev seransertiya ji bo rêzîkên ewlekariyê jî bi xwe re tîne. Ez vê pir êşkire dibînim. Dema duh em ji geliyê Şêx Cuma veqetiyam min ew qas xwe xirab hîs kir. Ez li roja destpêka hatina xwe ya vê qadê hizirîm. Weke şerîda filmekê li ber çavên min zindî bû, min rojên li vir derbas kirine anîn bîra xwe. Ez bi kelecana, kêfxweşî û hevaltî beşdarî jiyana Xerzanê bûm. Ez niha bê dil, hêvî, xeyalek şkestî û birîndar vediqetim. Bi bizavek giran gavên xwe

davêjim û ji hundirê min nayê bêjim; di nav xweşiyê de bimînin. Êdî girîng nîne, bayê demê min ber bi ku ve diteriqîne bila biteriqîne. Di rê û meşa şev hemûyê de ez ketim û rabûme. Dema dimeşiyam her tim bîranîn dihatin ber çavên min, dema em ji vir çûn peywira Bidlîsê ez li bûyeran hizirîm. Min ew rojên xweş nû kirin. Bi van tiştên min dawî jiyîn ez zêdetir li hevalê Rojhat dihizirim û wijdan ezabî dikşînim. Nika-rim li hevalê Rojhat ne hizirim, ew hevalek hêja bû. Ger ê hatî girtin ew be niha di girtîgehek tarî de di bin îşkencayan de henase digire. Ger ê hatî girtin ne ew be, niha li cihekî bi rewşa birîndar têkoşîna jiyânê dide yan jî dibe ji zû de şehîd ketibe. Ne hevalên wî dizanin ew şehîde ne jî dijmin. Di vê rewşê de divê çi were kirin nizinim. Di malzaroka tenêbûna xwe de diperpitim. Ez ber bi te ve tîm Tetwan lê bê ku ti kelecaneke bijîm. Ka em binêrin tu yê çi pêşkêşî me bikî.

Birîndarim, her kêlî xwê li birîna min tê kirin, her ku xwê li birîna min dikeve weke mayîneke li ber teqînê be li min tê.

24 Tîrmehê 2008/Kember

Dilê min ê di riyên bê dawî de

Çend roje em di riyên de ne û hîn dimeşin. Hîna çend şev rîya me maye. Cara yek ez li hemberî meşek wisa bê dil û zewq jê nagirim. Rêzanê me bi awayek gelemperî arazî nas dike, lê bi qasî min jê fêhm kirî di rêzaniya xwe de li ser arazî ne serwere. Em vala vala derxistin ser giran û daxistin. Tu dema jê re dibêjî, qebûl nake û bizava me ya meşê dike hencet. Ev nêzîkatîya wî min zêdetir hêrs dike û hêza min a meşê dişkêne. Bawerim pir zêde pêwîst nake mirov behsa hinek tiştan bike. Duh şev qereqola cendirmeyan a li hemberî ronahiyên Bidlîsê ya me çalakî li ser kirî pir xweş xuya dikir. Bi carekê di tarîtiya şevê de noqî wê roj û peywira em çûnê bûm, em çiqas bi kelecaneke û kêfxweş bûn.

Bi rastî tu li vî welatî hatî girtin? An jî weke hinekan gotî; tu bîdeng gihiştî vî bajarî û çûyî malbata xwe? An tu birîndarî û li malbatek welatparêz tê dermankirin? Pirsyar, pirsyar û hemû bê bersiv dimînin. Ez dengê dilê xwe guhdar dikim, ew jî tişteki nabêje. Dihizirim û dixwazim xayalan çêbikim, weke tu yê rojekê vegeirî, kêmek jî be dibe wisa heda-

ra xwe bînim û moral bigirim. Gelo ez ê bikarim carek din te bibînîm? Tu çima hevalên xwe yên bêriya te dikin û ji te hez dikin bê agahî dihêlî? Te biryara çî girtibe, tiştêkî tu dizanî heye, lê herî kêma agahiyekê bişîne. Tu li ser riya xwe û em li ser riya xwe. Tu yê bihizirî ez bêwijdanim. Kî dizane niha tu di kîjan rewşan de yî? Dilê min dêşe, nikarim barê bê te û vê bêdengiyê rakim. Di vê pêvajoyê de tiştê herî xweş wê agahî ji te girtin be.

Bi dijiwariya van rojên giran pêşwaziyê qebûl dikim. Her ku tîm lêpîrsînkirin zêdetir pêwîstî bi te dibînim û ji roja destpêkê heta roja îro bi êşkişandinê tînim bîra xwe. Her ew roj û meşa wan rîyan û rojan tê bîra min. Pratîka Xerzanê ji bo min xweş bû. Tenê nêzîkatiyên kesekê yên çînî, pîvanên wî/ê yên kesî û xwe weke milîtan dîtin, ez zorlame kiribûm. Di vê pêvajoyê de min hezar caran xwestiye bimirim, min dixwest bi guleya dijmin xatir bixwazim. Ez li xwe kuştinê hizirîm. Ji ber xwe kuştin xîyanet e, min nekir. Li gor nêrîna kirêt a hinekan, ez ê piştî bûyerê revîbam. Min yek jî tercîh nekir. Min a herî zor tercîh kir, li hemberî van ferasetan min têkoşîn û berxwedanî bingehe girt. Hevalê Rojhat, dibe dema ez van hevakan dinivîsim hinek şaş fêma bikin û cuda bihizirin. Lê êdî ew qas negirîng e.

Ger rojekê ez şehîd bikevim û tiştên dixwazim parve bikim û parve nekim, dixwazim tu bizanî min ti dema nexwestiye te bêşînim û min nexwestiye tu ji ber min zehmetiyan bijî. Min ew ti caran nexwestiye û ez niha êşa vê dijîm. Lê bawer bike ne gunehe te û ne jî gunehe min bû. Em tenê qurbanê kesên bêrêxistin û vî tarzî ne. Min hemû dem weke hevalekê nîrx da te û ez ê berdewam nîrx bidim. Ez nikarin ji ber van nêzîkatiyên zehmet piştî xwe bidim hevaltiyê û xîyanetê bikim. Ez duh çî bûm îro ji ew im. Ger di tarz de nebesiyên min hebin ez ê baldar nêz bibim, nikarim ji ber rojeveka wisa û hesasiyetên nêvengê naletê li te bibarînim. Ez weke ehlaqî jî vê rast nabînim. Ez nikarim li gor hesasiyetên nêvengê xwe ji qîlîfekê bixim qîlîfekê û min ti dema nêzîkatiyên polîtîk rast nedîtin, hêjayî xwe jî nabînim. Jixwe sedema van zehmetiyan hemûyê jî ew e. Min bi rengê xwe beşdarbûnê esas girt. Ez ji ber vê nepeşêmanî. Baş li xwe binêre. Tevî hemû êşan hewl bide li ser piyan bimîne, daxwaza min tenê ew e.

Merheba xeyalên min ên di sotîneriya rojê de dişewitin

Meşa me ya Tetwanê bi zoriyên xwe ve berdewam dike. Her çendî hinek zehmetî peywendiya xwe bi rewşa min a ruhî ve hebe jî, lê hinek zehmetî di vê meşê de tên jiyîn. Rêwîtiyek seyre. Em çar kesin, lê pêşengê me û hevala Sema her ji me vediqetin.

Li zozanan em rastî şivanan tên. Em xwe ji gelekaniya vedişêrin û tedbîrê xwe yê ewlekariyê digirin. Hinek şivanên em rastî wan tên pir germ in û ji dil nêz dibin. Xwedî derketina gel a li gerîla tê dîtin felsefeya Rêber Apo çiqasê bi jiyanî bûye û ez ji vê nêzîkbûna germ moral digirim. Bi hezar pirsyaran re bi rê dikim. Di vê meşê de fîzîkî jî zehmetiyê dijîm. Tevî hemû keda xwe cihê divê bigihinê em nagihinê û ji neçariyê em xwe di dolekê de vedişêrin. Êdî hewa ronî bûye û guncav nabe em bi-kevin tevgerê. Av qet li gel me nîne, erzaqê me jî du bacan, du xiyar û hinek penîrê şivan dayî me heye. Helaw hemû çend parçe bûn. Çi li gel şivan hebû hemû dabû me. Ger kêmek ava me heba me guh nedida germahiya rojê, lê dilopek ava me nîne. Hevalê Adil ê şervanê nû pir zehmetî dikşîne. Lêvên herdu hevalên din ji tîna ziwa bûne û hevala Sema jî nikare ji tîna razê. Êş û pevçûnên min ên hundir bi ser van hemûyan re ye. Ew qas pêwîstiya min bi nîqaşê heye.

Dibêjim, min bêriya dayîka xwe kiriye. Ger min ew bidîta min ê hemû tiştên jiyîne ji wê re bigota û wê dayîka min ez fêmkiribam. Wê weke jin û şoreşgerekê wate bida ka ez rû bi rûyê çî hatime. Dibe li gor gelek jinan nexwendibe, lê ezmûnên wê yên jiyan û fêmkirina mirov di asta zanistî de ye. Gelo ji ber zehmetiyan dijîm bêriya dayîka xwe dikim? Bawerim na. Min her tim bêriya wê jina şahane kir û hez kir. Bi şoreşgertiya xwe di kesayeta dayîka xwe de ji bo hemû dayîk û zarokan hiştina pêşerojek xweş e.

Her ku li van zozanan dinêrim xwe pir ecêb hîs dikim. Min pir bêriya geliyê Şêx Cuma û jinên xweşik ên li wir kirine.

Hîn ti agahî ji hevalê Rojhat Markoz nîne. Hinek kes şiroveyan dikin û hinek şirove weke xenceran di dilê min re diçe. Bi van nêzîkatîyan re têkoşîn kirin weke peywira xwe dizanim. Pirsgirêk tenê ne hevalê Rojhat e, kîjan heval di vê rewşê de be wê helwesta min heman tişt be. Ger hinek din di cihê min de ban, heta rastî eşkere dibû wê li hemberî van nêzîkatîyan bêdengî hilbijarta. Ez bêdeng mayînê rast nabînim. Mirov ji kîjan rastiyan bawer bike divê li gor wê xwedî helwest be. Min weke hevalekê bêriya hevalê Rojhat Markoz kiriye, dixwazim carek din wî bibînim. Pir kûr nebe jî ez hevalê Rojhat Markoz nas dikim û bawerîya min bi wî heye. Dibe mirov ji hemû aliyan ve bawerî bi xortan neyîne, biqasî nas dikim mirovek xwedî rûmete. Ji rûmet û girêdana xwe tavîz nade. Ez dema li van hemûyan dihizirim, di xala weke qadrokê wê ji niha û pê ve beşdarbûna min çawa be serê xwe dêşînim. Daxwaza beşdarbûna li ser bingehek rast heye. Divê nêzîkatîyên kesan min bi rêxistin û armanca min ve nexe nav nakokî û rewşek dijberbûnê.

Demjimêr pêşde diçe û hewayê rengê gewr girtiye. Roj jî xatirê xwe ji me dixwaze, êdî dema ketina ser rê hat. Em çenteyan didin piştî xwe û ji cihê lê mabûn riya xwe berdewam dikin. Em hîn bîst çirkeyan nemeşîne digihin ser kaniyê. Avek pir xweş e, şivan jî li ser avê kêf dikin. Me pir xweş pêşwazî dikin. Çar kesin. Ji gundê....ne. Ew cih gundek welatparêz e. Her ciwanek ji bo pêwîstiyên me pêşwazî bike ji çar aliyan ve dikevin tavgerê. Piştî ew qas têhnîbûn, li gel sermaya zozanan a şev û vexwarina çay ew qas muhteşem e nikarim vebêjim. Gerîla û çay du tiştên ji hev nayên qutkirin e. Piştî demek kûrt em xatirê xwe şivanên ciwan dixwazin û vediqetin. Êdî gavên me, me bi Tetwanê dide nasîn.

Di dawiyê de em tîni cihê lê rendewî dane. Êdî em li Tetwanê ne, heval nînin. Em bi bêtêla mezin peywendiyê çêdikin. Wê di demek guncav de werin gel me. Erzaqê me nîne, lê ava me heye. Hinek nanê me yê kûfkî heye, em wî jî xilas dikin.

Ez di vê meşê de dibînim hinek mirov çiqas fêlbaz in. Tiştên jiyîne wisa vedişêrin nikarim vebêjim. Mirov çima li gor rastiya xwe najîn.

Hestên wan, wan didin dest, ma wê heta ku derê xwe veşêrin. Ka em binêrin li vir çî li benda me ye.

29 Tîrmehê 2008/ Tetwan

Merheba bêriyên min ên di nav agiran de li ber semahê

Ma divê her tim wisa be? Ma divê hevaltî di nivî de bimîne? Me xatirê xwe hîn ji hev nexwestibû, di çûyîna her peywirekê de bi hêviya hevdişînek din me hevalên xwe birêkirin. Di vê çûyînê de me nikaribû wê jî bikin. Çavên min li gavên dûr û dilê min ket nav tirsan. Tenêbûnek kûr xwe li bedena min pêça û min êşeke vegotina wê nayê kirin jiya. Mijûlankên min şil bûn. Min xwest bi îske îsk bigirîm, min hemû hêza xwe kom kir, rondikên xwe di dilê xwe de herikand û di malzaroka tenêbûna xwe de bi rê ketim. Veqetînên bê dem dilê min diqurifîne, min çiqas xwestibû jê re bêjim “serkeftin be.” Ger nebesiyek min a di hevaltiyê de hebe, min dixwest lêborînê bixwazim û li pey te biqêrim.

Ma êdî wê dil û çav di kîjan demê de hev bibinînin û hevaltiya di nivî de mayî wê çawa berdewam bike? Ma wê stranên di dilan de girtî mane bên gotin? Carek din hevdişîna bêderfet e, ji ber çiya û diwarên beton di navbera me de hene. Yek jî tiştê herî dûrî min û nêzî min axa sar heye. Agir Giyan, tu nikarî texmîn bikî ka ez çiqas xemgînim. Ji ber pir zêde nêzîkatiyên pêşdaraz hene nikarim xemgîniya xwe jî parve bikim.

30 Tîrmehê 2008/Tetwan

Merheba dîroka min ji nû ve jidayîkbûna wê pêk anî

Îro 2'ê Tebaxê roja biryara paşde vekişînê hatî girtin e. Roja min a veqetîna ji malê ye. 2'ê Tebaxê roja min hemû girêdanên xwe bi pergalê re qut kirin û min gav avêtî nav refên gerîla ye. Di 18'ê mehê de em gihîştin hevalên Sasonê. Tevî di navberê de gelek sal jî derbas bûn, lê ez dîsa vê roja bi wate dijîm.

Ji bo ji Rêbertiyê re bibim bersiv, beşdarî gerîla bûm û ez hîn nebûme bersiv. Jixwe ya herî zêde bêhna min teng dike ev e. Jixwe sedema beşdarbûna min bûna fedaiyê Rêber Apo, ji aliyê xwe ve têkoşînek bi hêz

dayîn û Rêbertî ji wê girtîgeha tarî rizgarkirin bû. Bihêlin li van lûtkeyên bilind Rêbertî ji wan derfetan rizgarkirin, ez alîkariyê ji Rêbertiyê dixwazim. Dema ez dixitimim û zehmetî dikşînim xwe dispêrim Rêbertiyê. Bi qasî xweşiya jiyîna van rojan, ew qas jî wijdan ezabî dide min. Ez ji Rêbertiyê re nebûm bersiv, min her tim di pîvanên ji rêzê tevlîbûn da çêkirin û beşdarbûnek awarte pêkneanî. Min pîvanên qadrobûnê derbas nekirin. Ez vê rastiye baş dibînim; êdî dirûstbûn û girêdanbûn têrê nake. Min armanc kiribû ez ê weke qadrokê derçûnên bi hêz li qada Bakûr bidim pêkanîn. Nebû. Dibe hîn zû be, divê ez nelezînim. Dibe ev zehmetî bibe henceta zêdetir bi hêz beşdar bibim.

Erê, Tebax dîsa ji min re dibêje merheba. Di heman demê de Çarçêla tîne bîra min. Rojên min ên Çarçêla jî pir xweş bûn. Ez bi rêhevalên xweş re bûm. Me hêz dida hev.

Ez salroja beşdarbûna xwe ya partiyê li Xerzan Tetwanê derbas dikim. Di quncika taldaya tenêbûnê de vê roja bi wate dijîm. Her ku wateyên bi hêz bi ser hev de tên, dibî xwedî jiyanek bi wate. Bêwatebûn tenê tiştên bê wate, bêwate nake, tiştên bi wate jî bê wate dike û hebûna mirov jî bê wate dike. Ji ber vê divê ez ji van nêzîkatiyan birevim.

2 Tebaxê 2008/Tetwan

Merheba kulîlaka min a mizgîniyê û evîna bêriya wê dikim

Piştî li bendê mayînek dirêj min bihîst can dost û rêhevala min çûye Îraqê tedawî bibe. Ji ber ez ê bi wê re baxivim, pir bi kelecana bûm. Ez pir kêfxweşim ji ber tedawî bûye, bila herî kêmtendirûstiya wê baş be. Çi tişteke seyre, em her yek li serekê Rojhilata Navîn in. Hêvî dikim dema li te bigerim agahiya te çêbibe Mizgîn giyan. Pir pêwîstiya min bi te heye û dixwazim bi te re parve bikim. Dixwazim bi dil, deng û hestên xwe bi te re parve bikim. Dixwazim behsa rastiya hinek kirêtiya miro-

van a di vê pêvajoyê de bikim. Gerîla jiyan û nirxek pêroz e. Mirov van nirxan jî qirêj dikin û tînin rewşeke mirov nikare bijî. Min pir bêriya we kiriye, hûn gelek ji min dûrin û destê min nagihe we. Hêviya min a dîtina we dê bibe henceta min a jiyanê. Her çendî zehmetî bijîm jî ez ê nekevim nav nêzîkatîyên erzan û serasera. Bi hizirandina mirovên ji min hez dikin, ez ê bi esilzadebûna berfînekê bibim şervan. Yek jî ez ê destûr nedim kesayet li ser jiyanê min bibin sîber. Ez pir ji we hez dikim. Bi vê hezkirinê ez ê bi rê bikivim.

3 Tebaxê 2008

Di bayên payîzê de jiyîn

Tevî ne demsala wê ye jî baranê dest bi barînê kir. Bêhevsengiya di xwezayê de xwe wisa dide hîs kirin. Ez gazindan ji barîna baranê nakim, berovajî wê ez ji vê pir razîme. Piştî barîna baranê xweza şahane dibe. Ez ji bêhna axê û giyayê hişk bûyî serxweş dibim. Min bi carekê xwest bi çîyan bikevim. Berê di kêliyên wisa de dilê min ê weke zarokan bi coş dibû, niha zîzbûnê dijî. Ez nagihim ti miroveke jê hez dikim, pêwîstiya min pir bi wan heye.

Tarzê hinek kesên di rêveberiyê de cih digirin, guman bi min re ava dike û vediciniqîne. Ev hemû dijminê rêxistinbûnê ye. Yên li dijî wan disekinin bertek didin nîşa û wê/î biçûk dixin. Li hemberî vî tarzî tiştê herî baş têkoşîna rêxistinî ye. Li qada Bakûr mirov li ser piyan jî bimîne bi wate ye. Divê ji bo mirovên ji min hez dikin bi ser bixim.

8 Tebaxê 2008/Tetwan

Merheba Agir Giyan

Tu meraq dikî rojên min çawa derbas dibe, ez fêrî warê xwe yê nû bûm û cihê xwe di kîjan pratîka jiyanê de digirim. Ez hez nakim li cihek bê tevger bimînim, ez pir ji bizav û bi tiştêkî re mijûlbûnê hez dikim. Dema ez demê li gor wateya wê tijî derbas nekim, dihizirim weke min heqaret li demê kiribe. Dem pêroz e. Dema tê bikaranînê dî paşde nayê. Dixwazim zanabûna wateya demê bijîm. Rojên min vala diçin. Em hatine Tetwanê, heta niha ji derveyî çûna hinek peywirên biçûk, me tiştêk

cuda nekiriye. 15'ê Tebaxê nêz dibe. Qet planeke çalakîyê nîne, ev jî min aciz dike. Ez li bizava Şêx Cuma digêrim û bêriyê dikim.

Dijmin bi avêtina guleyên helîkopterê agir bi Kember, Sîser û Kurîs xistiye. Niha daristan qirçe-qirç dişewite, her der di nav dûkelê de maye. Ba jî pêtên agir geş dike. Ez hêrs dibim û naletê li dijmin tînim. Ji ber destê wan nagihe me, erdnîgariya me ya xweşik dişewitînin. Lê ez niha bawerim, ciwanên me yê her tim daran diçînin wê cihên hatîne şewitandin ji nû ve şîn bikin.

11 Tebaxê 2008/Tetwan

Merheba evîna min a bi bahoz

Pîştî çend rojan min li Tetwanê cudabûnek jiya. Em çûn peywirek komîk û xeter. Li Tetwanê koçer pir in. Jiyana koçeran her tim bala min kişandiye. Li vir derfeta min a ji nêz ve naskirina wan çêbû. Ev peywira me ne çalakî bû, lê li hinek cihan pîrsgirêka bînesazîyê bi qasî çalakîyê girîng e. Hevalê Xemgîn bi keran erzaq anîbû. Lê pêwîst bû ev ker dîsa bi awayek sexlem radestî cihê wan hatiba kirin. Ji bo naskirina arazî ez bi hevalê Demhat Koçer re çûm peywîrê. Bi sê keran erzaq anîbû. Di vegerê de em her yek li yekê siwarbûn. Siwarbûna keran jî serpêhatiyeke. Di berê de ez li keran siwar nebibûm. Hevalê Demhat pir baş dimeşand. Me pîştî çend gav avêt, dema em daketin jê ez ji kerê ketim. Min pes nekir û dîsa siwar bûm. Pîştî em hinek din pêş de çûn ez dîsa ketim nav giya. Ez dîsa siwarbûm û min pes nekir. Di vê navberê de hevalê Demhat û Sebrî ji kena ji hev ketin. Berî hewa ronî bibe em gihiştin cihekî. Me xwe di nav daran de veşart. Em roj hemû di nav van daran de man, ber bi êvarê bi tarîbûna hewayê re em ketin ser rê. Piştî dîsa me bêhna xwe li wargehê vekir. Her çendî min şiyarî dabe û gef li hevalê Demhat xwaribe jî, hevalê Demhat dîsa tiştên komîk ên di peywîrê de derketî ji hevalan re got. Bi taybet behsa ez çawa ji kerê ketime kir. Heval jî kêfxweş bûn û bela xwe li min didan. Min qet guh nedidayê.

Di berê de tiştên wisa bala min dikşand û dibû kêfxweşî. Ji bo min dibû girgir. Ez niha guh nadimê û bê ku gelek tiştan vebêjim, derbas dikim.

Ez xwe lêpirsîn dikim û dixwazim xwe kom bikim. Ji ber bêmafiya min jiyan kirî, xwe ew qas bi vê re kirina yek wê min bibe heta ku derê? Êdî divê şêwe bidim jiyanê xwe, divê dem min nexirîkîne. Min hîn pêşdarazîn ji holê ranekirine. Pêşdarazîn paşverûtî û bêhêzbûna mirov e.

Agir Giyan, ez êdî naxwazim êş û zehmetiyên xwe ji te re vebêjim. Min pir bêriya te kiriye. Tu hezkirin û bilindbûna girêdana min dizanî. Tu dizanî bê hebûna te jî çiqas zehmet e. Bêriyên min kûr, hêviyên min mezin û xeyalên min xweşik in. Tevî hemû tiştî ez ji mirovan hez dikim. Tevî mirovan ew qas zehmetî bi min dane kişandin jî dîsa pir ji mirovan hez dikim.

Çi tiştêk seyre, di çavkaniya hemû zehmetiyên min de hezkirin heye. Ji ber ez ji jiyan, mirov, Bakûr, gerîlabûn, rêhevaltî û hwd, ji van hemûyan hez dikim ew qas zehmetî dikşînim. Bawerim ji ber vê hezkirin ew qas pîroz e. Ti hêz nikare vê bêbandor bike. Hezkirin pîroz e. Ger mirov hez bike, dikare were hezkirin. Ger şerê azadbûnê bidî, dikarî azad bibî.

14 Tebaxê 2008/Tetwan

Merheba Agir Giyan a bêriya wê dikim

Ez pir ji agir hez dikim. Dibe hezkirina min a agir ji ber çanda Zerdûştî be. Agir rêhevalê gerîla ye. Gerîla her tim bêriya agirê bi azadî di tariya şevê de pêdixe, li derdora wê xelek girêdidin û stranan dibêjin dike.

Agir weke dilê jinekê bi rehme. Agir hemû kes û tiştî ber bi germahiya xwe ve dibe û hembêza xwe ji wan re vedike. Dema agir direqise nikarim lê nenêrim. Agir hemû xeyalên min dixemilîne. Te jî bi xwe re

dixirikîne. Agir û hezkirin. Agir û jiyan. Agir û dostanî. Agir û jin. Wisa yek in, nikarim cîhanek bê agir bihizirim. Cîhaneke bê jin nahizirim. Jin cîhan û jiyanê bi wate dike. Agir jî jiyanê xweşik dike.

Di sincirîna agir de hezkirin, di sorbûna agir de şerkirin û xwe bi xwelîya agir şûştûn! Ger mirovek di rengê agir de azadbûnê serbixe, bêdewî û bê mirin dibe. Agir di dilê min de dibe stranek şewitî, agir di qehra bêriyên min de dibe xwelî. Agir nasnameya evînên pîroz û mirovên dilê xwe dane azadiyê ye.

Çavên min di lerizîna agir de tijî dibe û bîranînên min ên gerîla hemû nû dibin. Her ku sihbetên me yên ber agir kûr dibin. Stêrk bi sihbetên me dibiriqin, me ji sihbata kûr digire û dibêjin; em stêrk jî li vir in. Girnîjînek xwe li ser rûyê me belav dike û em dîsa dest bi sihbata xwe dikin. Gotin weke libên tizbiyan dikevin rêzê, destpêkê pirsan dipirsin. Ji tiştên em jê hez dikin, heta tiştên em bêriyê dikin û ji mijarê derbasî mijarê dibin. Pirsyarên cuda cuda li pişt hev tên. Ev kursiya pêşbirkê nîne, ev gotinên zêrîn, gotinên komek gerîlayên li derdora agir kom bûne ne. Min jî bîranîn, xezîne û hezkirinên xwe yên li paş hiştî hene. Demên derbasbûyî wisa xwe di xwebûna min de çandiye û text di dilê min de daniye. Yek jî em li îro vegerin. Rojên min ên bê agir derbas dibe û behsa şevên xwe bikim. Li Bakûr ji ber mijara ewlekariyê em nikarin bi şev agir pê bixin. Heta ji ber wê cihê me eşkere bike em destûr nadin pelek tenê jî bi me re bigirniye.

Demek dirêj çêbû em li herêma Tetwanê ne. Jiyana me yek reng derbas dibe. Ji ber vê bêhnê min pir teng dibe. Niha di herêmê de plana çalakîyê nîne. Plana giştî, sexlem derbaskirina yekeyan û amadekariyên binesaziyê kirin e. Ev niha hinek tê meşandin. Ji ber vê em her tim li wargehê dimînin. Di navberê de em carna diçin gel koçeran. Em li gelîyê Şêx Cuma zêdetir çalak bûn. Mirov li wê derê zêdetir fêrî pratîkê dibe. Dibe ji niha ve biryar girtin pir zû be, lê niha rewş wisa ye.

Berî çend rojan jî dijmin got; li Sasonê windahiyên wan hene û hevalêk şehîd ketiye, du heval jî birîndar ketine dest. Piştî jî got; her sê heval jî şehîd ketine. Em qet nikarin agahî bigirin. Bi qasî me fêm kirî yekeya hevalê Çiya (K) ye. Hevalê Çiya berê li Şêx Cuma bû. Vesaziya wî

ji bo wir çêbibû. Hevalê Xeyrî bi wî re çûbû. Divê em ji bo van hevalan çalakiya tolhildanê bikin. Divê em li hemberî van windahiyan bêdeng nemînin. Dixwazim cihê xwe di vê çalakiya tolhildanê de bigirim. Ka em binêrin wê heval çalakiyek çawa plan bikin. Hêvî dikim çalakiyê bidin pêşiya herêmê jî. Ji bo pêwistiya girêdana me ya bi van hevalan re, divê em bihêz beşdarî têkoşînê bibin û tola wan rakin.

18 Tebaxê 2008/Tetwan

Merheba jiyana azad a bêriya wê dikim

Em şoreşger, mirovên dil dane azadiyê, her tim di lêgerîna jiyaneke azad de ne. Li hemberî tiştên li pêşiya azadiyê dibin asteng hêrs dibin. Ji bo guhertina van jî têdikoşin. Em carna di vê têkoşînê de bi tenê dimînin û hinek caran tînin asta fetisandinê. Tevî van hemûyan em bawerî û hêviya xwe ya ji bo azadiyê winda nakin. Ji zehmetiyan re înat em bi tînbûna azadiyê têkoşîna xwe berdewam dikin. Ji bo azad bibin û azad bikin hevaltiya me hemû ji bo azadiyê ye!

Ger ew qas bawerî bi azadiyê nebe, wê mirov li hemberî hinek zehmetiyan hilweşe. Baweriya bi azadiyê hêza berxwedanê ava dike. Ger girêdana azadiyê nebe, mirov nikare rojek tenê jî hinek tiştan tehemûl bike. Bawerim aliyê azadiyê yê xweşik ev e, hêsan bi dest nexistine. Şoreşger her tim ji zehmetiyan hez dikin. Ji ya hêsan direvin û ya zehmet hildibijêrin. Felsefeya şoreşgeran a bingeîn azadî û xuliqandina jiyaneke azad e.

Şoreşger bi sekna xwe ya jiyaneke mirovên balkêş û xwîngerm in. Îdeya min her tim bûna şoreşgerek bi hêz e. Dema min şoreşgertî bi ser xist ez ê azad bibim. Dema şoreşger dibin pêşengên civakê, heta henaseya xwe ya dawiyê ji bo gel têkoşînê dikin. Her şoreşgerek ji aliyê xwe ve girêdanek wan a bi jiyana şoreşgerî ve heye. Kes nikare ji yê din re bêje, ez ji te zêdetir şoreşger û milîtan im. Di rastiya xwe de yê wisa dihizire, nebûye şoreşger û nepixî nêzî xwe dibe. Nêzîkatiyên nepixandinî azadiyê naxuliqîne û pêknaîne.

Dema em şoreşger û gerîla li gel hev bin nirxa hev nizanin û ji rêzê nêzî hev dibin. Ev ji rêzêbûna me dihincirîne û li pêşiya xeyalên me dibe asteng. Di bin navê rexneyan de em hevdu dihilhilînin û gotinên divê em nebêjin dibêjin. Em şoreşgerin, ev taybetmendî kirêtiyên pergale avakirine. Şoreşger xwe ji van taybetmendiyan paqij dike. Ev fêrbûn sihê dixê ser hest û lêgerînên hîn nû di asta pêşketinê de ne. Ev nêzîkatî di şexs û komên biçûk de yê ji xwe re dibêje ez şoreşgerim, lê di cewher de nebûye şoreşger tê jiyîn. Şoreşgerî jî li hemberî vê serxistina hebûna xwe, hebûnek wisa hîskirin jiyîne.

Ez jî jineke keda şoreşgerbûnê didim û xwedî wê îdeayê me. Dema ez rastî nêzîkatiyên wisa tîm êş dikşînim. A hêza li hemberî hemû zehmetiyan di min de ava dike, hêviyên min ên azad ên ji bo Rêbertî û jiyana pêşerojê ye. Ez ê heta henaseya xwe ya dawiyê ji bo şoreşgerbûn û azadiyê bijîm.

Çi zehmetiyê dibînim bila bibînim, ez dest ji hêviyên xwe bernedim. Ez dest ji we bernadim Rêberê min.

27 Tebaxê 2008 /Tetwan

Merheba mirovên xweşik

“Dem diherike û diçe, nizane bisekine.” Ez vê stranê pir dicibînim. Rûpelên salnameya 22’ê Tebaxê dide nîşan. Par di vê dîrokê de me xatirê xwe ji hevalên Akademiya Jinên Azad Ş. Bêrîtan xwest û veqetiyên. Par weke îro em çiqas bi kelecana bûn. Em ji kêfan difiriyên. Heval niha yek bi yek tîn ber çavên min. Ez dubare li hevalên komê dihizirim û îro digirim dest.

Du hevalên jin ên di koma me de ji ber fîzîkî zehemtî dikşandin li Botanê man. Rojhat Cîlo revî xwe radestî dijmin kir û gelek mirov jî dan girtin. Hevalê Fuad jî ji ber pîrsgirêkên wî yê tendirûstiyê îsal dubare şandin Başûr. Hevala Cîhan jî li Şêx Cuma dimîne. Hevalê Delîl F. jî li Xaça Reş dimîne. Ez û hevalê Hewrê em niha li herêma Tetwanê dimînin. Hevalê Rojhat Markoz jî niha di girtîgehê de ye. Dema li araziya Bidlîsê diçin peywirê dijmin kemînê datîne pêşiya wan. Ji ber hevalê

Rojhat di kemînê de birîndar dibe ji hevalan qut dibe. Hevalên din sexlem digihin cihê xwe. Di 7'ê Tîrmehê de dikevin kemînê û di navberê de demek nêzî deh rojan derbas dibe. Piştî gundî şikayeta hevalê Rojhat dikan. Di derbarê rewş û tendirûstiya wî de ti agahiya me nîne, ez nizamim di kîjan girtîgehê de ne jî. Ka em binêrin wê rewşa hevalên din ên di komê de bûn çawa be?

Em nêzî 25'ê Tebaxê dibin. Rêhevalên ku me oxur kirine di vê dîrokê de şehîd ketibûn. Me agahiya şehadeta wan rêhevalan di rê de bihîstibû. Koma me bi şehadeta wan pir bandor bibûn. Vê rewşê biryarbûn û îdeaya me zêdetir kûr kiribû. Taybet em ê ji bo wan bihatan Bakûr, bihatan Xerzanê û şer kiriba. Me yê li van warên azad têkoşîna xwe gihandiba lûtkeyan û em jî biban kulîlîkên Kurdistanê.

Bi vê kelecana û biryarbûnê me beza maratonê xilas kir. Me xwêhdana xwe paqij kir û em li Xerzanê ne. Ew rêhevalên hêja ne li gel me ne, a li pişt wan ji me re maye xeyal û bîranînên wan in. Ez soz didim we, wê hewla min hemû li ser bingeha pêkanîna xeyalên we yê azadiyê be. Ger ji we hez dikim, wê demê em hundirê vê hezkirin û girêdanê dagirin û divê ez tola we bistînim.

Rêhevalên min ên hêja, tiştê herî zêde ez li Xerzanê aciz kirim nestandina tola we bû. Me çalakiyek bi hêz nekir. Hinek tişt tenê bi min ve ne sînordar bûn. Lê dîsa herî kêr di wateyek takekesî de be jî dikare çalakiyek were kirin. Ez ê ji bo tola we bistînim bijîm, heta çalakiyek bi hêz dikim. Stêrkên bêdawî yê li asîmanan.

Rêhevalên min ên hêja! Şehîd Roza, Avesta, Andok, Delîla, Îsyana, Rojhat, Erdal, Amed û Eşref... Çi dibe bila bibe ez ê bêriyên we pêk bînim. Hezkirin û girêdana min ji bo we nû dibe û ez li ber bîranîna we bi rêzdarî bejna xwe ditewînim.

Rojên xwe yê Tetwanê bi rojnivîsa xwe re parve dikim.

Rêhevaltiya rast a qada Bakûr ji her tiştî hêjatir û bi watetir e.

Min ji hevala Sema re got; ger ez rojekê şehîd bikevim, tu yê vê rojnivîsê bigihîni Mizgîn giyanê. Ez nikarim hemû bahozen di dilê xwe de

binivîsim. Nikarim tiştên di hundirê xwe de veguherînim gotinan, Agir Giyan tu min fêm dikî ne wisa?

Ez hatina bahozan di dilê xwe de mezin dikim û dikim bihar. Li van axan diçînim ji bo di pêşerojê de şîn bibin û kulîlkan bidin.

Ji gel dilê xwe yê herî xweşik demasala ku pir jê hez dikim diyarî we dikim. Ji bo her tim bijî û ber bi pêşerojê biçe. Her çendî tu ji min dûrî jî ger carek din şansê dîtina min a te çênebe, ez ê her tim ji dilbûna te bawer bikim, xwe bispêrim mezinbûna hevaltiya te û bimeşim. Ger rojekê mirin were ber deriyê min jî ez ê jê re bêjim tu bixêr hatî. Ez ê bêjim, silav, dil, dostaniya min ji zarokê şervan re bibe û tiştê cuda naxwazim. Dema ev daxwaza min hat cih wê çavên min vekirî neminin. Ez dixwazim hûn jî li pişt min bidin ber tilîliyan, ji ber ez ji we hemûyan pir hez dikim.

22 Tebaxê 2008/Tetwan

Rêberê min

Êşa herî mezin a ji bo mirov were dayîn, ji ax, welat û hezkiriyên wan qutkirin e. Êşa herî mezin mirov bide zarokan jî qutkirina ji dayîk û bavê wan ne. Êşa herî mezin a mirov bide gerîla jî qutkirina ji Rêbertî, gel û hevalên wan e. Em fîzîkî ji hezkiriyên xwe vediqetin û qut dibin. Em hinekan bi tîrsa em ê carek din nebînin bi rê dikin. Hinek axa sar ji me digirin û hembêz dike. Hinek ji dikevin quncên tarî yên girtîgehê, tîr girtin; hemû girêdanên wan ên bi rêhevalên wan re tîr qutkirin.

Li gel van hemûyan tevî li heman warî yî jî hevalên tu agahî ji wan nagirî hene. Ji ber alavên teknîkê nîne tu nikarî agahî bigirî. Tenê mezinkirina bêriyan li pişt dimîne. Hezkirina te bi hêviya dîtina carek din avê bi ser êşên te de dike.

Xeyala min a her mezin dîtina Rêbertiyê ya duyem jî dîtina kêliya Rêbertî bigihe gel e. Di dawiya hemûyan de hevdîtina û gihiştina hev heye. Bi hezaran gerîla ji bo dîtina Rêbertiyê ya kêliyê ma çî nakin. Rêberê min, şansê min ê dîtina we ya fîzîkî nîne. Lê weke jinek gerîla hemû hewla min weke manevî bi felsefeya we re jiyîn, weke hûn her

tim li gel min in hîs kirin û bi wê hewlê bijim. Rêberê min, min hewl da ji rastiya we dûr nekevim û 24 demjimêran bi we re bijîm. Wê ji niha û pê ve jî wisa be.

Ev bayê azad ê li çiyar dixe, ez ê bihîskirina jiyîna zehmtiyên di wê quncê de bijîm. Wê azadiya we bibe azadiya min; azadiya me. Ji ber vê singa xwe didim ber hemû zehmetiyan. Ji ber vê weke berfînekê li hemberî hemû zehmetiyan serhildêr dibim. Rêberê min, ez ji hemû tiştên xweşik hez dikim. Ji mirovê zanyar ê firîna çûkek azad, bawezînek nerim a bayê, bazdana hespek dîn û har, hêviyên gerîlayekê, mezinbûna çiyar ê ku wate dide van tevan û van xweşikbûnan bi min dide nasîn hez dikim. Rêberê min, we azadî bi me jinan da tamkirin. Em niha bi hilmijandina azadiyê, bi hebûna xwe wate didin jiyar û cîhanê. Di gerîla de watedayîna çirûskek herî biçûk jî dijîn. Rêberê min; êşa min a herî mezin, neparkirina daxwazên xwe ye. Ev bêrîkirin birînên kûr di dilê min de vedike.

23 Tebaxê 2008/Tetwan

Bi tenê me

Birîndarim

Her kêlî xwê li birîna min dikin

Nikarim bêjim canê min dişewite

Wisa hêdîka êşê dikişînim hinavê xwe

Êşên ji bo azadiyê tên jiyîn

Mirov serfiraz dike

Ez ê hevaltî û dostaniya gerîla

Li zarokên bi hêvî binexşînim

Ez ê weke jinekê

Ji jinan re vebêjim
Min çawa
Bi împratorên biçûk re şer kiriye
Xwe di agirê hestên xwe de şûştîye
Bûm keça rojê
Çawa xwebûna xwe dijwar parast
Rengê xwe hîlbijart
Di bêdawîbûna şîn de
Ez bûm leylana wê
Bûm Marya
Bûm hêvî
Bûm hezkirin
Ne ez im
Di robara vê demê de diherike
Jinên azadbûyî ne diherikin

Tu şîrîka derdê tenêbûna min î
Tu ronahiya min
Ya min di xeyalên xwe de avakirî
Gotinên min dibin girêk
pênûsa min nanivîse
Tirsa êdî nebînim dilê min dişewitîne
Ez ê tirsên xwe ji kê re vebêjim?

Kurdistana min a xweşik

Dilê min dibe derya
Dibe okyanûs
Dibe robar û diherike
Dixwazim vebêjim
Di qirika min de dimîne
Û hemû peyvan ji bîr dikim
Bi pêlên dilê xwe re bi tenê dimînim.

Di pençeyên qêrînekê de
Di kenê zarokekê de
Dixwazim vebêjim
Janên xwe yên azadiyê
Şerê xwe yê serfiraziyê

Ma her tim wisa dibe?
Dema dixwazî vebêjî
Nikarî vebêjî
Dilê min
Mîna çûkekê

Di nav kefa destê min de difire
Bêdeng li dûv dinêrî
Di nav gerdûna hestên nayê pênasekirin de
Melevaniyê dikî
Hestên te mîna lavlavkê li bedena te diale
Jiyanek
Vegotina wê zehmet li pêş te tê raxistin
Hema dixwazî zû bijî
Bê ku bizanî jiyanek çawa ye
Tenê bêjî bijî

Şerê min
Min dikşîne
Yek jî
Azadiya min temenê xwe dayê dikşîne

Di lerizîna bêrî û êşan de
Têlên spî ketin porê min
Di kêliyê de min xwe nas nekir
Êdî di eynika xwe dibînim de
Yek cuda heye

Çawa vebêjim?

Xetên rûyên min
Êdî xendeyan napijiqîne
Di rondikên çavên min de
Deryaya bîranîna êşan heye

Hemû wênesaz
Şoreşger tabloya êşê xêz dikin
Ti kes nikare
wêneya welatê min
Êşên dayîka min xêz bike
Welatê min
Kurdistana min a xweşik
Tu her tim tenê hatî hiştin
Weke winda hatî hesibandin
Bû dergûşa dîrokê
Bû înkara îro

Welatê min bû dayîka min
Bû dosta min
Bû şerê min
Bû evîna di dilê min de
Welatê min
Dayîkên me

Dîsa hembêz dîkin bedenên ne zindî
Dilê min ranake
Bêhêz dikeve ji ber van çûyînên bêdeng
Raweste heval neçe!
Min jî bibe
Ma dibe wisa bi tenê biçî
Li pişt xwe çavên tijî rondik hiştin
Rêheval û dostên xwe

Rojekê
Teqez rojekê
Ez ê jî li pey we werim
Zarokên leheng ên welatê min

16 Tebaxê 2008

Merheba

Merheba stêrkên li asîmanan dibiriqin û zarokên leheng. Merheba xunçeyên azadî, zarokên agir û rojê!

Nizanim ez ê ji ku derê dest pê bikim. Ti gotin nikare tiştên di dilê min de derbas dibe vebêje. Dema di kûrahiya gelî de êşa veqetînê dijîm, qirika min ditevize. Bîranîn yek bi yek hemû li ber xwebûna min zindî dibin. Tîqetîqa kenê hevala Delîla di guhê min de deng vedide. Coş û nihêrîna kûr a hevala Avesta ya jiyanê li ber çavên min e. Ji niha de heybet û sekna azad a Hevala Roza weke şerîda filmekî zindî dibe.

Hûn ne tenê bîranînekin, hûn her tim bi me re ne û bi hebûna we re dijîm. Ez gotineke we vebêje nabînim. Êşa tenê di dilê min de diherike

xwebûna xwe di kûrahiyê de dijîm. Hizirinandina nebûna we ya îro ji mirinê xirabtire. Tu carekê mirinê hembêz dikî, lê ez bi 11 giyanan dimirim. Ka mane me yê hev li Xerzanê bidîta. Niha çavên min li we digerin, dema we nabînim, weke bikevim binê bîrekê li min tê.

Nihêrîn û nihêrînên we yê dawiyê wê ji me re bibe zimanê bêdawîbûnê. Kî dikare nihêrînên hevalê Erdal ên xemgîn û ew têkoşîna bi xwestek, temenê xwe yê ciwaniyê dayî ji nedîtî ve were? Yan kî dikare rêhevaltiya ji hundir a hevalê Rohat ji bo hevalên jin ji bîr bike? Yan kî dikare serîrakerîna hevalê Îsyar a li hemberî zilmê û azweriya wî ya ji bo azadiyê vebêje? Ti pênuş û dil nikare we vebêje. Vegotina ziman tenê û tenê dikare weke Rozayan bûna stêrk pêwîst dike.

Hevalê Andok, qaşo mane te yê tiştên berê li Xerzanê jiyane bi me re parve kiriba? Kenê te di nîvî de ma. Tehemûlî kenê te nekirin. Ya tu hevalê Andok, ez ê çawa xwîngermiya te vebêjim. Ez perçiqîna nevegotina we dijîm.

Xerzan bêdengiya nebûna we dijî. Sûlav li çepikan nadin û bi awaza bilûrvanan diherikin. Kember, Kurîs û Sîser li dora xeyalên we govend girtine û berbest danîne. Wê kes xeyalên we netemirîne. Ji ber wê çiyayên Xerzanê bibin dostê gerîla, wê ji nû ve stranên Mizgîn û Delîlayan deng vedin bi hezkirin.

25 Tebaxê 2008/Tetwan

Pêwîstiya her jinekê bi azadiyê heye

Weke jin em çiqas hev nas dikin? Naskirin di cîhana jin a hundirîn de rastiya di jinê de tê veşartin asta yekbûna rihe. Ez bi fîzîkî jinekê nas nakim, lê dikarim hest û derûniya wê fêhm bikim. Em dikarin hev fêhm bikin. Xala me tenê ji hev vediqetîne şeweyê me di nav civakê de girtiye. Yek jî aliyê jinan a hevpar daxwaza ji bo azadiyê ye. Pêwîstiya jinên

li wî aliyê cîhanê dijîn jî bi azadbûnê heye, pêwîstiya min jî bi azadbûnê heye û lêgerînên min hene. Her wiha têkoşîna wê didim.

Koma me ya sêyemîn a ji Başûr dihat, sexlem gihişt herêma Xerzanê. Gelek hevalên di koma hevalê Şahan de dema derbasî başûrê Mûşê bûn şehîd ketin. Pir baş e, ev koma me sexlem gihişt herêmê. Ez di wê baweriyê de me wê alîkariya wan ji herêmê re çêbibe. Di vê komê de du hevalên jin jî hebûn. Hevala Toprak û Jiyan. Îro şansê me yê dîtina wan çêbû. Min hevala Toprak berê du saetan dîtibû. Lê min hevala Jiyan qet nedîtibû. Nîqaş û sihetên me yên pir bi wate çêbûn. Mirovên pir xweş bûn. Nîqaşên min bi hevalên xort ên di komê de çênebûn. Min ramanên xwe di civînê de bi wan re parve kir. Bêmoralî di komê de hebû, hevdu zorlame kiribûn. Hevalên xort ên bi hev re nedaxivîn jî hebûn. Rewşa hevalên jin baş xuya dikir. Tevî hevala Toprak bi fîzîkî pir zehmetî kişandibû jî, bi nîşandana vînek mezin re gihişt Xerzanê. Bername, kêfxweşî û kelecana wan pir xweş bû. Hêvî dikim tiştê li pêşiya van xeyalan nebe asteng. Her wiha hêvî dikim wê her tim wisa bi kelecana û zindî bin.

Hinek rastiyan Bakûr xeyalên mirov dişîne. Naxwazim ew vê bijîn. Serkeftin be ji we re hevalên min ên xweşik, hemû tiştî li gor dilê xwe bijîn.

7 Îlonê 2008/ Tetwan

Merheba hevaltiya PKK'ê û mirovên paqij

Li ser rastiya zilam gelek dahûrandin tînin çêkirin. Li ser van eksenê dahûrandinan tehlîl tînin pêşxistin. Tevî em di zanabûna serdestiya zilam de ne, dîsa gelek deman baweriyê bi hevaltiya PKK'ê û di aliyê hestiyarî de girtina dest a vê baweriyê me dixê nav nebesiyan. Me siyasî nake, hestiyar dike.

Ma hemû kesê beşdarî gerîla bûye bîrdozî fêm kiriye? Lê weke hinek bîrdoziyê dipejirînin xwe di vê mijarê de kûr nekirine. Lê vê polîtîk û bi rêbazên zirav li hemberî jinê bikartînin. Di rastiya xwe de li hemberî rêxistinbûna jinê xwe eşkere dikin. Weke ev têrê nake, weke pişîka reş hevaltiya jinê parçe dike. Hewl dide biçizire nav peywendiyên jinê. We-

ke em li malekê bijîn, lê em di nav rêxistinekê de ne. Di ziman de dibêjin rêxistin, lê di nêzîkatiyên xwe de dikarin weke ferdê malbatekê nêz bibin. Carna weke bira, bav û carna jî wek parazvanê namûsê ne. Di rastiya xwe de ev tişt li her derê hene. Ji ber ev kesayet berhemên polîtîkayên pergala serdest û dewletê ne. Ti girêdan, xislet û dirûvên van a bi kesayeta rêxistinê re nîne.

Ew qas kirêtî heye em nikarin peywendiyek xweser pêk bînin. Her tim astengiyekê didin nîşan. Bi eşkereyî nikarin bêjin; peywendiya xweser nekin. Nikare rêxistinê bigire hemberî xwe, lê di bin de rêxistinê vala derdixe.

Dibêjin; pêwîst nake hûn muhabereya xweser çêbikin, jixwe em li ser navê herêmê tekmîlê didin. Muhabereya xweser hewce nabînin. Îro li nav çavên min nihêrîn û gotin; enerjî nîne em nikarin muhabereyê bikin. Min jî bawer kir, lê dema demjimêra muhabereya giştî hat bêtêl vekirin û muhabere kirin. Yê ev kirî fermandarê cepheyê ye. Her wiha qaşo perwerdeya jin jî dîtiye û yek jî yê herî zêde xwe heval dide nîşan ne. Ev ne cara yeke rû dide. Di berê de tevî min ji fermandarê qadê re gotibû jî, dixwazim hevala Rojan bibînim negotibû. Divê ez van nêzîkatiyan çawa şirove bikim? Divê ji bo mirov van nebîne, yan xeşîm yan kor be. Ger mirov van nêzîkatiyên li Bakûr ji hinekan re bêje, kes bawer nake. Wê bipirsin û bêjin; ma çawa çêbû hîn wisa li Bakûr nêzî jinê dibin. Qaşo yê van dikin fermandarên me yên xwe rewşenbîr bi nav dikin in.

Zilamê serdest hewl dide serweriya xwe li ser rastiya qada pratîkê pêk bîne. Ji ber şer weke karê xwe dibînin, bi nêzîkatiyên weke em ji derve de hatine cuda û ji jor de mêzandin bi hezar lîstokan nêz dibin. Ez nikarim vê pir zêde gelemperî bikim, lê ferasetên wisa zêde hene. Her wiha ev mirov jiyan û hevaltiya PKK'ê xirab dikin. Li pêşiya daxwaza ji nû ve avabûna azadiya jin û zilam dibin asteng. Ji ber paşverûtiyê di kesayeta xwe de dijîn, dema fersendê dibînin vê bi rêxistin dikin. Ev fermandarên paşverû li cihên serweriya rêxistinê lê nebe û wisa dûrin, bi vî şêweyî tarzê xwe didin axaftin. Li qada Bakûr ev nêzîkatiyên wisa zehmetiyê dide mirov. Ez li hemberî van nêzîkatiyan hêrs dibim? Wê ev

kirêti li pêşiya xeyelên me yên pêşerojê bibin asteng. Xwezî min karîba van ji Rêbertiyê re gotiba, xwezî.

10 Îlonê 2008/ Tetwan

Agir Giyan

Çima tiştên divê di dema wê de werin gotin nayên gotin? Em çima hêvî dikin her tim mirov hikum li ser hest û ramanên me bike. Em gelek caran ne di ferqê de ne tên bikaranîn, an jî di ferqê de ne, lê hêza me ya helwest nîşan danê çênabe. Yek jî dema ev dibe Bakûr hinek tişt zêdetir zehmet dibin. Yekeyek biçûk, asta vê yekeyê çî be asta rêxistinê jî wisa ye.

Fermendarê herêm û cepheyê li gor daxwaza xwe dimeşînin. Ger xwedî wijdan be baş dimeşe, lê ger wijdana wî/ê lewaz be zîyanê didin rêxistinê.

Yek jî di van yekeyan de hejmara hevalên jin jî kêr e. Di van derfetan de vîna azad û demokrasî wateya xwe winda dike. Di vê wateyê de hejmara hevalên li Bakûr çiqas zêde be, ew qas rêxistin tê meşandin. Li Bakûr zêdetir pêwîstî bi serweriya rêxistin û rêxistinbûna jin heye. Li vê derê tarzê gelek fermanbaran cuda tê jiyîn, ev tarz mirov dixê nava gumanan. Baweriyê nade. Ev bêbawerî mirovan dihincirîne û nerihet dike. Tu nizanî tu yê vê rewşê ji kê re jî bêjî, dest û lingê mirov girêdayî ne.

15 Îlonê 2010

Merheba kulîlka min a mizgîniyê

Di navbera me de çiya û bajar hene. Ev dûrbûn ji bo min bê wate ye, ji ber ez her bi te re me. Lê rasterast dixwazim bi te re bim. Dixwazim dengê te bibihîzim. Ez li gel te xwe pir bi kêf hîs dikim, weke zarokekê xwe nazdar dikim û rû digirim.

Ez pir tişt ji te fêr bûm û fêrbûnê berdewam dikim. Ez her roj zêdetir pêwîstiyê bi te dibînim. Em her tim tên gel hev û ji hev vediqetin. Bihar her tim dibe demsalên me yên hevdîtînê. Di veqetînan bi zanabûna jiyîna êş û bêriyan gavên me ji hev dûr dikevin.

Tu her tim hem xwîşk, hem hevala têkoşîn û hem jî mamosteya min î. Tu hemû tiştê min î. Ez ti caran naxwazim tu ji ber min êş bikşînî û ger tiştê wisa çêbibe jî teqez xwe efû nakim. Tu giyan û bîbilka çavê min î. Her ku bi rastiya jiyane re rû bi rû tîm zêdetir te fêr dikim.

Kulîlka min a mizgîniyê; ger hinek caran nêzîkatiyên min ên hişk rûdabin jî lêborîna xwe dixwazim. Mirov heta hinek tiştan neji fêr nake, ya min jî hinek wisa bû. Ez niha te ji gelek alîyan ve baştir fêr dikim. Her wiha tiştên min ji te re gotine, ji bo bi te re parve bikim ez ê hewla têkoşîna li ser piya mayîne bidim. Tu min fêr dikî giyana min, zehmetî û dijmin nikare min bin bixe?

Piştî mehan min fersenda silavekê ji te re bişînim dît, tu nizanî ez çiqas ji te hez dikim. Ez dilê xwe yê bi hezkirin, bêrî û azadiyê lêdide ji te re dişînim. Gelo em ê bikarin carek din şansê hevdîtînê bibînin? Hewldana min hemû ji nû ve hatina gel hev a carek dine. Ger em carek din bi fîzîkî hev nebînin jî, dixwazim hest û rihê xwe yê bêdawîbûn hembêz kirî bişînim. Veqetînen bi hiş hatine hunandin bi wate ne, her çendî êşa her veqetînekê şopa xwe bihêle jî, hinek veqetîni di xwebûna mirov de ji aliyê fîzîkî li cem hev mayîne wêdetir wateyek pîroz di nava xwe de dihevine. Vaye ya me jî wisa ye.

Min ti caran hêviya xwe wînda nekir û wînda nakim jî. Ez ê teqez rojekê te bibînim. Mizgîna ez bêriya wê dikim, li benda min be. Ez ê dîsa di bihareke tu ne li bendê derkevim pêşîya te û ez ê dîsa te matmayî bihêlim. Ez ê bi qêr, hezkirin û bêriyên salan xwe li stûyê te bigerînim û ez ê carek din bi te re ji dayîk bibim. Ez ê her tim di warên welatê xwe yên hêviyê de bi te re di heman çeperê de têkoşîn bikim. Her çendî bayê Bakûr dijwar jî be, wê nikare min ji hezkirin û hêviyên min veqetîne. Her çendî min demek dabe sekinadin jî, ez ê dîsa li cihê jê mabûm dest bi bezê bikim.

Heval û şervana ji te hez dike.

17 Îlonê 2008

Zarokmayîn pir xweş e

Rojên me bi bizavekê berdewam dike û diçe. Di vê pêvajoyê de me zehf arazî nas kir. Warên me dîtine mîrasa ji hevalên me yên şehîd mane. Em niha ji bejahiya Geliyê Cengîzan diçin wargehek hevalan a kevin. Di berê de hevalên birîndar li vê wargehê diman. Nayê zanîn di vî cihê xweşik de kî hatiye û çûye; em gelek ji wan nas nakin. Di bin roniya heyvê de ez û hevala Sema sihbet dikin. Gelo kîjan heval li ser vî kevirî rûniştine û temaşeyî van axan kirine?

Min bêriya hevalê Rizgar Êrsî kiriye, pir dixwazim wî bibînim. Berî bî-kevin kemînê min wî di xewna xwe de dît û min şer dikir. Wî henek bi min dikir û ez aciz dikirim. Piştî xewnê hefteyekê fêr bûm ku hevalê Rizgar ketiye kemînê. Hêvî dikim tiştek nebûbe. Berî ez werim Tetwanê, min ew pir şikand û aliyên pê re aciz bûm hebûn. Bi rastî hevalê Rizgar mirovek paqij e. Girêdayî hevaltiya xwe ye û polîtîka li gel wî nîne. Ji hevalên xwe re vekiriye. Femandarekî ku gelek aliyên wî mînak bînin girtin e. Dibe li gor hinekan behsa mirovek dijî kirin nerast be, lê îro ev heval wisa nin.

Her weke min gotî, xwedî taybetmendiyan pir xweş e, niyeta wî pir paqîje û ev niyeta wî gelek deman zehmetî bi wî daye kişandin.

Hevalê Rizgar jî weke hevalê şehîd Adil her tim girêdayî rêxistinê maye û li cihên herî zehmet têkoşîn bingehe girtiye. Ji saya serê van mirovên xweşik şoreşa me hatiye astek wisa. Weke newindakirina nirxa mirovên me winda kirine, divê em nirxa mirovên xwe yên xweşik û dijîn jî bîzînin.

Di nav lêhiya hestek xerîb de me, pir ji mirovan hez dikim. Ji ber pir ji wan hez dikim, pir bêriya wan dikim û her tim dixwazim wan bibînim. Dema wan nabînim xemgîn dibim. Ger ev bêrî min nehincirîne pir baş dibe. Giranbûnek xwe li hestên min dipêçe. Divê ez xwe fêrî vê taybet-

mendiya xwe bikim. Hingî tê bîra min mirovên ez bêriya wan dikim her hebûne.

21 Îlonê 2008/ Tetwan

Şerê rûmetê

Li pişt pelek ziwabûyî çermê min di bayê payîzan de ziwa dibe. Xwe li dilê min ê bi tenê di kûrahiya okyanûsan de dipêçe û vediguherim bagerek bêdeng. Li xemrevîniyekê digirim û xwe dispêrim hêviyan.

Xeyalên min li dora têkoşîna rûmetê şêwe girt û bi te re jî berdewam dike. Her henaseya ji bo azadiyê digirim weke berfînekê serhildêr dibim. Bi baweriya xwe ya bi zanyariya hezkirinê ve min sond xwar bi esil bijîm. Mebesta min ne ew e ku ez xwe bi çol û çîyan bidim qebûlkin. Dema ez tama şerê rûmetê dikim, min hevpeymana xwe di nihêrîna zarokên bêguneh de çêkir. Ji ber lûtke û riyeke ku ez bigihimê heye. Rojeke ez jê re bibim heval heye. Heval ez bi te re bi rê dikevim ber bi tenêbûna payîzê ve.

28 Îlonê 2008/ Orax

Merheba dilê min ê bi evîn xwe li azadiyê pêçayî

Her ku dijîm bêrî û hezkirinên min zêde û mezin dibin. Her ku dijîm êşên min jî bi min re mezin dibin. Dema em bi paqîjiya zarokekê dijîn û dema dilê min rû bi rûyê desthilatiya zehmetiyên zîlam tê, dihejîm û xwe li ser tetîka hêrsê dibînim.

Ferasetên ez li qada Başûr rastî nehatime, ez li vê derê rastî tîm. Hem weke jinekê, hem weke jineke fermanîdar rastî van nêzikatiyan tîm. Niha li vê derê kîjan hevala jin li şûna min li vir ba, wê heman zehmetî bijîya. Tevî van zehmetiyan hemû jî ez ti lewaziyê di ideaya azadbûnê de najîm. Ev areste hemû ji bo bêvînkirina min e. Erê, ez bi hizirandina jinên leheng bi hêz dibim. Ez ê bi baweriya bi hêza rêxistinê û baweriya bi rêhevalên xwe yê durist ji heqê van zehmetiyan derkevim.

Tevî van zehmetiyan hemûyê ji mirov, jiyan, rih, hest û ramanên wan ên xweşik hez dikim. Ez li van mirovên ji wan hez dikim jî digirim. Ez pir

dixwazim hevala Rojna bibînîm, gelek xalên bi wê re parve bikim hene û yek jî ger min hevalê Rizgar jî bidîta pir baş dibû. Ez bi hevaltî û jidilbûna wî bawer dikim. Çareserî di rêveberî û tarzê têkoşîna te de veşartîye, lê hinek caran derfet mirovan ber bi bêçaretîyê dehf dide.

Nehizire min tu ji bîr kiriya Mizgîn giyan, giyana min, tu di dilê min de ya rêhevala min.

3 Mijdarê 2008/ Tetwan

Ahenga bi agir re

Tu dizanî jiyîna di nav agir de çawa ye? Her ku dijîm fêr dibim ahengê bi agir re bigirim dest.

Em di nav şoreşekê de ne. Her yek ji me li cihên cuda ne û rastiya şer jî dijîn. Ti kes ji me guman nake kî yê kengê şehîd bikeve û agahiyên şehadetan weke şîrqîna brûskê di dilê min de diteqe. Bi êşa her hevalekê giraniyek xwe li dilê min dipêçe. Şehadeta hevalê Agir ji min re pir giran hat. Em xeydî ji hev veqetîbûn. Tevî hemû zehmetiyên bi min dabû kişandin jî, dîsa aliyên wî yên min nîrx didanê hebûn. Pêwîst bû wisa hêsan şehîd neketiba.

Arjîn, ka mane te soz dabû Jina ji Agir, te yê min nehiştiba û neçûba? Ger tu nebî ez ê çawa bijîm? Giyana min, ji min re bêje; ez ê bi dîtina kê zehmetiyan bin bixim û ez ê xwe bavêjim ber sipartina dostaniya kê? Tevî hemû êş û zehmetiyan hizirandina li we têra min dikir. Min çiqas xeyalên xweş avakiribûn; min ê tu dîtiba û min ê tiştên li Bakûr jiyîna ji te re gotiban. Lê niha tu nînî, te çima ez jî negirtim gel xwe? Min jî bigire gel xwe. Dixwazim bi te re li warê stêrkan bijîm. Ma neçare her tim wisa be, wê hevalên min ber bi bêdawîbûnê bifirin û ez ê jî li pişt wan binêrim. Na, divê êdî wisa nebe. Hevala min a zarokatîyê û ciwan. Şehadeta te pir êş dide min.

13 Mijdarê 2008/ Ximsê

Merheba azweriya min a azadiyê

Çawa ku tiştêk di cihê xwe de nasekine, ez jî bi êş û kêfxweşiyên xwe di rê de diçim. Her roj bi agahiya şehadetekê dihejim, lê ez bi pêkanîna xeyalên wan re erkdar im. Ji ber vê di nav êşan de bi jiyane re digirnim. Bê ku ti hevalekê ji bîr bikim, bi bîranînan wan meşa xwe berdewam dikim. Girêdana bi hevalên şehîd re bi berpirsyartiya milîtanbûnê ve derbasdare.

Milîtanên herî bihêz, ên berpirsyartiya xwe ya li hemberî jiyana dîrokê pêkanîne. Di vê wateyê de ez bi ser xwe de diçim. Dixwazim li hemberî pêvajoya dîrokê rola xwe bi azadiyê tacîdar bikim.

Me hîn weke wargeh dest bi perwerdeyê nekiriye, lê weke xweser me destpêkiriye. Em dahûrînan Rêbertiyê yê şexsî dixwînin. Pêwîstiya lêhûrbûna me pir mezine. Lê divê hinek caran eleqedarbûn bi hevalan re were çêkirin. Ez xwe di ber wan de berpirsyar dibînim. Li ser vî bingeşî min rasterast bi hevala Toprak û Sema yê li gel xwe re nîqaş kir û min nebesiyên wan rexne kirin. Piştî van nîqaşan jî me belgeyên Konferansa 4. a YJA-Star li ser bêtêlê girt qasêtan û niha jî em li ser rûpelan dinivîsin. Alîkariya lêhûrbûna me ji bo nîqaşan çêbû. Ev yek min pir bi kelecana dike. Gelek tiştên hatin destnîşankirin ez bi xwe jî dibînim.

Li Bakûr bi hevalên jin re bûyîn pir bi wateye, dixwazim vê wateyê bi kûraniya wê ve bijîm. Her çendî di demsala payîzê de deryayek xemê di dilê min de hebe jî, her çendî çavên min bi pelên li ber bayê difirin bikeve jî, her bi hizirandina biharê têkoşîna ji nû ve avabûnê ji xwe re bingeh digirim.

Bêriyên hevalên min jî dilê min dişewitîne. Ez ji gelek hevalên xwe veqetîm, ez ê êdî qet hinek ji wan nebînim, encex tenê dikarim di wateya bêdewîbûnê de wan bibînim.

Hevalên min ên xweşik, ez pir ji xwe hez dikim. Her çendî ev hez kirin barê min giran bike jî, ez ê berdewam ji jinên xweşik û hevalên xort ên bi rûmet hez bikim û di heman demê de li hemberî nebesiyên wan jî têbikoşim.

Xwezî berî em biketan pêvajoya ketina wargehê min hevalê Rizgar û hevala Rojna bidîta. Min ê hinek xal zelal bikira. Min pir bêriya wan kiriye.

21Mijdarê 2008/ Tetwan

Merheba Agir Giyan

Em di vê wargeha zivistanê de destpêka gelek tiştan dijîn. Erê, nebêjin me nebihîstiye, wergeha me ketiye nav liv û tevgera qoçxana bi fîtik. Kes nizane qoçxana bi fîtik bi kar bîne. Dema rewş wisa be, em ê kengê dengê booom bibihîzin dilê me kut kut lêdide.

Erê, em ê cara yek li ser sêlê nan çêbikin û nanpêja destpêkê ez im. Endamên wargehê jî bi qasî min mereq dikin ka wê nan çawa çêbibe. Hevalê Xemgîn sax be hema tê tûpê li sêlê dide, hema nan vedike û dest bi biraştinê dike.

Di navberan de hevala Sema û Xemgîn nan vedikin. Tevî hemû şêwazên komîk jî em bi serkeftî nanê xwe bi encam dikin. Ji bo ev dem li dîrokê were neqîşkirin, hevala Toprak dîmenê me digire. Em jî ji nîfşên pêşerojê re digirînin.

23 Mijdarê 2008/ Ximsê

Agir Giyan

Di dîroka PKK'ê de her rojek xwedî wate û giringiyekê ye. Her şehadetekê roj, dem û kêliyên pîroz avakirine. Azadî bi hêsanî nayê bidestxistî, em bi dayîna bedelan digihin. Hinek lehengên canê xwe feda dikin, hinek lehenagên di girtîgehan de temenê xwe diqedînin, hinek jinên azweriya azadiyê ne jî li hemberî kirêtiyên zilam û dijmin şer dikin.

30 sale gelê Kurd û lêgerînavanên azadiyê doza PKK'ê anîn roja îro û em ê jî bi baweriya xwe bigihînin nîfşên pêşerojê. Her çendî ba dilê min bi hincirîne jî ez ê bi serhildêriya berfînekê bimeşim. Erê, Agir Giyan, duh 27'ê Mijdarê ango roja ji dayîkbûna gelê Kurd bû. 27'ê Mijdarê dîrok û kêliya ku mirovahî nas dike. Em bi vê rojê re dîsa ji dayîk dibin, ber bi dem û çaxan ve diçin. Rojên wisa her tim min hestiyer dike. Ji bo

avabûna rojên wisa çend mirovan xeyal avakirine û bi vê xeyalê çavên xwe li bêdawîbûnê girtine? Min nexwest vê roja ji nû ve jidayîkbûnê weke her rojê derbas bikim. Tevî hinek pîrsgirêk hene jî min dîsa xwest nêveng bi moral be, min bi qismî bi ser xist lê ne hemû.

Me duh hevalên taximê hemû bi hev re eprex pêçan. Her hevaleyê dixweze tiştê bike. Hewaya cejnê heye. Kelecana îro di çavê her hevalê de tê xwendin. Pîr xweş e mirov li Bakûr be û kêfxweşiya vê rojê bi hevalan re bijî!

Ji bo mirovê zana yê ev roj bi me dayî jiyîn hezar silav. Rêberê min, ji bo we ev hestên bi wate bi me dan jiyîn em deyîndarê we ne. Em di vî şerê rûmetê de çi bikin jî nikarin deynê xwe bidin. Hûn bûne xwedî jiyanek ew qas giranbiha.

Di rojek wisa xweş de nikarim li mirovên xweşik nehizirim. Ez bi hesreta agahî û silavekê me. Wê girêdana min, min bi serkefinê tacîdar bike û ez ê li ser baskê jiyanek azad bifirim.

Di nav PKK'ê de şerê herî mezin şerê bîrdozî ye. Divê tu berî her tiştî di bîrdoziyê de kûr bî û partîbûnê di kesayet de bi dest bixî. Axaftina pîr zêde bêguman ne kûrbûna bîrdozî ye. Milîtan bi qasî fêhmî dikin, dixin meryetê.

Gelek caran em têkoşîna bîrdozî nameşînin. Em li hemberî xwe, nêveng û kesên jiyanê xirab dikin lîberal dimînin. Ev nêzîkatiya me weke virûsekê jiyanê PKK'ê dimêje û xeyalê me yê azadiyê asteng dike. Lehengiya herî mezin bi destxistina serkeftina têkoşîna tu di hundir de didî ye. Tiştê dixwazim bidim fêmkirin çi qas cidiyet û girîngiya şerê hundir heye?

Erê Agir Giyan;

Bê ku pes bikim li ser navê rastiyên jê bawer dikim têkoşînê dikim. Her ku têkoşîn dikim baldariya min a rêxistinbûnê zêdetir bi hêz dibe. Ger bizanim ez ê bi guleya şoreşgerek sexte bimrim û bimrim jî ez ê dest ji partîbûnê bernedim û di têkoşîna bîrdozî de îsrar bikim.

Her ku dihizirim wê dawîya wargeha me çawa be bêdeng dibim. Serê xwe diteqînî ji bo erênî bi dawî bibe. Ji bo tiştek bi hevalên min neyê ez ê her zehmetiyê bidim ber çavên xwe û divê baldar bim. Wêrekî dostê mirovan e, ez ê hewl bidim bi wêrekî berdewam bikim û nehêlim kesayeta jina hevkar pêl rûmeta min bike.

2 Kanûnê 2008

Merheba kulîlka min a tenêbûnê

Evîna dilê min, min ew qas pir bêriya te kiriye nikarim vebêjim. Ez mereqa rewşa te dikim. Min dixwest di biharê de bi te re baxivim, lê gotin tu li Îraqê yî. Ez bi qasî mereqa te dikim, tu jî mereqa min dikî. Wê rojekê ev mereqkirin bi dawî bibin. Ez xeyala wê roja ava dikim. Girêdana me ne tenê girêdana xwîşke, girêdana me li ser bingeha azadiyê ye.

Erê, em li dû hezkirin û jiyana bi wate ne. Di vê wateyê de êş û veqetîn me dike şoreşger. Ez te di dilê xwe de didim jiyîn û bi te re gavan davêjim. Li hemberî zehmetiyên rastî wan tîm bi hizirandina te ezma serkeftinê bi dest dixim.

Giyana min, tu dizanî her çendî zehmetî bijî xwe bê hêz hîs nakim. Ez vê hêz û coşa jiyane ji te û hevalên xwe yên hêja digirim. Tu niha mereqa tiştên min li Xerzanê jiyane dikî. Ez ê rojekê hemû tiştî ji te re vebêjim. Divê niha ez navberê bidimê, ji ber diranê min dêşe û ev yek min aciz dike.

Merheba giyana min; êdî ez ji ber êşa diran digirim. Hevalên vê rewşa min dibînin hem dikenin hem jî xemgîn dibin. Her kes li çareyekê digere û bi rojane ez îşkence dijîm.

Mizgîn giyan; em sê hevalên jin di mangê de dimînin. Ez hewl didim jiyana me her tim bi wate û xweşik be. Sekna hevala Sema bandorê li ser jiyana me dike. Ji bo lêhûrbûnek kûrtir bijî me rapor ji wê xwest. Naxwazim hêviya xwe ya li hemberî wê wînda bikim. Hinek tarzê danûstandina wê ya li vê wargehê min pir dixê nav gumanan. Ez nizanî wê wîsa heta ku derê biçe, lê divê em pir baldar bin.

Mizgîn giyan;

Min pir dixwest behsa tiştên cuda ji te re bikim. Lê ev pirsgirêk weke kurmekê jiyana me dikoje. Niha di nav xweşiyê de bimîne giyana min.

5 Kanûnê 2008

Gotinên di semaha agir de tîn şûştin

Mirov bi gotinan xwe îfade dike û jiyane pêş dixe. Di jiyana mirov a civakî de cihek taybet a nîqaşê heye. Em bihizirin miroveke nikaribe xwe îfade bike çiqas zehmetiyê dikşîne. Ji ber nikare xwe bîne ziman, her tim dizane aliyek wê kême û derûniya kêmbûnê dijî. Em nikarin axiftinê ji uslûb û xîtabetê qut bigirin dest. A axifinê temam dike uslûb û xîtabet e. Uslûbê şoreşgeran balkêş e, ji ber vê mirov li derdora şoreşgeran kom dibin. Gotina her şoreşgerekê ji bo wan bi nirxe. Ji ber şoreşger vala vala naxive. Li ser rê û rêbaza armancên xwe daxivin. Şoreşger xwediyê gotina xwe ne. Kêm zêde em civateke dikarin xwe îfade bikin. Tenê xwe îfade kirin jî têrê nake. Lê mixabin heta ên pir gotinan dikin hebin wê pir zêde nirxa gotinên me nemîne. Ji ber vê nîqaş ji derveyî nebûna tiştêk naçe. Bawerim em wateya gotinan zû xerç dikin. Em kesayetên kaptalîzmê ne, lê gumana bibin şoreşger dijîn.

Yan em kesayetên kemptalîzêmê ne, gumana bûna şoreşger dijîn?

Hevoka hevala Ş. Viyan tê bîra min digot; “dema gotin wateya xwe winda dike rêz tê çalakiyê.” Divê em di roniya vê gotinê de li xwe bizivîrin. Weke pêvajoya dema gotinê derbas bû, divê ji aliyê pratîkî ve bersivên bi hêz bidî.

Divê em ji bîr nekin, ger gotin wateya xwe di jiyana me de winda bike, em ê hev tine bikin. Wê demê jî pêwîst nake dijmin bi hemû hêza xwe ve bi ser me de were. Yê di îdeaya şoreşger û pratîkbûnê de be, divê di semaha agir de xwe nû bikin. Gotinên di agir de werin şûştin, wê xwe bigihîne azadiyê. Wê bi nirxa mirovahiyê re were pîrozkirin. Her gotina were pîrozkirin wê jiyane ji nû ve ava bike.

Em di agirê dostanî û rihê şoreşgerî de bibin yek. Em xwe ji çewtî û kirêtiyên pergale xilas bikin.

Baxive gula min baxive!

Bila bêdeng nebin çavên te

Bila gotinên te jiyanê bikenîne

16 Kanûnê 2008/Ximsê

Dilê di êşan de bûye pola

Bi rastî bi xortan re jiyîn pir zehmet e. Bi qasî zehmetiya jiyîna bi xortên civakê re, bi xortên li çîyan re jiyîn jî pir zehmet e. Dema tu serê xwe li ber hikûmraniya zilam radikî, ji bo te di nêvengê de bixe her cur kirêtiyê dikin. Ji ber cewhera ava serdestiyê weke azadî vexwarine. Her wiha hemû tişt li ser derewan avakirine. Desthilatdarî hema wisa nexweşik were başkirin û ji rêzê were destgirtin nîne. Ez vê di nêzîkatiya bê wijdanbûna hinekan de fêhm dikim, ne wisa ye. Her nêzîkatiyê ji xwe re heq dibîne, bi qasî dikare jina reben a nasîbê xwe ji azadiyê negirtî bandor bike, çavên wê girê bide û bixe bin venêrîna xwe. Vaye ev e asta rizadinê.

Erê, dema zilam wisa be, jina ji zilamê wisa bandor dibe xwe zêdetir dixîne. Gelek kirêt dibe, bi rastî bi qasî kirêtiya jinê tiştên koletiyê mezin dikin pir kêmtir tişt hene. Bi taybet li hemberî vê peywendiya hevexistinê sekinandin divê mirov xwedî vîn û rihê azad be. Divê berî her tiştî bibî heval û bizanî bibî heval. Bawerim di cewher de ev koletiya kûr dibe tenê ne girêdayî jinê ye. Ji ber vê yekê xwe zanîn wê jinê azad bike. Serê hemû tiştî di xwe zanînê de derbas dibe.

Çi tiştek seyre, hevalên tu ji dil ji wan bawer dikî hewl didin hikum li te bikin. Dema kêmek vîna te ferq dikin hema dikevin êrîşê. Dema sekna jin ne baldar be, dikeve kemîna zilam û nêzîkatiyên desthilatdariya zilam ên di nav jiyanê de ji hev dernaxîne. Dema wisa jî dibe bê ku bi-keve ferqa wê bi xwestek koletiyê dike û bi ruhî ji hemcinsê xwe dûr dikeve.

Huner çavkaniya hezkirin û mirovheziyê ye

Gerîlayek baş, şorşgerek baş e û di heman demê de hunermenda/ê herî mezin e.

Huner hostatiya avakirinê ye. Bi riya hestan re nirx li nirxa mirovahiyê barkirine. Mirovên bi hunerê re mijûl dibin û têkoşîna vê didin bi mirsogerî mirovên nirxên herî mezin ava dikin in. Huner evînek e. Yên êş û kêfxweşiya gelê xwe hîs neke nikare hunera wê jî bike.

Di pergalê de hunera tenê ji bo para tê kirin heye, ji ber vê hemû kes dixwaze bibe artist. Kî zêdetir xwe bifiroşe ew dibe popîlîstê civakê û pergal wî/ê bi kar tîne. Mirovên di pergalê de mezin dibin wê pergalê lêpirsîn nakin.

Nêzîkatiya me ya hunerê çi ye û hunermendên me rola xwe dilîzin? Di me de nequlixandin heye, bi qasî dinyayê mijar bûyer hene, lê ev xistina malê mirovahiyê giştî pir sînordare. Li bereya me jî yên cidî nêzî hunerê nabin hene. Mînak tiştê gelê me li Mexmûrê jiyîne bibe filîm û roman wê ew tiştên hatine jiyîn dinyayê bihejîne. Ew gelê me yê hatî mişextkirin her yek ji wan xwedî çîrokek cuda ye. Navê gelek ji wan Penaber e, ger tiştek li hemberî vî navî jî hîs nake ew hunermendek çawa ye? Têkoşîna çekdarî tenê têrê nake, di heman demê de divê em têkoşîna xwe bi riya hunerê re jî veguhezin.

Agir Giyan

Zîhniyeta zîlamê serdest bi çanda fesadî, pûxtan, çetegerî û planên komployê ve mohra xwe li pratîka Tetwanê xist. Ger sal jî derbas bibin, bûyerên nayên ji bîrkirin û mirov dixê nav sehmê hatin jiyîn û derew

hatin gotin. Jina radestî van fêlbazîyan hemû nebûye, dibe weke demekî hinek êş bikîşîne lê di wateya dîrokî de bi ser xist.

Ger tiştên di van çar pênc mehan de hatin jiyîn, ji aliyê perwerdê ve were destgirtin û dahûrandin perspektîfeke jiyanê ya di asta mirov dikare bi salan li ser piyan bihêle û rehendên ders jê were girtine pêk were. Me di bûyera dawî ya me jiyan kirî de dît ti komplo-entrîka nikare jiyanê PKK'ê tine bike. Dibe hinek texrîbatan çêke, lê dîsa ya serdikeve jiyanê PKK'ê û milîtanên wê ne.

Agir Giyan;

Min berî vê jî hewl da car caran bi te re parve bikim û gotinên min yek bi yek derketin holê. Tevî min pir tişt dizanî û min gelek zehmetî kişandî jî lê dîsa min neda der. Lê demê ez mafdar derxistim.

Di encama civîna me lidarxistî de mijarên ku ez pê êşiyam hebûn. Çawa çûm mangê min nikarî xwe bigirim û ez giriyam. Ez ji ev qasê re îşyan dikim. Li ser jinek şoreşger ev qas êrîş hene lê ji ti kesê berteka hevaltîyê dernakeve. Ev rewş mirovan dide hizirandin. Tevî encamên jê derketin jî di derbarê jinê de nixandinek rast nehat kirin. Lê ya rast encama derketî pir girîng bû. Li Xerzanê li hemberî feraseta çetegerî têkoşîna hatî dayîn xeta têkoşîna jina azad bi ser ketiye. Dikariya ev were nixandî. Ev qet nehat kirin û nêzîkatiyên seranser hatin çêkirin û hat paşguh kirin. Li qada Xerzanê di sekna kadro de, lêhûrbûnên girêdayî azadiya jinê di asta nîne de ye. Xebat û hewla jinê nayê dîtin. Ger tiştên li min hatî kirin li hevalek xort hatiba kirin, bi misogerî wê pir cuda destgirtin hatiba çêkirin, piştî rewş derketiba holê jî wê rexneyîna wê daban. Ango xort di derbarê jinan de hemû tiştî daxivin, lê pêwîst nabînin rexneyînek biçûk jî bidin. Nexwe ev qas wijdanê wan kor e, ew qas ji desthilatdariya xwe razîne.

Em dibînin xortê tê nav PKK'ê bi xwe re şer nake û bi zîhniyeta xwe ya heyî siyê dixê ser jiyanê. Lê PKK'bûyîna ne ev e. Di PKK'ê de mijara herî hesas nêzîkatiya ji bo jin e. Yek jî li hember jina bûye şervan pîvan û pîrensîpên heyî zêdetir hesas in.

Erê, bi rastî jî bi xortan re jiyîn pir zehmete. Nexwe ji bo xortan qet hêsan nîne bibe endamê rêxistinê û kesayetek rêxistin bûyî. Xefleta herî mezin jî xort di ferqa vê de nînin. Ew qas di şibakeya xwe de li bûyeran dinêrin qet aliyê din ê bûyerê nabînin.

Ez dema li Xerzanê dikevim dû salên xwe zehmetiyên rû bi rû tîm her heman tiştin. Sedema wê jî zîhniyeta zîlamê desthilatdar e û ya alîkariya vê zîhniyetê jî dike jina paşverû û bê hêz e. Lê li gor min divê qada Bakûr cuda be, divê hevaltiya jin û xortan bi hêztir be, ger wisa berdewam bike wê encamên nayên payîn bi xwe re bîne.

Di navberê de roj derbaz bûn, ez bi hevalê Xemgîn re axivîm. Min nêzîkatiyên wî yên derdikevin holê jê re got, dikarim bêjim ez hinek rihet bûm. Hîn hinek xal min dide hizirandin. Ma min dikariya li hemberî rastiyeke wisa ji nêdîtî ve bêm, bawerim na. Ji ber wê pir zêde naxwazim pê re eleqedar bibim. Wisa çi bi serê vê wargaha me de hat? Ez pir li ber dikevim. Mirov qehr dibe, hevalek jin vîna xwe hemû radeştî xortekî bike.

Ez çiqas dixwazim hinek heval li gel min bûna. Ez pir bêriya wan dikim û dixwazim tiştên min li Xerzanê jiyîne bi wan re parve bikim. Mizgîn giyan, te her tim ji min re digot, berfîn. Bawerim bi vê rewşê min berfînbûn bi ser xist. Min bêriya hevala Mizgîn, Şehristan, Dilgeş, Ar-manc, Bêrîtan Aysel û gelek hevalên din kiriye. Ez çiqas dixwazim bi wan re di nav peywendiyê de bim. Kufîlên min ên evîne her yek li cihek cuda ye.

Ez çiqas pêwîst dibînim weke heyî hêvî, xeyal, hizirandin û hestên xwe bi hinekan re parve bikim. Li parvekirinê digirim. Vaye ez li biharê dihezirim, wê demê mirovên ez ê bibînin hebin û jinên ez bi wan re parve jî bikim hebin. Ez bi çar çavan li benda wê rojê me.

27 Kanûnê 2008 /Tetwan

Merheba berbangê serê sibê ya nû hiltê û roja hilhatî

Piştî çend roj derbas bûn min xwest girêdayî sala nû hestên xwe parve bikim. Dema hest demborî dibin, mirov nikare heman tiştî hîs bike û

parve bike, ji ber cuda dibe. Lê dîsa bi zanabûna vê demboriyê, dixwazim hest û kelecana xwe ya girêdayî sala nû parve bikim.

Min hemû salan di heman demjimêrê de dinivîsand, lê vê carê nebû. Min tiştên jiyîne bi xwe re sînordar hişt, min xist tov û di dilê xwe de çand. Tevî hemû zehmetî û êşên me jiyîne, bê ku em hêviya xwe winda bikin me îdeaya xwe ya jiyana azad nû kir. Em dem, roj û salên li benda me ne hembêz dikin.

Di serê her salê de bi hêviya ez ê Rêber Apo bibînim sala nû pêşwazî dikim. Ev hest min bi kelecana dike. Bû deh sal, lê min tiştek ji vê hest û kelecana xwe winda nekir.

Rêber Apo hîn di nav wan çar dîwaran de bi tena serê xwe ye. Ev rastî gelek zora min dibe. Ez ji ber vê êşê dikşînim û van rojan bi xemgînî dijîm. Di wateya takekesî de jî ez nebûm xwedî pratîkek wisa Rêber Apo ji nav wan derfetan rizgar bikim. Min tiştek şênber nekir. Ji ber vê bêrîkinên xwe yên ji bo Rêber Apo anîna ziman zehmetî dijîm. Ez ezikbûna vê dijîm. Ji min re zehmete ku mirov hêjayî Mirovê Zanyar ê her tişt bexşî me kirî nebe. Bi hezaran jin û xortên weke min zehmetî dikşînin hene.

Rêberê min, ji kûraniya dilê xwe bi hestên xwe yên herî paqij û bi hezîrin sala we ya nû pêroz be! Bi sedhezar car silav û hezîrin xwe ji we re dişînim. Dixwazim vê giyana xwe bi lehengî fedaiyî riya we bikim. Weke jinek Kurd dikarim wisa deynê xwe bidim.

Rêberê min, bi zanabûna jiyîna her rojek îşkenceye dijîm û ev yek jî min hêrs dike. Ji bo min û gel ya herî zehmet dûrbûna ji we ye. Dema ez rojên salek nû dijîm, ez ê bi hêviya Rêber Apo bibînim demê hembêz bikim. Ez ji ber vê bi kelecanim. Ger weke kes ez Rêber Apo nebînim jî wê zarok û jinên li şûna min Rêber Apo hembêz bikin hebin. Wê jinên Kurd li cihê min jî Mirovê Zana hembêz bikin. Ger bêriyên xwe neqêrîm jî wê mirovên xweşik hebin li cihê min bêriyên xwe biqêrîn.

Di roja destpêkê ya sala nû di radyoyê de ji bo şehîd Adil û hevala Gulbihar stran hatin gotin. Dema ez guhdar dikim ew fermanدارên min

ên hêja tèn ber çavên min. Dilê min dêşe û kelogirî dibim. Erka me ya herî mezin em têkoşîna van hevalên hêja di nav gel de belav bikin û li dîrokê binexşînin. Wê carek din fermanîdar di vê astê de negihin û wê dîtîna fermanîdarên wisa pir zehmet be. Ji aliyê şoreşa me ve, ev şehadet windahiye giran bûn. Ev fermanîdarên me yên li qada pratîkê pijiya bûn.

Bi qasî derfeta me çêdibe radyoyê guhdar dikan. Em rastî daxwaz û navên naskirî tèn, stranên tèn xwestin guhdar dikan. Daxwaza rêhevala min a hêja Aysel Wan hat xwendin û strana Dîno diyarî min û hevalên nas dike kiriye. Ez pir kêfxweş bûm. Min pir bêriya Aysel jî kiriye û ez her tim mereqa wê dikim. Ez gelek caran behsa hevala Aysel ji hevalên li vir re dikim. Dîsa ya hevalê Soranê ciwan hat xwendin, wî jî silav ji min re şandiye.

Bi bîr hatin pir xweş e. Weke min ew ji bîr nekirine, wan jî ez ji bîr nekirime. Ji kêfan nikarim di cihê xwe de bisekinim. Piştî van daxwaziyan a hevala Yekbûn hat xwendin û daxwazî ji bo hevala Toprak a di yekeya me de jî hat. Ew jî weke min hestiyar bû û moral girt.

Erê, em bi şansin. Em ji aliyê hevalên xwe yên hêja ve tèn bibîranîn. Ev jî diyariyek xweşik a sala nû ye. Derfeta me nîne, an me yê jî hezkirinên xwe ji hevalên xwe re bişanda. Lê em nikarin derkevin derve û em baldar nêzî ewlekariyê dibin. Ango weke tê fêmkirin derfet nîne. Hevalên li Başûr derfetên me dizanin û wate didinê.

Ew qas mirovên min bêriya wan kirî hene nikarim vebêjim. Bi hestên xwe yên herî kûr sala nû li we hemûyan pîroz dikim.

Hevala Mizgîn, ez bi hezar caran sala te ya nû pîroz dikim. Bi hêviya başiya te sala te ya nû bi serkeftinan derbas bibe. Kulîlka te ya berfinê ya ti caran te ji bîr nake.

3 Çile 2009

Agir Giyan

Nîqaşên me yên rojane berdewam dikin. Ez van dahûrînên nîqaşên girêdayî taybetmeniyên kesayetan esas digirim, ev nîqaşên wisa encamgirin û mirov ber bi lêhûrbûnê ve dibe. Hem dahûrîn dike û hem jî taybetmendiya tê dahûrandin her ku kûr dibe digihîn encamekê. Îro heftê mehê ye û dibêjim baş e. Kêmek ma ji biharê re, em bi çar çavan li benda biharê ne. Ji bo em ji van pirsgirêkan xilas bibin, dixwazim roj zû derbas bibin. Ji bo hevalên ez ji wan hez dikim, bi esas girtina wate-darkirina jiyanê dixwazim bijîm. Divê tevî hemû zehmetiyan dest jê neqerim û bi ser bixim.

Divê ez ji hevalên xwe yên hêja re jiyanek bi wate bihêlim û divê di jiyanek azadbûyî de hevalên xwe bibînim.

7 Çile 2009

Dayîkên me

Di navberê de sal derbas bûn. Piştî ew qas sal min dema xebatên Dayîkên Aştîyê dişopand hestekî nikarim şiroveya wê bikim xwe li dilê min pêça. Tevî hemû zehmetiyan têkoşîna dayîkên me ya ji bo aşîtî û azadiyê min zehf bandor dike. Daykên me nahêlin êşên wan jî deng vebide. Her tim davêjin sindoqa pîroz a dilê xwe. Ji ber dizanin ger ji kur, keç, hevser û dostên xwe re bêjin, wê ew pê biêşin, ji ber wê nabêjin. Ji ber vê sedemê her tim bi tena serê xwe hêza vînê didin nîşan, ji ber dizanin di nav êşê de bijîn û şer bikin. Tevî hewl didin dayîkên me weke jinên ji derveyî civakê bîr dîrxistin jî, dayîkên me dilê xwe ji hezkirin, ked, edalet, azadî û aşîtiyê re pîroz kirine.

Erê, dayîkên min ên delal. Dema ez beşdarî nav refên gerîla bûm, ji bo êdî gelê me, hûn dayîkên me yên hêja êş nekşînin min xwest cihê xwe li eniya herî pêş bigirim. Ji ber vê min qet li pişt xwe nenêrî. Dayîka min nexweş bû, ez li nexweşiya wê jî nehizirîm, ango di kesayeta dayîka xwe de hizirandina bi hezaran dayîkan bi rê ketim. Her tim baweriya ger ji Rêbertî û gelê xwe re bibim bersiv wê demê ez ê êşa dayîka xwe jî bi dawî bikim hebû. Dayîka min jî jineke girêdayî Rêbertî û axa xwe ye. Tevî wê nexweşiya xwe jî di hemû çalakiyan de cihê xwe li pêş digirt. Dayîka min jî wisa dixwest ji Mirovê Zana re bibe bersiv.

Wê dem were

Min dilê xwe kir dîlê demê

Dûrî hemû bîranînan ketim

Bi perperîkek difirê re

Bi çûkek stran dibêje re

Bi robarek diherike re

Bi coş bûm

Çavên min biriqîn

Kesê fêm nekir

Min nekarî ji kesekê re vebêjim

Kêfxweşî û êşên min

Bi min re veşartî man

Zeman min ji min dizî

Tu tenê mayî

Tu tenê hebû

Min nekarî rengê te jî

Li asîmanan xêz bikim

Çavên min te vedibêje

Dilê min te jiya

Her tim

Di qetmeriya xembariyê de ez bûm tu

Ez ê te ji kur û keçan re vebêjim
Wê dîroka me bibe abîdeya kêfxweşiyê
Wê kur û keç
Li axa xwedavendan vegerin
Wê di pêşerojê de
Berê wan li qubleyê bin
Wê dem biweze
Bi destdayîna bawezînê
Em ê ji xewa mirinê şiyar bibin
Em ê xwe
Di dilê azadiyê de bibînin
Bi kenê dostekê
Ji nû ve dest bi jiyanê bikin

12 Çile 2009

Di nav xendeyek nîvmayî de bûna rêwiya rojê

Weke jinekê li Xerzanê pir zehmetî dijîm. Di vê rastiya Xerzanê de yê mohr li jiyanê min da zîhniyeta zîlamê desthilatdar e. Ji ber li Başûr em ev qas ne di nav hev de ne, em hinek tiştan tam naçîn. Lê niha yek bi yek rû bi rû tême. Zehmetiyên wê dijîm. Di rastiya xwe de ger di şênberbûna pratîka qada Xerzanê de ez li gor hinek tîpan nêz bibam wê ez pir zorlame nekiribam. Lê ger ne li gor wan bî, ji bo hincirandin, bi rêxistinê re rû bi rû bimînî serî li hemû rêbazan didin.

Bi zanabûna azadiya ji PKK'ê fêr bûme ez ê qet nevim tîpek li gor wan. Ez ê ti carî li gor rastiyan heyî yên nêveng ferz dike ji rêgez û pîvanên xwe yên jinbûnê lewaz nekevim, tavîz nedim û bêçare nevim. Ez ê bi bingeha rêgezên jina azad ên ji dil jê bawer dikim û fedekariyek pir

mezin jê hîn bûme bijîm, teşe bidim jiyana xwe. Ez ê xwe di esilbûna berfînên wisa zanîne bijîn de pîroz bikim. Ji ber vê jî ez ê bijîm, ti carî bin nekevim, pes nekim û şerê xwe yê rûmetê berdewam bikim.

Di derbarê pêşerojê de hêviyên min hene, dixwazim van hêviyên xwe pêk bînim. Dixwazim li gor pîrozbûna Bakûr bibim xwedî jiyan û çalakî. Ji bo ev xwesteka min pêk were ez ê hemû hewl û zehmetiyan bidim ber çavan. Divê ez xwe ji bo van zehmetiyan amade bikim. Divê sedem û armanca xwe ya Bakûr bixim jiyane. Divê weke qadroyekê mijarên bi salane ji Rêbertiyê re nebûm bersiv derbaz bikim û êdî bibim bersiv. Ev çewisandina nebûna bersiv min tine dike. Divê bi ser bixim, bi pêşdaraz nêzî xwe nebim, divê nêzîtiyên pêşdaraz ên heyî min paşde venegerîne. Jixwe hinek tîpên cuda vê bi awayek zanabûn dikin.

Rêberê min, çi dibe bila bibe divê bi ser bixim, ez ê bi hêviya serxistinê lêhûrbûn bikim û bibim xwedî vê hewldanê. Xwesteka min a serxistinê ne ji bo ez xwe bi hinek kesan bidim îspatkirine, ji bo cewhera xwe derbixim holê ye. Ez ê qet li gor kesê nebim, ez ê mîna xwe bim.

Di vê rojnivîsa xwe de min piranî cih ji tiştên min jiyane veqetand. Min gelek tişt nivîsandin. Min li Xerzanê gelek zehmetî kişandin û hîn jî dijîm. Ev zehmetî çavkaniya xwe ji min nagire, ji ber jinek im, min zor-lama dikin. Bi watedayîna van zehmtiyan hewl didim bijîm. Dizanim azadî bi hêsanî nayê bidestxistin, ez jî weke bedelê wê van zehmetiyan dijîm. Ez rastiya bi qasî li hemberî zehmetiyan têbikoşim, dizanim ez ê ew qas azad bibim. Ji derveyî vê cuda ti riyên din nîne.

Em di navbera “tiştên divê bibin û rastiyeke heyî” de çûn û hatinan dijîn. Em hinek caran rast nêz bûn, hinek caran bi xeyalî nêz bûn, hinek caran jî hestiyar nêz bûn, me her tim di jiyan xwe de kirz jiyan kir û me hîn jî kirzên xwe derbaz nekirine.

Ez pir ji zarokan hez dikim. Yek jî sedema ez xistim nav lêgerînan zarokên li kolanan mezin dibin bû. Ji bo ez wan zarokan ji wê rewşê derxînim, pirsên min pêşxistin ez bi pergale re rû bi rû anîm û di encamê de min jiyîna di pergale de red kir. Min jî bîrdoziya PKK’ê tercîh

kir û piştî wê jî zanabûna min a Kurdbûnê pêş ket. Hezkirina min a zarokan jiyan min wisa guhert. Ev guhertin ji bo min bû zayînek nû.

Ez bawer dikim wê Bakûr ji min re bibe warê azadbûnê, ez ê bi dilê xwe yê jinbûnê behsa çend rastiyên girêdayî dîrok û mirovan bikim. Ez ê bêriyên xwe jî ji dîrokê re bihêlim. Ez ê jî weke ferdeke dîroka jina herêmekê cihê di nîvî de mayî di kesayeta xwe de binivîsim û wê hemû hewla min li ser vê yekê be.

Mizgîna min a sitiya dilê min;

Di encama zehmetiyan de min nekarî bêrî û hezkirinên xwe ji te re biqêrîm. Min her tim tu di dilê xwe de hilgirt û da jiyîn. Min nedixwest bi zehmetiyên xwe te zivêr bikim. Divê êdî fêrî jiyane bibim û çareser bikim ku nexeyal e. Divê ji bo vê jî bihejim. Ev ji bo min ezmûna azadiyê ye. Ez her roj bi xwe re di nav lêpîrsînekê de me. Ez ê bi ser bixim giyana min, weke te bi ser xistî ez ê jî bi ser bixim. Wê girêdan û hezkirina min a ji bo te min her tim serkeftî bihêle. Ez tam nikarim behsa hezkirin û bêriyên xwe yên ji bo te bikim.

Di nav xweşiyê de bimîne giyana min. Bi hêviya dîtina te ez ê her tim bijîm.

Agir Giyan;

Ez tîm dawîya rojnivîsek xwe. Lê nehatim dawîya jiyane. Ji ber jiyane ji bo min nû destê pê dike. Gelek parkirinên min bi te re çêbûn û gelek tişt jî di nîvî de man. Sedema nîvçemayîne ne tu bûyî, çavkaniya xwe ji min û rastiyên heyî digire. Min gotibû ez ê sînoran nexim navberê, min gotibû di hundirê min de çi derbas dibe û çi dihizirim ez ê parve bikim. Min nikarî bikim, min ji bo demek din veşart.

Agir Giyan, min hîn biryar nedaye ez ê di rojnivîsa xwe ya nû de çawa xîtabî te bikim. Dixwazim ji te re bêjim “şînok” an jî dixwazim bêjim “dara berûyê.” Dîsa dixwazim ji te re bêjim “jina bi agir.” Gelek nav di hundirê min re derbas dibin û hemû jî bi wate ne.

Ez ê nivîsandînê berdewam bikim. Ji ber pir ji şîn hez dikim, min rengê rojnivîsa xwe jî şîn hilbijart. Ji bo vegotina di derbarê hemû tiştên şîn de bû. Lê ez niha nikarim vebêjim, ji ber nîvçe mam û weke mînaka qaqlîbaz birîndar bûm. Wê êş û bêriya dileke birîndar were xêzkirin. Min ê cih nedaba vê, lê êdî bû. Ez ê jî bi robarê herikîna tenêbûna xwe re bi dilê xwe yê birîndar re biherikim û biçim.

Şerê min xilas nebû, lê ez ê li vir bi te re bi dawî bikim. Ez ê bi te re di nav xweliya agir de bêdawî bibin. Oxir be ji te re, jiyana te her tim di nav azadiya agir de be.

19 Çile 2009/ Tetwan

JI BO RÊHEVALTIYÊ

Ji bo hevaltiya durist a em mezin kirin û meşandin...

Selihandin ne kareke wisa ye ku her kes bike

Mirov çî balkêş in, berovajî qonaxa pêşketina xwe jî dikevin. Tevî temen mezin jî bûye lê hîn nêzîkatiyên weke zarokan pêş dixîn hene. Di rastiya xwe de ne zarok mayîne jî, ev netebitiya birjûwaya biçûk e. Ez çavdêriya nêzîkatiyên wan ên xirab hene, asta wan a civakbûnê lewaz, mirovên ji zanabûna dîrok, felsefe û sosyolojiyê bê parin dikim. Nezanîna wê li ku derê û çawa tevbigerin mijara gotinê ye. Ev yek di mirovên Rojhilata Navîn de pir kûr tê jiyîn. Ger em rastiya Rojhilata Navîn a heyî binêrin em ê vê pir bi eşkereyî bibînin.

Diyardeya baweriyê di bin navê kevneşopiyê de hinek fêrbûn mirov dixe nav qaliban. Dema jiyan û çanda rêxistinê li pêşiya van tê danîn di kasayetê de kirîz û tevlihevî tê jiyîn. Dema tayebebmendiyên çînî jî li ser van zêde dibe, li hemberî te tîpên eşkere nîne û tam tevlihev derdikeve. Xwedî potensyelek wisa ye dikare di her kêliyê de her tiştî bike. Ji aliyekê ve xwedî rihek baş e, ji aliyê din ve jî dikare bibe xwedî nêzîkatiyên zirarê bide jiyanê. Divê mirov ji aliyê hest û derûnî ve ji van re amade be. Yan mirov nikare li hemberî tiştên tîp kirin amade be.

Xirabkirin hêsane, lê sazkirin û komkirin pir zor e. Dermanê van nêzîkatiyên xirab jî, nirxadayîna mirov, xweza, ajal û gerdûnê ye. Ez behsa feraseta hesta xerîzî ya ji rêzê nakim. Ez behsa hesta şahane ya girêdayî ked û zanabûnê dikim.

Em li mirovek ji hezkirinê bê par bihizirin. Dikare her cure xirabî û zîyanê bide mirov û xwezayê. Tîpên wisa wê bikevin nav nêzîkatiyên pênasêya wan zehmet tîp kirin. Jixwe em weke civak ji windabûnê rizgar bûn, em ji serjêr çûnê vedigerin.

Di dîroka mirovahiyê de desthilatdarî û koletî bi serê xwe ji rê derketine. Ji ber van nêzîkatiyên xirab di jiyana rojane de danûstandinek bi tendirûstî nayê avakirin û parkirin pêş nakeve. Parkirinên li ser nirxa mirov pêş dixê aramî û kêfxweşiyê dide mirov. Cihê desthilatdarî lê hebe nirxa mirov ber xilasîyê ye. Jixwe rastiya zîhniyeta desthilatdar û kole lê serwer be, ma parkirin dikare di çî astê de be?

Mirov her tim bezvanek e. Îtopya dibin roj û cîhana wî/ê. Roj wî/ê weke fêkiyekê digihîne, zîhin û dilê wî/ê ronî dike, kesayetek civakî jidayîk dibe û li wir tovê sosyalîzêmê tê çandin. Sosyalîzîm li ser vî mirovê nû hatî avakirin şîn dibe.

Niha mirovên Rojhilata Navîn bi nîrxên xwe yê cewherî re digihin hev. Wê hemû nêzîkatiyên xirab jî cihê xwe di sergoya dîrokê de bigirin.

Wê hemû hizirandin, zîhniyet, bawerî û hestên rizî di agirê roj û demê de bibin xwêlî. Wê hemû kes di rîya xwe de bimeşin, wê çûk di awaza xwe de bifirin, wê perperîk hewl bidin jiyana xwe ya kurt temam bikin û di nav qêrîna azadiyê de bi agir re bireqisin.

9 Sibatê 2009/Ximsê Tetwan

Jiyan gerdûnek e

Jiyan gerdûnek û gerdûn jî jiyanek e. Nepenî û efsûnbûna wê ji vir tê. Ez dihizirim jiyan beza maratônê ye. Jiyan li gor hinekan robarek e, li gor hinekan jî rê û li gor hinekan jî dem e. Li gor min jî jiyan tunela demê ye. Jiyan her mirovekê bi serê xwe romanek e, jiyan min robarek ji kûraniya demê diherîke dîrokê ye. Hinek mirov di herîkîna vî robarî de nayên fêm kirin. Mirov cîhanek mezin a razan e. Were vê cîhana razan fêm bike! Karek zehmet e, lê bi zewqe.

10 Sibatê 2009

Meşale bi min hat pêxistin

Her yek ji me dîlê wê ye

Em dîlê mirinê ne jî

Dîlê jiyanê ne jî
Dîlbûna me ya destpêkê
Bi veqetîna ji malzaroka dayîkê dest pê dîke
Dîlketin di hişê me de tê neqîşandin
Xeyal, hizirandin û hest
Her yek dibin lîstîkvanê sîberê

Derî ji jiyanê re nîvî vedibin
Di naverasta jiyanê de tê sekinîn
Ev rawestgeh
Her yek ji van pireke di jiyana mirov de
Li gor hinekan jî
Xetên riyên dibin bihûştê ne
Dîlê qeyd û benda me
Koletî weke gerdanekê di stûyê min de çînge çîng dîke
Kenê min di quncikên nepenî de veşartî dimîne
Bi hêrsa şevşevokan şevê derbazî şevê dikim
Bila sonder bi ser min de werin
Ji bo di şewqa roniyê de rabim ser xwe
Ji bo vê dîlbûnê di teqandina volqanekê de parçe bikim
Jiyana min
Çiyayek volkanîke
Dîlê min di agiran de diqemire

Reşkên çavên min
Behsa min ji azadiyê re dikin
Di şibakê de li cîhanê binêrim jî
Bi dîlbûnê re şer dikim

Min bi evînê binasin

Rêwiya ewrên li asîmanên şîn im
Min xwe di pakbûna ewrekê de dît
Di nav ewran de avisê demsalan e
Weke xeyalên em ava dikin
Ewr û asîman parçeyek ji min in
Her weke hêviya di hundirê min de

Dema ji zinaran ketim
Min xwe bi şaxê hêviyê girt
Min zarokê di hundirê xwe de hembêz kir
Min azweriya jiyana di hundirê xwe de hembêz kir
Min hezkirina di hundirê xwe de hembêz kir
Dema ji dostan veqetiyam
Dema ji çiyayên xweşik veqetiyam
Dema dilê min di nav êşan de digevîzî
Ji hêviyê veneqetîm
Hêvî felsefeya jiyana min e

Hêvî ji nû ve hebûna min e
Hêvî azadiye li ser van axan
Bihar weke bûkekê xwe dixemilîne
Bihar hêviyeke di dilê gelê min de

Yek jî
Dosta gerîla
Hemraza jinê ye

Bi te re heme
Bi te re rêwîtiyê dikim
Ez ê bi te re xatir bixwazim
Ez ê bi te re bê mirin bim

Li gor hinekan
Tu pirtikên nanê bêçareyan î
Tu roniya reşbîniyê yî
Li gor hinekan
Tu hêza îlahî ya qada şerî
Lê tu felsefeya jiyana min
Xwedavenda min î
Jiyan bi te dest pê kir
Azadî di hembêza te de şax da
Keçên çeleng

Xortên egîd
Bi hev re ketin nava şer
Destê min hîn çek nas nedikir
Lingê min çiya nas nedikir
Û dilê min êş nas nedikir
Min her tim tu nas kirî
Min bi te re dest bi hezkirinê kir
Min her tim tu
Di firîna qaqlîbazan
Bi lêdana pêlên li peravê dikevin
Û di rêwîtiya ewran de dîtî
Tu kelecana di hundirê min de yî
Tu evîna di hundirî min de yî

Di jopên li destê min dikevin de
Êşa elektirîka di lingê min de
Ên gelê min înkâr dîkin
Jinê tine dihesibînin
Û bi leza dixwaze min tine bike re
Tu firîşteyek
Tu mertalek
Tu şervaneke azadiyê yî
Bi te re ji dayîk bûm

Min xwe bi te re dît
Tu hêvî
Stêrka min a dîberîqê
Tu agirê min ê navemirî
Min hêviya xwe li baskê ewrekê bar kir
Ewr rêwî û ez rêwî me
Çavkaniya hemû demsalan
Pişkivîna hêviya gelê min
Ez gerîlaya gelê xwe me
Min bi hêviyê darizînî
Min bi azadiyê mohr bikin
Ji ber ez ez im
Ji min hez bikin
Min bi hêvî û evînê nas bikin

11 Sibatê 2009/ Ximsê

Ez dîsa 15'ê Sibata bi nalet dijîm!

Serma zivistanê, tenêbûna Sibatê û qehr hundirê min dişewitîne. Hundirê min wisa tijî bûye, nizamim ez ê çawa hest û hîskirinên xwe vebêjim. Ji xwe aciz dibim û tîm asta nefret ji xwe bikim. Ez çima ew qas berovajî îdea û îtopayên xwe dikevim? Ez çima nikarim bi jiyan û çalakiya xwe vê roja bi nalet bikim xwelî? Ez çima nikarim bibim çirûskek? Ew çi ye dikeve navbera min û îdeayên min? Çima ez jî nikarim rih bidim xeyalên xwe? Ez li ser maseya lêpîrsîna dil û bîra xwe me, pîrs yek bi yek dikevin rêzê. Ez hîn negihîştîme encameke qatek jor a bêhempa.

Roja reş dîsa hat û xwe pesart dilê me. Gelê me bi hemû hêrsa xwe li ser piyane, li qadan sonda tolhildanê bi ser dijmin de dibarînin. Bi sekneke bi wate girêdan û hezkirina xwe ya ji bo Rêber Apo ji cîhanê re diqêrin. Bi hezaran dil bi heman kelecana û hêrsê bi hev re dijîn. Mist hemû bi hev re radibin hewa û çav li heman cihê tûj dibin. Dil dibe lehî kolan, kuçe, cade, qadan digire û dibe. Keç û xortên egîd ên ji vê bêhempabûnê re çepikan lêdidin jî hene. Viyanên bedena xwe kirin xwelî û hêrsa xwe diqêrin jî hene. Viyan ji bo me bangek e. Li hember xemsariyên me, rastiya jiyana me ya rojane, xemsariya me ya li hember dîrokê û her wiha li hember sekna me ya sexte ku li hember rastiya Rêbertî heyî û şaşiyên ku xwe qadro dihesibînin re banga rawestandinê ye.

Ez li hemberî vê çi dikim? Li hemberî pêvajo û dîrokê di seknek pasîf de me. Ji vê astê û şûnde nan û ava vedixwim haram e. Ji ber li hemberî van rastiyan heyî tiştek nekirin xwe dana jiyîne. Em nikarin nirx tevî nirxên şehîdan avakirî bikin. Em di jiyana xwe de dubarebûnê dijîn.

Dijmin li hemberî vê rastiya min, rastiya me bi hêz dibe, zextê li Rêbertiyê dikin û gelê me di komkujîyan re derbas dikin. Lewaziyên me hemû yek bi yek weke pariyan dikeve devê dijmin û xwînê di ser gelê me de dibarîne.

Ez piştî dîlgirtina Rêbertiyê beşdarî gerîla bûm, armanca min yek jî Rêber Apo ji wir rizgar kirin bû. Di navberê de sal derbas bûn Rêbertî hîna li wir e. Ger girêdayî Rêbertiyê me, ez çima ew qas sebir dikim? Ger durist û girêdayî me, ez çima wê demê nabim xwedî gavek bi hêz? Wê demê min korbûn, bêzimanbûn û korbûn ji xwe re kiriye pîşe. Bi rastî ger bixwazim li ser bingehek rast beşdar bibim, ez ê wê demê sekna xwe ya qadrobûnê di ber çav re derbas bikim û divê dahûrîn bikim. Divê êdî ez bi ser xwe de biçim û xwe bibînim. Ger em wisa berdewam bikin, wê gel û dîrok naletê li me bîne.

Rêberê min, her ku sekna xwe çareser dikim, wêrekiya rexnedayînê bi xwe re dibînim. *Armanca min ne ku ji bo gotinên xweşik bêjim, armanca min bûna xwedî jiyaneke bi wate ye. Dixwazim li gor pîroziyên we avakirine, pêwîstiyên wê bijim.*

Rêberê min, vê jidilbûnê didim nîşan, weke jinekê dixwazim di riya azadiyê de bibim rêhevala we. Perpitînên min hemû ji bo xwe gihandina vê astê ye. Ji ber heta niha negihîştim vê astê dilê min dişewite. Carek din naxwazim bi vî şeweyî vê roja bi nalet bijîm.

Rêberê min, heta hûn li Îmraliyê bin, wê ti wateya jina min nebe. 15'ê Sibatê di jiyana min de her tim weke qamçiyên e. Ev qemçî bê ku bisekine li dilê min dikeve. Êşa 15'ê Sibatê di dilê min de her tim nû û zindî ye. Ez fêrî van çar dîwaran nebûm û ez ê qet fêr nebim jî!

Ez ê hesabê vê 15'ê Sibatê bixwazim. Ez ê dawî li êşa gelê min a dikşîne bînim û wê Rêberê min li Amed, Cudî û li Munzûran bi gel re were gel hev, ez ê bêrî û hesreta salan bikim xwelî. Ez ji ber vê henase digirim, ji ber vê tevî hemû zehmetiyên hêza li ser piyan mayîne dikarim bidim nîşan.

Daxwaziyek min tenê ji zarokên welatê min heye, bila bi nûnertiya bihara dilê min re destê kulfîkan bidin Rêberê min û bila wî hembêz bikin. Bila ji Rêberê min re bêjin; *jinek gerîla ya dixwest we bibîne hebû. Ew jin niha pir dûre, me silav û bêriyên di dilê wê jinê de ji we re anîne.*

15 Sibatê 2009

Hem azad be hem jî azad bike

Mirov hebûnek balkêş e, ji bo balê bikşîne ser xwe çima xwe wisa perîşand dikin? Hinek xwe bi hêz dixin xweşikbûnê ava dikin. Di encama vê xweşikbûnê de dibin navenda hezkirinê û bala mirovan didin ser xwe.

Hinek ji ber bê eleqedarbûnê xwe nexweş dikin. Bi vê fêlbaziya nexweşiyê bê eleqedarbûnê didin derbaskirin. Çima perîşanî xweşiya mirovan diçe? Ev jî pîrsgirêka ji xwe bê bawerbûn û ji derûniya perçiqandinê digire. Dema mirov ji bo balê bikşînin ser xwe, xwe perîşan dikin hem komîka min diçe û hem jî pê dêşim. Bi vê rêbazê asta xwe dixînin.

Mirov hêjayî xweşikbûnê ye. Diyardeya nîrxê jî, berzbûna di dil û raman de tê avakirin ji hezkirinê tê.

18 Sibatê 2009/ Tetwan

Rêberê min

Ez niha di nav hestên vagotina wan zehmet de me. Li serê van çîyan û di nav xwezaya azad de bûn, rojek tenê jî be silavek ji bo xuliqînerê azadiyê re neşandin! Di nav van bêhempabûnan de bûn, ji bo silavekê çalakîyek nekirin ji kêfxweşiya biharê destek kêfxweşî, hezkirin û hêvî neşandin min qehr dike.

Rêberê min;

We em jin fêrî vîn, hêvî û xweser hizirandinê kirin. Di kêliyên herî zehmet de jî hûn li me hizirîn. Hûn her tim li gel me jinan bûn, li ber rewşa me jinan ketin. We xemgîniya xwe jî bi vî awayî îfade kir û we got; “xebata min a girêdayî jinê di nîvî de ma.” We ji bo pêşketina jinê hewlên mezin û ked da. Em her tim li hemberî keda we dayî xwe deyişdar hîs dikin. Hewla tê dayîn min lêpirsîn dike û xwe dadirizînim. Her ku xwe dahûrîn dikim, ji ber nebûme bersiv êş dikşînim û di xala dikarim zêdetir çawa bibim bersiv bi ser xwe de diçim.

Rêberê min;

Ew silavên we di nav çar dîwaran de ji me re şandine, nikarim nîrx, moral û kelecana wê vebêjim. Silavên we weke rojê, weke germahiya dayîkekê, berzbûna hevaltiyê dilê me mîna sûlavan bi coş dike. Bi hezkirin min germ dike.

Silavên we ji me re şandine di vê demsala zivistana sar de, ji ew bêwatebûna me di hizir û dilê xwe de pêkaniye re dibe panzehîra hestên me yên ziwa.

Rêberê min;

Weke jinekê dema silavên we digirim, weke cîhan hemû dibe ya min û hîs dikim di nav nîrxên mirovahiyê de heme. Weke avê vexwim silavên

we pêşwazî dikim. We di vê hevîdîtina xwe de silav ji jinên Sêrt Dihê re şandibûn û we gotinên giranbiha gotibûn. Yek jî we silavên taybet ji jinên Dihê re şandibûn, ez cara yekem silavên tayebebet ên girêdayî jinên Dihê digirim. Ez pir bandor bûm, weke mînaka lavlavkê hestên şîrovaya wan nayê kirin xwe li min pêçabûn. Ji ber jineke ji Dihê me şanaz bûm.

Rêberê min;

Me di temenek biçûk de ji Kurdistanê koçî metropolan kir. Ez ji Dihê me, lê ez zêde wir nas nakim. Ez li bîranîneke xwe ya girêdayî wir digirim. Weke xeyal meyal hinek tiştên bîra min. Ez ji Dihê me, lê weke biyaniyê wir im, ev yek zora min diçe û birîndar dibim. Di şexsê Dihê de Kurdistanê digirim dest, ez ji aliyê çandî ve her çiqas ji Dihê me ew qas dibim Kurdistanî.

Aliyên xweser ên jina Kurd hene, ev azadî jî pêşengiya xwe ji şoreşa Neolîtîkê digire. Jinên Kurd pêşengiya çand, hilberîn, afirandinê kiriye û heta roja me ya îro aniyê. Weke ev di çanda Neolîtîkê de jî tê dîtin, jinên Kurd hezkiriyên kedê ne, bi mirov, gel û cîhanê re di nav xweşbîniyê de ne. Dilê wê bi paqîjiya zarokekê pake. Ez jî berhema vê çandê me, lê belê ez li ser koka xwe mezin nebûm.

Ez bi bêriyên dayîka xwe yê Kurdistanê mezin bûm. Xeyal û bêriyên dayîka min bûn ku herî dawî dîsa biçê gund, li ber siya darekê rûne, pîvaz û jajî bixwe. Dayîka min her tim digot; “em li Kurdistanê kêfxweş û azad bûn, lê ez li vir di girtîgehê de me.” Dayîka min bêriyên xwe yê Kurdistanê wisa danî ser ziman. Dayîka min li Dihê azad bû, lê li ser axê biyanî xwe di girtîgehê de hîs dikir. Ew bajarên şemaldar ji dayîka min re balkêş nedihat. Me zarokan wate nedida vê hesta dayîka xwe û em biyanî diman.

Dema dil li ser koka şane, li ser axa xwe mezin nebe; zarok biyaniyê dayîk, welat û xwe ye. Her yek ji van biyaniyan vediguhere zinaran. Ji bo navbera van zinaran bigirim, weke zarokên gelê xwe bûm gerîla. Yek jî weke gerîlayekê xweşîkbûna çiya û welatê xwe hildimijim hundirê xwe. Hewl didim di semaha perperîkê de cihê xwe bigirim. Ez jî hesabê salên derbasbûyî dixwazim. Zîhnîyeta welatê min mahkûmî tarîtiyê kirî,

weke cinawirekî xwîna gelê min vedixwe. Ez ê li hemberî vê dil û giyana xwe bikim mortal. Ez ê heta serkeftin bi dest bê xistin û gelê min azad bibe bi azwerî şer bikim.

Dixwazim dema dîwarê Îmralî parçe bibe û hûn li ser sûrên Amedê bi gel re daxivin bibînim. Dixwazim di nav vê lehiya hezkirina gelê xwe de biqêrim û bêjim; Rêberê min!!!!

Ji bo êdî Rêberê min gelê xwe hembêz bike, çi pêwîste ez ê bikim û wê tiştek li hemberî serkeftinê nebe asteng.

Wê bedema me ji bo azadiyê weke agir cîhanê dorpêç bike. Wê dilê Kurdistanê zindîbûna xwe biparêze û weke koka Rojhilata Navîn wê jiyanê azad li ser van axan şîn bibe.

21 Sibatê 2009/ Tetwan

Divê her zayînek nû bibe tîqetîq û mezin bibe

Dema min îro dest bi nivîsîna rêzên destpêkê kir bêhna min pir teng dibû. Tevî di navberê de demjimêr derbas bûn jî hîn dilnerehetîyeke nikirim pênasaya wê bikim min tine dike heye. Ez vê roja xwe ji hemû hevalan vedişêrim û bê ku wan pê bihesînim, hest, kelecana û êşên welidînê anga bi êşên azadbûnê re parve dikim.

Di navbera perwerdê de min ji hevalan pirsî û got; “meha Sibatê ji bo te tê çi wateyê?” Hinekan got; “birîna di dil de tine bîra mirov,” hinek hevalan jî got; “naletê tine bîra mirov” û wisa bersiv dan. Ev bersiv dîsa dîroka Kurd a tarî bi min dide jiyîn. Di bersiva hevalan dayî de xemgînî û êşa 15’ê Sibatê hebû.

Çend demjimêr mabûn hewa tarbî bibe, bi zanîna vê fersendê em bi hevalan re derdikevin derve. Bi rojane hevala Toprak dibêje; “em kardan adam, çêbikin.” Min jî got; “ne kardan adam, em peykerê bûka berfê çêbikin.” Her wiha me dest bi çêkirina peykerê bûka berfê kir. Me porê wê ji pelên hişk çêkir û me kefiya Koçeran a di stûyê hevalê Bawer de jî lêpêça. Me çav û devê wê ji rejiya kozan çêkir û me biriyên wê jî ji çeqên daran çêkir. Bûkeke berfê ya pir xweşik çêbû. Di vê navberê de

pir zêde ferqa me û bûka berfê ji hev nema. Em jî di nav spîbûnê de man, barîna berfê berdewame. Ji ber sedemên ewlekariyê em neçar man bûka berfê xirab bikin. Bi avêtina gulokeke berfê em dest bi lîstîna berfê dikin. Piştî em hinek dilîzin, ez xwe davêjim hundir. Me kêliyên pir xweş jiyan kirin. Îro rojbûna min e, bê ku kes pê bihese, min wisa pîroz kir. Hevalê Xemgîn ji vê lîstika me kêmbû, wî jî nobedariya girtiyan digirt. Du girtiyan me hene.

Di vê navberê de ger havalê Toprak bizane îro rojbûna min e, ji ber min ji wê re negotiye wê pir aciz bibe. Lê ji ber sedema meha Sibatê ez nabêjim, ez di wê baweriyê de me wê wate bide min.

Hesreta gelek hevalên xwe dijîm. Min pir bêriya Mizgîn giyan kiriye û li hebûna wê digirim. Xeyal dikim rojekê ji nişka ve dengê wê di radyoyê de bibihîzim. Mizgîn giyan, min bêriya deng û biriqîna çavên te kiriye. Giyana min, tu li ku derê yî? Ez ji te bê agahî me, weke zarokên sêwî me. Xwe kêmbûnê dikim, ji ber ji te agahî nagirim rewşa te mereq dikim. Me di her biharê de hev didît, lê weke wê vê carê nebe. Lê herî kêmbûnê min dengê te bibihîsta û bêriyên xwe biqêriyan. Tu giyana min î, ez pir ji te hez dikim. Ez bi bedewiya Kurdistanê re silav û hezkirinên xwe ji te û hevalên din re dişînim. Ez bi bêrî û hesret te hembêz û maç dikim. Ez hezkirinên xwe ji bo hevalên xwe yên hêja Diljîn, Arjîn, Aysel, Dilgeş û ji hemû hevalên min navê wan negotî re dişînim.

25 Sibatê 2009/ Ximsê

Birîna dilê min

Dema berf li ser laşê min diherike

Dema porê min spî dibû

Dema di lerizandinên sar û cemidî de dikeniyam

Her li te hizirîm

Her tu hebû di dilê min de

Çavên min noqî dûriyê dibin
Gotin di qirika min de asê dibin
hesret û bêrî min difetisîne
Bêdengiya piştî bagerê bi ser min de tê
Gotin hemû difirin û diçin
Û bi bêriyên xwe re dimînin
Ez hîn fêrî tinebûna te nebûme
Te bi hemû kesî re dibînim
Hemû kes te tîne bîra min
Bê agahiya te
Tu her tim
Bi wan deran re tê bîra min
Berf, çiya bêdengî behsa te dikin
Em kulîlkên çola warên dûrin
Ev dûrbûn zinareke
Ev zinar min ji quncên nepenî berbelav dike
Tu hem heyî
Hem nînî
Hem li gel min î
Hem pir dûrî min î
Rastiyek wisa ye!
Ne dikarî vebêjî
Ne dibe

Ne jî dikarî bêjî dibe
Li tabloyan bêdengiyê xêz dikim
Xeyalan li kevîşenan
Hêviyê li asîmanan xêz bikim
Dema lingê min pêl axê dike
Dema bi laşê xwe bi bayê dihesim
Tu tineyî li gel min
Ez di arîfeya zayînekê de me
Bila ev zayîn bibe xelata temenê te

25 Sibatê 2009

Berfa min a spî

Bi yekeyek gerîla me mangên xwe di bin erdê de çêkir. Me sê metre axa bilind kola. Me xaniyên xwe yên luks çêkirin. Me modelên fêrbûyî derbaskirin û me şibakeya xwe di ban de vekir. Cam û çarçoveya şibaka me nîne. Cama şibaka gerîla ji naylonê pêk tê. Ev şibake ronahiyê diyarî me dike. Em jî bi hesreta xwe ya riya vê ronahiyê temam bike di vê şibakê de li cîhanê dinêrîn û pergala cîhanê nîqaş dikin. Em di mangeyek biçûk de jiyana nû ava dikin.

Ez nikarim li vê şibakê nenêrim. Pelikên berfê bi hev re ketine pêşbirkê. Wisa bê sebir nêz dibin nikarim behs bikim. Ji bo ji hewa bi-kevin erdê hevdu dehf didin. Her pelika berfa li naylonê dikeve zû dihele.

Xweza çiqas muhteşem e, bi hesta dayîkeke fêr dike mirov hambêz dike. Hilm û germahiya nîqaşên em di mangê de dikin ji hundir ve naylonê zêdetir germ dike. Pelikên berfa di binê de dihele û yên nû dikevin cihê wan û spîbûna berfê tijî dibe. Ji bo hebûna hevdu bidin jiyîn temenek kurt dijîn û cihê xwe ji pelikek din ya berfê re dihêlin. Pelikên berfê bêmirin dibin, dilop dilop kom dibe û vediguhere golên biçûk û ji wir

ber bi robaran ve diherike. Bi bêdengî ji axê re dibêjin; merheba û riya xwe berdewam dikin. Rih û bereketê tevî axê dikin, ev robar weke mizgîniyê bide gerdûnê bi coş dike.

Ev pelikên berfê min dibe hizirandinên cuda. Ger ez di nêvenga perwerdê de nebam, min ê nikariba çavên xwe ji vê dika dilê min ronî dike biguherta. Çavek min li şibakê ye çavek jî li hevalan e. Carê di navberê de vê beşê dikim lib û lib û rêzikan dadigirim. Dema hestên min weke van libên berfê diherikin ser van risteyan, a di dilê min de dimîne ji bo hevalên min dimîne. Berfa min a spî; tu berdewam çiyayên me bixemilîne, ji bo ez jî berdewam temaşeyî te bikim. Kêfa min pir ji pêşbirka we re hat. Berfa min a spî; her yek ji we lehengek e, ger hûn xwe feda nekin wê bihar nebin. Ji ber vê xweza deyndarê we ye, berfa min a spî, ez jî deyndarê we me.

28 Sibatê 2009/ Ximsê

Îro 8'ê Adarê ye

Bi hêvî û baweriya hemû roj û 8'ê Adarê azad bin merheba! Ji hemû jinên hêja yên ev roja bi wate diyarî me kirî re merheba! Di dîrokê de jinan bi ked û bedelan ev roj ji pergala desthilatdar qutkirin û diyarî mirovahiyê kirin.

8'ê Adarê remza berxwedan û nasnameya jina azad e. Ya di vê çaxê de pêşengiya 8'ê Adarê dike jina Kurd e. Jina Kurd pêşengiya azadiyê dike û hemû jinan ber bi jiyana azad ve dibe. Wateya herî mezin a vê 8'ê Adarê jî li ser bingeha azadiya Rêber Apo ye. Ji ber vê gelek jin li qadan bûn. Em di radyoyê de pîrozbahiyên dişopînin. Ji ber ewlekariyê gerîla televizyonê bi kar nayîne, bi xwezayî em di radyoyê de dişopînin. Pîrozbahî hemû bi gelemperî derbas bûne. Jinên Kurd bi cil û bergên xwe yên neteweyî ahenga rengan avakirine û azadî qêrîne.

Bi hêviya 8'ê Adarê bibe wesîleya azadiyê.

8 Adarê 2009

Rojbaş

Îro hewa vekiriye, roj bi hemû xweşikbûna xwe xwezayê germ dike û hêviyên me digihîne. Asîman şîp û şîne, ji ber berfê mirov nikare çavên xwe tam veke. Xweza xwe ji bo biharê amade dike û ji me re jî dibêje; divê hûn xwe amade bikin. Piştî barana duh ev tava heyî bi serê xwe şahane ye!

Ji aliyê têkoşîna me ve her sal destkeftiyên xwe yên cuda hene, her sal ji bo em serkeftinê bi dest bixin têkoşînek bê eman didin. Her çendî ev sala em tê de ne ji gelek pêşveçûnan re ducanî be jî, divê ji aliyê din ve xwe ji pêşveçûnên neyênî re jî amade bikin. Rêxistin, gelê me û kadro bi zanabûna vê rastiye bi hemû hêza xwe beşdar dibin. Dirûşemeya me ya îsal; “em di xeta Zîlanê de bibin fedaiyî û Rêber Apo azad bikin.”

Rêberê min; dixwazim we bibînim û li gor kêrhatiya demê bijîm. Divê êdî em dawî li tevgera xwe ya giran bin. Ji ber vê bi kelecanim. Ez ê deng, hezkerin û bêriyên xwe bikim gilokek agir û pergala Îmraliyê parçe bikim.

Rêberê min; tiştên we ji bo me jinan kirî, dixwazim tiştên behra min dikeve rexnedayîn û deynê xwe bidim. Em jin deyndarê we ne, we jina dikare bibe xwedî vîn fêrî me kir. Azadiya we azadiya gelê me û azadiya me jinan e.

Rêberê min; min dixwest di sala 2006'an de girêdana xwe ya ji bo we bidim hîskirin ji ber ji her alî ve amade bûm. Ji bo demek berî demekê bigihim wê berzbûnê min xwe ferz dikir. Di dawiyê de guncav hat dîtin. Li ser bingeha armançek wisa ez ketim ser riyek dirêj. Li ser çerçoveya bernamê ez bi baldarî nêzî rêzikên ewlekariyê bûm û parastî gihîştim cihê xwe.

Min gava destpêkê ser xistibû. Dema ez gihîştim cihê xwe min cih dest nîşan kir û heta cilên ez li xwe bikim jî min amade kir. Dor hatibû pakêtê bigirim. Lê belê navnîşana ez çûmê gotin; “pakêt negihîştîye me” û min şoq derbaz kir. Weke gule li mejiyê min ketibe, min ew qas bala xwe dabû ser, li hemberî vê bersivê ez pir êşiyam. Min agahî şand xwest pakêtê dîsa bişînin. Bi mehan ez li bendê mam, piştî wê agahiya ji min re hatî, gotin “pêvajoya guherî çalakî hatine sekinandin.” Her wiha

gotin divê xwe zû bigihînim çîyan. Ez li hemberî vê agahiyê helweşiyam, weke ji lûtkeya herî jor li erdê bist bibim li min hat. Ji ber ez ji bo çalakiyê pir amade bûm. Min xwe pir bi tenê hîs kir, piştî rojan dema ez ghiştim hevalan ti kelecana bi min re nebû, min bi îşyan li heval û çîyan dinêrî. Ez pir ecêb bibûm, ez veguherîbûm mirovek bêdeng. Min piştî mehan xwe hinek komî ser hev kir. Vê carê min berê xwe da Bakûr. Di nav şerê germ de cihê min hêrsa xwe lê anîba ziman qada Bakûr bû. Ez dihezirim, ger dixwazim ji Rêbertiyê re bibim bersiv, divê wê demê ez li Bakûr bim. Di encama ferzkirinê de hatim Bakûr. Armanca hatina min nîşandana girêdana sekna xwe bû. Ez nizanî min ev çiqas bi ser xist, lê min ti dema dest ji vê daxwaza xwe berneda.

Dixwazim bibim bersiva dirûşmeya me ya îsal, ez ê bi wijdanî tevbigirim, wê ev wijdan min bibe serkeftinê. Wê ev serkeftin bibe rojbûna min û wê xeyalên min li van axan rih bide û şîn bibe. Vaye wê demê ez ê bibim jina herî kêfxweş a cîhanê.

10 Adarê 2009/ Ximsê

Merheba

Şev û gerîla weke xwîşk û birayên cêwî ne. Em bi şevê re direqisin û şevan bi tenê nahêlin. Bi gelemperî em xebatên xwe bi şev dikin û bi şev dimeşin. Ango em şevê ji nêz de hîs dikin û şev jî me ji nêz ve nas dike. Yek jî dema tava heyvê hebe mirov ji meşê têr nabe. Her çendî ji aliyê ewlekariyê ve mertsîdar jî be gerîla pir ji şevên tavaheyvê hebe hez dike. Ez îşev dixwazim mamosteya xwe ya jiyanê bi te bidim nasîn. Ez tam nikarim hestên xwe pênasê bikim. Hem mamosteya min, hem hevala min a çekê û di demarê me de heman xwîn heye. Weke kombûna van hemûyan, li ser bingeha heman armancê dilê me hev dibîne. Ez nikarim xweşîkbûna wê pênasê bikim. Gotin di ber min de dimîne û min pir bêriya wê kiriye. Ev bêrî dilê min dişewitîne. Min pir bêriya deng, biriqîna çavên wê, kenê wê yê ji dil, ew destê wê yên pambû di ser porê min re dibir û bêriya hîn gelek tiştên din ên wê kiriye.

Ew a di dilê Botanê de evîndara hevaltiyê bû. Ew jineke di nav hemû zehmetiyan de vîna xwe serxistiye. Hîn di şaşde saliya xwe de dil û bîra xwe bi azadiyê re kiriye yek, ji ber vê bi pêşniyarî û ferzkirina xwe qadên herî zehmet hilbijartiye. Tevî xwesteka hevalan nebû jî ew bi biryara xwe bûye xezala Kêla Memê. Bi vegotinê çîroka jiyana vê jina bi vîn xelas nabe. Ev jina delal rêheval û xwîşka min e. Ji ber xwîşka wê me şanaz dibim. Ne ji ber xwîşka min e van tiştan dibêjim, bi rastî jinek wisa ye. Hevalên bi wê re mane ji min xweşîktir behsa wê dikin. Jineke xwe bi çanda xwedavendiyê gihandiye. Jineke fedekar a vê şoreşê ye. Ji sala 93'ê heta niha bê navber cihê xwe di nav têkoşîna azadiyê de girtiye. Tevî dîsa birîndar bûye asteng nas nekiriye. Di encama topên hatine avêtin de parçe li serê wê ketiye. Ev parçe li ser demarê sinir e. Dema ev parçe dikeve tevgerê serêşek pir zêde çêdike. Caran ew êşa dikşîne wisa giranî çêdike dibe sedem li ser hişê xwe biçe û carna bi rojan li erdê dimîne.

Jinek gerîla ya barê şoreşê radike ye. Hem hevalên jin hem hevalên xort jê hez dikin û nîrx didinê. Ji ber ked, sekin, vîn û mirovheziya wê girêdayî me. Ji ber ev hevala delal xwîşka min e pir bi şansim. Dema li gel wê me xwe pir aram hîs dikim û rihê min ê zarokatiyê dikeve tevgerê.

Dema em li malê bûn hem me pir şer dikir hem baş li hev dikir. Me li hemberî malbatê hev diparast. Hemû kes li hemberî vê peywendiya me şaş dima. Dema em şev diketin nav cih me dest bi axaftinê dikir. Êdî bavê min îsyar dikir. Em dîsa bi şevên derî digirt û filîmên bi tirs guhdar dikir re rû bi rû dihatin. Zîlamê feqîr rojê hemû kar dikir, dema dihat malê dixwest bêhna xwe vede, lê ji ber me ev ne pêkan bû.

Parkirinên me ne ji rêzê bûn, di vê mijarê de ew jî hilbijêre û ez jî. Ez pir ji wê hez dikim. Tevî ew qas ji wê hez dikim, min carek tenê jê re negotiye pir ji te hez dikim. Min di nivîsên xwe de eşkere kir û xwendiyê. Dibe min bi gotin neanîbe ser ziman lê çav û dilê min gotiye. Ew kulîlka min a mizgîniyê ye, ew her tim mizgîniya xweşîkbûnê ye ji min re.

Ez niha fizîk pir ji wê dûr im, di navbera me de çiya hene. Ev dûrî yekbûna me ya rihî lewaz nake. Em her tim di dilê hev de ne. Em moral û hêz ji hebûna hev digirin. Ew hêza min a xwe li hemberî zehmetiyan ragirtinê ye. Rewşa wê mereq dikim, tenê bizanim baş e, besî min e. Gelo rewşa wê ya tendirûstiyê çawa bû? Gelo derfeta tedawî bibe dît?

Mizgîna min, bihara min. Bi bawezîna bayê re silav û hezkirinên xwe ji bo te dişînim.

12 Adarê 2009

Tu hêviya di dilê min de şîn dibê yî

Pêvajoya zivistana me li Tetwanê derbas kirî zehmet derbas bû. Me tam digot, hinek tişt rast bûn, me hinek tiştên din dijiyan. Min di rojnivîsa xwa ya din de behsa çetegerî û peywendiyên ji rê derketî yên li vir derketî kiribû.

Ez pir dixwazim rêxistin û hevalên min ên jin tiştên li vir derketî bizanin. Divê bizanin xort jinan çawa tengav dikin. Ez bawer dikim zehmetiyên em dijin Rêbertî hîs dike. Ev hest tenê besî min e. Ji ber hevalên xort li Xerzanê zîhniyeta feodal ji xwe re kirine fêrbûn, dema vîna jinê hinek tê dîtin weke milkê wan ji dest biçe. Di encamê de qada Xerzanê tînin rewşek wisa jin nikaribe tê de bijî. Li bendê ne rêxistin bêje; hevalên jin nikarin li Xerzanê bikin. Dibêjin; “Xerzan zehmet e bila hevalên jin nebin.

Em ê li hemberî vê feraseta dibêje, “nabe,” nebûnê veguherînin dibe. Ji ber Rêbertî erkek girîng daye qada Xerzanê. Her wiha Xerzan xwedî cihek stratejîk e. Ji ber rista Rêbertî dayî Xerzanê zehmetiyên wê çî dibin bila bibin ez qet xwe paşde nadim. Di berê de gelek hevalên jin xistine bin keviran û agahiyên nerast dane Rêbertiyê. Hewldane hevalên jin nebaş bidin nîşan, lê Rêbertî rastî fêm kiriye. Divê teqez dilê jinê li Xerzanê lêbide û rengê jinê li van axan were nexşandin.

12 Adarê 2009/ Ximsê

Merheba

Li vê derê min kêliyên pir zehmet derbaz kirin. Lê min her tim gotina hevala Sema Yuce ya dibêje, “heta rihê PKK’ê hebe mirovê bê hêz nîne,” ji xwe re vegot. Dibe di nêvengekê de di pîvanên hevaltiyê de lewazî hebin, lê ger tu dîsa xwe di pîvanên PKK’ê de lêpîrsîn bikî û pêş bixî wê dîsa hevaltî bi ser bikeve. Ji ber PKK’e jiyaneke dide qezenckirin e. Êdî ez xwe li hemberî van pîrsgirêkan bêhêz nabînim. Lê dîsa heyîna van nêzîkatiyên li Bakûr zora min diçe. Nêvenga Bakûr pîroz e, divê ev pîrozî neyê qirêj kirin.

Em van rojan li ser dîroka PKK’ê perwerdê dibînin, ez û hevalê Xemgîn bi hev re komîsyonin. Min di berê de cihê xwe di vê komîsyonê de girtibû, min wê demê pêvajoya piştî salên 2000’an vegotibû. Lê ez niha vegotina pêvajoya komê heta sala 1990’an ango piştî Kongireya 4. dikim.

Di dema vegotina vê de min kêmaniyek din jî pir baş ferq kir. Mantiqê min wisa bû, weke wê hinek vebêjin û em ê jî guhdar bikin. Di fêmkirina dîroka PKK’ê de min tenê erka guhdarkirinê dabû xwe. Vê jî tarzek bi me re avakiribû. Mantiqê me ew bû jixwe hevalên jiyîne hene bila ew vebêjin. Min digot; ez nikarim heqê wê bidim, a herî baş hevalên kevin didin bû. Hinek rastiya vê hebû. Divê mirov wisa rêzdar nêzî tiştên hatine jiyîn bibe, lê nêzîkatiyek pir şaş e. Divê me jî xwe kûr kiriba. Mantiqê bila hinek vebêjin û ez guhdar bikim ji aliyê qadroyekê ve nêzîkatiyek siqete. Divê her endamek PKK’ê, her Kurdek dîroka PKK’ê ji hemû aliyên ve baş bizane û xwe pêş bixe. Yê duh nizane wê nikare îro bizane, yê îro nizane wê nikare sibe fêm bike û qîmeta nîrxên tîna avakirin bizane.

13 Adarê 2009/ Ximsê

Rojbaş heval

Xew ji bo gerîla weke avek şîrîn e. Bi tayebe sibehan mirovan dikşîne. Bawezîna bayek hênîk û ahenga çûkan weke lorîkê mirovan bi xew re dibe. Ji ber ewlekariyê gerîla zû radişe. Li hemberî rewşên sibê rû bidin re amadeye. Piştî keşfa serê sibê agir tê pêxistin û taştê tê xwarin. No-bedar derketine û êdî demjimêr ber bi nîvro ve diçe. Rojê êdî xweza

hemû xistiye kefa destê xwe. Êdî li siya darekê tê gerîn. Çav mestin, ger karek rojane nebe bi germahiya rojê re çav dikevin xewê. Zerdexene-yek şîrîn li ser lêv û xetên rûyê gerîla yê ketî xewê tê xwendin.

şansê gerîla yê sibê xew bike çênabe. Em gazindan ji vê nakin. Yek jî ger mehên bihar, havîn û payîzê be sibehan nexewkirin baş e. Hevaltiyê bi berbanga sibê re dikî, stêrkan bi rê dixî û rojê hembêz dikî. Roj bi gerîla destê pê dike. Razana sibê bêparbûna ji van pîroziyên xwezayê ye. Dewlemendiya herî mezin girêdana bi xwezayê re hatî avakirin û dostaniya te pêk aniye. Gerîla jî parçeyek vê xwezayê ye û ya wê temam dike ye.

17 Adarê 2009

Ma kenek çi venabêje?

Gelo her kenek îfadeya kêfxweşiyê ye? Yan mirov di encama tiştên jiyîne li şûna bigirî dikene? Di encamê de çavkaniya ken çi dibe bila bibe hestekê vedibêje.

Gerîla xwedî tayeбетmendî û qerktarek, herîkbar, bi tevger, zindî, nepenî, xuliqkar, bi serpêhatî, romantîk, dînokî û her gerîlayek pir hez dike xweza, çiya, deşt û robar bikene û bidin kenandin. Ji ber di qerke-tera gerîla de kêfxweşî û xemgînî heye, ev di xetên rûyê wan de tîn dîtîn. Ger tîqetîq ji wan neyê jî, çavên wan dikenin. Aramiya mirov di hundirê xwe de dijî kêfxweşiyê bi xwe re tîne.

Gerîla bi gîrnijîn zehmetiyan derbaz dike. Ji ber gerîla di zanabûna tiştên dike de ye. Ked û hewla ji bo azadiyê tê dayîn pîroz e. Coşa ji yana gerîla bi vê pîroziyê di lûtkeyan de ye.

Li Başûr ji ber ewlekariyê kes kenê te sînordar nake. Ji ber vê pîrçênîya kenê me weke bayê tevî xwezayê dibû, kêfxweşî û bişîşîn xwe di çavan de deng vedidan. Me dikariya bi azadî bikenin. Kesê mîdaxeleyî dengê me nedikir. Divê li Bakûr ji ber rêzikên ewlekariyê dengê xwe kêmbikin û baldar nêzî veşartîne bibin. Ji bo wargehên me êşkere nebe, em bi dengê nizim daxivin, dûkelê dernaxin û agirê bê dûkel pê dixin. Dema sihetên me bi dengê nizim çêdibe bi xwezayî em

dengê kenê xwe jî kêr dikin. Her kes nikare bi dengê nizim bikene. Her çendî ez baldar nêz dibim jî, dîsa hinek caran pîrçênîya kenê min bi dengê bilind derdikeve.

Hevalên bi salan li Bakûr rêbaza wê girtine, dema dikenin dengê wan dernakeve. Dema derdikeve jî nizim derdikeve. Hinek dema dikenin tenê sîh û du diranên xwe nîşan dikin. Êdî bi demê re tenê çav û lêv dikenin, dengê ken di qirîkê de asê dimîne. Di pratîkê de gelek caran ji ber deng û pîrçênîya ken şiyariyê didin hev. Hinek caran wisa dibe em nikarin dengê xwe kêr bikin, em kefiyan dixin devê xwe. Dema ew jî nebe em destê xwe gez dikin. Êdî wisa dibe ne bi mijara ken em li rewşa hev dikenin.

Em nêzî pratîkê dibin û divê ez zêdetir baldar nêzî pîrçênîyên kene xwe bibim. Ka em binêrin wê çawa be. Şêwazê kenê li Bakûr bi serê xwe keneke; kenê bi tîpên biçûk!

19 Adarê 2009

Em di dîroka agirê Mazlûman re derbas dibin

Bi hezar carî silav û hezkinên xwe ji bo yê agir diyarî mirovahiyê kirî dişînim.

Em di sorbûna agir de dişewitin, dilê me bi hezkirina agir re dibe yek. Agirê di dilê Mazlûm Doxan ê ku agirê berxwedaniya Kawa gur dike, li rûyê me dikeve. Dilê me bi rûmet, evîn, hêvî û azadiyê lêdide. Ji ber em di dîroka agirê Mazlûman re derbas dibin. Em weke zarokên agir û rojê, weke jinên agir cihê xwe di vê dîroka berxwedanê de bigirin.

Di serî de cejna Newroza bûye remza azadî û berxwedanê li Rêber Apo, gelê me yê welatparêz û hevalên me yên di girtîgehan de li ber xwe didin pîroz dikim. Cejna Newroza hevalên niha ji min dûrin pîroz dikim. Min pîr bêriya wan kiriye. Ne dest û ne dengê min nagihin wan. Ez bi hesreta wan dişewitim. Rihê min bi wan re ye û her şev dibin mêvanên xewnên min. Bi evîn û azwêriyê ji wan hez dikim. Bi hêviya ez ê rojekê wan bibînim dijîm. Hesreta wan di baxçeyê dilê min de veşartîye.

Roj li rûyê gelê min dikene. Hewayek muhteşem heye. Asîman şip û şîne, gelê me hevaltiyê ji vê bêhempabûna xwezayê re dike. Weke hemû deman cilên xwe yên neteweyî li xwe kirine û bi coşek mezin Newrozê pîroz dikin. Hesreta xwe ya aşîtiyê diqêrin. Tilîliyên wan rûyê erdê dinalîne.

Dema dibêjin; agir, germî, sotînerî, sorî, pêt, berxwedan û piştî wê jî Prometheus, Mazlûm Doxan, Zekiye, Rewşen û Ronahî tê bîra mirov. Mirovên xweşik bi bedena xwe agir geş kirin, carek din azadkirin û gihiştin azadiyê. Di her biharê de pêt mizgîniya azadiyê ji gelê min re tîne.

Agir her tim hezkirin û hevalên xweşik ên ji wan hez dikim tîne bîra min. Ew hevalên min jî pir ji agir hez dikin. Agir evîn û bêriya di dilê min de ye. Qirîskên di bîbîlka çavên min de dibiriqê ye. Ez dostaniyê bi germahiya agir re parve dikim, gelek şevan bûye hevkarê xemên min. Pêtên agir mirovan ber bi rêwîtiyek dûr ve dibe û aramiyê dide mirov. Agir sotîner e, cihê pê bikeve dişewitîne. Kirêtiyan dike xwelî û paqij dike. Hemû kes nikare bibe hevalê/a agir, ji ber agir ji her dilî re nabe dost.

Mirovên ji jiyana, xweza, agir û mirovan hez nakin bi ecêba min diçe û her tim di nav matmayînê de dimînim ka ew çawa dijîn. Ez hizirim ev mirov, mirovên cîhanê yên herî rebenin. Agir bêriya di dilê min de ye.

22 Adarê 2009

Hezkirin ji bo xwedawenda min a evînê

Giyana min, di vê cejna Newrozê de tu her tim li bîra min bûyî. Min di kûraniya dilê xwe de cejna Newroza te pîroz kir. Ez hizirîm dibe tu îro li ku derê bî û hêviya min ew e tu bi gel re bî. Weke gerîlayekê, xweşî û kelecana pîrozkirina bi gel re pir cudaye. Ez hîs dikim tu dixwazî bi gel û zarokan re pîroz bikî. Ez te mereq dikim. Tu îro li kîjan bajar, welat, çiya, qad û di hembêza hezkirina kîjan gerîla de yî?

Di nav gerîla de tenê di sala 2005'an de şansê me yê bi hev re Newroz pîrozkirinê çêbû. Bi îro re ez vegeriyam sala 2005'an. Em wê

demê çiqas kêfxweş bûn. Ez bi te re bûm û me cejna Newrozê pîroz dikir. Gelo wê dîsa şanseke me çêbibe?

Dem bi hemû fêrbûnên xwe ve diherike, ez hêviya xwe li demê bar dikim. Ez her ku li te dihezirim xwe nû dikim û di ahenga biharê de dilê xwe bi rûmet û hezîrînê tacîdar dikim. Li te hizirandin û bi rê ketin hestek xweş e. Tu firîşte û xwedawenda min î. Bi rihê te re hebûn moral dide min û hîs dikim dijîm.

Her çendî çiya û bajar weke barîkatan di navbera me de hebin jî, em di rihê şoreşgertiyê de bi hev re ne û dê rihê me bi hev re bijî. Niha qîqilbaz bêriyên me dike stran û bi hatina bayê re diqêrin. Bi qasî nikarim te vebêjim pir hez dikim. Gotin li gel hezîrîna min bê wate dimînin.

22 Adarê 2009/ Tetwan

Merheba

Min îro pêwîstî bi dost û hevalekê dît. Min xwest rûnim û bi demjimêran pê re parve bikim. Min xwest bagera di dilê xwe de vebêjim. Diyare kes nîne, kes nîne ez di vê astê de pê re parve bikim û hêz bide min. Mirov carna pêwîstî dibîne tiştên jiyîne bi hinekan re vebêje. Ez îro li gelek hevalên xwe hizirîm. Weke li gel min in, min bi wan re sihet kir. Hinek hevalên min şehîdin. Nebûna wan êş dide min. Ez nikarim bêjim fêrî nebûna wan bûme û ez ê ti deman fêr jî nebim. Hevalên min ên xweşik her tim di bîra min de ne û ez wan di rihê xwe de hîs dikim. Zivistanê tişteke ji sermaye xwe kêm nekiriye. Di vê mehê de jî berf dibare. Her ku berf dibare biharê ji me dûr dixê û bêriyên me jî mezin dike. Hevalên xort ên di wargeha me de dijîn rihên xwe qet ji serma û hizirandinên qerisî qut nekirin. Ji ber vê jiyana me ya wargehê her tim nîvçe ma. Ji bo jiyan xweşik bibe ji derveyî hevalekî ti kes pê re mijûl nabe. Berûvajî wê jiyanê xirab dikin. Bi paşverûtiyên xwe sihê dixin ser jiyana PKK'ê. Tu rexne dikî, nîqaş dikî, tu ji bo qanekirînê rêbazan pêş dixî, dîsa nabe û xwe nadin ber guhertinê. Di feodalîya pûç de îsrar dikin. Ji ber du girtî di destê me de ne em nikarin biçin sepandinek din jî. Ew jî vê dizanin û dixwazin vê valatiyê binirxînin. Di kesayetên bêrêxistinbûyî de îsrar dikin. Nakokiyên hemûyan bi hev re hene. Lê ka

werin bibînin çawa bi parşverûtiyên hev re dibin yek. Ez nefretê ji vê zîhniyetê dikim. Ger ne ji feraserta hevalatiya PKK'ê bûya ez bi wan re nedaxivîm jî. Bi hevalên xort re jiyîn pir zehmet e! Weke jinek milîtan bi şêwazê rêxistinbûyî bi hevalên xort re jiyîn pir zehmete. Min nizanibû ew qas bê ferasetin. Ger bêjin sekin û ferasetên hemû paşverûtiyên Rojhilata Navîn di vê wargeha me de tên jiyîn dê zêde nebe.

Sibe hîlbijartin hene. Dê yên nûnertiya aşîti, azadî, rûmet û mirovahiyê dikin û yên nûnertiya şidet, olperest û zilimê dikin şer bikin. Em bi hêvî ne û baweriya me bi gelê me heye. Wê ev hîlbijartin hemû tiştî xilas neke lê dê vîna me ya siyasî dane holê û ya herî girîng jî wê bi riya siyasî girêdana xwe ya ji bo Rêber Apo nîşa hemû cîhanê bide.

Ez dema îro li ser van dihizirîm, ji aliyê din ve jî bi bîranînan re diketim nav rêwîtiyê. Bîranîn min bi pêşerojê re digihîne hev. Her çendî dem xencera veqetînê jî be hewl didim her kêliyê bi wate bijîm. Di mînaka berfînê de di dilopa wateyê de serê xwe ber bi asîmanan ve bilind dikim û dilê xwe ji bo şerê gelê xwe vedikim.

28 Adarê 2009

Qêrînên kêfxweşiya gelê min

Di encama kedên mezin de bi hemû eşkerebûnê ve gelê Kurd danî holê ku bê Serok jiyan nabe û vîna me ya siyasî îmralî ye. Hemû bereyên dijminatiya AKP'ê yên nû vala derxistin û gelê Kurd mesaja xwe da hemû cîhanê. Em ti kesê di axa xwe de naxwazin. Me bi narînî dijmin û dûvîkê wan AKP'ê jî diqewitînin.

Bi vekirina sadiqan re pîrozbahîyan destê pê kir. Me jî coşa gelê xwe li vir jiya. DTP'ê di rêza destpêkê de cihê xwe li Kurdistanê girt û bi ferqek mezin pêşbirka alê tamam kir. Li gelek cihan deng hatin dizîn. Tevî van sepandinan hemûyê jî gelê Kurd bi wêrekî dengê xwe bi kar anî û vîna xwe ya siyasî nîşa cîhanê da. DTP'ê li gor berê dengê xwe bilind kirine. Ev serkeftinek mezine. Me Wan, Îdir û Sêrt ji destê AKP'ê girt. Bi vê helwest û berxwedaniya siyasî, pirsgirêka Kurd û azadiya Rêber Apo ket rojevê. Êdî kes nikare ev encama derketî înkâr bike.

Me roja xwe li ber radyoyê bi guhdarkirina encamên hîlbijartinê derbas kir. Ji ber parazîtê navber navber qut dibû, piştî demjimêr nehan kêmbû. Me dîsa pêşveçûn şopandin. Ji ber ez xwarinpêj bûm, lingek min li salonê bû û lingê din jî li mangê bû. Di encama van nûçeyên xweş de divê mirov tiştekî bixwaze. Bi çêkirina helawê em serkeftina xwe pîroz dikin.

30 Adarê 2009

Merheba

Vegetînên Nîsanê weke xemgîniyê bi ser min de tê. Em hêdî hêdî zivistanê li pişt xwe dihêlin. Çûk di berbanga sibê de mizgîniya biharê ji me re tînin. Ji ber tav nade wargeha me hemûyê berf heye. Bi germahiya tavê re ev berf jî bi lez dihele. Ji ber em sûd ji tîrêjên rojê nabînin, ez ji xwezayê dihesidim. Dema ez li aliyê hember dinêrim hundirê min dihele. Min dixwest li wir bim. Berf qet li aliyê hember nemaye. Ax bi kulfîkan bi me re digirinijîn.

Perwerdeya me bi hemû leza xwe berdewam dike. Hinek heval qet ne tevlî perwerdê ne jî jiyanê dibin. Di paşverûtiyên xwe de îsrar dikin û bi nêzîkbûnên şexsî pirsgrêkan dixin nav bêçaretiyê. Xwezî bizaniyan çiqas di nav nêzîkatiyên paşverû de ne. Dê rojekê jovan bibin. Di vê wargeha me de nêzîkatiyên hinek kesan ên pir zehmet hene. Heta dawiyê bêhna qirêjiyê tê û hilweşandin heye. Seknên bê biryar û nediyare çî dijîn hene. Di vê kesayetê de rojekê roj hiltê, rojekê baran dibare û brûsk lêdikevin. Di rastiya xwe de naxwazim van binivîsim.

Me îro dahûrîna Rêbertiyê ya li ser hevala Zîlan xwend û hinek hevalan jî nêrînen xwe anîn ser ziman. Em ê sibe cihê jê mane berdewam bikin. Min dema dahûrîn dixwend, nameya xwedawenda me hevala Zîlan a xîtabî Rêbertiyê nivîsandibû dema min hest û ramanên wê xwend gotin di qirika min de bûn girêk. Ez her ku dixwînim pir bandor dibim. Ji aliyekî ve ev şêwazê çalakiyê bi hêz dike, ji aliyê din ve dema ez bejin-bostbûna xwe dibînim ecêb dibim. Herî dawî çalakiya hevala Sarîna ya di 15'ê Sibatê de li dar xistî ez pir bandor kiribûm.

Her roja hevalên min şehîd dikevin, çalakiyên esîlzade li dar dixin ez ji rêzê dijîm. Ev yek bêhna min teng dike. Hemû tişt ji kes destê pê dike û di kes de encam digire. Kes nikare vê rastiye biguherîne. Li gor hemû tişt ji mirov dest pê dike, em çima xuliqkar nabin û em çima nikarin weke hevalên xwe bibin xwedî nirxên berz? Ya me ji Rêbertiyê dûr dixê çî ye? Ev zinar zinarên çî ne?

Hezkirin pêhesîna girêdanê hîskirinê bi xwe re tîne. Metirsî bi saya van pêhesînan tê hîskirin. Dibêjim; ez girêdayî Rêbertiyê me, lê ez çiqas zehmetiyên Rêbertî dijîn hîs dikim? Ez girêdayî Rêbertî, gelê xwe û girêdayî rêhevalên xwe me jî. Ji ber ev girêdan berhem nade, ez difetisim. Hevala Zîlan dibêje; *“teşegirtina birjûvaziya biçûk û dijmin a pir caran tê dubarekirin, bandorên şerên taybet û xwe sipartina rastiye mîna vê, rexnedayînen cur bi cur dayîn, pir vekirîye ku me pêşve nabe. Ez di wê baweriyê de me ku rexnedayîna herî baş di pratîkek rast re derbas dibe.”* Dixwazim li ser vê destnîşankirinê bisekinim. Dixwazim li kesayeta xwe bînim û bigihim encemekê. Wê sibe nirxandin çêbibin. Ez dikarim li hemberî rastiya Zîlan kesayeta xwe bigirim dest û lêpîrsîn bikim. Ez di wê baweriyê de me nêzîkatiya herî durîst ev e.

Rojbûna Rêbertiyê nêz dibe. Gelê me meşa Amara liderdixê. Dê gelê me di 4'ê Nîsanê de bi çandina şitlan hêvî û bêriyên xwe îfade bikin. Dê ew şitilên wan şîr bibin û bejin bidin. Dê hêvî û bêriyên wan ji nîfşên nû re weke dîrok bimîne. Xwezî li gundê Rêbertiyê yan dara xurmê yan gelyazê çandiban. Mêweyên bihar û payîzê ne, ev darên mêweyê behsa tiştên gelê Kurd jiyîne dike. Ma ger ev 4'ê Nîsanê bi azadî bihata pîroz- kirin dê çî bûya? Ger Rêbertî li gundê xwe bûya û gelê min pêşwazî kiriba dê çiqas xweş bûya. Wê Amara dîsa 4'ê Nîsanê bi dilşikestî pîroz bike. Amara dizane dilê wê di Îmaralî de tê girtin. Hêviya xwe nû dike. Dê Amara bi azadiya dilê xwe dilxweş bibe.

2 Nîsanê 2009/ Ximsê

Merheba kulîlka min a evînê

Êş weke pêlên deryayê xwe li keviya dilê min dide. Di welatê min de rojek bê êş derbas nabe û dengê lorîkan di welatê min de kêş nabe.

Ma gelo ev çaranûsa gelê min e? Ma ev çewisandin çarenûsa jinên Kurd e? Ma divê her tim dengê dayîkên me bilerize û çavên wan tijî rondik be? Ma divê çavên wê her tim li riyan be? Bi yek gotinê ez li hemberî vê jiyana bê wijdan îsyân dikim.

Rêberê min, rojbûna we pêroz be! Mirovahî dikare bi rojbûna we re bibe mirov. Bi vê rojbûnê tenê gelê Kurd û jinên Kurd di riya azadiyê de nameşin. Tenê gelek rizgar nebû, we cîhan xilas kir û azad dikin.

Min dixwest diyariyekê ji we re bişînim. Weke gerîlayekê, weke jinekê tişta ez diyarî bidim we hezkirina di dilê min de ye. Yek jî bi salane bêriyên di dilê min de kombûne. Di nepeniya şevê de dilê xwe li ewran bar dikim û dişînim Îmraliyê. Dilê hemû jin, zarok û gelê min li Îmraliyê lêdide.

Amara îro jî xemgîn bû. Îro jî mêvanê bi çar çavan li bendê bû nehatbû. Mirov hembêz kirin û xweza şîn kirin. Çav û dil bi barana dihat re bûn yek û bêdengiyek hebû. Sedema bi hezaran mirovên li Amara bêdeng kom bibûn nebûna Mirovê Zana bû. Îro bi hezaran mirov bûn lehî Amara tijî kir. Dijmin jî tehemûlî beşdarbûnê nekir û hewl da şitil neyên çandin. Em bi agahiyên bi êş dihejin. Di meşa Amara de du xortên ciwan şehîd ketine. Mirovên xweşik. Hîn di destpêka temenê xwe de bûn, weke hevalên Rêbertî yên egîd bi xendeyek li ser lêvên we, we ax hembêz kir. We jî bi xwîna xwe ev darên azadiyê av dan. We jî weke abîdeya azadiyê cihê xwe di dilê gelê min de girt. Kulîlkên evînê hûn ê qet ti deman neyên jibîrkin.

Em weke hêzên Tetwanê li gor wateya îro me notên hevdfîtina Rêbertiyê li ser bêtêlê guhdar kir. Rêbertî weke hemû caran em jin dîsa ji bîr nekiribû. Her wiha behsa em ê çawa azad bibin û divê em çawa nêz bibin dikir. Di derfetên herî zehmet de jî Rêbertî li me dihizire û ji bo me dixebite. Divê di rojên wisa bi wate de em jî bi wate bijîn û bi wate nêzî hev bibin. Em girêdanên xwe bi hêz bikin. Weke jinek, weke mirov-vek a hewl dide bibe milîtana PKK'ê, dema ez hevalên di nêzîkatî, ni-hêrîn û kenê xwe de fedekariya girêdayî îro nabînim û bi wate nêz na-bin pir bandor dibim.

Min tenêbûna xwe bi Îmralî û Amara re kir yek. Ez îro tenê li Îmralî û baranên Nîsanê hizirim. Erê, ez di baranên Nîsanê de dihatim şuştin. Xislet û taybetmendiyên min ên girêdayî koletiyê yek bi yek dihatin hilkirin. Hestên min pir zêde û kûr bûn. Weke baran bi hestên min re biherike. Ez bi tenê bûm, lê tenêbûna îro ez dehfi riya rast didam û di vê tenêbûnê de kêfxweşim.

4 Nîsanê 2009/ Tetwan

Tevlîbûna şoreşê, çalakiya xwe ji nû ve avakirinê ye

Bi germahiya rojê re berf bi lez dihele. Di vê hewayê xweşik de çiyayê Sîpan pir xweşik xuya dike. Tam li pêşberî çiyayê Sîpanê gola Wanê heye. Em qîma xwe pê tînin ji dûr ve temaşe bikin. Berfa li van warên me qet xilas nebû. Tişta herî xirab jî berfa li ser mangê zû dihele û em her tim ber bi êvarî berfa di palê de kom dikin tînin davêjin ser mangê. Germa li hundir berfa li ser mangê zû dihelîne. Ev jî ji aliyê elwekariyê ve metirsiyê çêdike. Ji ber vê gerîla nikare rêzikan paş guh bike. Ya gerîla dike gerîla rêzik û jiyan e. Me li Başûr berfa li ser mangan kom dibû davêt û paqij dikir, lê em li vir berûvajî wê dikin.

Erê, derfet çawa jiyan mirov diguherîne? Mirov gelek deman neçare jiyan xwe li gor derfetan biguncîne. Em li vê derê pîvana gerîla ya valatî û tijîbûnê pêk tînin.

Nêzî şeş mehe em di bin erdê de ne û cara yek duh du heval çûn peywirê. Ji ber neçariyê hevalan ji tarîbûna şevê sûd girtin û çûn. Vaye hîn nehatine. Dema çay û titûn pir ji zû de xilas bibûn û şeker jî li ber xilasiyê ye. Hevalê Xemgîn û Sabrî bûn ên gava yekem avêtin vê pratîkê. Her wiha yek jî germahiya rojê hildimijînin hundirê xwe. Tama xweşiya biharê dijîn. Hewaya paqij digirin. Hesreta mehan derbas dikin. Bi rastî hevalê Xemgîn û Sebrî bi şansin, peywirên destpêka biharê nabe şansê hemû kesî.

Tevî hejmara me kêm jî bû me perwerde dît. Perwerdeya me li ser mijara rast beşdarbûnê bû. Ez çawa beşdarî partiyê bûm, ez bi kîjan raman, hest û xeyalan hatim? Min ev hemû bi hevalan re parve kirin û

min sekna xwe ya qadro danî holê. Sedema beşdarbûna min a rêxistinê Rêbertî bû. Ez dihizirîm ger ez beşdarî gerîla bibim ez ê bikarim Rêberê xwe ji girtîgehê rizgar bikim. Bi wê bawerî û hestê ez hatim qada têkoşînek dijwar lê dihat meşandin. Dema ez salên derbasbûyî li ber çavan re derbas dikim dibînim ku min sekneke bes nedaye avakirin. Lê ez yeka riya navîn û heta weke temaşevan lê dinêrim dibîmim. Ev yek pir zora min diçe. Lê ev jî rastiyeke. An niha min jî dikariya bi çalakiya xwe bibim bersiv û pergala Îmraliyê parçe bikim.

Ma ji kê re dibêjin qadro? Qadro xwîneke rih bi hizirandinê dide qezenc kirin e. Bi bîrdoziya jê bawer dike dijî û jiyanî dike.

Waneya beşdarbûnê pir girînge. Her waneyek beşdarbûnê destpêkek nû ye û îmza avêtina bin serkeftinan e.

12 Nîsanê 2009

Divê bibim bihar!

Çima gihiştina germahiya dilê mirovekê ev qas zore? Di rastiya xwe de dibe ya herî zor mirov nikaribe germahiya hundirê xwe bide hîskirin an jî di dana hîskirinê de zehmetî bikşîne. Di hinek pêvajoyan de mirov van hestan pir dijî. Dema dijî jî ji ber bi wate nekirine û nav lê nekiriye dixirike. Her wiha her tim diltenge. Her tim weke mirovek birçî ye. Mirovê ku ev dahûrandî êdî ji bo derbaskirina wê dikeve nav lêgerîn û serî li rêbazên nû dide. Di nav van hemûyan de ya herî rast divê mirov germahiya hundirê xwe bide hîskirin. Miroveke nikaribe xwe îfade bike û bide nasîn wê çi qas bikare germahî û girêdana xwe vebêje?

Ez girêdayî gelê xwe me. Lê ez di wê baweriyê de me bi feraseta hezkirinek zuwa, bi girêdanek zuwa û bi ferasetek durist a qilasîk re nabe milîtana PKK'ê. Dixwazim werim ser vê pirs, hest, nakokî û çavakaniya ez anime vir. Em weke mirovên Rojhilata Navîn di pêşkêşkirina hezkirina xwe de girtine. Tevî hinek deman nîrx dide mirovên li hemberî xwe, nêveng û cinsê te lê ev nîrx dayîn berûvajî tê fêmkirin. Mirov bi nêzîkatîya weke tu jê hez nakî, nîrx nadiyî rû bi rû tê. Ez di vê mijarê de xwe

lêpîrsîn dikim. Rêbazeke min a yek aheng heye. Ez bawerim carna ji ber vê wisa dibe. Divê mirov li hemberî cînsê xwe wisa sar nebe. Dibe hinek caran acizbûn û tengbûn çêbibe. Lê divê ev demkî bin.

Divê bi hevalên xwe yên jin ên li gel xwe bide hîskirin ku nîrx dide wan, ji wan hez dike û hêz ji wan digire. Divê ez jî vê bi hevalên jin ên li gel xwe bidim hîskirin. Her wiha divê min kariba di pêkanina jiyaneke xweşik de xuliqar bim.

Girêdanên hestiyar hezkirinên rojane ne. Dikare her kêlî gur bibe û her kêlî bitemire. Girêdanên bi zanabûn û girêdayî kedê bin, girêdanên bi îstîqrar û her demîne. Xwe her tim zêde dike weke genima tê çandin. Divê ez jî weke biharê xwe bi reng bi reng bikim. Biharbûnê di kesayeta xwe de bidim jiyîn.

Ez hêz û moral ji hevalên xwe yên jin digirim. Her çendî ji derve nêzîkatiyên zehmet bêm dîtî, germahiya hevalên jin didin hîskirin besî min dike û bi wan heme. Ez bê wan ne tiştêk im. Ez bi hezkirin û baweriya wan azadiyê dijîm. Dema ez bi hevalên xwe yên jin re nerihe-tiyekê dijîm moralê min dikeve. Ez xwe bêhêz hîs dikim û weke cîhana min hilweşe. Ez qet naxwazim bi hevalek xwe ya jin re tiştên nexweş bijîm. Ji bo neyê jiyîn ez ê baldar bim. Ez ê li hemberî nêzîkatiyên xwe yên çînî tîk neçim û şerê herî mezin li hemberî qereqtera xwe ya çînî bidim.

14 Nîsanê 2009/ demjimêr 12.45 şev

Merheba hevala ez êşa wê dijîm

Îro platform çêbûn. Ez di rêza sisiyan de bûm. Destpêkê platformên rêveberiyê hatin çêkirin. Her platformek çekeke ku mirov ji nû ve da-fîrîne, lê ger bê rêbazî çêbibe berûvajî wê jî tê jiyîn. Rexneyên bê rêbaz û bê uslûb tên kirin dikare mirov lewaz bike. Rexne- rexnedan di nav tevgera me ya azadiyê de pira destpêkek nû û ketina ser riya serkeftinên nû ye.

Dema ev platform çêbûn sê hevalan ne pirsek pîrsîn û ne jî rexneyek kirin. Ev nêzîkatî ez acizkirim û min nikarî xwe bigirim ez çûm min pîrsî

û got; “hûn çima nanirxînin?” Pirsê min bê bersiv ma. Ev helwest tê wateya ez we rexne nakim, hûn jî min rexne nekin bû. Dema platformê dest pê kir min îfade kir, wê rexneya her hevalekê ji bo min bibe alîkarî. Min ev bendewariya xwe ya jî bo hevalan anî ser ziman.

Em îro dîsa ji ber tûpê bi jehrê ketin. Min tevî bê taqetîya xwe hewl da xwe vebêjim. Di destpêkê de kelecane ez girtim û çongên min kêmek lerizîn. Ji ber tu sekna xwe li hemberî Rêbertî, şehîd, xeta azadiyê digirî dest û tu soz didî Rêbertî, gel, berxwedanvanên li girtîgehan û xeta azadiya jinê. Giraniyek wisa dikeve ser milê mirov nikarim behs bikim. Soz temînata jiyan û serkeftinê ye.

Tevî êşa di serê min de min xwe ji hevalan re vegot û hevalan jî rexneyên xwe pêş xistin. Rexne li ser bingeha rêxistinbûn û nekûrbûna bîrdoziyê bû. Yek jî nirxandin li ser nikarim rexneyan rakim çêbûn. Dema ez hemûyê digirim dest platform di mirov de lêhûrbûnê da avakirin.

15 Nîsanê 2009

Seknên nayên partîbûnê

Îro platform bi encam bûn. Dîsa kesayetên nayên partîbûnê xwe dan axaftin. Du hevalan sond nexwarin û rûniştin. Di derfetên normal de pêwîst bû ketiban girtîgehê û bihatan girtin. Ji ber du girtî hene em nikarin vê bikin. Ew jî wêrekiyê ji vê digirin. Yek jî dubare dixwazin biçin Başûr. Ji ber bê biryarbûnê zêdetir optûnîzm tê jiyîn. Ger ev soza xwe ji bo Rêbertî, şehîdan nû nakin û vê bi zanabûnê dikan, wê demê hemû tişt ji van kesayetên tê payîn. Soza xwe li hemberî Rêbertiyê nû nekin. Her wiha bê rûmet li cihê xwe rûniştin. Çiqas nêzîkatîyên xortan ên bi lanet hene! Divê çi bikin û çawa fêm bikin? Wisa bi jiyana me difîzin. Di jiyan, rabûn û rûnişkandina xwe de bêhna zîhnîyeta zîlamê desthilatdar tê. Heta dawiyê xweperestî û rêxistin nejiyîn heye. Pergal û dijmin wisa bi van kesayetên lîstîye dikarin heta dawiyê ketîbûnê bijîn.

15 Nîsanê 2009

Merheba

Bihar li rûyê me kenî. Me sermaya zivistanê li dû xwe hişt û pêngava pratîka destpêkê avêt. Min berê eniya xwe da rojê, çavên xwe li stêrkan xist, dilê xwe noqî şîniya zelal a asîmanan kir û bi gavên pola dikevin ser rê. Di şiveriyên bihar, deşt û çiyayan de...

Erê, kulîlka min, tu bûka biharê yî, bihar bi te re xendeyan belav dike. Bi hemû mûhteşembûna xwe ve hezkinê belav dike. Bihar bi te re destê pê dike û bi te tê pîrozkirin. Di bayên te yên hezkinê de ji dayîk dibim.

Veqetîn dikeve nav xemzên min, ji rondikên çavên min gol çêdibin, tamek tûj xwe li hebûna min dipêçe û di nav êşan de digevizim. Di nîvçemayîna jiyanê de noqî temaşekirina çiyân dibim. Aliyek min dibe sî, aliyek dibe hesret. Nebûna te deryaya xemgîniyê ye di dilê min de. Ger sal jî derbas bibin, wê ev bêrî û êş her tim zindî bimînin di dilê min de. Kulîlka min, ger tu bifirî û biçî jî ez bi te re dijîm. Bîranînên te hem derdê min, dost û hevala tenêbûna min e.

Piştî mehan em ji wargehê derketin. Vaye bihar hîn nehatiye Tetwanê, berfê ax xistiye nav kulamên xwe. Kelecana çûna peywirê dijîm. Ez ê warên min nedîtine bibînim û ez ê şansê dîtina hevalên min bêriya wan kirî bibînim. Dema ez ji wargehê derketim hesteke xerîb xwe li min pêça. Piştî mehan ji wargehê re dibêjim di nav xweşiyê de bimîne. Em sê heval ketin ser rîyan. Ez, hevalê Bawer û Sebrî di rê de ne. Rêzanê me hevalê Bawer e. Wê me di xeta Tetwanê de bigihîne Oraxê, hevalên hatine wir bigire û vegere wargehê.

Ji ber bi mehane em nemeşîne, em hinek zehmetî dijîn. Tayebet şeva reş xweza dîl girtiye û em bi zorê pêşiya xwe dibinin. Dijwariya bayê weke şimaqekê li rûyê me dikeve. Em ji bo ji hev veneqetin bi baldarî nêzî dûrahiyê dibin.

Rê xilas nabe û bi şaşkirina rêzanê me ya rê em xwe li cihekî nas nakin dibînin. Em ji hal ketine û westandin serweriyê li ser bedenên me pêk tîne. Em di nav daran de xwe bi cih dikin. Destê min çadirê nagire û bi alîkariya hevalan em çadirê vedikin. Di meşê hemûyê de baranê zehf li me kir û dîsa dema razanê hewl didim xwe ji baranê biparêzim. Ji ber

min tişteki ji bo bin li gel xwe neaniye heval ji bo parke û singerê xwe bidin îsrar dikan. Ji bo qebûl nekim min çi kir nikarî wan zarî bikim û min parkê hevalê Sebrî girt. Ji serma direcifim û ez bi ser hev de çûme. Min xew daye aliyekê û demek berî demekê dixwazim bibe sibe. Ez agir xeyal dikim, bi hêviya agirek mezin di bin baranê de dibe sibe.

Dema dinya ronî dibe ez dibînim em li hember gundek hatî valekirî ne. Em piştî keşfa xwa dikan xwe davêjin gund. Hema em agirek mezin pêdixin. Piştî em germ dibin çay ji vedixwin. Piştî vê westandinê ev agir weke dayîkekê ji me re germ tê û dilê me germ dike.

Rêzanê me hîn tam nizane em li ku derê ne. Piştî çavdêrîkirina arazî û şûnde bi alîkariya hevalê Sebrî me fêhm kir em li kîjan gund û li ku dera arazî ne. Tu nabêjî heval berê diçûn vî gundî. Piştî keşfê ken bi me ket. Hevalê Sebrî gund bi navê gundê hevalê Bawer îlan kir. Ji ber di berê de kesê li pêşiya hevalê Bawer ev gund keşf nekiribû ev gund dibe yê wî. Êdî hevalê Bawer nikaribû xwe ji henekên hevalê Sabrî xilas bike.

Me piştî fêhm kir araziyeke bi ewleye, em bi rê ketin û me meşa xwe ya esasî berdewam kir. Em tama xweşiya bihar û meşa bi roj dikan. Em nikarin çavên xwe ji dîmenên mirov jê têr nabin bizivîrînin. Em her ku ber bi lûtkeyan diçin aram dibin. Êdî gola Wanê xuya dike. Sîpan û Xelat tên dîtin. Ronahî bi pêlên golê re direqisin. Piştî meşa şevê du şevan em digihin Tetwanê. Em ji dûr de temeşeyî Tetwanê dikan. Me piştî xwe daye çenteyên xwe, em ji aliyekê ve şekirê cejnê dixwin ji aliyê din ve jî noqî sihbeteke kûr dibin.

Bayeke hênîk tê, dema bi xwêhdana me re dibe yek recifandinek kêmkirî xwe li bedena me dipêçe. Dema ez bi tama gerîla li vê dîmena bi heybet dinêrim mirovên xweşik yek bi yek tînin bîra min. Hûn tenê ji vê xweşîkbûnê kêmkirî in. Wê ev kêlî bi we re hîn zêdetir bi wate biba. Ez dema van kêliyan dijîm, tu di çi rewşê de yî? Ez ji bo te jî li van xweşîkbûnên Kurdistanê dinêrim. Bi hîskirina hev jiyîn hevdiyanê herî berzin. Ji ber vê veqetîna tenê mezin dike. Min ji bêrî, hezkirî û can dostên min venaqetînin. Bi rê de diçim, hemû rê te vedibêjin.

28 Nîsanê 2009/ Tetwan

Min ti deman jibîr nekir

Piştî meşek dirêj em gihiştin gundê Oraxê û em ê li vir hevalan pêşwazî bikin. Ez bi kelecanim. Em bi çar çavan li benda wan in. Piştî mehan em ê hevalan bibînin. Ez henaseyek kûr dikşînim û wê êdî dawî li jiyana me ya bi qirîz bê. Li gor wextê me destnîşan kirî divê li vir ban. Lê hîn nehatine. Em li bendê dimînin û di vê bendêmayîn de roj derbas dibin. Ji ber bêtêla mezin xirab bûye em nikarin peywendiyê çêbikin. Êdî em pir zirvêr dibin. Ger di planlamê de hinek guhertin hatibin çêkirin jî agahiya me nîne.

Em tam li vir deh rojan li benda hevalan man. Rêveberiya herêmê nehat. Hevalên wargehê hatin gihiştin me. Bi qasî em fêr bûn di planlamê de guhertin çêbûne. Rêveberiya herêmê nayê û em ê biçin geliyê Şêx Cuma. Ji ber ez ê hemû hevalan bibînim kêfxweşim. Ez ê dîsa Sîser, Kember û Kurîs bibînin û ava wê vexwim. Dema ez ji Şêx Cuma veqetîm bi dilşikestî veqetîbûm, ez xeydî ji hevalan veqetîbûm. Herî kêr ferseke ji bo ez van dilşikestinan derbas bikim. Ez ê gulên xwe yên xunçe yên min li çiyayê Sîser veşartibûn bibînim. Ez ê dil, êş û bêriyên xwe ji çiyayê Sîserê bêjim û yek jî ez ê lêborîna xwe ji wan bixwazim.

Êdî em li lûtkeyên Kember in û ronahiyên Sêrtê çavên me kor dike. Warê min pir nêz xuya dike. Kember bi kirasê xwe yê bûkaniyê me pêşwazî dike û hemû cih berfe. Ez koma gerîla ya di tarîtiya vê şevê de dimeşe dişibînin xalxalok û moriyan. Kedkar û moriyên li ser berfa spî tevger dikin.

Balafir bi ser me re derbas dibin. Gelo niha difirin kîjan welatî. Ma kî dizane dibe niha her rêwiyek çîrokek xwe ya cuda hebe. Ez temaşeyî balafirên bi rêzê difirin dikim. Min biryar da ez îşev stêrkan nerihet nekim.

14 Gulanê 2009/ Kember

Dayê

Salek din jî derbas bû
Min nekarî silavekê bişînim dayê
Bêrî di dilê min de girtîne
Her bêriyek di çavên min de tebitîne
Bihar li dû hev tên
Kulîlk dostên hev in
Çiya hezkirina min e
Okyanûs evîna min e
Hezkirina min robareke di welatê min de
Dema bêhna çiyar dikşînim hundirê xwe
Bi bêriya dayîkê xwe dispêrim çiyar
Dema çongên min diwestin
Çavên min dikevin xewê
Xeyalê dîtina te dijîm
Wek zarokek winda bûyî
Li te digirim dayê

Êdî pênuşa min nanivîse
Hestên min dîlgirtîne
Dixîşikim li dû bêriyên xwe
Bila çavên min tijî rondik nebin
Min bi hevalên min re bibîne û bêhn bike

Ger silavek min nekeve nav kêfa destê te

Wê silavên hevalên min bikeve dilê te

Weke silavên min hembêz bike

Min bêriyên xwe yên ji bo te

Li çiyên neqîşand

Kenên te yên şîr maç dikim

Hesreta min awirek dişewite ye

Dayê!

Peyv dengvedana dilê min in

Dayê!

Tu hevala min

Û giyana min î

Bi bêriyên te rê dikevim

20 Gulanê 2009/ Şêx Cuma

Merheba

Pîştî mehan roj li rûyê me kenî. Pîştî mehan kabûsên me bi dawî bûn. Em yeke hemû çûn geliyê Şêx Cuma. Me li wê derê pîrsgirêk di zemînek rêxistinî de nîqaş kir û bi çêkirina serweriya rêxistinê em ji pîrsgirêkan xilas bûn. Min dixwest hîs û bîranînên xwe li ser van rûpelan ji Kember û Sîser re vebêjim. Dema min a vegotinê çênebû. Ji ber vê ez tenê dixwazim mizgîniya xilasbûna ji kabûs bidim.

Di encama civîna de ji aliyê rêxistinê ve hatî çêkirin komisyona lêpîrsînê derket û yên girtî lêpîrsînkirin. Ji me jî agahî girtin. Bi rojan civînê berdewam kir. Ew qas bûyer rûdane û em tijî bûne bi vegotinê

xilas nabe. Bi mehane em di nav de dijîn. Hevalê li vir jî bi me re dijîn. Bi sebrek mezin guhdar dikin. Hinek caran dikenin, hinek caran hêrs dibin, hinek deman jî moral didin û hewl didin tiştên me jiyîne bidin derbaskirin. Ez hinek caran dihizirim weke em tam fêma nekirine gazindan dikim. Di encam lêpîrsînê de sekna jina paşverû hat dahûrandin. Hûr û kûr rexne hatin kirin. Me jî di kesayeta hevala jina girtî de nebesiyên xwe lêpîrsîn kirin. Jinek bi vî şêwazî li hemberî me sekinandin ji aliyê me ve jî pir zor bû û dema min nirxandîn kir min pir zehmetî kişandin. Ew li hemberî paşverûtî, lewaziyên xwe binketibû û xwe sipartibû kendalan. Xalên ku xwe tê de da lêpîrsînkirin hîn kêmin. Hewldana hemû hevalan rastiye bi wê bidin fêmkirin û jinek dikare çawa azad bibe. Bîrara di encama platformê de hatî girtin şeş mehan pêvajoya xwe peyîvandî bû. Em nikarin ji ber şert û mercên Bakûr endamtiya wê bisekinînin. Pêvajoya girtinê bi dawî bû. Wê êdî ew jî rihet bibe. Me vesaziya wê jî çêkir. Dê biçe cepheya din. Ger encamek baş ji van tiştên jiyayê derbixe, dikare pêşketinek mezin ava bike. Niha hemû tişt girêdayî hewldana wê ye. Alîkariya pêwîst bû rêxistinê da.

Platforma girtiye din jî çêbû. Giran derbas bû. Ji ber sûcên kirine jî pêwîst e giran be. Hewl dida xeta Dr. Elî li vê derê bide meşandin. Qirêjiyeke di zibîlxana tasfiyetkaran de peyda bibû û me bi vîna rêxistinê ev qirêjî paqij kir. Bi feraseta reformên civakî, pratîk, feraseta jiyanê bê esil, tiştên kirine, çetegerî, avakirina koman, lîstina bi hevalatiyê, bi xeta jina azad lîstin, jiyan xirab kirin û ev hemû bi raya ji rêxistinê girtî bi kar aniye, berpirsariya xwe xirab bikaranîn û her wiha tiştên kirî me hemû dîsa danîn holê. Em di kesayeta vî zîlamî de dibînin mirovê xilasbûyî dikeve çî rewşê û dahûrîn dikin. Miroveke xwe bi çand, ehlaq, bîrdozî û wijdana PKK'ê ava neke mahkûmê di çerxa pergale de bifetise. Ev mirov jî di nav paşverûtiyên xwe de difetise. Wî li gor xwe qebir kolabû, ev qebir ji bo rêxistinê kolabû lê ne di ferqa hêz û mezinbûna rêxistinê de bû. 20 sale di nav nêvenga rêxistinê de ye, bi fîzîkî di nav me de ye lê weke zîhîn tîpeke şansê xwe ji jiyanê PKK'ê negirtiye. Ger ev mirov ji rêxistinê were avêtin jî wê biçe civakê xirab bike. Em ê bişînin Başûr, dê li wir lêpîrsîna wî were kûrkirin. Em ji vê belayê xilas bûn, êdî pîrsgikêrek astengiyan li pêşiya me ava bike namîne. Ez xwe bi

qasî çûkekê sivik hîs dikim. Ez di hemû hevalan de rihetbûnekê dibînim. Bi kelecanim, dixwazim demek berî demekê biçim pratîkê û tiştêkî bikim. Dixwazim li Xerzanê bi rengê jin xweşîkbûnekê ava bikim. Ez nikarim vê dema windabûyî paşde vegeînînim, divê herî kêr ez vê dema li pêşîya xwe bi xweşîkbûn û serkeftinan dagirim. Êdî demek berî demekê dixwazim biçim Tetwanê.

Rojên me bi civînan derbas dibe û vasazî jî hatin çêkirin. Hevalê Bedran û Bager nû hatin yekeyê. Hevalê Hewrê, Demhat û Adil jî yekeyê veqetîyan. Wê jî niha û pê ve rojên me li Tetwanê zêdetir bi hêz derbas bibin.

10 Hezîranê 2009

Çiyayê Sîser û hêviyên min

Ez xwe dispêrim te çiyayê Sîser, wek dayîkekê min hembêz bike. Ez bi te jî nû ve bi coş bûm û jî nû ve jî dayîk bûm. Sîser min bi te re heybetbûna Bakûr, pîrozî, hevaltî, lêgerîna xwe avêtina azadiyê dît.

Çav û dilê min bi te re ber bi deryaya hêviyan ve çû. Min bi te re dest bi hilmijîna bayê Bakûr kir. Min hesreta salan bi te re da derbaskirin. Warê min ê destpêkê û hembêza dayîkê. Min bi rastî, şaşî, sergermî, lêgerînên xwe yên azadiyê, bi hesreta hevaltîyê re weke zarokekî di dilê te bi çalapkî meşiyam. Tu malzaroka êş û kêfxweşiyê min î.

Ez hinek caran girîm û hinek caran hêrs bûm. Min hinek caran îşyan kir. Min hinek caran bi qasî zarokekî xwe azad hîs kir. Min xwe weke gerîlayekê jî kêfxweş hîs kir. Kêliyên herî zêde ez rastî xwe dihatim bû. Min li vê derê rastiyan jiyane yên bi êş jî dîtî. Ev rastî dilê min birîn kir, xeyalên min êşand û pêşeroja min xist nav mijan. Ez bi ketin û rabûnê fêrî mezinbûnê bûm, min hewl da xwe ji sergermiyê xilas bikim û ez gihiştim.

Çiyayê Sîser, piştî mehan ez dîsa li hemberî te me. Bîranînên min yek bi yek zindî dibin. Hestek kûr xwe li min dipêçe. Dema ez li te dinêrim

hestiyar dibim, ne di destê min de ye. Dikarim kîjan hevokan vebêjim!
Bila ev hestên min jî bi min re veşartî bimînin. Tiştên tu hîs dikî ez jî hîs
dikim, ev besî min e. Ez di hembêza dayîkê de firiya û firiya warên
dûr. Her wiha ez dîsa li te vegerim û beziya xweşîkbûna te.

Dixwazim bi te re di bêdawîbûnê de werim veşartin. Dixwazim weke
nêrgîzekê di hembêza te de şîn bibim. Tu yê wî şansî bidî min? Nehizire
ez xeyîdî me, ji ber pir ji hevalên xwe hez dikim ez wisa dihezirim. Her
ku ez sînga xwe didim ber zehmetiya zêdetir bi te ve tîm girêdan.
Şoreşger gavan bi paş de navêjin, her tim gavan ber bi pêş ve davêjin.
Weke çiyayê Sîser serê wan bilind e û bi serfirazî asîmanan silav dîkin.

Ez bi rondikên çavan ji vî geliyê veqetiyam, ez hêdî hêdî ji van deran
dûr ketibûm. Min gotinên xwe yên dawî jî neqêrîbûn û weke avek
bêdeng veqetîbûm. Bê ku bihezirim ez ê carek din bibînim weke qulin-
gekê firîm û çûm. Hîn xwîn ji dilê min tê çiyayê Sîser. Ez fêrî vî birînê jî
bûm. Ev birîn bû parçek min. Êdî ez gazindan nakim, lê ji rêzê jî nêz
nabim. Bi hemû vekirîbûna xwe ve wateyê didim tiştên min jiyîne û
birîna xwe. Ji ber vê êşên te ji bo min bi nîrx tê. Bê ku hêsanbûnê bijîm
bi hilbijartina zehmetiya dijîm. A girîng serxistina zehmetiya û bi vîna
xwe ya cewherî ji heqê wê derketine.

Min dîsa dixwest bost bi bost li te bigerim. Min dîsa dixwest bes te
bibînim, axa te bixim kulma xwe û li ber bayê berdim, min dixwest ji
kaniyên te yên cemidî tîr av vexwara. Min dixwest bi heybeta te hezar
silav ji hevaltiyê re bişanda. Ez di palên Kemberê de hesretan didim
derbaskirin. Ez ji dûr ve Kurîs dibînim. Wê jî serê xwe rakiriye û dibêje,
ez li vir im, banî min dike. Ez ji dûr de destê xwe dihejînim. Hemû tişt
mûhteşem xuya dike. Bîranînên xwe li van warên mûwazam zêde di-
kim. Dubare dîtina van deran pir xweş e! Dê ev gelî her tim biharê bijî.
Ez ê bi hemû xweşîkbûna xwezayê şerê azadiyê bidim û bijîm. Ez ê her
tim ji çiyayê Sîser hez bikim, xwe bixim hembêza wê û wê dost bizanim.

17 Hezîranê 2009

Gerîla

Gerîla her tim rêwî ye. Di war û xeyalan de nahewe. Gerîla di ahenga xwe de geştyarek e. Dil û hizirandinên wan ber bi dema bê ya xweşik ve dibe. Mal û halê wan li pişta wan e. Her zinar, dar, gelî û çiya mala wan e. Hinek caran bi sivikbûna çûkekê ji wî çiyayî difire wî çiyayî, ji wî geliyî difire geliyê din. Hinek caran jî barê wan pir girane, giran dibe û bi gavên giran dikeve ser rîyan.

Ev giranî ne wek tê hizirandin ji ber barê giran rakiriye. Ev giranî ji ber nebûye bersiva gel, Rêbertî û hevalên xwe ye. Hêviyên her gerîlayekî hene. Hêviya her yekê bûna şervanê leheng ê gelê xwe, daxwaziya wan tenê bûna bersiva Rêbertî û bikare hezkirina xwe biqêre. Gerîla bê ku guh bide zehmetiyên xwezayê bi rihê xwe yê berxwedêr bi serbilindî dijî. Gerîla evîneke dest jê nayê berdan û gerîla nayê vegotin tenê tê jiyîn. Ger sal jî derbas bibin tu ji jiyana gerîla têr nabî. Rih û qerektêra gerîla azad e. Mirovê bigihe vî rihî, mirovên binakevin.

Me weke hêza Tetwanê dest bi pratîkê kir. Hevalê Bawer û Bager yekîneyên dijmin ên veşartî dibînin û bi karanîna însyatîfa xwe çalakî dikin. Kuştî û birîndarên dijmin hene. Hejmara me bi giştî heftin, koma me ji du hevalên jin û 5 hevalên xort pêk tê. Em dixwazin ji bo pêngava 1'ê Hezîranê amadekariyan bikin. Dijmin li her derê kemînan datînin. Em carna rû bi rûyê hev tên.

Pêşngê me hevalê Bawer û Sebrî ne. Dema ber bi cadê ve diçin bi leşkeran re rastî hev tên. Leşker qêr dikin û dibêjin hûn kî ne, heval jî xwe davêjin aliyê cadê yê din. Bi gavên lez li robarê diherike didin û xwe ji cihê kemînê dûr dixin. Dijmin bi navber guleyan davêjin. Em jî bi dengê guleyan re paşde vegeriyan. Hem plana me hem plana dijmin sabota dibe. Em îşev nikarin biçin peywirê. Cihê em lê bi cih bûne ji ber pale em nikarin razin û bi vî rengî dibe sibe. Ba hîn bi awayek şêtan wedize. Çavdêrê me hevalê Xemgîn bi vê wezîne re daran dişkêne. Êdî demjimêra pêxistina agir hatiye, demek berî demekê dixwazim germ bibim.

Ber bi êvarê em pênc heval ketin ser rîya Tetwanê. Du hevalên me jî ber bi geliyê Şêx Cuma ve bi rê ketin. Em di deştê re derbas dibin. Piştî em bi demjimêran dimeşin bi lûtkeyan ve hildikşin. Demjimêr duyê

şeve û hîn em di rê de ne. Ez hîs dikim pir westame, heval hemû westayî xuya dikin.

Em her ku bi lûtkeyan ve hildikişin hîn bi eşkeretir Tewanê dibînin. Ev dîmen westandima me hemûyê dide jibîrkirin. Gund û navçeyên Tetwanê her weke pelên gulan ew dorpêç kiriye. Em hemû bi heyranî temaşeyî vê dîmenê dikin. Kolan û cadeyên Tetwanê bêdengin, ti tevger lê nîne û tenê ronahiyên wê dibiriqin. Rêbertî ji Tetwanê re digot; “welatê min ê xweşik.” Bi rastî cihek xwedî navê xwe ye. Hevalek jin a di girtîgehê de digot; “dixwazim akademyek jinan li Tetwanê vekim.” Ji van axên xweşik silav û hezikirinên xwe dişînim.

Hevala min a jina xweşik, weke te akademî li van deran avakiriye temaşê dikim. Ji nav kenê gulan silav û hezikirinên xwe ji we rêhevlên bi rihê berxwedanê di girtîgehê de ne dişînim.

Rêberê min, em qîmeta van warên mûwazam nizanin. Ji ber em bi xwe re mijûl dibin, bela xwe li tiştên basit didin hestên me kor dibin û em nikarin bi tama gerîla bijîn.

Rêberê min, her çendî hinek xal bi zehmetî jî be û ji min re bi nakok were jî, ez dûrî evîna xwe ya gerîlabûn û kelecana xwe nakevim. Ez ê her tim bi hêviya serxistinê bikevin ser rê û nakokiyan bi têkoşînê bidim fêmkirin. Ez ê di têkoşîna hundirîn de jî tûj û rêxistinî bim. Bi vê zanabûnê hewl didim bijîm.

Bi kelecanim, demek dirêje hevalên jin cihê xwe li Tetwanê negirtine. Ji ber vê ez xwe bi şans hîs dikim. Ez wisa dihezirim tiştêk bi qasî mirov bi ked û hewla xwe nix li ser nix zêde bike xweşik û watetir nîne. Zehmetî çavê min natirsîne. Ji hevalan bendewariya min tenê hinek ferasete. Ez nabêjim bê ferasetin, lê cîhana min a hundirîn û qerktera min zêdetir pêwistiya wê bi nîvenga bi feraset heye.

Mizgîna min, bû demek dirêj, divê ez di tama evînê de gotinan ji te re binivîsim. Tu dizanî ez evîna xwe ne bigotinan, bi dil û çavê xwe vedibêjim. Her çendî ez evîna xwe veşêrim jî çavên min, min dide dest.

Mizgîna min, ez li cihê te û heval Dilgeş li dîmenê Tetwanê yê bi heybet temaşe dikim. Giyana min, min pir bêriya te kiriye û pir ji te hez dikim.

19 Hezîranê 2009

Kurdistan welatê bihûstê ye

Baran nizane bisekine. Peywira me ya çend rojan berdewam dike. Ji bi saya vê peywîrê şansê me yê dîtina erdnîgariyê jî çêbû. Ji bo gerîla û şer arazî hêmana herî bingeînê.

Em Tetwanê li pişt xwe dihêlin û dibin mêvanê deşteke bi ewran hatî pêçan. Tu çi bixwazî li vê deştê heye. Weke her cihek wê bi şêwazek cuda hatibe nexşandin. Ji ber mijê hemû gelî pêçaye ez xwe li ser ewran hîs dikim. Dema mij winda dibe, hewayek paqij peyda dibe, baxçe wisa zindî û xweşik xuya dîkin. Tam di naverasta deştê de çiyayê ziyaretê heye. Ev çiya weke kelhekê disekine. Riya Norşîn û Tetwanê di vê deştê re derbas dibe.

Ev deşt demekê baxçeyê Koçeran bû, lê mixabin îro ala Tirkan li hewa diheje. Deşt ew qas mezine hemû tişt wek moriyan xuya dîkin. Nepêkane ku mirov li vê deştê binêre û axînekê nekşîne. Niha ev dešta xweşik di bin sîha dagirkeran de ye û dagirker li ser cirîtan davêjin. Divê mirov vê bisekinîne.

Min behsa hevalên nû hatine yekeyê kiribû. Bi vê peywîrê re zêdetir fersenda ji nêz ve naskirinê çêdibe. Em li derdora agir kom dibin û noqî sihetên kûr dibin. Em pirsan ji hevalê Bedran dîkin, ew jî paşeroj û bîranînên xwe parve dike.

Hevalê Bedran di sala 1997'an de beşdarî nav refên gerîla bûye. Berî wê jî li Yûnanîstanê di dewreyek perwerdê de maye. Dema di wê pêvajoyê de bi telefonê bi Rêbertiyê re daxive dibêje; “ez ji Baykanê me.” Rêbertî jî ji wî re gotiye; “dema tu çû welat biçê Xerzanê.” Hevalê Bedran jî soz dide û vê soza xwe di sala 2008'an de jiyani dîke. Berê li Bakûr maye, lê nehatiye Xerzanê.

Temenê hevalê Bedran pir derbas bûye û fîzîkî jî zehmetî dijî. Hewl dide nîvengê bi van zehmetiyên xwe nede hesandin. Ew jî weke me ji hilkişîn û evraziyan hez nake.

Ez van rojan xewnên balkêş dibînim. Ez nizanim ez ê bi çi şîrove bikim. Min hevala Rengîn, hevalê Bahoz Erdal û hevala Şefaq di xewna xwe de didît. Her wiha çawa be ez bi hemûyan re daxivim, gazindan dikim, aciz dibim û dibêjim; “ez hinek tiştan rast nabînim.” Divê ez van xewnan bi çi şîrove bikim û encamên çawa derbixim? Gelo ji ber bendewariyên min ji wan hene van xewnan dibînin. Ez di xewnên xwe de jî geştiyarek im û her tim digirim. Ez li qevdek hezkirin, hevaltî û azadiyê digirim.

20 Hezîranê 2009

Merheba

Nêzîkatiyên bê bawer ên li hemberî jinê hene. Xwe hîn zêdetir di vê pratîkê de dide nîşan. Xort şaş jî bike normal tê dîtin. Lê ger jinek vê şaşiyê bike bi awayekê tê teşîrkirin. Di nav van hemûyan de tiştê herî girîng baweriya jinê ya bi xwe û hemcinsê xwe ye. Nêzîkatiyên bê bawer jinê pasîf dike û dibe sedem dereng bigihe. Zîhniyeta zîlamê desthilatdar ti caran bawer nake wê jin hinek tiştan bi ser bixe. Ji ber tenê xwe hêz dibîne, esas digire û xwe diecibîne. Her çawa be paşayê cîhanê ye! Her çawa be navenda jiyanê tenê ew e, nabe cuda navend hebin! Li gor vê zîhniyetê ger jin şoreşger jî be jin e, ji ber vê têgeha serkeftinê ji wê dûr e. Zîhniyet û bergeha wî ev e. Ya herî girîng baweriya jinê ya bi xwe ye û bi vê baweriya cewherî gav avêtine. Ji derveyî vê ger bawerî ji cinsê xwe jî girt li pêşiya wê kîjan astengî hebe dê derbas bike. Dikare kelhan birûxîne, paşverûtiyan bihelîne; ango dikere bi ser bixe û paskên xwe ji bo azadiyê veke. Ez rengê azadiyê di jiyana xwe de xêz dikim, kêlî bi kêlî tam dikim û bi lûtkeya erdembûnê ve hildikşim. Te jî digirim gel xwe û bi rê dikevim. Te di şînahiya asîman de xêz dikim.

23 Hezîranê 2009

Bi rengê jinê keşfa jiyanê

Yekeya me bû sê kom. Komêk dê bi rêzaniyê re mijûl bibe, komêk çû hevdiînê bi gundiyan re pêkbîne. Em jî keşfa qereqolê dikan. Em veşartîbûnê esas digirin. Cara yekem em hevalên jin tenê xebatên keşfê bi rê ve dibin. Piştî salan di binya qadê de em destpêkê pêktînin.

Em du sê rojan keşfa xwe dikan. Erênî derbas dibe. Em hemû agahiyan digirin. Îstixbarat tenê maye, em wê jî bigirin keşf temame. Em li girek stratejîk in. Di berê de dijmîn ev der girtine û ji bo çeperan gelek dar birîne. Em jî niha di van çeperan de temaşeyî dijmîn dikan. Dema dijmîn li lûtke û geliyên kûr li me digere em li hemberî wî ne.

Hevala jin a li gel min rojbûna beşdarbûna wê ya partiyê ye. Pênç salên xwe yên di nav rêxistinê de temam kirin.

Em li vî girî bi heyrantîyek mezin li derketina rojê û li tavaheyvê ya bi me re dikene temaşe dikan. Me jî bi ahenga xwe re dibin. Roj û şev ew qas bêguneh dewrî hev dikan. Dema dibe roj jî, dasika heyva ji şevê mayî wisa bêdeng hevaltîyê ji rojê re dike. Dema roj xatirê xwe ji me dixwaze cihê xwe ji tavaheyvê re dihêle. Stêrk jî li asîmanan di nav pergalekê de cihê xwe digirin. Her wek li şanoyê temaşe bikim li min tê.

Em 30'ê Hezîranê jî li gir derbas dikan. Zîlan xwedawenda me û xeta jiyana me ye. Em jî jinên di robarê Zîlanê de xwe dişon û hewla azadiyê didin. Xeyalê her yek ji me di xeta Zîlanê de veguherîna çirûskeke ye. Ger dê jiyanek hebe divê bi tarzê Zîlanê be. Ti wateya jiyanek ji derveyî vê nîne. Hevala Zîlan dibêje; “xwezî tiştek ji canê min zêdetir heba min bidaba,” bi vê biryarbûnê bi ser dijmîn de diçe. Divê em jî bi vê îdea û biryarê bi ser jiyana xwe de biçin û bi ser dijmîn de bimeşin.

30 Hezîranê 2009

Rûheyva min

Bi germahiya Tîrmehê te hembêz û maç dikim. Ez îro nikarim li te ne-hizirim. Her Tîrmeh straneke veqetîna ye di jiyana min de. Dema Tîrmeh digihe, hinek din jî qevdek veqetîna ji me re hiştin. Her çendî Tîrmeh navê veqetîna ji be, di heman demê de wexta hevdiînê ye jî.

Rojbûna te pêroz be xendeya heyva min. Hêvî dikim îsal ji hemû salan xweştir û dilxweştir derbas bibe. Daxwaziyên xwe di nav deryaya hestên îro de bi bayê re dişînim, bila daxwazên min bibin agirê serkeftinê. Yek jî qevdek hezkirin ji şerê xwe yê rûmet û hêza xwe ya berxwedanê ji te re dişînim.

1 Tîrmehê 2009

Hevdîtina bi Mirovê Zana re

Rêberê min, dema ez di nav heybeta van çiyayan de bi rê dikevim, aliyek min her tim dibe xemgînî. Xweza mûkemel xuya dike, roj hemû deman hezkirina xwe diyarî me dike. Xweşikbûn hemû li derdora me bûne xelek. Di nav van xweşikbûnan hemûyan de li we dihizirim. Nikarim silavekî ji we re bişînim, lê di xewnên xwe de digihim rûmeta dîtina we.

Rêberê min; min şevê din hûn di xewna xwe de dîtî. Em di mangên xwe yên me li Başûr çêkirî de bûn. Hawan- obûs dihat avêtin. Ji bo tiştek li we neyê min hişk hûn hembêz kiribûn. Ji aliyekê ve hûn ê aciz bibin min bi dudilî temaşeyî we dikir. Hevalek din jî li gel me bû, wê jî dîmen digirt. Piştî re min di hundirê xwe de digot; ev mange ne sexleme, ger ev dîwar hilweşe em ê çî bikin, divê ez Rêbertiyê ji vir derxînim. Rêbertiyê nedixwest derkeve, lê me îsrar dikir. Hevala li gel me kamera dixist destê min û digot; hinek tu dîmenan bikşîne. Min di wê tevlihevîyê de kamera dixist destê xwe û dîmen digirt. Di wê demê de tarîbûn çêdibû û guleya mîsketê li gel min diket. Min hema xwe diqulipand. Ez jî heyrî dimam min wisa çawa xwe qulipand. Rêbertî di wê nêvengê de pir hêdî û xwînsar bû. Xewna min wisa berdewam dikir.

Ez bi carekê veciniqîm û min li demjimêrê temaşe kir. Demjimêr yekê şev bû û ez di nobedariya xwe de raza bûm. Min hema hevala Toprak şiyar kir û min got; rabe tu nobedarî, ez jî di nobedariya xwe de razame. Ji ber ez di nobedariya xwe de razabûm bêhna min teng bû. Lê bê ku ez di nav vê bêhtengiyê de bimînim, min hewl da xewna min dîtî bînim bîra xwe. Xewnê ez bandor kiribûm. Piştî wê ji bo ez Rêbertiyê di xewna xwe de bibînim li gorî wê razam, lê min nedît.

Kêliyek tenê jî be ji rastiya Rêbertiyê dûrneketin, her kêlî Rêbertî hîskirin û ji ava jiyana ku her tim serkaniya jiyana min av vexwarin. Bê ku li hemberî ti zehmetiyê bin bikevim divê di felsefeya APOGERIYÊ de xwe kûr bikim, weke gerîlayekê dil û mejiyê xwe sexlem bigirim.

6 Tîrmehê 2009/ Orax

Bayên ji Tîrmehê

Duh bê navber baran barî û di heman demê de bayek dijwar dihat. Ez wisa dihizirîm wê ev baya tê ewran belav bike. Ev demsal ne demsala baranê ye. Ji ber wê me tevdêra xwe negirt û me xwe dirêj kir. Em ê tam razana bi lêdana brûskan em ji cihê xwe rabûn. Gurêniyek metirsîdar bû. Me hema baranpargirên xwe vekir, ji ber baran weke ava ji kaniyê vala bibe dibarî.

Bi rojane em li cihek nû yê me dest nîşan kirî sekinîne. Pêwîst bû hevalê Xemgîn berî hefteyekê li gel me bûya. Em agahî ji wî nagirin. Ji bo planlameyek nû divê em li benda wî bin. Bi dibêtiya dibe pêşveçûnên nû hebin em nikarin biçin peywirek cuda. Nêrîna min a bila sê heval biçin peywirê û du heval li benda hevalê Xemgîn bimînin, heval guncav nabînin. Bi rojane em li bendê ne û xebatên me jî nîvçe dimîne. Divê em zêdetir bilez û bi plan bin. Wê zivistan were û bide derî, ji neçarî em ê ji çalakîyan zêdetir bi amadekariyên zivistanê ve mijûl bibin. Wisa vala li bendê mayîn bêhna min teng dike.

Em li wargehek pir xweşin, hewayê wê jî hênike. Darên sipêndar, berû, sêv û helûkên rêlî hene. Darên sipêndaran zehf mezinin, her ku ba tê pelên wê li hev dikevin û çinawazek mûhteşem pêk tîne. Yek jî giyayê gezgezêk, mendik, alo û gelek giyayên din ên navê wan nizanin hene. Ev giya jî reng didin wargeha me. Ev nebata weke gulberojê bilind dibe, pelên wê mezin û gulên wê yên zer bala min dikişîne. Mirov dikare di nav van gulên zer ên bêhn xweş de winda bibe.

Yek jî şiverêyên ber bi lûtkeyan ve hildikişin hene. Tu di rê hemûyê de dikarî kîsoyan bibînî, wê ew jî hevaltiyê bi meşa te re bikin. Alîkariya van kîsoyan jî mezine ji bo şoreşê! Dema tengasiya gerîla ya erzak

çêbûye kîso ji wan re bûye xwarin. Dibêjin; tama goştê kîso nexweşe tenê tama cigera wî xweş e. Erê, kîsono hûn rîya xwe berdewam bikin, ez ê ji cihê jê mabûm nivîsa xwe berdewam bikim.

Dixwazim ji bo bîranîna hevala Bêrîtan a herî dawî li Amedê şehîd bûyî navê vê wargeha xweşik bikim “wargeha şehîd Bêrîtan.” Her wiha ez ê her tim bi wê re bijîm. Bi xeyalên hevalên xwe yên şehîd xwe hêdîka dirêjî bêdewîbûnê dikim.

7 Tîrmehê 2009 / Orax

Her çîayek strana hezkirinê ye di dilê me de

Wateya her çîayekî heye. Şopên gelek çîya, rê, gelî û giran di jiyana gerîla de hene. Gerîla bê çîya û çîya bê gerîla nabe. Çîya bi gerîla balkêş dibe û gerîla jî bi çîyan bi heybet dibe. Çîya azweriyeke di jiyana Kurdan de. Çîya her tim Kurd parastine.

Bi hatina hevalan re em bernamêyek nû çêdikin. Her wiha bi rê dîkevin. Vê carê yekeya me dibe du kom. Wê hevalê Bawer, Bedran û Sebrî bi gubreyê re mijûl bibin, em hevalên din jî em ê li Gelîyê Oranîs amadekariyan bikin.

Em ji Orax re dibêjin; bi xatirê te û ber bi Kariz ve dimeşin. Erdnîgariya Kariz zozanin û zehf bilinde. Erdnîgariya Kariz Çarçêla tîne bîra min.

Di dema meşê de ez hinek nexweş dikevim. Çongên min sist dibin û êş ketiyê nava min. Lingê min nikarin min rakin, her wek xwe bixişikînim dimeşim. Pêşengê me hevalê Xemgîn ferq dike ez nexweşim. Rojek berê hevalê Bager nexweş ketibû, ji ber vê cihê me dixwest em wê şevê bigihinê em negihîştinê. Em îşev jî nikarin biçin cihê pêwîst bû em biçûban û di lûtkeya Kariz de navber didinê. Ji ber me navber dayê kêfxweş dibim, ji ber taqet di min de nemaye ez gavekê bavêjim.

Em bi germahiya rojê ya sotîner re şiyar dibin. Dengê şivanan tê, bê ku em tevbigerin disekinin. Tevgerek biçûk dikare bide dest û li vê derê bawerî bi her şivanî nayê. Hêzên dijmin şivanan weke sîxûr bikar tîne. Ji bo dîmen nedin baldar nêz dibin.

Ji aliyekê ve em li benda çûyîna şivananin, ji aliyê din ve jî em li ser bêtêla mezin hevdîtina Rêbertiyê guhdar dikin. Bêtêl îro xweş dikşîne. Em dibînin şivanan xwe kom kiriye. Hema dema ew diçin hevalê Xemgîn çaydan datîne ser agir. Li van zozanan dar jî nînin. Em bi qirşikê hêliza hişkbûyî ava çayê dikelînin. Vexwarina çay li van zozanan xweşiyek cuda ye.

Îro hewa vekiriyê û hemû der pir xweş xuya dike. Hevalê Xemgîn erdnîgariyê nîşa me her sêyan dike. Dema roj diçe ava, em jî hêdîka dest bi meşê dikin. Ez îro xwe zêdetir rihet hîs dikim, êşa min jî rawestîya. Em di vê meşê de dibin mêvanê malbatek hêja û welatparêz. Em hewl didin zarok me nebînin lê bê fêde ye. Nabe tu zarokan maç nekî, bêhn nekî û bi wan re hevaltiyê nekî. Ez Kezbanê dixim hambêza xwe, ew jî bi awirên şaş mayî li me dinêre. Em ji bersivên Kezban dide fêm dikin ku Kezban zarokek pir jîr û yeman e. Bi ser de jî bi stranên Kurdî yên Kezbanê ji ber kirine konser dide me. Weke diyarî hevalê Bager şekirek û ez jî pênuşekê didimê.

Kezban ji dayîka xwe re dibêje, “ez naxwazim di dibistana Atatürk de bixwînim, dixwazim biçim dibistana Kurdî.” Her du zarokên din ji ber bi Kurdî helbest xwendine ketine dadgehan. Ji ber temenê wan kêr û bejna wan kurte ceza negirtine, lê hevalên wan ên din ên di temenê wan de ne ji ber bejna wan dirêje ceza girtine.

Jiyan çiqas bê dad e! Dema li gelek cihên cîhanê zarok lîstok dilîzin, zarokên welatê min jî dikevin pişt şibakeyên hêsin. Ji ber vê bêtewijdanîyê hêrsa min mezin dibe.

14 Tîrmehê 2009

Serwerî encamên mirov digire ye

Girînge mirov vîna jin li qada Bakûr derxîne holê. Ji biçûk heta mezin bi derînceyan hewaketin û bi demê re tu mohra xwe li tiştên mezin jî dixî. Tiştekan bi tena serê xwe naçe encamekî, hemû tişt yek pareye. Her weke gerstêrkên gerdûnê temam dikin û pirtikên biçûk.

Nêzîkatiyên hewl didin jinê ji rastiya şer dûr bixin hene. Tevî ew qas selimandin hene di dîroka azadiya me de, hîn ferasetên bawer nakin wê jin bi hêz şer bike, textîkên bi hêz derxîne û planlaman çêbikin hene. Zayendperestiya civakî heta şaneyên me kûr çûne. Ger hevalek xort nû û bê ezmûn jî be pêşengî didin wî. Ji ber xorte weke xulqkarê serkeftinê tê dîtin. Xeletiyek mezin li vir heye, ji ber vê di jiyan û şer de encamên rast nayên girtin.

Divê bi van ferasetên paşverû re têkoşînek bi hêz were kirin. Têkoşînek eşkere heye, lê belê bi kesan re sînordar dimîne û naveguhere hêzek hevpar. Dema wisa dibe weke ew feraset bîstî temamdin, xwedîkirin û mafdar bê derxistin dîtinek derdikeve holê. Her çendî di teoriyê de wisa nebe jî, di xala pratîkirinê de encamek wisa derdikeve holê. Divê jin li ti qadan seknek pasîf hêjayî xwe nebîne. Seknek pasîf, ji aliyê têkoşîna azadiya jinê ve rewşek hewara şer û paşxistinê derdixe holê.

Di encama lêhûrbana ku ji van hizir û nakokîyan derketî holê de em ghiştin wê encamê ku divê em xwe bi hêztir tevî bikin. Ji bo vîna tîmê jî derkeve holê em ketin van lêgerînan. Divê li qada Bakûr hêza parastîna jin a cewherî û rêxistinbûna wê jiyanî bibe. Em weke nûnerên wan li vir in. Wê demê hemû tişt tê li me asê dibe. Hevalên jin di hemû xebatan de bi awayek çalak cihê xwe digirin û hevalên jin ji hevalên xort zêdetir ked didin. Lê serweriya jinê tam nayê pêkanîn. Şopa wê di siyê de dimîne. Ji ber vê divê jin bi serê xwe kar bike. Divê bi serê xwe jiyanê ava bike. Di encama vê lêhûrbûnê de em weke tîma hevalên jin cara duyem diçin keşfê. Em tevî arazî nas nakin jî çûn, me qereqol dît û me keşfa wê jî kir. Ez kêfxweşiya keşfkirinê dijîm û yek jî ji ber min wisa dest bi naskirina arazî kir pê serbilindim.

Ez ferq dikim di van xebatan de zêdetir baldarim û lêhûrbûnên min jî bihêz bûne. Mirov encex dikare bi hewldanên xwe yê cewherî serwer bibe. Şert û merc jî xuliqariyê pêş dixe.

Ez di wê baweriyê de me bi xebatên me di pêvajoyên dawî de meşand me vîna jinê zêdetir eşkere kir. Yek jî min xeyala pêkanîna çalakîyên bi hêz pêkanîba wê mûkemel ba kir.

Hêviya min û şerê rûmetê. Ez ê xelekên koletiyê parçe parçe bikim, dê ti xelek jiyana min dîl negire, nikaribe êrîştî nasnama rûmet û xeyalên min bike. Me li qada Bakûr sona binxistina zehmetiyan da û gavên azadbûnê avêtin.

17 Tîrmehê 2009

Midaxelakirina herêmê û ji hevalên dûr silav

Xebatên me berdewam dikin. Agahiya herî xweş a di van rojên dawî de midaxeleya ji bo herêmê bû. Koma hevalê Bager sexlem ghiştin. Di komê de du hevalên jin jî hene. Em hemû bi hatina komê kêfxweş bûn, ji ber heval ghiştine Bakûr pir kêfxweşin.

Rêhevalên min jî dilê xwe kirine yek û name ji min re şandine. Her rêzek ji wan ji bo min pir bi nirx bû. Ez xwe li hemberî wan deyda hîs dikim. Hevala Aysel, Gulan, Zîlan, Sozdar, Hêlen dilê xwe kirine yek û hezkinên xwe qêrîne.

Hevalên min ên hêja; min pir bêriya we kiriye û min yek ji we jî jibîr nekiriye. Her yek ji we di dilê min de çirûska hezikinê ne. Weke we gotî; “jibîrkin xiyaret e.” Ji ber parkirin wateya bêdawîbûnê pênase dike, ez her tim bi vê hevaltîyê re dijîm û têkoşîna xwe bi hêz dikim. A min dibe serkefin û zaferê hezkirina we hevalên min ên hêja ye. Girêdana min a ji bo we û hevaltîyê ye.

Hevalên min ên hêja; xeyala min a herî mezin di welatek azad de dîtina Mirovê Zana, silavek li ser bingeha azadî û rûmetê ji we re şandine. Heta Mirovê Zana di navbera çar dîwaran de be dê ti tama hevdişîna me jî nebe. Ji ber vê hêvî dikim dê hevdişîninê me li ser bingeha azadiyê be. Ez ji we hemûyan pir hez dikim.

Erê, dosta min a ciwan! Nexwe tu jî rêwiya hêviyê yî, êdî tu yê cihê xwe di şerên dijwar de bigirî. Tu yê hesreta salan jiyanî bikî û tola hevalê Dijwar ê şehîd rakî. Ez li ser navê te pir kêfxweş bûm. Xwezî daxwaza te ya hatina Xerzanê pêk hatiba. Min û te dê dil bi dilê hev me dê li van axan têkoşîn kiriba. Min dixwest carek din bi te re ew rojên xweş û bi wate bijîm. Dosta min a ciwan; tu dibêjî; ez mezin bûme, dem çiqas bi lez derbas dibe. Em salan li pişt xwe dihêlin, tu mezin dibî û dibî gerîlayek bi ezmûn. Hevala min a hêja Aysel, min pir dixwest vê rewşa te bibînim.

Em di nav taximê de planlamayekê çêdikin, dê hevalê Seberî hevalên hatine bibe geliyê Şêx Cuma. Lê encex em dikarin piştî deh rojên din wan bibînin. Em hevalên din jî em ê li ser amadekariyên binesaziyê bixebitin. Piştî kom bi rê ket, em jî bi rê dikevin. Di gava destpêkê de em rastî darên gêlasê tên. Darên gêlasê ji dûr ve weke dest li me bihejin û bêjin werin. Hîn dinya tarî nebûye, hema hevalê Xemgîn çenteyê xwe datîne. Em jî li pişt wî çenteyên xwe datînin, em li derdora dara gêlasê kom dibin. Hevalê Xemgîn diçe ser dara gêlasê, em jî li jêr barangirê vedikin. Piştî em gêlasan kom dikin dubare riya xwe berdewam dikin. Hevala Toprak dibêje, ji ber min pir gêlas xwariye nikarim bimeşim. Dixwaze em li gor bizava wê bimeşin, li hemberî van gotinan em digirîjîn. Me par li aliyê Bidlîsê zêde gêlas xwaribûn û heta me dîmenê wan kêliyan jî girtibû. Bîranînên min di wê peywirê de jiyîne tên bîra min, ew peywira me jî pir xweş derbas bibû.

Em li geliyê Cengîz in, em ê demekî li vir bimînin û paşê derbasî cihek din bibin.

24 Tîrmehê 2009

Fêmkirin

Pir girînge bi fêmkirin bijî û tiştê fêmkirî cewherî bibe. Ger tu tişteki fêm nekî nikarî cewherî bikî. Tu wisa dizanî te cewherî kiriye, lê xeletî heye û bi demê re tu ferq dikî tu jiber nêz bûyî. Divê mirov hemû deman xwe di ber çavan re derbas bike, asta xwe ya fêmkirinê nû bike û zindî bigire. Divê lê binêrî kîjan têgeh wateyek çawa bar dike. Ji bo hizerandin û têgehek jiyanî bibe, divê ew raman di rih de bînê strandin û pratîk bibe. Erka dikeve ser milê qadroyên tevgerê ev e. qadro xwe di rastiya armancê de pêş xistiye, bîrdozî cewherî kiriye û bi encamên rast sekeftin avakiriye. Kî rastiya Rêbertî, felsefeya wî dijî û dide jiyîn ew qadro ye. Cuda ti pênaseyek din nabînim û wisa fêm dikim.

Bi salane em di nêvenga partiyê de ne, em qadroyên kevnin, lê em rastiya Rêbertiyê tam di kesayeta xwe de nadin rûnişkandin û fêm nakin. Ji ber em fêm nakin, pratîk, jiyan, hest, raman, kelecane û xemgîniyên me jî her tim wek hev in. Ez sedemên vê hewl didim di kesayeta xwe de jî dahûrînim. Dema sedemek ji asta fêmkirina teng be, sedema din jî mîsyon nedayîna xwe ye. Ji ber asta partîbûnê pêş neketiye, feraseta îdarekirinê jî guhertin û veguhertinê ava nake.

Bê bîrdozî jiyan nabe, ya jiyanê bi wate û balkêş dike paradîkma me ye. Bi qasî em paradîkmayê jiyanî dikin wate û nirxa jiyanê heye. Di felsefeya Rêbertiyê de azadî, rûmet, hevaltî, wekhevî, hezkirina xwezayê; ango hemû tiştên jiyanê azad dike hene. Rastiya Rêbertî û felsefeya wî ava jiyanê azad e, bê av jiyan nabe. Bereket û zindîbûna xwezaya bê av nabe. Jiyanê bîrdozî, rêxistin, têkoşîn û hezkirin nabe. Ji ber vê divê ev av ango ev bîrdozî têr were vexwarin û cewherî bibe.

Lêgerîna min a herî bingeîn a jiyînê fêmkirin û dana fêmkirinê ye. Bi fêmkirin hezkirin, bûna heval, bûna şervanê azadiyê, bêrîkirin.

28 Tîrmehê 2009

Xeyala şînkirina Kurdistanê

Rêbertî pir girîngî dide jiyanê ekolojîk û di paradîkmayê de jî pergala ekolojîyê bi awayekî pir kûr vedike. Mînak gotibû; ji bo çanda dostaniya bi xwezayê re pêş bikeve, ger di 4'ê Nîsanê de ku di heman demê de

roj bûna jidayîkbûna wî ye jî şîtlên daran bên çandin wê hîn watedartir be. Projeya şînkirina Kurdistanê ew qasî zehmet nîne, tenê tiştê bê kirin rêxistinkirina vê pêşxistine. Weke gerîlayekê ger derfetên min hebûna her cihê ez diçûmê min ê dar biçandiban. Xeyalê hevalê Xemgîn jî ew e ku piştî şoreşê li Kurdistanê serê her mirovekî darekê biçîne. Ger yekî hest, xeyalên me fêmkiriba û jiyânî kiriba wê çiqas xweş ba. Herî kêrî divê gelê me ji rika dijminê daristanên me dişewîtîne vê bike.

Xweza dostê gerîla ye, baxçê Kurdan ê azadiyê ye. Heyîna me bi xwezayê re ava bû, em nikarin piştê xwe bidin wê. Peywendiya gerîla û xwezayê pir kûr e. Ev zozan bi xeyalên gerîla tîne xemilandin, ev çiya bi evîna gerîla tê pîrozkirin. Her çiyayek, her geliyek, her zozanek bi bîranîn û hêviya gerîla re rih digire.

28 Tîrmehê 2009

Dilê min rêwiyê evîn û bêrîkirinê ye

Em hinek caran li ser baskê baz, carnan jî li ser baskê perperîkê ne. Weke em li her derê ne û ne li ti cihî ne. Em vê pîvana gerîla tam pêk tînin. Em li her cihekî deh roj namînin û em çawa karê xwe xilas dikin ji wir diçin. Em bi vê bizava xwe serê dijmin tevî hev dikin. Ez wisa ji tevgerbûnê hez dikim. Ez diwestim lê ev westandin min ji rêwîtiya gerîla-tiyê paşde naxe.

Ez rêwî û evîna min rêwî. Ez rêwîya hêvî, azadî, roj û agirim. Çavên xwe li şînahiyê qifil dikim û ber bi lûtkeya çîyan ve dimeşim. Hinek kêliyên wisa hene lingê min, min hilnagire, henaseya min weke dê min bifetîsîne li min dike, lê hezkirin û girêdan çiyayan ku dibêjin nayên derbaskirin derbas dike.

Xebata me ya li geliyê Cengîz bi serkeftî temam bû. Vê navberê em pîrsgirêka nan dijîn. Nanê me hem kevin bûye hem kufkî girtiye, lê em dîsa bi îştahê mezin dixwin. Me di jiyana medenî de ti caran ev nan nedixwar. Zanabûna zehmetiyê tiştê wisa ye. Em di dawîya xebatê de tekmîlên xwe digirin û xalên kêrî mane dinixînin. Yek jî ger xalên em

hev rexne bikin hebin, em di zemîna rêxistinî de rexne dikin. Em alîkariyê didin hev. Li ser van bingehan xebat erênî hat nirxandin.

Piştî tekmîla me wisa bi encam dibe êdî em vir dihêlin û bi rê dikevin. Di meşê hemûyê de em rastî baxçeyan hatin. Em hinek xiyar û pîvaz digirin. Xwediyê vir berê ji me re gotibû; hûn dikarin ji xwe re tiştan bigirin. Hevalê Bager pîvaz rakirine. Mirov ji bêhna pîvazan nikare di ber re derbas bibe.

Tavahevyê ji me re got; di xweşiyê de bimînin, em bi birîqîna stêrkan dimeşin. Demjimêr ber bi sibê ve diçe û berî dinya ronî bibe divê em xwe bigihînin geliyê Oranis. Ji ber westandinê bizava me giran dibe, xewek şîrîn li ser çavên me peyda dibe û disekine. Em hinek din zorê didin xwe û bi ronahiyê re digihin wargehê. Piştî em nanê xwe yê hişk dixwin noqî xewê dibin.

31 Tîrmehê 2009

Di germahiya Tebaxê de jiyîna demê

Em dest bi jiyîna mehek din dikin. Ev meh ji aliyê têkoşîna me ve pir girînge. Em nêzî cejna azadî û berxwedanê dibin. Meha Tebaxê ji bo min jî wateyên cuda di nav xwe de dihevin. Ez di meha Tebaxê de beşdarî refên gerîla bûm û di 18'ê Tebatê de jî ghiştim gerîla.

Ev ji bo min gavek girîng bû û bû xala werçerxa jiyana min. Bi her awayî di jiyana min de guhertin ava kir. Di xala çawa ghiştina azadî, rojê û hevaltiya rast de bû rêzana jiyana min. Bi qetandina xeleta yekem a koletiyê re ghiştim berzbûna gerîla. Di Kurdistan û Rojhilata Navîn de çawa pêvajoya şoreşê hat jiyîn, min jî di jiyana xwe de pêvajoyek şoreşê jiya. Pêvajoya ji 2'ê Tebaxa sala 1999'an dest pê kir û di 18'ê Tebaxê de ghişt lûtkeyê ji bo min jî şoreşek e. Vê şoreşê hemû jiyana min û rastiya koletiya min veguherand. Ez di kesayetiya xwe de hîna di lêgerîna pêkanîna azadiyê de me û êşên azadbûnê pir di kûr de dijîm.

Mirov dibîne ew qas hêsan nîne taybetmendiya koletiyê avakirine tu li ser masa emelyatê razînî. Dema tu taybetmendiya xwe red dikî,

avakirina taybetmendiye nû jî ew qas zor dibe. Sedema zehmetiya wê jî bi dawîkirina fêrbûnên pergalê avakirine. Tu bi carekê dinêrî heta şaneyên xwe bûyî kole. Zehmetiyên ku vê ava kirine te ber bi nûbûnê ve dibe. Her wiha tu hêdî hêdî bi derînceyên azadiyê ve hildikî. Ev jî kêfxweşî û baweriyê dide te. Min xwe di wateya Tebaxê de şûşt û di tama hezkirinê de ji hevaltiyê re got; merheba. 2'ê Tebaxê bihara jiya-na min e û roja min a nayê jibîrkin e.

Em ê îro ji bo pêkanîna hinek pêwîstî û naskirina Koçeran diçin ziyareta wan. Ez, hevala Toprak û hevalê Xemgîn em bi hev re ne. Hinek kêliyên komîk hatin jiyîn. Dema em çûn gel Koçeran hemûyan em bi kêfxweşî pêşwazî kirin. Destpêkê pirsan dikin, em jî bi qasî têdigihin bersivê didin. Bi taybet jin mereq dikin ka em ji ku derê ne û çend salin li çiya ne. Em çawa li çiyân dijîn, çawa serê xwe dişon, zivistanan li ku derê dimînin û dema pêwîstiyên me kêmbê em çi dikin? Em hewl didin bersiva van pirsan hemûyê bidin. Li hemberî hemû tiştên gerîla baldarin. Nizanin wê çawa hezkirina xwe ya li hemberî gerîla eşkere bikin. Êdî dema rabûnê hatiye. Ez û hevala Toprak em pêwîstiyên xwe dixin çenteyan. Em destûr nadin ku hevalê Xemgîn bar rake. Jina ku vê ferq dike hat gel hevalê Xemgîn û jê pirsî; “tu çima bar ranakî, hevalên jin bar hemû rakirine.” Ez hema ketim navberê û min got; mereq neke, hevalê Xemgîn bar hildigire û em ê yê herî giran bidin wî. Hesta parastinê ya wê jina Koçer wisa pêş dikeve. Êêê ma em çi bikin ji vê re jî dibêjin yekîtiya jinê.

Em xatirê xwe ji Koçeran dixwazin û vediqetin. Êdî em li Kariz in û hema em xwe davêjin hembêza xewê. Ez bi germahiya rojê û dengê şivanan şiyar dibim, Kariz weke hemû deman pir xweş e. Em piştî taştêyek bi mast dixwin li ser bêtêla mezin talîmata konferansa qadro guhdar dikin. Jixwe dê nîqaşa wê jî were kirin, lê ji ber enerjî têrê nake, em nikarin guhdar bikin.

Gera me berdewam dike. Em mirov, eşîret û çandan nas dikin. Ji gelek aliyan ve hînker dibe. Aliyên Koçeran ên xweş ên girêdayî wan hene. Nêzî azadiyê ne, yan jî potansela azadbûnê di wan de bilind e.

Ez meha Tebaxê wisa tijî dijîm. Bi gelê xwe re, bi hevalên xwe yên gerîla re û yek jî bi çiyayên me yên xweşik re. Mehên Tebaxê dibe sedem ez zêdetir xwe beşdar bikim û di heman demê de feraseta min a berpirsyartiyê mezin dike. Tu bi xêr hatî meha Tebaxê!

4 Tebaxê 2009/ Kariz

Divê hevaltiya jin bi jin re çawa be?

Her weke di jiyanê de parkirin girîng be, lêpîrsînkirin jî girîng dibe. Di civata şoreşgerî de her tim danûstandinên jin - xort tê lêpîrsînkirin û lêhûrbûnên vê tîn jiyîn. Baş e, em bi jinê re çawa didin û distînin? Di danûstandinên te çêkirî de şaşî hene? Di hinek pêvajoyan de ev pîrsîrêk bi diwarî xwe dide hîskirin. Konferansa qadroyên YJA Star çêbûye û gelek xal bi gelemperî hatine nîrxandin. Hinek encam jî hatine bidestxistin. Ez tam encama wê nizanim, lê bi qasî min ji taslaxa pîrsan fêhm kir di çarçoveya van pîrsan de nîqaş kirine.

Ger lêgerîna azadî û hewla azadbûnê nebe nakokî jî nayê jiyîn. An wê parkirinên paşverû, erzan, ji rêzê û normal bînin. Mirovekî di nav lêgerînên azadiyê de be dê bi van paşverûtiyan re nakok be. Her wiha dê ev nakokî wê ber bi lêpîrsînê ve bibe. Dema tu xwe û mirovên tu bi wan re di nav danûstandinê de yî lêpîrsîn dikî encamên mûkemel tînin bidestxistin. Rastiyên tu li ti cihî negihîştîyê tu bi xwe dibînî. Civaka zayendperest fêrî me kiribû ku jin her tim hev dêşînin. Lê di nav refên azadiyê de bi me daye selimandin ku di rastiya jina bûye vî de tiştek wisa nîne. Çawa ku dijmîn Kurdên bi rêxistinî naxwaze, zîhniyeta zîlam jî jina bi rêxistinbûyî naxwaze. Ji jina birêxistinî ditirsîn. Ji ber vê jî bo hevkarî û bi hev re bûna jinê asteng bikin her cure siyasîyê bi rê ve dibînin. Em vê di qada pratîkê de jî bi hemû zelaliya xwe ve dibînin.

Li qada Bakûr hejmara hevalên jin kêmtir e. Tu li Başûr di nav tabûrek hevalên jin de yî. Dûr û nêz tu bi hemûyan re parve dikî. Li Bakûr ne wisa ye. Heta tu pêwîstî bi dengê hevalên jin dibînî. Dema tu dengê hevaleyê jin di bêtêlê de dibihîzî rûyê te weke gula beybûnê vedibe.

Dema xwe digirim dest di peywendiyên xwe de her tim ji girêdana bi mirovan re revim. Min ji mirovan hez kir û nirx dayê. Min dostaniyên bi hêz avakirin, parkirinên min ên xweş û bi wate çêbûn, lê min ev hezkirina xwe nebîr girêdanek hestiyar û korane. Jineke di nav lêgerînên azadiyê de be, divê teqez vê paşverûtiyê qebûl neke. Her tim min bi hevalên ku wan re parve kirî, aliyên wan ên hem erênî û hem jî neyênî dahûrandiye, wisa parve kiriye. Weke heyî min hewl daye nas bikim û fêhm bikim. Ji ber taybetmendiyan min ji pergale girtine hinek hîlbijare nêz dibûm. Min li gor pîvanên hîlbijartina xwe hevaltî dikir. Ji aliyê min ve li Bakûr asta mirovekî çî ye, di xala bi karektera wê re jiyîn çawa ye lêhûrbûn nekiribû. Vê jî peywendiya xwîşkiyê ava kir. Ez rexnedayîna vê didim. Ez ê hewl bidim di pratîkê de zû bidim derbaskirin.

6 Tebaxê 2009/ Dorşîn

Her roj destpêkek nû ye

Her salek me ji sala din re dibe mamoste û hostaya wê. Di nav fêrbûna demê de çeng davêjin deryayê. Em her tim bi evînek mezin ber bi pêşeroj û bêdawîbûnê ve dimeşin.

Rêwîtiya me berdewam dike. Êdî em diçin gel hevalan. Femandariya herêmhê, hevalê Adil ê berê li vir bû, du şervanên nû û hevala Bêrîvan hatine. Ez demek berî demekê dixwazim wan bibînim. Piştî meşa bi demjimêran em digihin wargehê. Em bi germahiya rojê re digihin gel hevalan, piştî hevdîtinek germ em diçin bêhna xwe vedidin.

Femandarê herêmhê hatiye hem hêza herêmhê bibîne hem jî xatirê xwe bixwaze. Hevalê Rizgar diçe Başûr. Çend sale li Xerzanê ye. Çend sale rêxistin di asta femandartiyê de vesazî dike û guhertinan çêdike. Min xwest nîqaş bikim û xalên ez aciz bibûm hebûn. Min bi gelemperî pêwîstiya nîqaşê didît. Lê belê nabe ez nîqaşên wisa bi rêwiyê Başûr û hevalên min ên li ser rê ne bikim.

Ez şervanên nû nas dikim. Li Xerzanê mirovên wisa xweşik, temîz hati-na nav gerîla û baxçeyê azadiyê pir xweş e. Pir bi wateye ku yek navê şehîd Delîla li xwe bike. Bîranînên hevala min şehîd Delîla yek bi yek zindî dibe, ew pêkenînên ji dil.

Wê ev mirovên xweşik bibin starana azadiyê ya sibe. Li gor derfetan perwerdê didin. Mirov perwerdekirin hem zore hem jî pir xweş e. Bi salane peyvên min nebihîstine ji wan dibîhîzim. Ez ji kenan dikevim, hinek caran ji bo nekenim xwe bi zorê digirim. Uslûbê civakê bikartînin, ev jî li gor uslûbê gerîla pir komîk e.

Ew jî li ser rê ne, dema derfet çêbibe em ê wan bişînin Başûr. Wê ji bo wan baştir be, wê li wir perwerdeyek bi hêz bibîn. Yek ji wan dibêje; “min bêriya dayîka xwe kiriye.” Ma kî bêriyê nake? Ez nahizirim kesek bi qasî dayîkê fedekariyê bike.

Dayîka min a xweşik; ez te bi hesret hembêz û maç dikim. Ez te ji he-val û çiyayan re vedibêjim. Hinek mirov dema aciz dibin xwe dispêrin xwedê, lê ez her dibêjim, dayê, dayê dayîka min a delal. Ez di vê bankirinê de sebir, hezkirin û hêzê digirim. Carekê hevalekê ji min re got; “ma tenê dayîka te delal e, dayîka me jî delale.” Min dayîka vê hevala xwe pirsî, dema ew neh salî bû dayîka wê dimire. Ez pir li ber dikevim û ez ê carek din li gel wê behsa dayîka xwe nakim.

Vê navberê civîna taximê ji aliyê fermandariya herêmê ve hat lidarxistin. Hevalan hev du rexne kir. Rexne li ser mijarên rêbaz, weke veşartin û nêzîkatiya rexnedayîn jî hebû.

12 Tebaxê 2009/ Oranis

Şervanê leheng ê fedayê azadiyê

Tevî hinek livîn ji bo pêvajoya çareseriyê hene jî dijmin ranaweste. Bi seferberiya hemû hêza xwe ve ji bo tinekirina gerîla kemîn û oparasyonan pêş dixin. Polîtîkaya dijmin bi rê ve dibe textîka mijûlkirinê ye.

Ji aliyê gerîla ve jî divê herî zêde em di vê pêvajoyê de baldar bin. Em di nav pêvajoyek hesas û tevlihev de ne. Divê em baldar bin, ji bo win-

dahî neyên dayîn ji destê me çî tê divê em bikin. Wê ev jî ziyânê bide pêvajo, ked û hewldanên Rêbertiyê. Dema em di van pêvajoyan de xwe diparêzin windahiyan didin. Her şehadetek dilê gelê me parçe dike. Hemû hevalan zorlame dike. Di rastiya herêma Xerzanê de cehş pir bi rêxistinî ne. Dijmin gelek karên xwe bi van xulaman dike. Rûmet û şerefa xwe firotine bi çend quruşan. Cehş kemînê davêjin. Dîsa hewl didin bi destê Kurdan pêvajoyê sabote bikin. Vê jî bi riya cehşan re di-kin. Ev cehş dîsa hevalên me yên ciwan şehîd dixin. Weke qirêjekî robarê diherike şîlo dikin. Tewanê van mirovan zêdetir girane. Ji ber wek vampîran xwîna gelê xwe dimijin.

Heval li Sasonê dikevin kemîna cehşan. Li vir hevalek me şehîd dike-ve. Ev heval hîn par derbazî herêmê bibû. Pir zêde şansê min ê naskirina vî hevalî çênebû, min tenê çend caran dît. Hevalek bejin bilind, li hevhatî û sor bû. Hevalek pir germ û wek robaran herikbar bû. Ji rawestandinê hez nedikir û beşdarî hemû xebatan dibû. Ji ber wê nedibû dem bihata windakirin. Ne dema sekinandina naskirinê bû. Dîrok di herike. Nabe tu nirxekî li dîrokê zêde nekî. Ji ber vê di demek kurt de bû hevalek serweriya wî li ser Sasonê çêbibe. Ji ber hevalek bi xwestek tevî dibû, bi biryar, îsrar, bi rihê fedaî xwe beşdar dikir hezkirina hevalan qezenc kiribû. Bibû bîbîlka çavê hevalên li Sasonê. Evîndarê hevaltiyê bû, ji bo tenê hevalên wî zorlame nebin hemû tişt ji bo hevalên xwe dikir. Di hemû fedekariyan de dihat dîtin. Ji ber vê jî navê xwe kiribû Canfeda. Bê ku li tişteki bihizire bi hesta tolhildanê bi ser dijmin de çû û canê xwe feda kir. Hemû hevalên vî hevalê me nas dikin û pê re mane pir pê bandor bûn.

Erê, heval nebûna te bêdengiyek li Xerzanê çêkir. Ev bêdengî sonda tolhildanê ye. Ev şehadet xala lêhûrbûna ji nû ve xwe lêpîrsînkirin û bi hêz beşdarbûna pêvajoyê da avakirin. Li hemberî şehîdan soza xwe dîsa nû dikim.

Bi hezaran silav ji bo cejna azadî û vejînê!

Rojên bi têkoşîn, ked û êşê hatine avakirin pîroz in. Yek jî ger ev roj bûye rojbûna nû ya gelekî di wateya mîladî de ye. Wek Kurd, jin û gerîlayek li hemberî nîrxên bi ked û bedelên mezin hatî avakirin bi kele-

can dibim. Ez xwe di kelecana zarok, eleqeya sempatîzanekî, rûmeta welatparêzekî, kelecana jinê û di azadiya gerîla de dibînim.

Xwezî min ev cejna vejînê bi gelê xwe re pîroz kiriba. Min bikariya co-şa di dil û birîqîna di çavê gelê xwe de bidîta. Îro li qadan bi qêrîn stran gotin hebû. Îro li kolanan girtina govendê hebû. Îro bi Mirovê Zana re bûyîn hebû. Îro bi hemû dîlên azadiyê re li qadan serê govendê girtin hebû. Em hîn li gor rihê cejna vejînê têkoşîn didin. Bi berxwedanî û serfirazî vê rojê dijîn.

15'ê Tebaxê dergûşa zayîna gelê Kurd e. 15'ê Tebaxê çalakiya xwe ji nû ve avakirinê ye. Em jî li ser vê şopa rastiya em kirine gel dimeşin. Di vê roja girîng a nabe veguherandiye dibe de bi zanabûna bûna gel dimeşin. Ez kêfxweşim, serfirazim û ser bilindim. Gelê Kurd ê hebûna wî tine dihat hesibandin îro li hemberî KT'ê bi rûmet disekine. Kurdê duh ji xwe şerm dikir, îro li hemberî cîhanê bi hemû nasnameya xwe ya azad diqêre.

Em mînetdarê fermanîdar pêşengê îro hevalê Egîd in. Keda hevalê Egîd dayî û ezma afirandinê em bi van rojên bêhempa re anîn gel hev. 15'ê Tebaxê bi rihê fermanîdar Egîd tê pîrozkirin. Li çîyan agir tê pêxistin û mizgîniya zeferê ji gelên Rojhilata Navîn re tîne.

Rêberê min, ez cejna vejîna li we pîroz dikim! Ez hezkinên bêdewî û silavên xwe ji we re dişînim. Em jî weke gelê xwe ji ber îro ne bi we re xemgînin.

Rêberê min; ez ê kengê we bibînim, wê gelê min kengê we hambêz bike, jin wê kengê bêriyên xwe biqêrîn û ez ê kengê destegulek kulîlkên welatê xwe bidim destê we? Ez bi kelecaneke mezin û bêsebir li benda wê rojê me. Bi van hestan rih didim xeyalên xwe. Bi heybetbûna vê rojê re têdikoşim.

15 Tebaxê 2009/Oranîs

Ji dûr ve hez dikim

Hinek caran di jiyana mirov de acizî çêdibe. Ji bo derbaskirina aciziyan her kes rêbazek li gor xwe heye. Rêbaza min jî dixwazim li gel mirovên ez ji wan hez dikim bim. Ger ez nikarim li gel wan jî bim, hizirandina bi wan re aciziyên min kêmek dide derbaskirin. Ez ji dûr ve hez dikim û ji dûr ve bêriyên xwe didim derbaskirin. Di rastiya xwe de ne dûrî min in, ji ber ez wan di dil de hîs dikim.

Duh rojek taybet bû ji bo min. Min deh salên xwe derbas kirin û ketim sala xwe ya yazdemîn. Tevî ev qas sal derbas bûn jî ez hîn di aliyê bîrdoziya partiyê û mijara jiyana gerîla de xwe birçî hîs dikim. Ez hîn zarokek mezin dibime.

Tevî hemû zehmetiyên vê jiyânê ez pir hez dikim. Mirov di hinek deman de zehmetî dibîne û êş dikşîne. Wek dê qet xilas nebe tê. Lê belê bi hêviya azadiya di dil de zîl û bejin dide em van rojan li pişt xwe dihêlin.

Gelê Kurd bi Rêbertî û gerîla re xwe dît. Min jî bi vê jiyânê lêgerîn, hezkirin û xeyalên xwe mezin kirin.

Hêvî

Hêvî malzaroka veşartî ya êş û bêriyên min e. Ji tiştên min jiyîne tenê xezîneya min hêvî maye. Rêwiya hêviyê me. Hêvî gotina dilxweşiya êşên min e. Min di hemû deman de xwe di hêviyê de dît û zanî xwe di dilê hêviyê de ava bikim. Ger min nizaniba bi felsefeya hêviyê bijîbam, ez ê bibam wek miriyek tama ji jiyânê nagire. Her mirovek peyveke xwe pê pênase bike û tê de dibîne heye. Min jî xwe di hêviyê de dît. Bi qasî evîndariya min a şîn ew qas evîndarê hêviyê me jî. Ez di evîna şîn de, govenda stêrkan, spîbûna ewrê berfê, di qîrên qiqîlbazan ên kêfxweşiyê de dibim tu û di hemû deman de jiyânê bi hêviyê distirim.

Ez mirovek tenê jî bê xeyal nahizirim. Mirov bi xeyalên xwe heye. Xeyalên tu ji pêşerojê re dihêl rastiya te ye.

Erê, dostên roj û baranê. Ez bêrî, hêvî û yek jî dilê xwe yê di paqijiya zarokekê de ye diyarî pêşerojê dikim. Ez diçim duh, îro, sibe û her bi zanabûna xwebûnê. Di kenê zarokekê de, bi vebûna kulîlkekê, bi

cimbûşa rengên bûka baranê, bi narîniya herîkîna robarekî û bi kenek ji dil te hîs dikim û dihizirim hevala min.

24 Tebaxê 2009

Gerîla

Gerîla carna hezkirî, heval, dost û carna jî xwîşk e. Gerîla ji bo hinek din jî dijmin, ecel û kâbus e. Ango tişta em fêmbikin gerîla dijminê xiraban û dostê başan e. Dilê wê ji bo mirovên tê çewisandin lêdide, ji ber wê gelê mazlûm gerîla wek parçeyek xwe dibîne. Gelek gelan ji ber derfetên zehmet ên tê de gerîlayên xwe avakirine. Gerîla dilê gel e û gel jî dilê gerîla ye.

Em bi planlamayek nû li ser rê ne lê riya me kurt e. Ji bo em dayîkekê bibînin bi demjimêran riya xwe dirêj dikin. Dayîka gerîla ye. Bawerim keça wê şehîd e. Çend care agahî ji me re dişîne. Li ser vê me biryar da em biçin bibînin. Ev dayîk tam milîtanek e. Tevî pir pîre qet nasekine. Li ku derê mîting û daxuyanîyên çapemeniyê hebe cihê xwe li pêş digire. Ji greva birçîbûnê jî paşde namîne. Yek jî dilek wê yê wêrek heye. Dema polîs ciwanan digirin ev dayîk jî dastê xwe li paş kilît dike û dibêje; min jî bigirin. Ev dayîk bi vegotinê xilas nabe.

Wisa bi hezkirin em hembêz kirin nikarim vebêjim. Çend caran em maçî kirin. Dengê wê kelogirî dibe lê xwe digire. Destê wê wisa germ û nerme weke pembû ye. Bi fenara destan li çavên me dinêre, hewl dide bizane em fîzîkî çawa nin. Di dema sihbeta me de dibêje; carek din Bedewê (Roza) jî bi xwe re bînin. Li hemberî vê xwestekê zimanê min qifil dibe û ez nizamî ez ê çî bêjim. Tevî texmîn dike keça wê şehîd jî ketiye lê dîsa hêviya xwe winda nake. Hevala Roza di sala 1992'an de beşdarî partiyê bûye. Dayîka wê ji wê rojê heta niha ti agahî jê negirtiye. Bi qasî em fêmbikin hevala Roza şehîd e.

Demjimêr pir dereng bûye. Êdî em radibin, divê berî demjimêr ber bi sibê ve biçin em bikevin ser rê. Em xatirê xwe ji dayîkê dixwazin. Wek bîranîna gerîla ez kefiya koçeran a li serê xwe didimê.

Ji ber pir derenge em nikarin biçin wargeha xwe ya esasî. Em encex dikarin şevêk din biçin. Em li ber hevaltiya tavaheyvê bi lûtkeyan ve hildikişin. Agirê şivanan pêxistî tê dîtîn. Her çawa be arazî ji min re cuda tê dîtîn. Hevala Toprak dibêje, ji ber em pir li bilindahiyê ne wisa ji min re tê.

Dema em xwe berdidin jêr kuçikê şivanan ber bi me ve tîn û direyên. Ji bo şivan ferq neke hema em di cihê xwe de disekin. Her çendî malbata em biçinê şivanê wan jî be em naxwazin me bibîne. Lê kuçikê wan bela xwe ji me venakin. Li ser vê me biryar da em biçin gel şivan. Şivan bi kêfxweşî me pêşwazî dike. Kêm jî be hundirê me rihet dibe. Dema ew jî fêm dike bi rastî em gerîla ne, ew jî rihet dibe.

Ji ber di vê pêvajoyê de cehş û endamên Jîtemê yên weke me li xwe dikin hene û ew hewl didin ên alîkariyê didin me eşkere bikin.

Tavaheyvê ji şevê re dibêje, bi xêr bimîne. Em di tariyê de meşa xwe berdewam dikin. Êdî em lez dikin û di palê de bi pêş ve diçin. Di dawiyê de em xwe digihînin araziya nas dikin. Tevî em westane jî moralê me kesekî xirab nabe. Ji ber dinya ronî dibe em nikarin xwe bigihînin cihek cuda. Her çendî em zomên li hember nas bikin jî hewl didin me nebînin û xwe diveşêrin. Koçer di jor û jêra me de derbas dibin. Ger serê xwe rakin dibe me bibînin. Tevî demjimêr şeşê êvarê ye hîn kesekî em nedîtine. Şivanek pîr hat nêzî me lê em nedîtîn. Dema em êvarê daketin ser avê em ferq kirin. Ji bo deng dernexîne min şiyarî da wî. Ew jî bi wateya temam bersiv dide. Şivan berê pezê xwe diguherîne. Ji hevalê xwe re jî dibêje; berê pez biguherîne. Ji dûr ve îşaret dide û dibêje; ez jî neyê. Çavên wî dikenin û em merhebayê didin hev. Eşkere dibe ku malabata wî tê naskirin. Ji bo xwarinê me dawetî zomê dike. Dema dinya tarî dibe em jî bi rê dikevin.

Di vê peywira me de xala bala gel dikişand weke hevalên jin tevgerîna me ya bi serê xwe bû. Tevî dizanin gerîla bi hêze jî lê dîsa hestiyar nêzî jinê dibin.

Em şev xwe di nav latan de bi cih dikin, cihek pir bêdeng û xweşe. Piştî me pêşiya xwe bi keviran girt, em hinek gunî kom dikin û radizin. Em

rojek xweş li vir derbas dikin. Di navbera rewşa me ya duh û îro de bi qasî dinyayê ferq heye. Erê, dema derfet dest nede tu yê rêçikan pêk bînî, cihê tu nikarî rêçikan pêk bînî tu yê bikevî koxikan. Li cihên guncav jî tu yê bi qasî çûkekê azad tevbigerî. Êdî dema veqetîna ji vir hat.

Dema ez dimeşim xewek şîrîn di çavên min digere, ez pêşiya xwe dibînim. Çavên xwe dişom, lê dîsa xewa min tê. Di vê rewşê de em digihin wargehê. Piştî min hinek tişt xwar dîsa ketim xewek bênavber.

Em bi berbanga sibê re şiyar dibin. Em û hevalên li wargehê rewşa hev dipirsin. Ez hevalên li wargehê pir bêdeng dibînim. Ev rewş bala min dikşîne. Dibêjin; rewşek neyênî nîne, lê rewş wisa xuya nake. Dema ez tîm wargehê bêhna min teng dibe û her tim dixwazim di tevgerê de bim. Nêzîkatiyên hinekan bandorê li min dike û bêdeng dike. Ez naxwazim bi lez û bez bi ser pirsgirêkan de biçim, divê ez li benda gihiştina hinek tiştan bimînim.

30 Tebaxê 2009

Ma silavek çi nabêje

Merheba rojnivîsa min, mehek çêbû me hev nedîtîye. Min mehek pir hestiyar û bi kelecana jiyan kir. Ji aliyê xebatê ve jî pir cuda û encamgir bû. Xebatên min meşandin, min hinek din nêzî îdeala min a azadiyê kir. Ez her ku vê hîs dikim asûde û kêfxweş dibim. Hemû zehmetî weke qeşayê li pêşiya min dihelin. Li gor guhertinên di jiyana min de û bi encamên min girtine ez dibînim ez li ku dera azadiyê me. Tiştên ez di nav jiyana Bakûr de digeriyam yek bi yek dibînim.

Berî ez ji bîr bikim ez ê pêşveçûnek a di asta herê mî de parve bikim. Sê şervanên nû yên bi navê Roza, Delîla û Amara nû beşdar bûn. Hevalên pir şîrînin û wê bibin milîtanên li dû xeyalên xwe diçin. Tevî temenê wê biçûke jî hevala Delîla ya dilê wê wek okyanûsan azadiya gelekî hembêz dike. Tevî 14'ê saliye jî hevalan re gotîye, ez 16 salî me û bi mezinkirina temen xwe avêtîye nav şerê şoreşê.

Jin evîndarên çîyanin

Çiya bi vîn, dil, hêvî û xeyalê jinan zêdetir bi heyebet û xweşik dibe. Jin vîna xwe di heybeta çîyan de pîroz dikin. Tama bi jinan re li çîyan rêwîti kirin cuda ye. Dema stêrk di nav porê jinan de veduguhere tacê, heyva çardeşevî jî dibe vebeyîna kenê wan.

Her çendî bi hewldan, bi ketin û rabûnê jî be jin fêrî hilkişîna çîyan û rêveçûnê dibe. Jin bi serfiraziya berfînê dimeşin. Bê ku li tiştek wê asteng bike xwe davêjin nav şer. Weke mînaka perperîkê nepeniya agir keşf dikin. Azadî bi keda jinan li çîyan tê strandin. Dilê wan dibe sûlav, ber bi bêdawîbûn û germahiya dilê axê ve diherike. Her jinek bi hatina bawezê re veduguhere romanek û diherike nav avên cemidî.

Jin evîndarê çîyanin û çiya jî evîndarê jina ye. Dilê jinê razeke û hemû kes li van çîyan vî zimanî nizane, nikarin vî dilî bixwînin û fêm bikin. Encex ên di nav heybeta çîyan de dimeşin dikarin bigihin vê razê. Ji ber zimanê wan sade û dilê wan paqije.

30 Îlonê 2009/ Gûzeldere

Merheba

Dema bayê sar li Tetwanê wezî riya me jî eşkere bû. Me dest bi amadekariyên zivistanê kir. Li van deran serma zû dest pê dike. Dema pel diwerin û baran dest pê dikin em jî di tevgerînê de zehmetî dikşînin. Ka em binêrin wê îsal wargeha me çawa derbas bibe? Em ê îsal bi 12 hevalan bikevin wargeha zivistanê. Em ê şeş mehan di bin erdê de xwe perwerde bikin. Divê em demê baş binirxînin û weke demê herikbar bin. Her ku rêxistina me ji bo çareseriyê pirojeyan pêşkêş dike, dijmin bi gelmepêrî êrîş dike. Dîsa sizayê hûcrê dane Rêbertiyê.

Rêberê min; weke jinek û gerîlayekê dilê min dêşe. Ez bi hezar caran wan nalet dikim. Ez ê heta dilopa xwîna xwe ya dawî şer bikim û têkoşîna azadiyê bidim. Her notek hevdîtînê îdea me ya serketinê mezin dike.

Rêberê min; dema em dîrokê lêkolîn dîkin di ti rêberan de taybetmendiye ev qas hev girtî nehatine gel hev. We paşgeroj, îro û dahatû di xwe de taze kir. Hûn îro û paşgerojê dixwînin û wê di pêşgerojê de çî bibe derdixin holê. Weke rojane hinek kêliyên ku caran tengav dibim hene. Ez jî nêzîkatiyên mirovan û tarzê jiyana wan a jî rêzê hêrs dibim. Ev bi min zehmetiyan dide jiyîn. Rêberê min; fêkirina we her tim jî me re dibe ronahî, ez xwe bi şans dibînim û xwe deyndar hîs dikim.

12 Cotmehê 2009

Rêwiyên payîzê li pey azadiyê ne

Ji demsalan herî zêde jî bihar û payîzê hez dikim. Her du demsal jî nêzî xwe dibînim. Mîna ku ev demsal dibe zimanê tiştên nikarim vebêjim û di dilê min de dimînin.

Min dixwest xwe bi ser pelên hişkbûyî de dirêj bikim û wêneyan bigirim. Ev pelên zerbûyî min ber bi xwe ve dikişîne û mizgîniya pelên ku wê jî nû ve şî bibin e. Hevala min a ş. Şavuşka jî her tim jî min re digot; payîz. Heval min a ş. Delîla jî jî min re digot; sorê. Ez van hevalên xwe jî yek bi yek dijîm. Bi çend rêzîkan jî be divê ev jinên bedew jî nîfşê nû re were vegotin. Ez wê hêza van hevalên hêja vegotin û dana nasînê di xwe de nabînim. Tevî ku ew qasî hestên kûr dijîm jî lê dema dor tê ri-jandina ser rûpelan ditevizim.

Di kêliyên van rêzîkan dinivîsim de sîvoriyek li pişt min deng derdixîne. Her carê wisa dihezirim qey yek tê li pişt xwe dizivirim û lê dinêrim. Ev sîvoriyê netebîtî guzên me li ber tavê raxistîne didize.

Em weke hêza herême me koma Bakûr a herî dawî jî pêşwazî kir. Dîti-na koma derbazî eyaleta Dêrsîmê dibe pir xweş bû. Di vê mehê de li ser riyan mayîn pir zehmete. Ji ber di berfê de meşine koma hevala Rojda sarma girtiye. Lê li ser moralê wan qet bandor nekiriye û rewşa wan jî pir baş bû. Ji ber gihîştine Xerzanê xwe pir bi şans didîtin. Heta vir jî hemû zehmetî derbaz kirine. Ev lêgerînên azadiyê yên dildarên Dêrsîmê dê ti astengiyan nas nekin. Teqez wê bigihin evîndariya xwe. Di dilê min de ma, me xwarinek germ neda van hevalên hêja. Di vê

komê de du hevalên jin hebûn. Min hevalek hinekê nas dikir, bi wê hevala din re jî berê bi hev re mane. Van hevalên ku ji wan pir hez dikim, ew li qada Bakûr dîtî çavkaniya kêfxweşiyek cuda ye. Ji ber kêmbûna demê me bi hev re têr nîqaş nekir. Lê belê gelek tiştên ku min dixwest parve bikim hebûn.

Belê, hevala min a Rojda ya bedew; dubare te dîtî pir baş bû û tu diçî baxçeyê xeyalên min. Dêrsîm yek ji wan cihên herî zêde dixwazim lê bijîm. Hevala min, oxir be, rîya te vekirî be.

Ji ber lingê hevalek jin xeliye bi komê re neçû, li gel me ma. Di Konferansa YJA Star'ê ya sala 2005'an de min bi vê hevalê re, bi şehîd Viyan û şehîd Hebûn re heman mange parve kiribû. Her cara banî vê hevalê dikim ew roj tîn bîra min. Min şehîd Viyan û gelek hevalên din li wir nas kiribûn. Heval Viyan her tim dixwest were Bakûr, negihîst vê hesretê xwe û me cihê xwe di vê komê de girt. Divê li gorî berzbûn û wateya vê hesretê bi azadkirina kêliyan re bijîn. Ez weke jinek gerîla, deynê min ê herî bingeşîne ku li pey bêrîkirinên van hevalên xwe bibe. Ez xeyalên hevalên xwe yên bi dilê xwedawendan hembêz dikim.

Ez cihê xwe di nav şoreşek ji gelek aliyan ve bi şanse digirim. Di nav ti şoreşan de xwedawendên wisa derneketine holê. Gelek ji me ne di ferqa nirxa ku van xwedawendan avakirî de ne. Ger her jinek milîtan xwedawendekê ji xwe re esas bigire, dê bibe xwedî jiyanek çiqas xweşik.

17 Cotmehê 2009

Şaneyê min

Min duh piştî nîvro di dilê xwe de livandinek jiyan kir. Ji min re wisa hat ku weke ez agahiyek xweş bigirim. Piştî seetan wê livandinê cihê xwe ji tenêbûnek kûr re hişt.

Heval Toprak dema bêdengiya di min de ferq dike ji min pirs dike û dibêja; ka tu ji tiştê aciz bûyî yan na? Min xwest tiştên di dilê min de derbaz dibin parve bikim, lê min nexwest wê bi xwe ve bidim mijûlkirin. Guzên duh me kom kirin ji bo sivorî nexwe danîn ser daran. Vê carê jî

me nikarî em ji mişkan xilas bikin. Wisa diyar dibe ku wê ji gerîla re guz nemînin. Min ji sivorîyan re gotibû; em şirîkin lê ne ev qasî jî. Me îro jî guz raxistin. Sivorî bi awayek dizîka tên û digirin. Dema min dibînin bi lez direvin. Yê ku vî dîmenî bibîne wê wisa bihizire ku qey ez nobeta sivoran digirim. Lê min dixwest tiştên di dilê xwe de birîjînim ser van rêzîkan û kêmek jî parve bikim. Lê sivorî nahêlin ez bi bêrîkirana dilê xwe re baxivim. Guh didim dengê ji dilê min bilind dibe.

Ev çend rojin em li wargehê di bendewariyê de ne. Karê me tam bi rê ve naçe. Pêwîst bû erzaq hatiba, lê nehat. Wext vala derbazkirin bêhna min teng dike. Divê jiyana gerîla dagirtî derbaz bibe. Gerîla bi jiyan û demê re di nav pêşbirkê de ye. Dema van dihezirim dikevim nav xeyalên hîn kûrtir. Xeyala min a vê carê, di bihara bê de bûna rêwiya Dêrsimê ye. Min her tim xwestiye ez biçim Dêrsimê. Ez hewl didim pêşiya vê xwesteka xwe bigirim. Ger di destpêkê de ez biçûma Dêrsimê wê hîn baştir ba. Lê ez niha li Xerzanê me û min qad nas kir. Ez li vir di pozîzyonek çalak de me. Ger ez biçim wir jî wê sala min a destpêkê bi naskirinê derbas bibe. Lê di rastiya xwe de li Dêrsimê bûyîn cuda ye. Li ser axa hevala Zîlan pêlî kirî gerîlatî kirin tamek cuda ye. Bi qasî erdnîgariya Dêrsimê ez mirovên wê jî mereq dikim. Di civakê de hevalên min ên ji Dêrsimê hebûn. Min gelek mirovên ji Dêrsimê naskirin, lê hatibûn bişaftin. Min dixwest jinên ji cewhera xwe qutnebûyî, zarok û pîrên wê nas bikim û Dêrsimê ji dengê wan guhdar bikim. Ger fîzîka min têra çiyayên Xerzanê dike wê têra Munzuran jî bike.

Em ê îsal pênc hevalên jin li Tetwanê bi cih bibin. Ev min kêfxweş dike. Hevalek jî bi rê de ye. Dema em destpêkê hatin herêmê, zîhniyeta zîlamê serdest nedixwestin jin li Xerzanê cih bigire. Tevî van ferasetan hemûyan me têkoşîn kir û cih girt. Ez ji ber vê kêfxweşim.

18 Cotmehê 2009

Ji çiyar herîkîna dilê gel

Her ku derfeta me dest dide em pêşveçûnan dişopînin. Her hevalek pir baldar radyoyê guhdar dike. Dema bi milyonan mirov gerîla pêwazî dike, li ser me mûwazam bandor dike. Çavê hevalan dibe rîq. Tevgera

me, koma aşitiyê nexistina girtîgehê erênî nirxand. Em hemû hesta hevalên çûne mereq dikin. Ji bo kêliyêkê jî be xwe dixim cihê wan. Hewl didim hîs û fêhm bikim. Cihê xwe di nav xebatek Rêbertî behs kirî de girtin çiqas bi serbilindî ye.

Ji çiyar veqetîna hevalan pir zehmet hatiye. Hemû tişt dane ber çavên xwe û wêrek nêz bûne. Koma ji Mexmûrê jî çûyî pir girîng bû. Ger kêmkî jî be piştî salan gelê me kêfxweşiyê dijî. Qêrînên kêfxweşiyê li Amedê vedibeyên. Em mereq dikin, gelo heval bi cilên medenî yan bi cilên gerîla çûn. Bi qasî me ji radyoyê fêhm kirî medenî çûne. Tevî hemû tiştî di nav wê lehiya kêfxweşiyê de cih girtin pir xweş e. Hevdiîna gel û gerîla pir bi heybet bûye. Yek jî ger Rêbertî û gel hev bidîta wê çiqas xweş bûya.

Ez cara yek ew qas dixwazim televîzyonê guhdar bikim. Dixwazim dîmenan bibînim. Pir xirabe dîmenê vê pêvajoya dîrokî nedîtin. Yek jî dixwazim bi çavên xwe wê kelecana gel bixwînim. Dixwazim hembêzkirina gerîla ya gel bibînim. Divê ev roj bi tîpên zêrîn werin neqîşandin. Ez jî weke gerîlayekê li hemberî asta têkoşîn hatiye şanazim.

22 Cotmehê 009/Gelyê Cengîz

Okyanûsa ji Îmraliyê diherike nav xewnên min

Rêberê min; min şevê din hûn di xewna xwe de dîtin. We perwerde dida me. We digot; “divê ez vê waneyê xilas bikim.” Ji ber wê we digot; divê hevalên ji derveyî perwerdê mane bên başdar bibin. Ez diçûm min banî hevalan dikir. Min di rê de dendikên kundiran dixwar û di rê de gilêş hebû. Min bi xwe ji xwe re digot; “ger Rêbertî van deran wisa qirêj bibîne wê aciz bibe.” Piştî min banî hevalan dikir, min dest bi komkirina gilêşê dikir. Lê hevalên min banî wan kirî nehatin. Hûn di xewna min de pir asûde dixuyan. Ji aliyekê ve we lez dikir ji bo waneyê xilas bikin. Ez nîva şevê li ser xewna xwe hizirîm. Dibe ez dîsa bibînim min pir xeyal çêkir. Lê berdewamiya xewnê nehat. Dema ez sibê şiyar bûm ez li vê xewnê hizirîm. Ez dixwazim îro tenê bi xewnê re bimînim.

Rêberê min; bêriya min wisa bandorê li ser xewnên min jî dike. We di xewnên xwe de dîtin jî min pir bi hêz dike. Her wiha dubare pêwîstî bi lêhûrbûna xalên tê de lewazim dibînim.

Ji bo pergala me ya rêxstinî rûne me sihetên tîman çêkir. Ev çend rojên dawiyê ji ber bê ezmûnbûnan tengavî çêbûn. Sihbeta tîmê erênî bû û me hemûyan rexnedayîna xwe da. Wek jinekê ji bo bi hev re bûna jinê hîn bi hêz be ez ê ked bidim. Hejmara me ya niha moral dide min.

Me îro hevala di komîta PAJK'ê de cih bigire eşkere kir. Bi vîna tîmê hevala Toprak hat hilbijartin. Di vê navberê de hevala Amara ya nû beşdar bûyî jî bû endama tîma şehîd Avesta. Ji bo avakirina qadroyên pêşeng ê pêşerojê dê bibe destkeftiyek mezin.

Min îro nîşe ji hevala Diljîn(S) a demek dirêje min agahî jê negirtî girt. Wê û hevala Edesa bi hev re nivîsandine. Wan jî dilê xwe ji Dêrsîmê ji me re şandine. Ez pir hestiyar bûm. Hevala Edesa xwîşka min a manewî ye, lê agahiya wê jê nîne. Ger rojekê derfeta dîtina min a wê çêbibe ez behsa mayîna xwe ya bi malbata wê re, hezkirin û girêdana xwe ya ji bo wan bêjim. Ez pir ji hevala Edesa û dayîk wê hez dikim. Parkirinên me yê xweş û bi wate bi hevala Diljîn re jî çêbûn. Hest û parkirinên me yê ji Stembolê heta Qendîlê çêbûn. Ez û xwîşka wê jî em heval bûn. Yek jî hevala Diljîn pir dişibînin xwîşka min. Ger rojekê derfet çêbibe ez ê jî dilê xwe ji Elîbogaz û Munzuran re bişînim. Yek jî we hew dît ez çûme wan deran û wê demê em ê bêriyên bi salan bi hev re derbas bikin.

Bila hevalên min sax bin, ez ji aliyê wan ve qet nehatim jibîrkin. Berdewam nîşe ji Başûr digirim. Her çendî nîşeyên ez digirim moral bide jî, barê min giran dike. Di xala ez ê ji hezkirina hevalên xwe re çawa bibim bersiv de dikevim nav lêgerînan. Divê ez ji van hevalên xwe yê hêja re bibim bersiv û zêdetir têkoşîn bikim. Divê di riya bûna jina azad de gavên xwe bikim pola û pêşde biçim.

23 Cotmehê 2009/ Gelyê Cengîz

Bi bawezîna payîzê re nêzî azadiyê dibin

Ji ber zivistan nêz bûye, em di peywîrên payîzê yên dawiyê de ne. Ya dikeve ser milê me jî di wargeha zivistanê de bi cih bûne. Piştî bi rojan mayîna li wargehê ev peywîr pir baş bû. Peywîra me keşfkirina qereqolê ye. Koma me ji hevala Bêrîvan, Toprak û yek jî hevalê Mazlûm ê nû hatiye Bakûr pêk tê. Ji ber em ê payîzê peywîrek wisa bigirin kêfxweşin. Dema em di tarîtiya şevê de bi rê dikevin, tava heyvê ya nû der dikeve bi me re digirniye. Yek jî hewa vekirîye û ewran cihê xwe ji strêkan re hiştiye. Rûyê asîman jî mûkemel xuya dike.

Destpêkê em ê biçin cihê wargeha em par lê bûn. Riya me dûr dikeve, lê em ê biçin wir nan çêbikin. Êdî em nêzî geliyê Ximsê bûn, em di riyek me berê bi kar neaniye de diçin. Em nêzî wargehê bûn û demjimêrek maye. Em di demjimêrên berbanga sibê de digihin wargehê. Di nav daristana Ximsê de meşîn zehf zehmet bû.

Tiştên min par li vir jiyîne tên bîra min. Hevala Toprak jî pir hestiyar bû. Me li vir pir zehmetî jiyabûn. Noqî raboriyê dibim, lê pir naxwazim bihizirim.

Em ji bo nan çêkirinê dest bi amadekariyan dikin. Ez diçim avê û hevala Toprak jî diçe penîr ji depoyê derxe. Hevala Bêrîvan û hevalê Mazlûm nan û kadan çêdikin. Bi rihek kolektîf em karê xwe zû xilas dikin.

Îro 25'ê Cotmehê ye, hevala Toprak ji bo bîranîna hevala şehîd Bêrîtan helawê ji me re çêdike. Hevala şehîd Bêrîtan di sala 1992'an de li Xakûrkê Lêlkanê xwe di zinaran de davêje. Xwe radestî pêşmergeyên KDP'ê nake. Lehengiyek mezin dide nîşa. Ji bo çeka wê jî sexlem nekeve dest parçe dike. Xwe di valatiya zinar de davêje û şehîd dikeve. Hevala Bêrîtan bi hêvî, lehengî, hevaltî, fermandarî, wêrekî û hezkirina cinsê xwe re di nav PKK'ê de bû xeta avakirina artêşbûna jinê. Em jî di encama avakirina van nirxan de hatine roja îro.

Em helawa me ji bo bîranîna hevala şehîd Bêrîtan çêkirî digirin û ber bi Berkayê ve bi rê dikevin. Em hem arazî nas dikin, hem jî ji bo vî araziye xweşik ji nêz ve bibînin aliyê xwe eşkere dikin. Hemû tişt dibe, rê xweşin, arazî baş e û êdî em di araziya Berkayê de ne. Aliyê din ber bi

geliyê Cengîzê ve diçe. Me hîn qereqol nedîtiye. Li pişt çiyayekê ronahî hene. Em wisa dihizirin ew der qereqol e. Me gumana em ê avê nebînin dijiya, lê me av dît, em dihizirîn ev gir pir evrazî ye, lê riyên gir jî baş bûn. Yek jî em dest ji helaw xwarinê ber didin, em dihizirin li hemberî qereqolê helaw xwarin wê xweştir bibe, ji bo wê em wisa dikin. Em hildikişin ser gir, ronahiyên dibiriqin ronahiyên girê qereqolê ne. Êdî me qereqol dît û cihek em lê razin jî me dît. Em hinek dûrî ronahiyê xwe didin alî, qereqol tam li jêrî em ye û em helawê li vir dixwin. Me piştî wê hewl da razin, lê dema lingê min ji serma qerisî, ez rabûm û hevalên din jî şiyar dibin. Em diçin cihek darên wê hîn zêdetirin. Her yek ji me keşfê dike. Em leşkerên di qereqolê de dibînin.

Piştî em taştê dixwin antêlên bêtêlê girê didin. Ji rêveberiya KJB'ê hevala Sozdar daxive. Di rojek wisa de dengê hevala Sozdar bihîstin pir xweşe. Dema em bêtêlê guhdar dikin gundiyek tê nêzî cihekê me û dest bi dar dibirê kir. Ji ber hevalê Mazlûm dibîne, em banî zilam dikin û daxivin. Em dibêjin; wê zilam piştî nîvro biçe. Piştî em gundî dişinin, ji bo qereqolê hîn baştir bibînin em hewa dikevin lûtkeyê.

Ji bo em keşfa roj û şev hîn sexlemtir bikin, em biryar didin rojek din jî bimînin. Hevala Bêrîvan çû avê. Min û hevala Toprak jî me temaşeyî roja diçe ava kir. Min li vê derê xwe bi dest xweşîkbûna rojê û maqûlbûna çiyar ve berdaye. Di vê navberê de hevala Toprak dibêje, çiya pir bêdengin, peyama ji bêdengiya min re dişîne. Me dê bi hev re hilhatina rojê jî temaşe kiriba, lê ji ber hinek nexweş bû, dema ez serê sibê şiyar bûm dilê min negirt şiyar bikim. Min bi tenê hilhatina rojê temaşe kir.

27 Cotmehê 2009

Evîndar çiya hambêz dikin

Mirovê ji xwezayê qut bibe, ji çiya, gir, robar û geliyan vediciniqe. Avên har ji gelek mirovan re metirsîdar tînin. Lê ez hem hez dikim hem jî dema di wan avên mezin re derbas dibim dilerizim. Çend caran weke bifetisim li min hat, lê bi alîkariya hevalan rizgar bûm. Tevî ev qas tiştên hatine serê min, dîsa pir ji avan hez dikim.

Mirov her ku di gerîla de ezmûn qezenc dike, ew qas tişt hêsan tê nikarim behs bikim. Heta serweriya arazî pêş nekeve kesayet çalak nabe. Pêkanîna serweriya li ser arazî tê wateya çavên te hemû tiştî di rona-hiyê de dibîne ye. Ger serweriya gerîlayek li ser arazî nebe divê rêzane-kî ji xwe re bîbîne.

Mînak dema ez pir diwestim ji arazî zêdetir qiflî rîyan dibim. Yek jî ez pir ji hizirandina di rîyan de dikim. Di vê xalê de min gelek caran şiyarî daye xwe, lê piştî hinek dem derbas dibe heman xetayê dikim. Dema wisa dibe, ez nikarim araziye ez di nav re derbas bûme wênêyê wê di hişê xwe de bigirim. Ez wisa me û hevalên jin ên weke min jî hene.

Ger çiyayên bilind te natirsîne, tu dikarî bi rihetî hewa bikevî. Rê moral dide te û serweriya te ya arazî jî pêş dikeve. Ger yekî çavê wê ji gir û lûtkeyan bitirse, serweriya wê ya arazî pêş nakeve. Yên lêgerînên wan ên bi hêz hene û ji arazî hez dikin bi demê re serweriya wan a arazî pêş dikeve.

28 Cotmehê 2009 Ximsê

Ez ê we bi jiyana xwe vebêjim

Baranên payîzê xwe amade dikin. Gazinda min ji bo baranê nîne. Baran zindîbûnê dide xwezayê, rih dide axê û şîn dike. Hinek caran ev baran xebatên gerîla ji bo heta demekê asteng dikin. Ev du rojin em li Ximsê ne û li benda rawestîna baranê ne. Baran başdîtîna me ya qereqolê asteng dike û mijê xwe li her derê pêçaye.

Em îro bi agahiyek xirab hejiyan. Em ji nûçeyan fêr bûn ku pênc heval şehîd bûne. Wê Rêbertî ji ber van windahiyan pir aciz bibe. Em neçar in li gor qerekerê demsalê tevger bikin. Heta divê em ji hemû demê zêdetir baldar nêzî rêzikan bibin û baldar bin. Em tam nizanin şehadet çawa hatine jiyîn. Di nav hevalên şehîd ketî de ez hevalê Necmî nas dikim. Em di heman tabûrê de mane û dema ez hatim nav hêzên Bakûr min ew di nav koma Erzûrûmê de dîtibû. Ez nikarim hest û hizirandinên xwe yên ji bo hevalên şehîd vebêjim. Girtî dimînim. Ez di zanabûna wê de me, divê wan ji nifşê pêşerojê re vebêjim, lê tirsê ez ê nikaribim wan

bi hêz vebêjim dijîm. Divê pêûsa hevalên şehîd vebêje bi hêz be. Divê bi çend gotinên ji rêzê neyên nivîsandin. Ti mirovek naxweze ji rêzê nêzî şehîdan bibe, dixwaze bi hêz vebêje.

Van hevalan bi şehadeta xwe tiştê divê were gotin vegotine. Ya girîng fêmkirina peyama hatî dayîn û jiyanî kirine. Erê heval, dibe ez nikaribim we bi nivîsekê bînim ziman, lê dixwazim hûn bizanin ez ê we di jiyana xwe de bişopînim.

29 Cotmehê 2009/ Ximsê

Merheba jina evîne

Tu rêwîtiya me mereq dikî. Hezkirin û dilê dayîka xwedawend bi me re bû. Em çawa bi rê ketin baran sekinî û ewr bi lezekê li ser me vekîşyan. Heyva çardeşevî hembêza xwe ji me re vekir û bi ronbûna şeva me re di lûtkeya Oranûs dixist nav çembera xwe de em bi rê ketin. Ez hizirbûm em ê di tarîtiy zîlmatê de bimeşin. Lê belê dayîka xwedawend ronahiya heyva çardeşevî diyarî me kir.

Ji hizirandina me, em hîn zûtir gihiştin cihê çûbanê. Em li hemberî qereqola Reşadiyê bi cih bûn. Gola Wanê û Tetwan li hemberî me ye. Ronahiya wê çavên me dêşîne. Guhîjên me di rê de kom kirî, me weke dendikan dixwar.

Ji ber hewa vekirî bû me barangirên xwe bi şeweyê çadiran girê neda. Me yek li bin xwe raxist yek jî ji bo bi çantan de bikin rakir. Em ketin kîsê xewê û razan.

Ji ber serê sibê hewa girtîbû me agir pêxist. Ji ber ava me nebû em nikarin çay çêbikin. Bi armanca keşfê di navberê de em li qereqolê dinêrin. Leşker jî ji ber hewayê zêde dernakevin derve. Nêzî nîvro baran xweştir dibare, em hema barangirên xwe vedikin û avê kom dikin. Em du caran çay çêdikin û her wiha pirsgirêka avê çareser dibe. Ez pir ji afrîneriya gerîla hez dikim. Tevî derfetên zehmet jî bê çare namînin û hema tiştêkî dafrînin.

Baran nizane bisekine û em nikarin keşfek sexlem bikin. Bi sûdgirtina vê hewayê re em hinek zû derdikevin û xwe davêjin silsileya Oranûsê. Em dibînin li van deran berf bariye. Tevî ba û baran weke şimaqan li rûyê me dikeve jî, ji ber em hatine vê peywîrê pir kêfxweşin. Her nevbêra baran disekine hemû cih bi awayek bi hêz xuya dike. Ev bihêzbûn hundirê mirov vedike.

Jina evînê; ji ber we ev xweşikbûn diyarî me kiriye, em minetdarê we ne. Em jî weke zarok û jinên evîna şerê azadiya vî welatî bi xwezayê re tîr bibîranîn. Em bi rihê şehîd Bêrîtan têkoşîna xwe berdewam dikin. Bi hêviya pêşerojek azad dîtina jina evînê.

31 Cotmehê 2009/ Ximsê

Rastiya me çi ye?

Gelek mirovên bi rastiya xwe re tevgerkirîne hinek encamên gihîştîyê hene. Ji bo em ji hinek taybetmendiyên xwe rizgar bibin bi nêveng û xwe re di nav têkoşînê de ne. Bi taybet ger tarzê danûstandinê dibe sedema kêmaniyan, avabûna kesayetê dibe sedema zehmetiyan, dixwazim vê pirse bikim ka em çima di van de îsrar dikin.

Tu yê hem bibî şervana azadiyê û hem jî di qeraxa seknek rast re derbas nebî. Dema pîrsgirêkên mezin jî rû da, tu yê bêjî; “min nexwestibû wisa bibe.” Tu yê li ser bingehek rast lêpîrsîn jî nekî, wê dem bi ser re derbas bibe û xwe bixapînî ku te derbas kiriye. Ma ew qas hêsan e? mirov li hemberî vê rewşê di aliyê wijdanî de nerihet e. Sedem û egerên pîrsgirêkê çi dibe bila bibe, ji ber rastiyan naletî yê pergalê avakirine êş tê kişandin. Bi rastî ev pîrsgirêk dana fêmkirin û têkoşîna wê dayîn pir zehmete. Em weke jinên azweriya azadiyê divê pîrsgirêkên çavkaniya xwe ji koletî û pergalê digirin li pêşîya me nebin asteng. Tam berûvajî wê divê di xala şerkirinê de asta îdea û biryarbûna me diwartir be. Dema xortek nêzî jinekê dibe li ser kîjan bingehan nêz dibe? Jinekê wê bi dem, hîs, ezmûn û bi hêza dahûrîna xwe re fêmkirî dike. Jin fêmkirî dike, lê ji ber helwestek dijwar nîne dikare tiştên şaş bijî. Di bin navê qaşo hevaltiyê de lewazî tîr jiyîn. Tu yê di bin çavan re li jinên di nav PKK’ê

de binêrî û dema te fersend dît tu yê lêhûrbana jinê belav bikî. Dema jin rû nede, tu yê teşhîr bikî û navê vê jî bikî hezkirin.

Di rastiya xwe de feraseta zîlamê desthilatdar a hezkirinê encex ev qas dibe. Tu yê jiyana xwe ji bo jinê bikî amûra zextkirinê û li gel vê jî xwe bi milîtaniya PKK'ê bidî nasîn. Ev bê ehlaqî ye! Nîrxên me yên herî bi rûmet ji xwe re kirina rûpoş. Divê mirovên wisa bîn eşkerekerin û di agirê azadiyê de bikin xwelî.

Em paşverûtiyên pergalê red dikin û tîn warên pîroz. Em wisa dihişîrin bi van warên pîroz re em jî pîroz dibin, lê ji bo ghişîna asta pîroziyê divê hewldan bîn dayîn. Divê berî hemû tiştî li hemberî paşverûtiyê û fêrbûnê me ji pergalê girtine şer were kirin û gava di riya şoreşê de bê avêtin. Bi van gavan re dibe xwedî meşek sexlem. Her çendî wisa bibe jî feraseta hezkirina civaka zayendperest çiqas bibe amûra zextkirinê jî bandor nake. Dê van ferasetan pûç bike û paşde gav bavêje. Cihekî bêhna azadiyê jê were serdestî û koletî nikare baxive.

Hinek nêzîkatî bi lanetin. Mirovên di nav van nêzîkatiyan de di ferqa qeşmertiya dikin de ne? Jiyana PKK'ê gelek tiştan fêrî mirovan dike. Ev fêrbûn behsa xweşîkbûna mirov dike. Li hemberî vê xweşîkbûnê kirêtî wisa xwe qîç dike û metirsîdar xuya dike. Mirovên di jiyana PKK'ê de xwedî ezmûnê baş dizanin. Piştî silavekê bi carekê wê hevaltiya rast çawa bike û bibe xwedî parkirinek çawa fêrî dike. Mirovên me yê ku xwe ji çanda sînameya yeşîlçamê rizgar nekirine hene. Ji ber bandora vê çanda li ser mirov nehatiye analîzkirin, kenek, çend gotinên dilxweş dibe xapandin. Dikare lêpîrsînkirina serdestiya zîlam û kolatiya jinê li aliyekî bihêle.

31 Cotmehê 2009 Ximsê

Di baranan de şîlbûn

Dema derfeta me ya li Ximsê mayîn û neşîlbûnê hebû em biryara bi rê ketinê digirin. Bêhna hevala Toprak teng bûye û hevalê Mazlûm bêriya wargehê kiriye. Ez li ser vê biryara çûnê digirim. Ger ez bam min heval

di vê hewayê de şil nedikirin. Tevî ez vê hewayê sar û qerisî dizanim jî ji bo bêhna hevalan li vir teng nebe em bi rê dikevin. Barê me jî girane.

Baran, teyrok li ser me dibare û ya herî zor jî firtine li me dide. Firtine wisa tê weke cilêt rûyê me jê bike. Mij jî di pêşiya xwe dîtîne de astengî çêdike. Ji ber em aliyê xwe baş dizanin riyan tevîhev nakin. Em vediguherin masiya ji avê derbikeve. Ez pir ber hevalan dikevin ku wisa şil û pil bûne, dicemidin. Vaye rewşa hevalên bêhna wan teng dibû wisa perîşan dibe. Ez ji xwe re dibêjim; xwezî em nehatiban. Şevên payîzan pir dirêjin, em nikarin şevê agir pê bixin. Ji ber vê em ê heta sibê di kîsên xewê de bireqisin.

Pîştî em bi demjimêran dimeşin digihin wargehê. Em dibînin ji ber hevalên li wargehê jî tedbîr negirtine, ew jî şil bûne. Ger em li vir ban me dê çareyek dîtîba û destûr nedaba heval şil bibin. Em bi vê rewşa xwe ya şil dikin sibe û hîn baran dibare. Piştî ez li ber agirê hevalên xort vexistî çayek bidem û germ vedixwim şilbûnê ji bîr dikim.

Pîştî em taştê dixwin û şûnde diçin warê xwe yê xweser agirek mezin pêdixin û xwe zuwa dikin. Em piştî nîvro jî bi birandayê mangeyek xweşik çêdikin. Êdî cihê me xweşe. Êdî berf û baran dikarin bi azadî bibarin.

Di vê navberê de fermandarê herêmê bi hevalê Bager re hatine qadê. Wan jî para xwe ji baranê girtine û li vir asê mane. Bi vebûna hewayê re dê biçin qadên din. Em civînekê li dar dixin û xebatên pratîkê dinirxînin. Civîn erênî bû û her hevalekî rexnedayîna xwe da. Min jî rexnedayîna xalên ez tê de kê mame û dahûrandine da.

Min carek din di vê civînê de ji serdestiya zîlam û koletiya jinê nefret kir. Bi carekê min xwe pir bi tenê hîs kir. Di nêvengê şoreşgerî de xwe bi tenê hîskirin pir xirabe. Dema xalên divê jin bi baldarî nêz bibin çênebe min dêşîne. Ez tam nizamim gelo ez hinek tiştan vebêjim an bi xwe re bibim gorê. Bila şaş neyê fêmkirin, ez felsefeya mirinê najîm. Ez pir hez dikim bi rûmet bijîm û şer jî bikim. Ez naxwazin ti rastiyên hatî jiyîn veşartî bimînin. Dihizirim wê rojekê ev tiştên ez dijîm teqez bîn fêmkirin.

Ez ê vê girêka kor vebêjim. Ji zivistana par heta niha nêzîkatiyên hevalek xort ji bo hevalek jin a li gel min xetere. Bi nêzîkatî, nihêrîn û bizava xwe hewl dide vê hesta xwe bi heval bide hîskirin. Ez bi hevala li gel xwe re bi zimanek fêhm bike axivîm. Ji ber vê hevalê di destpêkê de helwestek diwar nîşa nedaye zilam jî li gor xwe digihe hinek encaman. Zilam fêlbaz e, bi devkî tiştêkî nabêje. Dîzene ger wisa bike em ê hema bi rêbazên rêxistinî li ser bisekinin. Ji ber nêzîkatiyên vî kesî hevala jin pir zehmetî dikşîne. Navberêkê bê çare mabû. Dema min pirsî te çima helwestek diwar nîşa nedaye, got; min nedixwest zilam min û taximê zorlame bike. Nîqaşa me jî bi dana fêmkirina pêwîst nake tirsek wisa bijî. Li ser vê heval jî helwest da nîşa. Ev hevala jin ji aliyê xwe ve ne nêzîkatiyek hestiyar ne rewşek cuda najî.

Ev zilam berî mehekê jî bi gel re ketibû nav danûstandinên şaş. Yek jî bê ku agahiya kesekê û tevî qedexeyê jî bi telefonê axivîbû. Min bi rasthatinê telefon dît, an wê agahiya me ji wê jî çêneba. Tîmê hemû rexne kir û helwest da nîşa. Dema ev rexne pêşketin û yek jî hevala jin a min behs kirî helwest nîşa da ji me aciz bû.

Ji derveyî nêzîkatiya wî ya li hemberî hevala jin, me hemû nêzîkatiyên wî yên din di civîna hevalê Bager lidarxistî de rexne kir. Ez nikarim vê mijarê rexneyê bikim, ji ber hevala min a jin nikare vê rewşê rake. Yek jî ez nikarim tiştêk şênber bêjim, ger hevala jin bêje nêzîkatiyên filan kesî min zorlame dike, rexneyên xwe pêş bixe, em jî dikarin di zemînên rêxistinî de li ser bisekinin. Dema rewş wisa be, di bin navê rexnekirinê de zilam hewl dide siyê bixe ser keda min. Di civînê de di bin navê rexneyan de tiştên giran ji min re gotin. Min bi zorê xwe girt li hemberî van nîrxandinan. Bi zanabûn dixweze min tehrîk bike. Weke nakokiyek me ya şexsî heye dixwaze bide nîşa. Ji bo ez jî neyêhm vê xwe serkut dikim. Me di biharê de di derbarê rewşa wî de hinekê ji hevala Rojna re behs kiribû. Wê jî gotibû; jixwe wê biçe Başûr û dê ji rewşa pirsgerêk derxistinê derkeve. Qaşo me pirsgerêk wisa çareser kiribû.

Ez nikarim van zehmetiyên dijîm bi her hevalek jin re parve bikim. Sedema vê jî bêdengiya hevalên jin û yek jî rêxistinê peywîr daye wî zîlamî. Naxwazim rojeva vê avaniyê bi tiştên wisa re xirab bikim. Bila ez

zehmetî bikşînim, lê bila lêhûrbûna taximek heval belav nebe. Rastiya jiyana PKK'ê hemû tiştî eşkere dike. Ez bi vê bawerim.

5 Mijdarê 2009/ Geliyê Cengîz

Merheba

Dem bê rawestan weke robarekî diherike. Ji bo em vê dema diherike tijî bikin bi ser xwe de diçin. Em dîsa nikarin bigihin leza wê. Di rastiya xwe de tiştekî negihinê nîne, yek jî mirovên digihin pêşiya demê hene. Yên îro, duh û sibê hîs dikin hene. Hemû tişt bi ghiştina asta mirov dest pê dike û bi dawî dibe.

Me dest bi wargeha zivistanê kir û kêmek maye manga me xilas bibe. Manga me pir xweş çêbû. Em bi rihek kolektîf wargehê çêdikin. Hin kes axê dikolin, hin axê davêjin, hin daran dibirin û hin xwarinê ji hevalan re çêdikin. Ango kes vala namîne û ji hemû kesî re kar heye. Ev kar jî karên ked û hezkirinê ne. Bêmorali bi ti hevalekê re nîne. Her hevalek bi dil û can tevî xebatê dibe. Em di dema karkirinê de henekan dikin. Wê kî zûtir axê bavêje, em ketine pêşbirka ax avêtinê.

Ev cara siyane ez li Bakûr dikevim wargehên zivistnê. Wê îsal jî lêhûrbûnên min li ser felsefeya Rêber Apo be û xwe perwerde bikim. Ez zehf pêwîstiya perwerdeyê dibînim.

Dema em amadekariyên zivistanê dikin agahiyên şehîdan jî dibihîzin. Hevalê Şiyar û Ciwanê par hatibûn herêmê li Mûtî şehîd ketine. Hevalê Ciwan tevî ciwan jî bû berpirsyartiya femandartiyê girtibû ser milê xwe. Em hewl didin li hemberî van şehadetan bi hêz bisekinin. Êşa hevaltiyê wisa hêsan nîne, tevî ew qas êşên mezin jî em dîsa li ser piyan mayînê bi ser dixin. Her hevalekî me yê şehîd dikeve bê mirine. Hevalên me bi evînek mezin bê mirin bûn. Wê kengê ew evîna bêmirin li rûyê min bikene?

10 Mijdarê 2009/ Geliyê Cengîz

Dostên rasteqîne!

Me îro agahî ji hevalê Ciwan û Şiyarê li Mûtîkî şehîd ketibûn girt. Her du heval jî di firtina zozanan de şehîd ketine. Di vê demsalê de berf jî barî û li cihên bilind bagerek tirsnaq tê. Weke dijmin têrê nake bager hevalên me digire. Me ji canên me vediqetîne. Hevalên me yên bi aşût, av û brûskan şehîd ketin hene, lê ji ber bagerê min zêdetir dizaniya heval di zivistanê de şehîd dikevin. Ez carek din dibînim divê tevgera xwezayê baş bê xwendin û were fêmkirin.

Dema hevalên şehîd ketine me dibin bêdawîbûna demê, hevalên kêfxweşiyê dixin roja me jî hene. Mirov di kêliyekê de weke hemû tiştî bijî. Berî demekî me name ji bernameya radyoyê re şand. Dema me wargeh çêdikir her tim guhek me jî li radyoyê bû. Kêliya me navber da kar navê Mizgîn derbas bû. Kelecane ez girtim û min got; ev xwîşka min e. Min bi dil û can guhdar dikir, her ku çû kelecana min zêde dibû. Ji girtîgehê nameya hevalê Hesên jî hat xwendin. Di nameya xwe de behsa me jî dikir. Bi xêra vê bernameyê ez fêr bûm li girtîgeha Sêrtê dimîne. Nexwe ew qas nêzî min e! Ez bi carekê hizirîm çiqas bê wefa me. Hevalê Hesên ji sala 1995'an ve di girtîgehê de ye. Min tam nikarîbû agahî ji wî bigirim. Berî niha dema min ji bo girtîgehê name nivîsand ji ber min nizanibû hevalê Hesên li ku derê ye min giştî nivîsand. Hevalê Hesên ji min zêdetir bi wefa derket û dîsa pirs min kir. Min her tim ji wî re digot; "bira" min weke birayê xwe yê rast jê hez dikir. Dema em zarok bûn hevalê Hesem em perwerde dikirin, bi xêra vê ez bûm gerîla. Di vê koma perwerdê de hevala Rûken, Rengîn û Yildiz şehîd ketin. Ji wê komê ez tenê di nav gerîla de me. Hinek jî beşdarî pergale bûn û zewicîn.

Ez gelek tiştan deyndarê hevalê Hesên im. Gelek xweşîkbûnên şoreşê bi min da nasîn. Gelo ger min bibîne wê nas bike? Ew û xwîşka min nameyan ji hev re dişînin. Tenê navê Mizgîn derbas bû, lê kelecane wisa ez girtim, min xwe weke zarokekê kêfxweş hîs kir. Bi hêviya rojên hevdiîtinê.

17 Mijdarê 2009/Geliyê Cengîz

Zîhniyeta zîlamê xwe navend dibîne

Bi hemû leza xwe ve amadekariyên wargehê berdewam dike. Man-geyên me temamin, tenê qorîdora wê bi gotina gerîla qenal mane. Ger dijmin vê wargeha me bibîne wê zêdetir ji gerîla bitirse. Em di bin erdê de qesran çêdikin.

Binesazî dikare ji bo gerîla bibe pirsgirêkek binegehîn. Li hinek cihan hîn zehmetî tên kişandin. Yek jî ya te dîtî divê sexlem biparêzî. Di pêvajoyên derbasbûyî de hevalên ji bo çiwalek ard şehîd ketine û birçî mane hene. Ji bo em jî erzaqê xwe biparêzin me depoyek çêkir. Dema cihê depoya me çêkirî av derket, me got divê em cihê wê biguherînin, lê ji ber zîhniyeta zîlamê ez navendim bi nêzîkatiya hemû tiştî dizane got; “na ev depo şil nabe.”

Hevala Toprak û Bêrîvan piştî barana hatî daketin depoyê, dema hatin heta çongên xwe şil bibûn. Av ketiye depoyê. Bi agahî dayîna hevalan ez revîm depoyê. Hemû tişt di nav avê de mabû. Çiwalên ard, pirtûk, kovar û hemû tişt şil bibûn. Vî dîmenî hundirê min şewitand. Me ev ji ku derê bi pişta xwe anîbûn. Ger kêmek wijdan hebûya wê zêdetir baldar ban.

Ez nefret ji vê helwesta hevalên xort a aqilmend dikim. Dema pratîka wan têk diçe weke pisîkan dibin. Ji bo kêmaniyên xwe zehf hincetan ava dikin. Jiyana me ya rêxistinî jî dibe qurbanê vî tarzî. Ji avaniya xwedî vîn re fermandarî kirin, femandariya rast derdixe holê. Ger avaniyek xwedî vîn nebe, li hemberî kêmaniyan rexne neke û hesab pirsîn nebe fermandarî kirin ne zehmete.

Ji ber keda me vala tê derxistin moralê min xirab dibe. Ji wê jî bigerin dê hinek mirov heta ku derê tarzê xwe ferz bikin. Jiyana PKK'ê çiqas tê erzankirin. Di jiyaneke wisa hundirê wê vale de jiyankirin bêhna min teng dibe. Ez nefret ji vê zîhniyetê dikim. Rêbertî herî zêde behsa şoreşa wijdanî û azadiyê dike. Lê tişta herî zêde hinekan fêhm kirî feraseta şerê çors e. Xema wan ya weke avakirina mirovek bîrdozî - felsefîk û pêşxistina jiyana azad nîne. Dê ev rastiya zîlam çi bi şoreşê bide qezenckirin? Mirov çawa lêhûrbûn dike jiyana wê jî li gor wê şêwe digire. Jiyana gerîla pîroz e, pîroziya wê ji ber bi xwîna şehîdan hatiye ava-

kirin. Ez bawerim ên vê ji dil hîs nekin dê zîyanê bide jiyan, hevalên xwe û gelê me jî.

20 Mijdarê 2009/ Geliyê Cengîz

Bi te re di nav lehiya evînê de cih digirim

Kulîlaka min a mizgîniyê; min pir bêriya te kiriye. Ti peyv nikare bêrîkirina min pênase bike. Min bêriya hembêzkirina te, bêhnkirin û mistdana porê te kiriye. Yek jî sihetên me yên bi demjimêran berdewam dikir. Ew qas tişt hene dixwazim bi te re parve bikim. Pir pêwîstiya min bi guhdarkirina te û behsa xwe ji te re kirin heye.

Îro roja damezrandina PKK'ê ye û gelê me vê rojê bi coş pîroz dike. Ez jî di destpêkê de li Rêber Apo, hevalên me yên hêja ên di oxura azadiyê de li girtîgehan li ber xwe didin, yek jî cejna te, yê evînê di dilê min de mezin dike pîroz dikim.

Lêhûrbûna min a îro hemû li ser dîroka PKK'ê bû. Yek jî min nirxandinên hevalên rêveberiyê yên di radyoyê de guhdar kir. Dema min ev heval guhdar dikir weke dilê min di qefesa sînga min de bi cih nabe û wê derkeve dibû.

Hebûna van hevalên di asta koma destpêkê de pir hêz dide. Yek jî mirov xwe bi şans hîs dike. Tu dîroka PKK'ê ji van mirovên duh û îro avakirine guhdar dikî. Tevî hemû êş û zehmetiyan em dîsa gelek bi şansin. Min pir bêriya hevalê Ebass, hevalê Cuma, hevala Sozdar û hevala Bêrîtan kiriye.

Dîroka PKK'ê dîrokek cuda ye. Di hemû dem û çaxan de xwedî felsefe û bîrdoziyek derbazdare.

Mizgîn giyan; diyariya herî xweş a îsal ji radyoyê bihîstina dengê te bû. Kelecanekê wisa ez girtibûm nikarim vebêjim. Ji kêfxweşiyên çavên min tijî bûn. Min ew kêlî hestên pênaseya wan zore jiyan, min banî hemû hevalan kir ji bo guhdarî te bikin. Min xwest kelecan û kêfxweşiya xwe bi hevalan re parve bikim. Hevalên jin ên li gel min jî bi hezkirin guhdarî te kirin. Wan jî hema dengê te naskirin. Dema te di radyoyê de behsa

min dikir, min jî dixwest tu bizanî wê kêliyê ez guhdarî te dikim. Piştî demek dirêj dengê te bihîstin pir xweş bû. Pêwîstiya min pir bi bihîstina vî dengî û guhdarkirina vî dilî hebû.

Min berî niha demekê name ji bo te nivîsand. Ji ber çûn û hatin nîne hevalan name neşandine. Name dîsa ji min re şandin. Ji ber negihîştîye te pir xemgîn bûm. Ji bo biharê bişînim ez ê veşêrim. Erê hevala min a delal, mamosteya min a jiyanê. Ez bi te re dimeşim, dûrbûna di navbera me de tenê fizîkî ye, ji derveyî wê tiştek din nîne. Ji ber vê ez her ku li şînahiya asîmanan dinêrim tu dibî asîmanê bi min re dikene. Pêkenînên te dibe livîna dil, kelecana û xwîna di demarê min de di herike.

28 Mijdarê 2009/ Geliyê Cengîz

Bêhêzbûn

Mirov bi qasî bêdewîbûnê kûr, xweşik û nepenî ye. Di heman demê de bi aliyên xwe yên nayên dahûrandin, demdemî û weke girêkek kor li hemberî me disekine. Bi taybet zilam bi rastiya xwe ya reben hikûm dike, bi tîrsa rebeneniyê dayê re hikûm li xweza û jinê dike. Jin jî dibe evîndarê vê koletiyê û heta dawiyê hewl dide xwe bi zilam bide qebûlkirin, di siya zilam jiyanê de bi rê ve dibe. Di rastiya xwe de mirov nikare ji vê re bêje jiyan jî. Ji ber jiyan pîroz e, divê mafê jiyanê bê dayîn.

Mirov çima ew qas xweperest û jiyanê qirêjê dikin? Cîhanê tînin rewşek wisa jiyan neyê kirin? Lê mirov hebûneke dihezîre û hestiyar dibe ye? Çima ew qas jehrê li cîhanê belav dikin? Ya rastî dikare bibe dostê xweza, hevala dinyayê û çavkaniya morala jiyanê.

Ev cîhan bi rengên xwe xweş û bi wate ye. Lê belê beşer rengbûnê weke înkara hev fêm dikin. Heta henaseya xwe ya dawiyê mirovan tine dikin. Çi kuştinên fîzîkî çî jî kuştinên rihî wisa berdewam dike û diçe.

Mirovê xwe nas nake çiqas komîk dibe. Di nav jiyanê de vediguhêre geşmeran. Mirovek reben dibe weke şêr û hewl dide lewaziya xwe veşêre. Xwe wisa hêza bêhêzbûnê dide nîşan.

Perwerde weke axek bi berhem e

Wek tê zanîn di pêvajoya pratîkê de pir zêde derfeta gerîla ya pirtûk xwendinê nîne. Lê di mehên zivistanê de derfeta xwendinê pir çêdibe. Lê dîsa gerîla vê demê kêm dibîne. Ev dema heyî qet vale derbas nakin, her tim hewl dide bi xwendin, nivîsandin û bi komî perwerde dîtîne tijî derbas bike. Perwerde ji bo mirov weke axek bi berhem e. Mirov di axên bi berhem de çî biçîne şîn dibe. Dema gerîla jî xwe perwerde bike û lêhûrbûn bike weke gulekê şîn dibe û hêz dide derdora xwe. Ji bo perwerde watedar be, divê weke avê pêwîstî bi perwerdê bê dîtîn û bi çar destan bê girtin.

Bi rojane em di bin erdê de ne. Her hevalekê pirtûkek xistiye destê xwe û dixwîne. Bi hêz xwe ji bo biharê amade dikin. Hewaya hundir hinekê giran e. Em car caran ji bo hewaya paqij bigirin serê xwe di derî re derdixin, piştî em henaseyek digirin hema dikivin hundir. Car caran berf dibare, lê zû dihele.

Em weke tîm hemû pir pirtûk dixwînin. Hevalên xort weke hemû deman sist nêzî xwe perwerdekirinê dibin. Dibe hinek caran em li ser pirtûkan radizin. Hevalên ku hevalan di vê rawestandinê de dibînin pîrçênî bi wan dikeve. Dema hevala razayî şiyar dibe ew jî beşdarî ken dibe. Ji bo heval bi roj ranezin zorê didin xwe. Em şev jî dereng radizin. Em serê sibê di demjimêr 5.30'an de radibin.

Ger hinek pirtûk bi sûd jî bin bêhna mirov pê teng dibe. Her weke pirtûka hevala Bêrîtan a kaosê. Hevala Toprak sax be tevî qelebalixiya nêvengê bi rîkek mezin dixwîne û hinek caran a xwendî bi me re parve dike, bala me jî dibe ser. Mereqa hevala me Zeyneb jî xwendine. Lê divê em hemû ev tişten me xwendine bi rastiya jiyana xwe re bikin yek. Jîyan eyneya mirov e. Mirov di vê eynê de çawa be di jîyanê de jî wisa tê xuyakirin.

Ez pir pêwîstî bi xwendin û xwe perwerdekirinê dibînim. Wek jinekê her roja diçe ez ji xwe re dibêjim, tu di naskirina gerdûn û dinyayê de

pir lewazî. Divê bi ser demê de biçim, birêxistin bikim û xwe bi awayek bi hêz perwerde bikim. Divê hevalan jî perwerde bikim û xwe ji bo pêvajoya biharê amade bikin.

14 Kanûnê 2009

Merheba

Ez ji ku derê dest pê bikim, ji ku dera gotinan dest pê bikim? Çiqas zehmete ku mirov xwe vebêje û bide naskirin.

Bager di hundirê min de radibin. Ev bager êş û tenêbûna min zêdetir kûr dike. Kêmek mabû ez bêjim êşên min qalik girtin û sax bûn, lê te-maşe dikim ji hemû deman zêdetir xwîn ji birînên min tê.

Dijmin îro li Mûşê êrîşî gel kiriye û du mirovên me yên welatparêz şehîd ketine. Her ku diçe şertên jiyana Rêbertiyê jî zehmet dikin û tecrîtê di nav tecrîtê de pêk tînin. Ji aliyekê ve êrîşên li ser Rêbertiyê, li ser gel û ji aliyê din ve jî êrîşên bi gelemperî li ser xebatkar û qada xebatê heye. Em ji ber derfetên zivistanê nikarin tiştêkî bikin û dibin dîlê van derfetan. Ji ber mirov ji van tiştên tîn jiyîn re nabe bersiv xwe şkestî hîs dike.

Ji ber ez di nav giştî de pir zuwa dimînim hevalekê ez rexne kirim. Ger lo ez hestiyar nêzî xwe dibim? Erê, ez îşev giriyam, min xwe pir bi tenê hîs kir. Xala ez pê êşiyam û xemgîn bûm, çima ez tam nayê fêm kirin. Ger hevala herî nêz tam fêm nake wê demê pirsgerêk xwe tam nedana fêmkirina min e. Dema ez neyê fêmkirin, zehmetî dikşînim û teng dibim. Ev tengasiyên min demkî ne, tê û diçe, a herî girîng li ser baskê qiqilbazekê xwe berdana deryayê ye.

15 Kanûnê 2009 Geliyê Cengîz

Rêxistinî, riya azadkirina jiyanê ye

A şêwe dide jiyanekê felsefeya wê jiyanê ye. Her jiyan xwedî felsefeyekê ye. Darek reng û hebûna xwe bi pelên xwe yên şîn dibe û bi fêkiyên xwe dide nîşan. Çûkek her tim bi firîna xwe ya azad û bi dengê

xwe yê stran dibêje zindîbûnê dide xwezayê. Dîsa her giyayek jî bi rengek cuda û bêhna xwe hebûna xwe nîşan dike.

Derûniya gelek bindest cuda ye. Gelê Kurd jî tê çewisandin, lê li hemberî dagirkeran şerek bi rûmet dikin. Bawerim ji bo wî gelî ji nû ve vejîn qet hêsan nebû. Di derbarê vê çîroka vejînê de bi hezaran roman dikare bîn nivîsandin. Jiyana her Kurdekê romanek e. Ên herî zêde êş kişandî jin in. Jin hem ji aliyê dewletê ve hem jî aliyê zilamên civaka di nav de zextê dibîne. Jin her tim di nav êşê de diperpîte. Lê niha jina Kurd jî di nav van êşan de têkoşîna xwe ya bi rûmet û serhildêr dide. Ronahiyek di dilê jina Kurd de heye. Ew ronahî ti caran jina Kurd bi tenê nahêle. Ew ronahî bi tenê hat hiştin, lê wî kesek bi tenê nehişt û jiyanek azad diyarî jinan kir. Jin fêr kirin ka dê çawa weke berfînek serhildêr di nav wê jiyanê de bin. Em deynarê vê roj û ronahiya pîroz in.

Em weke jinên milîtan ên li çiya têkoşînê dikin cihê xwe di nav vê jiyana pîroz de digirin. Rêxistinbûn jiyanê me diparêze. Ger ev rêxistinbûn nebûya ti ferqa me ji mirovên medenî yên ji rêzê nedibû. Rêxistinbûn mirov dike milîtan û dibe panzehîra hemû paşverûtiyan. Jiyanêke rêxistinbûn bi kar neye, bi her cure kirêtî lê tê jiyîn. Li wê derê hevaltî jî nabe.

Me weke tîma şehîd Avesta civîn çêkir. Di vê civînê de gelek mijar hatin ser ziman. Her hevalekê lêhûrbûna xwe veguest. Li gel rexneyan rexneyên xwe jî dan. Girêdayî xalên kêman perspektîfek derket holê. Nirxandinek radîqal hebû. Vekirîbûn û radîqaliya hevalan a li hemberî hev ez kêfxweş kirim. Em hemû bi hêz ji vê civînê derketin.

Em wisa yeqîn dikin ku divê rêbazên me yên dewlemend ji bo hevala Amara ya nû hebin. Hevalên di tîmê de girîngiyê didin perwerdeya xwe. Her heval pirtûk dixwîne. Hevala Berfîn rêwitiya serhildanên Kurdan dike û di vê rêwîtiyê de têra xwe xemgîn dibe. Bêduayan li dewleta Tirk dike. Hevala Amara jî bi xwendina pirtûka behsa çîroka zarokek kêmendî dike hewl dide xwendinê fêr bibe. Zehf ber zaroka kêmendî jî dikeve. Hevala Toprak jî bi gumana dem têra wê nake şev- roj parêzname dixwîne. Dixwaze bi awayek bi hêz lêhûrbûn bike. Dengê herî biçûk jî wê nerihet dike. Dema wê ya ji me re veqetîne nîne. Ji bo

rêz û hevokê fêm bike dubare dubare dixwîne û nîşe digire. Hinek caran pênuşa wê jî dixitime, lê hevala Toprak naweste û ji pênuşan aciz dibe.

Hevala min a bi kelecana Bêrîvan jî li ser mijarên zanistî lêhûrbûn dîke. Tenê bi lêhûrbûnê jî namîne, hewl dide hestên mirovên zanistî yên li aliyên din ên cîhanê û di çaxên raborî de jiyîna hîs bike. Her wiha dibêje, “ew jî bi tiştên pîroz re mijûl bûne, lê bi demê re ketine xizmeta pergalê” û hêrsa xwe tîne ziman. Heyerani hewldana mirovên bi zanistê re mijûl bûne. Yek jî hevala Bêrîvan ji felsefeyê hez dîke.

Ez pir kêfxweş dibim bi jinên wisa delal ên ji bo pêşketinê eleqedar û bi mereq hêz ji wan digirim. Jinek bi qasî xwe perwerde bike dikare xwe ji pergalê qut bike. Jinên li Tetwanê di wargeha di bin erdê de jiyana nû wisa ava dikin. Her çendî kêmaniyên me her yekê hebin jî em ji dil girêdayî Rêbertiyê ne.

Li Xerzanê rojên wisa bi wate jiyîn ji bo min pir cuda ye. Dixwazim bêjim ez pir kêfxweşim.

24 Kanûnê 2009

Sala nû

Em dema dikevin salek nû êş, xemgînî û şkestin xwe li dilê min dipêçin. Sala nû ji bo gelek mirovan dibe wesîleya hêvî û destpêkên nû. Gelek mirov jî êşên xwe ji bîr nakin û sala nû pîroz dikin.

Em ê bikevin salek nû. Baran ji derve dibare. Di wargeha me de ji ber jeneretora xirabûyê em bê ronahî mane. Em nikarin bîlgîseyarê bikarbin, belgên me hemû di bîlgîseyarê de man. Tiştê herî xirab em îsal jî nikarin Sosyolajîya Azadiyê bixwînin. Ev rewş moralê min xirab dîke. Nexwendina parêzname ya îsal ji aliyê milîtanek PKK'ê ve şerm e. Nîşana şoreşgertîya nîvçe maye. Em îsal xweşik nikarin notên hevdiştinê ji bêtêlê guhdar bikin. Her wiha nikarin talîmatan jî bigirin. Ez nikarim vê rewşê qebûl bikim. Wê bê ronahî jiyan zehmet be. Ger me destpêkê li gor derfetên ronahiyê şêwe daba xwe me dê îro zehmetî neqşandiba, me ji bo nebûna ronahiyê vebijerek ava kir.

Em dema dikevin salek nû ez di xwe de kelecane kêman dibînim. Şkestin û xemgînî zêdetire. Hêviyên xwe yên pêşerojê wîndî dikim, bi hêvî me, lê belê ez jî ne bi navkirina vê bêkelecaniya xwe de zehmetî dikêşînim. Di rastiya xwe de rewşeke neyê fêmkirin nîne. Ez dîsa bi hevaltiya xwe ya kêman re dikevim sala nû.

Ez nizanim ma ji sala nû re bêjim tu bi xêr hatî. Ez îsal jî weke salên din dixwazim di 11.55'an de ji derve bim. Di bin nihêrînên şîna de bi dilê xwe dixwazim banî Îmraliyê bikim.

Jiyan hinek deman weke ji xalên erzan pêk bê, ji rêzê dibe. Girînge jiyan bi azadiyê were strandin. Bendewariyên min ên ji bo sala nû pir in. Ger ev sal jî weke salên din derbas bibe dê nebaş be. Ez ê hewl bidim ji bo ev sala min xweş derbas bibe, ez ê mirovan jî vexwînim wê. Ger kesayetên zehmet li pêşiya min hebin jî ez ê nekim asteng. Ez ê destûr nedim ti kes paşverûtî û kêmaniyên xwe bi min îzah bike. Ez heta bi felsefeya Rêbertiyê bimeşim dê ev zehmetî min zivêr nekin. Weke hevala şehîd Sema gotî, “heta rihê PKK'ê hebe dê mirovên bêhêz nebin.”

30 Kanûnê 2009

Salên çuyî

Êdî em roj û demjimêrên sala nû dijîn. Îsal li gor salên din bê berf bû û xweza mûwazam bû. Di demjimêr 11.45'an de ez û hevala Toprak çûn derve. Dîmana ji derve aramî dida. Asîman zelal bû û şîna asîman mûhteşem bû. Di nav vê şîniyê de stêrk pir xweşik digirnişîn. Daran serê xwe ber bi asîmanan ve bilind kiribûn û bi çeqên xwe ji bayê re çepik lêdîdan.

Li lûtkeya çiyayê li hemberî me berf heyê. Her weke bişîbe kumê bes-tênîne. Dengê ava robar bêdengiyê xirab dike û zindîbûna xwe di guhê me de fikir piste pist. Ez hezkirin û bêriyên xwe yên di nav vê şeva xweşik de ji Rêbertiya xwe re dişînim. Di kêliyê de min rihê xwe berda kûrahiya xwezayê. Ez wisa bûm weke henase li gel we bigirim. Ji ber

vê min pir aramî ji xwezayê girt û kelecaneke di pênasikirina wê de zehmetî dikînim hîs kir.

Rêberê min, dîsa bi hesret sala we ya nû pêroz dikim û ji bo bibim rêhevalek rasteqîne biryardariya têkoşînkirinê didim. Mizgîna min, di kesayetiya te de sala nû ya hemû jin, dayîk û zarokan pêroz dikim.

Bi hêviya hevdişînê.

1 Çile 2010

Bêmirinbûn

Jeneretora me çênebû û em hîna di tariyê de ne. Gelek belgeyên perwerdê di hardê de qifilkirî man. Me weke rêveberiyê biryar girt em jeneretore ji rojeva xwe derxin. Me got; herî kêr em tevdêra gazê bigirin ji bo têra lampan bike. Hevalên me di rojên salê yê dawiyê de di tarîtiya şevê de ketin ser rîyan û gaz anîn. Di xala ewlekariyê de gumanên me hebûn. Lê baş bû tiştê çênebû. Koma çûne peywirê motorsiklêt li wir dîtine û dibêjin; em dikarin ji wê sûd bigirin. Ango dibêjin; em dikarin enerjîyê ji motore bigirin û akûyan tijî bikin. Vê nêrîna xwe ji hevalên xort ên di rêveberiyê de dibêjin, alîkariya avaniyê jî digirin. Hevalên rêveberiyê jî qebûl dikin. Me carekê bihîst hevalên xort çûne motosiklêtê binin. Ev pêşniyar bi hevalên jin re parve nekin. Ji ber em di van şert û mercan de tevgerîna şaş dibînin û em rast nabînin motostiklêt bê dizin. Hevalên me dibêjin; em ê biharê teslîm bikin. Tu dema ji wan re dibêjî diz, pir aciz dibin lê bi bertek nêz nabin. Bi kurtî kom berî me agahdar bike bi lez û bez çûne motorsiklêt dane pişta xwe û anîne. Sibê zû karê hevalên jin ê destpêkê bi çavên me-reqdar li motorsiklêtê dimêzin. Em ji ber vê rewşê hem aciz dibin, hem pê dikenin. Heval bi vê tenê jî razî nebûne, ji bo kar tam xirecir bibe kursiyek şkesî, eynika bejinê û kevçiyên dar anîne.

Em bi çareserikirina ronahiyê ve rihet dibin. Vê carê em wargeh hemû bi jehrê dikivin. Em hewl didin bimeşin serê me dizivire, em hewl didin xwe dirêj bikin ew jî nabe. Dilê me gurmegurm davêje. Ez bi vê êşê xwe

davêjim derve. Hemû kes ketiye rêzê ji bo hewayê paqij bigire. Dema ez diçim ber derî yekî li ser çongan xwe kom kirî li ber lingên xwe dibînim. Ez ji ber ser zivirandinê nas nakim kî ye. Bi dengê nizim ê tê guhê min, fêma dikim hevala Zeyneb e. Ji taqet ketiye û bêhna mazotê ew jî bi jehrê xistiye. Di tarîtiya şevê de dengê veraşandina me vediguhere koro. Bi tîrsa em ê bi sermayê bikevin li ser derînceyan hêdî hêdî dikevin hundir. Heval hemû li ser hişê xwe çûne. Ez jî hema xwe davêjim erdê. Rewşa min a li ser piyan bimînîmin nîne. Hevala Toprak û Bêrivan ên li hemberî jehîrketinê li ber xwe didin nizanin wê çi bikim. Hewl didin dermanekê bibînin.

Ez serê sibê bi dengê rojbaşê hevala Toprak şiyar dibim. Bersivê didim lê nikarim rabim. Heval hemû nexweşin. Lê rewşa min û hevala Zeyneb nebaşê. Hevala Bêrivan neçar dimîne bi tenê taştê bixwe. Ez heta nîvro nexweş li erdê me û ji ber vê perwerde taloqî piştî nîvro kirin.

Motorsiklê jî di destê me de li ber xwe neda û wê jî pes kir. Ji ber hinek sedemên em nizanin naxebite. Roja tekmîlê hat. Hevalên jin li cihê xweser nêrînen xwe gotin. Nêzîkatiya hevalên xort a şaş hat rexnekirin. Her wiha motorsiklê ji rojevê derket.

7 Çile 2010

Merheba

Ez nizanîm dem mirovan diguherîne yan mirov hikûm li ser demê dike. Têgeha demê her tim bala min kişandiye. Min her tim li gor xwe wate li demê bar kir. Dem her tim jî bo min remza nîvçemayîn, şkestin û îtop-yayên min ên divê bigihimê nîşa dide.

Ez dîsa bi tenêbûna dilê xwe re rû bi rû me. Ez dîsa bersivan nagirim û di tenêbûna xwe de dişewitim. Çend rojin em parêznameyê dixwînin û me dest bi nîqaşê jî kiriye. Em hewl didin fêma bikin û bizanin. Ez her ku dixwînim û lêhûrbûn dikim, zêdetir kêma mayîna xwe dibînim û di fêmkirin û dahûrandina gelek xalên vê pirtûka pîroz de lewaz dimînîm. Ji ber di hinek xalan de danaheva min a teorîk nîne nikarim fêma bikim. Hinek xal jî ber biyaniyê xwe me di fêmkirinê de kêma dimînîm. Lê dîsa jî

her ku parêznameyan dixwînim di hundirê xwe de hinek tiştan hîs dikim. Ev hesta jinê ya hundirî ne.

Her parêznameyek Rêbertî manifestoyek e. Di van parêznameyan de mirov, xweza, gerdûn û girêdayî xweşîkbûnê çî hebe hemû heye. Her wiha dê çawa hemûyê di rih, hest, hizirandina xwe de azad û xweşîk bijî, bi şêweyê wê yê herî zelal ve datîne holê û pêşeroja me ronî dike. Ez pir ji vê parêznameya Rêbertiyê bandor bûm. Ji parêznameyên din jî bandor dibim. Lê vê carê cudabûneke nikarim pênaseya wê bikim heye. Ez dibînim min li kêleka deriyê xweşîkbûnê xistiye. Ev kelecane dide min û dibe sedem ez zêdetir jiyanê hembêz bikim. Ji ber xalên tê de şkestime bêdeng dimînim.

Pêwîst bû hinek tişt nehatiban vê rewşê. Diviya bû me destûr nedaba vê. Tevî Rêbertî pir vekirî gotiye jî xwe ker dikin an ker dikim. Ez wê wêrekiyê di xwe de nabînim hinek xalên bingeîn dest nîşan bikim. An ji destnîşakirinê ditirsim, ez xwe li hemberî dijimin çiqas bê hêz dibînim. Ez wijdan ezabî dikşînim. Ji aliyê ehlaqî ve xwe lêpîrsîn dikim. Destnîşankirinek Rêberê min hebû digot; “pêwîstiya azadiyê bi ehlaq heye.” Em ne azad in û ne azad im. Wê heta kengê ev seknên me berdewam bike?

Rêberê min; zehmetiyê dikşînim. Dê ev zehmetî min paşde nebe û ez ê teqez bi ser bixim. Ez ê li hemberî demê bin nekevim. Ez ê bi ser xwe de biçim û bi parêznameya nû re xwe nû bikim. Êdî ez ê wê fêrbûn û jî rêzêbûnê nejm.

Rêberê min; ez wisa hîs dikim ji ber hemû hevalên min ên jin nabin bersiv zehmetiyê dikşînin. Em hemû heman êşan dikşînin. Em hemû di nav wateya heman lêgerînan de ne. Em hemû li dû bûna hevalê Rêbertiya xwe ne. Hezkirinên xwe yên bê dawî ji we re dişînim.

11 Çile 2010/ Geliyê Cengîz

Rêxistinî bûn

Em çima zilam weke pergalekê nabînin û bi vê ferasetê li hemberî wan şer nakin? Tevî ku hişmendiya serdestiya zilam me tengav dike û li ber

çavên me jiyanê dixin, çima em hîna nikarin bi hêz bi vê hişmendiye re bi nakok bin û li dijber rawestin? Ez di vê mijarê de kêmaniyên pir cidî dibînim. Ji ber zîhniyeta zîlamê serdest weke pergal nayê dîtin, nakokî nînin û rihet disekinin.

Dibe gelek mirov vê nêrîna min qebûl neke û bêje, nakokiya me bi pergalê re ye. Ez jî dibêjim; raste em di xalên sereke de nakokî dijîn. Em têdikoşin, lê di hundirê xwe de zîlamê baş- xirab pênasêkirin heye. Di zîhniyeta zîlam de cihê nasnama jin nîne, tenê cihê çend jinan heye. Zîlam bi pîvanên şexsî nêzî jinê dibe. Yek jî ger zîlamêk pir vekirî hewl dide rêxistinbûna jinê bi rêbazên xasok parçe bike, ku dera wî zîlamî şoreşger e?

Ez ji vê bawer dikim; ger jinek van nakokiyan di cewher de bijî wê bi misogerî têkoşîna zayendî ya wê jinê ne rojane, dê her tim be. Bi hêviya yekîti û rêxistinbûna jinê ya pêşerojê.

11 Çile 2010/ Geliyê Cengîz

Baweriya bi hevaltiyê

Mirov bi qasî ji hevalên xwe bawer dike û bawerî ji hevalên xwe digire heye. Bi qasî ji hevalên xwe hez dikî û hevalên te ji te hez dike heye. Bi qasî girêdana te ya ax û xwezayê dikare nirxa te ya civakî bi hêz be. Bi asta gerîla girêdayî gelê xwe ye, êşên gelê xwe hîs bike dikare bibe gerîla û rihê xwe yê fedaî derxe holê. Gel jî bi qasî xwedî li zarokên xwe yê rastî û rastiya çalakiya xwe derkeve dikare azad bibe û xwedî li nasnameya xwe ya rûmetê derkeve.

Xweza û jiyan, mirov û jiyan, dem û mirov bûyera enerjî ya her tim hev xwedî dikin e. Qet tiştek bi tena serê xwe çênebûye û nemirîye. Her tim bi diyardeyên hev xwedîkirinê pêşketine. Xaleke jiyanê ya herî girîng jî wate ye. Fêmkirina jiyan, mirov û xwezayê. Bi qasî xwezayê fêmkirî sade dibî û bi qasî hevalên xwe fêmkirî dikarî bibî alîkar. Wate asta hezkirin û kedê ava dike ye. Hezkirin girêdaneke jiyanê bi hêz dike ye. Diyardeyên ku di wateya giyanwerî de dilxweşî, hêz û bawerî didin mi-

rov, encama parvekirinên dafirînin û peywendiya tenduristî ya bi xweza û civakê re pêk tîne ye.

Pîvana bingeîn a PKK'ê nirxdayîna hevaltiyê ye û berî xwe li hevalên xwe hizirandin e. Xwe birsî hiştin û hevalên xwe têrkin, li hemberî guleyên dijmin xwe kirina qalqane ji bo hevalên xwe. Gelek caran heval wisa hatine xilaskirin. Bi qasî dizanim di oparasyona 1998'an de bi gotina hevala Agirî ya di aqilan de maye dibêje; " şêr şêre çi jin çi mêr e" ji bo hevalê Cemal biparêze xwe davêje ber guleyan. Hevala Agirî di dîroka me de yek ji wan fermanدارên rast ên bi wêrekî, şerkerî û ji dilbûna xwe dihat naskirin e. Hevala Agirî di oparasyona Nîsana 1998'an de li Botanê hatî destpêkirin xwe feda kiriye. Hevalê Cemal ji çepera lê ye derdixe û hewl dide bibe cihek hîn parastî. Ji ber hevalê Cemal kordîneyê şer e, bi parastina kordîneyê ve hewl dide pêşî li binketina şer a giran bigire. Bawerim ên berpirsê partî û rêxistinê ne pir baş dizanin dê çawa nêzî hevalên xwe bibin. Hevala Zelal jî bi vê hestê bi fedayane şehîd dikeve. Hevaltiya PKK'ê wisa ye, ji bo hevalên xwe dijî û ger pêwîst bike divê ji bo wan bimirî.

Hinek kesên beşdarî PKK'ê dibin ji vî rihî bê par dijîn. Di gelek xalan de pîvan hatine tevlihevkirin. Mirovên zêdetir taybetmendiya çînayeti bi wan re hene jiyanê ji rê derdixe û textîkî nêzî hevaltiyê dibe. Tenê bi çîna xwe re di nav peywendî û parkirinê de ye û di vê parkirinê de rêxistinî nîne. Peywendiyek hîn zêdetir bi ehbab-çawişî û hemrazî ye. Ev curê mirov, mirovên ne ji taybetmendiya wan veder dike û biçûk dibînin.

Her yek ji me xwedî taybetmendiya xirab in, lê ya girîng ji wê acizbûn û ji holê rakirin wê ye. Hinek mirov hewla xwe guhertinê nadin nîşa. Ez dîsa berê xwe didim hesta *bi qasî ji hevalên xwe bawer bikî, ew qas ji jiyanê hez dikî û tu wisa dikarî bibî hevala PKK'ê.*

25 Çile 2010/ Geliyê Cengîz

Îmralî

Li hemberî her nota hevdîtîne zêdetir li ber xwe dikevim. Dijmin bi ser Rêbertiyê de diçe. Rêbertî jî dibêje, “êdî rêxistin çî biryarê digire bila bigere û xwedî li biryara xwe derkeve.” Bi rastî ev rewşek metirsîdar e. Me Rêbertî anî rewşek wisa ku di navbera çar dîwaran de ji me re bêje, “pêwîst dike hûn bi xwe biryara xwe bigirin.” Dê dijmin dîsa ji ber van gotinan sizayê hucreyê bidin Rêbertiyê. Wê bêjin; hûn fermanan didin rêxistinê. Em niha hemû di ber wê çala mirinê ya Rêbertî tê de ye berpirsyar û gunehbarin. Kes nikare xwe bê guneh bibîne û ji vê rastiye bireve.

Di rastiya xwe de biryar eşkereye. Li hemberî vê rastiya dijmin, biryara were girtin biryara şer e. Biryara fedaiybûn û di derbarê pêkanîna wê de lêhûrbûnên min hene. Em dikarin li hemberî êrîşên dijmin bi rihek fedaî bibin bersiv. Pêvajo pêwîstî bi çalakiyên fedaî dibîne. Her weke ew gotina hevala şehîd Bêrîtan pir jê hez dike, “şoreş kesayetên weke tofanê dixwaze.” Pêwîstî bi kesayetên gotin, pratîk, jiyan, hest û hizirandê dike yek heye. Di wateya hestî de, ez ne di nav nêzîkatiyek ka ez biryarekê bigirim de nînim. Berûvajî wê pir bi hizirandinê digihim asta biryar girtinê, ji bo bi xeyalên xwe re berûvajî nekevim. Hestên bi hizirandinê hatine starndin çalakiya jiyanê pêk tîne.

26 Çile 2010/ Geliyê Cengîz

Merheba

Di hinek kêliyan de rojanebûn me ji kêliyên dîrokî dûr dixê û dike dîlê herîkîna xwe. Lê belê çiqas lêhûrbûnên min li ser pêvajoya cuda bûn. Di navbera van bê watebûnên tîn jiyîn de her tim hevala şehîd Viyan tê bîra min. Em nêzî salvegera şehadeta wê dibin. Heta ew roj jî hat, lê me nikaribû lêhûrbûnên xwe bi hev re parve bikin. Lê min çiqas xwest rih, lêhûrbûn û hestên hevala Viyan bîn bihîstîn. Min çiqas xwest bi 1'ê Sibatê re weke dînan bi hevala Viyan re bikevin ser rê. Ez naletê li van kêmaniyên dijim tînim. Çima tiştên erzan tîn me dibînin. Em di nav tevgerê dîrokî de ne, derfet û şansê me yê em bibin kesayetên dîrokî jî heye. Lê mixabin ez û gelek ji me dibin xwedî jiyana roja ne. Ez pir ji vê aciz dibim.

Ji ber nêzîkatiyek erzan hevalên jin bûn mijara nîqaşê û ev jî pir zora min çû. Nirxandinên di cih û ne di cih de li ser hevalên jin hatin kirin. Lê em çiqas mijûl bûn ji bo wisa nebe. Hêza me ya razîkirinê çiqas lewaz e. Em nikarin mirovekê biguherînin. Ew rojeva me diyar dike û bandorê li ser lêhûrbûnên me dike. Em xwe lêpirsîn dikin. Nexwe ez di partîbûnê de lewaz im û min xwe di warê bîroziyê de çenekiriyê. Em bi vê rewşa dawî hatî jîyan re fêhm dikin ku jiyana me ji mirovan re balkêş nayê. Ev jî mirovan dide şermê û bandor dike. Lê belê jiyana PKK'ê hêja û bi wate ye.

Ji aliyekê ve ev bêwatebûna bi lanet me aciz dike, ji aliyê din ve jî kêmaniyên di gîştî de tînin jiyîn hatin rojevê û hewla li ser sekinandinê tê dayîn. Ji destpêka pratîkê heta niha hinek nêzîkatiyên ji hev xeyîdandin, bi hev re neaxiftin û nêzîkatiyên veder bûn mijara rexneyê. Di jîyan PKK'ê de cihê ji hev xeyîdinê nîne, lê em dibînin hevalan ev paşverûtî hêjayî xwe û me jî dîtine.

Hevalan bê rêbaziyan min rexne kirin. Bêrêbazî mirovan nade fêmkirin û bi armancê wê re rû bi rû tîne. Ez lêhûrbûnê li ser bêrêbaziya çêdikim.

Vê carê kêmaniyên nû û cuda hene. Em weke hêza jin pêwîstiya me bi nîqaşkirina hinek xalan û hewla watedayîna heye. Ez ji hevalên xwe bawer dikim û jidilbûn û hevaltiyê di wan de dibînim. Hinek taybetmendiyên me ne wek hev in, lê em di dil, armanc û lêgerînan de xwedî heman îpoyaya nin. Em ê bi azwêriya xwe ya hevala Viyan bi şeweyê rengê jinê yê herî xweşik di jîyanê de bidin hîskirin.

3 Sibatê 2010/ Geliyê Cengîz

Heta tu hebî xweşik dibim

Her ku li we dihizirim ji jîyanê hez dikim. Heta hûn hebin dibim çavkaniya jîyanê. Her ku ji te dûr dikevim li zinaran diqelibim û ji xwe biyanî dibim. Tiştên ne yê min in bi wêrekiya şûr qut dikim û davêjim. Dema ez li hemû dem û waran bûna te bi ser dixim kêfxweş dibim. Kêliya ji

we dûr dikevim kêmanî dest pê dikin. Hûn hêza wateya îtopya û hezkinê ne. Hûn okyanûs, dîrok û gel in.

Mirovê Zana. Okyanûsa dilê min. Sonda min a bûna hevala we azweriya min a herî mezin e. Ez ji ber vê henase digirim. Ji ber vê ez li hemberî ferzêkirinê zilamê serdest û nêzîkatiyên jina hevkar serî natewînim. Bi qasî bûyîna te bi ser bixim dikarim ferasetên nexweş û paşverû tine bikim. Bi hêvî û baweriya hevdîtina rojekê bi çar destan jiyane hembêz dikim.

9 Sibatê 2010

15'ê Sibatê û rêhevaltiya me ya kêr

Em bi bizavek giran Sibatê nîvî dikin. Sibat weke agirkî paşverûtiyên min dişewitîne. Ev meh ji bo mirovên bi wijdan, meha xwe lêpîrsîn û dadgehkirinê ye. Yê ku xwe lêpîrsîn neke, nikare dijminê di encama komployekê de Rêbertiya me li Îmraliyê dîl digire jî lêpîrsîn bike. Nikare şerek bi hêz li hemberî dijmin bide. Ji ber me xwe bi hêz nedahûrandiye, me nekarî bibin rêhevalên Rêbertiyê. Em bi vê hevaltiya xwe ya kêr di labîrantên xefletê de winda bûn.

Di nav lêhûrbûnek hundirîn de me, xwe di mîfsika me ya pîvanên azadiyê de derbas dikim û hewl didim dahûrîn bikim.

Ji bo lêhûrbûna hevalên li wargehê bandor neke, xalên ku baldar nêz dibim hene. An ez gelek xalên xelet û nebaş dibînim. Kes nikare qilîfekê ji van kêmaniyan re bibîne. Dibe mirov bêje cihê lêhûrbûn lê hebe, divê helwest û bertek hebin. Ev tişt a divê bibe ye, lê ferqêkirin û jiyankirina kes zêdetir encam digire. Dema mirov ji xwe aciz dibe ber bi azadiyê ve gavan davêje. Ger tenê dema rexne û şiyarî hat, li ser rewşê bê sekîandin ev metirsîdar e. Ji ber ev nêzîkatî heta cihekî ye, ji ber dê piştî heman tiştan bijî. Ger bi têgihiştin nêzî rexneyên tên bibe dê guhertin zêdetir mayînde be.

Divê mirov hinek caran bi xwe re bimîne, ji bo xweşikbûn û paş-verûtiyên xwe bibîne.

10 Sibatê 2010

Lêhûrbûna hestan

Her ku hest lêhûrbûnê dike qevastinek tê jiyîn û ev jî vediguhere çalakiyê. Ev hest ji dualiyên hem hezkirin, hem nefret, hem ken û hem jî girî xwe vediguherîne çalakiyê. Em dibêjin di her zindiyekê de zekaya hestî heye. Her ku hest lêhûrbûn bike têgeha hîskirin, zanabûn û fêmkirinê jî pêş dikeve.

Mijara dixwazim li ser bisekinim helwestên hestiyarî ne. Divê mirov hest û hestiyarbûnê ji hev cuda bike. Em hinek caran tevliheviya vê jî dijîn. Me di nav rastiya jina pergalê avakirî de şêwe girt, bawerim em ne mirovên pir bi tendûristin. Ji ber em ne xwedî derûniyek pir bi tendûristî ne hestiyarbûn li pêşe. Ez di xwe de asta zekaya hestî û anatîk lêpîrsîn dikim. Her tim lêgerînek min a avakirina mijara manewî çêbû. Dema hinek nebesiyên jiyanê min nerihet dike, min hewl daye rexnegir û rastiye ava bikim. Lê bi qasî tê xwestin jêhatî nebûm û di mijara avakirina rastiye de jî bê rêbaziye min çêbûn. Ev jî têkoşîna min nîvî dihêle, ji rêbaza têkoşîna encam digire dûr dikevim.

14 Sibatê 2010

Weke jin jiyan parvekirin

Ger em xwe ji aliyên xwe yên paşverû xilas bikin, dikarin xweşiktir jiyanê bi hevalên xwe yên jin re parve bikin. Dema nêzîkatiyên çînî zêdetir bi me re hebin ji cewherê xwe dûr dikevin û ji hev qut dibin. Em ê germahiya di dilê xwe de nedin hev û kenek ji dil jî zêde bibînin. Em hinek caran bi mantiqê zilam nêzî hev dibin. Yên ji aliyê bîrdozî ve xwe têgihiştî bibîne û xwe ji zîhniyeta zilamê serdest xilas kirî nêzîkatiyên wisa pê re dernakeve.

Wijdanê jina vegere cewhera xwe, bi nîrxên dîrokî re hatiye strandin. Em çima ji vê wijdanê bê par in? Em çima hov nêzî hev dibin? Lê divê ji

dilê jinên beşdarî vê têkoşînê bûne roj hil bê. Ji ber dizanin têkoşîna hundirîn bi xwe re bidin û jiyanê xweşik bikin.

Li şûna em ji hevala me ya kêmanî kirî aciz bibin divê berteka me li hemberî pergalê çêbibe. Her jina em dawetî xweşikbûnê dikin jina me ji pergalê qut kiriye. Bila em bizanin wan bikin çirûskek ji agir. Divê jinên bi lêgerîna azadiyê ji jiyan û parkirinê hez bikin.

Civaka zayendparêz jin ji nirxa wê yê cewherî dûr xistiye û li ser bingeha berjewendiyên xwe şêwe dayê. Lê Rêbertiyê ev guhert, bi hezaran jin mil bi milê hev û dil bi dil têdikoşin. Em jî pênc hevalên jin ên di nav van hezaran jinan de nin. Kêmaniyên me hene, lê ji bo derbaskirina van têkoşîn didin. Ji aliyê xwe ve lêpîrsînekê dijîm. Ev lêpîrsîn ne li ser bingeha darezandina hineka ne, li ser bingeha darezandina aliyên li ser me tên ferzkirin û derbaskirine.

Bi qasî vegera li xwe dikarin vegera li dayîka xwezayê jî çêbikin. Em her ku xwe ava bikin dikarin jiyanê azad jî ava bikin.

Êdî ez ê li dûriyê li dostaniyê negerim. Êdî ez ê bi germahiya dostên xwe yê dî ji hevalên xwe yê nêz re bibim dost. Êdî ez ê nebêjim; lê digêrim, ez ê bêjim; dibînim. Êdî her çendî nêzîkatiyên zehmet hebin jî, êdî ez ê her tim bizanim têbikoşim û bi aliyên mirovan ên xweşik bigêrim.

18 Sibatê 2010

Sibat

Sibat xemgîniya sar hildigire, ez jî êşa deyndayîna xwe dijîm. Heta dest û dilên Sibat di tariyê de fetisandî parçe nebin wê êşên min her tim hebin.

Îsal zêde berf nebarî. Berfa li giran jî dest bi helandinê kiriye. Çûk mizgîniya biharê tînin. Ba jî têhngerm tê.

Bi helandina berfê re bi dizî em xwe davêjin derve. Ez hewayê paqij dihilimjim hundirê xwe û noqî dûriyan dibim. Xweza jî dest bi guhertinê dike. Bi carekê çavên min bi giyayê şîn bûyî dikeve û kelecaneke nikarim

pênaseya wê bikim dijîm. Li hemberî vê zindîbûnê dilê min livînê dijî û ji bêhn tengiya hundirê xwe rizgar dibim. Dîsa carek din hîs dikim jîyan çiqas bi nîrx e.

20 Sibatê 2010

Rihê xwezayê yê azad

Nihêrîn pênaseya gelek tişta ye? A hundirê mirov diyar dike çav in. Hinek caran dema xwe bi peyvên şaş vedibêje, dibe sedema şaş fêmkirinê. Tu tam nikarî xwe pênase bikî.

Ez dikarim hêza vegotina çavan bixwînim? Nihêrînên ez ji bo hezkirin û başiyê şîrove dikim hene. Hinek nihêrînên nebaş, vale û hinek caran dadgeh dikin hene.

Dema ez li ser nihêrînê lêhûrbûn dikim ji xwe dipirsim gelo dema xweza li me dinêre çi hîs dike? Ez bersiva vê nizanîm, lê dema mirov bi hestên xweş li xwezayê binêre, ez bawerim xweza jî bersiv dide. Em dikarin nihêrîna xwezayê di her zindiyekê de hîs bikin. Qencyên xweza didin me bi hejmartinê xilas nabin. Giyayên şîn dibin, kulîlkên dibişîştin, bayê têngerm ê xwe li giyana mirov dipêçe, roja hundirê me germ dike û robarên di nav axê de xwe berdidin û diherikin.

Divê mirov spasdarê xwezayê be. Lê bele, di roja me de pergaleke hikûm li ser xwezayê dike heye. Zaroka xwezayê îro bûye cinewerê xwezayê. Her roja ku diçe xweza hinek din dimere, lê agahiya ti kesê jê nîne. Em nikarin di roja xwe ya îro de hilweşîna ehlaq û wîjdan ji nêzîkatiya mirov a ji bo xwezayê qut bigirin dest. Îro zaroka xwezayê dayîka xwe red dike û dîkuje.

Ez her ku xwezayê di rihê xwe de hîs dikim zêdetir ji pergala kaptalîst nefret dikim. Dixwazim deynê xwe yê xwezayê bidim.

Ey bayê çiya yê rihê min hênîk dike! Ez her ku te hîs dikim, dibim a fêmkirinê û tê fêmkirin. Ji ber vê dixwazim nihêrînên wê bi wateyên wê ve fêmkim. Evîndarê xwezayê me û dixwazim hemû xweşîkbûnên wê di şaneyên xwe de hîs bikim. Dixwazim azweriya xezalê ya ji bo jîyanê,

pêşbirka qiqilbaz a bi pêlên deryayê re, meşa hespek serhildêr û gera masiyan a di nav kevzê de hîs bikim.

27 Sibatê 2010

Ji bo dayîka min a afrînera ked, hezkirin û hêviyê

Dayîka min a delal. Min bêriya bêhn û razana aram a di hembêza te de kiriye. Tu dizanî em di van rojan de parêznameyên Rêbertiyê dixwînin û nîqaş dikin. Em li hemberî rastiya Rêbertiyê sekin û zîhniyeta xwe lêpîrsîn dikin. Rêbertî di vê parêznameya xwe de pir li ser pergala kaptalîst radiweste. Kaptalîzim çawa ji nîrxê mirovahiyê hatiye qutkirin ji her alî ve me serwext dike.

Di parêznameyê de xala herî zêde balkêş yek jî keda dayîkê bi tiştêkî nayê qiyaskirine.

Dayîka min a bêhn xweş û delal! Ji ber keda te di ber min dayî min di dema wê de fêm nekiriye di aliyê wijdanî de nerihet im. Ji ber ji vegotina hestên dayîkekê bêpaarim ji xwe aciz dibim. Lanetê li feraseta xwe ya şoreşgerî ya çors tînim.

Erê, dayîka min a delal a dilê wê bi hezkirin diherike. Dema ez bi şoreşgertiya rast re rû bi rû tîm dibînim min çiqas bêmafî li te kiriye. Ez ferq dikim ku doxmayan zîhê çawa dîl girîne.

Dayîka min a delal; te hezkirin, ked û xweşbîniya xwe ji me kêr nekir. Min tiştên te dijîn fêm nedikir. Ji ber ferasetên şaş û vîna takekesî ya bê pîvan ku pergalê daye, erzan nêzî hestên te bûm. Min êş û zehmetiyên te hîs nekir.

Dayîka min a delal a dilê wê bi Rêbertiyê re lêdide. Dema Rêbertî hat girtin, dayîka min digot; “hûn çima li vir disekinîn, biçin çiya û Rêbertiyê rizgar bikin.” Gotin û hestên te her tim li ser vî esasî bûn. Ti dayîk naxwaze ji ewladên xwe veqete, lê te ev êş jî da ber çavên xwe û rîya azadiyê nîşa me kiribû. Ev gotinên te ez gelek kêfxweş kiribûm. Te hêz û moral dabû min. Ev gotin ji dayîkekê bihîstin ez şanaz kiribûm. Tola dilê te bi van gotinan jî xilas nebû, we cihê xwe di her meş, mîting û

daxuyaniya çapemeniyê de digirt. We hêrsa xwe li rûyê dijmin qêrandiye. Hevalên min ji te re digotin; “dayîka milîtan.” Hûn tenê ne dayîka min dayîka hevalên min jî bûn.

Dayîka min a delal; hûn dayîkek mezin a şoreşê ne. Ji ber te ji dil û canê xwe du giyan dane gel û welatê xwe. Me jî tama azadiyê girt. Ger ji ber hewldanên te nebûya em nedibûn şervanên azadiyê. Bi hezkirina dilê xwe û keda te ji bo mirovan dayî te em jî kirin xwedî lêgerîn. Te em ji pîvanên jiyana rêzê û kole rizgar kirin.

Dayîka min a delal; ez pir ji te hez dikim. Nikarim bêriyên xwe yên ji bo te bi rêzan bînim ziman. Di şexsê te de ji hemû dayîk û welatê xwe pir hez dikim.

Min pir dixwest carek din te bibînim. Weke gerîlayekê gelek tiştên dixwazim bi we re parve bikim hene.

Dayîka min a delal a serhildêriya azadiyê di dilê xwe de kê nake; bêhna azadiyê ji van çîyan tê, ev çîya bêhna te ji dilê min re tîne. Ev çîya bi dilovaniya te hembêza xwe ji me re vedike û dixê dilê xwe. Bi salane min dengê te nebihîstîye û silavek ji te re neşandiye. Min ti caran tu ji bîr nekirî û hûn di deryaya bêriyan a min dilê xwe de mezinkirî de ne. Ji hemû dayîkên gerîla hez dikim. Ger me silavak bi qulingan re neşandi-be, ev nayê wê wateyê me hûn ji bîr kirine, tenê derfeta me çênebûye.

Dema em li deşt, gelî, çîya û zozanên welatê xwe bi rê dikevim û ava wê ya cemdî vedixwim li te dihezirim. Dayîka min a delal, dema kulîlkan bêhn dikim û penirê Koçeran dixwim her tim tu têyî bîra min. Jiyana gerîla bêriyên te bûn û te dixwest biba gerîla. Te digot; “ger ez qet nikaribim tişteki ji bo gerîla bikim, dikarim nanê gerîla çêbikim û cilên wan bişom. Tiştên ez jî bikim hene.” Ma mirov destê dayîkek wisa girêdayî Rêbertî, welat û gerîlayên xwe be maç nake? Ji ber ev jina delal dayîka min e ez van nabêjim. Ji ber bi rastî ev dayîk dilê wê bi azadî, hezkirin û bêrî diherike ez pir ji vê jinê hez dikim. Ji ber ez keça jinek wisa me, şanaz im û dixwezim dayîka min jî bi min şanaz be. Ji ber vê tiştê ji destê min tê ez ê bikim. Ez ê bibim xwedî jiyaneke bi wate û şervanek leheng.

Her dayîka min hembêz dike û datîne ber singa xwe te bêhn dikim. Bi hîskirina te li van çiyên dijîm û di şexsê te ji bo êşa hemû jin êş dikşînin bidim derbaskirin ez ê hewl bidim bigihim mertebeya jina azad. Ger zehmetî hebin jî, bi derxistina zanabûna van zehmetiyan û bi azweriya xwe ya azadiyê re ez ê bi zehmetî, paşverûtî, serdestiya zîlam û nêzîkatiya jina paşverû re têkoşîn bikim.

Dayîka delal a keseran di dilê xwe de mezin dike; bi rêwîtiya robaran, firîna azad a çûkan û evîna min di dilê xwe de mezin kirî silav û hezkirinên xwe ji te re dişînim.

26 Sibatê 2010

Bişîrîna Îmralî Xerzan bi kelecana kir

Notên hevdişîna Rêbertiyê her weke rojê hundirê me germ dike. Rêbertî di notê hevdişînê yê dawî de dibêje, “min di sihetên hevalên TÎKKO’yan ên li vir de qirîza ken derbaz kir. Bi salane ew qas nekenîbûm.” Ev gotin kêfxweşiyê dide me. Ji ber hevalên TÎKKO yên Rêbertî wisa kenandine pir spas dikim. Bi salan nekenîna Rêbertiyê rewşek çiqas metirsîdar e. Dema em di civata hevalan de dikenin, gelo em qet hîs dikin Rêbertî di wê kêliyê de nakene? Ger bi salane Rêberê gelekî nakene, ev şerm û eyba me ye.

Rêberê min; kenê we em bi coş kirin. Hêvî dikim hûn her wisa bikenin. Ew hevalê TÎKKO’yê çiqas bi şanse, bi Rêbertiyê re daxive, dikene û dide kenandin. Rêberê min pir dixwazim li gel we bim. Ji nêz ve dixwazim dengê kenê we bibihîzim.

28 Sibatê 2010

Warê min

Bêhna biharê ji warê min tê, bêhna bêriyan ji welatê min tê. Gerîla bi kelecana biharê rêwiyê riya ne. Meha Adarê rengê cuda li xweza û jiyana gelê Kurd bar dike. Meha Adarê bi serê xwe hêvî û serpêhatî ye.

Meha Adarê cejna vejîna gelê Kurd û hemû gelên Rojhilata Navîn û 8’ê Adarê ya jin azadiyê diqêrîn di hembêza xwe de hildigire. Ger li

Başûr cihê derfet lê hebe dê heval kom bibin û li giran agir pê bixin. Wê nihêrîna her gerîlayekê bi tama helbestê biherike robaran û ji dayîka xwezayê re bêjin merheba.

Hilmijîna roja destpêka biharê pir xweş e û ji bo hêvî, girêdayî hevalên delal noqî bîranînan dibim. Ji niha de cejna jinên bûne bihar û gelê xwe pîroz dikim.

1 Adarê 2010

Merheba

Ez di dawiya riyekî û destpêka riyekî, dawiya rêzekê û destpêka rêzekê, dawiya biryarekê û destpêka biryarekê, dawiya veqetîn û destpêka veqetînê de me. Di nav strana bêriyên qet bi dawî nabin de digevizim.

Em rêwiyan pêşeroja azad û jiyanek bi wate ne. Ez hîna di destpêka şervanî û evîna xwe de me. Dema her destpêkek dawiyekê tîne, her dawiyek derî ji nûbûnê re vedike. Jiyan hinek caran dişibe robareke diherike û bi bêriyan tijî dibe. Hinek bêrî hene tu di jiyana xwe hemûyê de li dû wê dibezî, dema tu dibêjî; min girt dîsa ji nav destê te difire û diçe. Ger henase û hêza te mabe tu dîsa li dû bêrî û lêgerînên xwe dibezî. Ez bêriyan weke agirê venamire û deryaya nasekine dijîm û didim jiyîn.

Sala min li dû xwe hiştî ji gelek aliyan ve parve kir. Bi jiyîna te derketim ser riya û çîyan. Min di demên xwe yên herî zehmet û westiyayî de tu hîs kirî. Bi hezkirina Dayîka Îştar a di dilê min de ketim zanabûna zehmetiyan. Bi soza rakirina ala rûmetê, min her tim armanc kir bibim xwe û tu.

Erê, ez hatim dawiya rûpela rojnivîsa xwe ya dawî. Rêzikên lûnûsê yên dawî xilas dikim. Lênûsek nû, rojên nû û jiyanek nû bi te re parve dikim. Min her tim dixwest tiştên xweş ji vî baxçê dilê xwe bi te re parve bikim. Lê min acizî û zehmetiyên xwe jî vegotin. Min hinek caran nexwest behsa kêmanî û bûyerên xirab bikim. Min pêwîstî bi vegotina rastiyên jiyanê dît. Min ji ber vê şerê desthilatiya zîlam, koletiya jinê,

xweşikbûna xwezayê, koletî û azadiyê destnîşan kir. Ez hinek caran kenîm, hinek caran giriyam, lê ya herî girîng jî ez kêliyêk tènê ji hêviya di hundirê xwe de dûr neketim û min ew hişk hembêz kir.

Mirovên pir delal hene ku dixwezim rojnivîsa min bixwînin. Dibe tiştekî di rojnivîsa min de wan pêş bixe, perwerde bike û ezmûn bide wan tinebe. Lê ez dixwezim bi xeletî, rastî û bêriyên min ve min nas bikin û fêhm bikin. Daxwaza min a ji bo hevalên rojnivîsa min bixwînin ev e.

Ger rojekê ew şansê min ê dîtina Rêbertiya ku min her tim bêriya wî jîyan kiriye û hêviya dîtîna di dilê xwe de zindî hiştiye pêk neyê, dixwazim bi navê min qevdek kulîlk jê re bê dayîn. Dibe ev daxwaziyek mezin be lê dixwezim Rêberê min jî rojnivîsa min bixwîne.

Dixwazim hevala Sozdar Avesta, hevalê Ebass û hevala Mizgîn rojnivîsa min bixwînin. Ez pir ji van hevalên xwe yên hêja hez dikim. Hevalên min ên jin û mirovên egîd.

Piştî salan têkoşîna hevalên jin li Xerzanê didin weke tê xwestin girîngiya wê nehatiye dîtîn. Dihizirim di vê demê de ez weke jin û lêgerînvana azadiyê bi qasî dihat xwestin nehatim fêmkirin. Di kesayetiya min de zehmetiyên jin rastî tîna nayên zanîn, ev rewşa nezanîna keda jinê di siyê dihele. Di encama vê de hevaltiyên rast pêşnakevin û li hinek cihan hinek tişt her tim kêmkirînin.

Ez niha van dinivîsînim. Rêz ber bi dawî ve diçin, bi fîzîkî ji te ve diqetim. Di nav xweşiyê de bimîne.

NAMEYÊN MIN

(Nameyên şehîd Marya yê di sala 2006'an de di pêvajoya pêşniyara çalakiya fedayî de nivîsîne)

Ji bo Rêber APO, mirovê sosyalîst û azad ê ku jiyan ji nû ne ava kir

Çawa dest pê bikim, gelo wê peyv bikarin we vebêjin, wê hibir hêza vegotinê bikare bafirîne? Ger bi dudiliya ez ê nikarim we vebêjim jî be

dîsa dixwazim bi girêdana xwe re pêûsê di nav peyvan re derbaz bikim. Vegotina herî baş mirov bi xwe li ser xwe vedibêje. Rêberê min, ji bo em çawa bijîn, bibin xwedî kesayetê bi ehlaq a çawa û bibin xwedî kesayetê azad a çawa, we bi jiyana xwe fêrî me kir. We ev têgehên wadetdar bi jiyana xwe fêrî me kir. Ger ehleq û azadî nebe ti tama jiyane nîne, we ev zehmetî hemû li ber çav girt û bi me da nasîn. Ji bo hûn nîrx li dîroka mirovahiyê bar bikin we tenêbûn ji xwe re kir jiyana. Tê gotin; “yê ku peyvekê fêrî min bike ez ê çil salan bibim koleyê wî.” We ji bo me hêza jiyana azad a mirovahiyê di nav betonê de heps dike ava kir. Hûn bûn jiyana azad a sosyalîst bi xwe. Rêberê min, gelek Rêber derketin holê, lê yekî jî bi qasî we dilê mirovan neqîş nekir, ji pîrs-girêkên jin, civak, xweza û zayîna dîrokê re çareserî neafirand. Rêberê min, taybetmendiya we ya bingeşîn a ji Rêberên din cuda dike; hûn ji hemû aliyê jiyane re dibin hêza çareseriyê. Berî gelê Kurd, jina Kurd we nas bike di tabûtan de dijiya, bi tabûtan ve hatibûn qifilkirin. Jiyana, rih, hest û hîzrên wî; kî li ser van axan hatiye û çûye Ereba, Tirk, Pers û hwd. hemûyan jî ji bo ku van tabûtan kûrtir bikin ax avêtiye ser. Kurdek ji koka xwe şerm bike ava kiribû. Keç û lawên ji dayîka xwedawend direvîyan ava kiribûn. Hûn di dîrokek ku mirovan nêrîn û zanabûna xwe li ber guhan bi awayek pistepist vedigot de bûn ronahî û roj. Li ser axa Mezobotamya gelê Mezobotamya li derdora tirêjên we kom bû. Gel bi we re jîndar bû. Bi we re dilşad bûn, ronî bûn Rêberê min.

Rêberê min, we di navbera dîwarên beton de PKK’ê ava kir, ji nû ve ava kir, hûn bûn qereqterê jiyana nû. PKK’ê bi Heqî, Kemal, Mazlûm û Zîlanan re rih girt, bû tarzek jiyane. Ev jiyana bi xwîna şehîdan ava bû. Bi jiyana PKK’ê lîstin, bi pîvanên jiyana PKK’ê lîstin zanabûn an jî bêzanabûn bê ku di zanabûna wê de be ev tê wateya bi xeyal û hêviyên hevalên şehîd lîstine. Çetegeriya di nav PKK’ê de pêş ketî, tîpên jinên bi tevgera jin re dilîzin û kesayetên di bûna jina qilasîk de îsrar dikin bi awayek bêrehm bi van nîrxan lîstin. Lê ti carî diyarkar nebûn. Rêberê min, ev jî çavkaniya xwe ji rihê PKK’ê yê we avakirî, hevaltiya wê digire û ez ji vê jî bawer dikim; çiqas çetegerî derbikeve jî, her çendî kesayetên neyên pîvanên jina azad hebin jî hişmendiya PKK’ê şoreşa çandî û wijdanî ava kiriye. Em vê encamê di asta jin û civaka Kurd girtiye de

dibînin. Rêberê min, hûn bûn fêrkerê her tiştî. Bi vê fêrkinê re jî hişt jin bigihe xwebûna xwe, cewherê xwe nas bike, zanabûna wê ya cîns pêş bikeve û jina di xewa çaranûsa dîn de razayî hişyar kir. Bi ked û hewldanên we rêxstinbûna jinê bû hêzek, bû jinek xwedî vîn û bi rûmet. Niha jî ji bo azad bibin bi hezaran jin bi xwe re, li hemberî paş-verûyên civakê şer û têkoşînê dide. Vî şerî deriyê azadiyê vekiriyê. Êdî ti hêz li pêşiya vê jina ronîbûyî nabe asteng.

Rêberê min, berî rastiya Rêbertî nas bikim, ez jineke bi pîvanên asayî re dijiyam, hêza xwe rêxistin nedikir û bi pergale ve girêdayî bûm. Ez xwedî binyatek hişmediyek nedizanî çî dijî û bi nêrîna zîlam xwe digirt dest bûm. Ez jinek ji rastiya xwe direviyam bûm.

Rêberê min, jiyana ku berî we nas bikim jiyaye weke min jiyaye nahe-sibînim. Ji ber ez ne li ser hişê xwe bûm. Hest û nêrînên ne yên te bin tê wataye tu kesek din î. Rêberê min, ji roja min fikir û bîrdoziya we nas kirî heta vê kêliyê hîs dikim ku dijîm. Ji ber jiyana bi we re wate girt.

Rêberê min, min ti carî dîlgirtina we qebûl nekir û hezim nekir. Dîlgir-tina we ez bi awayek mûwazam bandor kirim, min wisa hîs dikir ku baskên min şkestîne, bê aso mame û di binê bîrekê de hatime hiştin. Divê cihê mirovek bi edalet, azadî, hezkirin, evîn û hemû xweşîkbûn di xwe de şêber kiriye ne hûceryek ba. Ev rastiya bi êş di aliyê wijdan, rûmet û ehlaq de pir li ser min bandor kir. Rêberê min, ji ber pergal ji hêza we tirsîya hûn dîl girtin, di dîrokê de jî mînakên mîna vê pir in. Îsa, Spartakus hwd. dibe hûn weke fîzîkî ji me qut kiribin, lê hûn di dilê gelê Kurd û gerîla de bûn okyanûsek mezin dibe.

Rêberê min, bi dîlgirtina we re bi hezaran keç û law ber bi çîyan ve be-zin û ez jî bi armanca vê dîlgirtinê rakim hatim qada gerîla ya têkoşînek pir dijwar lê tê meşandin. Bi ser re 8 sal derbas bû û hûn hîn di girtîgehê de ne. Di nav van salên me windakirin de min hevaltiya xwe ya nebes û şervantiya xwe ya sexte lêpîrsîn kir. Encamên ez gihiştîmê nîşa min da ku, di encama sekna me ya sexte de Rêbertî di nav wan çar dîwaran de ye. Her çendî hewl didim êşên Rêbertiyê parve bikim jî lê min ev di kûr de nejiyaye. Ger min bijîba wê demê çima Rêbertî hîn şerê jiyana dide, Rêberê min, di vê wateyê de lêborîna xwe dixwazim.

Xeyala min a herî mezin, weke hevalên xwe yên gerîla dîtina we ye, hûn li gel xwe hêskirin û bi wê hezkirina kûr a di dilê xwe de ji we re bêjim, Rêberê min. Her wisa xeyala min a herî mezin ew bû ku dîtina ji yîna ew kêliya ghişîna we ya gel e. Dibe ez vê nebînim, lê dê ev xeyalên min pêk bên, dê gel û gerîla bigihe we. Ez ji niha ve wan stran û qêrînen dilşabûnê dibihîzim. Di vê wateyê de gelek bextewerim.

Rêberê min, jiyana hûn di bin şert û mercên dîlgirtîbûnê de dimeşînin êdî sebir, tehmûl û ehleqa min vê ranake. Pêşîya tecrîtê negirtin, li hemberî vê bîndeng mayîn, wisa dihizirim min li xwe, gelê Kurd û hevalên hêja îxanet kiriye. Ez di aliyê xwe de jî vê îxanetê qebûl nakim. Di vî warî de weke rexneyîna hevaltiya xwe ya nebes û kêma jî be dixwazim girêdana xwe bidim nîşa. Dizanim, hûn çalakiyên bi vî şewazî napejirînin, naecibînin, lê ez di vê zanabûnê de me ya girîng mirov çiqas bi wate bijî ye. Ez bi xwe biryara şehadeta xwe didim, ez ê bi vê şehadeta xwe ve bibim mizgîniya jiyana nû, pêşerojên azad, çareserî û aşîtiyê. Di vê wateyê de şehadetek bi vî rengî rewa û watedar dibînim. Ez wisa dizihirim ku ji bo çalakiyê dereng jî mame. Rêberê min, ger hezkirin bedel be, bedel azadî be ez dixwazim bibim henaseya Rêberê xwe, dengê gelê xwe û kenê li ser rûyê zarokên nû ji dayîk dibin. Xwezî ji canê min tiştek cuda heba min feda kiriba, lê weke hemû mirov, gelê Kurd û hevalên hêja dizanin, ji derviyî soza min a gerîla ya ji dilê min ê jinê tê û giyana min a feda bikim cuda tiştek nîne.

Herî dawî dixwazim qêra azadiyê ji civaka mirovan a bi nalet re qêr bikim. Rêberê min, ez we bi çanda dayîka xwedawend a Zagrosê re silav û hezkirinên xwe raber dikim û we hembêz dikim.

Silav û hezkirinên min

Marya Umud

19 Adarê 2006

Ji bo gelê Kurd ê egîd ê serî ji komkujiyan re natewîne

We bi felsefeya dayîka xwedawend dergûşî ji kêliyên dîrokê, jiyana, gelan û şaristaniyan re kiriye. Di pakbûna dayîka xwedawend de bi

awayek dost nêzî her kesê bûn. We hezkirin, dilgermî, edalet û azadî weke ehleqa bingehîn girt dest. We axa hişk gihand bereketa dayîka xwedawend û bûn afînerê çax û jiyana nû. Hûn bûn kedkarê mirov gi-hand zanabûn û teknîkê ku hişt azad bihizire. Hûn bûn afrînerê Zagros û Mezobotamya, lê piştî re ji vê re biyanî hatin hiştin. Bi komkuji, çewisandin û polîtîkayên pişavtinê re hewl dan van xweşîkbûnan tine bikin. Tiştên ji dayîka xwedawend hatin girtin, azadiya di mejî de hatiye bicihkirin hişt ku hûn her tim li ber xwe bidin û bibin gelek şerker. Hi-nek caran azadî şîbiya gulberfînekê, hinek caran jî bû avek bêdeng. Di herîkîna dîrokê de we azadî kir dostê xwe. We ev dost her tim di dil û hêviyên xwe de veşartî hişt. Di bin siya çarşevên reş ên dîn de jî vegu-herîn qêrînek bêdeng. Ji bo tarîtiyê biçîrînin Zerdûşt û Hallacî Mansur derketin holê. Hişmendiya serdest a tarîtiyê ya tehamûlî van hêviyan nekir û bi awayek hov şewîrand xwest weke di dîrokê de qet nehatiye jiîn bihesibîne. Serdestan dîroka mirovahiyê li gorî hişmendiya xwe ya serdest nivîsî û tovê zilmê yê nû jî di nav fikir, nêrîn û bawerîya mirovan de çand.

Hûn xwedî rastiya gelekê di nav zehmetî û êşan de hatiye stradin in. Ti serdemên êş nekişandî nîne, her tim mehkûmê êş û zehmetîyan hatine hiştin. Hişmendiya emperyalîzma serdest, dayîka xwedawend û gelê Kurd qebûl nake. Ji ber ji hêz û heybeta wî ditirse. Çawa ku îro jî tê dîtin Rêbertî qebûl nakin û ji ber ji hêza wî ditirsin ji mirovan hatiye dûrkirin û di hûcreya Îmralî de tê girtin. Rêbertî hêviya sedsala 21'în û azadiya gelê Kurd e. Heta ku Rêbertî azad nebe, nepêkane gelê Kurd azad bibe û kêfxweş bibe. Yan jiyaneke azad an jî heta dawî îsayan û serhildan. Heta ku Rêbertî azad dibe. Heta ku gelê Kurd negihe Rêber û vîna xwe, şiyar û felsefeya me ya bingehîn ev e. Gelê Kurd her her tim bedel da-ne. Malavanî ji şerek bi rûmet û berxwedîyê re kiriye. Rêbertî dibêje; “yên ku bi rûmet şer dîkin, wê aşîtyek bi rûmet jî pêk bînin.”

Hewl bidin dînamîkên xwe yê cewherî rêxistin bikin. Li hemberî em-peryalîzma har dibe û hevkarên wê li ser bingeha parastina rewa hewl bidin azadiya xwe pêk bînin. Ji her demê zêdetir di metropolan de pêwîstî bi rêxistinbûna parastina cewherî heye. Ez di wê baweriyê de me dê ciwanên dînamîk ên lêgerînavanên mirovahî û şoreşa me di vê

pêvajoya dîrokî de rola xwe bilîzin. Di wê baweriyê de me dê jina Kurd a bi rûmet, dayîkên êş dikşînin jî bibin pêşeng û rêvebira vê serhildanê û bi têkoşîna didin jî dê bilindtir bikin. Coşa têkoşînê ya dayîkan rih dide şoreş û têkoşîna me ya bi rûmet. Di vê wateyê de çalakiyên wan silav dikim.

Ji bo gelê me yê li Ewrûpa

Di çend mijaran de dixwazim nêrînên xwe bi we re jî pave bikim. We-ke hemwelatîyên ji Kurdistanê hatin mişextkirin, bi çand û jiyana rojavayî tîn çewisandin ji axa xwe ya herî nirxdar bêpar hatine hiştin. Mişextbûn êş û îşkenceya herî mezin e. Dixwazim hûn bizanin ku zehmetî, êş û xêrbîyên hûn dijîn di dilê xwe de hîs dikim. Gelê me yê li welatên rojavayî dimîne, divê ciwan ji qirêjî û helandina pergalê bîr parastin û ciwanên hêjayî dîroka me ya azadiyê mezin bikin. Ez nirxek pir mezin didim têkoşîna gelê me ya li welatên Ewrûpa didin meşandin û her çalakiyek moralek pir mezin dide min, lê ez wisa dihizirim ku nebesî jî hene. Di wateya gel maf û rewaya xwe biparêzê de divê li hem-berî dîlgirtîna li ser Rêbertî tê pêkanîn, li her çarparçeyên Kurdistanê çewisandina li ser gel tê meşandin bibin dengê bihêztir, divê çalakiyên dijiwartir bîr kirin, hûqûq bê tengavkirin, ger bi riya hûqûqî jî be pirs-girêka Kurd bibe rojave jiyane ya sereke. Şêwazê çalakiyên wan, li gorî rêgezên hûqûqa rojavayî şêwe girtiye û bi vî rengî didome. Ev şêwazê çalakiyan heta cihekî derbazdare, lê ger ev encam negire êdî ew tarz hatiye derbazkirin. Ez wisa dihizirim divê çalakiyên pergal û rojeva welatan bê tengavkirin bîr kirin. Ez di wê baweriyê de me çalakiyên bi vî rengî dê encamgir bin. Gel dikare bi însiyatîfa xwe şêwazê çalakiyan bi rêxistîna bike, ji niha ve serkeftina hûn bi dest dixin silav dikim.

Gelê Kurd ê egîd

Di van rojên em têkoşînek topyekûn didin meşandin de, di vê têkoşîna we ya bi rûmet de ez dixwazim di nav van hêvî û hêrsa we ya mîna lehiyê diherike de bibim xunçeyek. Girêdan û berpirsyartiya we ya ji bo Rêbertî, girêdana min a ji bo Rêbertî û girêdana min a ji bo we gelê

Kurd ê nirxdar û weke pêwîstiya girêdana dilsoziya min a bi hevaltiyê re ferman dike ku çalakiyek bi vî rengî pêk bînim. Encex ez dikarim bi vî rengî êş û hêviyên we di vê pêvajoyê de veguherînim serkeftin û çareseriyê. Ev çalakiya ez ê ji bo gelek weke we nirxdar pêk bînim, li beramberî têkoşîna hûn didin meşandin pir kêr e. Divê ewladên gelek leheng jî bibin cangorî. Weke gerîlayek jin, têkoşîna gelê Kurd a mîna goşt û neynûk ji hev nabin mezin kirin û dixwazim deynê xwe yê şehîdan bidim. Li ser vê bingehe dixwazim bi giyana xwe jiyana Rêbertî, hêviyên gelê Kurd bixim bin garantiyê, bibim nîşaneyê rihê şervanên Rêber APO, komploya navnetewî û îxaneta navxweyî vale derbixim. Li ser vî bingehî bi dengê dilê bi azadiyê dişewîte re gelê Kurd, ronakbîran, hunermendan vedixwînim têkoşînek geştir û li derdora Rêbertî bibin xelekek. Em bibin mirovên bi erdem ên hêjayî mirovbûnê. Ji bo ez ê bibim jinek şayanê gelê xwe gelekî bextewerim. Bi evîna Mazlûm û Zîlanan re gelê xwe yê hêja hembêz dikim û maç dikim.

Bijî Rêber APO

Bijî PKK û PJAK

Bijî HPG û YJA STAR

Bijî şehîdên me yên afrîneriya azadiya me

22. 03. 2006

Ji bo hemû pêkhatiya rêxistinê

Di dîroka PKK'ê de her roj û kêliyêk bi xwîna hevalên me yên şehîd hatiye bidestxistin.

Hevalên hêja;

Weke hûn jî dizanin têgehên nirxdar ên mirov jênagere û pê henase digire hene. Di serê van têgehên de jî ehlaq, azadî, hezkirin, zanabûn û hwd. tên. Em hemû jî şerê bûyîna mirovek azad û bi ehlaq didin. Şoreşgerên rasteqîne mirovên herî bi ehlaq û azad in. Ketina nav kûrbûna şoreşgerî û milîtanbûnê watedar e, ez jî dixwazim xwe bigihînim vê kûrbûnê.

Dixwazin nîrxên vî gelî yên 30 sale derbaz kîrîne û bi xwîna şehîdan hatine bîdestxistin, qêrîna azadiyê bifetisîn. Ji ber vê çendê divê em jî ji hemû deman zêdetir çalak bin. Asta ku em gihanê, asta em di nav de ne û misyona dîrokê daniye ser milê me tevlibûnek wiha bi hêz ferzî me dike. Ger em li gorî pêwîstiyên dîrokê beşdarbûnê pêk neyînin em ê bên naletkirin. Ez weke jinek şoreşger naxwazim bibim jinek hatî naletkirî. Dixwazim li gorî misyona dîrokê danî pêşîya min bijîm. Jiyana herî watedar di mirinê re derbaz dibe, jiyana te ceribandî û avakirî ye. Êrîşên li ser mirovê zana û şoreşgeran tê kîrin wijdana min qebûl nake. Di vê wateyê de di mijara divê ez çî bikim de pir lêhûrbûn kir. Weke hûn jî dizanîn ev hesret û bêrîkirina min bû.

Di rastiya sedsala 21'mîn de ku zanabûn û wijdana min bûye yek wisa dihizirim pêwîstî bi çalakiyek fedaî pêkanînê heye. Ji ber li ser vê baweriyê ez ê çalakiyek wiha pêkbînim gelekî bextewerim. Dixwazim bi vê çalakiyê xwe dubare nîşa hişmediya zîlamê direwker bidim ku jina bi rastiya Rêbertî hatiye strandin dikare çî bike. Ev pêvajoya em di nav de derbaz dibin dişibe hemleya satrancê ya dawî. Kî hemleya dawî dest pê bike dê pêvajo di aliyê wî de pêş bikeve. Di vê wateyê de em pêvajoyek pir kirîtîk dijîn. Di van rojên ez ê hêrs û bedena xwe biteqînim de bangawaziya min ji hemû rêheval, gel û her ferdê ji xwe re dibêje ez mirov im heye; divê li derdora Rêbertî bibin xelekek, xwedî li erk, berpirsariyên dîrokê danîne pêşîya me û nîrxên mirovbûna xwe derkevin. Ez wisa dihizirim û dibînin jixwe her hevaleyê jî di nav vê lêhûrbûnê de ye.

Hevalên min ên hêja;

Bi qasî mirov wate bide tiştên dijî, dahûrîne wê bigihe zewq û coşa jiyanê. Kesayetên nizanin çî dijîn, zehmetiyên xwe zelal neke dê her tim bibe xwedî seknek reşbîn û şêlo. Ev kesayetên wisa divê bi lezgîn xwe derbas bikin, an wê bikevin nav çirava ku wan jî nehizirîye, wê demê dê poşmaniya dawî nebe çareserî. Rêbertî hêvî ye, ev saziyên me yên ku hatine avakirin û qadên me yên xebatê jî parçeyek ji vê hêviyê ne. Lê gelek kesayetên van nabîne û hîs nake di nav me de hene. Çî jin be, çî xort be yê ku nebe xwedî keda hêviyê, ne dizane hêvî çî ye ne jî hîs dike. Me rêwîtiya hêviyê kir heta ku hatin vê astê. Divê em vê meşa

xwe ya li ser vê riyê jî bigihînin dawî, kêliya em gihiştin dawiya rê, gihiştine hemleya beza dawî, tevlibûnên bi hincet ên mîna nikarim bikim bi me nade qezenzkirin, dide windakirin. Di nav vê şoreşê de gelek tişt heye ku kesayet bike. Bila tenê mirov ji hêza xwe bawer be. Bila ji bîrdoziya Rêber APO ava kirî bawer bike û biecibîne.

Hevalên min ên hêja, dixwazim vê erka pîroz bi ser bixim. Di vê wateyê de di wê baweriyê de me hûn wate didin min. Silav û hezkirinên xwe raber dikim.

Marya Umud

20 Adarê 2006

Ji bo hêzên YJA-Star'ê

Hevalên min ên xweşewîst;

Bi êşa ku dereng mayî nê re dide min dixwazim dest bi gotinên xwe bikim.

Dixwazim girêdana xwe ya bi heval re, deynê xwe yê hevalên şehîd bi giyana xwe bi serkeftinê re bersiv bidim. Ji şehîd û Rêbertî re bûna bersiv, tenê ne şehîdbûn e. Ev di her kêliya jiyânê de, li her qadê seknek fedekar, bi vîn û milîtan dixwaze. Ez di wê baweriyê de me hûn jî wisa nêz dibin. Hemû avaniya partiyê fedaî ye. Ti hêz nikare vî rihê fedaî ji nedîtî vê bê.

Hevrêyên min ên xweşewîst;

Em çiqasî li dora Rêbertî bibin xelekek, çiqasî Rêbertî bijîn tê wateya ku em ew qasî gihiştîne azadiyê. Zanabûna me ya azadiyê pêş ketiye. Em dawiya jinên ji rastiya Rêbertî qutbûne her roj dişopînin.

Bûna dostê xwezayê pir xweş û watedar e. Bêguman her kes nikare bibe dostê çiya. Keçên egîd, wêrek û serhildêr li çiya tên. Jinên bi hêz dizanin xwe li gorî diyalektîka xwezayê çawa bidin jiyîn. Dizanin xwe çawa azad bigirin. Nepeniya xwezayê mîna nepeniya jinê razeke. Min gelek hewl daye ez vî razî dahûrînim û fêm bikim. Lê min ev raz tam

fêm nekiriye. Çiya û jin bi hev re di nav ahengekê de ne. Çiya hemraza jinê ye. Çiya çiqas bûye şahîdiya êş, zehmetî û kêfxweşiyên jinê? Gelo şahîdê van êş û zehmetiyan heye? Bêguman heye, ew jî Rêbertî ye. Ew in yên ku bi salan ji Rêbertî re hevaltî kirî ne.

Hevalên min, ji her demê zêdetir pêdîvî bi azadiya jinê heye. Hêza jinê ya bi hêz dibe wê jinên bi rengê xwe, bi xweşikbûna xwe, yên ku hêjayî dayîka xwedawend bin, birêxistinkirî, bi vîn, ên ji cînsê xwe hez bike û yên azad bikin derbixê holê. Nêzîkatiyên jina lewaz dihêla zilamê serdest bi hêz bike. Divê jin li ser xeta parastina rewa xwe pêş bixe û xwe weke tamînata jiyana civakê bibîne, xwedî lê derkeve.

Ev roj bi ked, xwêhdan û xwînê hatine afirandin. Jina ku nizane çawa hatiye van rojan, vê fêm neke û nirx nede, her qada xebatê ya ku diçê dê bibe xwedî seknek seqet û her tim li pêşiya xebatên jinê bibe asteng. Hevalên me yên jin ên gelek bedew hene. Van hevalên me yên jin ji bo nasnameya xwe ya cewherî ji rîkê hemû zehmetiyan kariye bibe jinek bi vîn jî.

Di xalên ku kêr mayîme de rexnedayîna xwe didim. Bi pêtên agir ên azadiyê yên di dilê min de gur dibin re hemû hevalan hembêz dikim û maç dikim.

Bi silav, rêz û hezkirinên min re

Marya Umud

21 Adarê 2006

Ji bo tevahî şervanên azadiyê yên li Çarçêla

Çarçêla, gelek bedewî û zehmetiyan di nav xwe de dihevwîne, ya ku Çarçêla dike Çarçêla ev rêgeza diyalektîkê ye. Nepeniyên Çarçêla mirovan dikişîne xwe. Ez her tim Çarçêla dişibînim jinekê. Dema tu xwe berdidî nav kûraniya Çarçêla, tu wê demê ferq dikî te ew nas nekiriye û hîn gelek tiştên wê nedîtine. Çarçêla cihê ked dayîne ye, bêkedbûnê qebûl nake, tevî reftarên xwe nake. Azadiya jinê jî bi wî rengî ye; dema te ji

bo azadiyê ked û hewldan nedan wê demê jin li derveyî pêvajo û azadiyê tê hiştin.

Divê ji Çarçêlayê re tenê nebêjî çiyayeke û derbaz bikî. Çarçêla bûyîna tiştên tu dihezirî nabe ye. Sê demsalan di hembêza xwe de dihevine. Êş û kêfxweşiyê bi hev re dide jiyîn. Çarçêla warek azad ê mûwazam e. Ger te dilopek jî ji ava azadiyê vexwar êdî tu ji azadiyê venaqetî û hema tenê tu dixwazî azadiyê vexwî. Ger tu tenê carekê jî hevaltiyê bi Çarçêlayê re bikî êdî nepêkane tu ji vê hevaltiyê veqetî. Çarçêla, zehmetiyan bi hevaltiya xwe re bi rakêşwerkirina ji mirovan re fez dike. Naskirina Çarçêla û Zagrosê her tim weke lêgerînekê ye, di dilê me de azweriya azadiyê ye.

Ez dudil û newêrek hatim Zagrosê, lê ez bi biryara xwe hatim. Tevî min berî vê qet Çarçêla nedîtibû jî ji min re pir balkêş hat. Ez hilkişiyam ser lûtkeyên Çarçêlayê. Her ku min Çarçêla nas kir, hevalên li qadên pratîkê dîtin guman û newêrekiya min weke cemedê heliya. Ev cemada ku heliya di dilê min de hezkirinek bi hêz jîndar kir. Rêgezê diyalektîka Çarçêlayê ez di nav rastiya rêxistinê de zêdetir strandim û têgihîştî kirim. Min gelek tişt li vê derê di nav rastiyeke zelal de nas kir. Çarçêla bû demsala ku nêrîn û hestên min têgihandin. Min Çarçêla bi kevir, ax, hevaltî û bêhna xwe ve di dilê xwe de neqîş kir.

Dixwazim bi silavdayîna hemû hevalên li Çarçêlayê re dest pê bikim. Hevalên min ên hêja, ya ku Çarçêlayê watedar dike ked û hewldana hûn didin e. Ev hevaltiya we ya ji dil û giyabûnê ye. Rêgeza diyalektîka Çarçêla xwe di pêwendiyên hevaltiya me de jî peyîtandiyê. Gelek bîranîn û parvekirinên me yên pir xweşik çêbûn. Me êş, zehmetî û kêfxweşî bi hev re tam kir û bi hev re jî li hemberî wan sekinin.

Hevalên min ên hêja, dixwazim diyar bikim ku gelek tişt ji we fêr bûm. Bi vî rengî min wateyek mezintir li jiyanê bar kir. Di paşeroj û pêşerojê de jî dibe zehmetî, ji hev nefêmkirin, gumanên ne di cih de û nakokiyên sînî derkevin. Divê em ji nakokî û pirsgerêkan netirsîn, ger bihevrebûna bi havaltî nêzî bûyer û diyardeyan bibin dê zemîna nakokiyên sînî bê zuwakirin. Ez wisa dihezirim divê pirsgerêk tenê ne di ferdekî de bîn mehkûmkirin ne jî xwe ji derviyî pirsgerêkan dîtinê hebe. Ev xapandinek

herî bingeîn e em dijîn. Dema pîrsgîrêkek derdikeve em di kesekî de mehkûm dikin û em dibêjin pîrsgîrêk çareser bû. Ev nêzîkbûnek pîr şaş e. Pîrsgîrêk bi tena serê xwe pêş nakevin. Teqez zemînên hem ji kes û hem jî ji nêvengê digire hene. Ne em bibin mirovên gunehbar, ne jî pîrsgîrêkan ji derveyî xwe bibînin. Ger em xwe li gor cewherê çeka rexne û rexneyên lêpirsîn bikin, di ber çavan re derbas bikin wê demê dê rojevên ne di cihê xwe de neyên jiyîn. Ez di wê baweriyê de me hûn hevalên hêja jî li ser vî bingeînê nêz dibin.

Ji bo hevaltiyê nebesiyên min çêbûn. Lewra ji we lêborînê dixwazim. Weke hûn jî dîzanin şerek topyekûn ku di şexsê Rêbertî de li hemberî Kurdan tê pêşxistin heye. Divê em li hemberî van êrîşan bibin mortal. Dixwazim di pêkanîna pratîkê de bibim bersiva erk û berpirsyariyên xwe yên di vê pêvajoyê de. Encex dikarim bersivê wisa bidim, ji ber ez ê erke wisa bi cih bînim gelekî bextewerim. Di van kêliyan de dilê min di qefesa xwe de nahewe, mîna zarokê bi coş im. Ez di wê baweriyê de me hûn jî di gihandina sala 2006'an a serkeftinê de bi awayek çalak xwedî li erk û berpirsyariyên xwe derkevin. Di vê wateyê de ez di têkoşîna we ya azadiyê de serkeftinan dixwazim. Her wiha ez we bi dilsozaya xwe ya hevaltiyê, bi agirê azadiyê yê di dilê min de hembêz û maç dikim.

Bi hezkirinê min re

22 Nîsanê 2006

Marya Umud

Zagros- Şamkê

Ji bo malbata min xweşewîst a jiyîna bi rûmet ji xwe re kirî rêgez

Di serî de ez silav û hezkirinê xwe ji dayîk, bav, xwişk, bira û tevahî xizim û dostan xwe re dişînim. Hêvî dikim ku hûn kêfxweş û bi tendurist bin. Ez yek bi yek çavê we maç dikim.

Ev demek dirêj çêbû ji we veqetîme. Di vê demê de ew derfeta min a rasterast bi we re baxivim çênebû. Gelek tiştên ez ê di vir de binivîsim min dixwest bi we re nîqaş û parve bikim. Ger rasterast nîqaş çêbiba dê watedartir ba. Ez dixwazim hûn bizanin ku min gelek tişt ji felsefaya jiyana Mirovê Zanê yê pîroz fêr kir.

Malbata min a hêja, ji bo zarokekî perwerdeya dayîk û bav dide, taybetmendiyên di zarok de pêşdikevin û rêbazên terbiyekirinê pir girîngin. Di nav derfetên Kurdistanê de zarokên keç li gorî feraseta pîvana feodal hatiye mezinkirin, feraseta namûsê bûye weke tirsekê ku divê taybet li hemberê wê şiyar tevbigere bi darê zorê hatiye fêrkirin. Dibe di roja me ya îro de bi vî awayî perwerde nemabe, bi saya têkoşînê malbatên Kurdan jî di asta şoreşekê de guhertin û veguhertin avakirine. Dema behsa guhertina hişmendiya pîvanên feodal dikim divê ferasta jiyana kaptalîzmê ya pûçbûyî jî derbas nekim. Zarokên keç û kur divê li gorî hişmendiya bîrdoziya jiyana me bîr mezinkirin. Ya bi carekê tê çewisandin an jî bi carekê serberedayî tê hiştin, ev herdu nêzîkatî pir şaş in, zarok û ciwanan ber bi tinebûnê ve dibe. Her wiha ev ciwan ji aliyê civak û malbatê ve dikevin rewşa xeteriyekê. Dikevin ber diranên çarxa pergala bê esil. Di vê wateyê de berpirsariyên pir girîng dikevin ser milê malbatan. Perwerdeya di temenê biçûk de tê dayîn pir girîng e. Divê zarokên pêşeroja wan xweş bîr mezinkirin. Zarok çavkaniya hêviya me ya pêşerojê ne. Dayîk û bavê min ên xweşewîst, dibe hûn bêjin êdî ji me re perspektîf pêwîst nake. Lê min xwest di şexsê we de nêrînên xwe bi malbata xwe re parve bikim. Dayê, manê tu dizanî ka ez çiqas ji zarokan hez dikim. Tê bîra te, min her tim zarokê cîrana me direvand û danî gel me. Yê ku ez dehfi nav lêgerîn û têkoşînê kirim zarok bûn. Ronahî û bingehe ku hişt ez têkoşîn bikim yek jî zarok bûn. Divê zarok bi azad mezin bibin, divê bi azad li ser axa xwe bafirokên xwe li ba bikin. Divê zarokên Kurd êdî xemgîn û dilşikestî nebin. Divê em wê cîhana zarokan a pak jiyânî bikin. Divê di welatê min de zarokên rû bi ken mezin bibin.

Malbata min a hêja, ez weke zarokek we, her çendî aliyên we yê kêm hebin jî we ferasetek baş fêrî me kir û bi pîvanên welatparêziyê mezin kirim. We jî êşa zarokên xwe jiyân kir û we ew êş di kûr de jiyân kir. Di

vê wateyê de bi hezaran keç û lawên we hene. Şehadeta min divê we di warê hestiyarî de bandor neke, bila hêz û moral bide we. Ez naxwazim hûn bi awayek hestiyar nêzî çalakiya min bibin. Ger nêzîka-tiyê we bi wî rengî çêbibe, wê demê tê wateya we ji keça xwe fêr ne-kiriye, êşên gelê Kurd nejiyane. Baweriya min bi we heye ku hûn ê ji her demê zêdetir ji bo xeyal û hêviyên keça we pêk werin li qadên têkoşînê yên demokratîk çalakbûnê esas bigirin. Vê ti carî ji bîr nekin, hûn ne bi tenê ne, bi hezaran keç û lawên we hene. Ger kêfxweşiya min kêfxweşiya we be wê demê hêvî dikim hûn weke min dilşad bin. Dayîka min pir hestiyar e, lê dayîkên Kurdan dizanin dê bi êşa zarokên xwe re çawa bijîn, dê alîkarî bidin dayîka min. Dayîk pir dilgerm û bi hêz in. Evîna li hemberî Rêbertiyê, girêdana min a bi gelê Kurd re, deynê min li hemberî şehîdan, hezkirima min a li hemberî we; dixwazim bedelê azadiyê bi awayek hêjayî şîrê dayîka min ê zelal bidim, deynê xwe bidim.

Hêvîdarim apê min ê Gorgun baş û kêfxweş be. Her wiha ez jî keçek wî me û bi hezaran keçên wî li çiya ne. Apê Gorgun, mirov hebûnek cuda ye, ger mirov li ser xwe serweriyê çêneke, hest teşê didin wî, yek jî dema ev hest xeter bin, dê nikaribe xwe ji ber kendal û îxanetê rizgar bike. Ger di vê wateyê de bê dahûrandin dê baş be. Divê tu feodal û bi xurur nêz nebî. Di vê wateyê de xwe xemgîn neke, lawê te yê bi lehengî şer kirî û şehîd ketî heye. Riya şehîd Mazlûm riya me ye. Apê Gorgun ez ne ji ber xwîna me yeke ji te hez dikim, ez ji mirovhezbûna te û ji ber tu mirovan weke nîrx digirî dest, ji te hez dikim. Min tu weke apekî ne, her tim weke hevalem digirtî dest. Dema dihatim gel we min xwe pir rihate hîs dikir. Apê Gorgun, ji ber min malbata te nas kir pir dilşadim û bi şensim. Dixwazim hûn vê jî bizanin, ji we jî pir hez dikim. Her kesê maç dikim, bi hezkirinên min re.

Ez bi giştî xizim û dostan yek bi yek negirim dest. Tiştên min ji we re gotin di heman demê de ji bo wan jî derbasdar e. Ez ê ji bo Ridwan, Îbrahîm û Elîfê tişteke pir cuda venebêjim. Bila dibistana xwe berdewam bikin, bila dev ji dibistanê bernedin. Bila bi felsefeya Rêbertî zana bibin, di riya ronahî de meşin ji xwe re esas bigirin. Di rastiya Rêbertî de xwe kûr bikin. Bila nebin ciwanên ji rêzê. Bila her tim hewl bidin bi awayek hêjayî şehîdan bijîn. Elîf, Îbo û Ridwan ji we pir hez dikim.

Ez dubare we yek bi yek bi germahiya şoreşê hembêz dikim, bi hestên azadbûnê re we maç dikim.

Silav û hezkirinên xwe raber dikim

24 Adarê 2006

Marya Umud

Merheba bihara min, merheba kulfîlka min a mizgînîyê

Li ser lûtkeyên çiya, di nav baxçê azadiyê de bûna rêwiya heman riyê pir xweş e û bihevrebûnek watedar e. Tu hevala min a têkoşînê yî. Mirov dikare xwîşkekê ji xwe bibîne lê hevaltiya rast dîtî pir zehmet e. Hevaltiya min a bi te re hevaltiya rast e. Em ghiştin peywendiyek azad a xwîşkbûnê. Vê peywendiya azad a me xwe gihandiyê nêrîn û hişmendiya min a ji bo cîhan û jiyanê ronî kir. Parvekirinê min ê bi te re her dem ji bo pêşerojê ji min re bûne alîkar. Tu bûyî mamosteya min a jiyanê, min jiyan bi te re xwend. Bi tiştên ji te fêr bûme re hilkişiyam lûtkeyên herî jor. Ji ber tu xwîşka min î, ez her dem bi te serbilind bûm. Hebûna te hêz û moral daye min. Bihevrebûna me di rih, dil û mejî de girtî ber bi hêvî û evînê ve bask dibim. Bi hestên serkefinê dixwazim hezkirin û girêdana xwe ya li hemberî te bidim nîşa. Niha bi tilîliyên serkeftinê bi coş dibim. Hest û nêrînê min ên ghiştine lûtkeyê veguherîne lehiyekê, bi vê lehiyê dixwazim bibim zimanê hêrs û êşên bi salan kom bûyî. Bi biharê re mîna robarek diherike dixwazim gelê xwe bi coş bikim.

Azadî tim bûye lêgerîna min. Her tim li pey azadiyê bezime. Dema hinek caran henasa min di qirika min de dibû girêk, hinek caran jî bû remza ghiştina te û bi te re heman nêveng jiyan kirin. Di îtopayên min ên azadiyê de her tim xwe nû kir. Min azadî ne di qefesa di dilê xwe de ne jî li çyan bi cih kir. Azadî her tim lêgerînek bû. Di kêliya ku min digot; min ew dît, lê dîsa evîna min lêgerîna azadiyê bû. Ez nikarim piştî xwe bidim zanabûna azadiyê ya min bi dest xistî û ez nikarim îxanetê li kesayatiya xwe bi xwe bikin. Ez di dilê gelê xwe de bi lorîkên azadiyê ha-

tim mezinkirin. Ya ku min bike ez jî ev tûjbûn û tempoya min a têkoşînê ye. Heta ku Rêbertî azad nebe azadbûna gelê mazlûm jî nepêkane. Azadiya Rêbertî, dê bibe kêfxweşiya gelê Kurd, bibe azadî û kêfxweşiya min.

Kulîlkak min a mizgîniyê, ez hezkirina xwe ya ji bo te bi azadî û jiyana Rêbertiyê hevpeyman pêk tînim. Her veqetînek hevdîtinek e. Her demsalek gihiştina demsala din e, ez jî bi serkeftin û azadiyê re digihim te. Ya girîng ne hevdîtînê fîzîkî ye. Tiştê watedar ew e ku hevdîtîn bi rûmet, rêgez û azad bibin. Ez di wê baweriyê de me tu wate didî, hewl bide bi nêrîn û hestên min nêz bibe. Nêzîkbûna hestiyar û teng dê sih bixe ser evîna min. Lê dizanim tu ji min fêhm dikî û tu yê ji her kesê zêdetir li çepikan bidî. Ji bo mirovekî, ji bo jinekê nîrxa herî mezin azadî, ehlaq û hezkirin e. Ez jî dixwazim bibim jinek bi erdem; ez kêfxweşî, coş û dilşadbûna xwe li vê derê dibînim. Hêrsa min a gihiştîye lûtkeyê, berpîrs-yartiya dîrokê ji bo min ferman kirî, bi şêwazê Zîlanê ez ê di dilê pergala û KT'ê de biteqim. Ez dixwazim nîşa emperyalîzm û hevkarên wê bidim ka çawa bi mirinê tê reqîsîn û çawa agir tê pêxistin.

Bihara min, bila dilê te her tim mîna biharê be, di dilê te de kêfxweşî kêm nebe. Di demê xwe de gelek nîqaş û parkirinên min bi te re çêbûn. Ez wisa dihezirim mijarên me bi hev re parve nekiriye nemaye. Ji ber wê jî bila dilê te rihet be. Min dixwest te bibînim lê weke tu jî dizanî derfet dest nadin. Lewra em nikarin hev bibînin. Lê me di demê xwe de hevdu dît û em pir bi şans bûn jî. Piştî çend salan me di tarîtiya şevê de hev dît. Her wiha her hevdîtinek bû sedama avêtina gavên bi hêz ên nû. Di hevdîtina me ya dawî de pêkanîna çalakiyek wisa bi êsil bibû ax û barana wê. Bi mehane ev hestên bedew ên dijîm di rojnivîsa xwe de her tim bi te re parve kirine. Tu dizanî min di jiyana xwe de ti deman hestek wisa xweşik û aram nejiyaye. Ev coşa dijîm di qefesa dilê min de nahewe. Bawerim a jê re dibêjin azadî ev e; ji qirêjiyên dil û gemariya hizir xwe şûştin, ji sîberan dûr, di pakbûna şîn de li jiyane nêrîn, bi dem re ketin pêşbaziya û ji vê bezê tamek mûwazam girtin. Bûna rêhevala Zîlan, Bêrîtan, Mazlûm, Berwar û Viyanan, ew jiyîn, tişteke jî vê pîroztir nahizirim. Dema pêkanîna xeyalên min hatiye û derbas bûye, êdî dixwazim demek berî demekê rih bidim xeyalên xwe.

Dubare di şexsê te de bi baweriya dê hemû hevalên jin di vê pêvajoyê de bibin şervanên Rêber APO bi hezkirinên xwe te silav dikim. Mizgîn giyan, bi okyanûsa dilê xwe re, bi coşa evîna xwe te hembêz û maç dikim.

Bi hezkirinên min re

25 Nîsana 2006

Marya Umud

Zagros

Dosta min, Cana min, hevala min a bedew û femandara min Marya Şehîd ket

Belê dost û hevala min, ev nivîsa min a di vê lînûsê de heta vir e. Lînûs xilas nebû lê ez xilas bûm. Nivîsa min a berî vê ango nivîsa min a ku min xilas nekirî min berî vê sê rojan nivîsandibû lê ji ber dijmin hat min navber dabûyê. Min pir dixwest çalakiya xwe ya destpêkê ji te re vebêjim lê ne çalakî, êdî ketime rewşek ku nikarim tiştêkî vebêjim. Çalakiya me di 14'ê Gulanê de dest pê kir û min di 16'ê Gulanê de dest bi nivisandinê kir. Di tepeyê bi nalet ê Hevser de di 17'ê mehê de bi dijmin re ketin pevçûnê. Em bi giştî 6 heval bûn. Hevala Marya, dosta min, giyana min, hevala min a bedew û femandara min şehîd ket. Heval paşve kişyan. Ji bo ez dijmin kêmek din mijûl bikin dest bi gule avêtinê kir. Marya, femandara min êş dikişand, bi gotina xwe ya digot; “nalet be ez birîndar bû” re destê xwe bi awayek kulm şidand, li erdê xist û dîsa birîdar bû. Vê carê nalenala wê bû, ez çûm ser serê wê min qêr kir û got; “hevala Marya, hevala Marya” lê bi awayek fikir nalenal û çav vekirî şehîd ket, ez bi tenê hiştim.

Cilên wê parçeparçe bibûn. Ez jî ew du roj bûn ji hevalan qut bibûm û bi tena serê xwe di arazî de mabûm, dijmin di aliyê çep û rastê min re tên xwarê û derbas dibin, her kêlî dibe ku min bibînin. Ez pir bi tenê me, ti kes tineye. Îro jî nêzî du-sê demjimêran baran li ser min barî, li

min wisa bûye weke qerisîme. Çawa ku min çek û bêtêla femandara xwa Marya girt, min ew li wir bi bedena xwe ya ciwan bi tenê hişt. Min da ber qîran û got; “hevala Marya, hevala Marya,” lê êdî tiştêkî bikim nebû. Min pir ji wê hez dikir. Nirx didayê. Ev du roje ez direcifim, hem ji sermayê, hem jî hizirandina ji dîmena femandara min Marya û negotina peyva xwe ya dawî, tiliyên min niha pêûsê nagirin. Min ji milê xwe birînek biçûk xwariye, lê nenivîsandina min ne ji ber vê ye.

Hundirê min direcife, kêmek maye ez dîn bibim, nizanim çi bikim. Ez li ser arazî tam ne serwerim. Dûrbîna femandara min Marya jî li gel min e, dûrbîn gelekî kêrî karê min tê, lê qutê min nîne. Çentê me û her tiştê me ket destê dijmin. Weke tedbîr min parçeyek nan ê biçûk xistibû berîka xwe. Ew nan jî femandara min Marya dema nanpêj bû bi hevalê Sebrî re çêkiribûn. Ji ber bi destê wan û wê hatiye çêkirin naxwazim xilas bikim, jixwe ez ê têr nebim.

Niha jî dengê hat, dibe îro, sibe ez jî şehîd bikevim. Her çendî hêviyek min hebe jî.

Ez rewşa hevalên din pir mereq dikim. Gelo ew jî weke min bi tenê ne, yan jî şehîd ketine tam nizanim, mejiyê min gelekî tevlihev e. Naxwazim nivîs jî binivîsim, lê dîsa bi çend rêzîkan jî be, her çendî dest direcifin jî dinivîsinim.

Niha dîsa dengê skorskiyê tê, her dever girtine. Bi dûrbînê lê dinêrim û hema li ser şîverêya di bînya min de leşker derbaz bûn, min carekê got; qey ez dîtîm. Niha dîsa skorskî, gelo daket jêrê, ez nabînim lê dengê wê tê.

Ji hizirandina gelo ez biçin gundekî yan na serê min teqiya. Tenê ne ji bo nan, ji bo zûtir bigihim hevalan, lê nas nakim, gelo wê min îxbar bikin an na nizanim. Gundên din ên nas dikim pir dûrin, di gundên nêzîk de jî kemîn danîne. Ji ber çongên xwe jî nikarim bimeşim, ji westandinê zêdetir derûniya min rê nade. Marya min her tim li ber çavê min e.

Ger şehîd bikevim, lê ger bikevim nav dijmin ez ê heta guleya xwe ya dawî şer bikim. Dema ez li ber serê femandara xwe Marya bûm min bi

carekê xwestibû ez bomba xwe derxînim û li gel wê xwe biteqînim. Îşev çî çêbe nediya e, min şeva destpêkê heta sibê xwe xişikandibû. Her ku diçe tempoya min dadikeve, lê tevî her tiştî ez ê pes nekim. Dîsa hêviyek min a xilsabûnê heye. Bi taybetî ji bo tohildana hevalên şehîd divê bijîm.

Seyên li jêr gelekî dikin ewte ewt, gelo leşker hatine, lê bila bibe cuda rê nîne. Ev şeva min a duyeme ku di nav wan de derbas dikim. Ger biçin gundekî û bi destê gelê xwe şehîd bikevim, an agahî bidin dijmin dê ev min pir bêşîne, ji ber em ji bo wan, ziman û çanda xwe şer dikin.

Tav hêdî hêdî diçe ava, serma dîsa bedenên dorpêç dike. Her wiha demjimêrên ku di tarîtiya şevê de bimeşim nêz dibin. Wisa hîs dikim ku kefiya Marya min, femandara min li ser min, min germ dike û pir kûr xwe li min dipêçe. Tevî her tim çavşilim jî lê hîn ji çavê min rondik nehatine xwarê.

Min gotibû; ger rojekê şehîd bikevim min li Cudî veşêrin, lê ev hinekî zehmet e, ji ber vê ger şehîd bikevim min li kêleka femandara min Marya veşêrin. Bila li ser goristana wê kulîlkên şîn a min jî spî hebin û li ser gora me binivîsin du hevalên hev ên ji hev venaqetin, bêguman ji bo welatê xwe.

Belê, tevî her tiştî ji jiyana PKK'ê hez dikim, hez dikim, hez dikim

Ji mirovan hez dikim.

Ji zarokan hez dikim.

Ji têkoşîna jinê hez dikim.

Çi xweş e cihê xwe di nav jiyaneke wisa bi rûmet de digirm û giyan didim.

Belê, dengê Marya min, femandara min hat min tu dibihîsî?

Ez lênûsê digirim. Ji ber ez ê niha bi wê re baxivim.

Silav û Rêzên Şoreşgerî

18 Gulana 2010

Toprak Canfeda

Bidlîs

(Ev nivîs ji rojnivîsa hevala Toprak Canfeda ya di pevçûna hevala Mar-
ya tê de şehîd ketî li gel bû û piştî wê di 24'ê Adara sala 2011'an de
şehîd ketî hatiye girtin.)



Navê kod: TOPRAK CANFEDA

Nav û paşnav: ASÎYE GUNDUZ

Cih û dîroka jidayîkbûnê: 12/ 09/ 1982 / SÊRT

Navê dayîk: KAMÎLE

Navê bav: MEHMED

Cih û dîroka beşdarbûnê: 25/ 06/2004

ALBÛM





DAYÎK Û BIRAYÊ WÊ RIDWAN AYDIN











Xeyalên xwe bigire û bernede

Bila guleyên bênavnîşan

Celadên mirinê xeyalên te di nîvî de nehêlin

Ez veqetînan di şevê de dihêlim û diçim

Bila riya te vekirî be

Rêwiya hêviyê dilê min bi te re rê dikeve

Tu hêviya Mazlûman î







